



K.T.

Zanîngeha Dîcleyê Enstîtuya Zanistên Civakî
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Doktorayê

**PLANDANÎNA ZIMANÊ KURDÎ (KURMANCÎ-SORANÎ)
DI MÎNAKÊN KORÎ ZANYARÎ KURD Î ENSTÎTUYA
KURDÎ YA PARÎSÊ DA**

Zülküf ERGÜN
20933007

Şêwirmend
Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU

Diyarbakır 2024

T.C.
Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı

Doktora Tezi

**KÜRT BİLİM AKADEMİSİ VE PARİS KÜRT ENSTİTÜSÜ
ÖRNEKLERİNDE KÜRT DİLİ PLANLAMASI
(KURMANCİ-SORANİ)**

Zülküf ERGÜN
20933007

Danışman
Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU

Diyarbakır 2024

TAAHHÜTNAME
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dicle Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum **“Plandanîna Zimanê Kurdî (Kurmancî-Soranî) di Mînakên Korî Zanyarî Kurd û Enstîtuya Kurdî ya Parîsê da” (Kürt Bilim Akademisi ve Paris Kürt Enstitüsü Örneklerinde Kürt Dili Planlaması)** adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

20/11/2024
Zülküf ERGÜN

PÊŞGOTIN

Li pişt piranîya kar û kiryarên me hokarên cîyawaz hene. Di amadekirina vê xebatê da jî çend hokerên hander hene ku hem peywendîya wan bi serborîya min a takekesî heye hem jî dînamîkên sereke yê nivîsîna vê xebatê ne. Berî her tiştî dema ku min di navbera 1997-2001ê da li Zanîngeha Dicleyê Beşa Ziman û Edebîyata Tirkî dixwend gelek caran bi awayekî siruştî li ser zimanê xwe yê zikmakî difikirîm û daxwaza nasîna mîrata ziman û edebîyata kurdî li cem min gur dibû. Ev bû sedem ku li ser kurdî çî bikeve destê min bixwînîm û hewl bidim bi qasî tirkî zimanê xwe jî binasim ku wê demê li tu dezgehekê derfeta hînbûna xwendina wê nebû. Piştî derçûna ji zanîngehê, min bi awayekî rêkûpêktir berê xwe da ser vekolîn û hînbûna rêzimanên kurmançî, soranî û zazakî û wek zimanekî hevmalbat hînbûna farisî jî bû yek ji karên min ên pêşîne. Bêguman bi saya van xwendinan bergeha min a li ser zimanê kurdî berfirehtir bû, bi taybetî hînbûna kurdîya soranî û xwendina çavkanîyên vî zarê dewlemend, derîyê gencîneyeke berfireh li ber min vekir û bi vê rêyê ez ji mîrata xwe ya zimanî, edebî û çandî agahdar bûm.

Ji ber vê serborîyê di destpêka sala 2012ê da dema ku min li Zanîngeha Artukluyê dest bi mamostatîyê kir, salên pêşî min dersên rêzimana kurmançî û soranî dan. Herçend tezên min ên mastir û doktorayê li ser edebîyata kurdî bin jî hogirîya min a di gel zimanî berdewam bû. Ez dikarim bibêjim ku ji 2015ê heta niha beşdarîya min a di xebatên standardkirina kurmançî da bû sedem ku ez bi bêhtir li ser serborîya zimanê kurdî hûr bibim. Di civînên me yê standardkirina kurmançî da gelek caran em tûşî gengeşeyên rêbazî dibûn û ji ber ku li ser mîrata plandanî û standardkirina kurdî xebatên rêkûpêk li ber dest nebû di nirxandin û destpêka bikaranîna hin zaraveyan (term) da em diketin nav gengeşeyên dîrûdirêj û carinan jî bêncam. Ev xebat ji alîyekî ve lêgerîna min a şexsî ye ku bi başî bizanim li ser plandanî û yekxistina kurdî çî hatine kirin û pêwîstî bi çî heye.

Li alîyê din mijara teza min a doktorayê ya li Zanîngeha Zaxoyê (2017) jî ku li ser peywendîya netewetî, nerît û helbestê bû ji alîyê zelalkirina hişî ve ji min ra bû palpişteke bihêz da ku ez bikarim xebateke weha bikim, lewra plandanîna zimanî encameke rasterast a netewetîya modern e ku di pêvajoya avakirina netewe-dewletan da kar ji bo bihêzkirin û pêşvebirina ziman, edebîyat û çanda wî gelî tê kirin. Ji bilî vê di 2020ê da pêşkêşîya min a “Raborî û Rêbaza Çêkirina Têgeh û Termên Teorîk û Zanistî di Kurdî da” li Stenbolê bû pêngava yekem a kirdeyî ku ez li ser vê mijarê hûr bibim. Piştî vekolîna min a li ser weşanên pêşî yê kurdîya soranî ji bo min ron bû ku ji ber bêagahîya kurdên kurmanç gelek bêje û zaraveyên kurdîya soranî bi çewtî ketine nav kurmançî. Ji ber vê min di heman salê da ev babet di Kongreya Duyem a Ziman, Raman û Dînî da li Zanîngeha Mêrdînê pêşkêş kir û bi sernavê “Kêşeya Veguhestinên Navzimanî ji Kurdîya Soranî bo Kurdîya Kurmançî” yê di pirtûka *Kavramlar ve Kuramlarê* (Çemk û Teorî) da weşand. Ez dikarim bibêjim ku ev her du xebat bûn zemîneyek ji bo amadekirina vê xebata li ber destê we.

Ji bilî van hokarên zemînesaz, di serê 2017ê da dema ku min li Zanîngeha Zaxoyê bernameya doktorayê temam kir mîna hemû xwendekarên ku li derveyê welatî dixwînî jî bo wergirtina “belgenomeya nasînê” min di gulana 2017ê da serî li UAKê da û ez li benda wergirtina vê belgeyê mam. Ji ber dirêjkêşana vê pêvajoyê û dozên li pey hev di 2020ê da min li Zanîngeha Dicleyê dest bi doktora duyem kir û bi vê pêngavê jî bingeha vê xebatê hat danîn.

Bêguman amadekirina tezên zanistî bi arîkarîya gelek dezgeh û kesayetîyan çê dibe. Di serî da sipasîya serperîştê xwe Doç. Dr. Osman Aslanoğluyî dikim ku ev çend sal in li Zanîngeha Dicleyê barê birêvebirina bernameya doktoraya kurdî hilgirtîye ser xwe. Mîna hemû vekolerên kurd berhevkirina çavkanîyan ji bo xebatên weha karekî yekcar mezin û giran e. Ji ber arîkarîya wan a di peydakirina hin çavkanîyên vê xebatê da sipas ji bo Sidîq Salihê serokê Dezgeha Jînê li Silêmanîyê, Dr. Hêmin Umer li Zanîngeha Bîngolê û Mistefa Aydoganî li Swêdê. Herweha sipas ji bo endamên jurîyê ku bi pêşnîyaz û rexneyên xwe piştgirî da vê xebatê.

Zülküf Ergün

Mardin 2024



KURTE

Plandanîna zimanî çawa ku di mînaka hin zimanên rojavayî yên sereke da tê dîtin, bi akademîyên zimanî dest pê bike jî bi damezirandina dewletên neteweyî dikeve rojevê. Lewra destnîşankirina zimanekî hevbeş ê neteweyî ji bo gihîştina armancên dewletên neteweyî xwedî roleke giring e, loma jî pêwîstî bi wê yekê tê dîtin ku ev zimanên neteweyî bî standardkirin, sadekirin, pêşxistin û nûjenkirin da ku di nav gelî da zû belav bibin û xizmeta armancên neteweyî bikin.

Ronakbîrên kurd di bin karîgerîya pêşhatên serdemî da cara pêşî piştî Meşrûtiyeta Duyem berê xwe didin vê mijarê û bi rêya weşanên xwe yên li Stenbolê bingeha plandanîna zimanî datînin. Lê ji ber ku kurd piştî belavbûna Dewleta Osmanî di nav pênc dewletên nû da ji hev tên veqetandin, ji derfeta plandanîneke hevbeş bêpar dimînin. Ronakbîr û zimannasên kurd heta salên 1970yê jî herwek li Stenbolê li dora hin weşanan di çarçoveya plandanîna zimanî da hin xebatan dikin. Di 1970yê da li Îraqê bi avakirina Korî Zanyarî Kurdê û di 1983yê da li Parîsê bi avakirina Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ev xebat renekî dezgehî yê rêkûpêk werdigire û derbazî asteke nû dibe.

Em di vê xebatê da pêşî paşxaneya plandanîna zimanî, çawanîya plandanîna zimanên cîran û bi awayekî giştî teorîyên plandanîna zimanî gotûbêj dikin, paşê jî li ser vê bingehe ji destpêkê heta 1970yê li welatên kurdnişîn xebatên plandanîna zimanê kurdî dişayesînin û bi taybetî jî li ser xebatên Korî Zanyarî Kurd û Enstîtuya Kurdî ya Parîsê hûr dibin. Ev her du dezgeh herwek xebatên berî xwe plandanîna zimanê kurdî li ser bingeha her du zarên sereke yên kurdî ava dikin. Ji vî alîyî ve Korî Zanyarî Kurd soranî û Enstîtuya Kurdî ya Parîsê jî kurmançî ji xwe ra dike navenda plandanîna zimanî. Em bi vê xebatê awa û dîroka plandanîna zimanê kurdî, nasandina xebatên her du dezgehên navborî û asta plandanîna her du zarên kurdî vedikolin û bi rêya berawirdkirina xebatên wan asta standardbûna van her du zaran nîşan didin.

Bêjeyên sereke

Plandanîna zimanî, kurdî, zar, Korî Zanyarî Kurd, Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, standard.

ÖZET

Dil planlaması başat batılı dillerde görüldüğü gibi dil akademileri ile başlasa da ulus devletlerin kuruluşu ile gündeme gelir. Ortak ulusal bir dilin belirlenmesini hedefleyen dil planlaması, ulus devletlerin amaçlarına ulaşması için önemli bir yere sahiptir. Ortak ulusal dilin halk arasında yaygınlaştırılması ve ulusal amaçlara hizmet edebilmesi için de bu dillerin standartlaştırılması, sadeleştirilmesi, geliştirilmesi ve modernleştirilmesi bir zorunluluk olarak görülür.

Kürt aydınları dönemin gelişmelerinin etkisi altında ilk kez İkinci Meşrutiyetten sonra bu konuya yönelir ve İstanbul'daki yayınları ile Kürt dil planlamasının temellerini atarlar. Osmanlı Devletinin dağılmasından sonra bu çalışmalar akamete uğrar. Yeni dönemde Kürtler beş farklı devletin sınırları içinde bölündükleri için ortak bir dil planlaması imkanından mahrum kalırlar. Bundan dolayı Kürt aydınları ve dil bilimcileri 1970 yılına kadar İstanbul'daki gibi bazı yayınlar etrafında dil planlaması çerçevesinde bazı önemli işlere imza atsalar da 1970 yılında Irak'ta kurulan Kürt Bilim Akademisi ve 1983'te Paris'te kurulan Paris Kürt Enstitüsü ile Kürt dil planlaması çalışmaları kurumsal bir veçhe kazanır ve yeni bir aşamaya geçer.

Bu çalışmada öncelikle dil planlamasının arka planını, Kürt dili ile ilişkili komşu dillerin nasıl planlandıklarını ve genel olarak dil planlaması teorilerini inceledikten sonra bu temel üzerine başlangıçtan 1970 yılına kadar Kürtlerin yaşadıkları farklı ülkelerdeki Kürt dili planlaması çalışmalarını tasvir ediyoruz ve özel olarak da Kürt Bilim Akademisi ve Paris Kürt Enstitüsünün çalışmaları üzerine yoğunlaşıyoruz. Bu iki kurum kendilerinden önceki Kürt dil planlamasının devamı olarak Kürt dil planlamasını Kürtçenin iki temel lehçesi olan Kurmanci ve Sorani lehçeleri üzerine inşa ederler. Bundan dolayı Kürt Bilim Akademisi Soraniyi ve Paris Kürt Enstitüsü ise Kurmanciyi esas alır. Bu çalışma ile Kürt dil planlamasının modelini, her iki kurumun çalışmalarının tanıtılmasını ve bu iki lehçenin planlanma düzeylerini karşılaştırmayı amaçlıyoruz.

Anahtar kelimeler

Dil planlaması, Kürtçe, lehçe, Kürt Bilimler Akademisi, Paris Kürt Enstitüsü, standart.

ABSTRACT

Although language planning starts with language academies as seen in the dominant western languages, it comes to the agenda with the establishment of nation states. Language planning, which aims to determine a common national language, has an important place for nation states to achieve their goals. The standardization, simplification, development and modernization of these languages are seen as a necessity in order for the common national language to become widespread among the people and serve national purposes.

Under the influence of the developments of the period, Kurdish intellectuals first turned to this issue after the Second Constitutional Monarchy and laid the foundations of Kurdish language planning with their publications in Istanbul. After the disintegration of the Ottoman Empire, these efforts came to a halt. In the new era, Kurds are deprived of the opportunity to plan a common language because they are divided within the borders of five different states. Therefore, although Kurdish intellectuals and linguists carried out some important work in the framework of language planning around some publications such as the one in Istanbul until 1970, Kurdish language planning studies gained an institutionalized aspect and entered a new stage with the Kurdish Science Academy established in Iraq in 1970 and the Paris Kurdish Institute established in Paris in 1983.

In this study, we first examine the background of language planning, how the Kurdish language and its neighboring languages were planned and the theories of language planning in general, and then build on this foundation to describe Kurdish language planning efforts in the different countries where Kurds lived from the beginning until 1970, with a special focus on the work of the Kurdish Academy of Sciences and the Kurdish Institute of Paris. These two institutions, as a continuation of their predecessors, based Kurdish language planning on the two main dialects of Kurdish, Kurmanji and Sorani. Therefore, the Kurdish Academy of Sciences is based on Sorani and the Kurdish Institute of Paris on Kurmanji. With this study, we aim to introduce the model of Kurdish language planning, the work of both institutions and compare the level of planning of these two dialects.

Key words

Language planning, Kurdish, dialect, Kurdish Academy of Sciences, Kurdish Institute of Paris, standard.

NAVEROK

Hejmara Rûpelan

PÊŞGOTIN	I
KURTE.....	III
ÖZET.....	IV
ABSTRACT	V
KURTEBÊJE.....	X
RAVEKIRINA ÇEND ZARAVEYÊN VÊ XEBATÊ.....	XI
DESTPÊK	1
1. Mijar û Kêşeya Tezê	1
2. Armanca Tezê	3
3. Sînorên Tezê.....	4
4. Rêbaza Tezê	5
5. Xebatên Sereke Yên Plandanîna Zimanê Kurdî	6
6. Nasandina Beşên Tezê	8
BEŞA YEKEM	11
RABORÎ, TEORÎ, RÊBAZ û DIJWARÎYÊN PLANDANÎNA ZIMANÎ.....	11
1.1. Raborîyeke Kurt A Plandanîna Zimanî	11
1.2. Teorîzekirin û Destnîşankirina Rêbaz û Armancên Plandanîna Zimanî	18
1.3. Dijwarîyên Plandanîna Zimanî û Peydabûna Modelên Nû.....	31
BEŞA DUYEM	35
RABORÎYA PLANDANÎNA ZIMANÊ KURDÎ (1908-1970).....	35
2.1. Plandanîna Zimanê Kurdî Li Stenbolê (1908-1921)	37
2.2. Plandanîna Zimanê Kurdî Li Îraqê (1918-1970).....	43
2.2.1. Tevgera Petîkirina Zimanê Kurdî.....	45
2.2.2. Gengeşeyên Li Ser Alfabeya Latînî û Çaksazîya Alfabeya Erebî.....	60
2.2.3. Destnîşankirina Rêzikên Rênivîsê.....	63
2.2.4. Xebatên Li Ser Ferhengnûsîyê.....	70

2.2.5. Xebatên Li Ser Rêzimanê	73
2.2.6. Hewldanên Yekxistina Zimanê Kurdî.....	76
2.2.7. Danîna Zaraveyên Zanistî.....	88
2.2.8. Berfirehkirina Qadên Bikaranîna Kurdî.....	93
2.3. Plandanîna Zimanê Kurdî Di Serdema Sovyetê Da	96
2.4. Plandanîna Zimanê Kurdî Di Serdema Hawarê Da (1932-1946).....	101
2.4.1. Danîna Alfabeyeke Nû û Belavkirina Wê.....	103
2.4.2. Destnîşankirina Normên Rêzimana Kurdîya Kurmancî.....	105
2.4.3. Danîna Bingeha Ferhenga Kurdî Bi Kurdî.....	106
2.4.4. Berfirehkirina Qadên Bikaranîna Kurdî.....	109
2.4.5. Yekxistina Zimanê Kurdî.....	110
2.5. Plandanîna Zimanê Kurdî Di Serdema Komara Mehabadê Da	115
BEŞA SÊYEM	118
XEBATÊN KORÎ ZANYARÎ KURDÊ LI SER PLANDANÎNA	
ZIMANÊ KURDÎ.....	118
3.1. Damezirandina Korî Zanyarî Kurdê, Armanc, Lijne û Çalakîyên Wê.....	118
3.1.1. Damezirandina Korî Zanyarî Kurdê û Armancên Wê.....	118
3.1.2. Pêkanîna Peykera Rêveberî û Lijneyên KZKyê.....	120
3.1.3. Peywendîyên KZKyê Di Gel Dezgehên Din û Hewldana Perwerdekirina Kadroyên Akademîk.....	126
3.1.4. Avakirina Pirtûkxaneya KZKyê.....	129
3.2. Danîna Normên Rênivîsê	130
3.3. Ji Nû Ve Nivîsîna Rêzimana Kurdî.....	143
3.4. Zaravesazî.....	155
3.4.1. Lijne, Çavkanî û Lîsteyên Zaraveyên KZKyê.....	155
3.4.2. Rêbaza Dariştina Zaraveyên KZKyê.....	166
3.5. Hewldanên Ferhenga KZKyê	173
3.6. Yekxistina Zimanî	174
3.7. Lîsteya Xebatên Kesî Di Govarî Korî Zanyarî Kurd/Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”ê Da.....	178
3.8. Weşanên KZKyê.....	197
BEŞA ÇAREM	203

XEBATÊN ENSTÎTUYA KURDÎ YA PARÎSÊ LI SER PLANDANÎNA ZIMANÊ KURDÎ..... 203

4.1. Ji 1983ê Heta 1987ê Xebatên Enstîtuya Kurdî Ya Parîsê Li Ser Plandanîna Zimanê Kurdî	205
4.1.1. Biryarên Li Ser Alfabeyê.....	207
4.1.2. Biryarên Li Ser Rêzimanê.....	208
4.1.3. Biryarên Li Ser Ferhengsazîyê.....	208
4.1.4. Yekdestkirina Dariştina Bêjeyan.....	209
4.1.5. Rêbaza Yekxistina Zimanî ya EKPyê.....	209
4.1.6. Bîr û Rayên Kesî Li Ser Plandanîna Zimanê Kurdî Di Hêvîyê Da.....	210
4.1.7. Destnîşankirina Pêwîstîya Weşanên Nû.....	212
4.1.8. Hewldana Pêkanîna Pirtûkxane û Arşîveke Neteweyî.....	212
4.2. Jî 1987ê Heta 2021ê Xebatên Koma Kurmancî Ya Enstîtuya Kurdî Ya Parîsê Li Ser Plandanîna Zimanê Kurdî.....	213
4.2.1. Beşdarên Koma Kurmancî.....	214
4.2.2. Naveroka Xebatên Koma Kurmancî.....	222
4.2.2.1. Mijarên Teorîk	223
4.2.2.1.1. Rêziman	223
4.2.2.1.2. Rênivîs	226
4.2.2.1.3. Etîmîlojî (Rehnasî)	228
4.2.2.1.4. Peywendîya Kurdî Di Gel Zimanên Din Ên Îranî û Zimanên Cîran	228
4.2.2.2. Ferhengsazî Yan Jî Çêkirina Ferhengokan.....	231
4.2.2.2.1. Vekolîna Devokên Kurmancî û Çêkirina Ferhengokên Wan.....	231
4.2.2.2.2. Çêkirina Ferhengokên Bêjeyên Kêmnas û Nenas.....	234
4.2.2.2.3. Derxistina Ferhengokên Çavkanîyên Edebîyata Kurdî.....	235
4.2.2.2.3.1. Ferhengokên Çavkanîyên Edebîyata Klasîk.....	235
4.2.2.2.3.2. Ferhengokên Çavkanîyên Edebîyata Nû	237
4.2.2.2.3.3. Ferhengokên Çavkanîyên Folklorê Kurdî	238
4.2.2.2.4. Ferhengoka Îdyoman.....	240
4.2.2.2.5. Tomarkirina Navên Zindîwerên Siruştî.....	241
4.2.2.2.5.1. Komkirina Navên Gul, Gîya û Daran.....	242
4.2.2.2.5.2. Navên Ajelan û Bêjeyên Têkildarî Wan	243
4.2.2.2.6. Tomarkirina Bêjeyên Têkildarî Çanda Kurdî Ya Pêşmodern.....	245

4.2.2.2.6.1. Navên Xwarin û Vexwarinan.....	245
4.2.2.2.6.2. Bêjeyên Li Ser Xanî û Amanên Navmalê	245
4.2.2.2.6.3. Navên Cilûbergan	246
4.2.2.2.6.4. Bêjeyên Karûbarên Gelêrî û Hunerên Destî.....	246
4.2.2.2.6.5. Bêjeyên Çend Mijarên Têkel	247
4.2.2.3. Zaravesazî Di Qadên Jîyana Modern Da.....	247
4.2.2.3.1. Zaraveyên Kargêrî û Siyasî.....	248
4.2.2.3.2. Zaraveyên Anatomî û Pizişkîyê	249
4.2.2.3.3. Zaraveyên Hiqûqî.....	251
4.2.2.3.4. Zaraveyên Rêziman û Zimannasîyê	252
4.2.2.3.5. Zaraveyên Edebî	253
4.2.2.3.6. Zaraveyên Cografi.....	254
4.2.2.3.7. Zaraveyên Matematîkê.....	254
4.2.2.3.8. Zaraveyên Aborî	254
4.2.2.3.9. Zaraveyên Leşkerî.....	255
4.2.2.3.10. Zaraveyên Rojnamevanîyê.....	255
4.2.2.3.11. Zaraveyên Kompîturê	256
4.2.2.3.12. Zaraveyên Trafîkê	257
4.2.2.3.13. Zaraveyên Futbolê/Topanê.....	257
4.2.2.3.14. Zaraveyên Rêzgirtinê	258
4.2.2.3.15. Zaraveyên Çend Mijarên Têkel.....	258
ENCAM.....	261
PÊŞNÎYAZ.....	267
ÇAVKANÎ.....	269
GENÎŞLETÎLMÎŞ TÛRKÇE ÖZET	311

KURTEBÊJE

EKP	Enstîtuya Kurdî ya Parîsê
KZÊ	Korî Zanyarî Êraq (Akademîya Zanistî ya Îraqê)
KZK	Korî Zanyarî Kurd (Akademîya Zanistî ya Kurd)
KZÊDK Desteya Kurd)	Korî Zanyarî Êraq Destey Kurd (Akademîya Zanistî ya Êraqê
bnr.	Binêre
vgz.	Veguhestin



RAVEKIRINA ÇEND ZARAVEYÊN VÊ XEBATÊ

Bikarber Fonksiyonel

Çaksazî Reform

Civaka zimanî (speech community) Ji komek mirovan pêk tên ku ji aliyê zimanî ve xwedî normên hevbeş in. Herwek zimanê hevbeş ê hoz, gund, bajar yan jî devereke.

Dahênan Îcadkirin

Dataşîn Ji du yan sê yekeyên zimanî çêkirina formên kurt ên bêjeyan. Bi îngilîzî “sculpture”, bi erebî “elneht”. Kurdîya vê bêjeyê ji “da+tiraşîn”ê çêbûye û forma wê ya kurt di soranî da wek “dataşîn”ê bi cih bûye.

Destwerdan Mudaxele

Firehzarî Pirzarî, bikaranîna gelek lehçeyên zimanekî

Girjî Rewşa nelihev a di navbera mirovan da ku hîna veneguherîye pevçûn û rûbirûbûna madî.

Kargêrî Îdarî

Kirdeyî Pratîk

Lawekî Talî, neesasî

Lêkdayî Hevdudanî

Namîlke Broşur, rîsale

Paye Statu

Plandanîn Plankirin, plansazî

Plandanîna zimanî (language planning) Rêxistina hemû xebatên pêşxistin û geşedana zimanî li xwe digire. Di zimanê kurdî ji bo vê plansazîya zimanî, plankirina zimanî û plana zimanî jî tên gotin. Ji nav van “plana zimanî” ji aliyê manayê ve kêmkirina û çalakîya plankirinê li xwe nagire. “Plankirina zimanî” ji aliyê manayê ve rast be jî zêde berbelav nîne. Herçî “plansazîya zimanî” ye herçend berbelav be jî ji aliyê dariştina xwe ve divê em bizanin ku “saz” a ku piştî bêjeya “plan”ê hatiye danîn forma dema niha ya lêkera “saxten”ê ya farisî ye. Li hember vê jî ber ku di kurdîya başûrî da “plandanîn” ji bo navê wezaretekê jî tê bikaranîn û “danîn” bêjeyeke kurdî ya xwerû ye em pêşnîyaz dikin ku ji bo vê “plandanîna zimanî” bê bikaranîn.

Plandaner Kesê ku plan datîne yan çê dike

Rênivîs Îmla, rastnivîsîn

Şêwezar Şaxên zarê zimanekî

Muturbekirin Tehmandin, veguheştina taybetmendiyên zarekî bo zarekî din

Tewere Behs, tema

Têçûn Mesref

Têhilkişîn	Derbazkirina nav hev
Xul	Dewre
Vuguhêzbarî	Hêz û karîna veguhestina zimanekî bo zimanekî din
Yekkirin	Tewhîd, unification
Yekxistin	Standardkirin
Zal	Domînant
Zar	Lehçe
Zarave	Term
Zûrbûn	Fokûs, fokûs bûn



DESTPÊK

1. MIJAR Û KÊŞEYA TEZÊ

Ziman dîyardeyeke zindî ye û her ziman li gor serborîya xwe ya dîrokî hinek taybetmendîyên xwe yên berê ji dest dide û hinekên nû li xwe zêde dike. Bi vî awayî li gor geşedan û guherînên civak û axiverên xwe rengûrûyên nû werdigire û diguhere. Ji serdemên berê heta niha koçberî, guherîna dîn, taybetmendîyên cografî, guherînên aborî, şer, dagirkerî, awayê desthilata sîyasî û pêşketinên zanistî û teknolojîk di guherîna zimanan da bûne hokarên dîyarker û van dîyardeyan arasteya pêşveçûn, dabeşbûn yan jî jinavçûna zimanan dîyar kirîye. Em dikarin bibêjin ku hokarên navborî di mînakê zimanê kurdî da karîgerîyeke nerênî çê dikin û dibin sedem ku ev ziman bi ser çend zarên cîyawaz da dabeş bibe, her zarek bikeve bin karîgerîya zimanekî din û ji hev dûr bikevin. Eger em berê xwe bidine serborîya kurdan a cografî, dîrokî, dînî, sîyasî civakî û çandî em dikarin bibêjin ku ev xalên jêrîn wek hokarên dabeşbûna zimanê kurdî derdikevin pêş:

a) Cografyaya kurdewarî bi piranî çîyayî ye û tê da çendîn çem û rûbar hene. Ji alîyê dîrokî ve ev taybetmendîyên cografî, rê li ber danûstendin û peywendîya civakî digirin, li pêşîya bazara hevbeş dibin asteng û dibin sedema peydabûna cîyawazîyên zimanî.

b) Welatê kurdan di nav împaratorîyên mezin ên mîna Roma û Pers, Bîzans û Ebasî, Osmanî û Sefewîyan da salên dûrûdirêj dibe qada milmilane û şerên berdewam û ev rewş dibe sedem ku her carê beşeke civaka kurdî bikeve bin desthilata van hêzan û kurd ji hev dûr bikevin.

c) Bi hatina îslamê herçend piranîya kurdan vî dînê nû qebûl bikin jî bi demê ra di nav civaka kurdî da gelek mezheb û bawerîyên cuda yên mîna sunîtî, şîîtî, yarsanîtî, şebektî, elewîtî û êzîdîtîyê peyda dibin û ev jî yekdestîya çanda dînî ji nav kurdan radike û dibe sedema ji hev dûrketinê.

d) Koçberî û êrîşên neteweyên mîna ereb, tirk û moxolan ber bi navçeyên kurdan ve ji alîyekî ve hevgyrtina civakî ya kurdan qels dike ji alîyê din ve rê li ber kartêkirina zimanên bîyanî li ser zimanê kurdî xweş dike.

e) Herçend di serdema lawazbûna împaratorîyên mezin ên îslamî da di nav kurdan da çendîn mîrektî peyda bibin jî di nav wan da yekîtiyeke sîyasî û kargêrî çê nabe û ev jî piştgirî dide zêdebûna cîyawazîyên navzimanî.

f) Di sedsala 19ê da dema welatên rojhilata îslamî dikevin bin karîgerîya modernîteyê ji ber sîyaseta navendîkirina dewletên serdest kurd xweserîya xwe ya herêmî ji dest didin û ji ber vê jî nikarin ji derfetên modern ên avakirina nasname, nerît û zimanekî yekgirtî sûd wergerin.

g) Di serdema avakirina dewletên neteweyî û parvekirina mîrata împaratorîyan da kurd nikarin tu payeyeke sîyasî bi dest bixin, ji berê xirabtir di nav pênc dewletan da tên dabeşkirin û dikevin ber pêlên asîmîlasyona dewletên neteweyî. Ji ber vê her beşeke kurdan dikeve bin karîgerîya van zimanên serdest (erebî, tirkî, farisî, rûsî û ermenî) û cîyawazîyên wan ên navzimanî zêdetir dibin.

h) Kurd di serdema modern da ji ber ku di nav çend dewletên cîyawaz da dijîn her beşeke wan li gor rewşa dewleta xwe alfabeyeke cîyawaz bi kar tîne û di encamê da weşanên kurdî bi her sê alfabeyên erebî, latînî û kirilî tên berhevanîn û ev jî rê li ber gelek xwendevanên kurd digire ku bikarin ji berhemên kurdên din sûd wergerin. Ev dîyarde hem peywendîya navzimanî qels dike hem jî li pêşîya çêbûna rayeke giştî û nerîteke hevbeş dibe astengeke mezin.

i) Ji ber nebûna plandanîneke navendî di sedsala 20ê da zimanê kurdî li dor kurmancî û soranî bi awayê ji hev cuda tê plankirin û ev berevajî armanc û nîyetên plandanerên zimanî dibe sedem ku modernîzekirina zimanî van her du zarên kurdî ji hev dûrtir bixe û rê li ber wê yekê veke ku di her zarî da ji bo heman dîyardeyên jîyana modern zaraveyên cuda bên danîn.

î) Kurdên Kurdistanê Îraqê di 1991ê da herçend ji bin hikumê rejîma Sedam Huseynî rizgar bibin jî ji ber nelihevîya her du partîyên sereke di 1994ê da di navbera wan da şerekî navxweyî çê dibe. Mixabin rengvedanên nerênî yên vî şerî di warê zimanî da jî xwe nîşan dide û di şûna plandanîna hevbeş a zimanî da di 1996ê da bi pêkhatina her du rêveberîyên Hewlêr û Silêmanîyê ev her du hikumet taybetmendîyên navçeyî yên herêma xwe derdixin pêş û berevajî vê derfeta baş li pêşîya hevgirtinê astengan çê dikin.

Ji ber van sedemên navborî ji serdemên pêşmodern û vir ve berhemên edebî yên kurdî bi çend zarên cuda yên mîna lûrî, kurmançî, goranî, soranî û vê dawîyê jî bi zazakî tên nivîsîn û tu car zarekî kurdî ji alîyê hemû kurdan ve nabe zimanekî hevbeş ê edebî. Lewra zimanê kurdî mîna zimanên cîran (erebî, farisî û tirkî) nabe zimanê dînekî berbelav yan jî împarotîyeke mezin û ji alîyê dezgehên dînî û siyasî ve bi awayekî berdewam nayê piştgirîkirin. Herçend ji sedsala 14ê heta sedsala 19ê çendîn mîrektîyên kurdî hatibin avakirin jî di nav wan da nerîteke hevbeş a edebî peyda nabe û her yek ji wan xwe dispêre zarê herêma xwe. Ji ber vê di serdema pêşmodern da kurdî ji dînamîkên hevgirtina zimanî (dîn û rêveberîyeke hevbeş) bêpar dimîne û di serdema modern da jî hewldanên plandanîna zimanî ya kurdî bi rêjeyî be jî ji bilî Kurdistana Îraqê û kurdên Sovyetê tu car piştgirîyeke dewletî û fermî wernagire û di çarçoveya hewldanên takekesî yan jî gengeşe û pêşnîyazên kovar û komeleyan da dimîne. Ev xebat bizav dike ku dîroka xebatên plandanîna zimanê kurdî berbiçav bike û bi taybetî jî li ser xebatên du dezgehên giring ên zimanê kurdî raweste ku ew jî Korî Zanyarî Kurd û Enstîtûya Kurdî ya Parîsê ne.

2. ARMANCA TEZÊ

Tevî hemû asteng û dijwariyan ji serê sedsala 20ê heta niha hin ronakbîr û dezgehên sîvîl û di mînaka kurdên Îraq û Sovyetê da hin dezgehên fermî ji bo plandanîna zimanê kurdî dikevin nav hewldanên giring lê ji ber hokarên nelibar ên jorîn ev hewldan tu car nagihîjin tevahîyeke giştî û hertim di çarçoveya welatekî yan jî zarekî da dimînin. Em bi vê xebatê dixwazin van parçeyên cîyawaz berbihev bînin û mîrata me ya ku di vî warî da çê bûye berbiçav bikin. Lewra xebata plandanîna zimanê kurdî bi tevahî negihîştîye armanca xwe ya dawî û zanîna vê mîratê dê di arastekirina vê hewldanê da arîkarîyeke baş bide dezgeh û xebatkarên vê qadê. Li alîyê din eger em ji hewldanên plandanîna zimanî ya pêşîyên xwe û ji beş û zarên din ên zimanê kurdî sûd wernegirin û nikaribin nerîteke hevbeş çê bikin dê hewldanên me bi tu awayî arîkarîya hevgirtin û nêzîkkirina zar û şêwezarên zimanê kurdî nekin.

Dema ku em berê xwe didin nerîta xwe ya plandanîna zimanî em dibînin ku ji çarîka pêşî ya sedsala 20ê heta îro belawela bin jî gelek raman, pêşnîyaz û xebatên baş hatine pêşkêşkirin û nabe ku em di xebatên xwe yên îro da û di arastekirina paşeroja xwe ya zimanî da vê mîratê paşguh bikin. Jixwe yek ji erkên xebatên akademîk ew e

ku vê mîratê berbihev bîne, bişayesîne û ji bo îro û paşerojê bi awayekî şîkarî şirove bike. Bi vî awayî mîrata pêşîyan di çarçoveya nerîtekê da tê vejandin û berdewamiya zimanî û çandî tê dabînkirin. Eger ev neyê kirin cîyawazîyên raborî û niha di paşerojê da dê xurttir bibin û ev xemsarî li ser paşeroja zimanê me û hevgirtina me ya neteweyî bibe metirsîyeke mezin. Lewra hevgirtina nasnameyî herçend mîrateke pêşîyan be jî alîyekî wî yê vînî (îradî) heye ku mirov di serdemekê da dikarin bi çêkirina rayeke giştî ya navçeyî yan şewezarî rêçika xwe ya nasnameyî biguherînin. Ji ber vê eger benikên ziman, edebîyat û çanda kurdî di çarçoveya nerîteke hevbeş da bi hev neyên xurtkirin û ji wan werîsên xurt neyên çêkirin dibe ku di paşerojê da ev benik ji hev biqetin û parçebûn yan mirineke yekcarî pêk bê. Ev xebat ji vî alîyî ve beşdarî û piştgîrîdaneke dilsozane ye ji bo bizavên xurtkirina nerîta zimanî û xeyala hevgirtina zimanî ya paşerojê ku bi raya me ev, xala herî bihêz a hevgirtina neteweyî ye.

Bi vê xebatê em di asta yekem da dixwazin valahîyên xebatên li ser plandanîna zimanê kurdî ya pêşîyan dagirin, dîroka plandanîna zimanê kurdî hem di qada kurdîya kurmancî da hem jî di qada kurdîya soranî da ron bikin û bi taybetî jî xebatên her du dezgehên Korî Zanyarî Kurd û Enstîtuya Kurdî ya Parîsê bi hûrgilî analîz bikin. Bi vî awayî ev xebat dê hem dîroka xebatên vê qadê destnîşan bike hem kar û çalakîyên van her du dezgahan ji nêzîk ve nîşan bide hem jî azmûna xebatên plandanîna zimanê kurdî ji bo bikarhênerên her du zarên sereke yên kurdî veguhêze da ku bikarin sûd ji xebatên hev bigirin û ji bo biryarên paşerojê xwe bispêrin nerîteke hevbeş.

3. SÎNORÊN TEZÊ

Ev tez ji Meşrûtiyeta Duyem (1908) heta 1970ê hewl dide hemû xebatên plandanîna zimanê kurdî xulase bike û piştî vê demê jî bi taybetî li ser xebatên plandanîna zimanî ya Korî Zanyarî Kurd / Korî Zanyarî Êraq Destey Kurdê (1970-2006) û Enstîtuya Kurdî ya Parîsê (1983-2021) raweste, lewra ev dezgeh, du dezgehên giring in ku di dîroka zimanê kurdî da bi mebesta plandanîna zimanî yekxistina zimanî tên avakirin û bi vê mebestê karên komelî dikin.

Ji alîyê zimanî ve ev xebat li ser kurdîya kurmancî û kurdîya soranî zûr dibe, lewra di perîyoda destnîşankirî da plandanîna zimanî li dor van zaran tê gengeşekirin û her du dezgehên navborî soranî û kurmancî dikin bingeha xebata xwe. Ji alîyê din ve divê mirov bi bîr bîne ku kurmancî û soranî ji serdema mîrektîyên kurdî ve dibin

zimanê edebîyatê, di serdema modern da pêkve dibin zimanê çapemenîyê, ji alîyê pîranîya civaka kurdî ve wek zimanê axaftinê tîbî bikaranîn û pîranîya deqên nivîskî yê zimanê kurdî jî bi van zaran tîbî kodkirin. Ji ber van sedeman em di vê xebatê da di mînakê kurmançî û soranî da behsa plandana zimanê kurdî dikin.

Ji bo şopandina xebatên plandana zimanî ya bi van her du zaran, ji bilî xebatên zanistî yê li ser vê mijarê, me weşanên mîna *Kürt Teavûn ve Terakki Gazetesi*, *Rojî Kurd*, *Hetawî Kurd*, *Jîn*, *Hawar*, *Ronahî*, *Roja Nû*, *Pêşkewtin*, *Dîyarî Kurdistan*, *Zarî Kirmancî*, *Gelawêj*, *Dengî Gêtîy Taze*, *Hetaw*, *Hîwa* û *Rojî Nwêyê* jî di ber çavan ra derbaz kir ku hem ji alîyê bikaranîna van zaran ve giring in hem jî ev mijar di van weşanan da hatîye gengeşekirin. Herweha ji bo nîşandana xebatên zimanî yê Korî Zanyarî Kurdê çavkanîya me ya sereke *Govarî Korî Zanyarî Kurd/Govarî Korî Zanyarî Êraq Destey Kurd* bû ku ji 1973yê heta 2006ê bi tevahî 31 bergên wê derketine. Di vê kovarê da herçend di her hejmarê da yek yan jî du gotarên erebî hebin jî me di xebata xwe da tenê gotarên kurdî esas girtin. Ji bo wênekirina xebatên Enstîtuya Kurdî ya Parîsê jî 8 hejmarên *Hêvîyê* (1983-1992) û 66 hejmarên *Kurmançîyê* (1987-2021) bûn çavkanîyên me yê sereke.

4. RÊBAZA TEZÊ

Çarçoveya teorîk û rêbaza plandana zimanî ya vê xebatê bi awayekî hûrgilî dê di beşa yekem da bê berbiçavkirin. Lê li ser bingeha gengeşeyên teorîsyenên plandana zimanî yê mîna Haugen, Ferguson, H. Kloss, Neustupny, Rabin û Nahîrî em dikarin bibêjin ku rêbaz û pêngavên plandana zimanî di mînakê zimanên curbicur da li gor pêwîstîyên wan zimanan tîbî peyrewkirin û teorîsyenên navborî van pêngavan ji mînakên curbicur ên zimanên cîyawaz derdixin. Ev pêngav di sê kategorîyan da dikarin bîbî kurtkirin ku kategorîya yekem plandana payeyê, ya duyem plandana korpusê û ya sêyem jî plandana berbelavkirin û cihgîrkirina zimanî ye di nav civakê da. Em di vê tezê da herçend car bi car amaje bi plandana paye û berbelavkirinê bikin jî zêdetir li ser plandana korpusê zûr dibin ku çemkên “kodkirina formê û berfirehkirina fonksîyonê” ya Haugenî, “nivîsîn û nûjenkirin”a Fergusonî, “cihgîrkirina kodê û hûrgilîkirin”a Neustupnyî, “armancên nîvzimanî û zimanî” yê Rabinî û “petîkirin, çaksazî, nûjenkirina bêjeyî û yekkirina zaraveyan” a Nahîrî li xwe digire.

Ji bilî vê ji ber temamnebûna qonaxa plandanîna payeyê û destnîşannekirina zimanekî hevbeş ê nivîskî di nav kurdan da hizir û pêşnîyazên li ser hîlbijartina normê jî di nav armancên vê tezê da cih digire. Di vê çarçoveyê da em di vê xebatê da plandanîna zimanê kurdî bi giştî di bin sernavên alfabe, rênivîs, rêziman, ferhengnûsî, petîkirin, zaravesazî, yekxistin û berfirehkirina qadên bikaranîna kurdî da destnîşan dikin. Li ser vê bingehe em dixwazin raborîya plandanîna kurdîya kurmancî û kurdîya soranî berbiçav bikin, asta standardîya van her du zaran berawird bikin û ji bo plandanîneke hevbeş a her du zaran bigihîjin hin encaman. Ji bo vê em dê ji rêbazên şayesandin (description), berawirdkirin (comparison) û şîkirinê (analysis) sûd wergerin û di çarçoveya lîteratura plandanîna zimanî da raborîya plandanîna zimanê kurdî binirxînin û perspektîvekê ji bo paşerojê çê bikin.

5. XEBATÊN SEREKE YÊN PLANDANÎNA ZIMANÊ KURDÎ

Ji salên 1970yan û vir ve di bin navên cîyawaz ên mîna zimanê yekgirtî, zimanê petî, sîyaseta zimanî û hînkariya zimanî da çendîn xebat li ser zimanê kurdî tên kirin û her yek ji wan alîyekî plandanîna zimanî vedikolin. *Ziman û Edebî Yekgirtûy Kurdîya* (1971) Îzedîn Mistefa Resûl hokarên dîrokî yên pêşketina şêwezarê Silêmanîyê wek zimanê yekgirtî yê kurdî ron dike û ji bo binecîhkirina vî şêwezarî wek zimanekî hevbeş ê hemû kurdan pêşnîyazên xwe dixêrê. Bi hin cîyawazîyan Cemal Nebez jî bi xebata xwe ya *Zimanî Yekgirtûy Kurdî* (1976) behsa vê mijarê dike û ji bo serxistina vê armancê pêşnîyaz dike kurdîya soranî bi kurmancî bê tehmandin. Jamal Jalal Abdulla bi teza xwe ya *Some Aspect of Language Purism Among Kurdish Speakers* (1980) bi hîlbijartina çendîn deqên kurdîya soranî ji 1934ê heta 1973yê petîkirina zimanî vedikole û nîşan dide ku di plandanîna zimanî da kurdîya soranî gihîştîye asteke baş û pêşketî.

Amir Hassanpour bi teza xwe ya doktorayê ya bi navê *Nationalism and Language in Kurdistan* (1992) di çarçoveyeke berfirehtir da li ser plandanîna zimanî hûr dibe û ji avakirina dewletên neteweyî (1918) heta sala 1985ê ji her alîyê ve rewşa zimanê kurdî, polîtîkayên dewletên serdest, weşanên kurdî vedikole. Hassanpour ji xebatên pêşî cudatir li ser hîlbijartina normê xwedî boçûneke cîyawaz e. Li gor wî, zimanê kurdî bi her du zarên kurmancî û soranî hatîye standardkirin û divê kurdî wek zimanekî cotstandard bê qebûlkirin.

Qeys Kakil Tofîq bi xebata xwe ya *Asayîşî Neteweyî û Pîlanî Ziman* (2008) cotstandardîyê li ser yekîtîya neteweyî metirsî dide zanîn û li dijî vê radiweste. Di vê çarçoveyê da ji aliyê çandî ve ji bo cihgirtina kurdîya soranî wek zimanê yekgirtî yê hevbeş pêşnîyazên xwe dixe rû û di vê mijarê da rexne li desthilatdarên siyasî yên Kurdistana Îraqê digire ku ji bo vê armancê karên pêwîst nakin. Nerîman Ebdula Xoşnaw jî di xebata xwe ya *Zimanî Standardî Kurdî* da (2013) piştî destnîşankirina raborîya gengeşeyên li ser zimanê standard rêgirîyên li pêşîya zimanê hevbeş bi tundî rexne dike, firezarî û cotstandardîyê wek xetereyeke mezin dide zanîn û diyar dike ku li Kurdistana Îraqê divê tenê soranî bibe zimanê fermî yê hemû kurdan.

Bêguman berbelavkirin zimanî jî şaxeke giring a plandanîna zimanî ye û hin xebat di vî warî da jî tên kirin. Se'îd Ebdulrezaq Qazî bi doktoranemeya xwe ya *Sîyaset û Plandarêjanî Zimanî le Sîstemî Perwerdey Herêma Kurdistan da* (2020) li ser vê mijarê hûr dibe û sîyaseta zimanî ya perwerdeya Herêma Kurdistana Îraqê dinirxîne.

Ji bilî van xebatên sereke li Kurdistana Îraqê bi dehan gotar li ser vê mijarê tên nivîsîn ku rêzkirina wan li vir ne pêwîst e. Lê ji aliyê xebata me ve divê em bibêjin ku çend xebatên taybetî li ser Korî Zanyarî Kurd û Enstîtuya Kurdî ya Parîsê jî tên nivîsîn ku navanîna wan pêwîst e. Azad Ubêd Salih bi bi navê “Korî Zanyarî Kurd” du gotar li ser Korî Zanyarî Kurdê, Salih Akin bi gotara xwe ya “Xebatên Plansaziya Ziman a Komisyona Kurmancî û Grûba Xebatê ya Vateyî” li ser du komên zimanî yên Enstîtuya Kurdîya Parîsê û Selda Araz jî bi teza xwe ya *La planification linguistique en diaspora: analyses linguistiques et sociolinguistiques des travaux du Séminaire Kurmancîyê* li ser xebatên Koma Kurmancî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê vekolînekê dike.

Herî dawî piştî vekirina beşên kurdî li Tirkîyeyê li ser mijara plandanîna zimanê kurdî çend tez û gotar li vir jî tên nivîsîn. Di vê çarçoveyê da Şehmus Kurt li ser xebatên hînkariya zimanê kurdî li Tirkîyeyê bi navê *Türkiye’de Kürtçe Öğretim Deneyiminin İncelenmesi (1968-2018)* (doktora, 2020), Sevda Orak li ser *Mînaka Standardkirina Kurdîya Kurmancî: Kovarên Hawar û Ronahîyê* (doktora, 2022), Behçet Toprak *Serborîya Hewldanên Standardkirina Kurdîya Kurmancî li Tirkîyeyê* (mastir, 2022), Cemil Güneş “Xebatên Weqfa Mezopotamyayê di Çarçoveya Plankirina Zimanî de” (gotar, 2023) û Şükran Coşkun jî “Plansazîya Zimên di Xebatên

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de” (gotar, 2024) çend xebatan dikin û ev jî nîşaneyê wê yekê ye ku di qada kurdî da ev xebat ber bi geşbûnê ve diçe.

6. NASANDINA BEŞÊN TEZÊ

Ev xebat ji bo ronkirina raborîya plandanîna zimanî di beşa yekem da behsa dîroka plandanîna zimanên ewropayî û zimanên cîran ên kurdî (tirkî, farisî, erebî) dike û di çarçoveya nêrînên Haugen, Fishman, Ferguson, H. Kloss, Neustupny, Rabin û Nahirî da li ser teorî, rêbaz, armanc û dijarîyên plandanîna zimanî zûr dibe. Ev çarçove ji bo nasîna dîrok û modelên cîyawaz ên plandanîna zimanî giring in û tevî xweserî û cîyawazîya xwe kurd dikarin ji van modelan sûd wergerin û li gor rewşa xwe modelekê çê bikin.

Di beşa duyem a vê xebatê da bi mebesta ronkirina xebatên plandanîna zimanê kurdî ya berî Korî Zanyarî Kurd û Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ji 1908ê heta 1970yê raborîya xebatên plandanîna zimanê kurdî tê vekolan û li gor cihê pêkhatina wan ev xebat di bin pênc tewereyan da tên dabeşkirin. Tewereya yekem ji 1908ê heta 1921ê xebatên plandanîna zimanê kurdî ya li Stenbolê, tewereya duyem ji 1918ê heta 1970yê xebatên plandanîna zimanî ya Kurdistanê Îraqê, tewereya sêyem xebatên plandanîna zimanê kurdî ya li Sovyetê, tewereya çarem xebatên plandanîna zimanî ya li dor kovara Hawarê û tewereya pêncem jî xebatên zimanî yên serdema Komara Mehabadê li xwe digire.

Xebatên plandanîna zimanê kurdî di sala 1970yê da bi avakirina Korî Zanyarî Kurdê derbazî qonaxa dezgehî dibe. Ji ber vê em di beşa sêyem da wek yekem dezgeha fermî ya zimanê kurdî pêşî li ser Korî Zanyarî Kurdê radiwestin. Herçend ev dezgeh di 1978ê da bê hilweşandin û di şûna wê da Korî Zanyarî Êraq Destey Kurd bê avakirin jî ev her du dezgeh wek heman dezgeh kar dikin û *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”* herwek dewama *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* derdikeve û bi berga heftem berdewamî dide weşana xwe ku di serdema Korî Zanyarî Kurdê da tenê şeş bergên wê derketibûn. Ji vî alîyî ve me di vê xebatê da çî cîyawazîyek nexist nav Korî Zanyarî Kurdê û Korî Zanyarî Êraq Destey Kurdê. Lê tevî vê divê mirov bi bîr bîne ku li gor sîyaseta dewleta Îraqê û rewşa şerî ya wê demê rol û çalakîyên Korî Zanyarî Êraq Destey Kurdê li gor Korî Zanyarî Kurdê gelek sînordar in û piranîya xebatên stratejîk di serdema Korî Zanyarî Kurdê da tên encamdan.

Em di vê çarçoveyê da ji bo nasandina vê dezgehê bi palpiştîya zanyariyên vê kovarê di serî da behsa damezirandin, armanc, lijne, çalakî û rêveberîya vê dezgehê dikin û paşê jî wek hîmên sereke yê plananina vê dezgehê behsa xebatên wê yê li ser rênivîs, rêziman, zaravesazî, ferhengnûsî û yekxistina zimanî dikin. Kovara vê dezgehê herçend cih bide xebatên hevbeş ên lijneyan jî bi awayekî berfireh cih dide gotarên kesî yê endamên KZKyê û nivîskarên serbixwe ku li ser mijarên cubicur dinivîsîn. Herçend ev gotar nûnertîya nivîskarên xwe bikin jî ji bo nîşandana bikaranîna kurdî di qadên curbicur da me bîbliyografyaya gotarên kurdî yê vê kovarê derxist û me ev gotar li gor mijarên wan dabeş kirin. Herî dawî dîsa ji bo nîşandana berfirehkirina qadên bikaranîna kurdî me cih da weşanên Korî Zanyarî Kurdê ku hinek ji wan li ser navê vê dezgehê tên weşandin hinek jî bi arîkarîya wan a diravî tên çapkirin.

Wek rengvedana hevterîbîya xebatên kurdîya soranî û kurdîya kurmancî 13 sal paşê dezgeha pêşî ya kurdîya kurmancî jî bi navê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ji aliyê kurdên penaber ve li Fransayê tê damezirandin. Ji ber vê em di beşa çarem da li ser xebatên plananina zimanî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê radiwestin. Ev dezgeh ji Korî Zanyarî Kurdê cudatir dezgeheke zimanî ya kurdên diyasporayê ye û ji welatî dûr bi arîkarîya civaka kurdî ya li Ewropayê û piştgirîdana Dewleta Fransayê berdewamî dide xebatên xwe. Ji bo berçavkirina xebatên zimanî yê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê me xebatên vê dezgehê bi ser du serdeman da parve kirin. Ji 1983ê heta 1987ê qonaxa damezirandin û xweavakirinê ye û di vê serdemê da bi rêya kovara *Hêvîyê* hin biryarên li ser zimanê kurdî dide. Me ev biryar di bin sernavên biryarên li ser alfabe, rêziman, ferhengsazî, yekdestkirina dariştina bêjeyên kurdî û yekxistina zimanî da destnîşan kirin. Herweha ji bo nîşandana xebatên vê qonaxê li ser plananina zimanî me cih da bîr û rayên kesî yê ku di kovara *Hêvîyê* da tên weşandin, weşanên Enstîtuya Kurdî ya Parîsê û hewla pêkanîna pirtûkxaneyêke neteweyî ya vê dezgehê.

Di tewereya duyem a vê beşê da em li ser xebatên Koma Kurmancî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê hûr dibin û bi rêya vekolîna kovara *Kurmancîyê* xebatên vê komê li gor taybetmendiyên wan polîn dikin û dinirxînin. Di encama vekolîna 66 hejmarên *Kurmancîyê* da me xebatên vê komê bi ser van pênc kategorîyan da dabeş kirin: (I) Mijarên teorîk di bin sernavên rêziman, rênivîs, etîmîlojî û peywendiyên zimanê kurdî di gel zimanên din ên îranî û zimanên cîran da, (II) xebatên ferhengazîyê di bin

sernavên vekolîna devokan û çêkirina ferhengokên wan, çêkirina ferhengokên kêmnas û nenas, derxistina ferhengokên çavkanîyên edebîyata kurdî û ferhengokên îdyoman da, (III) tomarkirina navên zindîwerên siruştî di bin sernavên navên gul, gîya û daran û navên ajelan û bêjeyên têkildarî wan da, (IV) tomarkirina bêjeyên têkildarî çanda kurdî ya pêşmodern di bin sernavên navên xwarin û vexwarinan, bêjeyên li ser xanî û amanên navmalê, navên cilûbergan, bêjeyên karûbarên gelêrî û hunerên destî û bêjeyên çend mijarên têkel da, (V) zaravesazîya qadên jîyana modern jî di bin sernavên zaravêyên kargêrî û sîyasî, zaraveyên anatomî û pizîşkîyê, zaraveyên hiqûqî, zaraveyên rêziman û zimannasîyê, zaraveyên edebî, zaraveyên cografî, zaraveyên matematîkê, zaraveyên aborî, zaraveyên leşkerî, zaraveyên rojnamevanîyê, zaraveyên kompîturê, zaraveyên trafikê, zaraveyên futbolê, zaraveyên rêzgirtinê û çend zaraveyên mijarên têkel da berçav kirin. Me di bin sernavê her kategorîyeke xebatê da bikerên vê xebatê, naveroka xebata wan û hejmara bêjeyên komkirî yek bi yek destnîşan kirin da ku ji aliyê çendîtîyê ve xebatên komê bi başî bîn zanîn. Herweha ji aliyê çawanîyê ve jî em li ser sûda bêjeyên komkirî û rêbaza dariştina zaraveyên qadên jîyana modern rawestan.

BEŞA YEKEM

RABORÎ, TEORÎ, RÊBAZ Û DIJWARÎYÊN PLANDANÎNA ZIMANÎ

1.1. RABORÎYEKE KURT A PLANDANÎNA ZIMANÎ

Plandanîna zimanî di nav mercên modernîteyê da wek pêdawîstî û armanceke dewletên neteweyî peyda bibe jî rehên wê vedigere serdemên kevintir. Herçend armanc ne plandanîna zimanî be jî bi derketina nivîsê û vir ve hin ziman nerasterast û nehişmendane dikevin nav pêvajoya plandanîna zimanî. Bêguman di serdemên pêşî da ji ber mebestên rêveberî, bazirganî û dînî kar bi zimanan dihat kirin û ziman tenê amrazên ragihandin û danûstendinê bûn. Bi taybetî nivîsîna pirtûkên pîroz û bi rêya avakirina dezgehên dînî veguheştina van deqan ji bo nifşên paşerojê dibin sedem ku ev ziman bi pêş bikevin û ji çakkirina alfabeyê heta danîna rêziman û ferhengan çendîn karên giring li ser wan bînin kirin. Bi vî awayî zanyarên dînî li perestgeh û xwendîngehan, burokrat li serayan û bazirgan jî li bajaran ji bo pêkanîna armancên xwe piştgirî didin pêşketina zimanekî hevbeş ê nivîskî. Mirov dikare bibêje ku zimanên mîna latînî û erebî di zemîneke weha da geş dibin û li derveyê cografyaya xwe ya etnîk li herêmên berfireh dibin zimanên hevbeş ên ragihandin, birêvebirin, dîn û edebîyatê û heta radeyeke baş standardîzekê bi dest dixin.

Li Rojavayê piştî lawazbûn û jinavçûna Împaratoriya Romainê, peydabûn û bihêzbûna mîrektîyên herêmî û serhildana mezhebên nû yên mîna protestanîyê, yekdestîya rêveberî û dînî têk diçe û rê li ber dezgeh û zimanên herêmî û pêrawêzxiştî vedibe. Ji ber vê cara pêşî li Îngiltereyê Wycliffe di 1382yê da bi rêya destnivîsînê Pirtûka Pîroz werdigêre ser zimanê gelî, Gerard Groote ji bo vê xwendîngehekê ava dike (Sadoğlu, 2010: 12) û Henrîyê Pêncem jî di sedsala 15ê da li hember latînî û fransî piştgirî dide zimanê îngilîzî û di gel burokratên qiralîyetê di rêveberîya dewletê da zarê Londrayê dixê kar (Janson, 2018: 199, 203). Li Fransayê jî Francisê Yekem di 1539ê da li dadgehan bikaranîna latînî radike, bi derxistina Fermana Villers-Cotterêtsê fransî wek zimanê fermî dide pejirandin û di hemû warên dewletdarîyê da wê dike zimanê fermî (Haugen, 1966: 6; Sadoğlu, 2010: 14).

Ev serdem li Rojavayê wek serdema Vejînê (Ronesans) tê binavkirin ku ne tenê peydabûna rêveberîyên herêmî; dahênana çapxaneyê, şoreşa zanistî (paşê vediguhêre şoreşa pîşesazî û teknolojîyê), peydabûna hînkariya laîk, tevgera reformê ya Lutherî jî palpiştîya geşedana zimanên biçûk ên navçeyî dikin û zemîna avakirina zimanên neteweyî xweş dikin. Ji ber vê li Rojavayê nerîta avakirina akademîyên zimanên neteweyî dest pê dike ku pisporên plandanîna zimanî van dezgehan pêngava pêşî ya plandanîna zimanî didin zanîn.

Li gor Einar Haugenî, akademîya zimanî yek ji dîyarî û beşdarîyên Ronensansa îtalî ye ku paşê li ser vê bingehe gelek akademîyên din li Ewropayê tên damezirandin. Cara pêşî nivîskarên Floransayê bi mebesta hilçînîn (sifting) û vebijartina (winnowing) zimanê îtalî di 1582yê da Duk Cosimoyê Yekem razî dikin ku Accademia della Crusca (Akademîya Xaçî) damezirîne û bi vî awayî Vocabolario degli Accademici della Crusca (Ferhengoka Akademîya Xaçî) di 1612yê da tê berhevanîn. Li ser vê bingehe li Îtalyayê ku ji aliyê siyasetî û zimanî ve welatekî dabeşkirî bû, kar li ser zarê Toskanayê (Tuscan) tê kirin û her ku diçe pêgeha vê dezgehê berfireh û rewa dibe û îdealên wê demeke dirêj karîgerî li ser ramana îtalîyan çê dike. Piştî vê mînakê pêşî, Académie Française (Akademîya Fransî) wek beşeke siyaseta navendîkirinê ji aliyê Cardinal Richelieuî ve di 1635ê da tê damezirandin. Herçend di serî da ev ji karekî kirdeyî zêdetir karekî sembolîk be jî di 1694ê da ferhenga zimanê fransî û di 1835ê da jî rênivîsa fermî ya vî welatî ji aliyê akademîya navborî ve tê amadekirin (Haugen, 1966: 9-10). Li ser şopa Akademîya Fransî jî di sala 1713ê da Akademîya Zimanî ya Qiralîyetê ya Îspanî ji aliyê Philipê Pêncem ve tê damezirandin û karê pêşîneyî yê vê akademîyê jî herwek mînakên berî wê danîna ferheng û rêzimanê ye. Loma jî di 1730ê da *Diccionario de Autoridades* (Ferhenga Rayedaran) û di 1771ê da jî *Gramatica de la Lengua Castellana* (Rêzimana Kastîlyayê) diweşînin (Milan, 1983: 125). Bi vî awayî li ser van mînakên destpêkî li Swêd (1786), Macaristan (1830) û gelek welatên din ên Rojavayê akademîyên zimanî tên damezirandin û ev dezgeh her ku diçin bihêztir dibin (Nahir, 1977: 108).

Di nav vê nerîta hevbeş a rojavayî da cihekî cîyawaz ê modela almanî heye ku heta demên nêzik jî plandanîna zimanî bi destpêşxerîya dezgehên sivîl bi pêş dikeve. Plandanîna zimanê almanî bi rêya tevgera petîgerîyê piştî şerê 1870-1871ê yê di gel Fransayê bihêz dibe. Li ser vê di bin serokatîya Rigelî da di 1885ê da Komeleya

Yekîtiya Zimanê Almanî ya Giştî tê avakirin, bi sedan şaxên wê tên vekirin û endamên wê jî digihîjin derûdora sih hezar kesî. Piştî vê bizavê hin dezgehên giştî jî piştgiri didin xebatên vê komeleyê û Rêxistina Posteyê û Rêveberîya Rêyên Hesînî yên Dewletê gelek bêjeyên bîyanî ji nav karûbarên xwe yên fermî diavêjin. Bi vê mebestê di 1935ê da Buroya Perwerdeya Zimanî tê damezirandin ku li ser Wezareta Navxweyî ya Almanyayê ye (Sadoğlu, 2010: 18) û piştî vê ev kar ji aliyê dezgehên dewletê ve tên encamdan.

Bi damezirandin û cihgirtina dewletên neteweyî li Rojavayê bizavên plandanîna zimanî gurtir dibin. Ji ber ku ev dewlet, neteweyê çavkanîya rewatiya rêveberîya xwe dizanin, ziman jî wek pêkhênerekî giring ê nasnameya neteweyî, dibe qada çalakî û giringîpêdana rayedarên dewletê û bi vê yekê jî ziman rehendêke îdeolojîk û siyasetî werdigire. Loma jî bihêzkirin û pêşvebirina zimanê neteweyî wek bihêzkirin û pêşvebirina dewleta neteweyî tê nirxandin û dibe karê pêşîneyî yê hikumetan. Li aliyê din berbelavkirina perwerdeya navendî û mecbûrî, rê xweş dike ku rayedarên dewletên neteweyî bêhtir giringî bidin destnîşankirina normên hevbeş ên zimanî û heman norman li ser hemû dever û bajarên welatê xwe bisepînin ku ji aliyê zimanî ve xwedî hin cîyawazîyan in. Bi gotina Haugenî herçend li hember van normên nû di nav hin komên civakî da hesta bîyanîbûn û welatîyên derece-du çê bibe jî (1966: 12) ji ber coşa nasnameya neteweyî, hêza sepîner a dewletên nû yên agresîf, geşedanên bilez ên ronakbîrîyê, perwerdeya mecbûrî ya giştî û kontrola navendî ya dewletê li ser amrazên ragihandin û çapemenîyê ev norm her ku diçin cihê xwe digirin û li piranîya van welatan “zimanên standard ên neteweyî” tên afirandin û bi ser tevahîya welatîyan da tên sepandin.

Îdealên avakirina neteweyan li dor ziman, çand, dîrok û nasnameyêke hevbeş; weha dikin ku rayedarên dewletên neteweyî ji bo avakirina zimanekî yekgirtî û hevbeş bikevin nav kar û çalakîyên zêdetir. Ji ber vê Haugen, vê serdemê çavkanîya tîpîk a plandanîna zimanî dide zanîn ku bi handana dewletan dezgehên peywendîdar dest bi bernameyên cidî yên vekolîna zimanên xwe dikin. Li gor wî herçend bingeha plandanîna zimanî cara pêşî ji aliyê akademîyên serdema ronakgerîyê ve dest pê bikin jî piranîya endamên wan ji elîten civakî pêk tên ku endambûna akademîyê ji bo wan rûmetek e û di mijara zimanî da kesên taybetmend nînin lê di serdema bidamûdezgehkirina dewletên neteweyî da ji ber armancên şênber û bilez ên demê

hikumatên neteweyî dezgeh û komîsyonên plandanîna zimanî ava dikin û ji bo gihîştina armancên xwe kesên pispor vedixwînin van dezgehan û bi hêza xwe ya madî û manewî palpiştîya plandanîna zimanên xwe dikin (Haugen, 1966: 10-14). Bi vî awayî dewletên neteweyî siyaseta xwe ya zimanî bi arîkarîya van dezgeh û pisporan binecih dikin û heta ji destê wan tê zimanekî xurt û bikarber ê neteweyî li seranserê welatê xwe û di hemû qadên jîyanê da berbelav dikin.

Ev pêşhatên li welatên Ewropayê piştî nîvê duyem ê sedsala 19ê karîgerî li ser welatên Rojhilata Îslamî jî çê dibe û hişyarîya zimanî di nav gelên musliman da jî serî hildide. Ev hişmendî di serdama dawî ya Dewleta Osmanî da bi rêya komele û weşanan xwe nîşan dide û hin mijarên plandanîna zimanî di bin karîgerîya mercên jîyana nû da cara pêşî bi rêya van amrazan tîr gengeşekirin. Di mînakê zimanê tirkî da Munîf Paşayê damezirînerê Cemîyet-î Îlmîye-î Osmanî (Komeleya Zanistî ya Osmanî) hêja di 1862yê da neguncana alfabeya erebî ji bo zimanê tirkî destnîşan dike (Yılmaz, 2013: 10), Suleyman Paşa (1838-1892) rêzimanekê vî zimanî dinivîse (İlm-i Sarf-ı Türki) (Sadoğlu: 2010: 109), paşê jî li dor hizira pêşvebirin û petîkirina zimanî û nehiştina karîgerîya zimanên erebî û farisî li ser vî zimanî, Türk Derneği (Komeleya Tirk) (1908) û kovara wê, Türk Yurdu Derneği (Komeleya Welatê Tirk) (1911) û kovara wê, kovara *Genç Kalemlerê* (Qelemên Ciwan) (1911), komîsyona Çaksazîya Tîpan (Islah-ı Huruf) (1911) û Tedkîkat-ı Lisaniye Encümeni (Encumena Vekolîna Zimanî), hizirên balkêş pêşkêş dikin û zemîna plandanîna zimanê tirkî di serdama Komara Tirkîyeyê da xweş dikin (Sadoğlu, 2010: 129-155; Çiçekler-Can-Yılmaz, 2018: 332-334, Can, 2016: 25).

Li ser vê bingeha hişyarîya zimanî, piştî Cenga Cîhanê ya Yekem dema li cografyaya îslamî dewletên neteweyî tîr avakirin ji bo plandanîna zimanî pêngavên kirdeyî û bihêz tîr avêtin. Her welat ji alîyekî ve zimanê xwe dike zimanê fermî û payeya wî bilind dike ji alîyê din ve jî ji bo pêşvebirin û modernîzekirina wî dest bi kar û çalakîyên giring dike. Di vê mijarê da plandanîna zimanî ya Komara Tirkîyeyê mînakê herî radîkal a plandanîna zimanî temsîl dike. Ataturk wek damezirîner û serokkomarê Tirkîyeyê, pênc sal piştî avakirina komarê li ser şopa mînakên plandanîna zimanên ewropayî û di çarçoveya armancên siyasî yê modernkirina çanda neteweyî ya Komara Tirkîyeyê da, di 23 Gulana 1928ê da di civîna encumena wezîran da biryara avakirina Encumena Zimanî derdixe û bi amadekarîyên vê dezgehê di heman salê da di şûna alfabeya erebî ya sedan salan da alfabeya latînî bi wan dide hilbijartin (Yılmaz,

2013: 41). Li ser vê biryarê, alfabeya erebî tê qedexekirin û alfabeya nû jî bi rêya amrazên dewletê bi ser gelî da tê sepandin. Piştî vê pêngava yekem, dîsa bi fermana Ataturkî di sala 1932yê da Türk Dili Tetkik Cemiyeti (Komeleya Vekolîna Zimanê Tirkî) tê damezirandin (Yılmaz, 2013: 60) ku paşê navê wê diguhere û dibe Türk Dil Kurumu (Dezgeha Zimanê Tirkî). Bi vî awayî ji bo afirandina zimanê tirkî yê petî û pêşvebirina wê, piştî Kongreya yekem a Dezgeha Zimanê Tirkî hema hema hemû ronakbîrên wê serdemê û paşê jî tirkologên bîyanî ji bo xebatên vê dezgehê tîr vexwendin û wezîfedarkirin. Ev dezgeh, kar dike ku di şûna bêjeyên erebî û farisî yê nav vî zimanî da bêjeyên tirkî peyda bike, di pirtûkên berê da li bêjeyên tirkî bigere û wan bixe kar, ji nav gelî bêjeyan berhev bike, kar li ser reha bêje û gireyên tirkî bike û li ser sîstema dariştina vî zimanî zaraveyên zanistî biafirîne (Kaya, 2018: 65). Hêjayê gotinê ye Ataturk bi xwe beşdarî van xebatan dibe û hin bêjeyên mîna “er, subay, kurmay, genel, özel, evrensel, kutsal, ısı, ergenlik û kıvanç”ê dadirijîne (Sadoğlu, 2010: 246). Li dor van armancan jî berdewam ferhenga zimanê tirkî tê berfirehkirin, xebat li ser zaraveyên zanistî, rêziman û rênivîsê tê kirin û zimanê tirkî di hemû qadan da tê geşkirin û pêşvebirin.

Zimanê farisî herçend di nav hemû gelên musulman da xwedî prestîjeke edebî û zimanê duyem ê cîhana îslamê be jî li hember pêşhat û pêşketinên Rojavayê nûnerên vî zimanî herwek bikarhênerên zimanên din pêwîstî bi plandanîna zimanî dibînin. Ji ber vê berî avakirina dezgeha fermî ya plandanîna zimanê farisî, di 1924ê da nûnerên Wezareta Ceng, Mearif, Ewqaf û Pîşesazîyê encumenekê ava dikin da ku ji bo pêdawîstîyên jîyana nû û karûbarên fermî bêje û zaraveyên nû daînin. Encumen heta dawîya sala 1924ê bi rêkûpêkî hefteyê carekê dicive û di warên firîn (hewapeymayî), endazyarîya leşkerî, topxane, kargêrî, amûrên cengê da dora 300 bêje û zaraveyên nû destnîşan dike. Li alîyê din di bin serokatîya Doktor Sidîq Alem ê serokê Darul Muallîmînê Alî da di sala 1932yê da “Encumena Danîna Zaraveyên Zanistî” tê avakirin û kar li ser zaraveyên zanistî tib, matematîk, fîzîk, kîmya, edebîyat û felsefeyê tê kirin.

Piştî van xebatên destpêkî Şahê Îranê dema serdana Tirkîyeyê dike û bi dezgeha fermî ya plandanîna zimanê tirkî dihesê, di vegerê da ferman dide ku karûbarên plandanîna zimanê farisî jî herwek mînakî zimanê tirkî di bin dezgeheke fermî da bîr kirin. Li ser vê Wezareta Mearif, Ewqaf û Pîşesazîyê piştî şewra bi pisporan ra

rêzîknameyeke 16 madeyî amade dike û di encamê da di 1935ê da fermana avakirina “Ferhengistanê Îran”ê dide (Tarîxçe-Ferhengistanê Zeban û Edebê Farsî, 1-2/7).

Herwek mînakên dezgehên berî xwe armanca sereke ya Ferhengistana Îranê “parastin, berfirehkirin û pêşvebirina zimanê farisî” ye û dixwaze van armancan bi rêya amadekirina ferheng, rêziman, xebata li ser pirtûkên kevin û edebîyata farisî pêk bîne. Ev dezgeh di qonaxa pêşî da (1935-1941) bêhtir kar li ser danîna zarave û bêjeyên nû dike û ji bo binecîhkirin û belavkirina wan jî bi fermanên hikumetê bêjeyên hîlbijartî di hemû qadên jîyanê da ji rojnameyan heta wezaretخانه û tabloyên li ser mixazeyan bi ser gelî da disepîne û bi rêya bernameyên radyoyê hewl dide welatîyan hînî bilêvkirina rast a van bêjeyan bike. Ferhengistan di 1943yê da bi navê *Nameê Ferhengistanê* kovarekê jî derdixe û bi vî awayî xebatên dezgehê ber bi edebîyat û vekolînên zimanî ve berfireh dibin (Beyat, 1370: 48-51).

Ferhengistana duyem a Îranê bi navê “Ferhengistanê Zebanê Îran”ê di 1968ê da tê damezirandin û wek dewama dezgeha pêşî ev jî, herî zêde li ser hîlbijartina bêjeyan radiweste û heta sala 1972yê di şûna bêjeyên bîyanî da 6650 bêjeyên farisî pêşnîyaz dike (Tarîxçe-Ferhengistanê Zeban û Edebê Farsî, 3/7). Ji bo vê jî sûd ji deqên farisî, zimanên din ên ku ji farisî bêje deyn girtine, zimanên gelêrî û ziman û zarên din ên îranî werdigirin. Li gor geşedanên sîyasî Ferhengistana sêyem jî piştî avakirina Komara Îslamî ya Îranê di bin navê “Ferhengistanê Zeban û Edebê Farsî”yê da di 1989ê da tê avakirin. Ev Ferhengistan li gor îdeolojîya Komara Îslamî herçend di nav armancên xwe da behsa vebijartina zimanê farisî neke jî wê “yek ji stûnên nasnameya milletê Îranê, zimanê duyem ê cîhana îslamê û hilgîrê zanist û çanda Îranê dide zanîn” û belavkirina vî zimanî li nav û derveyê welatî û guncandina wê di gel pêşketinên zanist û teknolojiya serdemî karê xwe yê pêşîneyî dide zanîn (Tarîxçe-Ferhengistanê Zeban û Edebê Farsî, 5/7).

Erebîya ku zimanê yekem ê şaristanîya Îslamê bû û karîgerîyeke mezin li ser zimanên neteweyên musliman çê kiribû di destpêka sedsala 20ê da dibe zimanê çendîn netewe-dewletên nû. Lê hêjayê gotinê ye ku erebî di mînaka Misirê da bi Sefera Napolyonî ra (1798) dikeve ber bayê guherînên modern ên rojavayî. Ji ber vê çî bi rêya weşanên modern çî jî bi wergêrana hin berhemên ewropayî bin, nivîskar û kesayetîyên çandî yên misirî hîn di sedsala 19ê da hest bi pêwîstîya dariştina zaraveyên nû yên

rojawayî dikin û ji bo vê mebestê dikevin nav bizavan. Ji bo vê, cara pêşî li vî welatî di sala 1892yê da El-Mecmeu'l-Luxe (Akademîya Zimanî) tê damezirandin. Tevî vê jî damezraweyîkirina plandanîna zimanê erebî di nivê yekem ê sedsala 20ê da geş dibe. Di 1919ê da li Şamê bi navê Mecmeu'l-Îlmîyyî'l-Erebî (Akademîya Zanistî ya Erebî), di 1932yê da li Misirê bi navê Mecmeu'l-Luxatî'l-Erebîyetî'l-Melikîye (Akademîya Zimanê Erebî ya Qiralîyetê) û di 1947ê da jî li Îraqê El-mecmeu'l-Îlmîyyî'l-Îraqî (Akademîya Zanistî ya Îraqî) tên damezirandin (Salih, 2017: 242) û ev dezgehên zanistî bi weşan û çalakîyên xwe ji alîyekî ve deqên kevin ên vî zimanî diweşînin ji aliyê din ve hewl didin di hemû qadên zanistî, teknîkî û hunerî da zaraveyên pêwîst destnîşan bikin û di nav çendîn welatên cuda yên erebî da hewla yekxistina zaraveyên zanistî bidin. (Nihad M. Çetin 2/5) Ji ber vê ev akademî parastina zimanê erebî, guncandina vî zimanî li pêşveçûnên zanistî, hunerî û teknolojik, dariştina zaraveyên modern, amadekirina ferhengeke dîrokî, vekolîna zarên erebî û çaksazîya zimanî di karûbarên fermî da û vekolîna her mijareke ku piştgirî dide pêşketina zimanê erebî di nav armancên xwe yên sereke da didin zanîn û ji bo vê kar dikin (Yalar, 2009: 138-140).

Ji van mînakên jî derdikeve ku di plandanîna zimanî da roleke giring a dezgehên heye. Di serdemên pêşmodern da dezgehên dînî û burokrasîya sîyasî, di serdema modern da jî akademî û dezgehên zimanî di teşedana zimanên standard da roleke berbiçav digêrin û di encama van hewldanan da zarekî biçûk ê eşîrek, devereke yan jî bajarekî dikin zimanê neteweyekê. Bo nimûne di destpêka Şoreşa Fransayê da li gor amareke sala 1790ê, tenê ji sedî 10ê gelê Fransayê zimanê standard ê fransî dizane. Herweha di sala 1860ê da dema Îtalya dibe dewleteke yekgirtî tenê ji sedî 2,5ê gelê wî welatî di jîyana xwe ya rojane da îtalîya fermî bi kar tînin (Elî, 2017: 68). Kêm zêde ev rewş, ji bo dîroka piranîya zimanên neteweyî yên îro weha ye. Ev jî asta serkeftina plandanîna zimanî ya dewletên neteweyî nîşan dide ku zimanên niha di rastîyê da di encama ked û têkoşîna wan a damezraweyî da digihîje vê astê û dibe zimanê hemû endamên neteweyê ku berê xwedî çendîn zar, şêwezar û devokan bûn.

1.2. TEORÎZEKIRIN Û DESTNÎŞANKIRINA RÊBAZ Û ARMANCÊN PLANDANÎNA ZIMANÎ

Mîna gelek dîyardeyên din binavkirin û teorîzekirina “plandanîna zimanî” (language planning) jî piştî pratîzekirina wê derdikeve holê. Hêjayê gotinê ye, hin vekoler ji bilî vê zaraveya berbelav ji bo nasandin û pênasekirina heman dîyardeyê zaraveyên şoreşa zimanî (language revolution), endazyarîya zimanî (language engineering), sîyaseta zimanî (language policy), çareserîya zimanî (language treatment), standardkirina zimanî (language standardization) û birêvebirina zimanî (language management) jî bi kar tînin (Baldauf, 2006: 149; Kaya, 2018: 4; Araz, 2020: 61) ku mirov dikare bibêje hemû jî şaxên plandanîna zimanî ne.

Li gor vekolerên vê qadê cara pêşî Uriel Weinreich di sala 1957ê da li semînerekê zaraveya plandanîna zimanî bi kar tîne (Cooper, 1989: 29) û du sal paşê jî Einar Haugen bi awayekî rêkûpêk çarçoveya wê dîyar dike. Li gor Haugenî, plandanîna zimanî arastekirina geşedana zimanekî ye ber bi armanceke dîyarkirî ve, lewra ji bo pêşbînîkirina paşerojê nabe ku mirov tenê piştî xwe bide daneyên berdest ên îro ku peywendîya wan bi raborîyê heye û ji bo ku mirov bikare karîgerî li ser zimanî çê bike divê bi mebest bikeve nav hin hewldanan. Rast e ku hin ziman berî hişmendîya teorîk a plandanîna zimanî, ji serdemên berê ve li ser destê komên biçûk ên ronakbîran ku xwe dispêrin çîneke rêveber, di nav demeke dirêj da hêdî hêdî bi rêya destnîşankirina ortografîyekê û lasayîkirina zarekî biprestîj “standard”ên xwe pêk tînin (1959: 8) lê li hember vê, piranîya zimanên îro di nav jîngeha serdema modern da bi paldana netewetîyê di demên nêzîk da dest bi plandanîna zimanî dikin. Herçend plandanerên van zimanan rûbirûyê hin rêgirî û dijwarîyan bibin jî li gor Haugenî dewletek, dezgehek yan jî komek ronakbîr dikarin araste bidin zimanekî û bi rêya plandanîne paşeroja wî zimanî dîyar bikin (1959: 15-16).

Plandanîna zimanî di nav hev kêşeya îro û paşerojê da teşe digire û li ser kêşeyên niha yên zimanî zûr dibe (Rubin, 2019: 206). Ji bo vê Fishman di asta neteweyî da plandanîna zimanî weku rêxistina lêgerîna çareserkirina kêşeyên zimanî dide zanîn (1973: 24) û bi rêya berawirdkirina aborî û zimanî, dîyar dike ku çawa kêşeyên aborî bi rêya plandanîne dikarin bînin çareserkirin ziman jî ji navendekî ve û li ser destê hin rayedaran dikare bê arastekirin, pêşvebirin û plankirin (1973: 26).

Fishman plandanîna zimanî, plandanîna neteweyê dizane, ji ber vê ne tenê paşerojê, nerîtê jî beşek ji plandanîna zimanî dide zanîn ku heta radeyekê dikare bê bikaranîn û afirandin (1973: 31). Herçend di vê hevkeşeyê da nerît bi serê xwe nikaribe bibe bersiva hemû pêdawîstîyên zimanî û li hember pêşhatên demê ji alîyê çandî, civakî û ronakbîrî ve kêmkirina bimîne jî ji alîyê retorîk û seqamgîrîya nasnameyî ve dikare bibe palpişteke aramker û beşeke giring a plandanîna zimanî (1983: 111).

Bi her hal mîna Gadelii jî amaje pê dike eger hin kiryarên pêşîyan yên li ser plandanîna zimanî nebûya îro ji hev têgihîştina mirovan dê zehmet bûya (1999: 5) û eger îro jî kar neyê kirin dibe ku di paşerojê da hin ziman yan dabeş bibin yan jî li beramber zimanên pêşketî lawaz bimînin, nikaribin barên paşerojê hilgirin û ji kar bikevin. Ji bo vê jî teorîsyenên plandanîna zimanî ji bo yekxistin, pakkirin, pêşvebirin, nûjenkirin û çareserkirina kêşeyên îro yên zimanan; rêbazên curbicur destnîşan dikin û rayedarên dewletên neteweyî jî ji bo dabînkirina yekparetîya welatê xwe, parastina yekîtiyê û hevgirtina xwe û asayîşa xwe ya neteweyî piştgirîya cihbicihkirina van planan dikin. Lewra bi gotina Nawxosî di plandanîna zimanî da ziman û netewe hevtayê hev tînin (2010: 12) û di bîngeha her planeke zimanî da parastin û pêşvebirina neteweyê li ber çavan tê girtin.

Li dor vê têgihîştinê wek pêşengê teorîya plandanîna zimanî cara pêşî Haugen di xebateke xwe ya 1966ê da (1966: 18-24) behsa rêbazên plandanîna zimanî dike û vê diyardeyê li ser çar stûnên sereke ava dike:

1. Hilbijartina normê (Selection of norm): Ji ber ku her ziman xwedî çendîn zar û şêwezar û devokên cîyawaz in di plandanîna zimanî da karê pêşî ew e ku yek ji van norman bê hilbijartin. Lê ev kar ew çend jî ne hêsa ye, lewra norma hilbijartî ji alîyekî ve ji bo axiverên wê dibe sedema prestîjê, li alîyê din dibe ku ji bo axiverên normên din bibe sedema perawêzxistinê. Ev carinan di nav herêm û eşîret û komên civakî da dibe sedema ji hev dûrketin û berxwedanê jî.

2. Kodkirina formê (Codification of form): Ji destnîşankirina rêzikên zimanî pêk tê. Herçend bê danîna rêzikeke formel mirov dikarin ji hev têbigihîjin jî di plandanîna zimanî da kodkirin ji bo pêşvebirina zimanî karekî jêneger e. Bi taybetî bi berbelavbûna perwerdeya giştî û çapemeniyê kodkirin dibe karekî pêwîst.

3. Hûrgilîkirina fonksîyonê (Elaboration of function): Di serdema modern da ji ber peydabûna qadên nû yê zanistî û teknîkî zaraveyên taybet bi van waran peyda dibin û ev jî dîyardeya hûrgilîkirina zimanî derdixe pêş. Ji bo nîşandana vê dîyardeyê Haugen mînakê *Third International Dictionary* (Ferhenga Navneteweyî ya Sêyem) dide ku herçend tê da 450 hezar bêje hebin jî piranîya axiverên îngilîzî ji van bêjeyan tenê 20-30 hezarî dizanin û bi kar tînin. Li gor plandanerên zimanî di hûrgilîkirina fonksîyonên zimanekî da du rê hene: yek jê dahênan (innovation) û dariştina navzimanî ye û ya duyem jî guncandina (adaptation) ji zimanên din e. Gelek caran guncandin ji dahênanê hêsantir e, lewra jixwe ev bêje di zimanekî zal da tên bikaranîn û wek model bi rehetî li binyada zimanekî din dikarin bên guncandin. Ji vî alîyê ve mînakê herî berbiçav zimanê îngilîzî ye ku gelek zaraveyên xwe yê zanistî ji zimanên kevin ên mîna girekî, latînî, îbranî û erebî werdigire û li zimanê xwe diguncîne.

4. Pejirandina civakî (Acceptance by the community): Plandanerên zimanî bi rêya hilbijartin, kodkirin û hûrgilîkirinê dema teşeyê nû didin zimanî di encamê da van norm û formên hilbijartî pêşnîyazî bikarhênerên zimanî dikin. Li hin welatan ji ber fermîbûna dezgehên plandana zimanî ev normên hilbijartî bi çendîn amrazên hikumî û alavên ragihandin û perwerdeyê bi ser xelkî da bên sepandin jî dîsa biryara dawî civak dide û dibe ku hin ji van pêşnîyazan tevî palpiştîya otorîteyên fermî û zanistî cihê xwe negirin. Ji ber vê jî bo serketina pêngavên pêşî yê plandana zimanî pejirandina civakî giring e û ev tê manaya çespandin yan cihnegirtina norm û formên pêşnîyazkirî.

Ferguson (1968: 28-33) ji bo pêşvebirina zimanî (language development) sê pêngavên giring ên plandana zimanî destnîşan dike:

1. Nivîsîn (graphization): Nivîsîn rêkxistina bikaranîna nivîsê ye di nav civakeke zimanî da. Ev dîyarde weha dike ku kereste û tomarên zêdetir, ji nîfşekî bo nîfşekî din bên veguhestin û di nav gelek mirovan da zemîna ragihandin, peywendî û hizirên takekesî xweş bibe. Li alîyê din bi bikaranîna nivîsê li repertiwara civakê curbicurîyên zimanî zêde dibe û gel weha bawer dike ku nivîs zimanê “rasteqîne” ye û axaftin jî forma wê ya şewandî ye. Ji ber vê, nivîsîna (grafikkirin) kodekê pîvana pêşketina wê kodê û pêngava sereke ya geşedana zimanî nîşan dide.

2. Yekxistin (standardization): Yekxistin di nav curbicuriya zimanekî da pejirandina normeke serzarî ye (supradialectal norm) wek “forma herî baş a zimanî” û bilind ragirtina wê ye bi ser zarên herêmî û civakî da. Yekxistin, zêdebûna yekgirtina norman û kodkirina wan li xwe digire. Li gor navborî ji Ronesansê û vir ve di nav piraniya mînakên Ewropayê da yekxistin xwe dispêre hin taybetmendiyên hevpar ku ji van xalan pêk tên: (a) zemîn û bingeha yekxistinê axaftina çîna navîn a perwerdekirî ye, (b) zimanê standard bi amrazên nivîskî yên asayî cihê zimanekî din digire û wî zimanî ji cihê wî dike, (c) nivîskarek yan jî komeke hindik a nivîskaran ji bo bikaranîna edebî ya zimanê standard wek model tên pejirandin, (d) zimanê standard wek sembola din yan jî nasnameya neteweyî xizmet dike.

3. Nûjenkirin (modernization): Nûjenkirina zimanekî pêvajoyek e û amaje bi wê yekê dike ku zimanekî diyarkirî bigihîjîne asta zimanên pêşketî û veguhêzbariya navbera zimanên civakên nûjen ên pêşesazbûyî, sekulerbûyî û cîyawazbûyî pêk bîne. Ev jî bi piranî bi berfirehkirina bêjeyên zimanî, bi rêya gotin û derbirînên nû û bi geşkirina şêwaz û formên nû tê pêkanîn. Ji ber vê plandanerên zimanî bi giştî li ser berhemana ferhengok û ferhengên nû yên zaraveyên teknîkî zûr dibin û li ser amadekirina formên nû yên bêjeyan gengeşe dikin.

Çend sal paşê, H. Kloss (Cobarrubias, 1983: 42-45) bi nexşeyeke cîyawaztir behsa plandana zimanî dike û plandana payeyê (status planning) û plandana korpusê (corpus planning) wek du aliyên bingeîn ên plandana zimanî dinasîne. Li ser vê dabeşkirinê, plandana korpusê amaje bi wan guherînan dike ku di binyad, gencîneya bêjeyan, teşenasî (morphology), rênivîs yan jî guncandina nivîsê da tên kirin lê plandana payeyê, li hember zimanên din li ser rewşa hiqûqî ya zimanekî radiweste û li ser qadên bikaranîna zimanekî diyarkirî hûr dibe di nav civak û dezgehên fermî da. Bi gotina Gadeliî (1999: 6) hejmara qadên nasîna zimanekî (bikaranîna wî zimanî ji aliyê hikûmet, parlemento, dadgeh, dezgehên rêveberîyê, perwerde, bazirganî û çapemendîyê ve) çend zêde be, payeya wî jî ew çend bilind dibe. Bêguman xala cîyaker a rêbaza Klossî di payeya zimanî da ye ku wê di çar kategorîyan da destnîşan dike:

1. Reha zimanê ku bi awayekî fermî tê bikaranîn û peywendîya wî di gel civaka zimanî (speech community): Di vê kategorîyê da sê cure ziman derdikevin pêşberî me:

a) Bi piranî zimanên neteweyî yên fermî bingeha xwe ji zimanekî xwecihî yê wî welatî werdigirin ku ji aliyê beşeke giring a nifûsa wî welatî ve tînin axaftin yan jî li wî welatî zimanên giring in. Ev nîşan dide ku zimanên fermî yên van dewletan zimanê hundirî ye (endoglossic).

b) Hin dewlet hene ku ji ber kolonyalîzmê yan her sedemeke din zimanekî xwecihî yê welatê xwe wek zimanê fermî bi kar naînin. Ji ber vê, ev welat ji aliyê reha zimanê fermî ve zimanê derveyî ne (exoglossic). Piraniya welatên weha ji aliyê zimanî ve heterojen in, zimanên wan bi herêm û eşîretan ve girêdayî ne, formên wan ên standard nînin û zimanên wan ji bo fonksiyonên dewleta modern bi kêr nayên. Ji ber vê herçend zimanek yan çend zimananên xwecihî bipejirînin jî zimanekî kolonyal ê derekî wek zimanê fermî bi kar tînin.

c) Ji bilî van cureyên sereke ji aliyê zimanî ve hin welatên tîkel (mixed states) jî hene ku zimanên hundirî û derveyî bi hev ra bi kar tînin.

2. Payeya pêşketî ya zimanekî: Kloss di vê kategorîyê da li gor taybetmendiyên wan ên pêşketinê yan jî pileya berfirehkirinê şeş tîpên zimanî dîyar dike:

a) Zimanên gihîştî yên standard ku bi tevahî modernîze bûne û bi rêya zanistên modern û zanînen teknolojik di xwendîngehên navîn û zanîngehan da tînin bikaranîn û veguhestin. Zimanên mîna îngilîzî, fransî û îspanyolî weha ne.

b) Zimanên standard ên komeke biçûk ku hejmara axiverên wan kêmtir in û qadên kartêkerî û ragihandina wan sînordar in.

c) Zimanên standard ên arkaîk ku berî pêşketinên pîşesazîyê bûne zimanên nivîskî lê ji bo hînîkirina zanistên modern û teknolojik bêtêr in. Latînî, yûnanîya klasîk, îbrî, sanskrîtî yan jî tamîlî zimanên weha ne.

d) Zimanên standard ên nû ku ji bo hin armancên taybetî yên mîna hînîkarîya dînî, mejîşûştina siyasî (political indoctrination) yan jî perwerdeyê hatine yekxistin. Herwek ugandayî li Ugandayê.

e) Zimanên ku alfabeyên wan nehatine yekxistin û sîstema nivîsîna wan di demên nêzik da pêşketîye lê hêşta nebûne zimanên standard. Ji ber vê di van zimanan da nivîsîn bi hînkariya seretayî ra sînordar e.

f) Gelek ziman hene ku îro jî sîstema wan a nivîsînê nîne û ji bilî axaftinê di tu qadeke din da nayên bikaranîn. Ji van zimanan ra zimanên pêşnivîsînê tê gotin.

3. Payeya hiqûqî ya civaka zimanî: Kloss li gor payeya hiqûqî şeş cure zimanan destnîşan dike:

a) Zimanên fermî yên tekane. Wek fransî li Fransayê û îngilîzî li Îngiltereyê.

b) Zimanên fermî yên hevta ku di fonksiyonên dewletdarîyê da xwedan heman mafan in. Wek îngilîzî û fransî li Kamerûnê, fransî, almanî, îtalî û romanî li Îsvîçreyê.

c) Zimanên fermî yên herêmî. Ev bi piranî zimanên pêkhateyeke etnîk a dewleteke yekgirtî ne yan jî zimanên herêmek in di nav dewleteke federal da.

d) Zimanên ku li welatekî yan jî li herêmeke wî welatî ne fermî ne lê ji aliyê rayedarên giştî ve tên piştgirîkirin û li şaredarî, eyalet yan jî di asta federal da ji bo hin armancên taybetî tên bikaranîn. Zimanên weha ji bo hin astên hînkariyê di xwendîgehên giştî da rê bi wan tê dayîn, li pirtûkxaneyên giştî tên nimandin û hin raporên hikûmî, qanûn û daxuyanî li ser kîsê dewletê ji bo van zimanan tên wergêran.

e) Zimanên rêpêdayî (tolerekirî) ku ji aliyê dezgehên mîrî û giştî ve, ne tên piştgirîkirin û bikaranîn ne jî pêşvebirina wan tê astengkirin. Ev ziman ji aliyê rayedaran ve nayên qedexekirin û hebûna wan tê pejirandin lê ji aliyê fermî ve nayên dîtin. Bo nimûne zimanên koçberan li Îngiltereyê yan jî hin zimanên xwecihan (çermsor) li Amerîkayê.

f) Zimanên qedexekirî ku rê li ber axiverên wan tê girtin ku zimanên xwe di çalakîyên hevbeş, komeleyên civakî û civatên dînî da bi kar bînin. Ev ziman li xwendîgehan nikarin bên bikaranîn û pêşvebirin.

4. Rêjeya bikarhênerên zimanekî di nav nifûsa giştî da: Tevî ku bi serê xwe ne pîvan be jî zêdebûna nifûsa axiverên zimanekî û bikaranîna wê ji bo nasîn û piştgirîkirina wî zimanî giring e. Kombûn û zêdebûna axiverên zimanekî li herêmekê dibe sedem ku ji bo nasînê guvaşekî zêdetir çê bike lê ev bi tenê têrê nake û ji bo vê, rêxistinên civakî û çavkanî jî pêwîst in.

Neustupny (1970) (vgz: Fishman, 1973: 24-25) plandanîna zimanî li gor pêdawîstiyên zimanan cuda dike û dîyar dike ku dema kêşeya zimanekî, hîlbijartina

kode be, ev yek peywendî bi rayedaran ra heye ku dikarin bi polîtîkayên fermî vê kêşeyê çareser bikin. Eger kêşe, cihgirkirina (stabil) koda hîlbijartî be, ev plan peywendî bi kodkirina ferheng, rêziman, rênivîs, rêberên xalbendî û bilêvkirinê û hwd. ra heye. Eger kêşe, berfirehkirina hejmara vebijêrkên berdest be (wek encama lêzedekirina fonksiyonên nû ji bo koda hîlbijartî), ev plan peywendî bi hûrgilîkirinê heye ku bi rêya zaravesazî û hevmanatî û tiştên bi vî awayî dikare bê pêkanîn. Eger kêşe, di nav kodekê da cîyakirina cureyekî ji cureyekî din be, plandanîn peywendî bi geşepêdanê heye. Di encamê da Neustupny pêvajoya plandanîna zimanî bi vê nexşeyê berbiçav dike:

1. Biryarên polîtîkayên hîlbijartinê (Selection policy decisions),
2. Cihgirkirina kodkirinê (Stability codification),
3. Berfirehkirina hûrgilîkirinê (Expansion elaboration),
4. Ferqçêkirina geşepêdanê (Differentiation cultivation).

Chaim Rabin di 1971ê da (2019: 264-266) sê kategorîyên armancên plandanîna zimanî pêşnîyaz dike:

1. Armancên derzimanî (Extra linguistic aims): Armancên derzimanî di serî da karê sereke yê civaknas û zanyarên sîyasetê xuya dike. Kesên navborî li ser wê yekê kar dikin ku çawa zimanekî hînî gelek kesan bikin û di nav komel û çînên civakî da belav bikin. Ji bo vê jî li ser rêbaz û çarçoveya hînkirina zimanî nirxandinan dikin û plandanîna perwerdeyê dixin bin sîbera karên xwe.

2. Armancên nîvzimanî (Semi-linguistic aims): Peywendîya vê bi sîstema nivîsîn, rênivîs, bilêvkirin û sînordarîyê heye di axaftinê da.

a) Sîstema nivîsînê: Guherîna sîstema nivîsînê, guherîna taybetmendiyên sîstema nivîsînê, guherîn di şêwaza nivîsînê da û guherînên ortografîk ên arîkar li xwe digire.

b) Rênivîs: Rêkxistin, sadekirin, fonemîzasyon û guherînên rênivîsa bêjeyan vedihewîne.

c) Bilêvkirin: Yekxistina guherteyên dengî yên herêmî û civakî li xwe digire ku karîgerîya wê li ser belavbûn yan jî hejmara foneman nîne.

d) Sînordarîya axaftinê: Bikaranîna formên nezaketê û tabuyên zimanî li xwe digire.

Bi vî awayî armancên nîvzimanî tîpa herî berbelav a guherînên plankirî yên zimanî ne û ji ber peywendîya wan bi armancên sîyasî ra jî hene, ne tenê bi zimanî ra, têkilîya wan bi tesewira sîyasî ra jî heye.

3. Armancên zimanî (Linguistic aims): Amaje bi plandanîna gencîneya bêjeyan û binyada rêzimanî û şêwazê dike.

a) Gencîneya bêjeyan: Li vir armanca yekem berfirehkirina gencîneya bêjeyan e ku bi rêya biryarên sistematîk û planên kirdeyî tê pêkanîn. Armanca duyem yekxistina bêjeyên teknîkî, neteknîkî û herêmî ye. Armanca sêyem manasîya civakî (sociosemantics) ye ku biryarên li ser çavkanîyên berfirehkirina gencîneya bêjeyan li xwe digire. Di vir da jî li hember bêjeyên bîyanî bêjeyên xwecihî tên danîn, ji formên kevin ên heman zimanî û ji zarên herêmî bêje tên wergirtin, ji zimanên nêzik bêje tên guncandin û qebûlbarîya çorsî û argoyê tê destnîşankirin.

b) Binyad: Dengnasî, teşenasî û ristesazîyê li xwe digire ku sê bingeheên sereke yên rêzimana zimanekî ne û ji bo nasîn û bikaranîna rast a zimanekî hînbûna wan pêwîst e.

c) Şêwaz: Li hember şêwaza nerîtî ya ewropayîkirî û şêwaza “bilind”, nivîsa sade ya fambar tê danîn û li ser wê kar tê kirin ku berhemên biprestîj ên neteweyî bi rênivîsa nûjenkirî yan jî wergêrayî bi forma resen bê xwendin.

Nahir cara pêşî di 1977ê da pênc armancên plandanîna zimanî destnîşan dike ku ji petîkirin, vejandin, çaksazî, yekxistin û nûjenkirinê pêk tê (1977: 107-118). Di 1984ê da şeşê din li wan zêde dike (berbelavkirin, yekxistina zaraveyan, xwerûkirina şêwazî, ragihandîna navzimanî, berdewamîya zimanî û yekxistina koda arîkar) û bi vî awayî yazdeh armanc yan jî pêngavên plandanîna zimanî destnîşan dike (1984: 299-319) ku bi kurtî mirov dikare wan weha pêname bike:

1. Petîkirina zimanî (Language purification): Nahir destpêka petîkirina zimanî vedigerîne akademîyên pêşî û behsa du cureyên wê dike ku ew jî petîkirina derekî (external purification) û petîkirina navekî (internal purification) ne. Petîkirina derekî, li hember karîgerîya zimanên derekî yên zal parastina normên zimanekî ye. Ev, ji akademîyên pêşî yên zimanî pê da wek armancekê derdike pêş û bi geşbûna netewetîyê ra wek helwesteke dijmêtingerîya çandî cihê xwe digire. Bi demê ra ev helwesta tund a petîkirina derekî xav dibe û ji germûgurîya xwe ya pêşî dadikeve. Petîkirina navekî, parastina standardên pejirandî li xwe digire, li hember şêwandinên

navxweyî qayîdeyan datîne û hewl dide yekxistina zimanî biparêze. Ev cure petîgerî jî dibe yek ji armancên akademîyên zimanî yên pêşî û di vî warî da xebata Jonathan Swiftî (Pêşniyazek ji bo Sererastkirin, Geşkirin û Destnîşankirina Zimanê Îngilîzî) ya 1712ê hêjayê bi bîrxistinê ye. Ji bo belavkirina zimanê rast di salên dawî da jî bi vê mebestê ji çapemenîyê heta bernameyên radyoyê, ji dezgehên şewirmendîya zimanî heta festîvalên li ser zimanî di mînaka welatên cûrbicûr da gelek kar û xebat hatine kirin.

2. Vejandina zimanî (Language revival): Netewetî û avakirina dewletên neteweyî vejandina wan zimanan tîne rojevê ku di civakê da yan bi tevahî nayên axaftin yan kêmtên axaftin yan jî mîrata wan a çandî bi başî nehatîye destnîşankirin. Di mînaka van zimanan da plandanerên zimanî hewl didin wî zimanê ku nayê bikaranîn yan kêmtê bikaranîn yan jî baş nayê zanîn bi rêya kodkirin, yekxistin û çaksazîyê vejînin û wî zimanî bikin zimanê ragihandinê yê civakê. Di 1911ê da Komîteya Zimanê Îbranî û di 1964ê da Komîsyona Zimanê Îrlandî ji bo vejandinê roleke weha digêrin û hewl didin van zimanan di hemû qadên jîyanê da bi kar bînin. Bêguman hemû tevgerên vejandina zimanî bi ser nakevin û ji bilî îbranî zimanên mîna îrlandî, galî û bretonî nagihîjin armanca xwe. Di vir da nebûna zimanekî hevbeş di nav hemû endamên civaka cihûyan da ji bo serîgirtina vejandina zimanî wek hokareke bihêz derdikeve pêş lê zanîna îngilîzî ji aliyê hemû îrlandîyan ve li pêşîya vejandina îrlandî dibe asteng.

3. Çaksazîya zimanî (Language reform): Hin guherînên zimanî li xwe digire ku xizmeta hêsanîkirina bikaranîna wî zimanî dîkin û alozîyên navzimanî ji holê radikin, lewra hemû zimanên siruştî xwedî hin kêmasîyan in û pêwîstîya wan bi çakkirinê heye. Ev guherîn bi gelemperî di nivîs, rênivîs, gencîneya bêjeyan û rêzimanê da tîne kirin û xwe dispêrin hin angajmanên îdelojîk, dînî û siyasî. Ev çaksazî bi piranî li ser destê dezgeheke zimanî tîne kirin û Nahir di vî warî da çaksazîya zimanê tirkî yek ji mînakên herî bihêz ên vê qadê destnîşan dike.

4. Yekxistina zimanî (Language standardization): Zimanek yan jî şewazarê herêmeke diyarkirî dema ji aliyê hemû beşên wî welatî ve ji bo zimanê hevbeş wek forma herî baş a wî zimanî bê pejirandin yekxistina zimanî pêk tê. Dema ev serî negire tercîhkirina zimanekî derekî, pejirandina du zimanên cîyawaz yan jî rêpêdana du zarên

heman zimanî jî di xebatên yekxistinê da derdikevin pêş. Ev hemû jî bi sepandina desthilateke sîyasî pêk tê. Ji ber vê hevgirtin yan dabeşbûnên sîyasî di serketin yan serînegirtina yekxistina zimanî da wek hokarên dîyarker xwedî rolên sereke ne.

5. Nûjenkirina bêjeyî (Lexical modernization): Dariştin û guncandina bêje û zaraveyan li xwe digire da ku zimanê mebest bikare valahîyên xwe yên zimanî ji holê rake û xwe li hember pêşketinê nû ragire û biguncîne. Di vê rewşê da zimanê mebest yan divê bi rêya kodkirin û berfirehkirina manayî ji çavkanîyên xwe yên xwemalî sûd wergire yan bi rêya dariştinê bêjeyên nû çê bike yan jî bi deynkirina ji zimanekî pêşketî valahîyên xwe dagire. Ji bo vê mebestê dezgehên plandanî, zaraveyên zanistî û teknolojîk bi bergindên wan ên îngilîzî liste bi liste diweşînin da ku nasîna wan ji bo bikarhênerên wî zimanî hêsan be.

6. Berbelavkirina zimanî (Language spread): Hewldana belavkirina zimanekî ye li hember hin zimanên din ku di heman welatî da tên axaftin. Ev, bi piranî di welatên fireziman da derdikeve pêşîya me û dezgehên fermî yan jî dezgehên plandanîna zimanî yên welatên weha ji bo yekîtiya sîyasî ya welatî û nasnameyeke hevgirtî, berbelavkirina zimanî karekî giring dibînin.

7. Yekkirina zaraveyan (Terminology unification): Ji bo kêmkirina şêlûbûnê ragihandinê, bi taybetî di warên teknolojîk û zanistî da, zarave bi pênasekirin û ravekirinê tên yekkirin. Lewra zaraveyên ku ji bo qadekê tên bikaranîn gelek caran di qadên din da jî tên bikaranîn û xwedî manayên cîyawaz in. Ji bilî vê carinan di pêvajoyên plandanîna da ji bo yek tiştî çend zaraveyên cîyawaz jî tên pêşniyazkirin û ev dibe sedema tevlihevîyan. Di vê rewşê da ji bo heman tiştî destnîşankirina zaraveyeke bi tenê, ronkirina manayên zaraveyan û rêgirîkirina tevlihevîyên manayî pêwîstîyek e û yekkirina zaraveyan xizmeta vê armancê dike.

8. Hêskirina şewazî (Stylistic simplification): Ji bo ku astengên li hember têgihîştinê di navbera pispor, burokrat û gelî da bêtir rakirin di astên bêjeyî, rêzimanî û teşeyî da hêskariya tên çêkirin. Ev ji bo ji hev têgihîştina çînên cîyawaz ên civakî, sûdwergirtina ji xizmetên giştî û çêbûna rayeke giştî ya hevbeş giring e. Ev kêşe bi taybetî di warên hiqûq, tenduristî û aborîyê da bi zeqî tê dîtin ku mirovên asayî li dadgeh, nexweşxane û bankayan di têgihîştina zimanê pisporan da tengasî dikêşin û rastî dijarîyan tên.

9. Ragihandina navberzimanî (Interlingual communication): Hêskirina ragihandina navbera endamên kom û civakên cîyawaz ên zimanî li xwe digire. Ragihandina navberzimanî, bi rêya zimanekî çêkirî (herwek esperantoyî) yan jî zimanekî arîkar di nav civakeke pirziman da çêbûna zimanekî hevbeş (lingua franca) dike armanc da ku bi rêya vî zimanî ragihandina devkî û nivîskî bê pêkanîn. Ji bilî vê, ragihandina navberzimanî ji bo hêskirina rêxweşkirina ragihandina navbera axiverên zimanên hevmalbat jî tê bikaranîn ku xwedî taybetmendiyên hevbeş in. Xebatên Komîteya Zimanên Îskandinavi ku di 1978ê da tê avakirin mînakê ye. Ji bo ragihandina navberzimanî heta niha li ser asta dinyayê esperantoyî wek zimanekî çêkirî û îngilîzî wek zimanekî hevbeş mînakên herî bihêz in. Herweha di astên herêmî da rûsî û îspanî jî roleke weha digêrin.

10. Domdarîya zimanî (Language maintenance): Domandina bikaranîna zimanekî li xwe digire wek zimanê yekem yan jî zimanê duyem. Ev, bi taybetî ji bo axiverên wan zimanan derbaz dibe ku ji aliyê siyasî, civakî, aborî û perwerdeyî ve di bin guvaşeke derekî da ne. Ji bo vê jî hewl didin zimanê xwe li hember zimanên zal û serdest, wek sembola nasnameya neteweyî û çandî biparêzin.

11. Yekxistina koda arîkar (Auxiliary-code standardization): Ji bo nehiştina şêlûbûnê, pêşvebirina jihevtêgihîştinê û bersivdana pêwîstiyên civakî û siyasî, yekxistina hin aliyên lawekî yê zimanekî giring e û yekxistina koda arîkar van guherînan li xwe digire. Herwek yekxistina nivîsîna navên cihan û destnîşankirina qayîdeyên tîpguhêzî û translîterasyonê.

Haugen wek teorîsyenê herî navdar ê plandana zimanî piştî van pêşniyazên nû yê di vê qadê da, teorîya xwe careke din di ber çavan ra derbaz dike û wê ji nû ve dadirijîne. Bi hin guherînan biçûk çar pêngavên plandana zimanî weha rêz dike (Haugen, 1983: 270-273):

1. Hilbijartina normê (Selection of norm): Biryara hilbijartinê ji aliyê gelî yan komeke biçûk a taybetî yan jî kesekî kartêker ve dikare bê dayîn. Bo nimûne Ataturk biryara guherîna alfabeya erebî bo latînî dide.

2. Kodkirina normê (Condification of norm): Kodkirin dibe ku karekî takekesî, nefermî û nehişmendane be yan jî ji aliyê dezgehên fermî ve jî bê kirin, lewra gelek caran ziman ji aliyê mîsyoner û pisporên bîyanî ve tên kodkirin ku xwedî

armancên cîyawaz in. Di kodkirinê da nivîsîn (graphization) pêngava yekem e û piştî wê jî rêziman, ferheng û rênivîs tên.

3. Cihbicihkirina fonksîyonan (Implementation of function): Cihbicihkirin, çalakîyên nivîskarek, dezgehek û hikumetekê vedigire ku zimanê hîlbijartî û kodkirî ji bo pejirandinê belav dikin. Ev bi piranî bi rêya weşandina pirtûk, namîlke, rojname û pirtûkên dersan tê pêkanîn. Ev kes li ser xwendîngeh û çapemenîyê xwedî hêz in û bi rêya van amrazan zimanê hîlbijartî hînî gelî dikin. Ji bo handan yan jî rêgirtinê pêwîst bike qanûn û rêzîknameyan amade dikin û bi ser mirovan da disepînin.

4. Hûrgilîkirina fonksîyonê (Elaboration of function): Hûrgilîkirin bi gelek rêyan berdewamkirina cihbicihkirina normekê ye ji bo ku bikare bersiva fonksîyonên jîyana modern bide. Bo nimûne ji Ronesansê û vir ve nûnerên zimanên sereke yên Ewropayê hem zimanên xwe di şûna latînî da bi cih dikin hem jî bi dahênana gelek qadên zanistî û teknolojîk hêdî hêdî standardên xwe çê dikin û fonksîyonên zimanên xwe berfireh dikin.

Haugen di bin karîgerîya pêşniyazên teorîsyenên din da ji rêbaza xwe ya pêşî cudatir van her çar qonaxên plandanîna zimanî di bin sernavên plandanîna payeyê, plandanîna korpusê, polîtîkaya plandanîne û geşkirina zimanî da di nav çar beşên sereke da bi cih dike û vê wek modela xwe ya revîzekirî (revised model) weha destnîşan dike (Haugen, 1983: 275):

A) Plandanîna payeyê (Status planning)

1. Hilbijartin (rêbazên biryarê/decision procedures): a) Pênaseya kêşeyê (identification of problem), b) Bicihkirina norman (allocation of norms)

3. Cihbicihkirin (berbelavîya perwerdeyî/educational spread): a) Rêbazên sererastkirinê (correction procedures), b) Nirxandin (evaluation)

B) Plandanîna korpusê (Corpus planning)

2. Kodkirin (rêbazên yekxistinê/standardization procedures): a) Nivîsîn (graphitization), b) Danîna rêzimanê (grammatication), c) Danîna bêjeyan (lexication)

4. Berfirehkirin (geşedana fonksîyonî/functional development): a) Nûjenkirina termînolojîk (terminological modernization), b) Geşedana şêwazî (stylistic development)

C) Polîtîkaya plandanîne (Policy planning)

1. Hilbijartin (rêbazên biryarê/decision procedures): a) Pênaseya kêşeyê (identification of problem), b) Bicihkirina norman (allocation of norms)

2. Kodkirin (rêbazên standardkirinê/standardization procedures): a) Nivîsîn (graphitization), b) Danîna rêzimanê (grammatication), c) Danîna bêjeyan (lexication)

D) Geşkirina zimanî (Language cultivation)

3. Cihbicihkirin (berbelavîya perwerdeyî/educational spread): a) Rêbazên sererastkirinê (correction procedures), b) Nirxandin (evaluation)

4. Berfirehkirin (geşedana fonksîyonî/functional development): a) Nûjenkirina termînolojîk (terminological modernization), b) Geşedana şêwazî (stylistic development)

Herçend heta îro jî çendîn pêşniyazên din ên plandanîna zimanî bîn kirin jî (bnr: Donnacha, 2000) bi bawerîya me nexşeya ku Haugen, Ferguson, H. Kloss, Neustupny, Rabin û Nahir ji bo plandanîna zimanî datînin çarçoveyeke baş a teorîk derdixe holê. Li ser vê mîratê em dikarin bibêjin ku di plandanîna zimanî da sê kategorîyên sereke hene:

Kategorîya yekem plandanîna payeyê ye ku ji hokarên navekî yê zimanî zêdetir peywendîya wê bi hokarên derekî ra heye. Di vê plandanînê da ji zimannasan bêhtir rola sîyasetvan, pêşengên civakî û rêxistinên sîvîl diyarker e ku di hilbijartina koda zimanî û diyarkirina çarçoveya hiqûqî ya zimanî da roleke sereke digêrin. Plandanîna payeyê ji bo zimanên ku ji aliyê dewletekê ve nayên piştgirîkirin karekî heta bibêjî jîyanî û hestiyar e, lewra eger plandanîna payeyê bi ser nekeve di mercên jîyana modern da zimanên weha ber bi lawazbûn û mirinê ve diçin û kategorîyên din ên plandanînê jî bêsûd dibin.

Kategorîya duyem ji plandanîna korpusê pêk tê. Di vê plandanînê da bikerên sereke zimannas û ronakbîr in ku li ser zimanî dixebitin û ji alfabeyê heta rênivîsê, ji rêzimanê heta ferheng û zaravesazîyê normên zimanî destnîşan dikin û gencîneya zimanî derdixin meydanê.

Kategoriya sêyem jî berbelavkirin û cihgirkirina zimanî ye di nav civakê da. Di vir da jî nivîskar, helbestvan, rojnamevan, mamosta û çalakgerên civakî bi rêya weşanên nivîskî, ragihandin (medya) û dezgehên perwerdeyê roleke sereke digêrin. Em dikarin bibêjin ku hêz û karîgeriya van kes û alavan, leza berbelaviya van norman û rêjeya pejirandina civakî, arasteya plandanîna zimanî û rêjeya serkeftina wê dîyar dikin.

1.3. DIJWARÎYÊN PLANDANÎNA ZIMANÎ Û PEYDABÛNA MODELÊN NÛ

Ji zanyariyên jorîn jî tê famkirin ku di bingeha hizira plandanîna zimanî da destwerdan, arastekirin û afirandin heye û ev di plandanîna zimanên neteweyî yên nû da baştir xuya dibe. Bi gotina Jansonî ev ziman xwe bi xwe dernakevin holê û di çarçoveya bernameyekê da bi zanîn tînin afirandin (2018: 205). Lê ev kar pêvajoyeke bêkêşe û hêsan nîne û di mînakê hin ziman û neteweyan da rastî dijwarîyên cidî tê. Bi taybetî ji bo wan neteweyên firezar ên ku ne xwedî paşxaneyê zimanê dîni ne û ne jî xwedî hikumraniyêke dîrokî ya yekdest in, dijwarîyên plandanîna zimanî zêdetir dibin.

Di rewşên weha da li hember planeke zimanî ya yekgirtî di nav komên hevrik ên navzimanî da planên alternatîf derdikevin holê û ev jî dibe sedem ku di civakê da li ser zimanê neteweyî riwangehên cîyawaz peyda bibin. Lewra paşxaneya dîrokî û civakî ya neteweyên weha dibe rêgir ku li ser bernameyê hevbeş bi hêsanî rêk bikevin. Ji bo vê Fishman dîyar dike ku bernameyê hevbeş a plandanîna zimanî li ser wan mirovan dikare bê cihbicihkirin ku di pêvajoyên guherîna civakî ra derbaz bûne (1973: 36) û gihîştine asta hevahengîya civakên modern.

Fishman di gotara xwe ya “Language Modernization and Planning in Comparison with Other Types of National Modernization and Planning”ê da (Modernîzasyon û Plandanîna Zimanî di gel Berawirdkirina Cureyên Din ên Modernîzasyon û Plandanîna Neteweyî) behsa çendîn kêşe û zehmetiyên plandanîna zimanî dike ku ya herî giring kêşeya nirxî (the value problem) ye. Lewra ziman û tevgerên zimanî, nirxên mirovî li xwe digirin ku peywendîya wan bi daxwaz û çêjên mirovî ra heye (1973: 37). Loma jî ji bo komeke civakî destberdana zar yan şêwezarê xwe ew çend hêsan nîne. Lewra bi salan bi wî zarî yan şêwezarî wê koma civakî hest

û hizirên xwe derbirîye, ji stranan heta çîrokan gelek formên hunerî derxistine holê û carinan jî deqên bilind ên edebî berhem anîne. Bêguman eger di nav civakekê da çend zarên hevtayên hev hebin û her yek ji wan xwedî raborîyeke cîyawaz a civakî, mezhebî û siyasî be û axiverên wan bi zarên xwe çendîn deqên giring ên edebî û hunerî berhem anîbin rewş aloztir dibe û kêşeya nîrxê li pêşîya plandanîna ortodoksî wek astengeke mezin derdikeve holê.

Ji alîyê din ve eger plandanîna zimanî li ser destê dezgeheke fermî ya desthilateke siyasî neyê kirin û axiverên zimanê mebest xwedî dezgehên hevbeş nebin, bi awayekî siruştî ev kar dikeve ser milên ronakbîran. Di vê rewşê da ronakbîr hem roleke zanistî hem jî roleke siyasî digirin ser xwe û hewl didin armancên xwe bihingêvin. Lê eger di civakeke firezar da çend projeyên alternatîf ên ronakbîrên zarên cîyawaz hebin wê demê di cihê çareserîyê da kêşe kûrtir dibe. Di vê rewşê da her ronakbîr bi awayekî siruştî ji bo zar yan şêwezarê xwe dest bi bangeşeya plandanîna zimanî dike û mîna ku Fishman jî dibêje ji bo qanihkirin û razîkirina wergirên zimanî dikeve nav tevgerên cîyawaz. Ev jî dibe sedem ku carinan di navbera plandaner û wergiran da (1973: 38) û carinan jî di navbera plandanerên cîyawaz da girîjî çê bibin û plana hevbeş a zimanî serî negire.

Di rewşên weha da eger planeke zimanî ji alîyê desthilateke siyasî ve bi zorê neyê sepandin yan jî bi amrazên nerm ên modernkirinê komên civakî hêdî hêdî neyên razîkirin wek encameke çaverênekirî di cihê zimanekî standard da zimanên cotstandard yan çendstandard peyda dibin. Ji bo vê mînakê herî berbiçav zimanê norwecî ye ku Haugen di xebatên xwe da gelek caran bal dikêşe ser mînakê plandanîna vî zimanî ku xwedî taybetmendîyeke xweser e û ji rêbazên ortodoksî yên plandanîna zimanî cuda dibe.

Di mînakên awarte yên weha da hin dînamîkên dîrokî û siyasî hene ku vê dubendîyê kûr dîkin û rê li ber çareserîyên ortodoksî digirin. Bo nimûne Norwec demeke dirêj di bin hikumranîya Danîmarkayê da dimîne (1380-1814) û ji sedsala 16ê heta 19ê zimanê danî li vî welatî dibe zimanê fermî. Ev jî dibe sedem ku li bajar û navendên giring zimanê norwecî bikeve bin karîgerîya zimanê danî. Ji ber vê piştî geşbûna tevgerên neteweyî dema ku pêwîstî bi destnîşankirina norwecîyeke fermî tê dîtin du cure norwecî tên pêşnîyazkirin ku yek jê riksmal (bokmaal) e û ya din jî

landsmaal (nynorsk) e. Riksmåla ku Knud Knudsen (1812-1895) pêşengîya wê dike xwe dispêre zimanên paytextê ku dirûvekî edebî wergirtîye û di bin karîgerîya zimanê danî û dêrê da maye. Li hember vê Ivar Aasen (1813-1896) wek “zimanê resen ê gelî” landsmaalê geş dike ku xwe dispêre zimanên gundîyan û zar û şêwezarên xelkê Norwecê ku bi raya Johan Stormê zimannas (1896) bi awayekî çêkirî û kêfî ji alîyê Aasenî ve tê damezirandin (Haugen, 1965: 189-190).

Ji ber vê ev her du cure norwecî ji sedsala 19ê û pê da dikevin nav rikeberî û pêşbirkeke germ û demeke dirêj di navbera alîgirên her du zaran da şerên tund çê dibe. Lewra alîgirên her du zaran ne tenê ji alîyê zimanî ve ji alîyê civakî û siyasî ve jî cîyawaz in. Komên radîkal, neteweperwer û xelkên çolterê piştevanîya landsmaalê (zimanê malê, zimanê welatî) dikin û xelkê muhafezekar û bijarteyên bajarî jî alîgirîya riksmåalê (zimanê dewletê) dikin (Janson, 2018: 255). Herçend di destpêkê da alîgirên landsmaalê li hember alîgirên riksmåalê lawaz bin jî her ku diçe alîgirên landsmaalê pêgeha xwe ya siyasî û çandî bihêz dikin û di encamê da landsmaala Aasenî ku wek norwecîya nû jî tê binavkirin, di 1908ê da digihîje armanca xwe û di beşeke xwendîngehên Norwecê da dikeve nav bernameya xwendinê û ji bo hemû xwendekarên zanîngehê dibe dursa mecbûrî (Haugen, 1959: 9-10; 1966: 63).

Bêguman bikaranîna du zaran hem ji alîyê têçûnê hem jî ji alîyê siyasî ve ji bo Norwecê dibe sergêjanîyeke mezin. Loma jî kesekî mîna Moltke Moeyî (1909) dide dû xeyala yekgirtina van her du şêwezaran û navê “samnorsk” yan jî “norwecîya yekgirtî” (united norwegian) li vê hewldanê datîne. Li alîyê din di sala 1917 û 1938ê da bi rêya komîteyên fermî hewla lihevneîzkirina van her du zaran tê dayîn, kar li ser ortografi û formên bêjeyan tê kirin da ku bikarin formên hevbeş hilbijêrin (Haugen, 1959: 11-12). Herweha bi vê mebestê di 1951ê da Lijneya Zimanî tê avakirin ku ji her zarî 15 nûner tê da cih digirin. Ev kes jî mamostayên zanîngehê, mamostayên xwendîngehan, nivîskar û nûnerên çapemenîyê pêk tên û du zimannas jî sekreterîya hertimî ya vê dezgehê dikin. Piştî xebatên şeş salan ev kom li dor biryarên hevbeş pirtûkeke dersê ya hevbeş amade dikin lê ev jî nabe çareserîyeke yekcarî.

Haugen li hember zimanê zindî yê civakê serkeftina van formên sentetîk ên fermî bi guman pêşwazî bike (1959: 14) û hewldanên sedsale yê planandinê zimanê norwecî wek nîşaneyê zehmetîya çareserkirina kêşeyên weha yan jî bêîmkaniya

çareserîyê bide zanîn jî (1966: 276) bi raya Jansonî xebata ku li ser van zaran tê kirin bi tevahî bêencam nabe û roja îro her du zarên Norwecê di nav aşîyê da tên bikaranîn, her ku diçe sînore navbera wan şêlû dibe, nivîskarên norwecî xwe dilsozên yek ji wan norwecîyan nabînin û di çarçoveya şêwaza şexsî da hewl didin têhilkişînekê di navbera her du zaran da çê bikin. Navborî vê yekê bi hêza hizira neteweyî ya norwecîyan ve girê dide ku herçend alîgirên her du zaran ji alîyê zimanî, siyasî û mijarên din ve xwedî hizirên cîyawaz bin jî di mijara yekîtiya Norwecê û zimanê norwecî da kok in (2018: 255-256). Ev jî peywendîya xurt a navbera netewetîyê û plandanîna zimanî nîşan dide ku bê vê motîvasyonê serxistina pêvajoyeke weha gelek dijwar dibe û ji alîyê din ve jî dibe mîna keke şênber a rêya çareserkirina kêşeyên weha.

Herçend norwecî di nav plandanînen zimanî da mîna keke kêmwêne be jî ne tekane ye. Lewra zimanê yûnanî jî bi her du awayên xwe yên nivîskî (katharevusa û demotikos) dişibe norwecîya cotstandard. Cara pêşî Adamantios Korais (1748-1833) di 1788ê da dest bi danîna normên katharevousayê yan jî “zimanê petî” yê yûnanî dike û li hember demotikosa zimanê gelî, bi mebesta petîkirina yûnanî sûd ji yûnanîya kevin werdigire, bêjeyên deynkirî yên bîyanî ji zimanî diavêje û gencîneya bêjeyên xwerû yên yûnanî berfireh dike. Lê ev hewldana wî dibe sedema dabeşbûna zimanî ku bi gotina Hugenî hin zimannasên mîna Charles A. Fergusonî ji vê dîyardeyê ra “diglossia” yanî duzimanîti dibêjin (1966: 13).

Ji ber vê herwek Norwecê li Yûnanîstanê jî di sedsala 19ê da du zarên nivîskî yên hevrik ên yûnanî li hember hev derdikevin û demotikosa zimanê gelî û katharevusaya parzûnkirî rûbirûyê hev dibin. Ev her du awayên zimanî di edebîyat, xwendîngeh û qadên fermî da demeke dirêj dikevin nav pêşbirkekê û ev dibe sedema gengeşeyê mezin û her ku diçe manayên siyasî li wan tê barkirin. Lewra kesên muhafezekar piştewaniya katharevousayê dikin û kesên şoreşgêr jî alîgirîya demotikosê dikin û bi vî awayî li cîyawazîya zimanî cîyawazîya siyasî jî zêde dibe. Herçend piştî derbeya leşkerî ya 1967ê katharevusa di xwendîngehan da bê sepanî jî piştî bidawîhatina cuntaya leşkerî di 1976ê da demotikos dibe tekane zimanê fermî û cihgir dibe (Janson, 2018: 118-119).

Mirov dikare di çarçoveya zimanên cotstandard da behsa zimanê ermenî û hinek zimanên din jî bike ku hemû jî di encamê da yan bi hîlbijartin û sepanîna zarekî

biencam digihîjin yan jî herwek norwecî du zar bi hev ra tên bikaranîn û dezgehên çandî yên van welatan forma dawî ya zimanî hewaleyî paşerojê dikin. Li hember vê mirov di mînaka kurdî da dikare behsa modeleke din bike ku axiverên zimanên weha ne xwedî serwerîya xwe ya sîyasî ne, ne jî dezgehên wan ên hevbeş ên zimanî hene ku bikarin yan zarekî bi ser yên din da bisepînin yan jî li dû derfetên bihêzkerin û xurtkirina peywendîyên navxweyî yên zimanî bigerin da ku zemîna hevgirtina paşerojê saz bikin. Bêguman neteweyên weha rûbirûyê dijwarîyên mezintir dibin, lewra hemû hokarên derekî li dijî wan in û zimanên wan ji bilî cîyawazîyên zarî yan jî şêwezarî bi sînor, rejîm, alfabe û modelên cîyawaz ên çandî her ku diçe ji hev dûr dikevin û dikevin bin gefa bişaftineke dijwar.

Di rewşên weha da erkên plandanîna zimanî bi piranî dikeve ser milên ronakbîrên serbixwe yan jî dezgehên lokal ên sîvîl ku hêza wan gelek sînordar e û li hember astengên navborî nikarin rayeke giştî çê bikin û dengê xwe bigihîjin hemû axiverên wî zimanî. Ji xwe di modelên weha da çalakvan û plandanerên sîvîl ên van zimanan bi giranî hêza xwe didin ser vejandina zimanî (language revival) da ku civaka wan di nav neteweya serdest da nehele û hebûna xwe ya zimanî biparêzin. Di vê rewşê da hewldanên yekxistina zimanê hevbeş e neteweyî lawaz dibin û ev armanc ji bo paşerojeke nedîyar tê bipaşdaxistin. Lê eger yekxistina lokal a her zarî bê liberçavgirtina zarên din bê kirin û têkilîya navzimanî ya zaran qet nebe di asta ronakbîr û plandanerên zimanî da neyê xurtkirin, yekxistinên lokal ên zaran dê zarên heman zimanî ji hev dûrtir bixe ku di paşerojê da mecala hevgirtinê nehele yan jî diwartir bike.

BEŞA DUYEM

RABORÎYA PLANDANÎNA ZIMANÊ KURDÎ (1908-1970)

Kurmancî zarê piranîya kurdan e ku ji Xorasanê heta Efrînê û ji Rewanê heta Mûsilê li herêmeke berfireh tê axaftin. Ev zar ji sedsala 15ê heta 19ê di nav sînorên mîrektîyên cîyawaz ên mîna Bedlîs, Mukis, Cizîra Botan, Hekarî û Amedîyê da li dor navendên van mîrektîyan bi awayekî siruştî dibe zimanê edebî. Berdewamîya mîrektîyên kurdî heta sedsala 19ê di bihêzbûna vî zarî da xwedî roleke berbiçav e û bi saya vê desthilata herêmî kurmancî dibe zimanê gelek kêmneyên etnîk û dînî yên mîna suryanî, ermenî û nestûrîyan jî.

Li hember vê Kurdîya soranî di qonaxa dawî ya Mîrektîya Baban da (sedsala 19ê) dibe zimanê edebîyat û nivîsînê û her ku diçe li hember kurdîya goranî karîgerî û pêgeha xwe berfireh dike û heta radeyeke baş cihê wê digire. Ji ber vê ev zar di nav piranîya kurdên Îraq û Îrana îro da belav dibe û di sedsala 20ê da digihîje asteke gelek pêşketî û ji alîyê hejmara weşan û pirtûkan ve dikeve pêşîya hemû zarên kurdî. Ji alîyê qada geşedanê ve jî em dikarin bibêjin ku Kurdistana Îraqê û bi taybetî bajarê Silêmanîyê dibe navenda kurdîya soranî.

Ji ber vê çendê ji alîyê hişyarîya zimanî ve jî cara pêşî helbestvanekî kurmancînûs (Xanî) û piştî wî jî helbestvanekî soranînûs (Hacî) dibin pêşengên hişmendîya zimanî û hizira geşedan û bikaranîna zimanê kurdî belav dikin. Xanî wek hişyarkerê pêşî yê hişmendîya zimanî, sedema nivîsîna berhema xwe ya navdar *Mem û Zînê* bi daxwaza bilindkirina payeya (statu) zimanê kurdî ve girê dide û bi gotina “manendê durê lîsanê kurdî” yê li hember zimanên biprestîj ên dewrûber pesnê zimanê xwe dide û dîyar dike ku wî bi têhilkişîna zarên bohtî û mihemedî û silîvî û sûdwegirtina ji erebî û derîyê (farisî) (2005: 612-614) “nîzam û întîzam” daye zimanê kurdî û di ber raya giştî da (‘am) zehmetî kêşaye (2005: 170) û zimanekî edebî berhem anîye. Xanî çawa *Mem û Zînê* ji bo hemû kurdan dinivîse *Nûbihara Biçûkan* a ku ferhenga yekem a kurdî û erebî ye, ji bo “biçûkêd kurmancan” dinivîse û bi van karên xwe yên giring hem pêngava yekem a ramana payeya zimanî diavêje hem jî dibe kodkerê pêşî yê ferhenga kurdî û di dewlemendkirina korpûsa vî zimanî da beşdarîyeke giring û dîrokî dike.

Hacî wek yekem helbestvanê modern ê edebîyata kurdî, ji bo şikandîna karîgerîya zimanên serdest ên wê demê û çêkirina prestîja zimanê bavûkalan, kurdî dide ber zimanên bihêz ên mîna erebî û farisî ku di nav kurdan da xwedî îtibareke zanistî û edebî bûn. Ji bo şîrînkirina zimanê kurdî dîyar dike ku ji alîyê fesahetê ve kurdî ji farisî kêmtir nîne û belaxeta wê di tu zimanî da nîne (2707: 46). Loma hewl dide hesta kêmdîtina kurdî ji nav kurdan ji holê rake û ji bo vê jî gelek caran berê xwe dide xweşkirinên (mubalexe) helbestî û angaşt dike ku zimanê farisî ji kurdî bêje dizîye û kurd ji farisan dêrîntir in. Li alîyê din ji ber ku kurd salên dîrûdirêj ji bo perwerdeya dînî zimanê erebî dixwînin, pîrozîya dîn didin erebî û ev jî dibe sedem ku di nav hin kesên bîrhişk da xwendina kurdî wek “kufîr” bê dîtin. Ji ber vê Hacî bi tundî li dijî vê têgihîştinê radiweste û kesên ku zimanê xwe bi kar naînin wan bi gotinên tund ên mîna

“hîz, zînakar û kerîtî”yê tawanbar dike û hewl dide kurd jî mîna milletên din bi zimanê xwe bixwînin û binivîsîn (2707: 200-201). Ev jî nîşan dide ku Xanî û Hacı di nav kurdan da dibin hişyarkerên pêşî yê zimanî, bi berhemên xwe yê karîger di nav ronakbîr û edebîyatvanên kurd da hişmendîyeke zimanî çê dîkin û bi vê helwesta xwe jî zemîneke libar ji bo plandanerên zimanî xweş dîkin.

Li ser bingeha ramanên van her du helbestvanan û bi taybetî jî di bin karîgerîya pêşhatên modern ronakbîrên malbata Bedîrxanî kurmancî û ronakbîrên mîrektîya Baban û bi taybetî bajarê Silêmanîyê soranî vediguhêzin qadên jîyana modern. Herçend nûnerên van her du zaran ji Meşrûtiyeta Duyem heta sala 1921ê di komeleyên hevbeş da bi hev ra kar bikin jî piştî belavbûna Dewleta Osmanî derfeta pêkve karkirinê namîne û li welatên cîyawaz bernameya plandanîna van her du zaran ji hev cuda dibe. Ji ber vê em dê di vê beşê da ji 1908ê heta 1970yê li Îraq, Sûriye, Sovyet û Îranê serborîya plandanîna zimanê kurdî bi van her du zaran ron bikin da ku paşxaneya her du dezgehên pêşî yê zimanê kurdî baştir bê nasîn.

2.1. PLANDANÎNA ZIMANÊ KURDÎ LI STENBOLÊ (1908-1921)

Ji boçûnên Xanî û Hacı derdikeve ku zimanê kurdî di serdema Osmanîyan da li beramber zimanên tirkî (zimanê rêveberîyê), farisî (zimanê edebî yê bipirestîj) û erebî (zimanê dîn û zanistê) wek zimanê navçeyî di pileya duyem da ye. Herçend di vê maweyê da kurdî ji dezgehên fermî yê dewletê piştgirî wernegire jî ne zimanekî qedexekirî ye. Ji ber vê bi avakirina komeleyên kurdî li Stenbolê çendîn kovar û rojname bi zimanê kurdî tên weşandin, bi saya azadîya demkî ya Meşrûtiyeta Duyem di van weşanan da tevî tirkîya osmanî her du zarên sereke yê kurdî (kurmancî û babanî/soranî) bi hev ra tên bikaranîn û cara pêşî di van weşanan da hin hewldanên plandanîna zimanê kurdî tên dîtin. Bi vî awayî her du zarên mîrektîya Botan û Baban li ser destê ronakbîr û nivîskarên ku mîratgir û peyrewên van her du mîrektîyan bûn, li mercên jîyana modern tên guncandin û her du jî wek kurdîyên nivîskî tên bikaranîn.

Meşrûtiyeta Duyem ji alîyê ramana plandanîna zimanê kurdî ve destpêkeke giring e. Lewra di bin karîgerîya azadîya rêjeyî û demkî ya vê şoreşê da hin komeleyên kurdî û weşanên wan peyda dibin û bi xêra wan di mijara plandanîna zimanî da çendîn pêşniyazên teorîk û pêngavên kirdeyî tên avêtin. Babanzade Îsmâil Heqî di *Kurd Teavun ve Terrakî Gazetesi*yê da (Rojnameya Piştgirî û Pêşveçûna Kurdan) bi du

nivîsaran bal dikêşe ser metirsîya li ser zimanê kurdî û dîyar dike ku di serdema zordestîya Ebdulhemîdî da ne tenê dijminatîya ramana kurdîtiyê, dijminatîya zimanê kurdî jî hatîye kirin. Di nivîsara xwe ya “Kürtçeye Dair”ê da jî (Li ser Kurdî) di çarçoveya plandanîna payeyê da behsa bikarneanîna zimanê kurdî dike di perwerdeyê da û bal dikêşe ser nîyeta bişaftina kurd, laz, çerkez û arnawûdan di nav tirk û ereban da. Li ser vê metirsiyê di çarçoveya plana korupusê da vê carê pêşniyaz dike ku pêşî rêziman û ferhenga kurdî bê danîn, paşê dîroka neteweyî ya kurdan bê nivîsîn û herî dawî jî çî helbestên nivîskî û berhemên edebî hebin bîn komkirin û weşandin. Bi dîtina wî, silametîya milletî di merîfetê da ye û kilitê merîfetê jî ziman e (1998: 141-143).

Xelîl Xeyalî wek kesayetîyekî giring ê vê serdemê, di *Rojî Kurdê* da li ser plandanîna zimanê kurdî çend pêşniyazan pêşkêş dike û di nivîsara xwe ya “Ziman” ê da deh xalên giring dixe rû ku di nav wan da li ser şêwazeke nû amadekirina alfabeyek, ji bo hemû zarên kurdî danîna ferhengek û nivîsîna rêzimanek jî heye (M. X, 2013: 187). Hêjayê gotinê ye di van waran da Xeyalî tenê bi pêşniyazên teorîk namîne û hin karên kirdeyî jî encam dide. Di vê çarçoveyê da di alfabeya erebî da çaksazîyeke biçûk pêk tîne û ji bo dengên zimanê kurdî 34 tîpan destnîşan dike û vê wek namîlkeyekê diweşîne. Herweha li gor ragihandina kesayetîyên wê serdemê (Nursi, 2004: 191) rêzimanek jî amade dike û di qada plandanîna zimanî da bi awayekî teorîk û kirdeyî beşdarî dike.

Li ser plandanîna zimnanî di *Hetawî Kurdê* da nivîskarekî ku îmzeyê (T...)yê¹ bi kar tîne nivîsareke giring diweşîne û belkî jî cara yekem di manaya modern da behsa nebûna zimanê kurdî dike. Ji bo destnîşankirina vê jî mînakê *Rojî Kurdê* dide, lewra dema ku li Kurdistanê ye jê ra hejmara pêşî vê kovarê dişînin û ji bo ku kesên derûdora wî ji kurdîya wê tînegihîjin neçar dimîne ku vê kurdîya nivîskî werdigêre ser kurdîya van kesan. Ji bilî vê di mînakê xwe da jî dîyar dike ku tevî ku ji kurdîyên herêma Îraqê dora panzdeh cureyên kurdî dizane jî dema ku rastî kurdên kurdên Hekarî û Botanê tê di danûstendinê da dijarî dikêşe. Ji bo çareserkirina vê mijarê jî herwek milletên din damezirandina komeleyeke zimanî (lisan cemiyetî) pêşniyaz dike ku ji pisporên

¹ Em ji gotarê tîdigihîjin ku ev kurdekî başûrî ye û ji ber tîpa “T” yê û zanîna wî ya gelek cureyên kurdî, dibe ku ev Tewfîqê Silêmanî yanî Pîremêrd be ku demekê li Beytüşebabê qaymeqamî dike û bi kurdên vê deverê ra dikeve nav danûstendinê. Herweha dibe ku ev kes Tewfîq Wehbî be jî ku pisporê zarên kurdî ye û li ser plandanîna zimanî xebatên wî yên giring hene. Ev her du kesayetî jî wê demê li Stenbolê ne û bi van mijaran ra mijûl dibin.

kurdîya bakurî û başûrî pêk tên. Li ser rêbaza xebata vê komeleyê jî dîyar dike ku divê pîsporên vê dezgehê ji bêjeyên kurdîya bakurî û başûrî namîlkeyeke nimûneyî pêk binin û vê namîlkeyê pêşkêşî raya giştî bikin da ku her kes tercîhên xwe li hember wan binivîse û pîsporên komeleyê jî piştî vekolînekê li ser van tercîhan biryara xwe bidin û vê xebatê bikin hîmê zimanekî hevgirtî (T..., 1331: 8-9).²

Nîzamnâmeya Komeleya Hêvîyê ya Xwendekarên Kurd (1914) ku di kovara *Hetawî Kurdê* da tê weşandin ji aliyê plandanîna zimanê kurdî ve deqeke giring e. Di vê nîzamnâmeyê da piştî ku behsa guherîna dinyayê û pêwîstîya parastina kurdbûnê tê kirin di heft xalan da armancên komeleyê tên rêzkirin ku xala duyem rasterast peywendî bi plandanîna zimanê kurdî heye ku dibêje: “Zimanê kurdan yekkirin û kitêbê kurdî civandin û tarîx û qewaid çêkirin û çapkirin û kitêb ji bo zarokê kurdan çêkirin” (1331: 13). Bi vî awayî cara pêşî Komeleya Hêvîyê li hember pîrbûna zarên kurdî behsa “yekkirina zimanê kurdî” dike û ji bo pêkanîna vê jî amaje bi nivîsîna rêzimanê û çapkirina pirtûkên perwerdekirina zarokan dike.

Dîyar e, ciwan û xwendekarên kurd ên wê serdemê di mijara zimanê kurdî da gelek hişyar, dilsoz û xemxwar in. Ji ber vê Îsmâîl Veadê kurê Pîremêrdê helbestvan, di *Jînê* da rexne li xemsariya Kurd Tamîmî Maarîf Cemîyetîyê (Komeleya Giştîkirina Zanistê ya Kurdan) digire û dîyar dike ku herçend Xelîl Xeyalî û Pîremêrdê bavê wî xwe berpirsyarê zimanê kurdî bizanin jî ciwanên kurd dê dest biavêjin zimanê xwe yê terikandî, jîbîrkirî û çewisandî û ji bo ku ev ziman ji aliyê cîhana medenî ve bi hêsanî bê xwendin û famkirin dê tîp û rênivîsa wê rast bikin û wê vejînin. Bi vî awayî mijara zimanî kar û berpirsariya tevahîya gelê kurd dide zanîn û ji ber ku heta wê çaxê komeleya navborî bername û armancên xwe yên di vî warî da dîyar nekirine rexne li wan digire (1985: 433-434).

Piştî vê rexneyê, Komeleya Giştîkirina Zanistê ya Kurdan beyannâmeya xwe diweşîne û tê da cihekî giring dide zimanê kurdî. Di destpêka beyannâmeyê da tê dîyarkirin ku ji bo ku neteweyek bikare li hember pêşhatên serdemê mafên xwe bi dest bixe divê xwedî dezgehên zimanî û dîrokî be ku ev her du dezgeh nîşaneyê azadîyê ya her neteweyê serwer in. Komele di vî warî da kurdan xwedî kêmasîyeke mezin û

² Hêjayê gotinê ye Remezan Alan jî di *Keşkûla* xwe da li ser boçûnên vî camêrî, Kurdîyê Bitlîsî û pêşnîyazên nivîskarên Hawarê yên li ser zimanê kurdî yê hevbeş radiweste (bnr: Alan, 2019).

daxbar bide nîşandan jî, diyar dike ku “kurd dikarin li ser zimanê xwe yê berfireh û rêzimana xwe ya rêkûpêk di demeke kurt da bigihîjin pileyeke bilind û vê kêmasîyê çareser bikin” (1985: 467). Lewra edebîyata raborî ya kurdan nîşan dide ku eger kurd li gor pêwîstîyên serdemê kar li ser zimanê xwe bikin dê zimanê wan bikeve pêşîya gelek zimanên neteweyên din. Komele di vê mijarê da berpirsyariya dîrokî dixê stûyê mîr û zanyarên kurd ku berê hêza neteweyî di destê wan da bû û wan jî ji ber berjewendîyên xwe nakokîyên navxweyî yên kurdan zêdetir dikir (1985: 468). Ji bo nehiştina van kêmasî û nakokîyan komele di bernameya xwe da cih dide bîst xalan ku hin ji wan rasterast peywendî bi plandana zimanê hene. Di vê çarçoveyê da di xala sêyem da behsa amadekirina ferhengeke kurdî tê kirin ku hemû bêjeyên zarên kurdî li xwe bigire û di xala çarem da jî ji nav rêzimanên heyî behsa çapkirina rêzimanên guncaw dike. Xalên din jî li ser dezgehên perwerde, çapemenî, dîrok û kelepura kurdî ne ku hemû jî dikevin bin xizmeta belavkirina zimanê kurdî û binecihbûna vî zimanî (1985: 471).

Kurdîyê Bitlîsî di kovara *Jînê* da bi xurtî bal dikêşe ser vê mijarê û hevterîbî nivîskarê *Hetawî Kurdê* diyar dike ku di roja îro da zimanê kurdî ji naveroka zimanekî zanistî û rênivîsîneke rêkûpêk dûr e û pêwîstiya kurdan bi zimanekî hevbeş ê danûstendinê heye. Ji bo gihîştina vê armancê hebûna zaran wek rêgirî nabîne û berevajî vê, hebûna zarên cîyawaz wek gencîneyên giring ên ferhenga neteweyî dide zanîn. Ji ber vê pêşniyaz dike ku di ber bikaranîn û axaftina zarên herêmî da kurd zimanekî edebî yê hevbeş bixin kar û vî zimanî di nav gelî da berbelav bikin. Ev kar di nav zimanên pêşketî da ji ber ku bi rêya dezgehên zimanî tê kirin bi kêfxweşî pêşwazî li avakirina Komeleya Giştîkirina Zanistê ya Kurdan dike û ji bo gihîştina armancên neteweyî dezgehên weha pêwîst dizane (1985: 606-609).

Bitlîsî di nivîsareke xwe ya din da jî (1985: 665) wek dewama vê nivîsarê bal dikêşe ser kêşeyên zimanê kurdî ku halê hazir ji alîyê ferheng, rêziman û berhemên edebî yên çapkirî ve kêmasîyên wê yên berbiçav hene. Li gor wî herçend bi zimanên rûsî, îngilîzî, almanî û fransî li ser zarên kurdî hin xebat hatibin kirin jî ev xebatên biserve li ser zimanê devereke diyarkirî ne û sînordar in. Ji ber vê jî hin alîyan ve sûda van xebatan bipejirîne jî ji bo zimanê kurdî wan wek çavkanîyên bikêr û bihêz nabîne. Herçî ferheng û rêzimanên ku ji alîyê nivîskarên kurd ve hatine amadekirin û helbestên helbestvanên berê jî bi bêjeyên erebî û farisî dagirtî dizane ku ji zimanê gelî gelek dûr

ketine. Ji ber vê ji bo pêşvebirina zimanê kurdî çavkanîya herî baş zimanê gelî, bi taybetî jî zimanê pîrejînan dide zanîn û vê wek gencîneya rasteqîne ya zimanê kurdî qebûl dike. Li gor wî eger kurd bi rêbazeke zanistî ji vê çavkanîyê sûd wergirin dê zimanê wan di demeke kurt da bibe yek ji zimanên dewlemend ên Rojhilatê.

Bitlîsî ji bo sûdwergirtina ji xebatên kurdologên bîyanî, berhemên kevin ên edebîyata kurdî û zimanê gelî, çend pêşnîyazên giring dixe rû (1985: 666-668) û piştî nivîskarê *Hetawî Kurdê* ew jî pêwîstî bi pêkanîna komeke pisporên zimanê kurdî dibîne ku berdewam li ser zimanê kurdî kar bikin. Li gor wî ev kom di bin navê “Encumena Zimanî” da di nav Komeleya Giştîkirina Zanistê ya Kurdistan da divê ji wan kesên xwendewar pêk bê ku şarezayên zarên kurdî û zimanê bîyanî ne û karê pêşî û herî giring ê vê encumenê jî berhevkirin û rêxistina bêjeyên zimanî dide zanîn. Ji bo vê diyar dike ku eger bêjeyek ji zimanekî din bê wergirtin divê berginda wê di hemû zarên kurdî da bê ravekirin, di nav bêjeyên hevmana yên kurdî da ya herî guncaw li serî û yên din jî li dû wê bên nivîsîn, ji bo berhevkirina bêjeyan divê ne tenê pişt bi kesên nav encumenê bê girêdan, belkî li herêmên cuda bi rêya kesên şareza komên berhevkirina bêjeyan bê çêkirin û ev kes bêjeyên komkirî di gel mînakên destnîşan bikin û komele jî li gor hêza xwe arîkarîya madî bide wan. Ji bilî van karên giring eger hin bêje û zarave ji çavkanîyên zimanê kurdî neyên peyda kirin divê kurd di şûna zimanên cîran ên mîna farisî û erebî da ji zimanên mîna pehlewî, zendî û farisîya kevin sûd wergirin lê di vê xalê da ew çend geşbîn nîne û bawer nake hemû pêwîstiyên serdemî ji van zimanên bên peyda kirin. Ji ber vê bi bawerîya wî divê kurd jî wek almanan ji çend bêjeyan, bêjeyên nû pêk binin û bi vê rêyê zaraveyên nû çê bikin. Zimanê kurdî ji bo karekî wesa zimanekî guncaw dibîne û di wê bawerîyê da ye ku encumen bi rêya dariştinê dikare bêjeyên xwe yên hîlbijartî her sal biweşîne û her pênc salan carekê jî ferhenga xwe nû bike.

Kurdîyê Bitlîsî di mijara rêziman û zimanê hevbeş ê kurdî da jî diyar dike ku divê kurdîya bakurî (kurmancî) bibe bingeha rêzimana zimanê hevbeş û di nav wê da jî zarê Hekarî û Botanê bê tercîhkirin. Ji bo gihîştina armanceke wesa, nîşandana bîrhişkî û navçegerîya muhtemel êrîşeke xirabkarane ya li jîyana neteweyî dide zanîn û vê yekê wek astengkirina pêşketina neteweya kurd dide zanîn. Li gor wî, ji bo gihîştina vê armancê hin rêgirî çê bibin jî divê endamên Encumena Zimanî ji armanca xwe dûr nekevin û bi pêdagirî li ser rêça xwe berdewam bin. Ji bo serxistina vê

armancê jî “pergala weşanê” pêşnîyaz dike ku xebatên encumenê bi rêya weşanên curbicur ji bo raya giştî bê pêşkêşkirin da ku ji alîyê gelî ve bê pejirandin û cihbicihkirin. Di vê çarçoveyê da pêşnîyaz dike ku bi namîlkeyan gel bê perwerdekirin û bi pirtûkên zanistî jî çîna ronakbîran li dor vê armancê bê komkirin. Bi vî awayî di van her du gotarên xwe da ji hîlbijartina normê heta kodkirin, hûrgilîkirin û cihbicihkirinê hemû pêvajoyên plandanîna zimanî li ber çavan digire û vî karî herwek mîletên pêşketî dispêre encumeneke zimanî da ku bi awayekî rêkûpêk bê pêkanîn.

Komeleya Hêvîyê piştî Cenga Mezin careke din beyannameyekê diweşîne û vê carê jî behsa hin xalên plandanîna zimanî dike. Li gor vê beyannameyê, komele ji bo hin kêmasî û kêşeyên zimanê kurdî çareser bike dê bi rêya desteyeke mirovên şareza (Tamîmî Maarîf Heyetî) hewl bide ferhengeke neteweyî amade bike û kurdîyeke nivîskî pêk bîne ku di demeke kurt da li navendên giring bibe zimanê axaftinê. Piştî pêkanîna vî karî komele dê berhemên giring ên edebîyata kurdî yên mîna *Mem û Zîna* Xanî, dîwanên Melayê Cizîrî, Nalî, Elîyê Herîrî, Feqîyê Teyran, Mistefa Begê Kurdî, Hacî Qadir û Şêx Rizayî çap bike û wan di nav kurdan da belav bike (1985: 937-938).

Di encama van gengeşe û pêşnîyazan da em ji gotareke Kamiran Bedîrxanî têdigihîjin ku li navenda Komeleya Tealîya Kurdistanê bi mebesta çaksazîya alfabeya kurdî û dîyarkirina normên rêzimana kurdî lijneyek tê çêkirin û ev lijne dest bi xebatan dike. Bedîrxan vî karî ji bo derxistina dahênerîya kurdan karekî yekcar pêwîst dizane, lewra neteweyeke ku bikare alfabeya xwe rast bike, zimanê xwe sade bike û qayîdeyên rêzimana xwe rêk bixe dê ji paşeroja xwe piştrast be. Em ji gotinên navborî derdixin ku kêşeya herî mezin a li ber vê lijneyê biryardana li ser alfabeyê ye. Ji ber vê bang li endamên vê lijneyê dike ku hestên manewî yên gelî li ber çavan bigirin û rêya hêsanîkirina hînbûn û perwerdekirinê bidin ber xwe. Bi vî awayî nerasterast be jî alîgirîya çaksazîya alfabeya erebî dike û pîrozbahî li endamên vê lijneyê dike (Veroj, 2018: 216-218).

Herçend ev komele, lijne û kesayetî ji ber derketina Cenga Mezin û rewşa sîyasî ya nelîbar a piştî şerî negihîjin armancên xwe yên giring û pêşketî jî ji bername û gotinên wan xuya dibe ku ji kêşeyên zimanê kurdî baş agahdar in û serwextê rê û rêbazên çareserîyê ne. Loma jî dema ku mirov bi giştî li pêşnîyaz û bernameyên wan dinêre hema bibêje hemû pêngavên plandanîna zimanî di wan da tên dîtin.

Bêguman hemû ev xal û pêşnîyazên plandanîna zimanî di teorîyê da namînin û hin karên kirdeyî jî tên kirin. Di vê mijarê da xebatên kesayetîyên mîna Xelîl Xeyalî, Ebdurehîm Rehmî û Mihemed Mîhrî (Muqeddîmet-ûl Îrfan û Îrfan) yên li ser çaksazîya alfabeya kurdî û amadekirina rêziman û ferhenga zimanê kurdî hêjayê gotinê ne. Mîhrî di serê *Muqeddîmet-ûl Îrfanê* da dîyar dike ku ev xebata wî bi mebesta yekxistina zimanê kurdî hatiye nivîsîn (Veroj, 2023: 141) û ferhenga kurdî-tirkî-erebî-farisî ya bi navê *Îrfanê* jî ji bo komkirina bêjeyên kurdî yên petî dike amrazek. Ji bo vê mînaka “xal” ê dide û li hember vê bêjeya erebî “lalo”ya hewramîyê pêşnîyaz dike (Veroj, 2023: 156). Ji bilî van her du xebatan, *Hînkera* ku ji alîyê Komeleya Hêvîyê ve ji bo hînkariya zimanê kurdî bi her du zarên sereke yên kurdî û zimanê osmanî (1921) tê amadekirin ji bo lihevneşîkkirina her du zarên kurdî xebateke balkêş e. Mixabin beşek ji van xebatan wînda dibin û nagihîjine ber destê me ku *Serf û Nehwa* Xelîl Xeyalî (1908), *Îrfana* Mîhrî û her du xebatên *Gramera Kurdî* û *Gramera Kurmancî*, *Kurdçe Metod Pratîkê* ya Ebdurehîm Rehmî ku di 1919ê da dinivîse ji van in (Zapsu, 2023: 15).

Li hember bikaranîna kurmancî û babanî em dibînin ku di vê serdemê da di mînaka Xelîl Xeyalî û Hîlmîyê Siwêregî da kurdên zaza wek zimanê edebî kurmancî bi kar tînin û Lahûtî Xan û Mihemed Mîhrî (Kaka Heme) jî di hin helbestên xwe da zimanekî têkel bi kar tînin ku ji zarên soranî, goranî û kurmancî pêk tê û bi vî awayî daxwaza xwe ya hevgirtina zimanî nîşan didin. Li ser vê bingehe em dikarin bibêjin ku di serdema modern da xebatên plandanîna zimanê kurdî cara pêşî li Stenbolê tên kirin û ev xebat dibin bingeha xebatên baştir ên paşerojê.

2.2. PLANDANÎNA ZIMANÊ KURDÎ LI ÎRAQÊ (1918-1970)

Kurdistana Îraqê ji alîyê plandanîna zimanê kurdî û serxistina wê ve qada herî bihêz û çîroka serkeftî ya zimanê kurdî ye, lewra derfetên rêjeyî yên li vir, li tu cihekî din nakeve destê kurdan. Loma jî li gor hevraz û nişûvên sîyasî carinan rêgirî û sînordarkirin hebin jî li Îraqê tu car kurdî bi tevahî nayê qedexekirin û di pileya duyem da be jî ji alîyê dezgehên dewletê ve heta radeyekê tê piştgirîkirin. Lê divê em vê ji bîr nekin ku ev dîyardeyeke sertaserî û seqamgîr nîne û li gor serdem û hikumetan diguhere.

Di serdema mandaya Îngiltereyê da (1918-1926) di damûdezgehên fermî û çapemenîyê da piştevanîya zimanê kurdî tê kirin û li gor rojnameya *Pêşkewtinê* ku ji aliyê îngilîzan ve tê derxistin, zimanê kurdî li ser destê îngilîzan dibe zimanekî fermî û nivîskarên vê rojnameyê vê yekê bi minet bi bîr tînin (Nûrî, 1921: 2). E. B. Soanayê (1881-1923) ku mîmarê vê hizirê ye ji bilî fermîkirina nivîsarên kurdî, bi damezirandina çapxaneyekê li Silêmanîyê û derxistina *Pêşkewtinê* ji bo berdewamîya nivîsîna kurdî bingeheke baş datîne û ji bo binecîhkirina vê di nav gelî da, gef li wan kesan dixwe ku bi çavekî biguman û sivik li nivîsîna kurdî temaşe dikin û her kesî neçar dike ku vê rojnameyê bikin û bixwînin. Bi vî awayî di şûna farisî û tirkîya ku wê serdemê wek zimanê çapemenîyê dihatin bikaranîn, hêz dide nivîsîna kurdî (Mukrîyanî, 1945: 387) û bingeheke baş ji bo plandana zimanî direxsîne.

Bi heman awayî di serdema hikumetên Şêx Mehmûdî da jî (1919-1924) li Silêmanîyê kurdî dibe zimanê çapemenî û dezgehên fermî. Lê piştî ku îngilîz biryara piştevanîya Îraqê yekgirtî didin qada bikaranîna kurdî tê bertengkirin, perwerdeya bi zimanê kurdî bi xwendîngehên seretayî tê sînordarkirin û di astên cîyawaz da erebî bi ser kurdan da tê sepandin. Herçend di pêvajoya avakirina Îraqê da bikaranîna zimanên navçeyî ku mebest jê kurdî ye, di peymanên navneteweyî da bê bicîhkirin jî di serdema monarşîyê da (1932-1958) Hikumeta Îraqê van mafên sînordar li hemû cihî cihbicîh nake û li Mûsil û Kerkûkê rê bi perwerdeya kurdî nade.

Di serdema komarî da (1958-1961) bi madeya sêyem a destûra nû, kurd wek hevtayê eraban bîn nasandin jî di warê kirdeyî da ev nayê cihbicîhkirin (Abdulla, 1980: 154; Hassanpour, 2005: 210-211). Ji Şoreşa Eylûlê (1961) heta peymana 11 Adara 1970yê jî ev rewş naguhêre û li Îraqê wek zimanekî navçeyî serederî bi kurdî ra tê kirin. Ev jî nîşan dide ku di vê maweyê da piştevanîya fermî ji bo kurdî di asta zimanê navçeyî û sînordar da ye û tevî piştevanîya hin dezgehên fermî giraniya karên plandana zimanî dikeve ser milên komele û bizava weşangerîya kurdî.

Bêguman di vê maweyê da Silêmanî wek navenda herî giring a plandana zimanê kurdî derdikeve pêş, lewra Silêmanî paytexta Mîrektîya Baban e, cihê avakirina hikumetên Şêx Mehmûdî ye û navenda pêgihîştina gelek nivîskar, helbestvan û ronakbîran e. Ji ber vê bi awayekî siruştî şêwezarê Silêmanîyê wek koda hîlbijartî dibe binemaya zimanê nivîskî û li dor vî şêwezarî hewlên pêşvebirin,

nûjenkirin û yekxistina zimanê kurdî tê dayîn. Herçend li Bexdad, Rewandiz, Hewlêr û Kerkûkê gelek weşanên kurdî derkevin jî heta salên 1970yan Silêmanî û şêwezarê Silêmanîyê di navenda plandanîna zimanî da ye. Bi vî awayî tevgera ronakbîrîya vî bajarî weha dike ku bê piştevanîyeke bihêz a hikumetê zimanê kurdî di maweyeke kurt da wek zimanekî edebî yê xurt bi pêş bikeve û di gelek qadên jîyana modern da bê bikaranîn. Şopên vî karî herwek mînakên berê di bernamêyên komeleyan û di nivîsarên kovar û rojnameyên vê serdemê da reng vedide û bi zelalî derdikevin pêşberî me.

“Cemîyetî Zanistî Kurdan” (1926) yek ji komeleyên pêşî û giring ên vê serdemê ye ku li Silêmanîyê xwe dide ber barê plandanîna zimanê kurdî. Ji ber vê di bernamêya xwe da cih dide van xalên giring ku ji bo plandanîna zimanî jîngeheke libar amade dikin: (a) weşandina rojname û pirtûkan, (b) wergêrana pirtûkên perwerdeyê û yên din, (c) vekirina xwendîngehan û dersdayîna bi roj û şevê, (ç) bi awayê dersdayîne ronakkirina gelî, (d) vekirina pirtûkxaneyan û (e) şandina xwendekaran ji bo welatên pêşketî (Zarî Kirmancî, 1926: 8). Yaney Serkewtin jî di sala 1930ê da li Bexdadê ji aliyê Meruf Beg Ciyawuk, Ehmed Muxtar Efendî Zehawî, Arif Efendî Bedrî, Mihemed Elî Begî ve tê damezirandin û di nav 18 xalên “Nîzamnâme Bineçekey Yaney Serkewtin”ê da xala herî giring xala sêyem e ku kêr zêde ji dubarekirina armancên Cemîyetî Zanistî Kurdanê pêk tê ku ew jî armanca komeleyê wek hewldana pêşvebirina zanist û perwerdeyê, bi rêya nivîsîna pirtûkan û wergêranê bilindkirina zimanê kurdî, vejandina kurdan li ser rewîşteyê nû û destûra serdemî, belavkirina zanistên modern, hînkirina kesên nexwendewar, perwerdekirina sêwîyan, vekirina xwendîngehên taybetî, şandina xwendekaran ji bo bajarên pêşketî yên Rojavayê û hin armancên din ên civakî ne (Zarî Kirmancî, 1930: 13). Ji ber vê berçavronîya ronakbîrên kurd û xebat û hewldanên wan, li bajarê Silêmanîyê plandanîna zimanê kurdî di pêngava pêşî da li dor tevgera petîkirina zimanî serî hildide û paşê ji bo qadên din şax vedide.

2.2.1. Tevgera Petîkirina Zimanê Kurdî

Petîkirina zimanî (language purism) yek ji taybetmendî û encamên netewetîya modern e ku mirov dikare reha wê bigihîjîne heta romantîkên alman. Johann Gottlieb Fichte (1762-1814) parastina zimanê neteweyî ji bêjeyên bîyanî, wek parastina gewhera neteweyê dide zanîn (Ökten, 2006: 417) û vî karî yek ji pêwîstîyên

neteweparêzîyê li qelem dide. Herwek modelên rojavayî ev têgihîştin wek normeke netewetîyê di nav bizavên netewetîyên rojhilatî da jî cihgîr dibe û plandanerên her zimanekî hewl didin zimanekî petî berhem bînin û bêjeyên bîyanî ji zimanê xwe biavêjin.

Ev bizav di nav kurdan da di destpêka salên 1920an da li Silêmanîyê serî hildide û şopên wê jî bi awayekî herî berbiçav di rojnameya *Pêşkewtinê* da tîn dîtin. E. B. Soanayê efserê sîyasî yê îngilîz û nivîskarê pirtûka *Elementary Kurmanji Grammarê* (1919) yek ji handerê bizava petîkirina zimanê kurdî tê pejirandin ku ji alîyekî ve li dijî bîrhişkîya şêx û melayan a li hember kurdîya petî têdikoşe (Edmonds, 1945: 56) ji aliyê din ve bêjeyên petî yên zimanê kurdî kom dike û kî di nivîsarên xwe da kurdîyeke petî bi kar bîne bexşîş dide wan (Mukrîyanî, 1945: 388) . Bi vî awayî tevgera petîkirina zimanê kurdî dide destpêkirin ku dibe yek ji xebatên giring ên plandanîna zimanê kurdî.

Bêguman hemû bizavên petîkirinê li hember zimanên zal ên dîn û împaratorîyan serî hildidin û ev di mînaka zimanê kurdî da jî weha dibe. Rola zimanê latînî wek zimanê dîn, perwerde û xwendinê li Rojavayê çî be, rola erebî jî li Rojhilata Îslamî weha ye. M. Nûrî (Şêx Nûrî Şêx Salih) bi nivîsara xwe ya “Ziban” ê û bi zincîre nivîsarên xwe yên “Bê Ziman Beseziman” ê yên *Pêşkewtinê* rûbirûyê vê dîyardeyê dibe û bi têgihîştina netewetîya modern di navbera ziman û nasnameya neteweyî da pevgerêdanên bihêz çê dike. Li gor wî netewe li ser bingeheke exlaq, dîn û zimanî ava bibin jî ziman ji hemûyan giringtir e û parastina zimanî parastina jîyan û ruhê qewmîyet û milîyetê ye. Lewra ziman ji ber hêza xwe ya jêvtêgihandinê germahîyekê di navbera endamên neteweyê da çê dike û wan ji dînî zêdetir bi hev ve girê dide. Ji ber vê li dijî wê yekê derdikeve ku ji ber musulmanbûna kurdan xwendina erebî bi ser wan da bê sependin. Ji bo vê mînaka musulmanên Hindistan û Çînê dide ku tevî musulmanbûna xwe bi zimanê xwe perwerde dibin û ji bo pêdawîstîyên xwe yên dînî jî pirtûkên dînî werdigêrin ser zimanê xwe (Nûrî, 1922: 1-2). Ji bo kurdan jî heman tiştî pêşnîyaz dike, loma jî ji bo pêdawîstîyên dînî doza nivîsîna tefsîreke kurdî dike û ji bo bihêzkirina zimanî behsa yekxistin û rêkxistina zimanê kurdî û pêkanîna “zimanekî hemû petî” dike (Nûrî, 1922: 6). Ji vî aliyî ve pesnê hikumeta îngilîz dide ku zimanê kurdî li ser destê wan bûye zimanekî fermî û vê rûdanê xizmeteke dîrokî dide zanîn.

Nivîskarekî din ê *Pêşkewtinê* hîn di hejmara 6ê da rexne li nivîsarên hin ronakbîran digire ku bêjeyên erebî û farisî bi kar tînin, nivîsarên weha nefambar û aloz dide zanîn ku tenê kesên xwenda dikarin jê têbigihîjin. Nivîskar, vê dîyardeyê sedema paşketina zimanê kurdî dide zanîn û ji bo şîrînkirina şêwazî bi tu awayî qebûl nake pêwîstî bi wergirtina bêjeyên zimanên bîyanî hebe. Loma jî pêwîst dizane ku di zimanî da destkarî bê kirin lê vê destkarîyê “ji hilweşandinê bêhtir, wek girtina kunên li pêşîya dilopên zimanên erebî û farisî” pênase dike û doza hewldanên zêdetir dike ji bo pêşvebirina zimanê kurdî (M..., 1920, 1).

M. X. ji Ranyeyê beşdarî vê gengeşeyê dibe, zimanî beşek ji kesayetî û hebûna neteweyan dizane û ji ber rêpêdana zimanê kurdî sipasîya “hikumetî fexîmey muşfeqe” ya îngilîz dike. Em ji gotinên wî fam dikin ku di wê demê da di şûna bêjeyên erebî, tirkî û farisî da yên kurdî tên dahênan û ev jî car bi car dibe sedema alozîya têgihîştinê. Ji bo vê wek hewcedarîyeke bilez behsa pêwîstîya danîna ferheng û rêzimanê kurdî dike, lewra eger ferhengeke kurdî hebe dê rê li ber gilîyên tenegehîştina bêjeyên petî yên kurdî bê girtin. Ji bo pêkanîna karekî weha jî kesê herî guncaw bi gotina wî “bawkî muşfiqî kurd û kurdî û Kurdistan” cenabê Soane ye. Hêvî dike ew bixwe yan jî di bin serperîştîya wî da encumeneke zimanî bê avakirin da ku ev kar bê kirin (M. X., 1920: 1).

Herçend hêvîyên M. X. yî di wê demê da pêk neyên jî mirov dikare bibêje ku bizava petîkirina zimanê kurdî hem ji alîyê teorîk ve hem jî ji alîyê kirdeyî ve bi *Pêşkewtinê* dest pê dike û ev têgihîştin dibe normeke hemû kovar û rojnameyên kurdî yên paşê. Ji vî alîyî ve bêjeyên mîna “pêşkewtin, jimare, kiryar (ji bo abone) zanist, kêşe, çapxane, çap kirdin (h. 1, 1920: 1-4) dahênan, mamosta (h. 3, 1920: 1), be taybetî (h. 6, 1920: 1), diwakewtin (h. 12, 1920: 2), paşmawe (h. 15, 1920: 1), aştî (h. 17, 1920: 3), rêgay asin (h. 18, 1920: 2, 4), rewîşt (h. 21, 1920: 1), cildirû (ji bo terzî) (h. 34, 1920: 3), dozînewe (ji bo keşfê), sikala (ji bo şikayetê) (h. 35, 1920: 1, 4), tika, xowilatî (h. 51, 1921: 1), wirdbûnewe (h. 56, 1921: 1), cejn (h. 59, 1921: 4), cejne pîroze (h. 60, 1921: 3), dîl, komel (h. 82, 1921: 2), petî (h. 95, 1922: 6), rojhelat (h. 102, 1922: 3)” ku di *Pêşkewtinê* da tên bikaranîn mînakên balkêş ên petîkirina zimanî ne ku ev bêje yan bi rêya dariştinê yan jî bi rêya berhevkirina ji çavkanîyên folklor, deqên edebî û zimanên hevmalbat tên destnîşankirin.

Di rojnameyên serdema Şêx Mehmûdî da jî mirov rastî çend namîlkeyên leşkerî û hiqûqî tê ku di bin sîbera vê hewldanê da bi kurdî tên amadekirin. Ji bilî van, Şêx Mehmûd biryarnamêyên xwe bi kurdî diweşîne û efserên kurd ên vê serdemê jî hewl didin pirtûkên perwerdeya leşkerî bikin kurdî. Di vir da rola Tewfîq Wehbî gelek berbiçav e ku bi wergêrana pirtûkên leşkerî yê mîna *Te'limî Taqim* (1922) û *Te'limî Qit'eyê* (1922) (Wehbî, 2022: 11) hin zaraveyên leşkerî ji zimanê tirkî werdigêre ser zimanê kurdî. Herweha bi gotina Hassanpourî di vê serdemê da gelek qanûn û rêzîkname bi kurdî tên weşandin û meyla petîkirina kurdî bi aşkerayî xwe nîşan dide (2005: 483-484).

Di rojnameya *Dîyarî Kurdistanê* da Heqî Şaweys di bin sernavê “Laperey Nûsînî Taze û Kurdîy Petî”yê da bal dikêşe ser vê mijarê. Ew jî herwek neteweperwerên serdema xwe behsa “pîrozîya zimanê kurdî” dike û herwek romantîkên alman di wê bawerîyê da ye ku binçîneya neteweyek bi zimanê wê ve û ruhê wê jî bi edebîyata wê ve girêdayî ye. Ji ber vê bang li nûciwanên kurd dike ku “zimanê kurdî wek çekekî xweparêzî û serkeftinê bidin ser milên xwe” û li ser navê kurdayetîyê xwedî lê derkevin. Ji bo vê di wergirtina bêjeyên erebî û farisî û peyrewkirina rênivîsa van zimanan da teasubparêzîyê pêwîst dizane (1926: 13-14/18-19) û pêşnîyaz dike ku divê kurd tîpên erebî ji alfabeya xwe derxin, alfabeyeke taybet bi xwe çê bikin, bingeha rênivîs û rêzimana xwe daînin, xwe ji bikaranîna bêjeyên erebî û ecemîyê biparêzin û zarave û destebêjeyên zimanên erebî û tirkî jî wergêrin ser zimanê xwe. Bi raya wî dema ku kurd vê bikin dê reng, hebûn û ruhê xwe bidin zimanê xwe û zimanekî hêsan û sivik berhem bin (1926: 15/11-12).

Di vê mamweyê da Pîremêrd hem bi berhemên xwe, hem bi rojnameyên xwe hem jî bi rêya Komeleya Zanistîyê piştgirîyeke baş dide bizava kurdîya petî. Jîyan û Jînê dike amrazên vê armancê û bi gotina Hêminî bi hişmendî û hişyarane mijûlî vebijartin û pakkirina zimanê dibe, bi hostayî bêjeyên erebî û farisî û tirkî jî nav kurdî derdixe, di şûna wan da bêjeyên resen û sade yê kurdî bi cih dike û di nivîsîna kurdî da guherînên baş çê dike (Hêmin, 2014: 477). Herweha Cemîyetî Zanistî Kurdan (Komeleya Zanistî ya Kurdan) jî ku Pîremêrd stûna wê ya sereke ye, di 1926ê da bi navê “Kurdîy Petî” yê pêşbazîyekê li dar dixê û armanca vê pêşbazîyê ew e ku bi dinyayê nîşan bidin ku kurdî zimanekî rêkûpêk e û pêwîstîya wê bi zimanekî bîyanî nîne. Ji bo vê armancê, Komeley Bijarî Zimanî Kurdî tê damezirandin û armanca wê

ya sereke jî di şûna bêjeyên bîyanî da peydakirina bêjeyên kurdî ye (Salih, 2017: 245). Herçend ev komele zêde çalak nebe jî em dikarin bibêjin ku bizava petîkirina kurdî di weşangerîyê da berdewam kar dike (Hassanpour, 2005: 565) û her kovar û rojnameyek dibin xelekeke giring a vê zincîreya berdewam.

Di vê çarçoveyê da ji bilî weşan û komeleyên Silêmanîyê, di wan salan da Husên Huznî Mukrîyanî jî wek çaksazekî giring ê zimanê kurdî di gel birayê Gîw Mukrîyanî li Rewandîzê bi kovara xwe ya *Zarî Kirmancîyê* di petîkirina zimanê kurdî da roleke giring dilîze. Di hejmara çarem a kovara xwe da bal dikêşe ser pêwîstîya plandanîna zimanî, di mînaka zimanên babîlî, aşûrî û latînî da behsa jinavçûn û windabûna zimanan dike û mîna hemû tiştî zimanî jî di çarçoveya qanûna tekamulê da dinirxîne ku bi xebatê dikare bi pêş bikeve. Ji ber vê yekkirin (tewhîd) û çakkirina (îslah) zimanî yek ji armancên xwe yên sereke dide zanîn û dîyar dike ku dê di çarçoveya vê armancê da ji vir û pê da rûpeleke kovarê ji bo ravekirina bêjeyên kurdî veqetîne da ku bibe sedema jevtêgihîştina hemû alîyekî. Ji bo vê ji xwendevanan tika dike ku li ser vê mijarê boçûnên xwe binivîsin û listeyek bêjeyên ku li ser wan nelihevî heye di gel ravekirinan ji wan ra bişînin û dê bi vê yekê xizmeteke mezin ji bo zimanê xwe bikin (1926: 15).

Ji bilî vê, Husên Huznî giringîyeke mezin dide berfirehkirina perwerdeya bi zimanê kurdî û gelek caran rexne li sîyaseta Hikumeta Îraqê digire ku kurdên Kerkûk, Duhok, Akre, Amedîye û Zaxoyê ji xwendina kurdî bêpar hiştine. Herçend xwendina bi zimanê erebî red neke jî zimanê kurdî ji hemû zimanên din xoşewîsttir û cudatir dibîne û doza perwerdeyekê dike ku ruhê kurdayetîyê jê biweşe (1930: 5). Ji ber vê nivîskarên *Zarî Kirmancîyê* berdewam doza fermîkirina zimanê kurdî dikin, ji bo vê xwe dispêrin biryarên “Komeley Eqwam” ê, şandina fermanberên ereb ji bo navçeyên kurdî protesto dikin, zimanê kurdî “zimanekî edebî û fenî” didin zanîn û wê ji hemû zimanan firehtir dibînin (Kurdî, 1930: 9).

Bi vê riwangeha petîkirina zimanî, em di *Zarî Kirmancîyê* da jî rastî gelek bêjeyên petî yên kurdî tên ku “kovar (mecelle, mecmua) (h. 1, 1926: 1), bîyanî (xerîb) (h. 4, 1926: 15), xoşewîst (hezkirî) (h. 6, 1926: 7), welam (cewab) (h. 6, 1926: 12), perwerde, pêgeyandin, pêwîst, binaxe (h. 8, 1927: 4), helbest, piştewanî (h. 11, 1927: 13), webîrhênanewe (h. 11, 1927: 19), biwêj (şair) (h. 19, 1929: 7), rastroyîştin

(îstîqamet) (h. 20, 1929: 4), mêjîn (dîrok), firok (balafir) (h. 20, 1929: 7) hêwirge (nadi), rêkûpêk (h. 22, 1930: 16)” bêjeyên herî berbiçav in.

Bêguman hemû weşanên kurdî yê nê serdemê kêr zêde dibin beşek ji tevgera petîkirina zimanê lê di nav van da jî cihêkî giring ê *Gelawêjê* heye. Lewra hem ji aliyê karîgerîya xwe ve hem jî ji aliyê naveroka xwe ve *Gelawêjê* dibe qadeke berhemdar a geşkirina zimanê kurdî. Ji bo geşkirina vê bizavê û jinavbirina hin kêşeyên tevgera petîgerîyê ku dem bi dem bikarhênerên zimanê dixê nav sergêjanîyê nivîskarekî *Gelawêjê* sê pêşnîyazên giring dixê rû: (1) Divê bêjeyên bîyanî yê ku bergindên wan di kurdî da hene bîn terikandin û kurdîya wan bê bikaranîn. Bo nimûne di şûna bêjeyên “cemal, eşq û heraretê” da divê “ciwanî, dildarî, germî yan germayî” yê bîn bikaranîn, (2) Ji bo kurdîkirina hin destebêje û risteyan divê daîreyeke biçûk hebe û her kes ji ber xwe ve bêjeyan çê neke, (3) Divê di wergêran û nivîsînê da hewl bê dayîn ku destebêjeyên petî yê kurdî bîn bikaranîn, riste û destebêje neyên wergêran û di cihê wan da riste û destebêjeyên amade yê kurdî bîn bikaranîn (1940: 8).

Ji serdema Şêx Mehmûdî heta *Gelawêjê* di petîkirina zimanê da roleke berbiçav a Tewfîq Wehbî heye û li ser vê rola xwe ya berdewam di hin hejmarên *Gelawêjê* da bi amadekirina “ferhengok”a hin bêjeyên petî yê serdema nû, bizava petîkirina kurdî didomîne. Bi vê mebestê di hejmarên 7-8, 9-10 û 11-12 ên 1942yê û hejmarên 1 û 2 yê 1943yê da di bin navê “Ferhengokî *Gelawêjê*” ê da li hember bêjeyên berbelav ên zimanê erebî, bêjeyên petî yê kurdî datîne.

Di hejmara 7-8ê ya 1942yê da ku cara pêşî ferhengok tê weşandin û li ser navê kovarê bang li xwendevanan tê kirin ku ji vir û pê da di bin navê “Ferhengî *Gelawêjê*” ê da dê bêjeyên kurdî yê petî bîn weşandin ku ji aliyê Tewfîq Wehbî Begî ve hatine komkirin. Li gor vê ronkirinê, mebest ji vê xebatê ew e ku hêz bidin nivîsîn û yekxistina bêjeyên kurdî. Ji ber vê ji xwendevanan tika dîkin ku li hember bêjeyên erebî yê ku hatine danîn eger bêjeyeke din bizanin bila ji *Gelawêjê* ra bişînin û ew ji dê van bêjeyan biweşînin (1942: 94). Herweha di hejmara yekem a sala 1943yê da jî ev tika tê dubarekirin û rê bi xwendevanan tê nîşandan ku sûd ji pîrên kurd wergirin. Di vê çarçoveyê da Wehbî berzîkirina zimanê kurdî erka hemû kurdan dide zanîn û hêvî dike her kurdek xwe bide bin vî barî (Wehbî, 1943: 53).

Di van pênc hejmaran da ferhengok di sê stûnan da tê weşandin. Stûna yekem ji bêjeyên erebî, ya duyem ji yên kurdî bi tîpên erebî û ya sêyem ji dîsa ji yên kurdî lê bi tîpên latînî pêk tên. Gelek caran li hember sermadeya bêjeya erebî çendîn bêjeyên hevmana yan jî guherteyên heman bêjeyê ji tîpên rêzkirin. Herweha hin bêjeyên hejmarên pêşî ji bo lêzedekirina bêjeyeke hevmana yan guherte di hejmarên paşê da ji tîpên nivîsîn. Bi vî awayî di hejmara 7-8ê ya 1942yê da 44³, di hejmara 9-10ê ya 1942yê



³ kat, newe, dahênan, ajawe, bayex, dirpêdan, dirkandin, tiwana/yara, serrast, kemayetî, zurbeyetî, zirye, çaweraw, bazirganî, layengîrî, silemînewe, hawkarî, pêwendî, peresendin /tenînewe, leberbûre, siza, dirge, be astem, pêşanî /rûkar, bere, qewmaw, parêzer, hawpeyman, serpişk, barge, gencîne, peyam, nemir, gêtî, dawên /kilk, qule, bezeyî piya hatin, barimte, nihênî, nîrx, saman, pişesazî, aşî, kutek (r. 94-96).

da 116⁴, di hejmara 11-12ê ya 1942yê da 128⁵, di hejmara 1ê ya 1943ê da 49⁶ û di hejmara 2yê ya 1943ê da jî 49⁷ bêje tên weşandin.

⁴ ast/aqar/ rast, hêm/xû/siruşt, hêmin (exlaqdar), pişêwî/gerdiş/şêwawî, şoriş, aloz, wudim (îcaze), rêkkewtin/guncan, hetahetayî, xoladan/xoparastin, pêşbînî/dûrbînî, binçîne/binaxe/bineret, binyad/binecek, pêwendî, leberddan, susekirdin, pêzanîn, şemûs/bêgwê/lasar, destewa/destyaw, xwastemenî, pêşûtir/bertir, piştêwebestî/piştêweestûrbûn/piştîwan, paşnîwero/nîwrubar, lêxêftan, raperandin/birdine ser, birînewe/kutakirdin/dway hênan, lêzanîn, werzkirdin/cariskirdin, sûrûpişt, xohelkêşan, nazîn, lêkbûnewe/ lêkbîran/cîyabûnewe, sazîkirdin/xoşîkirdin, tawîkirdin, tefredan, desxerûkirdin/desbezaxakirdin/rîşgawîkirdin/deseşikênkirdin/desbîrin, peypêbirdin/rîpêbirdin, feramoşîkirdin/gwênedan/xistine pişt gwê, serrast, pêlêdagirtin/mîçlesergirtin, rapermûn/ rabînîn, penabirdin, gwêzanewê/guwastinewê, paşekewtkirdin/gildanewê/despêwegirtin/maldarî, lêwergirtin, pêwîst, bilawbûnewe/bilawê/peresendin/tenînewe, pêşnîyar, awirdanewê, pêdeşt, deştanî/deştayî, barbû/pîtak, tase, galtepêkirdin, tîzpêkirdin, dêmî/malî, puzîşt, tiwan/yara/wuze/kêş, rahatin/hogirbûn/pêfêrbûn, azar/renc, bayex, dirkandin/ledemderkirdin, danpîyanan/pêlênan/dirkandin, bîro, firyakewtin, bordan, dêrîne, engawtin/pêkan/berkewtin, pindirkirdnewe/bûjandnewe, efsane, zurbeyetî, kemayetî, meyin/masyan/ bestin, bêlo, ajawê (aşop)/şîpirzeyî, dagîrkirdin, agadarkirdin, serbar/serera, berxwardin, peqxistin, erz/zewî/bûm, pêgeyandin/derhênan/encamdan, horkirdin, derkird/derkirdin/derhênan, tepîn/riman, lenawbirdin, becêhênan/cêbecêkirdin, lexiştebirdin/cigekirdin, ser/serak/serek/serok/serdar, ayîn/zêwê, bilawkirdnewe, şewnîxûnî, Okyanûsî Hêmin, Okyanûsî Bestû, Okyanûsî Hindî, Okyanûsî Etlatîk, barxane, bende, dîl, birew, bincî, binçîneyî, berpakirdin, hêlsûrandin/gêran, bêznehatin, ferman, fermaner, xokamî/xopereştî/xobînî/ xopesendî, estêrk,xêwranewê/tiwanewê, tiwandnewê, pirûzat, esil, bûjanewê, deskird, dîlnîyayî, darûperdû, xobedesewedan, aso, payedarkirdin, rapermûn/rabînîn, agirkuje, tengûceleme, çendan (r. 87- 94).

⁵ Lenawbirdin/tûnakirdin, cawîd/cawîdan/nemir, belek, yekyetî/yekgirtin, pêkhatin/rêkkewtin, rebeqkirdin/dwayîhênan, kobûnewe/girdbûnewe/molbûn/wêkkewtin, çemer, dagîrkirdin, atacî/pêwîst/pekkewtin/daman, têbînî/pêşbînî/dûrbînî, piştîwan (eskerî)/paşekewt, henaw, xel/vîr, agadarkirdin, pispor, xuşk/xu/wala, bijardin, berêweçûn, helkirdin, têxistin/têkirdin/kirdine jûrewê, têtrincandin/qirsandin, bendîwar, pêwendî, berdelhan, herde/kere, nişe/nisirm, beraw/awî, xir/bist, bej, zirguhlet, peşûş/ fişhel, pitew/reqen, toqandin/tirsandin, pitirbûn, herasankirdin/serleşandin, parsîkirdin, parsek, peyakirdin/desgîrkirdin/derhênan, lebardabûn/pêkiran, bendegerî/kirdin be bende, lezîn/pele/pelepel/xêra/desûbird/zûkirdin, hêdman, hîtîkirdin/waqman/hurman/wurman/waqwurman/sersûrman/çaşbûn/serasîme bûn, serbexoyî, piştîwan/piştêmêr, nefrîn, hejan/hêja, taqetkirdin/telxekirdin, xistin/lêxistin, awa/şêwaz, çawşîn/sûrîl/sûr, goc/qop, çawbelek, destebira/birader, çakkirdnewe, bincî, awa, şêwaz, desberdan, lexiştebirdin/şêwîn/lêwunkirdin, ferman birdin/be gwê kirdin/be qisekirdin/be gwê /gwêdan, arîkarî/kêşkkirdin, bîyanû, asayî, azadkirdin, kirdar, wêrankarî/leserxoçûn/lexoçûn/geşkegirtin/tasan, kole/qunet, tûkin/tîskin, tîkdan/lexiştebirdin, ledemderkirdin/dirkandin/aşkirakirdin/ledemderçûn/xistine rû, hermên, hênane bawer, becêhênan/raperandin/cêbecêkirdin/lêbûnewe/rebeqkirdin/birdine ser, zorxor/xorên/bixor, êsta/henûke/niha/niho, bîray bîbray/hetahetayî/hergîz, belam, rewel, serinc, pîrkirdin/tejkîrîdîn, lûs, karûbar, birişt, hewdanewê, hetrebûn, rêkî/xiştî/rêkyetî/xincî, toqîn/bizdan/zirawçûn/zaretirekbûn, mirov/merok/merdum/piyaw, saxtman, lût/kepû/bêvil/difin/poz, pîrpîyazkirdin, wêne/sermeşq, ceste, şewqawpij, rewîn, helatin, şikan, hogir/mitû, nawend, nuxuste/yekem, giringî/pêşemî, hoşyarkirdnewe/lexewhelsandin (r. 89-96).

⁶ Berî, mîze/mûçe, nûstû/dej, bexş/beş/peşş, heljimar, serjimar, amadekirdin/sazkîrîn, serpêdanewandin/hênan ber bar, pît, bang, renc, migêz/arezû, lenger/hawîştin, awdan/daştin, hesanewê, amadebûn/amadeyî/yara, kelksendin, beçawkirdin/bedîkirdin, çawtêbirin/çawtêwê bûn, tase/giran/arezû, zorane/wêrkirdin/xerîkkirdin, nefrîn, nijadî, nijad/reçelak, peşokan, rexne, bawer/birwa, çawtêwebûn, kelkgirtin/sûdan, tirazan, dildaxurpan/bizdandin, polikkirdin, weram,

Bêguman piranîya van bêjeyan roja îro di zimanê kurdî da bi awayekî berbelav bên bikaranîn jî bi hindikî bin jî hin bêje cihê xwe nagirin. Ji nav van bêjeyên pêşnîyazkirî “silemînewe” (di manaya teredudê da), “wudim” (di manaya îcazeyê da), “rexne” (di manaya îtirazê da), “weram” (di manaya îqtîsadê da) û “karî kiraw/bûnî/kirdinî” (di manaya îmkanê da) mînakên vê yekê ne ku cihê xwe nagirin. Ev jî karekî gelek asayî ye ku di hemû mînakên plandanîna zimanî da tê dîtin. Ji bilî bêjeyên vê ferhengê Tewfîq Wehbî Beg di hin nivîsarên xwe yên *Gelawêjê* da car bi car bêjeyên petî (pure) di gel erebîyên wan bi kar tîne ku bêjeyên “bizûtnewe”, “giştî” (umumî) û “netewe” yê (qewm) mînakê vê ne⁸.

Îbrahîm Ehmed jî di *Gelawêjê* da di bin sernavê “Bo Zanîn” ê da xwendevanan agahdar dike ku bi beşdarîya wan dixwazin bêjeyên petî yên kurdî kom bikin. Di hejmara pêncem a 1945ê da dîyar dike ku ji bo tîpa “b” yê F. Zêwer ji Silêmanîyê 61 bêjeyên petî şandîye û nûçeya berhevkirina bêjeyên tîpên “p” û “c” yê jî radigihîne (1945: 4). Herweha di hejmara yekem a 1946ê da berhevkirina bêjeyên ku bi tîpa “r” yê dest pê dîkin radigihîne û dîsa ji xwendevanan tika dike ku bêjeyên kurdî yên bi vê tîpê dest pê dîkin ji wan ra bişînin (1946: 31). Herçend em di hejmarên din da rastî nûçeyêke weha neyên jî dîyar e Îbrahîm Ehmed li derveyê kovarê di berhevkirina bêjeyên petî yên kurdî da di nav çalakîyan da bûye. Herweha di bin sernavê “Tika” yê da (h. 2, 1943: 56) li ser navê *Gelawêjê* tê diyarkirin ku Gîw Mukrîyanî li gelek cihên Kurdistanê digere û gelek bêjeyên nav hozên cîyawaz berhev dike, loma jî ji xwendevanan tê xwestin ku arîkarî bidinê. Tahir Behcet Merîwanî jî ji Amerîkayê gelek deqên tendirustî û pizîşkî ji *Gelawêjê* ra dişîne û di wê bawerîyê da ye ku ji bo

sarêjbûn/sererîzbûn/çikbûn, dayik/dak/dê/daye/dalk, cîyawazî, karî kiraw, bûnî/kirdinî, helbijardin, çaweriwanî, tole, tefrexwardin, dabezandin/dagirtin/hênane xwarewe, kinaçe/kenî, kişanewe, şikan/bezîn, keş, pîşesaz/pîşeger/pîşewer, gwênedan/xûnînegeyandin/feramoşkirdin (r. 53-56).

⁷ Kwêrewer, beş, sard/sar/sardûsir/çeyîk/çîyaw, be taybetî/nexwaze/nexwazela, be siruşt (bîltabî), birîsker, zîpik, ziryewan, nawcerg, tengûçeleme/tengane, zirzeyî, zirîçe/gum/berm, helim, rijd/berçawteng, ser/sereta/ berî, dahênan, batî/birîtî/cîyatî/pênaw, aşkira/dîyar, pexşîn/ pexşan, bej/zewî/wişkayî, barû, kelû, gopke, birûske, pît/birişt, bername, diyardan/derkewtin, mefrek/zerd, polke/gagoz, sade/text, ademzad, mizgînî/mijde, naşîrîn/kirêt/bêreza, beşêneyî/ le ser xo/ sist, bêkar/lat, petû/cacim/mewc, deskela/palewan/qareman, kelî, şarewanî, quwetdan/lirfedan/kawufdan/hellûşîn, ba, patal/ kewden, saxtman, tomanc, çwarpê, derxistin/diyardan/helriştin, xirman/coxîn, meyan, katenakati/carcare/carcar/carencarê (r. 53-56).

⁸ “Em bizûtnewe barkirdinêkî giştî (umûmî) bû ke le layen neteweyekî (qewmêkî) gewrewe des pê kirabû” (1940: 13).

peyda kirina navên nexweşîyan divê kurd ji pîrejin, pîremêr, gundî û hozên koçer sûd wergirin (1949: 5).

Tewfîq Wehbî û Huznî Mukrîyanî kovara *Dengî Gêtîy Tazeyê* jî dikin qada belavkirina bêjeyên kurdî yên petî û bi vê mebestê gelek bêjeyên weha di hejmarên cîyawaz ên vê kovarê da bi bergindên wan ên erebî di jêrenotan da rave dikin da ku ji aliyê xwendevanan ve bi hêsanî bîr famkîrin û bikaranîn⁹. Tewfîq Wehbî wek petîgerê

⁹ kelkhar: xizmetkar, kelk: xizmet, axawtin: qîse kirdin, çetirbaz (pereşûtkar), nûsyarî: îmla, be kelk hênan: îstîxdam, abûrî: iqtîsad (b. 1, h. 1, 1943: 11, 24, 44, 47), tomar kirdin: tescîlkirdin, heyî: hestî (b. 1, h. 2, 1943: 11, 16), girtûbend: zebt û rebt (b. 1, h. 3, 1943: 10), çeq: merkez, rêçkekêş: lokomotif, pişkinîn: teftîş (b. 1, h. 4, 1944: 3-6), sereta: mebdê, mebadî; siruşî siruşt: hatinî tebîet, şadot: emîre, pasar: sûr, hesar, herûher: îlelebed (b. 2, h. 1, 1944: 9, 21, 22, 53, 68), xwêndewarî: seqafe, serçawe: mesder, saman: serwet, jîrî: eqîl, pêşewa: zeîm, karname: meşru', firajîn: neşwunema, bîrî neteweyî: fikra qewmî, taf: zeman, ehd, bername: menhec, nwêner: mumesil, naib, wekîl; aşî: sulh, dwan: xutbe, desteber: we'd, nawend: wesîle, diruşm: şîar, helbijardin: intixab, ewreng: micîd, tenduristî: sihhe, bone: sebeb, xatir; silemînewe: teredud, zeryawan: behrî, xal: biray dayk, durge: cizîre, heterî: misrî, keştîgel: ustul, cêgeyî: meheli, kulk: hedef, pişanî: cebhe, hêl: xet, rext: cîhaz, birînkari: cerahî, barbu: miawenet, giring: muhim, beşdarekî: şîrke, herêm: mintiqe, abluqe: tetwîq, bazirganî, ticarî, pale: emele, dêrîne: asarê qedîme, kej: fêsl (b. 2, h. 2, 1944: 113, 114, 130, 135-139, 169, 171, 173-175, 185, 188), helgeran: tuxyan, serdem: zeman, pile: derece, xwast: meram, meqsed; çene: inad, lasalî: teqlîd, qedexê: men', çîman: çirpandin; hems, nihênî: sir, sirî; hîn, erame: filan, eşkence: ezab, spide: fecr, pişt: hîl, belên: we'd, hawpeyamekî: mixaberat, pişko, sikil: cemre, sûse: îstîla', direwş: elem, raye, berge: meqaweme, bej: ber, wuşkan, zeryaçê: behîre (b. 2, h. 3, 1944: 196, 201, 217-219, 223-224, 233, 253, 255, 278, 280-281, 283-284), zirî: dir', be nizîke: teqrîben, bê çen û çon: bila qeyd û şert, bîrewerî: zikrî, teratên: sîbaq, hestî kesî: şîurul şexsî, rêkî: nîzam (b. 2, h. 4, 1944: 315-317, 346, 349), dagîr kiran: xezwe, berg: cild, molbestin: teh'd, asîb: musîbe (b. 2, h. 5, 1944: 385-386, 390, 420), şeqhawêj: enwarul keşafe, nakawî: ficeten, çawlêbûn: muşahid (b. 2, h. 6, 1944: 494, 499), tewere: mîhwer, destawêz: sened, mizewer: mustexdem (b. 3, h. 1, 1944: 18, 20, 22), burbun: feşel, faşîlbûn; keleme: tewq, qeyd, taratên: musabeqe (b. 3, h. 2, 1944: 169, 180), damezrawî: muesese, taqî kirdnewe: tecrîbe, bînewaçeyî: lamerkezî, ho, bone, sune: sebeb, gencîne: xezîne, text: mustewî, padaşt: ceza, ramalîn: iktîsah, wey: qeza we qeder, nuqlane: et-tefaulu bî'lkeyr; wêran: cesare, cerae; cext: tekîd, jêrzerya: xewase, gîjker, hîrker: muxeddir, çîn: tebeqe, xwêndewar: museqef, bac: zerîbe (b. 3, h. 3, 1944: 201-202, 207, 264, 276, 279, 281-282), pêniwandîn: mucîze, dirîk: tarîx, firman: emel, wezîfe; perawêz: haşîye, nîrx: semen, qîmet, si'r; zanyar: melumat, şepol: mewe, tirkize: xeter, gorînewe: mubadele, kiryar: muşterî, firoşyar: baî', fiz: tekbir, liware: mihamî, barbu: pîtak, iane, sûd: renc, faide; girîman: ferezen, mize: ucre, temen, rist: umir (377), belge: delîl, meyane: muedel (b. 3, h. 4, 1944: 297, 305, 309, 332, 334, 367, 370, 377-378), kemayetî: eqîlîye, serpişk: hikum, şêwaz: usul, rewîşt: tebîet, xû: exlaq, kirdewe: emel, şûreyî: eyb (b. 3, h. 5, 1945: 440, 474-475), pîrsyar: sual; dildar, dilxwaz: aşîq, meşuqe; sede: esir, qern; bakûr: şîmal, sitemkar: zalim, akam: acl, nîwîşk: zubde, mexzî, xulase, nihifte, kokirdnewe: zexîre kirdin, birîtî: îbaret, koşk: qesr, nîgar: suret, neqş, bextyarî: seadet, bawer: eqîde, îman, gîyan, rewan: ruh, egîna: wala, mize: kirê, icare (b. 3, h. 6, 1945: 486-487, 525, 532), wata: ye'nî, liware: qanûn, şorişî bîr: sewre fikrîye, yeke: wehde, dagîr kiran: ihtilal, bere: hizb, çarenûs: mesîr, rêz: hurmet (b. 4, h. 1, 1945: 68-69, 71-72, 76), bezîn, helatin: inhizam, inkisar; dad: edl, nemir: xalid, tolesendînewe: intiqam, azadî tenyakes: azadiya ferdî, rêşman: zewî (b. 4, h. 2, 1945: 121-123, 154), bar: wez', biwar: mecîrî, amanc: hedef, xaye, binebiraw kirdin: imha we efna, fermanderî: qîyade, binke: qaide, pope: zirwe, pîrse: tezîye (b. 4, h. 3, 1945: 244, 246-248, 257), fermandeyî: qîyade, endamêtî: eluzwîye, damezrayî: muesese, menzeme, dijwarî: muşkile, sinûr: hidud, ciyawazî: ferq, ixtilaf, hemîşe: daîmî, paye: mensib, rutbe, dahênan: ixtira' (b. 4, h. 4, 1945: 330, 352-354, 377), siruşt: tebîet, aram: sebir, kelkhar: xizmetkar, xadim; şermezarî: xecil, sûç: qebahe, hel: firset, herêm: menteqe, ayînde: musteqbel, biryar: qerar; bineret, binaxe: esas, pêgeyandin: intac, kereste: mewa, hokirdnewe: tewîz (b. 4, h. 5, 1945: 421-422, 427, 468-469), tase: elîştîyaq; dildar, xoşewîst, dilxwaz: hebîb, kirok: lub (b.

herî giring ê vê serdemê, di çend nivîsarên xwe yêrên vê kovarê da li ser çavkanîyên bêjeyên xwe yêrên petî agahî dide û rêbaza xwe ya petîgerîyê rontir dike. Ji van nivîsaran em derdixin ku sê çavkanîyên wî yêrên destnîşankirina bêjeyên petî hene. Çavkanîya wî ya pêşî zar û şêwezarên din ên kurdî ye ku di mînaka bêjeya “bakûr” ê da dîyar dike ku çend sal berê dema vê bêjeyê bi kar tîne, helayek tê rakirin lê ew vê bêjeyê ji kurdên bakur werdigire ne ku li ber xwe çê dike. Çavkanîya wî ya duyem analojî ye ku di mînaka bêjeya “nîwero” yê da (cinûb) hizira vê bêjeyê ji zimanên ewropayî werdigire û dîyar dike ku “mîdî”ya fransî û “mezu curnu”ya îtalî jî heman manaya “nîwero”yê didin û bûne zaraveyên cihgirtî (1943: 44). Çavkanîya wî ya sêyem jî vejandina bêjeyên kevin ên kurdî ye ku reha wan digihîjîne heta avestayî yan jî zimanên din ên malbata hînd-ewropayî. Ji bo vê em dikarin vekolîna wî ya li ser bêjeyên “pîspor, azad, aza, zat, şareza (1943: 37-39), gemaro, kam, dozîn û puzîşt”ê bidin (1944: 21-24) ku reha wan di nav çavkanîyên navborî da destnîşan dike û guherînên wan ên dengî û manayî berbiçav dike.

Ji ber vê rol û xebata wî di tevgera petîkirina kurdî da, Edmonds piştî ku pesnê *Dengî Gêtiy Tazeyê* dide bi giringî behsa rola Tewfîq Wehbî Begî dike ku li hember teasuba melayên kurd ên li dijî kurdîya petî, bergirîyeke baş dike û wî hêjayê wê yekê dibîne ku hemû kurd sipasîya wî bikin (1945: 56). T. Dilpak jî di nivîsareke xwe ya vê kovarê da behsa xizmeta mezin a *Dengî Gêtiy Tazeyê* dike ku hêz dide nivîsîna kurdîya petî û vebijartina zimanî ji bêjeyên bîyanî. Herçend bal bikêşe ser hin zehmetîyên têngihîştinê jî bi hêvî ye ku dê hêdî hêdî bêjeyên petî yêrên kurdî şûna bêjeyên bîyanî bigirin û xwendevan jî li van bêjeyên nû rabihên (1945: 151).

Gîw Mukrîyanî û kovara wî ya *Hetawê* jî parçeyeke giring a tevgera petîkirina kurdî ne. Gîw Mukrîyanî bi rêya ferhengokê nebe jî bêjeyên petî yêrên ku nû di çapemenîyê da tên bikaranîn bi piranî di nav kevanekê da di gel erebîyên wan dide da ku xwendevanan hînî wan bike. Çend mînak ji van bêjeyan weha ne: “bîrewerî (hafîze), pîzîşkî (tebabe), amojgarî (nesîhe), xewtiname (tebîrî ruya) (h. 1, 1954: 6, 8, 16, 20), kirdar (ji bo pratîkê) (h. 3, 1954: 10), paçve (terceme), zarawe (istîlah), biwêj (şair), wêje (eledeb), wêjewan (edîb), bîrkem/tûle (nefs), miro (beşer), abadî (mektûb),

4, h. 6, 1945: 507, 516), pend: ibret, nesîhe; behane: hucet, cûr: mîsal, padaşt: ceza, mirokî: insanîye, şaristanî: medenîyet, asayîşt: selm, dêrîne: asar, bextkirdin: serf (b. 5, h. 1, 1945: 20, 22, 23-24).

aşik/perîjang (me'de), pîtol (feylesof), pis (cenin), mere/bawre (pizhal), xort (azeb), sêwî (yetîm) başûr (cunub), bakûr (şîmal), rawêj (lehçe), civat (meclis), berwar (tarîx), mêjû (îlmultarîx), kelanterî (daîre şurte), daroxe (muawwînu'ş-şurte), gizîr (mufewwîdu'ş-şurte), tengeçerî (şurte), serkirde (zabit), herêm (menteqe) kirk (telefon), sera (daîrel hikume), rajo (nukte), mişext (mihacir), birok (senaya), dirok (riba'î) (h. 5, 1954: 10), dadî komelayetî (h. 7, 1954: 6), binyat (esil) (h. 15, 1954: 2), nexşe (xerîte) (h. 25, 1955: 3), girohêkî zanistî (mecme'l îlmî) (h. 30, 1955: 2), bergirî (dîfa'), bafî (heqî) (h. 43, 1955: 6), bafte (heq) (h. 44, 1955: 1), karîgertirîn (h. 80, 1956: 19), wane (ders) (h. 90, 1957: 16)".

Ji bilî van bêjeyan di hejmara 9ê da di bin navê "Nawî Mangekanî Kurdî Ewanen" ê da navên werz û mehên salê yên kurdî yên petî dide û carinan ji bo navê mehekê çend bêjeyên cîyawaz ên nav xelkî li dû hev rêz dike: "Behar: 1. newroz, xakelêwe (nîsan), 2. gulan, banemer, şêstebaran (mayîs), 3. cozerdan, bextebaran, baranbiran (huzeyran). Hawîn: 4. coxînan (temûz), 5. gelawêj (axustos), 6. mîwegenan (eylul). Payîz: 7. rezber, hewelpayîz (teşrînî ewel), 8. pûşper (teşrînî sanî), 9. xezelwer, gelarêzan (kanûnî ewel). Zistan: 10. çile, sermawez (kanûnî sanî), 11. Rêbendan (şubat), 12 reşeme (mart)" (h. 9, 1954: 7).

Di hejmara 127ê da bi hin guherînên biçûk careke din navên werz û mehên salê weha rêz dike: "Behar: 1. newroz, xakelêwe, axelêwe, axlêv, darpişkêw, hermîpişkuwan, 2. gulan, şêstebaran, baneser, hêlaneme, 3. bextebaran, cozerdan, baranbiran, baranweşan (h. 127, 1958: 31). Hawîn: 1. coxînan, pûşkal, zexîran, xezîran, 2. mîwegenan, gelawêj, tîrme, sernîsang, 3. pûşper, tebax. Payîz: 1. rezber, hewelpayîz, îlon, 2. gelarêzan, xezelwer, baranpel û çirya pêşî, 3. sermawez, berûbez, girdoz, kewberdar, çirya paşî. Zistan: 1. befrenbar, darwer, hewelzistan, kanûna pêşî, 2. rêbendan, çileşor, kanûna paşî, 3. reşeme, mêşper, bazeberan (h. 127, 1958: 32)". Dîyar e, Gîw Mukrîyanî bi rêya berhevkarîya nav gelî her dema ku navên nû yên mehan bihîstîye lê zêde kirîye û listeya xwe nûjen kirîye.

Gîw Mukrîyanî wek çaksazekî giring ê zimanê kurdî hewl ku dide tevgera kurdîya petî hemû qadên jîyanê vegire. Bi vê mebestê ji bo ku helbestvanên kurd di şûna naznavên bîyanî da yên kurdî hîlbijêrin listeyek naznavên helbestvanên hevdemî diweşîne ku di rêza yekem da "navên nû", di rêza duyem da "yên kevin" û di rêza

sêyem da jî navên bajarên wan hene. Di vê çarçoveyê da Necmedîn dibe Arî, Muxlis dibe Aware, Faiq dibe Bextyar, Cemîl dibe Bendî, Reşîd dibe Bêçare, Mezher dibe Bîdar, Faiq dibe Bêkes, Exul dibe Bênewa, Racî dibe Jîko, Heme dibe Cengî, Safî dibe Xakî, Qani dibe Xesrew, Xerqî dibe Xoşrû, Xîdok dibe Damaw, Xîzir dibe Deştî, Nûrî dibe Dilsoz, Kemal dibe Zal, Selam dibe Zamar, Qasim dibe Selam, Perîzad dibe Jîyan, Medhoş dibe Sersam, Sefwet dibe Şêwaw, Fanî dibe Kake, Natiq dibe Mestî, Bedî dibe Mehî, Ehmed Beg dibe Herdî (h. 46, 1955: 14) ku gelek ji wan helbestvanên navdar ên Kurdistanê Başûr û Rojhilatê ne.

Ji ber vê têgihîştinê hin nivîskarên mîna Yusif Rehîl di *Hetawê* da bang li xwendevanan dikin ku arîkarîya wan bikin û bergindên bêjeyên erebî yên mîna “qatil, qare, îmtîyaz, hikumet, xîret, fiemanîlah, felsefe û seyare” yê jê ra bişînin (Rehîl, 1957: 14). Herweha Gîw Mukrîyanî rexne li wan kesan digire ku hewldanên petîkirina Tewfîq Wehbî fam nakin û bê ku bizanin di şûna bêjeya “muhîm” ê da bêjeya “giring” ê ji kîjan tîre û hoza Kurdistanê wergirtîye, bê şermane û zarokane dîyar dikin ku di ber xwe da dariştîye û kes nizane ji ku anîye (Hetaw, 1956: 19). Tevî vê, dariştina bêjeyan tiştekî asayî dibîne û di nivîsareke xwe da dîyar dike ku bêjeyên “wêje” û “biwêj” ê ji aliyê wî ve hatine dariştin (Hetaw: 1958: 4-5) û bêjeya “kovar” ê ji cara pêşî wan di *Zarî Kirmancîyê* da dahênaye (G.M., 1958: 23).

Bêguman di pêvajoya petîkirina zimanî da ji bilî berhevkarîya nav gelî û dariştinê, hin bêje carinan bi tevahî ji ber şaş-têgihîştinê belav dibin ku bikaranîna bêjeya “berwar” ê di şûna “tarîx” ê da mîna bîlêş a vê yekê ye. Li gor veguhestina Hassanpourî ji Zebîhî di 1943yê da dema ku li Tebrîzê bi karê çapkirina *Nîştîmanê* ra mijûl dibe *Roja Nûya* Kamran Bedirxanî bi destê wî dikeve û dema di dawîya gotarekê da piştî navê nivîskarî “Berwarî R. R. 1943” dibîne dibêje qey ev “berwarî” herwek bikaranîna farisî “be tarîxî” ye. Ji ber vê navborî bêjeya “berwarî” yê wek “tarîxî” yê fam dike û vê bêjeyê weha bi kar tîne. (Hassanpour, 2005: 569-570). Ji ber vê di gelek weşanan da ev bêje bi vê manayê belav dibe ku di eslê xwe da tu peywendîya wê bi “tarîx/date” ê nîne û wek xeleteke meşhûr belav dibe.

Tewfîq Wehbî di nivîsareke xwe ya *Pêşkewtinê* da (1958) vê yekê bi têhnîbûna kurdan a bêjeyên petî ve girê dide ku li ser navê petîgerîyê çî bikeve ber wan hildimijin. Wehbî wek plandanerekî giring ê zimanê kurdî, vê helwestê rast nabîne û ji bo

wergirtin û bikarxistina bêjeyên petî zanîna rêziman, zimanên îranî yên kevin û nû û zimanên hînd û ewropayî pêwîst dizane. Ji bilî vê, wergirtina bêjeyên petî ji şeweyên din ên kurdî jî rast dibîne lê pêşnîyaz dike ku kesên ku bi vî karî rabin divê mana û bikaranîna van bêjeyan di van şeweyan da baş vekolin û wan bi rastî veguhêzin. Ji bo rêgirtina vê metirsîyê û destnîşankirina bêjeyên rast û dirust rêbazeke weha pêşnîyaz dike:

(1) Divê çavkanîya bêjeya ku ji şeweyên din tê wergirtin bê diyarkirin û mînakên bikaranîna wê di nav çend risteyan da bê nîşandan, (2) Eger bêje ji zimanekî bîyanî hatibe wergirtin divê ev ziman bê destnîşankirin, (3) Bêje eger dariştî be; (a) divê reh û çavkanîya wê bê zanîn, (b) qayîdeya dariştina wê ya rêzimanî bê destnîşankirin (c) eger bi endaze yan çavlêkerîya bêjeyeke din hatibe dariştin, divê ew bêje bê diyarkirin. Li ser vê bingehe bang li xwendevanan dike ku dema bêjeyeke nû bibihîzin van pîvanan li ber çavan bigirin û wan bêjeyan li vê bêjîngê bixin û eger ji nav derneketin jî dikarin ji kovara *Pêşkewtinê* ra binivîsin û ew dê wan bêjeyan bi vî awayî binirxîne (2002: 340-342).

Piştî rûdana 14ê Tîrmehê ya 1958ê û ragihandina Komara Îraqê derfetên baştir dikeve destê kurdan û di çarçoveya azadîya demkî û geşbûna hestên neteweyî da tevgera petîgerîyê jî bi xurtî dewam dike. Ji ber vê, nûnerên vê têgihîştinê bi awayekî radîkaltir hewl didin hemû bêjeyên erebî yên ku di zimanê kurdî da cih girtîye, ji nav zimanê kurdî derxin. Mirov dikare bibêje ku kovara *Rojî Nwê* ku di navbera 1960-1961ê da derdikeve mînakeke tîpîk a vê qonaxê ye. Herwek *Gelawêjê* di her çar hejmarên pêşî yên *Rojî Nwê* da di bin sernavê “Ferhengî Rojî Nwê” da Umer Ebdulrehîm cih dide bêjeyên petî yên kurdî ku di her sê hejmarên pêşî da her carê 40 bêje û di hejmara çarem da jî 34 bêje cih digirin.

Di hejmara pêşî da bêjeyên “heledawan, qelaço, cêgorkê, belên, jiwan, wurujandin, serpêyî, reben, dûx, hat (şans), nehatî (negbet), şîkirdnewe (tehlîl), teşene, dayenge, paşbend (qafîye), berperç (red), berpirsyar, jimaryar, aferîde, dilnewayî (terzîye), puzîşt (mezeret), destber (kefil), biwardan (terk), pêşeng, yaxî (asî), şîgîr (esebî), helwêste (weqefe)” (Ebdulrehîm, 1960: 65), di hejmara duyem da bêjeyên “kuştîyar (qesab), diyardî (te’yîn), peraw (kitab), pertûk (defter), pênuş (qelem), tîyanûş (kaxez), dox (hal), bixur, bikuj, geşe, bangawaz, bizan (arif), nawekî, nawejû,

dij, wêne (suret), nîgar (resim)” (Ebdulrehîm, 1960: 14), di hejmara sêyem da bêjeyên wek “wutar, wutarbêj (xetîb), honrawe (şî’r), honer (şair), huner (fen), hunerwer (fennan), lar (maîl), hawser, werz (mewsim), werziş, werzişyar, bazine, aramge, bone (munasebe), pexşan (nesr), demdemî, rave (şerh), pişû (istirhet), peyker” (Ebdulrehîm, 1960: 94) û di hejmara çarem da jî bêjeyên wek “şoriş, bername (menhec), pirsyar (saîl), şîyaw (layîq), neşîyaw, kor (meclis), kost (karese), barimte (rehîn), dîdwan (keşaf), peyam, bangêşt, lêburdin” (Ebdulrehîm, 1960: 91) mînakên balkêş ên vê radîkalîzma petîgerîyê ne.

Li ser vê şopê Baxewanê ku nivîskarekî *Rojî Nwê* ye herçend li hember lezûbeza hewldana petîgerîyê û asta bilind a weşanên kurdî kêfxweşîya xwe derbibire jî, li hember zimanê paqij ê mirovên gundî rexne li zimanên fermanber û xwendayên bajarî digire ku di şûna bêjeyên petî yên kurdî da bêjeyên erebî di axaftina xwe da bi kar tînin. Li gor wî li ser zimanê mirovên weha di şûna bêjeya “bax”ê da “hedîqe”, di şûna “çaweriwanî”yê da “întîzar”, û di şûna “şeqam”ê da jî “şari”a erebî tê bihîstin. Loma jî vê yekê wek nakokî dibîne û doza wê yekê dike ku çawa di nivîsînê da ziman tê vebijartin divê di axaftinê da jî heman kar bê kirin. Ji bo berbiçavkirina vê rewşê risteyeke fermanberekî fermî vediguhêze ku bi bêjeyên erebî dagirtî ye: “Lutfen îstirahet bike ta warid e ekrê û tedqîqî ewraq ekem be pêy eqindar ew miqdare def bike ke ebê be kefil mutehid inca tesdîq ebê” (Baxewan: 1961: 38-39).

Di encamê da em dikarin bibêjin ku tevî hemû kêşe û kêmasîyên xwe, tevgera petîkirina zimanê kurdî herwek piranîya neteweyên cîhanê muhra xwe li kurdîya modern dixe ku rexnegirên wê jî nikarin xwe ji rastîya wê dûr bigirin. Ji bo nîşandana serkeftina tevgera petîgerîyê Jamal Jalal Abdulla di xebata xwe ya *Some Aspect of Language Purism Among Kurdish Speakers*ê (Çend Alîyên Petîgerîya Zimanî di nav Axiverên Kurdî da) da ji 1924ê heta 1973yê di sê qonaxan da bi rêya şîkarîya daneyî (data analysis) ya deqên nivîskî rewta petîgerîya zimanê kurdî bi ronî berbiçav dike. Abdulla, di navbera 1924-1938ê da li ser 26 deqên kurt ên qadên curbicur şîkarîya daneyî dike û ji nav 1992 bêjeyan 926 bêjeyên deynkirî destnîşan dike ku rêjeya wan dike ji sedî 46, 48 (1980, 24-71), di navbera 1939-1958ê şîkarîya 20 deqan dike û ji nav 1158 bêjeyan 111 bêjeyên deynkirî dibîne ku rêjeya wan dike ji sedî 9. 58 (1980: 119-132), herî dawî ji 1958ê heta 1973yê li ser 20 deqên rojname, kovar, pirtûkên giştî û pirtûkên perwerdeyê kar dike û ji nav 941 bêjeyan 42 bêjeyên deynkirî destnîşan

dike ku rêjeya wan jî dike ji sedî 4,46 (1980: 171-178). Ev pêşketin, serkeftineke aşkera ya tevgera kurdîya petî ye ku li ser destê plandanerên zimanî, helbestvan, nivîskar û weşangeran zimanê kurdî ji bin karîgerîya zimanê serdest (erebî) heta radeyeke baş tê derxistin û bi rêya çavkanîyên xwe yên xwemalî tê geşkirin.

2.2.2. Gengeşeyên li ser Alfabeya Latînî û Çaksazîya Alfabeya Erebi

Kêmasîyên alfabeya erebî û pêşnîyazên derbazbûna alfabeya latînî, yek ji encamên karîgerîya modernîteya ewropayî ye ku di Serdema Tenzîmatê da di nav ronakbîrên Osmanî da serî hildide. Rengvedana vê em di weşanên kurdî yên piştî Meşrûtiyeta Duyem da di kovarên *Rojî Kurd* û *Hetawî Kurdê* da dibînin. Em dikarin bibêjin ku ji wê serdemê ve di nav ronakbîrên kurd da du araste derdikevin pêş ku arasteya yekem alîgirên alfabeya latînî ne û arasteya duyem jî alîgirên guncandin û çaksazîya alfabeya erebî ne li zimanê kurdî. Raya yekem hêsanbûna alfabeya latînî û raya duyem jî berdewamîya nerîta dirêj a alfabeya erebî û hestiyariyên dinî wek delîl derdixin pêş. Ji ber vê cara pêşî bi destpêşxerîya Xelîl Xeyalî li gor hin pêwîstîyên zimanê kurdî di alfabeya erebî da çaksazî tê kirin (1909) û bi danîna îşareteke taybetî (A) li ser tîpên “ق” û “ی” yê kêşeya tevlihevkirina dengên “î-ê” û “û/u-o” yê tîp çareser kirin (Mutkî, 2004: 15).

Bi parçebûna Dewleta Osmanî û bi hatina îngilîzan bo Îraqê careke din alfabeya latînî dikeve rojevê. Îngilîz di serî da piştgirî didin wê yekê ku alfabeya latînî di nav kurdan da belav bibe. Ji ber vê di wê serdemê da E. B. Soane di pirtûka xwe ya *Elementary Kurmanji Grammarê* da (1919) deqên kurdî bi tîpên latînî dinivîse û bi piştgirîya wî û Captain W. J. Farrellî ku her du jî xebatkarên sefareta Îngiltereyê ne, Muhammed Zaki Effendî (Mihemed Emîn Zekî Efendî) û Mirza Muhammed Bashka (Mîrza Mihemed Başqe) bi navê *Kitab i Awalamin i Qiraat i Kurdiyê* (Kîtabî Ewelînî Qiraetî Kurdî) di sala 1920ê da alfabeyeke kurdî ya latînî pêşnîyaz dîkin. Ev alfabeya ku bi tirkî û farîsî tê nasandin (Kurdceyî Latîn Hirufatiyle Yazmaq Usulu / Qewaid Berayê Nuvîštenê Zebanê Kurdî ba Hirufê Zebanê Latînî) ji 24 tîpan pêk tê (a, b, c, d, e, f, g, h, i, j, k, l, m, n, o, p, q, r, s, t, u, w, y, z) (1920: 3-6) û bi rêya du tîpan jî (ch, dh, gh, kh, sh, th, zh) temsîla 7 dengên din lê tê zêdekirin (1920: 8,10). Herweha di bin navê “dangî raqq û narm”ê da jî tê dîyarkirin ku eger xalek di bin tîpên “r, l, h”yê da bê danîn tîpên stûr ên “ر”, “ل” û “ح”yê tîp bidestxistin (1920: 13-14). Bi vî awayî 34

deng tên wênekirin û di bin sernavê “Usul i Taalim Bo Mualliman”ê da bi 14 dersan ev alfabe tê nasandin (1920: 20-30).

Projeya Soaneyî ya “kurdî be herfî latînî nûsîn” ê, di 1921ê da bi çûna wî têk diçe (Pîrot, 1925: 11) û bi avakirina Komara Îraqê ji bo ku kurd bi Bexdadê ve bîn girêdan hem îngilîz dest ji piştevanîya latînîkirinê dikêşin hem jî karbidestên Îraqê bi tundî li dijî vê pêşniyazê radiwestin da ku hesta xwecudadîtîne di nav kurdan da bihêz nebe. Lê kesên wek Pîrotî ji ber arîbûna kurdan û xwenêzîkkirina Ewropayê berdewam piştgirîya derbazbûna alfabeya latînî dikin û ji bo nasîna ziman û edebîyata kurdî li Rojavayê, derbazbûna alfabeya latînî karekî pêwîst û giring didin zanîn (Pîrot, 1925: 9-11). Em ji Merûf Ciyawukî hîn dibin ku di wan salan da Tewfîq Wehbî, Îsmâîl Heqî Şaweys û dostê kurdan Major Edmonds piştevanên dîyar ên alfabeya latînî ne (1930: 9). Ji ber vê Tewfîq Wehbî wek destpêşxerîyeke şexsî di sala 1933yê da bi weşandina xebata xwe ya *Xwêndewarî Baw* alfabeya xwe ya latînî dinasîne û bi lêzedekirina du tîpan (v, x) li ser alfabeya Mihemed Emîn Zekî Efendî û Mîrza Mihemed Başqeyî alfabeyeke 26 tîpî pêşniyaz dike.¹⁰ Ew jî herwek xebata berê modela îngilîzî ji xwe ra dike bingeş, loma jî ji bo nîşandana pênc dengên din ên kurdî bi lêkdana du tîpan dengên “sh (ش), lh (ل), ch (چ), rh (ر), gh (غ)” ê destnîşan dike (1933: 2).

Di 1950yan da Cemal Nebez careke din alfabeya latînî tîne rojeva kurdên Başûrê û herwek Celadet Bedirxanî ji bo yekîtiya zimanê kurdî alfabeya hevbeş yek ji karên herî giring û pêşneyî dide zanîn û ji bo vê jî alfabeya Celadet Bedirxanî pêşniyaz dike. Ji bo vê behsa hevdiîna xwe û Osman Sebrî ya li Lubnanê (1956) dike ku li ser pêşniyaza Osman Sebrî li hev dikin ku alfabeya Celadet Bedirxanî bi hin destkarîyan (danîna du xalan li ser tîpên “r” û “l”yê çêkirina “r” û “l”yên stûr) ji aliyê hemû kurdan ve bê qebûlkirin. (Nebez, 1957: h-z). Ji ber vê Nebez di xebata xwe ya *Nûsînî Kurdî be Latînîyê* da li ser “l, r, h û x”yê du xal datîne¹¹ û alfabeyeke latînî ya 35 tîpî pêşniyaz dike (Nebez, 1957: 1).¹² Li ser vê rêçê sê sal paşê Gîw Mukrîyanî bi xebata xwe ya *Elfûbêy Kurdî Wênedar be Tîpî Latînîyê* van pêşniyazên Nebezî pesend dike û ew jî alfabeya latînî ya 35 tîpî di gel mînak û wêneyan di xebata xwe da dinasîne (2572: 32).

¹⁰ a, b, c, d, e, f, g, h, i, j, k, l, m, n, o, p, q, r, s, t, u, v, w, x, y, z (1933: 1).

¹¹ Celadet Bedirxan “ح” û “غ”ê wek du tîpên cuda qebûl neke jî di nasandina alfabeya xwe da du xal li ser van tîpan datîne (Hawar, 1932: h. 1, r. 3).

¹² Cemal Nebez di xebata xwe ya *Zimanî Yekgirtûy Kurdîyê* da dengê “ö”yê jî li alfabeya latînî ya kurdî zêde dike û ji bilî “غ”ê li ser tîpên “h, l, r”yê îşareta çûkleyê (v)yê datîne (1976: 88-89).

Tevî van hewldanên giring, dewleta Îraqê bi hinceta muxalefeta “alfabeya pîroz a dînê îslamê” (Nebez, 2008: 77) van destpêşxerîyan red dike û nahêle kurdên Îraqê derbazî alfabeya latînî bibin. Hêjayê gotinê ye ku hinek kurd jî dikevin bin karîgerîya vê sîyasetê û pesendkirina alfabeya latînî wek rêgirîyekê dibînin li hember xwendin û hînbûna Quranê. Bo nimûne di rojnameya *Dîyarî Kurdistanê* da dema kesên mîna Pîrot û Heqî Şawesî piştevanîya alfabeya latînî yan jî destkarîya alfabeya erebî dikin bi rêya nameyekê kesekî bi navê Husên Kurdistanî ji Rewandizê muslumanbûna kurdan, pêwîstîya xwendina Quranê û çavnasîya kurdan a alfabeya erebî wek delîl derdixe pêş û destjêberdana vê nerîtê tiştê baş nizane (1926: 8-9). Çend sal paşê Merûf Ciyawuk jî bal dikêşe ser heman hokaran, guherîna alfabeya erebî baş nabîne û dîyar dike ku ev hewldan dê serî negire (1930: 10).

Ji ber vê rewşê tenê alternatîfa duyem li ber destê kurdan dimîne ku ew jî çaksazîya alfabeya erebî ye.¹³ Herçend Tewfîq Wehbî alfabeyeke latînî daîne û demeke dirêj alîgirîya vê alfabeyê bike jî bi çavekî zanistî dîyar dike ku derûdora kurdan ji wan neteweyan pêk tê ku çî samî bin çî jî arî hemû alfabeya erebî bi kar tînin û kurd alfabeyeke din bi kar biînin jî neçar in ku vê alfabeyê bizanin. Jixwe piştî vekolînên xwe yê li ser alfabeyên farisî, tirkî, belûçî, afxanî, hindî û malayayî digihîje wê encamê ku kurd kîjan alfabeyê qebûl bikin jî divê ji bo dengên taybetî yê kurdî hin tîpên nû dahênin (1925: 5/6). Ji bo vê mînaka farsan dide ku piştî muslumanbûnê ji bo nîşandana dengên zimanê xwe tîpên “p, ç, j, g”yê li alfabeya erebî zêde dikin û vê alfabeyê li zimanên xwe diguncînin. Wek destpêka çaksazîya alfabeya erebî dîyar dike ku tîpên “ث”, “ح”, “ط”, “ظ”, “ص”, “ض”, “ذ”, “ع”, “غ”ê taybet in bi zimanê erebî û neteweyên nesamî “ث”, “ص”ê wek “س”ê, “ط” û “ض”ê wek “ز”yê, “ط”yê wek “ت”yê, “ح”yê wek “ه”yê, “ع”ê carinan wek “ل”ê carinan jî wek “ع”êke sivik, “ق”yê wek “غ”, “خ”yê yan jî wek “ق”yêke sivik bi lêv dikin (1925: 6/5-6).

Li ser vê zemînê Tewfîq Wehbî di destpêka 1920an da li ser çaksazîya alfabeya erebî kar dike lê herwek alfabeya latînî, çaksazîya alfabeya erebî jî wek dijayetîya dîn

¹³ Di nav weşanên Başûrê da pêwîstîya çaksazîya vê alfabeyê cara pêşî di *Pêşkewtinê* da ji aliyê M. Nûrî ve tê dîyarkirin û navborî dide xuyakirin ku di zimanê kurdî da hin tîp hene ku xwendin û nivîsîna wan ji hev cuda ne û ji bo vê jî tîpên “l, r, d, n, w, f, û î”yê destnîşan dike û ji şarezayên zimanî dixwaze ku nîşaneyêke cîyaker ji bo van tîpan daînin da ku bi hêsani ji hev bîr veqetandin (Nûrî, 1920: 3-4).

û Quranê tê dîtin û Wezareta Perwerdeyê ya Îraqê ji ber destkarîya di alfabeya erebî da rêzimana wî çap nake (2022: 343). Tevî vê rêgirîyê, Wehbî di sala 1929ê da bi xebata xwe ya *Destûrî Zimanî Kurdî* vê çaksazîyê pêk tîne û alfabeyeke 35 tîpî ya kurdî-erebî datîne. Di vê alfabeya destkarîkirî da ji bo ku tîpên dengdêr wek kîteyeke serbixwe bîna nivîsîn hemzeyê (ء) wek tîpa yekem destnîşan dike û ji bo nîşandana dengê “ê”yê tîpa (ئ)yê, û ji bo dengê “o”yê jî xêzek li ser “و”ê datîne. Herweha ji bo nîşandana “ر” û “ل”yên stûr jî xalek li ser van tîpan datîne. Herçend îro neyên bikaranîn jî ji bo nîşandana dengê “i”yê tîpa (ي)yê û ji bo nîşandana “ت” û “د”yên sivik jî xalek li bin van her du tîpan datîne (1929: 2). Bi vî awayî tîpên “ث”, “ط”, “ظ”, “ص”, “ض”yê ji kurdî diavêje û kêma zêde alfabeya kurdî-erebî ya destkarîkirî ya modern a îro destnîşan dike. Lê ji ber nebûna van îşaretan li çapxaneyan û redkirina destkarîkirina alfabeya erebî ji aliyê dezgehên fermî yên Îraqê ve ev tîp heta 1950yan jî di weşanên kurdî da nayên cihbicihkirin. Di serdema komarî da ev pêşniyaz bi hin guherînan ji aliyê Wezareta Perwerdeyê ve tên qebûlîkirin (Hassanpour, 2005: 517) û çaksazîya alfabeya erebî ji bo zimanê kurdî cihê xwe digire.

2.2.3. Destnîşankirina Rêzikên Rênivîsê

Li gor zanyariyên me cara pêşî Mamosta Heqî Şaweys mijara rênivîsê bi çend nivîsarên xwe yên rojnameya *Diyarî Kurdistanê* tîne rojevê. Bi raya wî ji bo pêşketina zimanê rênivîs wek “meseleya jîyan û mirinê” ye û bi tîp û qayîdeyên zimanê erebî rênivîsa kurdî mumkîn nabîne. Tevî vê di du hejmarên rojnameya navborî da di bin sernavê “Îmlay Kurdî û Hirûfatî Erebi”yê da bal dikêşe ser çend xalên giring ên alfabeya kurdî ku peywendîya wan bi rênivîsê heye. Şaweys di vê mijarê da 11 xalan destnîşan dike ku kurteya wan weha ye:

1. “Tenwîn” taybet e bi erebî û divê di kurdî da tenê bi “n”yekê bê nivîsîn.
2. “Şedde” di kurdî da nîne, ji ber vê ev tîp yan divê sivik bîna xwendin yan jî tenê carekê bîna xwendin û nivîsîn.
3. Hemze (ء) di kurdî da nîne û divê di şûna wê da “ى” bê nivîsîn.
4. “ى” û “ة” di kurdî da nînin û divê di şûna “ى” da “إ” û di şûna “ة”yê da jî “ه” bê nivîsîn (Şaweys, 1925: 8/7-9).

6. Divê xalên li ser tîpan bên kêmkirin û di şûna wan da nîşaneyên taybetî bên destnîşankirin. Ev yek, dê hem ji bo nivîsînê hem jî ji bo çapkirinê hêsanîyê çê bike.

7. Tîpên erebî hin jê biçûk û hin jî mezin tên nivîsîn û ev taybetmendî, ciwanîya nivîsînê xirab dike. Ji ber vê divê hemû tîpên alfabeyê bi awayekî bên nivîsîn.

8. Ji ber şêwaza likandina (pevnivîsîn) tîpên erebî carinan ev tîp bi awayekî gelek ecêb û xerîb tên nivîsîn, divê çareyek ji vê ra bê dîtin û bi awayekî xweşiktir bên nivîsîn.

9. Ji bo xwendina tîpên dengdêr herekeyên “jêr”, “jor” û “pêş”ê têr nakin û divê ev kêşe bê çareserkirin.

10. Gelek dengên sivik ên mîna “ه, گ, ک, س, ز, ژ, د, ت”yê di zimanê kurdî da hene ku di erebî û farisî da nînin, li hember vê di kurdî da jî dengên “ط”, “ظ”, “ث”, “ذ”, “ق”, “ع”ê nînin, loma jî divê ev tîp bi nîşaneyên taybetî bên destnîşankirin.

11. Divê tîpên weha ji bo alfabeya kurdî bên hilbijartin ku nivîsîn û hînbûna wan hêsan be û mirov bikare bi hêsanî bi wan binivîse û di çapê da bi kar bîne (Şaweys, 1925: 10/9-11).

Şaweys di du nivîsarên xwe da jî di bin sernavê “Nûsînî Kurdî Çon Bê?”yê da çend xalên giştî yên rênivîsa kurdî pêşnîyaz dike ku em dikarin wan bi vî awayî kurt bikin:

1. Bêje çawa ji devê mirovan derkevin divê weha bên nivîsîn.

2. Bêje çawa bên nivîsîn divê weha bên xwendin.

3. Ew bêjeyên ku ji zimanên bîyanî yên mîna erebî, farisî, tirkî, latînî û yên din hatine wergirtin divê bi qayîde û ahenga kurdî bên nivîsîn.

4. Ji bo ku kurdî bi rêkûpêkî bê nivîsîn û bi hêsanî bê xwendin divê dengên dengdêr li alfabeyê bên zêdekirin.

5. Tîpên “ث”, “ط”, “ظ”, “ص”, “ض”, “ذ”ê di kurdî da nînin. Ji ber vê divê di şûna “ث” û “ض”ê da “س”, di şûna “ط”, “ظ” û “ذ”ê da “ز” û di şûna “ط”yê da jî “ت” bên nivîsîn (Şaweys: 1925: 8-9).

6. Divê bêjeyên ku ji zimanên bîyanî tên wergirtin bi deng û ahenga zimanê kurdî bên bilêvkirin û nivîsîn.

7. Divê tîpên pêşî û dawî yên paşgir û pêşgirên kurdî di nivîsînê da bi tîpên dawî û pêşî yên bêjeyan ve neyên nivîsîn.

8. Pêwîst e “u” bi “ق”ekê, “û” jî bi du “ق”an ji hev bên cudakirin.

9. Divê qayîdeyên nivîsîna kurdî gelek sade bin, ne ji bo kesên çîna bilind ji bo gelî bin da ku bi rehetî belav bibin. Ji bo vê jî divê rêbaza kêtekirinê û dengên dengdêr li ber çavan bên girtin û tîp li gor qayîdeyên xwendîna kurdî bên nivîsîn (Şaweys, 1925: 6/7-8).

Herî dawî ji bo danîn û bicihkirina qayîdeyên rênivîsa kurdî pêwîstî bi wê yekê dibîne ku pirs ji helbestvan, nivîskar, mamosta û şarezayên zimanê kurdî bê kirin (Şaweys, 1926: 15/11) da ku ev kar bi başî bê kirin û bigihîje armanca xwe.

Di 1930ê da Merûf Ciyawuk bi namîlkeya xwe ya *Pirkî (Îmlay) Kurdî* (1930: 1-46) dest diavêje vê mijarê. Ew jî herwek Şaweysî ji bo destnîşankirina rênivîsê di pêngava pêşî da hîlbijartina alfabeyê pêwîst dizane. Ji ber ku alîgirê alfabeya erebî ye, rênivîsa kurdî li gor vê alfabeyê destnîşan dike û hema bibêje piranîya xebata xwe ji bo vê mijarê vediqetîne. Nivîskar li ser taybetmendîyên nivîsîna tîpên erebî, temsîla wan a ji bo zimanê kurdî û berawirdkirina hin qayîdeyên erebî û kurdî radiweste û digihîje hin encaman. Piştî vê bi termînolojîyeke xwe ya taybetî behsa mijara xalbendîyê dike û di bin sernavê “Rênînî”yê da cih dide 13 nîşaneyên xalbendîyê¹⁴ û bi kurtî cihê bikaranîna wan destnîşan dike. Dema em pêşnîyazên Heqî Şaweysî li ber çavan digirin em nikarin bibêjin ku Ciyawukî bi vê namîlkeyê mijara rênivîsa kurdî bi pêş ve birîye, lewra pêşnîyazên wî gelek sade û berteng dimînin û dîyar e nivîskar vê xebatê wek zincîre namîlkeyek plan dike lê dawî lê naîne.

Tevî van hewldanên seretayî heta demeke dirêj jî rênivîseke yekgirtî ya kurdî peyda nabe. Ji ber vê Bile di nîvasara yekem a *Gelawêjê* da nebûna rênivîseke yekgirtî ji bo hemû kurdan wek şermezariyekê dide zanîn û ji zanayan dixwaze ku li ser vê mijarê binivîsin û kurdan ji vê rewşê rizgar bikin (1939: 2). Heman gazinc di hejmareke din a *Gelawêjê* da ji aliyê nivîskarekî din ve jî tê kirin û ev kes dîyar dike

¹⁴ kom: wîrgul (,), komî nînî: wîrgulî niqtedar (;), dunîn (:), nîn (.), bopirsîne (?), kêşî benîn (!), dukêşî benîn (!!), ?!, nînûk (“...”), duçewt (), çewtî gewre { }, kêşî (-), dukêşî layî (- -) (1930: 39-44).

yek ji sedemên nebûna rênivîseke yekgirtî dabeşbûna ronakbîrên kurd e bi ser alîgirîya alfabeya latînî û çaksazîya alfabeya erebî da (Eyn, 1940: 3-4).

Em dikarin bibêjin ku gazincên weha ji salên 1940an heta salên 1960an bi heman awayî dewam dikin. Loma jî nivîskarekî bi îmzeya “B.”yî sala 1957ê di kovara *Hîwayê* da bal dikêşe ser wê bangewaza *Gelawêjê* ya ku bêbersiv dimîne û ji bo çareserkirina vê mijarê girêdana konferansekê pêşnîyaz dike lê heta wê rojê dixwaze ku kovarên bi zimanê kurdî çend rûpelên xwe ji bo vekolîna vê mijarê terxan bikin da ku zanayên kurd li ser vê mijarê raya xwe binivîsin û ji rêveberên kovara *Hîwayê* jî dixwaze ku li ser destûrên nivîsîna kurdî raya vekoler û kurdnasên biyanî wergire û daxwaza pêknehatî ya *Gelawêjê* bi cih bîne (1957: 12-14).

Pêşnîyaza B.yî bi cih neyê jî çend sal paşê hin kes li ser vê mijarê raya xwe derdibirin. Tahir Sadiq sala 1961ê di *Rojî Nwê* da dîyar dike ku hemû gelên pêşketî nivîsarên xwe li ser destûreke rast û cihgirtî dinivîsin û kes nikare bi kêfa xwe binivîse. Navborî, bi mixabinî dîyar dike ku vê destûrê hîn jî di çapemenîya zimanê kurdî da cihê xwe negirtîye û ji bo vê jî bêjeyek bi çend awayên ji hev cuda tê nivîsîn. Sadiq çend xalên kêşedar ên rênivîsa kurdî destnîşan dike ku bi raya wî ev tevlihevî zêdetir di bêjeyên lêkdayî, bêjeyên ku “bê” tê pêşîya wan, bêjeyên ku dawîya wan bi “ى”yê diqede, bêjeyên ku di wan da du “ى” li dû hev tên, bêjeyên ku li dawîya wan “da” tê bikaranîn, bêjeyên ku paşgira “dar”ê digirin, gihaneka “û”yê, bêjeyên ku gihaneka “ş”yê digirin, bêjeyên ku “le” tê pêşîya wan û di hinek bêjeyên taybetî da derdikevin pêşîya me. Nivîskar mînakên cotstandardîya van xalan destnîşan dike û herî dawî raya xwe li ser wan destnîşan dike (1961: 65-67).

Mirov dikare bibêje ku ev daxwaz û gazinc di sala 1966ê da ji alîyê Nûrî Elî Emînî ve tên bersivandin û navborî bi xebata xwe ya *Raberê Bo Îmlay Kurdî* cara pêşî bi awayekî rêkûpêk bingeheên rênivîsa kurdî datîne. Di vê xebata deh beşî da nivîskar her beşê ji bo mijareke rênivîsê vediqetîne ku em dikarin bi vî awayî kurt bikin.

Beşa yekem li ser kêşaya nivîsîna dengên kurdî ye bi tîpên erebî. Dengê “o”ya ku di rêzimana Wehbî da bi “و”eke xêzikdar hatibû nîşandan ji alîyê wî ve herwek îro bi awayê “ۆ”yê tê destnîşankirin lê ji îro cudatir bi pevnivîsîna du “و”yan “ۆ”yeke şeddedar jî destnîşan dike ku ev pêşnîyaz paşê cihê xwe nagire (1966: 20-21).

Beşa duyem li ser kêşeyên nivîsîna bêjeyên sade ye ku ji 11 xalan pêk tê. Em dikarin encamên gengeşeyên vê beşê weha kurt bikin:

1. Bêjeyên erebî divê li gor rênivîsa kurdî bên nivîsîn.
2. Hin bêjeyên wek “**wutî**, **wurç**, **wuşk**, **bawuk**” divê ne bi “**و**”ekê, bi du “**و**”an bên nivîsîn.
3. Kîteya “**ي**” (îy)ê divê ne bi tîpa “**ى**”yê, bi du “**ى**”yan bên nivîsîn. Herwek bêjeyên “mayîn, ayîn, zanîn û payîz”ê .
4. Nivîsîna hejmareyên ji 10ê heta 19ê weha destnîşan dike: “yanzde, duwanzde, siyanzde, çwarde, panzde, şanzde, hevde, hejde, nozde”.
5. Di şûna bikaranîna nîşanayeke taybetî ya gîreyê da (şedde) divê tîpên bêjeyên weha du car bên nivîsîn.
6. Lêkerên ku dawîya wan bi dengê “**ر**”yê diqedin dema ku bi paşgirên “**rê**” û “**ra**”yê bên pasîfkirin ji bo ku bi hêsanî bên xwendin divê di navbera wan da xêzik (teqel) bê bikaranîn. Wek “**ejmêr-rê**”.
7. Cihguhertina (cêgorkê/metatez) tîpên hin bêjeyan rewşeke asayî ya hemû zimanan e divê her du form jî rast bên qebûlkirin. Wek: cerg-ciger, birwane-binware, terze-tezre, rifan-fîran, ciwên-cinêw, pişqil-qişpîl, mêrûle-mêlûre, xelûz-zûxal.
8. Di hin lêkerên daxwazî û dananî da hin caran pêşgira “**bi**”yê nayê gotin û nivîsîn. Ev “**bi**” divê di nivîsînê da bê parastin. Bo nimûne di şûna “**wergirit**”ê da divê “**werbigirêt**” bê nivîsîn.
9. Di mînaka bêjeyên wek “**eçêt**” û “**desteware**”yê da xistina tîpa “**t**”yê rast nabîne û divê ev “**t**” di nivîsînê da bê parastin.
10. Di mînaka bêjeyên mîna “**mindalekan**”ê da xistina tîpa “**d**”yê rast nabîne û divê ev “**d**” bên parastin.
11. Di mînaka bêjeyên cotstardard ên mîna “**eçim-deçim**, **hawrê-awrê**, **kêrd-kard**, **badem-badam**, **pêwend-pêbend**, **hawta-hemta**”yê da guherîna hin tîpan asayî dibîne û her du awayan jî rast qebûl dike (1966: 30-44).

Beşa sêyem li ser kêşeya nivîsîna bêjeyên lêkdayî ye û bêjeyên dariştî jî di bin vî sernavî da behs dike û vê di çar kategorîyan da destnîşan dike:

Kategoriya yekem: (1) Eger bêjeya yekem bi tîpekeke nelikandî bi dawî bibe û bêjeyeke din bê dawîya wê tu kêşe nîne û tîpa dawîya bêjeya yekem û tîpa pêşî ya bêjeya duyem bi hev ve nayên likandin. Wek چاوکال = چاو + کال, داربەر وو = دار + بەر وو, (2) Eger bêjeya yekem bi tîpeke likandî bi dawî bibe dîsa jî divê pêve neyê likandin. Wek “دل پاک”ê.

Kategoriya duyem: Guherînên dengî yên bêjeyên lêkdayî ku bi arîkarîya daçek yan jî gihanekê tên pêkanîn tiştêkî asayî dibîne. Wek “destewyexe, serewnigun, berewrû, salewsal”ê.

Kategoriya sêyem: (1) Bêjeyên ku bi paşgirekê tên dariştin eger tîpa wan a dawî tîpeke likandî be herwek bêjeyên lêkdayî, bê kêşe tên nivîsîn. Wek “daristanê”, (2) Eger bêje bi tîpeke likandî biqede ev jî bi awayekî siruştî divê bi hev ve bîn likandin. Wek “pûşane”yê.

Kategoriya çarem: (1) Eger bêjeyên lêkdayî bi ketina kêteyekê pêk hatibin du rê hene: Tîpên van bêjeyan eger likandî bin pêve, eger likandî nebin pêve nayên nivîsîn. Wek “ciwamêr, mirawî, nîwero û bogenê”ê, (2) Bêjeya pêşî eger bi “e”yê biqede wek “le, be”yê û bêjeya din bi hemzeyê dest pê bike dengê dikeve. Wek “le+em= lem, be+ew=bew”ê. Lê forma dirêj jî rast dizane. Wek “leem, beew”ê (1966: 49-59).

Beşa çarem li ser kêşeya nivîsîna lêkerên lêkdayî ye. Di mînaka lêkerên “wun bû” û “wuşk helgeran”ê da behsa çar awayên likandina morfemên van lêkeran dike. Ji bo xwerizgarkirina ji vê kêşeyê dîyar dike ku divê tu pêkhatîyeke van lêkeran bi hev ve neyên likandin lê bi mercek ku ev beşên lêkeran ji hev zêde dûr neyên nivîsîn (1966: 60-61).

Beşa pêncem li ser kêşeya nivîsîna cihnavên likandî ye. Nivîsîna cihnavên likandî di kurdî da kêşeyeke mezin dide zanîn û ji bo vê çend rêzik datîne:

1. (a) Eger cihnavên likandî bîn dawîya lêkerê pêve tên nivîsîn. Wek “گرته”yê, (b) Eger berî cihnavên likandî tîpeke likandî bê, cihnavên likandî pêve nayên nivîsîn. Wek “کرد م”ê lê eger temamkera lêkerê hebe cihnav dikeve navbera wan. Wek “هەلم گێرساند”ê.

2. Cihnavên temamker ên likandî ku dikevin nav lêkerê divê pêve neyên nivîsîn.

3. Eger cihnavên likandî bîn ser lêkera ku bi “î”yê diqedin: (a) Di kesên yekem û duyem ên yekhejmar û pirhejmar da cihnav pêve tên nivîsîn: کریت, کریمان, کریتان, کریم, (b) Di kesên sêyem ên yekhejmar û pirhejmar da cihnav pêve nayên nivîsîn. Wek “کری” ی, “کری یان” ی. Li gor wî nabe di van mînakên da di şûna du “ی”yan da “ی”yekê bê nivîsîn.

4. Eger lêker lêkdayî bin û beşa wan a pêşî bi “î”yê biqede cihnav pêve tên nivîsîn. Wek “یاریم کرد” lê di awayê sêyem ê yekhejmar û pirhejmarê da cihê tên nivîsîn. Wek “زهی یان ئەکیلا, زوی ی ئەکیلا”yê.

5. Eger beşa pêşî ya lêkerên lêkdayî bi “ê”yê biqede di kesên yekem û duyem ên yekhejmar û pirhejmar da pêve tên nivîsîn. Wek “گویت لی بو, گویم لی بو” لی بو, گویتان لی بو, گویمان”yê. Lê di kesê sêyem ê yekhejmar û pirhejmar da pêve nayên nivîsîn. Wek “گوئی یان لی بو, گوئی ی لی بو”yê (1966: 64-69).

Beşa şeşem li ser kêşeya nivîsîna pêşgiran e. Eger dawîya pêşgira ku tê ser lêkerê yan navdêrekê bi tîpeke nelikandî biqede ew pêve nayê nivîsîn. Wek “eçê û wergeran”ê. Lê eger dawîya pêşgirê bi tîpeke likandî bê wê demê pêve tê nivîsîn. Wek “biro, bikuj”ê (1966- 70-71).

Beşa heftem li ser kêşeya morfema “ی” (î/y)yê ya ravekê ye. Eger berî wê tîpeke likandî bê “ی” (î/y) pêve tê nivîsîn lê eger tîpeke nelikandî bê pêve nayê nivîsîn. Ev tîp “ê” û “î” bin herçend mecala pêve nivîsînê hebe jî divê ev jî pêve neyên nivîsîn (1966: 72-74).

Beşa heştam li ser kêşeya nivîsîna gihaneka “û”yê ye ku wek navbergirê tê bikaranîn. Gihaneka “û”yê nabe ku bi bêjeya berî xwe ve bê nivîsîn lê divê pê ra bê xwendin. Li alîyê din eger bêjeya berî “û”yê bi tîpeke bédeng biqede ev dibe tîpeke dengdêr û divê bi du “û”an bê nivîsîn. Wek “nanû do”yê. Lê eger bêjeya pêşî bi “ê”ekê biqede divê gihanek bi “ê”ekê û cuda bê nivîsîn. Wek “darberû w darhenar”ê. Tevî vê li ser vê biryareke teqez nade û dixwaze raya xwendevanan jî bigire. Dîsa jî wek çareserî ji bo xala duyem dîyar dike ku eger mirov di navberê da bêhnokê bi kar bîne baştir e. Wek “darberû, û darhenar”ê (1966: 75-78).

Beşa nehem li ser kêşeya paşgiran e û ji bo çareserkirina kêşeya nivîsîna wan, du rêçik destnîşan dike:

Rêçika yekem: (1) Bêjeya ku paşgir tê dawîya wê eger bi tîpeke dengnedêr a likandî biqede bi hev ve, nelikandî be pêve nayên nivîsîn, (2) Eger bêje bi tîpeke dengnedêr biqede û paşgirên mîna “-we, -ke, -kan, -m, -mîn”ê wergirin “e”yek dikeve nava wan. Wek “hatewe, heştem/heştemîn, hengeke/hengekan”. Ev jî li gor tîpên likandî û nelikandî pêve yan jî cihê tên nivîsîn.

Rêçika duyem: Eger bêje bi dengdêrekê biqede divê bêje û paşgir bi hev ve nenûsin lê eger bêje bi “î”yê biqede û paşgir jî bi dengdêrekê dest pê bike “y”yek dikeve navberê. Wek “xoşî+y+ewe”yê (1966: 80-85).

Beşa dehem jî li ser xal bendîyê ye û yek bi yek cihên bikaranîna xal (.), duxal (:), bor (,), dubor (“), xal û bor (;), dukewan (()), kewaney dutayî (“ ..”), teqel (-), nîşaney sersirman (!), nîşaney pirsyar (?)ê radiweste. Cihên bikaranîna hin ji van nîşaneyan bi kurtî hinekan jî bi dirêjî behs dike. Bo nimûne “xal”ê tenê ji bo dawîya risteyê nîşan dide lê bêhnokê (bor)ê bi hûrgilîtir behs dike û 10 cihên bikaranîna wê destnîşan dike (1966: 91-120).

Piştî vê xebata berfireh heta 1970ê du xebatên din jî li ser rênivîsê tên weşandin. A. B. Hewrî di 1968ê da bi arîkarîya Sendîkaya Mamostayan a Silêmanîyê bi navê *Destûrî Nûsînî Kurdî be Pîtî Erebiyê* namîlkeyeke 42 rûpelî diweşîne û Tahir Sadiq jî salek paşê (1969) li Kerkûkê bi navê *Rênûsê* pirtûkekê dide çapkirin ku hêjayê behskirinê ne. Ev jî nîşan dide ku berî avakirina Korî Zanyarî Kurdê gelek mijarên rênivîsa kurdî tên gengeşekirin û beşeke giring jî tê çareserkirin.

2.2.4. Xebatên li ser Ferhengnûsîyê

Bingeha ferhengnûsîya kurdî di sala 1682yê da bi *Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî tê danîn û ev nerîta nivîsîna ferhengên honraweyî bi *Gulzara Îsmailê Bazîdî* ya winda, *Luxetnamey Ehmedî* (1795) ya Şêx Marifê Nodê, *Mîrsadul Etfala* (1912) Şêx Mihemedê Kerbelayî berdewam dike (Marif, 1973: 58; Bolelli-Ertekin, 2017). Li aliyê din jî xebata *Grammatica e Vocabolario della linguayê* ya Garzonî (1787), berga sêyem a xebata P. Lerxî (1858), *Dictionnaire kurde-français* August Jabayî (1879) û *Elhedîyetul Hemîdîye fî Luxetîl Kurdîyeya* (1892) Yusuf Zîayedîn Paşayê Xalidî û vir ve jî rojhilatnas û burokratên biyanî di berhemanîna ferhengnûsîya kurdî da beşdarî

dikin. Bêguman ev ferhengên pêşmodern ne bi mebesta plandanîn û yekxistina zimanê kurdî, belkî bi armancên pedagojîk li ser keresteyên herêmeke dîyarkirî tîn amadekirin. Ji ber vê di serê sedsala 20ê da dema ronakbîrên kurd hest bi pêwîstîya danîna planeke zimanî dikin danîna ferhengeke giştî dibe yek ji armancên wan ên sereke û dikeve nav bernameyên komeleyên kurdî.

Ev armanc li Îraqê bi bizava kurdîya petî gurtir û zêdetir dibe, lewra çawa ku li jor jî amaje pê hat kirin dariştina bêjeyên nû gelek caran dibe sedema tevlihevî û alozîyên manayî û ev jî rê li ber hin gazinc û hestkirina bi hewcedarîya ferhengeke giştî vedike. Ji ber vê wek çareserîyeke palyatîf, di hin kovaran da yan bi perawêz û kevanekan manaya hin bêjeyan tê dayîn yan jî hin caran beşên “ferhengok”ê di wan da tîn weşandin da ku ev hewcedarî heta radeyekê bê çareserkin. Li alîyê din bi mebestên pedagojîk û petîgerîyê hin ferhengokên biçûk bi serê xwe jî tîn weşandin ku *Ferhengoka îngilîzî-kurdî* ya Şakir Fetahî (1934), ferhenga navan a Elaedîn Seccadî (1953) (ferhenga navên kurdî yên petî) û *Ferhengok bo Qutabîyanî Kurd* (erebî-kurdî) a Îzedîn Mistefa Resûlî (1955) ya ku ji bo polên 4-6ê hatiye amadekirin, mînakên vê ne (Marif, 1973: 67; Hassanpour, 2005: 579).

Ji bilî van mînakên biçûk em dikarin bibêjin ku ferhengên giştî li ser destê du ferhengdarên giring tîn berhemanîn ku ew jî Gîw Mukrîyanî û Şêx Mihemedê Xal in. Ferhenga pêşî ya Mukrîyanî *Raber/el Murşid* kurdî-erebî ye (1950) û ji 15 hezar bêjeyan pêk tê, *Kolke Zêrîne* ferhengeke kurdî-farisî-erebî-fransî-îngilîzî ye (1955), *Ferhengî Mehabada* wî kurdî-erebî ye (1961) û ji 30 hezar bêjeyan pêk tê û *Nobereya* wî jî ferhengeke erebî-kurdî ye. Mukrîyanî bi van ferhengên xwe di ferhengnûsiya kurdî da rêçika petîgerîyê temsîl dike û di kovara xwe ya *Hetawê* da çendîn caran li ser rêbaza ferhengnûsiya xwe agahîyên giring dide. Di hejmara pêncem a *Hetawê* da danîna ferhengê karê dewletê û mirovên pispor bide zanîn jî bi gotina wî “ji neçarî dest diavêje vî karî” û hejmara bêjeyên kom kirîye ji 40 hezarî derbaz kirîye. Bi raya wî di çarçoveya yekîtiya zimanê kurdî da dema ku bêjeyên şêwezarên hewramî, lûrî, hekarî, botanî, bextyarî û yên din bîn berhevkin dê pêwîstîya wan bi bikaranîna bêjeyên bîyanî nemîne (1954: 9). Bi vê riwangeya petîgerîyê bi gotina wî bêjeyên ferhenga xwe ji gelek bajar, dever û eşîrên mîna Soran, Kerkûk, Baban, Şarezûr, Hewraman, Erdelan, Mukrîyan, Behdînan, Mergewer, Nehrî, Hekarî, Cizîr û Botan, lûr, kelhûr,

şwan, zîlî, celalî, berazî û cihên din berhev dike (1958: 1) û bêjeyên resen ên kurdî wek alternatîfa bêjeyên bîyanî derdixe pêş.

Hêjayê gotinê ye Gîw Mukrîyanî di pêşgotina *Ferhengî Mehabadê* da dîyar dike ku bi navê *Ferhengî Kurdistanê* ferhengeke kurdî-kurdî ya çar bergî û 45 hezar bêjeyî jî amade kirîye lê ji ber hin sedeman hîn çap nekirîye (2012: 18). Em ji gotinên wî fam dikin ku ev ferheng 1947ê da amade bûye lê li ser pêşnîyaza Mihemed Elî Ewnî çapkirina wê hatiye paşxistin da ku bi arîkarîya dewlemendên Sûrîye û Misirê bikare *Ferhengî Kurdistanê* çap bike. Mixabin wê salê Ewnî dimire û ferheng nayê çapkirin. Ji bilî nedîtina sponsorekî ji bo çapkirina vê ferhenga berfireh a kurdî-kurdî, yek ji sedemên giring ên derengxistina wê jî bi gotina wî nebûna zarekî hevbeş ê kurdan e ku bi kîjan zarî binivîse dê zarên din nikaribin jê sûd wergerin. Loma jî weha difikire ku eger ferhengên pêşî kurdî-erebî bin dê her kes bi hêsanî ji wan sûd wergire (2012: 28-29). Ji ber vê pêşî her du ferhengên xwe yên kurdî-erebî çap dike û çapa *Ferhengî Kurdistanê* wî bi paş dikeve.

Ji ber van kêşeyên navborî çapkirina ferhengên kurdî-kurdî li Îraqê gelek dereng dikevin û eger em *Ferhengî Kurdistanê* ya çapnebûyî nehejmêrin (di sala 1999ê da çap dibe) heta *Ferhengî Xalê* (1960) ya Şêx Mihemedê Xalî hemû ferhengok û ferhengên tên çapkirin du zimanî ne. Ji alîyekî ve herwekî amajeya Mukrîyanî û cexta Hassanpourî (2005: 584) ferhenga yekzimanî asta standardîzasyon û hêza razberkirina wî zimanî nîşan dide û di nav pêvajoyeke plandanîna zimanî da dikare bê nivîsîn. Loma jî bingeha ferhenga kurdî-kurdî ya ku Celadet Bedirxanî di sala 1932ê da bi ferhengoka *Hawarê* û berhevoka xwe ya derengçapbûyî datîne li ser destê Şêx Mihemedê Xalî bi bergên xwe yên salên 1960-1964-1976ê wek ferhengeke 40 hezar bêjeyî derdikeve holê ku bêjeyên hemû tîpên kurdî li xwe digire. Tevî vê jî Xal di destpêka ferhenga xwe da bal dikêşe ser zehmetîya amadekirina ferhengeke weha û ravekirina bêjeyan bi awayekî zelal û cîyaker karekî dijwar li qelem dide û ji bo vê jî mînakê bêjeyên “belam, tumez, meger, guncan, xalane, e, be, ane, egîna”yê dide û ravekirina wan ew çend jî hêsan nabîne (2005: 13).

Xal jî mîna Mukrîyanî xwedî nêrîneke modern a plandanîna zimanî ye û hewl dide bêjeyên hemû şêwezarên kurdî kom bike û ji ber ku Merdoxî (*Ferhengî Merdox* a kurdî-farisî-erebî, Tehran, 1956) ji bilî erdelanî ji şêwezarên din ên kurdî zêde sûd

wernegirtîye vê wek kêmasîya ferhenga wî dide zanîn. Ji ber vê dîyar dike ku wî ji sala 1935ê û vir ve ji hemû zar û şêwezarên kurdî yên mîna babanî, soranî, zazayî, botanî, behdînî, lûrî, feylî, lekî, mukrîyanî, hewramî, erdelanîyê bêje kom kirine û heta xwe negihandîye serçavîya bêjeyekê tenê bi rêya şandina kesên din tu bêjeyek nexistîye nav ferhenga xwe (2005: 12-13). Lê ji Mukrîyanî cudatir Xal tu car behsa petîgerîyê nake û hemû bêjeyên ku ji alîyê kurdan ve tên bikaranîn wek kurdî qebûl dike û bi vê têgihîştina xwe rêçika nerîtî û nerm a ferhengdaneîyê dide ber xwe. Ji ber vê, sala ku ferhenga wî çap dibe Tahir Sadiq wek alîgirekî petîgerîyê, di kovara *Hîwayê* da dîyar dike ku tevî ku bergindên wan di zimanê kurdî da hene jî bikaranîna hin bêjeyên erebî, farisî û tirkî yên mîna “axir, merdûm, altûn, ayîn û oyîn, bacî, badem, boyax, tobe, bedgo, payan, polad...”ê di vê ferhengê da li dijî tevgera petîgerîyê ye û divîya ev bêje di ferhenga Xalî da nebûya (1960: 68).

Bi kurtî li ser ferhengdaneîyê heta 1970yê Amir Hassanpour dîyar dike ku ev kes ne xwedî formasyoneke zimannasîyê ne, di dariştina bêjeyan da bi piranî rêya analogîyê peyrew dîkin û ji zanîna xwe ya zimanên mîna erebî, farisî, tirkî û carinan zimanê ewropayî sûd wergirin jî nikarin bi awayekî baş ji hêza morfolojîk û semantîk a zimanê kurdî sûd wergirin û ferhengnûsîya xwe dewlemend bikin (Hassanpour, 2005: 571). Tevî vê rexneya dicihda jî divê mirov dîyar bike ku ferhengdaneîyê kurd ên vê serdemê bê arîkarîya diravî û dezgehî bi hêz û xîreteke mezin karekî mezin dîkin û eger ev hewldana wan a dilsozane nebûya dê gelek bêjeyên kurdî wînda bibûna û kurdî lawaztir bibûya.

2.2.5. Xebatên li ser Rêzimanê

Herwek xebatên li ser ferhenga kurdî, xebatên rêzimana kurdî jî pêşî ji alîyê kurdan bi xwe ve û paşê ji alîyê rojhilatnasan ve tê kirin. *Tesrîfa Kurmancîyê* ya Elî Teremaxî (1590) yekem rêzimana kurdî tê hesibandin ku bi mebesta hînkirina rêzimanên erebî û farisî tê nivîsîn. Lê di sedsala 19ê da li ser daxwaza konsulê Rûsyayê Aleksandre Jabayî bi destê Mela Mehmûdê Bazîdî êdî rasterast nasandina rêzimana kurdî dibe mebesta nivîskarên kurd û çend deqên giring ên rêzimana kurdî tên berhevanîn ku *Tûhfetu'l Xîlan fî Zimanê Kurdan* di nav wan da ya herî giring e (bnr: Bilbil-Oztirk, 2019). Li ser vê rêçê di sedsala 20ê da hin rêzimanên kurdî ji alîyê melayên kurd ve tên nivîsîn ku hemû jî li ser modela rêzimana erebî tên berhevanîn.

Li alîyê din ji xebata *Grammatica e Vocabolario della linguayê* ya Garzoni (1787), *Etudes Philologies Sur la Langue kurdeya* A. Chodzko (1857), *Kurdische Gramatika* Ferdinand Justi (1880), *Brief Grammar and Vocubulary of the Kurdish Language of the Hakkari Districta* Samuel Rhea (1880), *Die Sprache der Kurdena* Albert Socin (1898), *Dialectes Kurdesa* J. de Morgan (1904), *Die Mundarten der Mukri Kurdena* Oscar Mann (1906), *Grammar of the Kurmanji or Kurdish Language* (1913) û *Elementary Kurmanji Grammara* E. B. Soane (1919), *Practical Kurdish Grammara* L. O. Fossum (1919), *Grammare Kurdeya* Abbé Paul Beidarî (1926) heta çarîka yekem a sedsala 20ê gelek rojhilatnasên ewropayî bi mebestên sîyasî û mîsyonerîya dînî gelek deqên rêzimana kurdî dinivîsin (Hîlmî, 1970: 34-37) û herwekî Akin jî dibêje xala hevbeş a van rêzimanan ew e ku çavkanîyên xwe ji keresteyên devkî werdigirin û tu armanceke wan a normatîf û yekxistina zimanê kurdî nîne (2013: 47, 51).

Nivîsîna rêzimanê li Başûrê pêşî di çarçoveya dersên seretayî da dikeve rojevê. Tewfîq Wehbî li ser daxwaza Wezareta Perwerdeyê di 1923ê da li ser modela rêzimana îngilîzî û fransî dest bi amadekirina rêzimanekê dike (Wehbî, 1943: 39) lê ji ber bikaranîna hin nîşaneyên taybetî ji bo nîşandana dengên taybetî yên kurdî ev berhem jî alîyê Wezareta Perwerdeyê ya Îraqê ve nayê pesendkirin û di şûna wê da *Muxteserî Serf û Nehwî Kurdîya* (1928) Seîd Sidqî wek pirtûka rêzimanê ji bo polên 4 û 5ê yên seretayî tê çapkirin¹⁵ ku xwe dispêre modela rêzimana erebî û ji alîyê termînolojîya rêzimanê ve jî tu nûbûnekê di xwe da nahewîne. Ji ber vê Wehbî, salek paşê li ser nav û hesabê xwe *Destûrî Zimanî Kurdîya* (1929)¹⁶ xwe diweşîne û şêwezarê Silêmanîyê dike norma rêzimana kurdî li Başûrê. Ji ber vê berevajî Sidqî di şûna “de”ya nîşaneya dema niha û dema borî ya berdewam da “e”ya şêwezarê Silêmanîyê tercîh dike û qayîdeyên zayend û tewangê ya mukrîyê ku bi kurmancî ra jî hevbeş in, naxe nav rêzimana xwe û dîyar dike ku herçend berê ev her du taybetmendî di binzarê Silêmanîyê da hebûne jî di bin karîgerîya erdelanî (sineyî) da ji holê rabûne û vê jî wek sivikbûnê tişteki asayî dibîne û dipejirîne (Hassanpour, 2005: 549-549).

¹⁵ Li ser berga vê berhemê weha hatiye nivîsîn: “Le ser qerarî Wezaretî Mearif bo sinifi çwarem û pêncemî îbtîdaî le çap dirawe” (Sidqî: 1928).

¹⁶ Tewfîq Wehbî di nivîsareke xwe ya *Pêşkewtinê* da (1958) dîyar dike ku beşeke mezin a berga duyem a vê rêzimanê di 1930yê da weşandiye lê em negihîştin vê deqê û weha dîyar e li Başûrê ev deq heta niha nehatiye weşandin (Wehbî, 2022: 344).

Tevî van mijarên gengeşebare bi rastî jî dema mirov rêzimana Sidqî û Wehbî dide ber hev bi aşkerayî derdikeve holê ku Wehbî dibe bingehdanerê pêşî yê rêzimana modern bi kurdîya soranî. Ev jî rêzîkirina mijaran heta ravekirin û termînolojîyê xwe dide der. Lewra nivîskar her xaleke rêzimana xwe bi hejmareyekê destnîşan dike û heta dawîya pirtûkê digihîje 337 madeyan. Li alîyê din vê xebatê wek berga yekem a rêzimana xwe dinasîne û cih dide mijarên alfabeyê, beşên sereke yên risteyê û beşên axaftinê. Ji alîyê termînolojîya rêzimanê ve jî di gel bikaranîna zaraveyên kevin ên mîna “herf, hica, kelîme, cumle, sifet, zerf, edat, fi’l, fi’lî muteedî, fi’lî lazim”ê bi piranî zaraveyên petî dadirijîne ku “baslêkiraw, bas, kert, parçekanî qise, naw, bonaw, lêkder, tewawkirdin, rût, lêkdiraw, bend, nêr, mê, jîmarey tak, jîmarey gel, nawî durustkiraw, nawî biçûkkiraw, sifetî çonî, sifetî nîşanî, sifetî jîmareyî, sifetî pîrsî, payekanî sifet, payey adî, payey zibadî, payey here zibadî, bonawî kesî, bonawî nîşanî, bonawî lêkder, bonawî mubhem, bonawî pîrsî bonawî xoyî, bonawî milkî, bonawî kesî tak û gel, bonawî kesî serbexo, bonawî kesî pêwe nûsaw” (1929: 14-83) nîşaneyê vê ne û bi piranî li ser modela îngilîzî hatine dariştin. Wehbî hin beşên vê rêzimanê piştî çend salan jî hejmara 2em a 1943yê heta hejmara 2em a 1944ê dubare di *Dengî Gêtîy Tazeyê* da çap dike û kurdîya hin zaraveyên din jî peyda dike. Di vê çarçoveyê da herf dibe “tîp” kelîme dibe “wuşe” cumle dibe “riste”, qise dibe “wite”, sifet dibe “awelnew” û nîda dibe “bang” û hwd. (Wehbî, 200-232).

Li ser vê modela rêzimanên ewropayî û normên şêwezarê Silêmanîyê Nûrî Elî Emîn jî di sala 1956ê da berga yekem û di sala 1958ê da jî berga duyem a *Qewaîdî Zimanî Kurdîya* xwe dide weşandin û di 1960ê da wan di bin sernavê *Rêzimanî Kurdî* da ji nû ve rêk dixê û dide çapê. Dîyar e di navbera çar salan da Emîn jî sernavê pirtûka xwe (“qewaîd” a erebî dibe “rêziman”) heta hin zaraveyên din li ser pêşxistina rêçîka Wehbî di kurdîya Başûrê da termînolojîyêke petî berhem tîne.¹⁷ Bi vî awayî berî Korî

¹⁷ Zaraveyên rêzimanê yên Nûrî Elî Emîn ev in: rêziman, pît, pîtî bêdeng, pîtî bizwên, pîtî dengdar, kerte (elmeqte’, syllable, kîte), kertey dirêj, kertey kurt, wişe /waje (kelîme), bêje (lefz), wişey sade, wişey lêkdiraw, kar (mesned), serbar (complement), karî behêz, karî bêhêz, axawtin (kelam), parçekanî axawtin, destewaje (îbare, phrase), destewajey nawî, destewajey awelnewî, destewajey awelkarî, riste, ristey sade, ristey mezin, ristey lêkdiraw, ristey têkel, parçe (clause), parçey şwênkewtû, parçey şwênkewtûy nawî, parçey şwênkewtûy awelnewî, parçey şwênkewtûy awelkarî, parçekanî riste, şaparçe (main clause), parçey nawî (noun clause), parçey awelnewî (adjective clause), parçey awelkarî (adverb clause), ristey nawbeyn, biker, mê, bêlayan, amraz, amrazî pênasînewe, amrazî nasînewey şunas (indefinite articles), amrazî pênasînewey neşunas (definite articles), naw, nawî sade, nawî lêkdiraw, nawî taybetî, nawî giştî, nawî me’newî, nawî madî, nawî komel, nawî tak, nawî gel, pîte paşgir, pîte pêşgir, paşgirî naw, nawî nêr, nawî mê, nawî bêlayan (neuter noun), jîmarey naw (number of noun), jîmarey

Zanyarî Kurdê di warê rêzimanê da jî xebatên giring ên nûjenkirinê tên kirin û ev xebat dibin çavkanîyên giring ên vê dezgehê.

2.2.6. Hewldanên Yekxistina Zimanê Kurdî

Mijara destnîşankirina zimanê kurdî yê hevbeş yan jî yekxistina zimanî ku li Stenbolê dest pê kiribû, piştî belavbûna Dewleta Osmanî û dabeşbûna civaka kurdî bi ser çend welatên nû da, bitemire jî di salên 1930an da di nav kurdên Îraqê da careke din dikeve rojevê. Lewra berpirsên mandaya îngilîz dema ku mafên xwendina zimanên xwecihî rêk dixin ji ber cîyawazîya zarê wan ji bo her pênc qezayên kurmanc ên Mûsilê azadiya hîlbijartina zarê wan destnîşan dikin û ev jî di nav hin ronakbîrên wê demê da dibe sedema gengeşekirina zimanê hevbeş.

Ji ber vê çendê Mihemed Emîn Zekî bi daxwaznameyekê ji bo berpirsê mandaya îngilîz ron dike ku mafê diyarkirina zimanekî yekgirtî yê ku ji bo hemû zimanan rewa tê dîtin divê ji bo kurdan jî rewa bê dîtin. Li gor wî, di navbera rojhilat û rojavayê Zêya Mezin da cîyawazîyên zimanî ew çend ne zêde ne û ji ber ku nêzîktirê şêwezarê mukrî ye divê kurmancîya rojhilatê Zêya Mezin (sorani) wek zimanê fermî bê qebûlkirin û ev zar li hemû dezgehên fermî yên Kurdistana Îraqê bê bikaranîn (Zekî, 1984: 112).

Zekî Beg bikaranîna kurmancîya behdînî li dezgehên perwerdeya her pênc qezayên Mûsilê ji ber sê sedeman metirsîdar û zîyanbar dide zanîn ku bi nêrîna wî ev yek di serî da dê yekîtiya zimanê kurdî têk bide û bibe sedema diltengî û nefreta kurdan li hember hikumetê. Herweha ev pêngav dê li vê navçeyê bibe sedema paşketina perwerdeyê, lewra li van qezayan bi şêwezarê behdînî tu pirtûkên perwerdeyê nehatine

tak (singular), jîmarey gel (plural), serbarî naw (ji bo ravekê bi kar tîne), ranaw, ranawî kesî, ranawî kesî cwê, ranawî likaw, ranawî xoyî, ranawî îşarî, ranawî heyî, ranawî geyener, ranawî pirsyarî, ranawî nadiyar, awelnawî sade, awelnawî lêkdiraw, awelnawî xebirî, paşgirî awelnaw, pilekanî awelnaw, piley sabî, piley berawird, piley bala, awelnawî îşarî, awelnawî îşarî mubhem, awelnawî firmanî, awelnawî biker, awelnawî kiraw, awelnawî çendî, awelnawî pirsyarî, awelnawî nadiyar, awelnawî jîmareyî, erk, tewawker, tewawkerî rast, tewawkerî narast, tewawkerî yarîdediraw, meşq, çawg, çawgî sade, çawgî lêkdiraw, çawgî teneper, çawgî têper, çawgî regî firman, paşgirî regî firman, firman (fî'l), firmanî teneper, firmanî têper, firmanî sade, firmanî lêkdiraw, firmanî raburdû, firmanî rabûrdûy nîzîk, firmanî rabûrdûy tewaw, firmanî rabûrdûy dûr, firmanî rabûrdûy îstîmrarî, firmanî rabûrdûy însayî, firmanî dadê, firmanî daxwazî, paşgirî firman, firmanî melûm, firmanî meçûl, firmanî merc, awelkar, awelkarî şwênî, awelkarî xal, awelkarî nefî, awelkarî weram, awelkarî çendî, awelkarî taqî, paşgirî awelkar, awelkarî sade, awelkarî lêkdiraw, amrazî peywendî, paşgirî amrazî peywendî, amrazî pêbest (conjunction), amrazî nîda (interjection), şaparçe (main clause) (Emîn: 2013: 19-21, 61, 62, 69).

nivîsîn û kadroyên şareza jî nînin ku bikarin di demeke kurt da materyalên perwerdeyê bi vî şêwezarî amade bikin. Ev jî dê bibe sedem ku demeke dirêj li vê herêmê perwerdeyê kirin û gelê herêmê ji perwerdeyê bêpar bimîne. Herî dawî ji bo qanihkirina muxetebê xwe bi bîr tîne ku perwerdeya bi du zaran dê ji bo hikumetê bargiranîyê çê bike û têçûnên perwerdeyê bike du qatî. Ji ber vê ji berpîrsê mandaya îngilîz tika dike ku tenê zarez ji bo hemû Kurdistanê Îraqê qebûl bikin (Zekî, 1984: 113-114).

Piştî çend salan ev mijar di kovara *Gelawêjê* da jî tê gotûbêjkirin. Rêveberên kovara *Gelawêjê* di hejmara xwe ya duyem da mijara dabeşbûn û yekxistina zimanê kurdî di bin sernavê “Pîrsyarî Gelawêj”ê da tînin rojevê û ji xwendevanên xwe dixwazin ku li ser vê mijarê boçûnên xwe ji wan ra bişînin (1940: 1). Di vê çarçoveyê da cih didin nivîsareke Mihemed Emîn Zekî Begî ku di bin sernavê “Zimanî Kurdî Çon Yek Egirê”ê da hatîye nivîsîn. Zekî Beg di vê nivîsarê da taybetmendîyên cografî, cihguhertin, mijûlîyên cîyawaz ên komên civakî, cîyawazîyên navbera zimanên axaftin û nivîsînê wek sedemên sereke yê cîyawazîyên zimanî yê her neteweyekê dide zanîn û vê dîyardeyê tiştêkî siruştî dibîne (1940: 3-7). Mijara yekxistin û pêşvebirina zimanê kurdî jî bi derfetên sîyasî ve girê dide û dîyar dike ku tevî vê derfeta biçûk, zimanê kurdî li Îraqê gelek bi pêş ketîye û eger ev derfet ji bo zarên din ên kurdî bihata dayîn dê ew jî bi pêş biketana, li hev nêzîk bibûna, cîyawazîyên bingehîn ên fonetîk û rêzimanî yê navbera wan hêdî hêdî kêmbibûna û zimanê kurdî di nav zimanên zindî yê cîhanê da cihê xwe bigirta (1940: 12). Ji van gotinan tê famkirin ku Zekî Beg ji bo yekxistina zimanê kurdî pêşî çareserkirina hokarên derekî û sîyasî pêwîst dibîne û piştî dabînkirina plandana payeyê yekxistinê di nav pêvajoyekê da mumkîn dibîne.

Gîw Mukrîyanî di *Hetawê* da cihekî giring dide mijara yekxistina zimanî û li ser paşeroja zimanê kurdî xemeke mezin dixwe. Ji hejmarên destpêkê ve (h. 1, 2, 3, 4) di bin sernavê “Yekêti Ziman”ê da cih dide babetên li ser zimanî û vê armanca xwe bi diruşma “yekêti ziman fermanêk e, le ser şanî hemû layekman e”yê derdibire. Bi raya wî hemû kurd halê hazir bi şêwezarên xwe dinivîsin û ji bo ku behsa zimanê kurdî bê kirin divê kurdên başûrî bi awayekî binivîsin da ku kurdên lûr, kelhûr, hewramî, Behdînan, Botan û Cizîr û Hekarî û cihên din jî bikarin ji vî zimanî têbigihîjin (1954: 18). Wek delîla vê boçûna xwe di hejmara 9ê ya *Hetawê* da dîyar dike ku kurdên bakurî nikarin alfabeya erebî bixwînin û ji zarê soranî têbigihîjin, bi gotina wî ji bo ku bikarin

ji çapemenîya kurdên Îraqê sûd wergirin çend car in jê tika dikan ku yek du rûpel ji bo wergêrana zarên soranî û bakurî terxan bikin. Bi vî awayî nebûna alfabeyeke hevbeş û cîyawazîyên zarî li pêşîya yekxistina zimanî wek du astengên sereke dide zanîn û dîyar dike ku dê ji hejmara 9ê û pê da dest bi nasandina alfabeya latînî ya kurdên Bakurê û alfabeya erebî ya Başûrê bike û ji bo têgihandina her du zaran du rûpel ji bo wergêrana bêje û risteyên zarên taybetî yên her du alîyan veqetîne. Ji bo vê, bang li xwendevanên başûrî dike ku meheke xwe ji bo bêjeyên birayên kurd ên bakurî veqetînin da ku bikarin bi hêsanî jê têbigihîjin. Li ser vê bingehe Gîw Mukrîyanî di yekxistina zimanî da sûdeke mezin a neteweyî dibîne (1954: 1-2) û di wê bawerîyê da ye ku heta mijara yekîtiya zimanî serî negire dê zimanê kurdî dewlemend nebe û dê kurd nikaribin ji duberekîyê rizgar bibin. Ji ber vê xebata ji bo yekîtiya zimanê kurdî wek rêya serkeftin û rizgarîyê dide zanîn (1955: 3).

Ji ber vê têgihîştina Gîw Mukrîyanî di çendîn hejmarên vê kovarê da li ser alfabeyê, nasandina bêjeyên kurmançî û soranî û cîyawazîyên rêzimana şêwezarên kurdî nivîsar tîn weşandin û bi rastî jî di bin sernavê “Yekîti Zimanî Kurdî” da dîyalogeke zindî di navbera hin nivîskarên kurmanç û soran da çê dibe û di nav van nivîsaran da carinan li ser yekxistina zimanê kurdî hin pêşnîyazên balkêş tîn kirin. Bo nimûne piştî du nivîsarên S. T. û Enwer Mayî yên bi kurmançî, nivîskarekî bi navê Qirgeyî bi kurdîya soranî di mînaka nivîsara S. T.yî da dîyar dike ku navborî tevî ku bi “behdînî” jî nivîsiye hewl daye xwe nêzî zarê soranî bike lê Enwer Mayî bi zarê xwerû yê behdînî nivîsiye ji ber vê jî zimanê wî nefambar û dijwar dide zanîn.

Qirgeyî di yekxistina zimanî da yekîtiya alfabeyê tîr nabîne û di nav zaran da bal dikêşe ser cîyawazîyên bêjeyî û manayî jî. Ji bo vê pêşnîyaz dike ku di serî da her navçeyek rojname yan kovarek bi zarê xwe derxe û paşê jî wek nûnerên navçeyên Baban, Soran, Behdînan û Botanê çend mamostayên şareza yên zimanê kurdî di bin navê “Komelî Ziman”ê da kom bibin, hemû bêjeyên her çar navçeyên Kurdistanê kom bikin û piştî berawird û lêkdanê bêjeyên komkirî bikin sê beş. Li gor vê; (a) divê bêjeyên ku taybet bin bi navçeyekê di tu nivîsarekê da neyên bikaranîn û tenê wek bêjeyên navçeyî yên axaftinê bimînin, (b) divê bêjeyên di nav hemû şêwezaran da hevbeş in, bibin binaxeya nivîsîna kurdî û ji bo heman manayê tu bêjeyeke din di nivîsînê da neyê bikaranîn, (c) bêjeyên ku ji nav riste û nivîsaran manaya wan

derdikeve dikarin bên bikaranîn. Di dawîyê da ji mamostayên kurd tika dike ku li ser vê mijarê ramanên xwe bixin rû da ku ev bername bê xurtkirin (1954: 3- 4).

Di hejmara 25ê da careke din li ser heman mijarê dinivîse û di mînaka nivîsara Enwer Mayî da dîyar dike ku navborî ji ber ku xwerû bi kurdîya Bakurê nivîsiye kurdên navçeya navendî jê tenegehîştine û pêşniyaz dike ku kurdên behdînî jî wek zimanê nivîsîn û weşanê kurdîya navendî bi kar binin (Qirgeyî, 1955: 4) û bi awayekî nerasterast dixwaze ku hemû kurd li ser kurdîya navendî yanî soranî li hev bikin û wê wek zimanê nivîsînê bi kar binin.

Nivîskarekî din bi îmzeya C.yî ji Qirgeyî cudatir rêbazeke din pêşniyaz dike. Li gor wî ji bo ku kurd hînê şêwezarên hev bibin divê bên handan, mîna ereban di ferhengên xwe da cih bidin bêjeyên hemû şêwezarên kurdî û wek wan ji bo tiştêkî bi rehetî çend bêjeyên hevmana di ferhengên xwe da bi cih bikin. Ji ber nebûna ferhengên bi kurdî yê weha pêşniyaz dike ku nivîskarên kovar û rojnameyên kurdî bêjeyên giran di nivîsarên xwe da ron bikin da ku her kes bikare ji wan têbigihîje (1955: 6).

A. T. piştgirî dide vê boçûnê û dîyar dike ku rojekê diçe Hewlêrê û mirovekî ji ber cîyawazîya şêwezarê wî dibêje qey bi farisî diaxive. Navborî vî kesî neheq nabîne û dîyar dike ku ji bo nêzîkkirina zimanê kurdî kar nehatîye kirin. Ji ber vê bang li kurdên soran dike û dibêje ku eger xwe newestînin dê çawa *Mem û Zîna* Xanî bixwînin û bi heman awayî bang li kurdên behdînî jî dike û dibêje eger ew jî hewl nedin kurdîya soranî hîn nebin dê çawa bikarin dîwana Hacî Qadîrî bixwînin (1955: 5-6). Bi vî awayî di mînaka Xanî û Hacî da geşkirina ruhê neteweyî wek handerekî bi kar tîne û dixwaze kurdên kurmanc û soran hînî zarên hev bibin.

Ev gengeşeya germûgur piştî hejmara 55ê bi nivîsarên M. M. (Mihemed Mîhrî) yê ku ji Stembolê dişîne, di bin diruşma “Zimanî Ême Yek Cûr e Şêwekanî Zor e”yê da berdewam dibe. Navborî bi vê zincîre gotara xwe ji vê hejmarê heta hejmara 72yê li ser eşîr û şêwezarên kurdî agahîyên bihûrgilî dide û paşxaneya dîrokî ya vê mijarê dixwe rû. Gîw Mukrîyanî jî ji hejmara 90ê û bi şûn da dest bi weşandina waneyên hînkirina alfabeya latînî dike û paşê wê wek pirtûk jî diweşîne.

Herî dawî C. Xesrew ji hejmara 98ê ya *Hetawê* û bi şûn da di bin sernavê “Yekêti Zimanî Kurdî Goranêk be ser Şêwekeman da”yê da dest bi nivîsîna zincîreyêke gotaran dike û li ser mijara yekxistina zimanî radiweste. Nivîskar nebûna

zimanekî standard bi dîrok û serborîya kurdan ve girê dide ku her beşeke kurdan dikevin bin hikum û nîrên çendîn desthilatên bîyanî yên cîyawaz û ev jî dibe sedem ku zimanê wan ji aliyê bêje û rêzimanê ve bikeve bin karîgerîya zimanên bîyanî yên cîyawaz û kurd ji hev dûr bikevin. Ji bo vê jî bang li zimannasên kurd dike ku dest bi kar bikin, rêgirî li vê dîyardeya dîrokî bikin û ji bo yekxistin û pêşvebirina zimanê xwe bixebitin (1957: 2-3).

Di çapemenîya vê serdemê da ji bo yekxistina zimanê kurdî pêşnîyazkirina şêweyê Silêmanîyê zêde dibe û ev di rûpelên kovara *Hîwayê* da jî tê dîtin. Li ser vê mijarê di nîvsarekê da tê dîyarkirin ku heta serdema Babanan li Kurdistanê tu car zimanekî yekgirtî yê kurdî çê nabe lê piştî sedsala 19ê şêweyê Silêmanîyê dibe zimanê nivîsînê û bi gîyanekî neteweyî kar tê kirin ku ev ziman bibe zimanê zanistî û neteweyî yê hemû kurdan. Ji vî aliyê ve şêwezarê Silêmanîyê dişibîne şêwezarê qureyşî ku dibe bingeha zimanê erebî û ji bo bicihkirina vê armancê dîyar dike ku di pêngava pêşî da divê bi hemû şêweyên binçîneyî yên kurdî (behdînî, lûrî, soranî, hewramî) helbest û gotar û namîlke bîn nivîsîn û paşê jî şêweyê Silêmanîyê li hemû navçeyên Kurdistanê bê belavkirin. Ji bo pêkanîna vê yekê tê pêşnîyazkirin ku bernameyên dersên xwendîngehan bi kurdîya Silêmanîyê bîn nivîsîn lê li navçeyên şêwezarên din bi wan şêwezaran bîn gotin û ravekirin û hêdî hêdî kurdên navçeyên din bîn handan da ku şêweyê Silêmanîyê hîn bibin. Ji bilî vê, di kovar û rojnameyên kurdî da kuncêk bê dîyarkirin û li vir bêjeyên hemû şêweyên kurdî bîn berawirdkirin, ferhengên biçûk ên zimanê kurdî bîn nivîsîn û bi erzanî di nav gelî da bîn belavkirin û li hemû navçeyên Kurdistanê bazara kurdîya Silêmanîyê bê xweşkirin (B., 1958: 72-75).

Di salên 1950yan da Cemal Nebez jî ji bo yekxistina zimanê kurdî dikeve nav hewldanan û di xebata xwe ya *Nûsînî Kurdî be Latînî* da behsa pêwîstîya têkoşîna vejandina zimanê kurdî, yekxistina şêweyên wê û danîna alfabeyeke yekgirtî dike. Sedemên jevdûrketina şêweyên zimanê kurdî bi nebûna têkilîya navxweyî, kêmiya xwendewarîyê, astengên cografî ve girê dide û ji bo jevtêgihîştina kurdan, yekxistina zimanê kurdî armanc û pêngava yekem dide zanîn û di nêzîkkirina şêweyên kurdî da herwek pêşîyên xwe danîna alfabeyeke yekta pêwîst dizane ku bi raya wî ev, alfabeya latînî ye. Herçend di alfabeya erebî ya îro da destkarî hatibin kirin jî ji bo gihîştina vê armancê rêgirîya herî mezin alfabeya erebî dide zanîn (1957: b-c). Di xebateke xwe ya 1957ê da jî ji bo nêzîkkirin û yekkirina zimanê kurdî pêwîstî bi damezirandina

dezgeheke zimanî dibîne ku zaraveyên zanistî daîne û piştgirî bide nivîsîn û wergerana pirtûkên zanistî û hunerî. Herweha ji bo pêşxistina zimanê kurdî avakirina yekîtiya nivîskarên kurd, vekirina pirtûkxaneyêke giştî, derxistina kovar û rojnameyan, çapkirina dîwanên helbetvanan, pêşxistina çîroka kurdî, amadekirina ferhengên kurdî, nivîsîna rêzimana yekgirtî ya hemû zarên kurdî û nivîsîna xebatên zanistî bi kurdî pêwîst dibîne (2007: 12-30) ku ev mijar di 1970yê da bi avakirina Korî Zanyarî Kurdê dikevin nav bernameya vê dezgehê.

Darbeya leşkerî ya 14ê Tîrmeha 1958ê û lihevhatina demkî ya rêveberîya Îraqa nû û tevgera kurdî dibe sedem ku kurd di serdema komarî da (1958-1961) zêdetir doza mafên xwe yên zimanî bikin û bi awayekî azadane li ser kêşeyên zimanê kurdî gengeşe bikin. Di vê çarçoveyê da Cemal Nebez û çend hevalên xwe bi rêya daxwaznameyekê ji Wezerata Zanyarîyê dixwazin ku dezgeheke zimanî (Korî Ziman) ji bo kurdî bê damezirandin. Herweha Rêxistina Yekîtiya Qutabîyên Kurdistanê ji daxwaznameyan didin serokwezîr û wezîrê perwerdeyê û dixwazin Korî Zanyarî Îraq bê berfirehkirin û bi beşdarîya şarezayên kurd li ser ziman û çanda kurdî kar bê kirin û kovareke bi kurdî bê derxistin. Heman daxwaz li ser zimanê Cemal Hacî Şefîqî di *Jînê* da jî tê behskirin da ku li Silêmanîyê dezgeheke zanistî ji bo zimanê kurdî bê vekirin (Salih, 2017: 250).

Di vê serdemê da hewldana herî mezin a damezraweyîkirina yekxistina zimanê kurdî li Başûrê, ji aliyê Kongreya Mamostayên Kurd ve tê dayîn ku di navbera rojên 10-13ê Eylûla 1959ê da li Şeqlaweyê tê girêdan. Di hejmarên 162, 163 û 164ê yên *Hetawê* û hejmara 2-3yê ya sala sêyem a *Hîwayê* da bi awayekî berfireh li ser vê kongreyê agahî tên dayîn. Gîw Mukrîyanî li ser navê *Hetawê* roja 10. 9. 1959ê rojeke giring û dîrokî dide zanîn û vê rojê wek “roja dirandîna perdeya reş a bextreşî û çarereşîyê û bilindkirina payeya bextyarî û vejandina zimanê şîrîn ê kurdî” dide zanîn. Lewra di vê kongreyê da nûnerên hemû şêwezarên kurdî cih digirin ku ji 21 kesên bingehîn¹⁸ û 120 endaman pêk tên ku nûnertîya bajarên Kerkûk, Silêmanî, Dîyale,

¹⁸ Li gor ragihandina *Hetawê* bîst û yek kesên bingehîn ev in: 1. Kak Cigerxwîn - biwêj, 2. Kak Ebdulhemîd Malih - mamosta, 3. Kak Reşîd Koyî – mamosta, 4. Xuşke Nesrîn Fexrî wêjewan, 5. Hafîzî Kazî – wêjewan, 6. Kak Ehmed Osman – mamosta, 7. Şewket Xefûr, 8. Kak Îbrahîm Baldar, 9. Doktor Mirad – pîzişk, 10. Kal Ezemedîn Mustafa wêjewan (1), 11. Kak Salih Baban – mamosta, 12. Kak Tewfîq Wurdî- mamosta, 13. Xuşke Pakîze Refîq Hilmî, 14. Nacî Ebas, 15. Kak Xelîl Mihemed wêjewan, 16. Mihemed Elî wêjewan, 17. Sîdîq Etrûşî – mamosta, 18. Elaedîn Secadî, 19. Cemal Şefîq, 20. Îbrahîm Ehmed – parêzer, 21. Husên Sîwanî.

Mûsil, Hewlêr, Bexdad û Kûtê dikin¹⁹ (Hetaw, 1959: 1-5; Hîwa, 1959-1960: 99) û li ser pêşvebirin û yekxistina zimanê kurdî gotûbêjên giring dikin.

Ji bo vê armancê (1959: 18-24) şeş lijne tên damezrandin ku Lijneya Zimanê Kurdî ji 20 endam û 8 temaşekeran²⁰, Lijneya Dîroka Kurdan ji 17 endam û 3 temaşekeran, Lijneya Wergêran û Weşan û Dananê ji 15 endam û temaşekerek, Lijneya Peyrewê ji 22 endam û 2 temaşekeran, Lijneya Gêrana Birêveberî û Zanyarîyê ji 32 endam û 2 temaşekeran û Lijneya Jinavbirina Nexwendewarîyê jî ji 14 endaman pêk tê. Piştî gotûbêjên van lijneyan çend biryarên giring tên girtin û biryarên her lijneyekê ji hev cuda tên nivîsîn. Çend biryarên van lijneyan ku peywendîya wan bi plandanîn û yekxistina zimanê kurdî heye, weha ne: Ji bo pêgihandina şareza û zanyarên kurd şandina xwendekaran ji bo derveyê welatî, vekirina şaxekê ji bo vekolînên kurdî di nav Dezgeha Zanistî ya Îraqê da, ji bo amadekirina kadroyên pêwîst vekirina fakulteyeke taybetî li Zanîngeha Bexdadê, di çapkirina pirtûkan da liberçavgirtina hemû zarên kurdî, danîna ferhengê ji bo hemû zarên kurdî, derxistina kovareke zanistî û nivîsîna rêzimana kurdî. Herweha di gel gelek pêşniyazên li ser perwerdeya kurdî tê xwestin ku kar li ser alfabeya latînî bê kirin û ferhengê jî ji bo xwendekaran bê amadekirin.

Li gor ragihandina Gîw Mukrîyanî li ser pêşniyazkirina şeweyê soranî wek zimanê fermî yê nivîsînê, kurdên Tirkîye, Surîye, Behdînan û Îranê îtiraz dikin û di nav endam û beşdaran da li ser vê mijarê nakokî çê dibe. Gîw Mukrîyanî rexne li vê helwestê digire û bal dikêşe ser serdestîya zimanên farisî û tirkî û diyar dike ku cihê ku kurd ji pesendkirina zimanê fermî yê kurdî aciz bibin, divê ji sepanîna zimanên serdest aciz bibin. Ew jî alîgirê fermîkirina soranî ye lê vê di nav pêvajoyekê da baş dibîne û mercên vê yekê weha rêz dike:

¹⁹ Hin kesayetiyên giring ev in: Ji Hewlêrê; Gîw Mukrîyanî - wêjewan mêjûnûs, Mesûd Mihemed - parêzer, bi tevahî 53 kes. Ji Silêmanîyê; Dîlan - biwêj, Şakir Fetah - serokî şarewanî, bi tevahî 28 kes. Ji Kerkûkê; Merûf Xeznedar, bi tevahî 15 kes. Ji Mûsilê bi tevahî 15 kes. Ji Xaneqînê bi tevahî 6 kes û ji Kûtê bi tevahî 2 kes.

²⁰ Ev kes ji van kesan pêk tên: Îzedîn Feyzî, Umer Saqî, Cigerxwîn, Nûrî Elî, Dilzar, Salih Seîd, Nahîde Refîq Hilmî, Xuşke Şêx Selam, Kemal Ebdulqadir, Nesrîn Fexrî, Şewqîye Ehmed, Merûf Xeznedar, Tahir Ehmed, Gîw Mukrîyanî, Te. Ehmed Şûşnaw (Hej. 164, 1959: 4).

1. Mamostayên behdînî û lûr li xwendîngehên welatê soran rojê dersekê bi zarê xwe bibêjin.

2. Mamostayên soran li Behdînan û welatê birayên feylî rojê dersekê bi şeweyên xwe bibêjin.

3. Rêzimana kurdî bi arîkarîya hemû şeweyên kurdî bê amadekirin.

4. Ji bo gihîştina armanca yekîtiya zimanê kurdî ji vir û pê da her pirtûka ku bê nivîsîn divê di gel şeweyên behdînî û feylî bê peywendîdarkirin.

5. Divê ferhenga kurdî ya ku bêjeyên hemû şeweyên kurdî li xwe bigire, bê rêkxistin û çapkirin.

6. Divê em bi hemû hêza xwe kar bikin da ku yekxistina zimanê kurdî ser bigire, eger her kes bi şeweyê xwe binivîse dibe ku di paşerojê da komên kurdan bi tevahî ji hev veqetin.

7. Ji bo zimanê kurdî alfabeya herî baş û guncaw alfabeya latînî ye.

Ji bilî van pêşnîyazan, sûdên yekxistina zimanê kurdî jî di du xalan da destnîşan dike ku dê zarê hîlbijartî bi zarên din ên kurdî bê dewlemendkirin û perdeya xerîbî û cîyawazîyê di nav kurdan da bê rakirin û bi vê rêyê kurd hev baştir binasin (1959: 4-9).

Kongreya Duyem a Mamostayên Kurd li Şeqlaweyê di sala 1960ê da tê girêdan û dîsa ev kongre ji alîyê Gîw Mukrîyanî ve di hejmarên 184 û 185ê *Hetawê* da tê behskirin û herwek kongreya yekem navê beşdaran û gotarên ku hatine pêşkêşkirin tîr veguhestin (Hetaw, 1960: 1, 7-8). Dîsa herwek kongreya yekem biryarên her lijneyekê bi awayekî cuda tîr destnîşankirin lê ji alîyê yekxistina zimanê kurdî ve biryarên lijneya zimanî giring in ku ji van xalan pêk tîr:

1. Divê zarê soranî bibe binçîneya zimanê kurdî li Îraqê û ji alîyê rêziman û bêjeyan ve di gel zarên din bê têhilkişîn û ji bo vê mebestê lijneyek ji şarezayên zarên kurdî bê pêkanîn.

2. Divê dezgeheke zimanî bê avakirin û ev dezgeh destkarî di tîpên erebî yê niha da bike, destûrên rênivîsa kurdî û zaraveyên zanistî destnîşan bike, bi

sûdwegirtina ji ferhengên heyî ferhengeke giştî amade bike û kovareke zanistî, edebî û civakî derxe (1960: 28; 1959-1960: 99-100).

Mirov dikare bibêje ku Kongreya Mamostayan di çarçoveya yekxistina zimanê kurdî da dibe destpêka gengeşeyên dîrûdirêj di nav alîgirên kurmançî û soranî da ji bo hîlbijartina koda sereke ya zimanê kurdî. Loma jî Îsmet Şerîf Wanlî piştî vê kongreyê di nivîsareke xwe da yekxistina zimanê kurdî ne di çarçoveya herêmekê yan beşek ji Kurdistanê da, mijareke neteweyî dide zanîn û sepandina şêwezarê Silêmanîyê çewt dizane. Li gor wî gelek asayî ye ku axiverên her zarekî, zarê xwe xweştir û baştir bidin zanîn lê divê ev mijar bi argumanên zanistî û rasyonel bê nîrxandin. Wanlî argumanên alîgirên her du zaran jî destnîşan dike û dinirxîne. Li gor wî, alîgirên kurmançî, zarê xwe zarê piranîya gelê kurd didin zanîn ku xwedî bingeheke rêzimanî ya aşkera ye, bûye mijara vekolînên gelek zimannasan li Sovyet, Sûrîye û Parîsê, alfabeya latînî ya ku kurmançî pê tê nivîsîn ji alfabeya erebî guncawtir e û kurmançî zarê herî nêzîk e li zimanên arî yên kevin, bi taybetî jî li Zend Avestayî. Li hember vê alîgirên soranî cext li ser xweşîkbûna zarê xwe dikin, muzîkalîteya vî zarî derdixin pêş, behsa hêsanbûna rêzimana wê dikin û bal dikêşin ser pêşketinên vî zarî bi taybetî di sih salên dawî da li Îraqê (1960: 19-21).

Bi raya Îsmet Şerîf di çarçoveya devjenîyeke weha da behskirina vê mijarê bê sûd e û tu tiştekî çareser nake. Ji bo vê berê xwe dide raborîya vê mijarê ku cara pêşî di 1934ê da li Rewana Ermenistanê kongreyek tê lidarxistin û kurmançî wek zimanê hemû kurdan tê pêşnîyazkirin. Cara duyem jî li Şeqlaweyê kongreyekê tê lidarxistin û di vê kongreyê da jî zarê soranî wek zimanê hevbeş tê pêşnîyazkirin. Bi raya wî, ev her du kongre jî raya tevahîya neteweya kurd nîşan nadin, lewra ya yekem tenê bi beşdarîya kurdên Sovyetê û ya duyem jî bi beşdarîya kurdên Îraqê pêk hatîye. Loma jî hêvî dike ev her du kongre bibin wesîleya girêdana kongreyeke kurdî ya sertaserî di çarçoveya hemû neteweya kurd da (1960: 21-22).

Îsmet Şerîf biryara fermîkirina şêwezarê soranî ya Kongreya Mamostayan ji ber çend sedeman rast nabîne. Sedema yekem zêdebûna kurmançan e û dîyar dike eger zaza li ser kurmançan û hewramî jî li ser soranan bîn hejmartin nîsbeta kurmançan dibe ji sedî 62 û ya soranan dibe ji sedî 38ê hemû kurdan. Ji bo vê destnîşankirina yek ji van zaran wek zimanê nivîsînê çewt dizane û bawer nake yek ji wan jî bi zorê bê

sepandin, lewra rewşa sîyasî ya kurdan rê nade vê yekê ku zarek bi ser zarê din da bê sepandin. Loma jî wek girîmane (farazîye) dîyar dike ku eger rojek Tirkîye bibe welatekî demokratîk û mafên kurdan binase dê 6 milyon kurdên wir (li gor texmînên 1960an) bi kurmançî bixwînin ne bi soranî. Loma jî pêdagirîya birayên soran ên Silêmanîyê li ser sepandina soranî bê encam dizane. Li alîyê din eger ji nişkê ve dewleta Kurdistanê jî bê damezirandin bi raya wî dîsa soranî ji alîyê akademîyeke zimanî yan jî parlamentoyê ve nayê hilbijartin ji ber ku piranîya kurdan bi kurmançî diaxivin û di dengdaneke demokratîk da dîsa nikarin soranî bisepînin (1960: 22-28).

Ji ber van sedeman di wê bawerîyê da ye ku divê her du zar jî li ser rêça xwe ya geşedanê berdewam bin û yek bi ser ya din da neyê sepandin, lewra li gor pêşbînîya wî kurd mîna raborîyê û dema niha dê heta maweyeke dirêj jî bi van her du zaran binivîsin. Loma jî tiştê gelek aqilane pêşnîyaz dike ku kurd hewl bidin rê li ber zêdebûna cîyawazîyên navbera her du zaran bigirin û cîyawazîyên heyî jî kêr bikin. Ji bo vê mînaka norwecîyan dide ku ew jî mîna kurdan du zaran bi kar tînin û her du zar jî xwedî çapemenî û cemawera xwe ya taybetî ne lê maweyek e karbidestên vî welatî hewl didin ji her du zaran zimanekî fermî çê bikin û ev pêvajoyê hîn jî dewam dike. Wanî modela norwecî ji bo kurdan jî pêşnîyaz dike û ji bo çareserkirina vê kêşeyê vê modelê rêya herî rast û demokratîk dide zanîn, lewra sepandina zarekî, rêbaza kevin û nedemokratîk a malbatên paşa û mîran dide zanîn û li pişt sîyaseta fermîkirina soranî jî sîyaseta îngilîzan û peymana veşartî ya Sadabad û Bexdadê dizane. Bi raya wî, şîyana her du zarên kurdî jî heye ku di paşerojê da di navbera wan da yekxistin çê bibe lê ji bo vê herwek Celadet Bedirxanî bikaranîna alfabeyeyeke hevbeş pêwîst dizane û bi raya wî ev alfabe divê alfabeya latînî be, lewra zehmet dizane ku kurdên Tirkîyeyê hînî alfabeya erebî bibin, loma jî pêşnîyaz dike ku kurdên Îraqê alfabeya latînî bipejirînin û bi kar bînin (1960: 28-33).

Di heman salê da Hejar bi namîlkeya xwe ya *Soranî yan Kirmançî* bersiv dide Îsmet Şerîfî û hin bîr û rayên wî red dike. Hejar li hember zêdebûna hejmarî, dîyardeya pêşketinê derdixe pêş û dîyar dike ku herçend li Tirkîyeyê 8 milyon kurd hebin jî yek rojname û kovareke wan nîne. Li alîyê din pêşketina zimanî bi pêşketina tevgera neteweyî ve girê dide û dîyar dike ku ji sala 1919ê û vir ve di mînaka hukumeta Şêx Mehmûdî û Komara Kurdistanê ya Mehabadê da kurdîya soranî dibe zimanê fermî, gelek weşan bi vî zarî derdikevin û pêşketineke berbiçav tê da çê dibe. Li hember vê

ji ber pêkûtîyên li ser kurdên Tirkîye û Sûrîyeyê û nebûna mafên zimanî li van welatan kurdên welatên navborî di qonaxa alfabeyê da dide zanîn (1960: 15-25).

Hejar di roja îro da gengeşeyeke weha li dijî berjewendîyên neteweyî yên kurdan dide zanîn û di wê bawerîyê da ye ku dijminên kurdan amade ne hemû tiştî li dijî wan bi kar bînin. Ji ber vê hewl dide vê gengeşeyê vemirîne û serê wê bigire. Herçend rexne li Îsmet Şerîfî bigire jî ji alîyê riwangeha çareserîyê ve boçûnên wî nêzî boçûnên Îsmet Şerîfî ne, lewra ew jî di wê bawerîyê da ye ku ev mijar li ser maseyê nayê çareserkirin, halê hazir her zarekî kurdî di bin mercên cîyawaz da pêş dikeve û dê dîrok nîşan bide kîjan ji wan di paşerojê da cihê xwe digire. Lê heta wê çaxê divê her kurdek bi hemû şeweyên kurdî alîgirîya xwendina kurdî bike, ji bo vê bang li kurdên kurdên soran dike ku piştgirîya xwendina birayên xwe yên kurmanç bikin. Ji alîyê peywendîya her du zaran jî dîyar dike ku divê soranî bê kurmançîkirin û kurmançî jî bê soranîkirin da ku di navbera wan da danûstendina bîr û rayan bê xurtkirin, lewra bi dîtina wî hem kurdîya kurmançî û hem jî kurdîya soranî xwedî hêzên mezin in û heta gihîştina armancê ku ew jî azadî û yekgirtina Kurdistanê mezin e, divê her du zar jî bîr bîkaranîn û pêşxistin. Dema ku ev armanca sîyasî pêk bê wê demê li gorî daxwaza her du alîyan, bi desthilata zanistî, pîrbûna xwendewarîyê, pevgihîştin û danûstendina gencîneya edebî, nivîsîn, çîrok, helbest û dîroka her du alîyan dê çareserîyeke guncaw bê dîtin û yek ji wan bê hîlbijartin (1960: 16-27).

Salek paşê Ebdulsitar Kazim jî beşdarî vê gengeşeyê dibe û dîyar dike ku di nav kurdan da li ser yekxistina zimanê kurdî sê boçûn hene. Hinek alîgirîya behdînî, hinek alîgirîya soranî û hinek jî alîgirîya muturbekirina (tehmandin) şeweyên kurdî dikin. Li gor wî alîgirên behdînî xwe dispêrin wê yekê ku piranîya kurdan bi şeweyê wan diaxivin lê bi raya wî merc nîne şeweyê piranîyê bibe zimanê zanist, huner û edebîyatê. Li hember vê, alîgirên soranî dîyar dikin ku ev demek e soranî bûye zimanê edebîyat û nivîsînê, rêzîmaneke wê ya rêkûpêk heye û normên wê cihgîr bûne. Kazim, van kesan qure û jixwerazî dide zanîn û tevlihevîya dariştina zaraveyên nû li ser destê van kesan mînaka vê qurebûna wan a pûç dide zanîn. Bi bawerîya wî, ji vî alîyê ve wê desteyê zîyan gihandîye zimanê kurdî û bûne sedema tevlihevîya zaraveyan. Alîgirên muturbekirinê jî dixwazin soranî bikin navend û wê bi bêjeyên şewezarên din dewlemend bikin û paşê şewezarên din bi yekcarî ji nav bibin. Bi raya wî ev rêbaz jî

zîyan digihîjîne zimanê kurdî û nabe sedema çakkirin û yekxistina hemû şêweyên kurdî (1961: 23-25).

Ji bilî van her sê pêşnîyazan bi raya wî, ji bo pêkanîna zimanekî edebî û zanistî ku di gel pêwîstîyên şaristanîya serdemê bigunce, divê kurd xwe bispêrin zanista zimanî û bi awayekî zanistî di hemû şêwezaran da li ser vekolîna reh û rîşeya bêjeyên kurdî kar bikin. Ji vî alîyî ve rêziman û ferhengên kurdî yên berdest encama xebatên karên kesî dizane û guman dixê ser şarezabûna nivîskarên wan. Bi dîtina wî ji bo karekî rast û rêkûpêk li ser zimanê kurdî bê kirin divê xebatkarên vî warî şarezayê hemû şêweyên kurdî, zimanên rojhilatî, bi taybetî farisî, tirkî û erebî bin. Herweha ev kes divê şarezayê zimanê latînî û zimanên kevin ên wek sanskrîtî bin jî. Kazim, vî karê giran ne karê çend kesan, karê Kozimanekî Zanyarî Kurdî (Akademî ya Zanistî ya Kurdî) dizane ku ji desteyek zana û kesên dilsoz pêk hatibin. Bi raya wî tenê bi vî rêyê zimanê kurdî ji vî tevlihevîya heyî rizgar dibe û di nav zimanên giring ên bîyanî da dikare cihê xwe yê hejî bigire (1960: 27).

Di kovara *Rojî Nwê* da A. Cejnî piştî ku behsa jevdûrketina zarên kurdî dike, çareserkirina vî bi salek û du sal û deh salan mumkîn nabîne û cih dide hin cîyawazîyên kurmancî û soranî (1961: 1). Bawî Tenya jî bal dikêşe ser wê yekê ku mijara yekxistina zimanê kurdî bi Şoreşa 14ê Tîrmehê (1958) gur dibe û biryarên Kongreya Mamostayan li Şeqlaweyê baş bizane jî bi raya wî ji ber nebûna desthilata vî kongreyê biryarên wê li ser kaxezî dimînin. Li gor wî heta niha jî bo çareserkirina vî karê dijwar ji bilî pêşnîyazan tu karekî nehatîye kirin û ew jî herwek pêşîyên xwe pêşnîyaz dike ku dezgeheke zimanê kurdî (Kozimanekî Kurd) bê avakirin û ji ber xalên jêrîn ji bo vî karî zemîna siyasî û çandî ya Başûrê guncaw dizane:

1. Piştî Şoreşa Temûzê Komara Îraqê xwe wek komara ereb û kurdan dinasîne.
2. Hemû şêweyên kurdî li Başûrê hene û dê nûnerên wan di vî da cih bigirin.
3. Dê sûd ji pisporên kurdên Sovyetê bê wergirtin û ew jî bîr vexwendin.
4. Hinek nivîskar û şarezayên zimanî ji Kurdistana Îran û Sûriyeyê li Îraqê ne, ev kes bi hêsanî dikarin beşdarî xebatên vî dezgehê bibin.

Taybetmendî û mercên vî dezgehê jî weha rêz dike:

1. Divê ev dezgeh fermî be û ji alîyê Komarê Îraqê ve budçeya wê bê terxankirin.

2. Divê desthilata vê dezgehê hebe ku biryarên xwe li Kurdistana Îraqê û di nav kurdên Sovyetê da bixe kar.

3. Hemû weşan û pirtûkên ku ji vir û pê da bên weşandin divê di çarçoveya biryarên vê dezgehê da bên çapkirin.

4. Divê ev dezgeh bikare cureyê nivîsîna kurdî daîne û dê ev bibe rêya herî baş ji bo yekgirtina şeweyên zimanê kurdî û çareserkirina vê dijwarîyê (1961: 75-76).

Ji van pêşnîyaz û gengeşeyan derdikeve ku heta roja îro mijara herî giring a plandanîna zimanê kurdî hîlbijartina normê ye ku di nav kurdan da bi navên ziman edebî, zimanê yekgirtî yan jî zimanê standard tê binavkirin. Lewra nebûna yekîtiya sîyasî û dabeşbûna civaka kurdî dibin sedem ku ev mijar di serdema modern da neyê çareserkirin. Ji ber asta xwendewarîya bajarê Silêmanîyê û ji destpêka avakirina Îraqê binecehkirina hin mafên çandî û zimanî li vê herêmê dibin sedem li ser şewezarê Silêmanîyê wek zimanê standard xebatên baş bên kirin û ev şewezar bi pêş bikeve. Ji bo vê ronakbîrên başûrî her ji avakirina Îraqê ve kar dikin ku ev şewezar ji alîyê hemû kurdan ve bê bikaranîn û wek zimanê hevbeş cih bigire. Yek ji sedemên avakirina akademîyeke zimanî ev e ku ev kar biçe serî. Loma jî em dikarin bibêjin ku hîn berî damezirandina wê bernameya Korî Zanyarî Kurd wek daxwaz û pêwîstî tîn destnîşankirin.

2.2.7. Danîna Zaraveyên Zanistî

Danîna zaraveyên zanistî di dema nivîsîn û wergêrana pirtûkên perwerdeyê da dikeve rojeva kurdên Îraqê û li gor ragihandina Hasanpourî (2005: 492) bi vê mebestê di navbera salên 1930-1950yê da gelek zarave tîn dariştin. Di salên 1952-1953ê da jî Cemal Nebez û çend hevalên wî yên li Zanîngeha Bexdadê ji bo danîna zaraveyên zanistên fîzîk, kîmya, matematîk, gîyanewernasî, rêziman û yên din komeleyek ava dikin lê ev komele zêde namîne û tu karekî wan ê berbiçav çê nabe. Ji bilî vê hewldana komî, Nebez bi serê xwe jî li ser vê mijarê hûr dibe. Ji ber vê dema ku li Kerkûkê mamosta ye li ser zaraveyên matematîk û fîzîkê kar dike û di 1956ê da bi navê *Seretay Cebirê* pirtûkekê dide çapkirin. Herweha di 1960ê da li ser fîzîkê bi navê *Seretay Mekanîk û Xomalekanî Madde* pirtûkekê dide çapkirin ku ferhenga kurdî-erebî-îngilîzî

ya dawîya vê pirtûkê wek yekem ferhenga zaraveyên kurdî tê pejirandin. Di heman salê da namîlkeyek jî bi navê *Hênd Zaraway Zanistî* li Silêmanîyê dide çapkirin (1976: 15-18) û bi van xebatên xwe dibe yek ji kesayetîyên giring ên vê qadê.

Di serdema komarî da bi avakirina “Berêweberayeti Xwêndinî Zimanî Kurdî” (1959) di nav Wezareta Perwerdeyê da ev hewldan rengekî damezraweyî û komelî werdigirin. Di vê çarçoveyê da di nav vê rêveberîyê da ji bo dariştina zaraveyên zanistî pênc lijne tên avakirin û bi vî awayî mijara zaraveyan bi awayekî berfireh dikeve rojeva kurdên Îraqê. Ev lijne di warên zanist, rêziman, edebîyat, perwerdeya neteweyî, matematîk, kargêrî û sîyasî da kar dikin û encama karên xwe cara pêşî di *Rojî Nwê* da û paşê jî bi rêya Neqabey Mamostayan (Sendîkaya Mamostayan) bi navê *Zaraway Zanistî Kurdî* (104 rûpel) di sala 1960ê da li Silêmanîyê diweşînin.

Di hejmara pêncem a *Rojî Nwê* da di bin sernavê “Zaraway Bîrkar”ê da pêşî zaraveyên matematîkê tên weşandin ku di stûna pêşî da erebîya wan û di stûna duyem da jî kurdîya wan tê danîn. Di destpêkê da tê ragihandin ku ev zarave ji alîyê lijneyekê ve hatine danîn ku ji Ebubekir Hewrî, Cemal Celal, Cemal Îbrahîm, Ehmed Herdî, Usman Arif pêk tên (1960: 59). Bi vî awayî di hejmara pêncem da 343 û di hejmara şeşem da jî 401 zarave²¹ tên weşandin.

Di heman hejmara pêncem da di bin sernavê “Zaraway Tendirustî”yê da bi îmzeya Diktor Qadir Şalî 34 zaraveyên tendirustîyê bi erebî û kurdî tên weşandin. Di hejmara şeşem da di bin sernavê “Zarawekanî Perwerdey Nîştimanî bo Qutabxaney Seretayî û Nawendekan”ê da 426, di bin sernavê “Zaraway Destûrî Polî Şeşî Seretayî”yê da 44, di bin sernavê “Pêristî Zaraway Destûrî Polî Dûy Nawendî”yê da 50 û di bin sernavê “Zaraway Tendirustî”yê da 32 zarave tên weşandin. Herî dawî di hejmara heftem da jî wek dewama “Zaraway Perwerdey Nîştimanî”yê ya hejmara şeşem 174 zarave tên weşandin.

²¹Çend zaraveyên vê listeyê weha ne: renûs (reqem), jimare (eded), rakoş (temrîn), bîrdoz/tîyor(nezerîye), petî (xalis), kajêr (saet), xulek (deqîqe), çirke (sanîye), sat (lehze), awête (murekeb), têkel (muxtelîf), helwêst (farize), kat (weqt), çerx/sede (qern), amraz (alet), berawird (muqarene), pêwan (qiyas), qebare (kîyan), nawend (merkez), arastekirdin (tewcih), taqîkirdin (tecrube) (hej., 59-66), rasteqîne (heqîqet), pênase (terîf), şepol (mewc), herêm (menteqe), yeke (wehde), derûn (nefs), berjewend (mesalih), tengûçeleme (ezme) (hej. 6, 79- 87).

Her di hejmarê şeşem a *Rojî Nwê* da Cemal Nebez wek plandanerekî giring ê zimanê kurdî ku ji salên 1950yan ve li ser danîna zaraveyên zanistî kar dike, di çend hejmarên vê kovarê da (hej. 6-7-8-11) bi zincîreyeke gotaran rexne li zaraveyên bîrkarîyê yê lijneya navborî digire û bi vê boneyê ji alîyê xwe ve rêbaza danîna zaraveyên zanistî destnîşan dike. Li gor wî, ji bo danîna zaraveyên zanistî pêwîstî bi damezirandina “korêkî zimanewanî” (akademîyeke zimannasîyê) ya mezin heye ku endamên wê ji şarezayên hemû şêwezarên zimanê kurdî, nûnerên hemû beşên Kurdistanê, şarezayên rojhilatnas û şarezayên zimanên bîyanî û zanistan pêk hatibin. Bi raya wî endamên vê dezgehê divê zimanên cîran û hevmalbat ên kurdî yên mîna farisî, efxanî, hîndî, frensî, îngilîzî û zimanên din ên arî bizanin û ji awayên xebatên akademîyên zanistî yên welatên bîyanî jî agahdar bin. Ji bo şeweyên karkirina vê dezgehê jî diyar dike ku divê endamên vê dezgehê di serî da bi hûrî li ser hemû şeweyên zimanê kurdî vekolin û ji her alîyê ve kêmasîyên zimanê kurdî destnîşan bikin, hemû kovar û rojnameyên kurdî yên ku heta niha derketine li ber destê wan be û desthilateke taybetî ya endamên vê dezgehê hebe ku bikarin ji hemû dezgehên fermî bi hêsanî çavkanîyên pêwîst peyda bikin (1960: 103-104).

Nebez, li ser danîna zaraveyan diyar dike ku ji ber ku xwendewarên kurd bi zimanên erebî, farisî û tirkî dixwînin divê pêşî navên wan ên zanistî yên bingeîn bi van zimanan bîn nivîsîn û paşê ev zarave bi rêya rojname, kovar, namîlke û radyoyê bîn belavkirin û ji xelkî bê xwestin ku bergindên van bêjeyan binivîsin û ji dezgeha navborî ra bişînin. Eger ev bi awayê pêşbazî û xelatkirinê be dê baştir be. Ji bo vê armancê divê di nav akademîya zimanî da çend lijneyên taybetmend bîn avakirin da ku ev kes di nav gelî da bigerin, bi taybetî jî li gundan, paşê ev bêje ji alîyê zanyarên akademîyê ve yek bi yek bîn nirxandin û di encama vê da jî ferhengeke zanistî bê pêkanîn û çapkirin. Li gor plana wî divê ev ferheng bi ser şareza, mamosta, rojhilatnas û xelkî da bê belavkirin û ji bo rexnegirtin û nirxandina wan maweya salek bi wan bê dayîn. Piştî wergirtina rexneyên wan jî bi civîneke dawî ev bêje bîn hilbijartin (1960: 104-105). Bi raya wî di dariştin û destnîşankirina zaraveyên zanistî da divê ev rêbaz li ber çavan bê girtin:

1. Ew bêjeyên kurdî yên ku bîn dariştin divê bi temamî mana û mebesta bêjeyên bîyanî bigirin, bi kêmanî nêzîkî wan bin.

2. Di dariştina van zaraveyan da divê şêweyên kurdî li ber çavan bê girtin û di kîjan şêweyî da bêjeyeke xweşik û dilgîr hebe ew bê wergirtin.

3. Zaraveyên hîlbijartî divê li ser ziman sivik û sade û rewan bin û awazekî wan ê taybetî hebe. Ji vî alîyî ve tîpên “z, j, f, î”yê muzîkal dibîne lê heman muzîkalîteyê di tîpên “q, ş û x”yê da nabîne.

4. Di danîna zaraveyan da divê erebî nebe pîvana bingeîn û zimanê kurdî bi terazûya rêzimana erebî neyê kêşan, lewra peywendîyeke binçîneyî ya erebî û kurdî bi hev ra nîne, berevajî zaraveyên ku tîpên dariştin divê ruhekî kurdî bi wan bê dayîn.

5. Tîpên ku li ser ziman giran in di hemû zimanan da hêdî hêdî ji nav diçin, loma jî bi merca ku manaya bêjeyê tîk neçe kurtkirina bêjeyan karekî baş dibîne. Ji bo vî mînaka “katjimêr”ê dide ku bi dîtina wî piştî demekê ji bo giraniya wê dê tîpa “t”yê her bikeve. Ji ber vî jî niha ve eger ev bêje wek “kajmêr”ê bê destnîşankirin dê baştir be. Herweha di mînaka bêjeya “netewe”yê da pirhejmarkirina wê bi paşgira “-kan”ê wek girankirina zimanî dibîne û di şûna vî paşgirê da paşgira “gel”ê pêşnîyaz dike ku di vî rewşê da ev bêje dibe “netewegel” û siviktir dibe.

6. Zaraveyên hîlbijartî divê du manayan nedin û ji alîyê manayê ve zelal bin. (1960: 105-107).

Di hejmarên 7, 8 û 11ê da jî zaraveyên lijneyê yên ku bi raya wî şaş hatine dariştin, li gor van pîvanên destnîşankirî dinirxîne û di şûna wan da pêşnîyazên xwe destnîşan dike. Bo nimûne “rasteqîne” jî bo “heqîqet”ê hatîye danîn lê bi bawerîya wî rasteqîne “heqîqî” ye. (1960: 85), jî bo “te’yîn”ê “dîyardî” hatîye danîn lê ew “dîyarîkirdin”ê pêşnîyaz dike (1960: 87) û bi vî awayî 51 zaraveyan dinirxîne û pêşnîyazên xwe rêz dike.

Li ser rêça Nebezî, Xefûr Reşîd jî bi nivîsara xwe ya “Serincêk le Perawî Zarawey Zanistî Kurdî” rexne li pirtûka *Zarawey Zanistî Kurdî* digire ku ji alîyê Neqabey Mamostayan ve hatîye weşandin. Xefûr jî wek Nebezî dîyar dike ku her kesê ku li vî pirtûkê temaşe bike dê fam bike ku bi zûyî û bê lêhûrbûn hatîye amadekirin û negihîştî ye. Li gor wî, ev xebat dê bingeha zanistî ya kurdî daîne lê kesî heta niha li ser wê tu rexneyek nenivîsiye. Ji bo bicihanîna vî erkê di mînaka çend zaraveyên cografyayê da kêmasîyên zaraveyên vî xebatê destnîşan dike. Bo nimûne ji bo “okyanûs”ê “derya” hatîye danîn lê bi awayekî heqdarane dîyar dike ku “okyanûs” û

“derya” du tiştên cuda ne. Ji bilî vê, biryarên Kongreya Mamostayan li Şeqlaweyê bi bîr tîne ku pêwîst e bêjeyên ku di şeweyê soranî da nebin ji şeweyên din ên kurdî bîn wergirtin. Ji bo vê jî mînakê bêjeyên “bakûr” û “başûr”ê dide ku di vê xebatê da li ber çavan nehatine girtin û ji bo “başûr”ê bêjeya “xwarû”yê hatiye tercîhkirin (1961: 27-28).

Rêveberîya Xwendina Zimanê Kurdî wek dezgeheke fermî ya berî Korî Zanyarî Kurdê, di salên 1960 û 1970yan da di danîna zaraveyên zanistî da roleke berbiçav digêre. Piştî ku bi navê *Zaraway Parêzgay Silêmanîyê* di 1971ê da namîlkeye 34 rûpelî diweşîne (Nerîman, 1988: 54), bi armanca başkirina pirtûkên xwendingehên kurdî li jneyekê li Hewlêrê û yekê jî li Silêmanîyê ava dike. Lijneya Silêmanîyê ji bo komkirin, yekxistin û rêxistina zaraveyên pirtûkên komelayetî yên xwendina seretayî, navendî û amadeyî tê raskartin ku ji Şakir Fetah, Ebdulxefûr Mela Elî, Refîq Fethulah, Cemal Xefûr, Umer Mistefa Kerîm, Behcet Seîd Kaban, Ebdulkerîm Mihemed û Ehmed Tofîq pêk tên. Lijneya Hewlêrê jî ji bo komkirina zaraveyên pirtûkên zanistên matematîkê û pirtûkên zanistî yên din tên peywirdarkirin ku ji Kemal Celal Xerîb, Feysel Mistefa Hacî, Îsmail Mihemed Xoşnaw, Ehmed Ebdula Ebas, Ebdusemed Mihemed Emîn, Cemal Ezîz û Xalîd Umerî pêk tên (Destey Nûseran, 1974: 3).

Lîsteya yekem a zaraveyên van li jneyan di 1972yê da di hejmara 4em a kovara *Perwerde û Zanistê* da tê weşandin. Di vê lîsteyê da 689 zaraveyên matematîkê (1972: 9-40), 2115 zaraveyên zanistê (1972: 41-136), 670 zaraveyên komelayetî (1972: 136-167), 583 zaraveyên rêziman û edebîyatê (1972: 168-194) û 22 zaraveyên bergirîya milî tên weşandin (1972: 195) ku bi tevahî dikin 4079 zarave. Lîsteya duyem jî di 1974ê da di hejmara 7-8em a *Perwerde û Zanistê* da tê weşandin. Di vê lîsteyê da jî 1136 zaraveyên zanistên giştî, 151 zaraveyên stêrknasî û cografyayê, 854 zaraveyên kîmyayê, 996 zaraveyên zanista zindîweran, 609 zaraveyên matematîkê, 743 zaraveyên fizîkê, 205 zaraveyên dîrokê, 472 zaraveyên cografyayê û 465 zaraveyên perwerdeya nîştîmanî tên weşandin (1974: 5-289) ku bi tevahî dikin 5631 zarave. Hêjayê gotinê ye di van her du lîsteyan da jî gelek caran mirov rastî zaraveyên dubare dibe û carinan di heman kategorîyê da jî hin zaraveyên dubare tên dîtin. Tevî van kêmasîyan ev hewldanên Rêveberîya Xwendina Zimanê Kurdî di pêşvebirina zaravesazîya kurdî da gelek giring û hêja ne.

Tevgera petîgerîyê ji salên 1920an heta 1950yê bi giştî li ser petîkirina zimanî hûr bibe jî di salên 1950yan da bi destpêşxerîya kesayetîyên mîna Cemal Nebezî û bi avakirina Desteya Rêveberîya Xwendina Kurdî zaravesazîya zanistî dikeve rojeva kurdên Îraqê û heta avakirina Korî Zanyarî Kurdê hin pirtûk û listeyên zaravesazîyê yên giring tên weşandin û ji vî alîyê ve jî berî avakirina vê dezgehê di warê rêbaza zaravesazîyê û amadekirina hin zaraveyên zanistî da bingeheke baş tê danîn û Korî Zanyarî jî di rêbaza xwe ya destnîşankirina zaraveyan û listeyên xwe yên zaravesazîyê da ji van xebatan sûd werdigire.

2.2.8. Berfirehkirina Qadên Bikaranîna Kurdî

Nûjenkirina zimanî şaxeke giring a plandanîna zimanî ye û ev jî bi berfirehkirina qadên zimanî ve girêdayî ye. Zimanê kurdî yê ku di serdema pêşmodern da bi piranî di qada helbest û honraweyê da tê bikaranîn bi derketina rojname û kovarên kurdî bi awayekî berfireh di warê pexşanê da jî tê bikaranîn. Hêjayê gotinê ye pexşanên kovar û rojnameyên kurdî yên li Stenbolê bi giştî di çarçoveya nûçe, gotarên civakî û siyasî da ne û herçî wergêran in ji bilî çend deqên Xelîl Xeyalî tiştekî nayê nivîsîn. Meyla berfirehkirina qadên bikaranîna kurdî li Kurdistana Îraqê ji *Peşkewtinê* û bi şûn da her ku diçe zêdetir dibe û ji bilî zêdebûna wergêranê qad û temayên nû yên bikaranîna kurdî peyda dibin.

E. B. Soana di *Peşkewtinê* da ji hejmara 59ê heta 79ê bi navê *Nat Pînkirtone* kurte romaneke polîsî ji îngilîzî werdigêre ser zimanê kurdî û beş bi beş di rojnameyê da diweşîne. Herweha ji hejmara 78ê heta 99ê bi navên *Kolanêk Lefentene Erz* û *Le Malî Koyxayê* du deqên edebî yên Alexandre Dumasî ji bo kurdî werdigêre. M. Nûrî jî di hejmara 92yê da bi navê “Tefekur”ê helbesteke Reçaîzade Mehmûd Ekremî ji tirkî dike kurdî. Mîrov dikare bibêje ku ev nerîta wergêranê û berfirehkirina qadên bikaranîna kurdî di hemû kovar û rojnameyên kurdî da berdewam û bihêztir dibe. Lê bi dîtina me, ev diyarde bi kovara *Gelawêjê* hem ji alîyê curbicurîya mijaran ve hem jî ji alîyê wergêranê ve digihîje asteke bilind ku hêjayê amajepêkirinê ye.

Berfirehkirin û nûjenkirina zimanî di hejmar û nivîsara pêşî ya *Gelawêjê* da ji alîyê Bileyî ve (Îbrahîm Ehmed) tê derbirîn ku xwedîyê kovarê ye. Bile armanca pêşî ya kovarê vebijartina zimanê kurdî û vejandina edebîyata kurdî dide zanîn û vê jî bi rêya parastin û komkirina edebîyata kevin, belavkirina edebîyata nû, wergêrana

nivîsarên xweşik û pirtûkên baş ên bîyanî mumkîn dibîne (1939: 2). Bi rastî jî di maweya deh salan da (1939-1949) ji hemû şaxên edebîyatê heta ziman, dîrok, cografya, civaknasî, felsefe, sîyasetnasî, vekolîn, tefsîr, rexne, bîyografi, qerf, gotinên pêşîyan, gotinên nesteq (wecîze), edebîyata zarokan, perwerde, werziş, muzîk û tendirustîyê di gelek waran da nivîsarên curbicur di *Gelawêjê* da tên weşandin.

Bi taybetî nivîsarên berdewam ên tendirustîyê ku ji Amerîkayê ji aliyê Tahir Behcet Merîwanî û ji Kerkûkê ji aliyê Doktor Ebdurehman Ebdulayî ve tên weşandin di vî warî da deqên giring in ku ji bo zimanê kurdî qadeke xam e. Ji bilî vê, Şêx Mihemed Xal di gelek hejmarên *Gelawêjê* da bi tefsîra Quranê herwek hewldana Kamran Bedirxanî ya di *Hawarê* da dixwaze zanyarîyên dînî bi kurdî kod bike da ku di vî warî da jî kurdî bê bihêzkerin. Herweha gotarên zimannasîyê yê Tewfîq Wehbî, gotarên dîrokî yê Mihemed Emîn Zekî, helbestên Pîremêrd, Goran, Herdî, Selam, Dildar, Zêwer, Bêkes û Qaniî û di her hejmarekê da weşandina çîrokên wergêrayî û dananî hêjayê behskirinê ne.

Herçî wergêran e yek ji xalên herî bihêz ên *Gelawêjê* ye ku bi piranî ji îngilîzî û hin caran jî ji fransî, almanî û rûsî rasterast yan jî kêman caran bi rêya erebî tê encamdan. Wergêranên kovarê herî zêde di warên çîrok, helbest û gotaran da tên dîtin û wergêrên diyar ên kovarê jî Eyn. Eyn., Hamid Ferec, Umer Qezaz, Nacî Ebas, Kerîm Mihemed, Îbrahîm Ehmed (Î.Î., N. Î), Eyn. T., H. L. B., Mihemed Tewfîq, F. Mihemed, F. R., Cemal Xefaf, Silêman Rewandizî, Yusif Emîn, F. Ç., Remzî Qezaz, S. Nakam, Osman Mistefa, Ebdulqadir Qezaz, Ehmed Şalî, Ekrem Ebdulqadir Etar, M. Azad in. Bêguman di nav van kesan da ji aliyê wergêranê ve kesê herî çalak xwedîyê kovarê Îbrahîm Ehmed e ku di maweya deh salên *Gelawêjê* da 24 çîrok, 25 helbest û 53 gotaran werdigêre (Elî, 2002: 155-241) û di vî warî da karekî giring dike.

Ji bilî van xebatên navborî di hin hejmaran da carinan beşên pirtûkan jî ji îngilîzî tên wergêran ku *Berew Bazirganîya* (Enter The Trade) Maus Worldly Goodsî ji aliyê Ewnî Yusifî ve, beşek ji pirtûka *Geştekanî Çayld Harulda* Lord Bayron ji aliyê Refîq Çalakî ve, beşek ji pirtûka *Geştî Kilodîws Rîç le Kurdistanaya* (Narrative of a Redident in Koordistan) Claudius James Richî ji aliyê Nacî Ebasî ve, “Çî Serbestî Nîye” (What Freedom Is Not) û “Manay Rasteqîney Serbestî” (The Real Meaninig Fredom) ji pirtûka *Felsefe Çî yeya Haward Silsamî* û gotara “Bîrkirdnewe le Kurd”a

E. J. R. yî ji kovara *Mecxeyê* ji aliyê Baye Eliyê ve tên wergêran. Ji bilî zimanên rojavayî ji zimanên rojhilatî jî hin deqên edebî û yên din ji aliyê Selam, Salih Hîrrî, Ibrahîm Remezan, Mihemed Salih Cefer, Şewqî Ezîzî û K. yî ve tên wergêran lê gelek deqên wergêrayî jî hene ku wergêrên wan nedîyar in.

Ev curbicuriya qadên bikaranîna kurdî ya ku di mînaka kovara *Gelawêjê* da li ber çavan dikeve di pirtûkên çapbûyî da jî tê dîtin. Li gor Hassanpourî ji sala 1920ê heta 1957ê pirtûkên kurdî yên çapbûyî di warên edebîyat, dîn, siyaset, dîrok, ziman, exlaq, folklor, perwerde, muzîk, bîyografî, cografya, hiqûq, leşkerî, cotyarî, hunerên ciwan, îdeolojîyê da ne û ji 1958ê heta salên 1970yan jî li warên navborî felsefe, bîblîyografya, rojnamegerî, aborî û tenduristî zêde dibin (2005: 310) ku hejmara van pirtûkan ji sala 1920ê heta 1970ê digihîje 739 pirtûkan (Abdulla, 1980: 165-166).

Mistefa Nerîman jî di xebata xwe ya *Bîblîyografyay Dused Salî Kitêbî Kurdî 1787-1986* da mijarên pirtûkên vê serdemê di şeş kategoriyan da kom dike ku ji dîn (Quran, tefsîr, hedîs, ferzên îslamê, şerîet, eqîdeya îslamî, fikir û felsefeya îslamî, xû û rewîştî îslamî, mewlûdname, navdarên îslamê, cengnameyên îslamî, dînê îsewî, dîn û mezhebên din) (1988, 20-47), ziman (ferheng, zarave, rêziman, rênivîs, alfabe, hînbûna ziman û xwendinê) (1988, 48-68), edebîyat (edebîyat bi giştî, rexne û vekolîna edebî, destan û efsane, roman, edebîyata gelan, dîwan-helbest-honrawe, helbestên wergêrayî, çîrok, çîrokên wergêrayî, edebîyata zarokan, şanogerî, pexşan, hinekên din) (1988, 69-190), komelayetî (dîrok, cografya, jînnamê, bîranîn, geşt, komelayetî, folklor, huner û hunerên ciwan, lîstîk û werziş) (1988: 191-238), zanist û zanyariya giştî (bîblîyografya, rojnamevanî, zanista giştî, tenduristî, perwerde, kiştûkal (zîraet), ramiyarî (siyasetnasî), gotarên karbidestî (xîtabe)) (1988: 239-278) û ji pirtûkên xwendîngehan (1988: 279-314) pêk tên.

Xebata Nerîman nîşan dide ku ji bilî curbicuriya mijaran ji aliyê hejmara çapkirina pirtûkan ve jî Kurdîstana Îraqê li gor beşên din ên civaka kurdî bi awayekî gelek berbiçav di rêza yekem da ye ku ev jî ji aliyê standardî û pêşveçûna plandaniya zimanî da serkeftina kurdîya soranî nîşan dide li hember kurmancî û zarên din. Li gor vê xebatê, di navbera 1920-1929ê da Li Îraqê 36 pirtûk li derveyê Îraqê 7 (1988: 399), di navbera 1930-1939ê da li Îraqê 78 li derveyê Îraqê 77, di navbera 1940-1949ê da li Îraqê 48 li derveyê Îraqê 14, di navbera 1950-1959ê da li Îraqê 252 li derveyê Îraqê

56, di navbera 1960-1969 li Îraqê 297 li derveyê Îraqê 60, di navbera 1970-1979ê da li Îraqê 868 li derveyê Îraqê 33 û di navbera 1980-1986ê da li Îraqê 922 li derveyê Îraqê 84 pirtûkên kurdî tên çapkirin (1988: 399-401).

Ev tablo nîşan dide ku herçend bi biryareke fermî nebe jî kurdîya soranî wek koda hîlbijartî derdikeve pêş, lewra rêjeya pirtûkên çapbûyî yên Kurdistana Îraqê li hember cihên din ji sedî 80 ye (Nerîman, 1988: 385) û ji sedî 96.6ê pirtûkên çapbûyî yên Kurdistana Îraqê jî bi kurdîya soranî ne. Ji bîbliyografyaya Nerîmanî derdikeve ku çend pirtûkên kurmancî yên ku tên çapkirin jî piştî 1958ê tên çapkirin û hejmara wan gelek sînordar e. Ev qadên curbicur û hejmara pirtûkên weşandî nîşan dide ku di vê maweyê da soranî li hember zarên kurdî yên din bê rikeber e û ev jî asta berfirehî û pêşveçûna vî zarî nîşan dide.

2.3. PLANDANÎNA ZIMANÊ KURDÎ DI SERDEMA SOVYETÊ DA

Sovyet ji piranîya welatên serdema xwe cudatir ne li ser îdeolojîyeke neteweyî, li ser bingeha îdeolojîyeke çînî tê damezirandin. Ji ber vê yekê mafên geşepêdana çandî û zimanî dide hemû etnîsîteyên navxweyî û li gor hêz û hejmara wan piştgirîya pêşveçûna wan dike. Kurd bi qasî neteweyên xwedî komar nebin jî di kategorîya “neteweyên biçûk” da heta radeyekê ji derfetên vê sîyasetê sûd werdigirin lê ji ber rewşa paşdamayî ya civaka kurdî ya Sovyetê heta kadroyên çandî yên kurdan tên pêgihandin ronakbîrên ermenî û kurdnasên bîyanî piştgirî didin bizava geşkirina zimanê kurdî.

Ji ber vê cara pêşî Hakop Xazaryan di 1921ê da bi weşandina pirtûka *Şemsê* li ser tîpên ermenî ji kurdên Sovyetê ra alfabeyekê datîne lê ji ber neguncana vê alfabeyê li zimanê kurdî di Kongreya Kurdî ya Transqafkasyayê da tê pêşnîyazkirin ku li ser bingeha alfabeya latînî ji bo kurdên Sovyetê alfabeyeke nû bê amadekirin (Reşît, 2012: 204). Loma jî li ser biryara Hikumeta Ermenistanê ya Sovyetê di sala 1928ê da Îsahak Marogûlov û Erebe Şemo dest bi danîna alfabeya latînî ya kurdî dikin û ev alfabe bi navê *Xo Xo Hînbûna Xwandina Nivîsara Kurmancîyê* tê çapkirin û bi vê alfabeyê di serî da rojnameya *Rîya Teze* gelek deqên edebî, sîyasî û perwerdeyî tên weşandin.

Di 1930an da bi piştgirîya dezgehên fermî yên Sovyetê zimanê kurdî (kurmancî) li Ermenistan, Gurcistan û Azerbaycanê di dezgehên perwerde û ragihandinê da tê bikaranîn. Di vê qonaxê da di amadekirina ferheng, rêziman û

pirtûkên hînkirina zimanê kurdî da roleke sereke ya Hecîyê Cindî çê dibe. Ji ber vê *Xebernameya Fileyî-Kurmancîyê* (ferheng) (1933) di gel Emînê Evdal, Cerdoyê Gêncî û Vardan Pêtoyanî, *Gramera Kurmancî* (1935) ji bo xwendîngehên navîn di gel Prof. A. Xaçatûryanî, *Xebernameya Termînolojiyê Ermenî-Kurmancî* (ferhenga zaravesazîyê) (1936) di gel Prof. A. Xaçatûryanî çap dike ku ji bo plandanîna korpusê xebatên giring ên seretayî ne. Herweha *Kitêba Zimanê Kurmancî ji bo sala 3yan* (1933), *Kitêba Zimanê Kurmancî* (1934), *Kitêba Zimanê Kurmancî ji bo Mezinan* (1934), *Kitêba Zimanê Kurmancî ji bo sala 2yan* (1934), *Elîfba ji bo Koma Ewîlîn* (1935), *Kitêba Zimanê Kurmancî ji bo dersxana 6an* (tevî hevalan) (1935), *Elîfba ji bo Mezinan* (1936), *Kitêba Zimanê Kurmancî* (1937), *Elîfba û Kitêba Xwendîne Bona Sala Pêşîn* (1937) (Cewarî, 2008: 213-214) wek pirtûkên hînkirina kurdî dide çapkirin ku ev jî ji alîyê plandanîna belavkirina zimanî ve giring in.

Di çarçoveya plandanîna zimanî da karê herî giring ê vê serdemê Konferansa Kurdnasîyê ye ku li ser daxwaza Peymangeha Dîroka Çandên Ermenistanê û Komîteya Alfabeya Nû ya ser bi Dewleta Ermenistanê di 9ê Tîrmeha 1934ê da li mala Çandê ya li Ermenistanê tê girêdan. Di vê konferansê da di gel berpirsên Partîya Komunîst a Ermenistanê 30 nûnerên kurd ên Ermenistan, Azerbaycan, Gurcistan, Nexçîvan, Acaristan û kurdnasên bajarên navendî yên Sovyetê beşdarî dikin û li ser kêşeyên avakirina zimanê kurdî yê edebî û rênivîs û rêzimana zimanê kurdî gotûbêj dikin (Hewramî, 2006: 114).

Di vê konferansa şeş-rojî da li ser gelek mijarên çandî danûstandin bîr kirin jî di navenda xebatê da plandanîna zimanî heye. Ji vî alîyê ve gotara “Pîrsên Afîrandîna Zimanê Kurmancî yê Edebiyatê” ya G. Sêvak û Prof. A. Xaçatûryanî, gotara “Pîrsa Rastnivîsa Zimanê Kurmancî û Guhestina Hinek Herfan” a Emînê Evdalî, “Rîknên Gramera Zimanê Kurmancî” ya Î. Sukerman û Qanatê Kurdoyî, “Derheqê Çêkirina Terman de” ya Vardan Pêtoyanî (Cewarî, 2008: 43) ji alîyê plandanîna zimanî ve gotarên balkêş in ku rê li ber gengeşekirina plandanîna zimanî vedikin.

Di encama van gotûbêjan da ji bo pêkanîn û pesendkirina zimanekî edebî û yekgirtî biryar tê dayîn ku zimanê kurdî Ermenistanê bibe bingeha vî zimanî û di vê çarçoveyê ji bo ku kar li ser zaravesazî, rênivîs û rêzimana kurdî bê kirin biryara avakirina hin komîsyonên taybetmend, vekirina beşeke kurdnasîyê li Zanîngeha

Ermenistanê û damezirandina navendeke kurdnasîyê li seranserê Sovyetê tê dayîn. Li gor vê, dê dezgehên peywendîdar zimanê kurdên Ermenistanê bikin bingeş û ji bo xebatên navborî sûd ji zimanê kurdên Azerbaycan, Gurcistan û Turkmenistanê jî wergirin (Hewramî, 2006: 115-116). Li gor ragihandina Tosinê Reşîdî endamên komîsyona amadekirina rêzimana Kurdî ji Prof. A. Xaçatûryan, Erebe Şemo, Vilçevskî, Qanatê Kurdo, Pehlevî, Hecîyê Cindî û Sukermanî pêk tên (2011: 84).

Herçend biryar tê girtin ku konferansa duyem li dor vê mijarê di sala 1935ê da li Azerbaycanê bê girêdan jî Tirkîye bi awayekî tund nerazîbûna xwe li hember hewldanên piştgirîkirina zimanê kurdî nîşan dide û karên weha li ser sîyaseta xwe ya bişaftina kurdan wek metirsî dizane û vê fikara xwe jî bo berpirsyarên Sovyetê radigihîne (Hewramî, 2006: 121-122). Ji ber vê guvaşa dîplomatîk konferansa navborî tê hilweşandin û şandina rojname û weşanên kurdî jî bo derveyê welatî tê ragirtin (Hewramî, 2006: 131). Jixwe piştî du salan Stalîn gelek kurdên li ser sînorê Tirkîyeyê bi zorê ji bo welatên Asyaya Navîn vediguhêze, hemû kar û çalakîyên çandî û zimanî yên kurdî dide rawestandî û alfabe ya latînî ya kurdî jî qedexa dike. Loma jî berî ku ev biryarên girîng ên plandanîna zimanê kurdî bikevin warê cihbicihkirinê hemû xebatên çandî û zimanî tên rawestandî.

Dîyar e, ji bo ku ji bo wan nebe mijara sergêjanîyê û karîgerîya wan li ser kurdên welatên din çê nebe di 1941ê da Hikumeta Ermenistanê di çarçoveya riwangeha sîyasî ya Stalînî da biryar dide ku ji bo kurdî li ser bingeşên tîpên kirilî alfabeke nû bê amadekirin û vî karî jî dispêrin Hecîyê Cindî. Ew jî di sala 1944ê da bi pirtûka xwe ya *Elîfbayê* alfabeke nû amade dike û di 1946ê da ji bo xwendîgehên gundên kurdan tê weşandin (Boyîk, 2012: 49). Bi vî awayî ev alfabe heta dawîya Sovyetê jî alîyê kurdên Sovyetê ve tê bikaranîn û pê gelek berhem tên weşandin.

Hecîyê Cindî herwek qonaxa pêşî di vê qonaxê da jî li ser xebatên alfabe û hînîkirina zimanê kurdî berdewam dibe. Ji ber vê piştî çapa pêşî ya 1946ê, *Elîfbaya* wî di salên 1951 û 1954ê da tê weşandin û *Elîfbayeke* din jî di gel Firîda Cewarîyê dinivîse ku di salên 1957, 1961, 1966, 1974, 1982ê da çend caran tê weşandin. Ji bilî vê, wek pirtûka perwerdekirinê di vê qonaxê da *Zimanê Dê ji bo Dersxaneyê Zyanê* amade dike û ev xebat di salên 1948, 1952, 1955, 1958, 1961, 1970, 1987ê da tê çapkirin (Cewarî, 2008: 214).

Ji bilî Hecîyê Cindî di nav plandanerên zimanî da hêja ye ku mirov behsa xebatên Emînê Evdal û Çerkez Bakaevî (Çerkezê Beko) jî bike. Emînê Evdal herwek Hecîyê Cindî di navbera 1933 û 1936ê da pirtûkên li ser zimanê kurdî ji bo polên 4, 5 û 6ê amade dike û bi navê *Metodîka Hînkirina Xwendin û Nivîsarê û Metodîka Zimanê Kurmancî* li ser rêbaza hînkirina zimanî pirtûkan dinivîse (Reşîd, 2011: 135). Ji bilî vê di sala 1958ê da *Xebernameya Kurdî ye Rastnivîsandinê* dide çapkirin û bi xebatên xwe yê rênivîsê di nav kurdên Sovyetê da beşdarî plandanîna zimanî dike. Bakaev jî wek ferhengdanerekî giring *Xebernameya Têrminologîya Kurdîya* (kurdî-rûsî) xwe di 1957ê da çap dike û di warê ferhengnasî û zaravesazîyê da piştgirî dide xebatên plandanîna zimanî.

Ji nav van kesan bi dîtina me plandanerê herî giring ê kurdên Sovyetê, Qanatê Kurdo ye ku bi rêzimanên xwe û bi ferhenga xwe ya kurdî-rûsî hem ji mîrata pêşîyan sûd werdigire hem jî gencîneyeke baş ji bo nifşên piştî xwe dihêle. Bi navê *Gramatîka Zimanê Kurdî* cara pêşî di 1936ê da ji bo xwendingehên seretayî pirtûkeke rêzimanê dinivîse û heman pirtûk bi berfirehkirin û dewlemendkirinê di sala 1949, 1956, 1960, 1979, 1981 û 1985ê ji bo polên 3-4, 5-6, 7-8ê jî tê çapkirin. Ji bilî vana bi zimanê rûsî jî bi navên *Gramatika Kûrdsko Yazyka* (Rêzimana Zimanê Kurdî) (1957) û *Gramatika Kurdsogo Yazyka Na Matêrila Kurmancî î Soranî* (Gramatîka Zimanê Kurdî li ser bingeha Kurmancî û Soranî (1978) du xebatên rêzimanê dinivîse (Reşîd, 2011: 155). Ji pêşgotina *Rêzimana Kurdî Kurmancî – Soranîyê* diyar dibe ku navborî piraniya xebatên ku li ser rêzimana kurdî ji alîyê bîyanî û kurdan ve hatine nivîsîn, xwendine, nirxandine û xebatên xwe li ser vî sermîyanê dewlemend ava kirine (Kurdo, 2021: 19-36). Ji ber vê jî sînorên berteng ên zimanê kurdên Ermenistanê derdikeve û bi berawirdkirina hemû zar û binzarên kurdî û bi taybetî jî bi berawirdkirina kurmancî û soranî hewl dide zemîna zimanekî standard xweş bike û nîşan bide ku zimanê kurdî yek e.

Ev helwesta wî ya yekxistinê di ferhenga wî da jî xwe nîşan dide, loma jî bi sedan bêjeyên kurdîya soranî dixê nav ferhenga xwe ya kurdî-rûsî ya sala 1960ê û di qada ferhengnûsîyê da jî xizmeta hevgrirtina zimanî dike²². Her li ser vê şopê bi

²² Di Ferhenga Kurdî-Rûsî ya Qanatê Kurdo da bêjeyên ku ji kurdîya soranî hatine wergirtin bi nîşaneyên “10-K”yê hatine nîşandan. Hin ji van bêjeyan ev in: astem, awat, awatxwaz, babet, barmite, belam, bêwejin, biwêj, cengkeştî, cîga, cîyawaz, cilewgrî, ciwan, çak, çakî, çawerwanî, çavilke, çemandin,

hevkarîya Zera Yûsûpovayê di 1983yê da vê carê li ser bingeha zarê soranî ferhengeke din a kurdî-rûsî amade dike (Reşîd, 2011: 155) ku ew jî xizmeta heman armancê dike. Ji ber vê nêrîna xwe ya dûrbîn, tevî sepandina alfabeya kirîlî ya bi ser kurdên Sovyetê da di xebata xwe ya *Rêzimana Zimanê Kurdî Kurmancî* (1957) û ferhenga xwe ya kurdî-rûsî da (1960) alfabeya Celadet Bedirxanî bi kar tîne (Reşîd, 2011: 28) û dibe rêxweşker da ku kurdên vî welatî piştî hilweşîna Sovyetê derbazî vê alfabeyê bibin.

Herçend di serdema Sovyetê da alfabeya latînî ya kurdên Sovyetê bê qedexekirin, di şûna wê da bi zora dewletê alfabeya kirîlî bê bicihkirin, peywendîyên kurdên Sovyetê di gel kurdên welatên din bê sînordarkirin û armancên Konferansa Kurdnasîyê ya li Ermenistanê bi tevahî neyên cihbicihkirin jî di maweya 60 salî da bi kurdîya kurdên Ermenistana Sovyetê gelek berhemên edebî, zimanî, perwerdeyî, sîyasî, folklorîk û wergêranê tîne weşandin²³ ku di nav wan da, xebatên rêziman, ferheng, rênivîs û pirtûkên perwerdeyê yê kesayetîyên mîna Hecîyê Cindî, Emînê Evdal, Çerkez Bakaev û Qanatê Kurdoiyî, ji bo plandanîna zimanî xebatên giring in (Matras-Reerşemius, 2017: 66) û ev kes, bi taybetî jî Hecîyê Cindî, Emînê Evdal û

çespîn, çespandin, çirpe, dabîn, dahat, dahênan, damezirandin, damaw, damirkandin, damirkên, danîştin, dapoşîn, dariştin, darşkên, dartaş, daşkandin, daşkên, dawerivîn, dawên, delaqe, darbest, derbend, derhênan, derperîn, destecilew, destkewt, destyar, dûmen, dîtir, dilaza, dilekutkê, dilêr, dilêrî, dilnewayî, dilnîya, dilnîyayî, diwa, diwaroj, firmêsk, fermo, fewtan, fewtandin, gaşberd, gazinde, gemaro, gerdûn, gewre, gîyanewer, gîyan, gêjaw, gileyî, gir, gird, gîrfan, girj, girjî, girew, girme, girtû, girtûxane, girûgal, gogird, gulale, gulebax, guwa, guware, guwastin, guzer, hare, hawrê, hawîştin, helbest, helbijardin, helgeran, helkewt, heliz, helperkê, helniştin, helo, helper, helûje, helwerîn, helperîn, hemhal, hempa, henardin, henaw, hera, hoz, hor, hore, halî, halî bûn, hîz, xawên, xawênî, xefet, xefetbar, xêra, xêrayî, xêzan, xawên, xerîk, xêrayî, xêw, xilîskan, xinkan, xinkandin, xişar, xişarge, xişt, xişte, xol, xolawî, xolemêş, xom, xomalî, xoman, xoparastin, xorayî, xorxor, xorî, xoşewîst, xoşewîstî, xoşhal, xoşî, xot, xotan, xoşbext, xwêndewar, xwêndewarî, êsqan, karesat, kawêj, kehl, kelafe, kelega, kelên, kemtyar, kepenek, kerû, kewçik, key, kêrd, kiçeza, kiçênî, kok, koga, kolgeh, kopan, kuşiman, kuşinde, kuşm, kuştar, kûtal, qaqa, qal, qarçik, qawan, qij, qor, qorat, qurs, qursayî, laje, lafaw, lapere, lawe, lêxurîn, lêre, lûs, lût, maman, maliştin, mawe, maye, melaşû, mele, mend, mendal, meng, mêşk, nardin, nasyaw, naşî, nawçe, negbet, netewe, nizar, parêzgar, parêzgarî, parşew, pêkhênan, pêwan, piste, poşîn, rabestîn, rabirdû, rakêşan, rax, raper, raperîn, rastyar, ravêjker, rawestan, rebeq, rewîşt, rîşe, rêbendan, rêxole, rêjge, rûxsar, sarûx, selmandin, sereta, sergele, serkirde, sîs, soz, şan, şarge, şaristan, şane, şayeste, şeq, şeqemîşar, şeqil, şel, şermezar, şêlan, şêwawî, şir, şineder, taqîman, tasan, taş, taw, tenîn, tewer, têk, têkçûn, têkda, têkel, waq, welam, werz, yaxî, zal, zax, zamdar, zanyar, zekav, zerya (Kurdo, 1960: 50-817).

²³ Li gor bîblîyografyaya N. A. Alêksanyan di navbera 1921-1960ê da bi tevahî 238 pirtûk li Ermenistanê (çend heb jî li Azerbaycanê) tîne çapkirin (bnr: Alêksanyan, 1976: 401-432; 1977: 312-342).

Qanatê Kurdo di dema vekirina Korî Zanyarî Kurdê da bi nivîsarên xwe heta radeyekê di xebatên plandanîna zimanê kurdî yên beşên din da jî beşdarî dikin.

Ji bilî vê berdewamîya rojnameya *Rîya Teze* jî di vî warî da karîger dibe. Emerîkê Serdar wek xebatkarekî berdewam ê vê rojnameyê (ji 1954ê heta 2006ê) diyar dike ku Rojnameya *Rîya Teze* di geşedana zimanê nivîskî da roleke giring digêre û rê li ber afirandina hin zaraveyên zanistî jî vedike. Ji bo vê mînaka cosmonaft (kozmonot)a rûsî dide ku ji bo vê di rojnameyê “arşger”ê û ji bo spoutnika rûsî jî “durngar”ê bi kar tînin û xwendevanên wan bi saya rojnameyê manaya van bêjeyan hêdî hêdî fam dikin (Bréteque, 2017: 108). Ev jî nîşan dide ku nûnerên zimanî yên civaka kurdî ya Sovyetê li ser plandanîna zimanê kurdî karên giring dikin û bi van xebatên xwe ji bo zindîhiştina zimanê kurdî roleke giring digêrin.

2.4. PLANDANÎNA ZIMANÊ KURDÎ DI SERDEMA HAWARÊ DA (1932-1946)

Kovara *Hawarê* û weşanên din ên Bedirxanîyan (Ronahî, Roja Nû, Stêrk) di serdema mandaya Fransayê da (1920-1946) li Sûriye û Lubnanê derdikevin. Ji ber cihgirnebûna dewleta neteweyî ya erebî û derfêtdana rêjeyî ya mandayê, kurdî nayê qedexekirin û bi saya vê bi pêşengîya Celadet Alî Bedirxan û Kamiran Bedirxanî weşanên navborî derdikevin û ev weşan, bi taybetî jî kovara *Hawarê* ji bo plandanîna diyarîkirina arasteya îro ya kurdîya kurmançî dibe werçerxaneke giring. *Hawar* li ser şopa hewldanên plandanîna zimanê kurdî ya komele û weşanên Stenbolê berdewamî bide karên xwe jî ji wan cudatir bi pêngavên bihêz ên kirdeyî beşeke giring a pêşniyazên xwe dixê warê cihbicihkirinê û bingeheke bihêz a plandanîna zimanî datîne. Kovar herwek weşanên pêşî bi her du zarên kurmançî û babanî/soranî derdikeve û xwedî riwangeha zimanekî standard ê kurdî ye ku li gor Celadet Bedirxanî ji bo kurdan tekane pîvan û çavkanîya nasnameyî û heveya hevgerîna kurdan e.

Di nivîsara yekem a *Hawarê* da (Armanç, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê) ku di heman demê da bername û manifestoya vê kovarê ye jî, mijara sereke nexşedanîna vejandin û geşkirina zimanê kurdî ye û her du xalên pêşî jî li ser vê yekê ne. Li gor vê, armanca pêşî ya *Hawarê* belavkirina alfabeya kurdî ya nû ye (alfabeya latînî) di nav hemû kurdan da û destnîşankirina hemû rêzikên rêzimana kurdî ye. Loma jî tê destnîşankirin ku dê mijarên van her du waran beş bi beş di kovarê da bên

weşandin û paşê jî wek pirtûk bên belavkirin da ku bigihîjin destê hemû kurdên xwenda. Ji bilî van her du armancan, vekolîna zarên kurdî û berawirdkirina wan, destnîşankirina cihê zimanê kurdî di nav zimanên hevmalbat û arî da û dîrok û awayê pêşketina wê wek armancên sereke yên *Hawarê* tî destnîşankirin (1932: 1).

Celadet Bedirxan di vê nivîsara manîfestoyî da wek plandanerekî zimanî, bi awayekî ji xwe bawer diyar dike ku wek kurd û kurmanczimanekî, kurdî bi heft heşt zimanên din ra berawird kirîye, kitekitên wê ji hev derxistine û ji bîyanîyan baştir zimanê xwe dizane û dikare normên zimanê xwe destnîşan bike. Aşkera ye ku Celadet Bedirxan ji kurdologên bîyanî cudatir xwedî xema pêşvebirin û çareserkirina kêşeyên zimanê xwe ye û rêya vê jî di pêşxistina neteweya xwe da dibîne. Bi vî awayî di nav pêşketin û mijûlîya endamên neteweyê û zimanê neteweyî da girêdaneke rasterast çê dike û diyar dike ku kurd bi kîjan qadên jîyanê ra mijûl bûne zimanê wan di van waran da pêşketîye lê qadên ku kurd ji wan dûr mane zimanê kurdî jî di wan qadan da rawestayê û berfireh nebûye. Loma jî ji bo pêşketina zimanî, modernbûn û pêşketina civakî, zanistî û siyasî tiştên pêwîst dizane û di wê bawerîyê da ye ku bi pêkanîna van dê zimanê kurdî bi hêsanî bikare xwe li rewşên nû biguncîne. Ji bo destnîşankirina hêza potansiyel a pêşketina zimanê kurdî du mînakên dide ku dema hin mirovên Gelîyê Goyan cara pêşî “teyare”yê dibînin tavil navê “balafir”ê lê datînin û kurmancên ku telefonê nû dibînin jî di cih da ji “mesmehe”ya wê ra “bihîstok” dibêjin (1932: 1-2). Ev jî nîşan dide ku eger kurd bi qadên jîyana modern ra mijûl bibin dê bi hêsanî bikarin di van waran da zimanê xwe berfireh bikin.

Celadet Bedirxan ji bo gihîştina armancên vejandin û pêşvebirina zimanî du rêçikên sereke destnîşan dike ku divê kurd di serî da bidin ser şopa bêjeyên xwe yên windabûyî û piştî bikarxistina van bêjeyan jî rêgirî li bêjeyên bîyanî bikin da ku di nav zimanê kurdî da cih negirin. Li ser bêjeyên windabûyî yên zimanê kurdî di wê bawerîyê da ye ku hin bêje bi tevahî ji bîr çûne, hinek jê ji zarekî ketine lê di zarekî din da hene, hinek jî di axaftinê da nayên bikaranîn lê di mamik, metelok, çîrok û stranan da mane. Ji ber vê divê pêşî ev bêje bîr vejandin û paşê jî li gor pêwîstîyên demê bi rêya dariştin û hevdudanîna bêjeyên nû bîr çêkirin. Ji bo pêkanîna vî karî jî li ser daxwaz û beşdariya xwendevanan dê di kovarê da cih bide beşa ferhengokê û bêjeyên weha yek bi yek rave bike. Ji bo vê jî ji xwendevanan hêvî dike ku baş bala xwe bidine beşa ferhengoka *Hawarê* û eger li ser van bêjeyan nêrîneke wan a cuda

hebe ji wan ra binivîsin û eger bêjeyên hevmana û nêzmane hebin ji wan ra bidin zanîn da ku hêza bikarberîya zimanê kurdî bê zêdekirin. Ji bo vê jî mînakê bêjeyên “rêkirin, şandin û hinartin”ê dide ku bêjeyên nêzmane ne (bi gotina wî cîyokên hev in) lê cîyawazîyên manayî yên hûr di nav wan da hene û divê kurdên xwendewar li ser van cîyawazîyan hûr bibin (1932: 2).

Ji vî alîyî ve manifestoya *Hawarê* di heman demê da bernameyeke plandanîna zimanî jî li xwe digire û Celadet Bedirxan çî bi nivîsarên xwe yên *Hawarê* çî jî bi xebatên xwe yên din di nav bîst salan da karekî giring dide ber xwe. Em dê xebatên plandanîna zimanî ya vê serdemê di bin sernavên danîna alfabeyeke nû, destnîşankirina normên rêzimanê, danîna ferhenga kurdî bi kurdî, bikaranîna kurdî di warên modern da, xebatên wergêranê û hewldanên yekxistina zimanê kurdî da rave bikin.

2.4.1. Danîna Alfabeyeke Nû û Belavkirina Wê

Celadet Bedirxan destpêka hizira danîna alfabeya latînî ya kurdî vedigerîne sala 1919ê û diyar dike ku îlhama xwe cara pêşî ji Major Noelî wergirtîye. Lewra dema li çîyayên Meletîyê di nav eşîra Reşwanê da digerin, dibîne ku Noel ji bo hînbûna kurdî her tiştî bi tîpên latînî dinivîse û bi hêsanî tîpên “û” û “o”yê û “î” û “ê”yê ji hev vediqetîne. Loma jî wê gavê biryar dide ku alfabeyeke latînî ji bo zimanê kurdî daîne. Bi vî awayî di vegera Stenbolê da alfabeyeke 36 tîpî amade dike û bi mebesta nasandina vê alfabeyê pirtûkek û ferhengokekê dinivîse. Mixabin dema biryara girtina wî derdikeve û berê xwe dide Ewropayê ev alfabe û ferhengok di 1925ê da dikevin destê Dadgeha Xarpûtê û wînda dibin. Tevî ku xebata wî ya berê ji destê wî diçe jî di sala 1924ê da dema ku li Almanyayê ye dîsa li ser alfabeya xwe dixebite û hejmara tîpan dadixe 34an. Çend sal paşê dema ku Komara Tirkîyeyê derbazî alfabeya latînî dibe dibîne ku di navbera alfabeya wî û alfabeya wan da nêzîkbûnên berbiçav hene lê dîsa jî ji bo xwenêzîkkirina vê alfabeyê di alfabeya xwe da destkarî dike, hin tîpên xwe diguherîne û di gel şêwra hin kesan halê dawî dide alfabeya xwe (Bedir-Xan, 1932).

Dema em berê xwe didin nivîsarên wî yên *Hawarê* em dibînin ku Celadet Bedirxan wek pêşengê *Hawarê*, di serî da giringî dide danîna alfabeyeke kurdî ya nû. Bi bawerîya wî yekîtiya zimanî ku armanca wî ya sereke ye, bi “yekîtiya herfan” dest pê dike (Bedirxan, 1932: 5) û ev jî gava pêşî ya plandanîna zimanî ye. Ji ber vê berî

ku *Hawarê* derxe bi Tewfîq Wehbî ra dikeve nav têkilîyê da ku ji alfabeya xwe û wî, alfabeyeke hevbeş derxin holê û hemû zarên kurdî bi alfabeyeke hevbeş bên nivîsîn. Lê ji ber hinek astengan û negihîştina nameyên wî ji bo Tewfîq Wehbî ev kar naçe serî û *Hawarê* bi alfabeya xwe derdixe (Xweyîyê Hawarê, 1932: 7).

Tevî vê jî di destnîşankirina tîpên alfabeya xwe da bi gotina wî, dengên her sê zarên kurdî (dimilî, lûrî, kurmancî) li ber çavan digire û hêvî dike ku ev alfabe ji bo hemû zarên kurdî bê bikaranîn (1932: 6). Ji bo vê mebestê di qonaxa pêşî ya *Hawarê* da di bin sernavê “*Elfabêya Qurdî*”yê da tîpên alfabeya xwe, rêbaza danîna tîpan û taybetmendîyên wan di hejmarên 1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 9, 10, 11, 12, 17, 18, 19, 20, 23ê da diweşîne û wan yek bi yek rave dike. Li dû vê jî di nav weşanên Hawarê da pirtûkçeyên *Rêzana Elfabêya Qurdî* (1932)²⁴ û *Rûpelinen Elfabê* (1932) diweşîne û Kamiran Bedirxanê birayê wî jî *Elfabêya Kurdî* (1938)²⁵ û *Elfabeya Min* (1938)²⁶ wek pirtûkên nasandina vê alfabeyê dide çapkirin da ku bi hêsanî ev alfabe di nav gelî da belav bibe.

Celadet Bedirxan derketina *Hawarê* di jîyana civakî û edebî ya “kurdmancan” da rojeke dîrokî dide zanîn, lewra bi raya wî, bi vê kovarê “kurdmanc dibin xwedîyê alfabeyeke serbixwe û ji bin nîrê alfabeyên milletên din rizgar dibin”. Loma jî vê alfabeyê ne wek alfabeya latînî, wek “alfabeya kurdan” bi nav dike û wê wek alaya serbixwetîya hebûna edebî ya kurdan dide zanîn. Li gor wî bi saya *Hawarê* û vê alfabeyê gelek kurd hînî xwendin û nivîsîna zimanê xwe dibin û kesên ku di hînbûna zimanê xwe da xemsarî jî nîşan didin wan bi tundî hişyar dike, nezanîna zimanê xwe eyb û şermek û kurdîtiya bêziman jî rûreşîyeke giran dide zanîn (Xwedîyê Hawarê, 1941: 4).

Dîyar e, Celadet Bedirxan di bin karîgerîya gengeşeyên sedsala 19ê da derbazbûna alfabeya latînî wek hêskirina hînbûnê û modernkirina zimanî dibîne loma jî giringîyeke mezin dide vê çaksazîya xwe. Li alîyê din di 1928ê da bi

²⁴ Celadet Bedirxan bi navê Mîr Herekol Azîzan, di vê xebatê da ji bo ku alfabeya xwe bi hemû kurdan binasîne hem tîpên latînî û erebî bi hev ra bi kar tîne hem jî ji bilî kurdî, alfabeya xwe bi zimanên fransî, tirkî, erebî û farisî jî dinasîne (1932: 3-14).

²⁵ Herçend Celadet Bedirxan jî di nasandina alfabeya xwe da behsa dengê xeynê bike û ji bo vê nîşaneyê “x”ê bi kar bîne jî wê wek tîp nake nav alfabeya xwe lê Kamiran Bedirxan di vê xebatê da “x”ê jî wek tîpeke kurdî destnîşan dike lê hêjayê gotinê ye paşê ew bi xwe jî bi vê tîpê kar nake û di weşanên xwe da wê bi kar naîne (1938: 25).

²⁶ Ev pirtûkçe ji ya pêşî cudatir wênedar e û tîpa “x”ê jî nehatîye bikaranîn.

pejirandina alfabeya latînî ji alîyê Hikumeta Tirkîyeyê ve peywendîya kurdên vî welatî bi alfabeya kevin a erebî tê birîn û ji bo xwegihandina nîvê civaka kurdî derbazbûna alfabeya latînî wek pêwîstîyekê dibîne. Herî dawî bi guncandina alfabeya latînî li zimanê kurdî, kêşeyên berbiçav ên alfabeya berê heta radeyeke baş çareser dike û taybetmendî û karaktera kurdî dide vê alfabeyê. Loma jî bi navê “alfabeya kurdî”yê lê xwedî derdikeve û dixwaze li ser vê binemayê pêngava pêşî ya plandanîna xwe ya zimanî cihbicih bike.

2.4.2. Destnîşankirina Normên Rêzimana Kurdîya Kurmancî

Celadet Bedirxan piştî binecihkirina alfabeya nû, di qonaxa duyem da dest bi danîna normên rêzimana kurdîya kurmancî dike û di hejmara 27ê ya *Hawarê* da dîyar dike ku zimanek li ser sê hêmanên bingeîn radiweste ku ew jî alfabe, rêziman û ferheng in û bi vê hejmarê dê dest bi weşandina mijarên rêzimanê bike. Li gor daxuyanîya wî, ji 1929ê û vir ve dest bi amadekirina bingeên rêzimana kurdî kirîye û ji wê çaxê ve berdewam li ser wê kar dike. Di encama vê xebatê da di 1939ê da ji bo dibistanan rêzimanekê amade dike û ji bo ku rêzimanê hînî zarokan jî bike bi navê *Kitêba Sînemxanê* pirtûkekê dinivîse ku bi nîyet e wan her duyan jî bide çapkirin (Xwediyê Hawarê, 1941: 5). Herçend ev her du pirtûk di serdema wî da neyên çapkirin jî di hejmarên 27, 28, 29, 30, 31, 32, 33, 34, 35, 37, 40, 42, 43, 44, 45, 46, 47, 48, 50, 51, 53, 54ê da di bin navê “Bingehên Gramêra Kurdmancî”yê da di 22 xelekan da gelek mijarên rêzimana xwe diweşîne û hîmekî din ê plandanîna zimanî datîne. Di salên paşê da vê xebatê berfirehtir dike û bi arîkarîya Roger Lescotî bi ravekirina fransî wê wek pirtûk jî amade dike ku piştî mirina wî tê çapkirin.

Celadet Bedirxan bi van xebatên xwe hemû mijarên rêzimana kurdîya kurmancî sax neke jî piranîya normên rêzimanê destnîşan dike û bi xêra vê xebata wî gelek kêşeyên rêzimana kurdîya kurmancî tînin çareserkerin. Ji ber vê ev xebatên wî ji bo nifşên paşê dibin bingeheke bihêz û referans û çavkanîyên sereke ku di roja îro da jî rêya xebatkarên vê qadê ronî dîkin. Ji alîyê din ve ji bilî danîna normên rêzimana kurmancî, Celadet Bedirxan termînolojîyêke nû ya rêzimanê jî destnîşan dike û di vî warî da karekî gelek giring dike. Bi vî awayî herwek Tewfîq Wehbî ne tenê modela

rêzimanî ya kurdî ji rêzimana erebî bo modela rojavayî diguherîne, di heman demê da li ser modela rojavayî termînolojîyeke rêzimanî ya nû jî datîne.²⁷

2.4.3. Danîna Bingeha Ferhenga Kurdî bi Kurdî

Herwek li jor jî hat destnîşankirin ferheng yek ji armancên giring ên *Hawarê* ye ku ji bo vejandin, nûjenkirin û pêşvebirina zimanê kurdî pêwîst tê dîtin û çawa ku li jor jî hat destnîşankirin ji bo vê yekê Celadet Bedirxan sûdwegirtina ji zarên kurdî, vekolîna çavkanîyên folklorîk û dariştin û hevdudanîna bêjeyên nû wek rêbazên sereke destnîşan dike û çendîn bêjeyên weha di beşa “Ferhengok”ê ya hejmarên 1, 2, 3, 4, 5, 7, 8, 19, 20, 27, 28, 30ê yên *Hawarê* da diweşîne. Bêguman ferhenga Celadet Bedirxanî tenê ji bêjeyên ferhengokê pêk nayên û ji bilî vana, dosyayeke ferhengê jî amade dike. Piştî mirina wî Osman Sebrî van bêjeyan derbazî ser kaxezî dike û dema Korî Zanyarî Kurd ava dibe ji bo çapkirinê vê dosyayê ji wan ra dişînin. Mixabin ev xebata giring di wê demê da nayê çapkirin û bi ser da jî bêjeyên tîpên “a, b, c, ç, d, e”yê li vir winda dibin (2009: 11-12). Ji ber vê, ev xebat di 2009ê da gelek bi derengî û nîvcoyî digihîje ber destê xwendevanên kurd.

Giringîya ferhenga Celadet Bedirxanî di wê yekê da ye ku cara pêşî bingeha ferhengeke kurdî-kurdî tê danîn û gelek bêjeyên jîyana modern û zanistî bexşî zimanê kurdî dike ku roja îro jî em gelekên wan bi awayekî çalak bi kar tînin. Ji bilî zaraveyên rêzimanî yên ku li jor hatin destnîşankirin, bêjeyên mîna “dîrok, erdnigarî, jînenigarî, bingeh, ferhengok, bijîşk, dibistan, dîl, pejirandin, ravekirin, civakî, zar, heyîn, neyîn, nîfş, raman, awarte, bûyer, gelemper, nûçe, têvel, mijar, çand” û hwd... bi saya wî belav dibin û di zimanê nivîskî da bi cih dibin. Bêguman ev bêje bi tevahî ji aliyê Celadet Bedirxanî ve nayên çêkirin û xwe dispêrin çendîn rêçikên dariştinê ku li jêr hatine rêzkirin:

²⁷ Ev zaraveyên rêzimanê cara pêşî ji aliyê Celadet Bedirxanî ve tên destnîşankirin: tîp, hûrdek, girdek, kî, vekî, dengdêr, dengdar, pêrkî, parkî, bêje, navdêr, rengdêr, rengdêrên wesfîn, rengdêrên îşarkî, rengdêrên jmarîn, rengdêrên pîrsiyarkî, rengdêrên nebinavkirî, rengdêrên xwemalîn, veqetandek, veqetandekên binavkirî, veqetandekên nebinavkirî, pronav, pronavên nêtar, pronavên kesîn, pronavên bikar, pronavên bireser, pronavên berbihevîn, pronavên lihevexistî, pronavên îşarkî, pronavên pîvene, pronavên qersene, pronavên girêkî, pronavên pîrsiyarkî, pronavên nebinavkirî, pronavên xwemalîn, lêker, komek, tewang, tewangbar, vekî, guhêrbar, neguhêrbar, niqteşanî, bihnok, niqtepirs, niqtebang, niqtecot, niqtebihnok, kevanek, dunik, xêzek, bendik, rawes, vêsîh, hevenav, serenav, zayend, mêjer, gerguhêz, negerguhêz, bireser...

- **Giştîkirina bêjeyên herêmi:** Bêjeyên vê kategorîyê jixwe di zimanê kurdî da hene lê ji ber ku li her cihî nayên bikaranîn bi saya *Hawarê* di nav kurdan da belav dibin. “Bendewar, boş, dîlbend, ejnû, tol, têgehiştin, zîvarî, hingûr, haf, guwah, belg, nependî, nîfş, mivro...” ji van bêjeyan in.

- **Berfirehkirina manayî:** Ev bêje di nav kurdan da di manayên nerîtî da ji xwe hene lê Celadet Bedirxan manayên modern li wan bar dike û wan ji alîyê manayî ve berfireh dike. “Çand” bi manaya “kultür”ê, “hatin” bi manaya “dahat”ê, “pîrs” bi manaya “bêje/peyv”ê, “nûjen” bi manaya “modern”ê, nûçe bi manaya “xeber/dengûbas”ê, “sehîti” bi manaya “vekolîn”ê, “babelîsk” bi manaya “sedsal”ê, “wergerandin” bi manaya “tercûmekirin”ê, “zar” bi manaya “lehçe”yê, “parîz” bi manaya “park”ê ji van bêjeyan in.

- **Vejandina bêjeyên kevin:** Ev bêje jî di zimanî da hene lê bi demê ra ji alîyê gelek kesan ve tên jibîrkirin. Bikaranîna van bêjeyan di amrazên modern da dibin sedem ku ev bêje careke din bîr vejandin û ji alîyê axiverên zimanî ve bîr bikaranîn. Mînak: armanc, bîyanî, dehker, dîl, dîyarî, doz, kûvan, leşker, pispor, raman, vîn/vên...

- **Kurdîkirina bêjeyên îranî:** Ev bêje di zimanên îranî da hevbeş in. Ji ber ku di farisî da baştir hatine parastin bi piranî ji farisî tên wergirtin û li zimanê kurdî tên guncandin. Mînak: agah, afîrandin, binyan, bijîşk, cenkeştî, dibistan, dişwar, kamiran, ferheng, keştî, nimînende, nijad, pejirandin, pend, pîroz, pîroz kirin, pîrozname, pîş, qelemrew...

- **Çêkirina bêjeyên kurdî ji lêkdana du yan zêdetir bêjeyan:** Bêjeyên weha ji alîyê Celadet Bedirxanî ve bi rêya lêkdanê tên dariştin. Mînak: wekhev, cihderk, berbînî, dotmîr, kitkit, hevedudanî, hevol, hûrhûnandin, hûrbijarî, berpêşkî, piştawî, zarawa, zimanazîn, zûbîrbîrî...

- **Çêkirina bêjeyên kurdî bi rêya dariştinê:** Bêjeyên weha bi rêya pêşgir û paşgirên kurdî ji bo dîyardeyên jîyana modern tên dariştin. Mînak: balafir (bala+fîr), bêje (bêj+e), bingeş (bin+geş), bîrawer (bîr+awer), bûyer (bû+y+er), cîyok (cî+y+ok), dîrok (dîr+ok), heyber (he+y+ber), hevok (hev+ok), kirar (kir+ar), kirîyar (kir+î+yar), nivîsevan (nivîs+e+van), nivîsanok (nivîs+an+ok), noqar (noq+ar), rayek (ray+ek), pêşkî (pêş+kî), paşkî (paş+kî), şandîyar (şand+î+yar), têdexistî (tê+de+xist+î), weşînek (weşîn+ek), zayend (za+yend)...

- **Formên têkel (hybrid forms):** Di vê kategorîyê da dariştina bêjeyan bi rêya lêkdana morfemeke bîyanî û bêjeyeke kurdî yan jî berevajî vê tê pêkanîn. Mînak: pronivîs (pro+nivîs), pronav (pro+nav), xeberdox (xeber+dox), erdnigarî (erd+nigar+î), jînenigarî (jîn+e+nigar+î), civakî (civat+kî), rehakar (reha+kar)...
- **Danîna bêjeyên nû bi rêya guncandinê:** Bêjeyên weha di zimanê kurdî da nînin lê bi rêya şibandin û guncandinê tên berhemanîn. Li hember “general”ê gelemper, li hember “neutre”ê nêtar, li hember “type”ê tîp tên danîn ku mînakên vî cureyî ne.
- **Wergirtina bêjeyên bîyanî bi hin guherînên dengî:** Di vê kategorîyê da bêje yan jî zaraveyên bîyanî bi hin guncandinên dengî tên wergirtin ku “elfabê (alphabet), gramêr (grammar), folklor (folklore)” mînakên vê ne.
- **Wergêrana bêjeyên bîyanî:** Di vê kategorîyê da li ser modela zimanekî dîyarkirî ku di mînakên jêrîn da ev ziman erebî ye, bêje rasterast tên wergêran û di kurdî da tên dariştin. Li hember “cumle”ya erebî “komek”, li hember “şe’bî”ya erebî “gelêr”, wek zaraveyê şanoyê di şûna “meclis”ê da “civanok” mînakên vê ne.
- **Afirandin û danîna bêjeyên nû:** Ji bilî guncandin yan jî wergêranê li hember hin bêjeyên bîyanî hin bêjeyên kurdî tên destnîşankirin ku reha wan yan mentîqa dariştina wan ne zelal e. Mînak: “hêman” di şûna “element”ê da, “têvel” di şûna “different”ê da, “mijar” di şûna “subject”ê da.

Bêguman piranîya van bêjeyan îro di zimanê kurdî da cihê xwe girtibin jî hinek ji wan cihê xwe nagirin. Ev dîyarde jî di xebatên hemû plandanerên zimanî da li ber çavan dikeve û tişteki gelek asayî ye. Loma jî bêjeyên mîna “azîn, zimanazîn, sehîti, parîz, cîyok, babelîsk, berbînî, nivîsanok”ê piştî *Hawarê* cihê xwe nagirin û tên terikandin. Herweha hêjayê gotinê ye di *Hawarê* da li ser navê kurdîya petî carinan hin bêjeyên bîyanî jî tên bikaranîn ku mînaka herî balkêş “ol” e. Ev bêjeya ku di eslê xwe da ji “yol”a tirkî derbazî zimanê kurdî bûye di *Hawarê* da wek bêjeyeke resen a kurdî li hember “dîn”ê tê danîn. Herçend “yol”a tirkî di sedsala 16ê da bikeve zimanê kurdî jî tu car di vê manayê da di nav piranîya kurdan da cih nagire. Lê piştî *Hawarê* di nav xwedayan da “ol” di manaya “dîn” da tê bikaranîn û dibe sedema sergêjanîyeke bêbingeh.

2.4.4. Berfirehkirina Qadên Bikaranîna Kurdî

Ji bilî van xebatên korpusê herwekî di manîfestoya *Hawarê* da jî tê destnîşankirin ji bo pêşvebirina zimanekî, berfirehkirina qadên bikaranîna wî zimanî karekî pêwîst e. Bi vê mebestê zimanê kurdî di warên ziman, edebîyat, dîrok, sîyaset, dîn, folklor, aktualîte û wergêranê da tê bikaranîn û deqên bi vî awayî bi awayekî serkeftî tên berhemanîn. Di vê çarçoveyê da li gor zanyariyên Hassanpourî li Sûrîyeyê ji 1925ê heta 1959ê 31 pirtûkên kurdî tên çapkirin ku 12 li ser edebîyatê, 11 li ser zimanî, 4 li ser dînî, 2 li ser folklorê, pirtûkek li ser dîrokê, yek li ser sîyasetê û 3 jî ji zimanên bîyanî tên wergêran (Hassanpour, 2005: 335). Hêjayê gotinê ye ji van pirtûkan 17 jê ji nav weşanên *Hawarê* derdikevin ku 12 ji wan bi kurdî hatine nivîsîn. Bêguman ev qadên cuda hem hêza derbirîn û gencîneya bêjeyên kurdî derdixin holê hem jî valahîyên zimanî nîşan didin da ku ji aliyê plandaneran ve bi rêya dariştin, guncandin yan deynkirinê bîr dagirtin û ziman bê pêşvebirin. Di *Hawarê* da jî heta radeyeke baş ev kar tê kirin û di van waran da pêşketin û nûjenkirineke berbiçav çê dibe, bi taybetî jî di warê termînolojîya rêzimanê da ku li jor hat behskirin.

Ji bo berfirehkirin û nûjenkirina zimanî rola wergêranê gelek dîyar e. Ji bo vê jî nivîskarên *Hawarê* çendîn deqên giring ji zimanên rojavayî û rojhilatî werdigêrin ser zimanê kurdî û bi rêya van zimanan hêza veguhêzbarîya zimanê kurdî zêde dikin. Kamiran Bedirxan ji bilî wergêrana çarînen Xeyamî di qonaxa duyem a *Hawarê* da giranî dide ser wergêrana beşek ji Quranê û hedîsên hezretê Mihemedî ku di nav piranîya civaka kurdî da xwedî roleke manewî ya berbiçav in. Aşkera ye ku Kamiran Bedirxan bi vî karî dixwaze hêz bide zimanê kurdî û li hember erebî qada bikaranîna zimanê kurdî berfireh bike. Herweha Celadet Bedirxan û Nûredîn Êsiv çend deqên giring ên edebî ji fransî dikin kurdî û Qedrî Can jî gelek beşên romana Gregory Petrovî di bin navê “Di Welatê Zembeqê Gewr de”yê da di hejmarên 5, 6, 7, 9, 10, 11, 12-13, 14, 15, 16, 17, 20, 24, 26, 41, 42yê ya *Roja Nû* da diweşîne. Herî dawî hem Celadet Bedirxan hem jî Kamiran Bedirxan nerasterast gelek nûçeyên Cenga Cîhanê ya Duyem ji weşanên bîyanî werdigêrin ser zimanê kurdî û wek nûçe di weşanên xwe da belav dikin. Bi vî awayî nîşan didin ku zimanê kurdî di warên dînî, edebî û rojane da dikare zanyariyên zimanên pêşketî hilgire û xwe li rewşên nû biguncîne.

2.4.5. Yekxistina Zimanê Kurdî

Mijara yekxistina zimanê kurdî cara pêşî ji aliyê ronakbîrên kurd ên li Stenbolê bê pêşnîyazkirin jî di serdema *Hawarê* da dibe yek ji babetên giring ên plandanîna zimanî. Herçend di manîfestoya *Hawarê* da li ser rêbaza yekxistina zimanê kurdî zanyarî neyên dayîn jî Celadet Bedirxan bi qasî kurmancî giringî dide soranî jî û heta qedexeya Hikumeta Îraqê nivê *Hawarê* bi kurmancî nivê din bi soranî û beşek jî bi fransî derdikeve. Celadet Bedirxan bi vê helwesta xwe di navbera kurdên Bakur û Başûrê da diyalogeke zimanî datîne û hewl dide zemîna yekxistina zimanî ava bike. Ji ber vê, Hamid Ferecê ku nivîskarekî başûrî ye, dema di hejmara sêyem da vê mijarê tîne rojevê (1932: 3) Celadet Bedirxan di heman hejmarê da bersiva wî dide, piştgirî dide ramanên wî yên yekkirina zimanê kurdî, li ser modela netewesazîya almanî yekbûna milletan di yekîtiya zimanî da dibîne û ji bo vê jî yekîtiya alfabeyê wek pêngava pêşî destnîşan dike (1932: 5).

Li ser vê di hejmara dehem a *Hawarê* da ji nivîskarên Başûrê Pîrot pêşnîyaza yekîtiya alfabeyê (alfabeya latînî) ya Celadet Bedirxanî pesend dike û jê dixwaze ku ji alfabeya xwe û alfabeya latînî ya Tewfîq Wehbî alfabeyeke hevbeş çê bikin da ku hişê kurdan tevlihev nebe. Pîrot, yekxistina hemû zarên kurdî erka xwendewarên kurd dide zanîn û di wê bawerîyê da ye ku di vî warî da *Hawar* dikare arîkarîyeke baş bide kurdan. Ji bo gihîştina vê armancê jî pêşnîyaz dike ku di weşanên kurdî da cih bidine bêjeyên hevbeş ên hemû zarên kurdî û ji bo vê jî nivîsîna ferhengê giring dibîne. Di vê çarçoveyê da rêbaza *Hawarê* gelek guncaw dibîne û diyar dike ku eger *Hawar* li ser vê rêçikê demekê biajo dê zarekî hevbeş ê kurdî bê damezirandin û ji bo ji hev têgihîştinê dê kurd berê xwe nedin zimanên bîyanî (1932: 1-3). Bersiva vê di heman hejmara *Hawarê* da bi navê “Bo Xwênerekanî Iraqman”ê bi kurdîya soranî tê dayîn û tê diyarkirin ku *Hawar* bi du şeweyên kurdî derkeve jî kar li ser wê yekê dike van her du şeweyên kurdî li hev nêzîk bike û ev, çend karekî giran be jî bi qasî wî pîroz û giring e. Herweha bi înzeya “Xweyîyê Hawarê” tê diyarkirin ku di gel hemû zehmetîyan *Hawar* bi “gavên bi vîn û hişk” ber bi vê armancê diçe û dê ji vê danekeve (1932: 8).

Diyar e, ev armancên *Hawarê* ji aliyê gelek nivîskarên Kurdistanê Îraqê ve tên şopandin, loma jî di hejmara 15ê da ji Silêmanîyê Lawêkî Kurdperwer diyar dike ku Tewfîq Wehbî Beg ji bo petîkirina zimanê kurdî, danîna destûreke baş û ferhenga

zimanê kurdî xebatên berdewam bike jî bi raya wî ji bo gihîştina armancên weha divê komeleyek bê sazîkirin û divê Tewfîq Wehbî di vê mijarê da bi “Bedirxaniyên welatperwer ra karê hevbeş bike”. Lawêkî Kurdperwer di vê mijarê da rexne li Tewfîq Wehbî digire ku tevî destdirêjîkirina Bedirxaniyan xwe nade ber karên hevbeş û vê dudilîya wî “eyb û kêmasîyeke mezin” dide zanîn. Ji bo vê tîka dike ku wek bira dest bidine hev û bi hev ra zimanê gelê xwe vejînin û şeweyên cuda yên kurdî li hev nêzîk bikin. Li alîyê din nivîskar pêdagirîya Tewfîq Wehbî ya li ser şewezarê Silêmaniyê rast nabîne û bawer nake ku “şeweyê Silêmaniyê yê deh hezar kesî bi ser kurmançîya şeş milyon kesî da bi ser bixe. Di mijara pakî û hêjabûna zarên kurdî da jî xwe dispêre Mehemed Emîn Zekî Begî û şewezarê mukrî ji hemû şewezarên kurdî paktir dide zanîn. Loma jî bi raya wî rêzimana ku Tewfîq Wehbî danîye ji bilî xelkê nav bajarê Silêmaniyê ji bo gundê Silêmaniyê jî nabe. Ji ber vê, rêzimana wî ne wek “Destûrî Zimanî Kurdî”, wek “Destûrî Zimanî Şarî Suleymanî” dide zanîn (1933: 2-4).

Hawar bi têbînîyekê maf bi gotinên vî xortê kurdperwer bide û pêwîstiya karê hevbeş tekez bike jî bi rêzgirtin behsa Tewfîq Wehbî û peywendîyên wî û xwedîyê *Hawarê* dike û amaje bi hevdîtina wan a li Beyrûtê dike. Ji bo yekxistina şeweyên kurdî jî dîyar dike ku divê pêşî ji bêjeyên kurdî yên petî dest bi kar bikin ku her du alîyan jî gelek bêjeyên hevbeş ji hev girtine û berhevîkirina bêjeyên kurdî yên petî karê pêşîneyî dide zanîn (1933: 5).

Hevindê Sorî jî di çarçoveya yekbûna giştî ya kurdan da giringîyeke mezin dide yekxistina zimanê kurdî û vê yekê merca destpêkî ya yekîtiya neteweyî dide zanîn. Ji ber vê, armanca herî mezin a *Hawarê* yekxistina zarên kurdî û nêzîkkirina şeweyên wê dide zanîn û dîyar dike ku *Hawar* ji bo vê armancê bi gelek alîyan ra ketîye nav têkilîyê. Sorî li ser navê *Hawarê* di bin sernavê “Sehîti le bo Yekîtiya Zimanê Kurdî”yê da ji bo gengeşekirina vê mijarê sê pirsyaran destnîşan dike, ji xwendevanan dixwaze ku raya xwe li ser van pirsyaran dîyar bikin û ji bo *Hawarê* bişînin da ku ev boçûn di kovarê da bîn weşandin. Pirsyarên Hevindê Sorî yên ku di bin heman sernavî da dibin destpêka gengeşeyê germ ev in: “1. Kurdî çawa dikare bê pakkirin?, 2. Zar û şeweyên kurdî çawa li hev bîn nêzîkkirin ku hemû kurd ji zarên hev têbigihîjin?, 3. Zimanê kurdî çawa bi pêş dikeve û bi ser dikeve?” (1933, 1-2).

Li ser vê antekê di hejmara 21ê ya *Hawarê* da tê dîyarkirin ku tenê çend bersiv ji Îraqê gihîştine wan û sedema vê jî bi qedexekirina kovara *Hawarê* ve tê girêdan ku Hikumeta Îraqê nahêle kovar biçe vî welatî. Piştî vê Lawêkî Kurd di bin sernavê “Sehêfî le bo Yekîtiya Zimanê Kurdî”yê da li ser anteka Hevîndê Sorî raya xwe derdibire. Bi dîtina wî, divê kurdên jorîn û jêrîn ji hev cuda du komeleyên zimanî ava bikin, bi rêya endamên van komeleyan ji bo peydakirina bêjeyên petî li gundan bigerin û kesên ku bêjeyên cuda bibînin bîn xelatkin. Li aliyê din divê her yek ji van komeleyan kovareke edebî derxe û bi arîkarîya weşan û mamostayên kurd bêjeyên nû di nav gelî da belav bikin. Di encamê da divê damezirînerên van komelayan amadekarîya ferhengê bikin û her çî bêjeyên jorîn (kurmancî) û jêrîn (sorani) hene hîlbijêrin û di nav vê ferhengê da bi cih bikin. Piştî çapkirina vê ferhengê divê çapxaneyek bê kirin û di hemû waran da pirtûkên kevin û nû bi nirxeke erzan bîn çapkin û belavkin. Herî dawî divê ev komele normên zimanî yê Tewfîq Wehbî Begî û Bedirxanîyan binirxînin û her dema ku serbestî çê bû dest bi nivîsîna alfabeya latînî bikin (1933, 1-2).

Elî Seydo Gewrî di nivîsara xwe ya kurmancî ya hejmara 22yê da di bin heman sernavê jorîn da di çarçoveya hîlbijartina normê da zarên herî pak û xwerû zarên mukrî û kurmancî dide zanîn û dîyar dike ku her du zar gelek nêzîkî zimanê zendî û avestayî ne. Li ser pirsyarên antekê dîyar dike ku ji bo ku cihê bêjeyên bîyanî yê di nav zimanê kurdî da bigirin divê sûd ji hemû zaran bê wergirtin lê berî vê ji bo xwendin û nivîsînê divê zarek ji nav van zarên kurdî bê hîlbijartin û paşê bêjeyên zarên din di nav vî zarê hîlbijartî da bîn bicihkin. Ji bo pêşvebirina zimanê kurdî jî berhevkirina helbest û pendên bav û kalan, vekirina xwendingehan li bajar û gundan, wergêrana pirtûkên hêja yê bîyanîyan, weşandîna kovar û rojnameyan û avakirina du civatên zanistî û dînî ji bo hîlbijartina bêjeyên kevnare û dariştina bêjeyên nû wek karên pêwîst dide zanîn (1933: 1).

Di heman hejmarê da Osman Sebrî dîyar dike ku divê pêşî yekîtiya alfabeya kurdî bê pêkanîn, paşê ji xortên kurd ên her welatî ku bi mijara zimanî ra mijûl dibin, civateke zanistî bê avakirin û di vê civata zanistî da berî her tiştî ferhengê mezîna zimanê kurdî, paşê jî pirtûkên kevnar û nûjen bi hemû zarên kurdî bîn weşandin û li ser vê bingehe jî bo yekîtiya zimanê kurdî xebat bê kirin. Li gor wî dema ev bê kirin

dê di nav deh salan da di xwendinê da yekîtî û di axaftinê da jî nêzîkbûnek di nav kurdan da çê bibe (1933: 1-2).

Li gor Cegerxwînê ji bo yekxistina zimanê kurdî divê pêşî ji her çar aliyên Kurdistanê bi beşdarîya seyda, zana û pisporên zarên kurdî civatek kom bibe. Ev civat divê ji nav zarên kurdî zarê herî sivik, bilind û şîrîn hilbijêre ku piranîya kurdan pê diaxivin û zarên din jî bikujin û tenê ji bo xurtkirin û temamkirina kêmanîyên zarê hilbijartî ji zarên kuştî sûd wergirin. Bi raya wî dema kurd hewl bidin ji hemû zaran zarekî hevbeş çê bikin dê hemû kurd bikevin nav dijiwarîyê lê bi hilbijartina zarê herî berbelav dê tenê beşeke biçûk a civaka kurdî vê zehmetîyê bikişîne. Cegerxwîn vê yekê tişteki xerîb nabîne û dîyar dike ku neteweyên din jî weha kirîye û eger li ser vê mijarê kongreyekê bê lidarxistin dê delîlên zêdetir destnîşan bike û hûrgilîyên ramanên xwe bixe rû (1933: 6).

Lacê Henî di heman hejmarê da ji Qahîreyê beşdarî vê gengeşeyê dibe û pêşî behsa nebûna zimanekî hevbeş ê kurdî dike paşê jî ji bo gihîştina vê armancê di serî da bi şêweyekî zanistî berhevkirina hemû zarên kurdî (kurmancî, babanî, zazayî, lûrî, feylî, bextiyarî, hawramî) pêwîst dibîne da ku zana û nivîskarên kurd bikarin ji helbest û gotinên hemû zarên kurdî sûd wergirin û dev ji bêjeyên bîyanî berdin. Li gor wî nêzîkbûna zarên kurdî li ser vê bingehe hêdî hêdî, bi civandin û belavkirina van zaran dê pêk bê û her xwenda, zana û nivîskarên kurd bi mijûlîya zimanê dê van zaran têkelî hev bikin. Lê heta ev çê bibe divê kurd di hemû zarên kurdî da li ser rênivîseke hevbeş li hev bikin. Piştî pêkanîna van karan ji bo yekxistina awayê nivîsînê, danîna zaraveyên zanistî û dewlemendkirina zimanê divê civateke zimanê bê avakirin û encama xebatên vê civatê ji aliyê hemû kurdên welatparêz ve bê cihbicihkirin û vî zimanê kurdî yê hevbeş hînî zarokên xwe bikin û pê binivîsin (1933: 7-8).

Piştî temambûna vê anketê jî, li ser rûpelên *Hawarê* û weşanên din ên birayên Bedirxanî mirov car bi car rastî boçûnên weha tê. Hesen Hişyar deh sal paşê bi nivîsareke xwe ya rojnameya *Roja Nû* beşdarî vê gengeşeyê dibe û herwek bersivdana pirsyarên Hevindê Sorî yekîtîya kurdan di şeş xalan da destnîşan dike ku ew jî bi gotina wî; ji yekîtîya zaran, yekîtîya tîpan, yekîtîya cografî, yekîtîya armancê, yekîtîya ramanê û yekîtîya dînî pêk tê. Li gor wî li Kurdistanê heft zar û şêweyên wek kelhorî, bextiyarî, hewramî, goranî, zazî û kurmancî hene û divê ev heft şêwe û zar bi arîkarîya

xwendevan û rojnamevanên zana bigihîjin hev. Bi raya wî divê kurmancî bibe bingeha zarê hevbeş û ev zar bi bêjeyên zar û şêweyên din bê xurtkirin. Li hember îtîraza muhtemel a axiverên zarên din jî vê yekê bi zanist û welatparêzîyê ve girê dide û dîyar dike ku kîjan zar dewlemend û xwedî axiverên zêdetir be divê ew bibe zimanê hemû kurdan û bi raya wî ev zar kurmancî ye. Ew jî herwek Celadet Bedirxanî ji bo gihîştina vê armancê pêngava pêşî bikaranîna alfabeya latînî dizane (1944: 1).

Balkêş e ku mijara yekxistina zimanê kurdî di navbera nivîskarên başûr û bakurî yên *Hawarê* da bi şêweyekî gotûbêjî derdikeve pêş. Ji ber vê Lawînî Pijderî di nivîsara xwe ya kurdîya soranî da piştî ku ji bo pêşveçûna zimanan behsa giringîya weşanê dike, ji xwendevanan dixwaze ku piştgirîya *Hawarê* bikin, lewra bi raya wî armanca sereke ya *Hawarê* bilindbûna zimanê kurdî û yekxistina her du kurdîyên jorîn û jêrîn e (1934: 8). Di heman hejmarê da Celadet Bedirxan bi îmzeya “Hawar”ê bang li hemû xortên kurd ên li Îraqê dike ku dê *Hawar* guh nede qedexeyên Hikumeta Îraqê, ji ber neşandina nivîsar û helbestên wan dilgiranîya xwe dîyar dike, *Hawarê* wek zevîyek û zarê jorîn (kurmancî) û jêrîn (soranî) jî tovên sereke yên vê zevîyê dinasîne û nehatina nivîsarên kurdîya soranî wek kêmasîyeke esasî dide zanîn. Bi raya wî herçend nivîskarên Başûrê kovarê bi dest nexin jî divê dîsa nivîsarên xwe bişînin, lewra ew ji bo nifşên paşerojê kar dikin û tovên ku niha diavêjin bin axê dê di paşerojê da zîl bidin. Loma jî ji wan dixwaze ku ji bo yekxistina zimanê kurdî û nifşên paşerojê, li ser şandina nivîsarên xwe berdewam bin (*Hawar*, 1934: 9).

Ji van gotinan derdikeve ku Celadet Bedirxan peywendîya navbera kurmancî û soranî û axiverên wan ji bo paşeroja zimanê kurdî karekî stratejîk dibîne. Ji ber vê di hejmara pêşî ya *Ronahîyê* da dîyar dike ku ji Bexda, Hewlêr, Duhok, Amedî, Zaxo, Ranye, Silêmanî, Akre, Kerkûk, Etrûş û Rewandizê gelek name wergirtine, ji bo vê peywendîyê kêfxweşîya xwe derdibire û dîyar dike ku *Ronahî* jî wek *Hawarê* dê nivîsarên kurmancî û babanî belav bike lê ji nivîskaran dixwaze ku nivîsarên xwe “bi tîpên kurdî yên paqij û jiheveqetandî”, yanî bi alfabeya latînî binivîsin da ku bikare wan wek xwe û rast bixwîne û di *Hawar* û *Ronahîyê* da biweşîne (1942: 12).

Aşkera ye ku bikaranîna alfabeya hevbeş ji aliyê Celadet Bedirxanî ve wek pêngava pêşî ya yekxistina zimanê kurdî tê dîtin, loma jî di hejmara 14ê ya *Ronahîyê* da cih dide anketeke *Gelawêjê* ku ji xwendevanên xwe dipirse “zimanê kurdî bi

alfabeya latînî yan erebî bê nivîsîn”. Celadet Bedirxan vê ramanê wek pêşketinekê dide zanîn, ji ber vê gengeşeyê pîrozbahî li wan dike û hêvîya serkeftinê ji wan ra dixwaze (1943: 24). Herweha dema dibihîze ku kovara *Nîştîmanê* derdikeve û dê piştî çendekî din bi tîpên latînî berdewamî bide weşana xwe, vê wek mizgînî dide zanîn û kêfxweşîya xwe nîşan dide (1943: 23).

Herçend hêvîyên wî yên bikaranîna alfabeya latînî ji aliyê kurdên Îraq û Îranê ve neyên cih jî hem ew hem jî Kamiran Bedirxan kovar û rojnameyên kurdî yên ku li Îraq, Îran û Sovyetê derdikevin, di weşanên xwe da dinasînin û hewl didin xwendevanên wan jî van weşanan agahdar bibin û wan bixwînin. Di nav van weşanan da Celadet Bedirxan cihekî taybetî dide kovara *Gelawêjê*, ji ber vê jî navê wê wek “Gulavêj”ê xweş dike û di çendîn hejmarên *Hawar* û *Ronahîyê* da behsa wê û naveroka wê dike. Celadet Bedirxan, *Gelawêjê* jî hemû kovarên kurdî yên ku derketine tekûztir dide zanîn (1941: 8) û wê dide ber kovareke fransî ku jê ra “Revue des deux mondes” (kovara her du dinyayan) dibêjin. Ew jî *Gelawêjê* “Revue des deux monde”a kurdan dide zanîn û jî kurdên Îraqê dixwaze ku arîkarîya *Gelawêjê* bikin mînakên wê zêdetir bikin (1942: 12).

Piştî van nîrxandinan em dikarin bibêjin ku Celadet Bedirxan dixwaze di mînakê *Hawarê* da bîngeha zimanekî standard daîne. Ji ber vê dema di kovara *Gelawêjê* da li ser nasandina weşanên Bedirxanîyan tê gotin ku bi “zimanî kurdîy botan”ê tê nivîsîn vê gotinê red dike û dîyar dike ku navê zimanê wan kurdî ye û xwedîyê van kovaran botî bin jî bi zarê botî nanivîsin û hewl didin bi zimanekî standard binivîsin. Ji ber vê dîyar dike ku kovar û rojnameyên Sûrîyeyê bi zarê kurmancî derkevin jî nivîskarên wan dixebitin ku “zimanekî yekbûyî” bînin pê, ji ber vê jî guh nadin zarê xwe û berevajî vê, berê xwe didin zimanekî paşerojê yê giştî û di xebatên xwe da dixwazin ji bêjeyên zarên din jî sûd wergerin (1944: 15). Bi vî awayî *Hawarê* û weşanên din wek zemîna avakirina vî zimanê paşerojê yê standard dibîne û dixwaze li ser vê bîngehê jî bo nişfên paşerojê bîngeheke bihêz û mîrateke baş bihêle.

2.5. PLANDANÎNA ZIMANÊ KURDÎ DI SERDEMA KOMARA MEHABADÊ DA

Kurdên Îranê ji peymanana Qesrê Şîrînê û vir ve ji alîyê sîyasî ve ji tevahîya civaka kurdî bîn veqetandin jî peywendîya wan a çandî di gel kurdên Osmanî didome. Ji ber vê dema ku ronakbîrên kurd li Stenbolê dest bi danîna bingegehên çandî û zimanî dikin wek nûnerên vê beşa civaka kurdî Mihemed Mihrî, Qazî Letîf, Qazîzade Mistefa Şewqî û Mihemed Mihrî di weşanên vê serdemê da roleke giring dibînin û di bin parçeyêke plandanî û geşedana zimanê kurdî.

Di serdema avakirina dewletên neteweyî da li dor tevgera Simkoyê Şikakî (1918-1930) cara pêşî di 1921ê da bi navê *Rojî Kurd* yan *Kurdê* rojnameyek derkeve jî temenê vê rojnameyê dirêj nabe (Deştî, 2009: 51). Ji ber vê heta salên Şerê Cîhanê yê Duyem tu çalakîyeke çandî li vir nayê dîtin. Tevî vê di mînakê Seyfî Qazî da di bin karîgerîya ramanên Hacî Qadirê Koyî da zimanekî petî yê helbestê tê afirandin û ji bo hin helbestvanên ciwan ên Mukrîyanê dibe çavkanîya îlhamê (Hêmin, 2014: 484-485).

Li ser vê bingegehê di maweya Cenga Cîhanê ya Duyem da (1943-1947) bi arîkarî û handana Sovyetê li hin navçeyên Kurdistana Îranê li dor rêxistina Komeley Jîyanewey Kurdê bi navê *Nîştîmanê* kovareke kurdî tê derxistin û bi damezirandina Komara Kurdistanê kovarên mîna *Awat*, *Hawarî Kurd*, *Kurdistana*, *Hawarî Nîştîman*, *Helale*, *Girûgalî Mindalanî Kurd* û rojnameya *Kurdistana* di geşedana zimanî da roleke berbiçav digêrin (bnr: Husên, 2008). Herçend temenê van weşanan dirêj nakêşe jî di vê maweya kurt da zimanê kurdî wek zimanê fermî tê ragihandin, li mizgeftan xutbeyên kurdî tên xwendin, xwendingehên kurdî tên vekirin û amadekarîya hin pirtûkên perwerdeyê jî tê kirin (Elî, 2013: 251-253).

Di vê maweyê da li Mehabadê li ser navê plandanîna zimanî tiştêkî berbiçav dernekeve holê jî Rehîmê Qazî wek kesayetîyekî wê serdemê, di romana xwe ya *Pêşmergeyê* da destnîşan dike ku Qazî Mihemed (di romanê da Bînayî) ferman dide Hêminê helbestvan ku di şûna bêjeyên erebî û farisî da bêjeyên kurdî peyda bikin û di encama vê da jî li ser zimanê Hêminî tê ragihandin ku ji bo dozîna navekî guncaw ji bo bêjeya “serbaz”ê dema li çayxaneyêke Mehabadê gengeşe dikin çayfiroşê çayxaneyê ji wan ra dîyar dike ku di nav gelî da ji bo mirovên canfeda “pêşmerge” dibêjin (1997: 86-87) û bi vî awayî bêjeyêke gelêrî ji bo qadeke jîyana nûjen tê pêşnîyazkirin û di salên paşê da ev bêje wek zaraveyêke leşkerî cihê xwe digire. Bi vê anekdotê em hîn dibin ku di serdema Komara Kurdistanê da zaraveya “pêşmerge”yê

wek encama plandanîna zimanî tê dahênan û eger temenê Komarê dirêj bûya dê gelek zaraveyên weha bihatana dozîn yan dariştin.

Ji bilî vê maweya kurt a xebatên zimanî li Mehabadê ji ber nebûna derfetên xebata çandî û zimanî li Îranê kesayetîyên giring ên vê serdemê yên mîna Hejar²⁸, Hêmin, Ebdurehman Zebîhî²⁹ û Hesên Qizilcî ku li dor Komeley Jîyanewey Kurd û Komara Kurdistanê li Mehabadê bi karûbarên zimanî, çandî û weşangerîyê ra mijûl dibûn, berê xwe didin Kurdistanê Îraqê û dema ku Korî Zanyarî Kurd vedibe hinek ji wan wek endamên kara û arîkar hinek jî bi xebatên xwe yên nivîskî di nav vê dezgehê da cih digirin û beşdarî plandanîna zimanê kurdî dibin.



²⁸ Hejar, di salên paşê da (1991) bi navê *Henbane Borîneyê* ferhengeke mezin a kurdî-kurdî-farisî dinivîse.

²⁹ Ebdurehman Zebîhî bi navê *Qamûsî Zimanî Kurdîyê* ferhengeke zimanê kurdî dide çapkirin ku berga wê ya yekem di 1977ê da û berga duyem jî di 1979ê da di nav weşanên Korî Zanyarî Kurdê da tê weşandin.

BEŞA SÊYEM

XEBATÊN KORÎ ZANYARÎ KURDÊ LI SER PLANDANÎNA ZIMANÊ KURDÎ

3.1. DAMEZIRANDINA KORÎ ZANYARÎ KURDÊ, ARMANC, LIJNE Û ÇALAKÎYÊN WÊ

3.1.1. Damezirandina Korî Zanyarî Kurdê û Armancên Wê

Ronakbîr û zimannasên kurd ji sala 1908ê û pê da herwek modelên derûdor ji bo plandanîna zimanê kurdî damezirandina dezgeheke zimanî pêşnîyaz dikin (T..., 1331: 8-9; Bitlîsî, 1985: 666-668; Nebez, 2007: 20) lê ji ber nebûna kîyaneke siyasî ya kurdî û rêgirîyên din heta sala 1970yê ev daxwaz cihbicih nabe. Li Îraqê piştî kudetaya 14ê Tîrmeha 1958ê û binecihkirina sîstema komarî ev daxwaz zêdetir dibe û “dikeve nav bernamêya siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê” (Hassanpour, 2005: 633) ku wê demê ji aliyê siyasî ve pêşengtîya kurdên Îraqê dike. Herçend di serdema komarî da dezgeheke mîna Rêveberîya Giştî ya Dersên Kurdî di nav Wezareta Perwerdeyê ya Îraqê da bê avakirin û destkefteke kurdan çê bibe jî tevî hemû qewl û xweşkirinên wan, akademîyeke zanistî ji bo zimanê kurdî nayê avakirin. Ev daxwaz piştî Şoreşa Eylûlê bi Peymana 11ê Adara 1970yê dikeve warê cihbicihkirinê û rê li ber Korî Zanyarî Kurdê (Akademîya Zanistî ya Kurd) vedibe.

Li gor vê peymanê ku ji aliyê Ehmed Hesên Bekirê serokkomarê Îraqê û Mistefa Barzanîyê pêşengê Şoreşa Eylûlê ve tê pesendkirin Îraq ji her du neteweyên ereb û kurd pêk tê, zimanê kurdî li tenişt zimanê erebî li hemû navçeyên kurdî dibe zimanê fermî û di vê çarçoveyê da biryara vekirina Korî Zanyarî Kurdê tê dayîn. Bi vê mebestê di 3yê Nîsana 1970yê da komek zana, nivîskar û ronakbîrên kurd bi nûnertîya Silêmanî, Kerkûk, Hewlêr, Behdînan, Xaneqîn, Gelale û Bexdadê, li Fakulteya Edebîyatê ya Zanîngeha Bexdadê dicivin û ji bo danîna hîmê vê akademîyê gotûbêj dikin. Di vê civînê da bi hîlbijartîneke veşartî lijneyek ji bo danîna destûra akademîyê tê pêkanîn û di encamê da jî Doktor Pakîze Refîq Hîlmî bi 25 dangan, Ebdulrehman Hejar bi 23 dangan, Doktor Marîf Xeznedar bi 23 dangan, Şêx Mihemedê Xal bi 21 dangan, Doktor Nacî Ebas bi 21 dangan, Kamîl Besîr bi 21 dangan, Sadiq Behaedîn bi 21 dangan, Doktor Îhsan Fuad bi 20 dangan û Husên Reşwanî bi 20 dangan tên

hîlbijartin. Lijneya hîlbijartî piştî çend civînan destûra Korî Zanyarî Kurdê amade dike û ji bo pesendkirinê pêşkêşî Wezareta Karûbarên Bakurê dike (Deferî Kurdewarî, 1970: 154-156).

Li ser vê bingehe, Encumena Serokatîya Şoreşa Îraqê bi biryara hejmar 183yê ya sala 1970yê qanûna Korî Zanyarî Kurdê (KZK) diweşîne (Şêrzad, 1973: 3) ku ji 25 madeyan pêk tê û pênaseya kar, armanc, pêkhate, endam, lijne, peykera rêveberîyê û awayê karkirina KZKyê dîyar dike. Herwek di madeya yekem da tê dîyarkirin KZK wek dezgeheke Komara Îraqê û şaxa kurdî ya Korî Zanyarî Îraqê tê pênasekirin ku xwedî serbixwetîya darayî û birêvebirinê ye. Di madeya duyem da jî tê destnîşankirin ku navenda wê li Bexdadê ye lê bi dengdana du li ser sêyê dikare civînên xwe li cihên din ên Îraqê jî çê bike (1973: 785-793). Armancên KZKyê di madeya sêyem da tê dîyarkirin ku ji van xalan pêk tên:

- a) Bilindkirina xebat û vekolînên zanistî yên li Îraqê di asta geşedana pêşketina zanistî da.
- b) Parastina zimanê kurdî û geşkirina wê li gor hewcedariyên zanistî, edebî û hunerî.
- c) Vejandina mîrata kurdî û îslamî di warê zanist, edebîyat û hunerê da.
- d) Giringîdana xebatên li ser şaristanîyên Îraqê bi giştî û herêma kurdî bi taybetî.
- e) Weşandina vekolînên resen û handana wergêran û nivîsînê di warên zanistî, edebî û hunerî da.

Di madeya çarem da jî rêyên gihîştina van armancan tên destnîşankirin ku ji van xalên jêrîn pêk tê:

- a) Danîna fehengên zanistî û zimanewanîyê.
- b) Derxistina kovar û bultenan.
- c) Weşandina pirtûk, belge û deqên kevin.
- d) Bihêzkirina peywendîyan di gel Korî Zanyarî Îraqê û akademî û dezgehên zimanî û çandî li welatên erebî û welatên din.
- e) Xelatkirina vekoler, nivîskar û edebîyatvanên dîyar.
- f) Dabînkirina arîkarîya diravî ji bo vekoler, nivîskar û wergêran.

- g) Nivîsîn û wergêrana mijarên ku ji alîyê KZKyê ve hatine hilbijartin.
- h) Ji bo gengeşeyên paşerojê destnîşankirina demê.
- i) Vekirina pirtûkxaneyekê ji bo KZKyê û giringîdana bi karên çapxaneyê (1977: 792-793).

3.1.2. Pêkanîna Peykera Rêveberî û Lijneyên KZKyê

Pêkhateya KZKyê di madeya şeşem da tê dîyarkirin ku ji 5 endamên tamdemî, 10 endamên nîv-demî, ji hin endamên şerefê û endamên arîkar pêk tê. Di madeya heftem da taybetmendiyên endamên kara yê û dezgehê tî dîyarkirin ku divê îraqî bin, ji sih salan biçûktir nebin, zimanê kurdî baş bizanin, di şaxek yan çend şaxên zanistê da pîspor bin, agahdarî pirtûkên qada pîsorîya xwe bin, agahdarî rêzimana kurdî bin û di karûbarên zanistî da beşdarî bikin. Ji bilî vana di madeya nehem da tê dîyarkirin ku KZK zanyarên xwedî azmûn û ronakbîrên kurd ên ne-îraqî jî dikare bike endam lê divê hejmara wan ji deh kesan derbaz neke (1973: 790-791). Li ser vê pêkhateya endamên serokatîya KZKyê jî di madeya sêzdehem da tê dîyarkirin ku serokatîya KZKyê ji serokek, cihgirên yekem û duyem û ji du endamên kara pêk tê. Endamên serokatîyê jî divê îraqî bin, bi hilbijartina veşartî bî destnîşankirin û ji sê salan carekê bî nûkirin (1973: 789).

Bi vê riwangehê KZK, civîna xwe ya yekem di 27ê Adara 1971ê da li dar dixê û heta 1972yê bi tevahî 53 caran kom dibe. Di encama van civînan da mîna ku di madeya 22em a qanûna KZKyê da hatiye, peyrewa navxweyî ya vê dezgehê û pêkhate û peykera wê ya rêveberîyê tê destnîşankirin. Di xula (dewre) yekem da tevî serok 11 endamên kara tî destnîşankirin ku ji Îhsan Şêrzad (serok), Şêx Mihemedê Xal, Ebdula Neqîşbendî, Mesûd Mihemed, Elaedîn Secadî, Pakîze Refîq Hîlmî, Ezîz Akreyî, Ebdurehman Hejar, Nacî Ebas, Ehmed Elî Usman û Kemal Mezher Ehmedî pêk tî. Tewfîq Wehbî û Ebdula Neqîşbendî³⁰ wek endamên şerefê, Qenatê Kurdo û Kamran Bedirxan wek endamên kara yê li derveyê welatî û Faîq Huşyar, Ebdulhemîd Etrûşî, Dr. Cemal Reşîd, Şakir Fetah, Dr. Nesrîn Fexrî, Rewşen Salih Bedirxan, Memduh Selîm, Ekrem Cemîl Paşa, Elî Seydo Goranî, Mihemed Mistefa Kurdî, Cemal Baban, D. Kemal Mihemed Seîd Xeyat, Dr. Samal Mecîd Ferec, Dr. Ezîz Ehmed, Dr. Ehmed

³⁰ Ebdula Neqîşbendî dema ji ber karê xwe yê fermî dest ji endamtîya kara ya Korî Zanyarîyê dikêşe wek endamê şerefê tê hilbijartin (Govarî Korî Zanyarî Kurd, 1973: 529).

Usman Ebubekir, Sadiq Behadîn, Usman Ewnî Hebîb, Kamîl Besîr, Kemal Celal Xerîb, Hafîz Mistefa Qazî, Ehmed Tahîr Neqîşbendî û Mihemed Emîn Usman jî wek endamên arîkar tên hilbijartin (Mezher, 1973: 323-324). Ji bilî van kesan, encumena KZKyê di civîna xwe ya roja 20. 12. 1972yê da Erebê Şemo û Prof. Dr. Hecîyê Cindî wek endamên arîkar hildibijêre (Govarî Korî Zanyarî Kurd, 1973: 530). Bi vê pêkhateyê KZK hewl dide endamên hemû navendên plandanîna zimanê kurdî yên berî xwe berbihev bîne û bingeha plandanîneke xurttir daîne. Ji bo desteya encumena KZKyê jî Îhsan Şêrzad wek serok, Ezîz Akreyî wek cihgirê yekem, Şêx Mihemedê Xal wek cihgirê duyem û Elaedîn Secadî û Nacî Ebas jî wek endam bi hilbijartina veşartî ji alîyê endamên KZKyê ve ji bo sê salan tên hilbijartin.

KZK ji 1970yê heta 1973yê dikeve nav hewldanên xweavakirinê û di vê maweyê da hin lijneyên xebatê jî destnîşan dike. Bi vî awayî wek dezgeheke zimanî cara pêşî Lijneya Zimanî ava dike ku ji heşt kesan pêk tê. Ev lijne roja 3. 5. 1971ê dest bi kar dike û duwazdeh caran kom dibe. Piştî demekê tê hilweşandin û di şûna wê da Lijneya Ziman û Rênivîsê tê avakirin ku ji Mesûd Mihemed, Hejar, Pakîze Refîq Hîlmî, Nesrîn Fexrî, Kamîl Besîr, Sadiq Behadîn, Ebdulhemîd Etrûşî û Nûrî Elî Emînî pêk tê. Li gor zanyariyên Mesûd Mihemedî ji ber zêdebûna endamên lijneyê û devjenîyeke zêde civînên vê lijneyê bêencam dibin û ev lijne jî tê hilweşandin. Ji ber vê di 12. 11. 1972yê da bi navên Lijneya Zimanî û Lijneya Vekolîna Zimanî du lijneyên nû tên avakirin (1975: 389-390). Di vê maweyê da encumena KZKyê ji bilî van lijneyan bi mebesta cihbicihkirina hinek erkên pêwîst çend lijneyên demkî jî datîne. Bi vê armancê di havîna 1971 û 1972ê da ji bo berhevkirina zarave, folklor û destnivîsan li navçeyên Duhok, Hewlêr û Silêmanîyê çend lijneyên gerok ava dike û li gor Kemal Mezherê raportorê pêşî yê KZKyê, ev lijne gelek encam û destkeftên binirx pêşkêşî KZKyê dikin û hejmarek destnivîsên kevin, gelek çîrok, bend, qesîde û destanên folklorîk ên hêja û navên amrazên gelek kar û pîşeyan kom dikin û didine KZKyê (Mezher, 1973: 328-330).

Piştî van ceribandînan destpêkî KZK di 1973yê da ji bo pêkanîna armancên xwe yên destnîşankirî di bin banê xwe da wek qadên xebatê deh lijneyên hertimî ava dike û ji bo her lijneyekê jî ji endamên jorîn kesên guncaw destnîşan dike. Bi vî awayî KZK sala 1973yê dike xula yekem a xebatên lijneyî û her sê salan carekê di van

lijneyan da guherînên pêwîst dike. Navên lijne û endamên lijneyên xula yekem weha ne:

1. **Lijneya Ziman û Zanistên Wî:** Mesûd Mihemed, Ebdurehman Hejar, Nesrîn Fexrî, Nûrî Elî Emîn û Sadiq Behadîn.
2. **Lijneya Edebîyat û Çandê:** Mesûd Mihemed, Ebdurehman Hejar, Elaedîn Secadî, Cemal Baban û Mihemedê Mela Kerîm.
3. **Lijneya Zanistên Civakî:** Nacî Ebas, Ehmed Usman Ebubekir, Kemal Mezher.
4. **Lijneya Zanistê:** Îhsan Şêrzad, Ehmed Elî Usman û Cemal Reşîd.
5. **Lijneya Ferhengê:** Mesûd Mihemed, Ebdurehman Hejar û Cemal Baban.
6. **Lijneya Wergêran, Danîn (telîf) û Weşanê:** Doktor Ebdurehman Qasimlû, Şakir Mistefa û Kemal Mezher.
7. **Lijneya Şaristanîya Îslamê:** Şêx Mihemedê Xal, Elaedîn Secadî û Ebdulhemîd Etrûşî.
8. **Lijneya Aborî û Hiqûqê:** Îhsan Şêrzad, Ebdula Neqîşbendî, Faîq Huşyar û Samal Mecîd Ferec.
9. **Lijneya Pirtûkxane û Kovarê:** Îhsan Şêrzad, Mihemedê Mela Kerîm, Hiseyn Caf û Kemal Mezher.
10. **Lijneya Vekolînên Zimanê Kurdî:** Pakîze Refîq Hîlmî, Kamîl Besîr, Mihemedê Mela Kerîm û Ebuzeyd Sîndî (Mezher, 1973: 328-329).

Bêguman endamên KZKyê û endamên lijneyan dînamîk in û xul bi xul di wan da guherîn çê dibe. Ji ber vê di 1974ê da Ebu Zeyd Mistefa, Tahîr Sadiq, Doktor Hîkmet Tofîq, Şikur Mistefa, Ebdurehman Qasimlû, Ebdulmecîd Lutfî, Kerîm Şareza, Mihemed Emîn Hiseyn (Hêmin), Mihemed Resûl Hawar, Mihemedê Mela Kerîm û Nûrî Elî Emîn wek endamên arîkar tînin hilbijartin (Mezher, 1974: 829). Di vê çarçoveyê da di lijneyan da jî guherîn çê dibin û navên kesên nû li van lijneyan tînin zêdekirin. Di vê lijneya nû da ji bo her lijneyek raportorek (muqerir) jî tê destnîşankirin da ku encamên kar û xebatên wan binivîse. Lijneyên nûkirî yê xula duyem weha ne:

1. **Lijneya Ziman û Zanistên Wî:** Mesûd Mihemed, Doktore Nesrîn Fexrî, Nûrî Elî Emîn, Sadiq Behadîn. Endamê Kara Mesûd Mihemed raportorê lijneyê ye.
2. **Lijneya Edebîyat û Çandê:** Mesûd Mihemed, Hejar, Hêmin, Cemal Baban. Endamê Kara Mesûd Mihemed raportorê lijneyê ye.
3. **Lijneya Zanistên Civakî:** Nacî Ebas, Ehmed Usman Ebubekir, Fuad Heme Xurşîd, Kemal Mezher Ehmed. Endamê Kara Nacî Ebas raportorê lijneyê ye.
4. **Lijneya Zanistê:** Îhsan Şêrzad, Cemal Reşîd Ferec. Ehmed Elî Usman endamê vê lijneyê ye lê ji bo karê zanistî li derveyê welatî ye. Serokê KZKyê Îhsan Şêrzad raportorê lijneyê ye.
5. **Lijneya Ferhengê:** Mesûd Mihemed, Hejar, Hêmin, Cemal Baban, Ebdurehman Merûf. Endamê Kara Mesûd Mihemed raportorê lijneyê ye.
6. **Lijneya Wergêran, Danan û Weşanê:** Ebdurehman Qasimlû, Hejar, Şîkur Mistefa, Kemal Mezher. Endamê Kara Kemal Mezher raportorê lijneyê ye.
7. **Lijneya Şaristanîya Îslamê:** Şêx Mihemedê Xal, Elaedîn Secadî, Ebdulhemîd Etrûşî. Endamê Kara Şêx Mihemedê Xal raportorê lijneyê ye.
8. **Lijneya Zanista Aborî û Hiqûqê:** Îhsan Şêrzad, Ebdula Neqîşbendî, Faîq Huşyar, Samal Mecîd Ferec, Ebdurehman Qasimlû. Serokê Korê Îhsan Şêrzad raportorê lijneyê ye.
9. **Lijneya Pirtûkxane û Kovarê:** Îhsan Şêrzad, Mistefa Seyîd Ehmed Nerîman, Hiseyn Caf, Kemal Mezher. Serokê Korê Îhsan Şêrzad raportorê lijneyê ye.
10. **Lijneya Vekolînên Zimanî:** Pakîze Refîq Hîlmî, Mihemed Emîn Hewramanî, Ebu Zeyd Sindî. Endamê Kara Pakîze Refîq Hîlmî raportorê lijneyê ye (Mezher, 1974: 830-831).

Heman guherîn di encumena KZKyê da jî çê dibin. Li gor vê, Îhsan Şêrzad dîsa dibe serokê KZKyê, Mesûd Mihemed dibe cîgirê yekem, Şêx Mihemedê Xal dibe cîgirê duyem û Elaedîn Secadî û Kemal Mezher jî wek endam tînin hilbijartin (1974: 942). Ji bilî vê tê dîyarkirin ku li gor qanûna wê ya nehem KZK dikare 10 kesên ji derveyê Îraqê bike endamên kara û ji ber vê jî biryar tê dayîn ku Ebdurehman Qasimlû bibe endamê kara yê derveyê Îraqê (1974: 945). Ji bilî guherîna kesên, salek paşê bi biryara encumena KZKyê ji bo destnîşankirina zaraveyên zanistî bi navê Lijneya Danîn û Vekolîna Zaraveyên Zanistî lijneyeke demkî ya nû jî tê avakirin ku endamên

wê ji Mesûd Mihemed (demrast), Şukur Mistefa (sekreter), Hêmin Mukrîyanî (endam), Dr. Ewrehmanî Hacî Marifî (endam) pêk tên. (1976: 433-434).

Di destpêka xula sêyem da (1977) dîsa guherîn çê dibin, lewra di sê salên dawî da hejmara endaman ji dehê dikeve şeşê, hinek ji endamtîyê tên avêtin û hinek jî ew bi xwe nayên civînan. Ji ber vê hin endamên nû di şûna wan da tên hilbijartin. Ji bo endamên arîkar Doktor Ewrehmanî Hacî Marif, Elî Ebdula Sofî Mihemed, Gîw Mukrîyanî, Mistefa Seyîd Ehmed, Mihemed Reşad Muftî, Heme Emîn Xefûr Hewramanî, Emîd Ehmed Hesên Ehmed, Mihemed Emîn Qadir (Kakey Felah), Reûfê Ehmedê Hesên Talanî û Doktor Qerenî Doxremeçî tên hilbijartin. Ji bilî lijneyên berê di vê xulê da jî ji bo wergêrana zaraveyên zanistî li ser mentiq, felsefe, derûnnasî û zanistên din lijneyeke demkî tê avakirin û ev lijne piranîya zaraveyên mentiq, felsefe û derûnnasîyê dike kurdî û pêşî di *Govorî Korî Zanyarî Kurdê* da paşê jî wek namîlkeyekê dide weşandin (Mihemed, 1977: 423-424) ku em dê di binbeşên jêrîn da bi awayekî hûrgilî li ser wan rawestin.

Berî ku maweya xula sêyem temam bibe ji ber guherînên rewşa sîyasî ya Îraqê KZK di 1978ê da tê hilweşandin û bi qanûna hejmara 163ya roja 4. 10. 1978ê bi navê Korî Zanyarî Êraq Destey Kurdê ji nû ve tê damezirandin. Piştî vê, bi biryara hejmara 471ê ya 15. 4. 1979ê ya Encumena Serokatîya Şoreşê 38 endamên Korî Zanyarî Êraqê tên destnîşankirin ku 9 ji wan pisporên ziman û edebîyata kurdî ne. Her neh kesên ku ji bo endamtîya Desteya Kurdê tên destnîşankirin ev in: Ezîz Reşîd Akreyî, Şêx Mihemedê Xal, Mela Ebdulkerîmê Muderis, Mûsa Ebdusemed, Doktor Hesên Ketsanî, Doktor Kamîl Hesên Besîr, Doktor Celal Mihemed Salih, Doktor Ciwamêr Mecîd Selîm û Doktor Nacî Ebas Ehmed. Ji nav van jî Ezîz Reşîd Akreyî wek serokê Desteya Kurdê û endamê dîwana serokatîyê tê hilbijartin. Endamên arîkar ên li derveyê welatî jî ji van kesan pêk tên: Elî Seydo Goranî-Urdun, Mûsa Enter-Tirkîye, Qenatê Kurdo-Yekîtiya Sovyetê, Hecîyê Cindî-Yekîtiya Sovyetê, Ordîxanê Celîl-Yekîtiya Sovyetê, Celîlê Celîl-Yekîtiya Sovyetê, Cigerxwîn-Sûrîye (Gilî, 1980: 288-290).

Di vê serdemê da Desteya Kurd sê lijneyên berdewam û lijneyeke demkî ava dike. Di vê xulê da di şûna raportorê lijneyê da serokê lijneyê tê destnîşankirin. Navên lijneyan û endamên wan weha ne:

1. **Lijneya Zimanê Kurdî:** Ezîz Reşîd Akreyî-serok, Dr. Kamîl Hesên Besîr, Sadiq Behaeddîn, Mela Cemîl Bendî Rojbeyanî, Şekûr Mistefa Ebdula, Nûrî Elî Emîn.

2. **Lijneya Edebîyat û Çanda Kurdî:** Şêx Mihemedî Xal-serok, Dr. Kamîl Hesênul Besîr, Dr. Kurdistan Gîw Mukrîyanî, Dr. Şukrîye Resûl Îbrahîm, Dr. Muhammed Farûq Umer Sîddîq, Muhammed Emîn Kardoxî, Dr. Şîwar Ebdulrehman Mam Elî.

3. **Lijneya Kovarê:** Ezîz Reşîd Akreyî-serok, Mûsa Ebdusemed, Dr. Hesên Kettanî, Şekûr Mistefa Ebdula, Ebduletîf Ebdulmecîd Mucemmed, Dr. Bedirxan Ebdula Sindî.

4. **Lijneya Demkî ji bo Vekolîna Rênivîsa Kurdî:** Dr. Kamîl Hesên Besîr-serok, Sadiq Beaheddîn Amêdî, Muhammed Emîn Xefûr Hewramanî, Şekûr Mistefa Ebdula, Nûrî Elî Emîn, Muhammedê Mela Kerîm, Ebduletîf Ebdulmecîd Muhammed (Gilî, 1980: 291-292).

Ev guherîn dibin sedem ku di navbera 1978 – 1980yê da bi awayekî kirdeyî çalakîyên vê dezgehê rawestî û tu hejmareke kovara vê dezgehê jî dernekeve. Li alîyê din herçend bê ragihandin ku dê Desteya Kurd a KZÊyê li ser rêbaza KZKyê ya hilweşiyayî berdewamî bide karên xwe û hewl bide mirovên şareza bike endamên arîkar jî (Akreyî, 1980: 3-5) bi awayekî berbiçav rol û qewareya wê tê bertengkirin. Di vê çarçoveyê da 10 lijneyên berê dadikevin 4 lijneyan, rûpelên kovarê bi 400 rûpelî tîrîn sînordarkirin, salane tenê destûra çapkirina 12 pirtûkên kurdî yan erebî tê dayîn û arîkarîya nivîskarên kurd jî ji bo weşandina berhemên wan bi 300 dînanan tê sînordarkirin (Gilî, 1980: 289). Ev jî nîşan dide bi nîsbet KZKyê di serdema nû da xweserî û taybetmendîya Desteya Kurdê gelek tê biçûkkirin û qada çalakîyên wê tê sînordarkirin.

Ji vir û pê da her ku diçe xebata Desteya Kurdê ber bi temirînê ve diçe. Loma jî *Govarî Korî Zanyarî Êraq Destey Kurd* ku neynika kar û xebatên vê dezgehê ye, hem ji alîyê naverokê ve hem jî ji alîyê dema derketinê ve lawaz dibe. Ji ber vê piştî berga 7em a 1980yê êdî li ser kar û çalakîyên Desteya Kurdê tu raporek nayê weşandin, behsa guherîna rêveber û endamên wê nayê kirin û ji bilî çend mînakên xebatên hevbeş ên giring nayên kirin. Tenê wek awarte di berga 14em a 1986ê da dema xebateke hevbeş a Lijneya Rêzimanê tê weşandin navên endamên wê tê bibîrxistin ku ji Dr.

Kamil Hesên Besîr, Mamosta Mihemed Cemîl Rojbeyanî, Dr. Wirya Umer Emîn, Dr. Kurdistan Ebdulrehman, Dr. Ebdulrehman Marif, Mamosta Ebu Zeyd Mistefa û Mamosta Nûrî Elî Emînî pêk tên (1986: 160). Ji alîyê çapa kovarê ve jî ji 1981ê heta 1984ê salê hejmarek, di 1985 û 1986ê da her salê du hejmar, ji 1987ê heta 1990ê du berg di hejmarekê da û ji 1992yê heta 2006ê jî hejmara dawî ne tê da di çar salan carekê da du berg di hejmarekê da tên weşandin. Ev jî nîşan dide ku ji alîyê qewareya rûpelan ve jî kovar bertengtîr dibe û hejmara vekolînan kêmtîr dibe.

Bêguman ev lawazî rasterast bi rûdanên siyâsî yên wê demê ra têkildar in, lewra dema di 1992yê da Hikumeta Herêma Kurdistanê tê avakirin bi awayekî kirdeyî herêmên kurdî ji Îraqê tên dabirîn û kurd êdî dezgehên xwe yên xwemalî ava dikin. Ev rewş piştî şerê dawî yê Amerîka û Îraqê yê 2003yê ji alîyê sîstema navdewletî û hikumeta nû ya Îraqê ve jî tê pesendkirin û êdî tu pêwîstî bi dezgeheke weha namîne ku di bin banê Korî Zanyarî Êraqê da be. Ji ber vê di bin hikumraniya Hikumeta Herêma Kurdistanê da bi navê Korî Zanyarî Kurdistanê dezgeheke nû tê avakirin û li ser rêça KZKyê berê ew jî kovarekê derdixe. Di 2008ê da navê wê tê guhertin û dibe Ekdîmyay Kurdî (Akademîya Kurdî) û navê kovara wê jî dibe *Govarî Ekdîmyay Kurdî* ku heta roja îro jî li ser weşana xwe berdewam e. Em dikarin bibêjin ku herçend di rol û qewareya wê da guherîn çê bibe jî ji 1970yê û vir ve bi navên Korî Zanyarî Kurd, Korî Zanyarî Êraq Destey Kurd, Korî Zanyarî Kurdistan û Ekdîmyay Kurdî kar û çalakîyên vê dezgehê berdewam dibe lê di vê xebatê da em dê li ser kar û çalakîyên Korî Zanyarî Kurd û Korî Zanyarî Êraq Destey Kurdê rawestin ku di navbera 1970 û 2006ê da kar û çalakîyên xwe encam dane. Jixwe di kovara Korî Zanyarî Kurdistan/Ekdîmyay Kurdî da em rastî tu karên hevbeş û biryarên normdaner nayên. Kovar wek kovareke zanistî berdewamî dide weşana xwe û ji her gotarê nivîskarê wê berpirsyar e, ne ku akademî.

3.1.3. Peywendîyên KZKyê di gel Dezgehên Din û Hewldana Perwerdekirina Kadroyên Akademîk

KZK ji ber berhevkirina çavkanîyên kurdî, xurtkirina têkilîyên zanistî û perwerdekirina kadroyên akademîk bi çendîn dezgehên zanistî yên navxweyî û derekî ra dikeve nav têkilîyê. Ji nav van dezgehan herî zêde ji Akademîya Zanistî ya Îraqê sûd werdigire û ji ber ku şaxeke vê dezgehê ye her jî serî ve dezgeha navborî hem cih

dide KZKyê hem jî çapxaneyê xwe diyarî wan dike. Herweha ji dezgehên îraqî bi Zanîngeha Silêmanîyê, Rêveberîya Xwendina Kurdî, Akademîya Zimanê Suryanî, pirtûkxaneyên Bexdadê û bajarên din ên Îraqê ra jî peywendîyên xurt datîne. Ji bilî vê jî bo çêkirina têkilîyên baş bi dezgehên zanistî yên derveyê Îraqê ra hejmarek endamên xwe dişîne Sovyet, Almanya, Fransa, Îngiltere, Misir, Surîye û Lubnanê û ev kes li van welatan serdana dezgehên Akademîya Zimanê Erebî li Misirê, Enstîtuya Destnivîsan li Qahîreyê, Zanistgeha Vekolînên Erebî li Qahîreyê, Akademîya Zimanê Erebî li Surîyeyê, Pirtûkxaneya Zankoya Amerîkî li Beyrûtê, Dezgeha Rojhelatnasîyê ya Akademîyên Zanistî yên Moskova û Lenîngradê, Dezgeha Gelên Rojhilata Nêzîk û Naverast a Akademîya Zanistî ya Azerbaycanê, Dezgeha Rojhilatnasîyê ya Akademîya Zanistî ya Ermenistanê, Dezgeha Rojhilatnasîyê ya bajarê Mainzê li Almanyaya Rojava û çend dezgehên din dikin. Di encama vê peywendîyê da Akademîya Zanistî ya Sovyetê jî bo pênc xwendekarên kurd bursa xwendina bilind terxan dike, Kongreya Rojhilatnasîyê ya Cîhanê li Fransayê jî KZKyê ra dawetnameyek dişîne, gelek zanyarên kurd û bîyanî bi wan ra dikevin nav peywendîyê û dezgehên navborî gelek pirtûk û kovar jî wan ra wek diyarî dişînin (Mezher, 1973: 333-336).

Di vê çarçoveyê da di 1974ê da şandeke KZKyê li ser dawetnameya Akademîya Zanistî ya Sovyetê serdana vî welatî dike û li wir sertîfîkayên endambûnê pêşkêşî Qanatê Kurdo, Hecîyê Cindî û Erebê Şemoyî dikin û bi rêya Wezaretê Xwendin û Perwerdeyê ji Çekoslovakîyê doza du kontenjanên doktorayê dikin (Mezher, 1974: 844-851). Herweha serokê KZKyê diyar dike ku di serdana wan a Sovyetê da jî bo çar endamên xwe xwendina bernameya doktorayê dabîn dikin ku dê di maweya du salan da li vî welatî li ser ziman, dîrok, edebîyat û etnografyaya kurdan bixwînin (Şêrzad, 1974: 9).

KZK di 1975ê da di gel Akademîya Zanistî ya Bulgaristanê jî dikeve nav hewldanên têkilîdanînê (Marif, 1975: 661) û heta 1978ê bi gelek dezgehên zanistî yên mîna Akademîya Zimanê Erebî li Dîmeşq û Urdunê, Encumena Bilind a Çavdêrîya Karûbarên Îslamî li Ezherê, Zanîngeha Kuveytê, dezgehên çandî û ronakbîrî yên Mexrîb û Tunusê, bi gelek zanîngeh û akademîyên Sovyet, Îngiltere, Fransa, Amerîka, Almanya Rojava û Îranê ra peywendîyên baş datîne û weşanên xwe jî hev ra dişînin.

Herweha KZK gelek weşanên xwe ji zana û xwendevanên kurd ra dişîne û bi wan ra têkilîyeke xurt datîne (Mihemed, 1978: 490-491).

Hemû ev kar û peywendî nîşan didin ku KZK ji destpêkê ve li ser rêbazeke rast dikeve nav hewldanên giring û di encama vê da rê li ber birek xortên kurd vedike ku li derveyê Îraqê bi taybetî li Sovyetê bernameyên doktorayê bixwînin û bibin kadroyên giring ên ziman û edebîyata kurdî. Ji ber vê herçend di destpêkê da di nav endamên KZKyê da kesên xwedî doktora kêmbin jî ev rêje her ku diçe zêde dibe. Hêjayê gotinê ye, ji nav endamên kara û arîkar ên navxweyî Ebdula Neqîşbendî, Pakîze Refîq Hilmî, Nesrîn Fexrî, Kemal Mezher, Ewrehmanî Hacî Marif û Cemal Reşîd her ji destpêkê ve xwedî doktora ne lê di salên paşê da gelek endam û nivîskar ên xwedî doktora yên mîna Şukriye Resûl, Kurdistan Mukrîyanî, Kamil Besîr, Wirya Umer Emîn, Zenûn Mihemed Pîryadî, Izedîn Mistefa Resûl, Ebdulsitar Tahir Şerîf, Muhsîn Mihemed Husên, Ewrehman Ebdula, Mukerem Talebanî, Refîq Mihemed Mihêdîn Şwanî, Adil Mecîd Mihemed Germîyanî, Umer Îbrahîm Ezîz, Umer Yasîn Cebârî, Fetah Mame Elî li nivîskarên *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* zêde dibin.

Cemal Nebez, tevî vê hewldan û geşedana rêjeyî, endamên KZKyê ji aliyê birêvebirina xebatên plandanîna zimanî û pêkanîna zimanekî standard ve qels dibîne û dîyar dike ku zimannasên ku bibin endamên KZKyê divê zimanê kurdî li ser bingeha zanistî ya zimanevanîya berawirdî (comparative philology) bixwînin, haya wan ji pêkhatin û guherînên zimanê kurdî hebe, şarezayên zimanên îranî yên mîna avestayî, farisîya kevin, partî, pehlewî, farisîya nû, belûcî û peştûyî; zimanên hîndî yên mîna sanskrîtî, hîndîya nû, ûrdûyî; zimanên latînî û yûnanîya kevin û zimanên cîran ên mîna erebî, tirkî, suryanî û ermenî bin ku karîgerî li ser zimanê kurdî çê kirîye. Ji bilî vê ji bo destnîşankirina reha bêjeyan, zanîna dîrok, etnolojî û mîtolojîyê jî pêwîst dizane. Nebez bi vê pênaseya xwe ya îdeal ji nav endamên KZKyê tenê Tewfîq Wehbî wek zimannasekî pîspor dibîne û di wê bawerîyê da ye ku heta kadroyên weha neyên perwerdekirin KZK dê nikaribe xizmeteke rasteqîne bike. Ji bo vê jî pêşnîyaz dike ku KZK her salê hejmarek derçûyên beşên kurdî yên zanîngehên Bexdad û Silêmanîyê bişîne Ewropayê da ku li wir zimannasîya giştî û filolojîya îranî bixwînin (1976: 18-19).

3.1.4. Avakirina Pirtûkxaneya KZKyê

KZK li ser rêçika qanûna damezirandina xwe ji destpêkê ve dikeve nav karûbarên pêkanîna pirtûkxaneyêke taybetî û vê wek armanceke giring datîne pêşîya xwe, lewra yek ji zîyanên nebûna desthilateke siyasî û yekdest a kurdî ew e ku mîrateya çandî û nivîskî ya kurdî li navendekê nayên komkirin û tomarên kurdî di nav dezgehên dewletên cîyawaz da belawela dimînin û gelek ji wan ji nav diçin. Ji ber vê ev hewldana KZKyê ji bo nasîna vê mîratê û plandanîna zimanî karekî giring e. Di vê çarçoveyê da pêşvebirina pirtûkxaneyê dibe yek ji xalên giring ên raporên KZKyê û geşedanên di vî warî da tên tomarkirin.

KZK ji 1970yê heta 1973yê dora 5 hezar pirtûkên li ser kurdan berhev dike ku ji van dora 1000î bi kurdî, 2500 bi erebî, 600 bi rûsî, 550 bi îngilîzî, 200 bi tirkî, 150 bi azerî, 75 bi fransî, 50 bi farisî, 28 bi ermenî, 17 bi almanî, 4 bi îtalî û 2 jî bi swêdî ne (Ehmed, 1973: 337). Bi heman awayî bi zimanên kurdî, erebî, îngilîzî, fransî, tirkî û azerî dora 110 kovar û rojnameyan kom dike û ji vana navên weşanên serdema hikumetên Şêx Mehmûdî, *Jîyanewe*, *Jîyan*, *Peyje*, *Rîya Teze*, *Zarî Kirmancî*, *Gir û Galî Mindalanî Kurd*, *Hawar* û *Ronahî* tên binavkirin. Ji bilî vê çendîn mîkrofilmên çavkanîyên giring û destnivîsên kurdî yên gelek hêja bi dest dixin. Ji bo pêkanîna pirtûkxaneyêke weha bi gelek dezgeh, kesayetî û zanayên navxweyî û derekî ra dikevin nav têkilîyê. Ji nav van kesan navên Tewfîq Wehbî, Memduh Selîm, Mistefa Qeredaxî, Şêx Meruf Qeredaxî, Mihemed Elî Ewnî wek zana û kesayetîyên giring tên destnîşankirin ku arîkarîyêke baş didin wan û derîyê pirtûkxaneyên xwe ji KZKyê ra vedikin (Ehmed, 1973: 340-342).

KZK di sala 1974ê da hejmara pirtûkên pirtûkxaneya xwe ji 5 hezaran digihîjîne 12 hezaran. Hinek ji van pirtûkan ji alîyê KZKyê ve tên kirîn, hinek ji alîyê ronakbîran ve ji bo wan tên dîyarîkirin û hinek jî ji alîyê dezgehên rojhilatnasîyê yên derve ve ji bo wan tên şandin. Ji bilî vê bi rêya wênegirtinê gelek berhemên giring peyda dikin û herwek rapora 1973yê di rapora 1974ê da jî çend berhemên giring ên pirtûkxaneyê tên nasandin (Ehmed, 1974: 841-842).

Di sala 1975ê da 2 hezar pirtûkên nû li pirtûkxaneya KZKyê tên zêdekirin û bi vî awayî pirtûkxaneya KZKyê dibe yek ji pirtûkxaneyên bilind û binirx ên kurdî. Li ser navê KZKyê tê dîyarkirin ku dê ji bo pêşvebirina pirtûkxaneyê û kirîna pirtûk û

destnivîsan pereyeke zêdetir terxan bikin (Marif, 1975: 557). Di rapora duyem a 1975ê da tê ragihandin ku endamê şerefê yê KZKyê mamosta Tewfîq Wehbî hemû destnivîsên pirtûkxaneya xwe û malbata rehmetî Me'rûf Ciyawukî jî paşmayîya pirtûkxaneya Me'rûf Ciyawukî bexşî KZKyê dikin (1975: 566).

Di sala 1977ê da hejmara pirtûkên pirtûkxaneya KZKyê digihîje 16 hezarî lê bi mixabinî dîyar dikin ku ji ber ku cihekî wan ê guncaw nîne nikarin pirtûkên xwe rêz bikin û vekoler jê sûd wergerin. Ji rapora sala 1977ê em hîn dibin ku navên hemû pirtûkan û nivîskarên wan hatine nivîsîn û her dema ku cihekî ji wan ra bê peydakirin dê pirtûkên xwe ji bo sûdwergirtinê amade bikin (Mihemed, 1977: 430). Mixabin piştî rapora 1977ê li ser pirtûkxaneya KZKyê tu zanyarîyekê nayê belavkirin û weha xuya ye ev kar radiweste.

Piştî destnîşankirina vê amadekarîyê em dikarin bibêjin ku KZK bi van kar û çalakîyên xwe li gor hêz û şîyana xwe ji bo xebatên plandanîna zimanî zemînesazîyeke baş çê dike û di çendîn qadên mîna rênivîs, rêziman û zaravesazîyê da xebatên baş û berfireh dide ber xwe ku ji bo plandanîna zimanî giring in.

3.2. DANÎNA NORMÊN RÊNIVÎSÊ

Berî KZKyê Mamosta Heqî Şaweys di *Dîyarî Kurdistanê* da (1925), Merûf Ciyawuk bi namîlkeya xwe ya *Pirkî (Îmley) Kurdî* (1930), Tahir Sadiq di *Rojî Nwê* da (1961), Nûrî Elî Emîn bi xebata xwe ya *Raberê Bo Îmley Kurdî* (1966), A. B. Hewrî bi *Destûrî Nûsînî Kurdî be Pîtî Erebiyê* (1968) û Tahir Sadiq bi xebata xwe ya *Rênûsê* (1969) li ser rênivîsê xebatên baş bikin jî nikarin bi hemû alozîyên rênivîsê çareser bikin. Ji ber vê Encumena KZKyê mijara rênivîsê dike yek ji karên xwe yê pêşîneyî, nebûna rênivîseke kurdî ya yekgirtî wek kêşeyekê dibîne û hewl dide berî derxistina kovar û weşanên xwe ji bo vê kêşeyê karê pêwîst bike.

KZK bi vê armancê lijneyekê datîne û di civîna xwe ya 35em da rapora vê lijneyê dinirxîne û digihîje hin encaman. Tevî vê ji bo ku biryarên rast û dirust bide û ev biryar ji bo kesên xwenda jî qebûlbar bin bang li hemû zana û şarezayên Kurdistanê Îraqê û kurdên derveyê Îraqê dike ku bi hûrî van biryaran vekolin û di maweya şeş mehan da boçûn û pêşnîyazên xwe ji wan ra bişînin da ku li ser wan, biryara xwe ya dawî bidin (1973: 364-365). Ji vî alîyî ve KZK her ji serî ve dixwaze xebatên xwe bi

raya giştî ra parve bike û qebûl û rizamendîya civakî bi dest bixe. Ev jî nîşan dide ku KZK xebatên zimanî tenê bi endamên lijneyên xwe ra sînordar nabîne.

Mesûd Mihemed wek endamekî kara yê KZKyê li ser amadekarî û raborîya xebatên rênivîsê yê vê dezgehê dîyar dike ku ew ji alîyekî ve hemû rênivîsên kurdî yê berî KZKyê tomar dikin û dinirxînin ji aliyê din ve jî bîr û hizirên wan kesên werdigerin ku mijûlî rênivîsa kurdî ne. Bi vî awayî hemû pêşniyaz û ihtîmalan bi hûrî û dûrûdirêjî vedikolin û kurteya pêşniyaz, biryar û bîr û bawerîyên KZKyê ji kesên şareza ra dişînin ku ew jî di nav şeş mehan da hizirên xwe li ser wan bibêjin (1976: 269). Di encama van amadekarîyan da KZK biryarên xwe yê li ser rênivîsê di hejmara pêşî ya *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* da diweşîne ku em dikarin kurteya van biryaran weha destnîşan bikin:

- **Alfabeya kurdî:** KZK qet nakeve nav gengeşeyên hîlbijartina alfabeya latînî yan erebî û her di serî da nîşan dide ku li ser rêçika çaksazîya alfabeya erebî ye. Ji ber vê di xebata xwe ya rênivîsa kurdî da raborîya çaksazîya vê alfabeyê ji bo zimanê kurdî bi bîr tîne ku piştî muslumanbûna gelên îranî ji bo nîşandana dengên wan ên cîyawaz tîpên “p, ç, j, v, g”yê li vê alfabeyê tên zêdekirin û di sedsala 20ê da jî kurd ji bo dîyarkirina “l” û “r”yên stûr û “û”ya dirêj çûkleyê (accent) dadihênin. KZK van pêngavan giring dibîne û dixwaze vê berfirehtir bike. Bi vê mebestê biryar dide ku ji bo nîşandana “û” û “î”ya dirêj tîrikeke pehn li ser “و” û “ی”ê bê danîn. Herweha biryar dide ku çûkle (v) li ser tîpan bîn danîn, ne ku di hinek tîpan da li ser û di hinekan da jî li bin. Endamên KZKyê ji çaksazên pêşî cudatir hiştina tîpa “ص”ê pêwîst dizanin, lewra bi raya wan gelek bêjeyên kurdî yê mîna “sed” û “seg”ê hene ku bi vî dengî tên gotin û divê ev tîp bê parastin. Bi vî awayî alfabeyeke kurdî-erebî ya 35 tîpî pesend dike.

- **Tîpa “ه”yê di dawîya bêjeyê da:** Eger dengê dawî wek “e”yê derkeve divê bi awayê “ه”yê û eger bi “ه”yê jî biqede divê wek “ه”yê yanî wek xwe bê nivîsîn (1973: 368).

- **“çî” û “çî”:** Ev bêjeyên serbixwe ne û divê cuda bîn nivîsîn, tenê cihnavên likandî divê bi wan ve bîn nivîsîn. Wek: چیمان به سەر دی

- **Hejmare:** Li hinek deveran “d”ya di navbera hejmareyên mîna 11 û 12yê da tê xistin û wek “yanze” û “diwanze”yê tên gotin. Ji ber ku di hejmarên din da ev “d” nakeve divê di van hejmareyan da jî “d” bê nivîsîn.

- **Navên bîyanî:** Pêwîst e navên bîyanî bi rênivîsa kurdî bên nivîsîn.
- **Tîpa “t”ya stûr di bêjeyê da:** Di hin bêjeyan da dema tîpa “t”yê piştî “l”ya stûr tê bi stûrî tê xwendin lê ev ji ber karîgerîya “l”ya stûr e, ji ber vê ev tîp divê ne wek “ط”ya erebî, wek “ت”yê bê nivîsîn.
- **Bêjeyên lêkdayî:** Divê hemû bêjeyên lêkdayî pêkve bên nivîsîn. Wek: xurmij, mêjû, rênûs, rêziman...
- **Bêjeya “em”ê:** Dema bêjeya “em”ê berî bêjeyên mîna “ca, sal, ro, şew...”ê bê nivîsîn divê bi hev ve bên nivîsîn. Wek: emsal, emro, emşew...
- **Bêjeyên guherandî:** Gelek bêjeyên kurdî hene ku di bilêvkirinê da di dengê wan da guherîn tê çêkirin. Bo nimûne “huşyar” wek “wişyar”ê tê gotin. Di nivîsîna van bêjeyan da divê eslê bêjeyê bibe bingeh, ne ku forma guherandî ya nav gelî.
- **Nivîsîna lêkeran di gel gireyên berî wan:**
Lêkerên xwerû: Dema gireyên erênî û nerênî berî lêkeran bên divê pêkve bên nivîsîn. Wek: “**dekujê, nakujê, mekuje, bikuje, nenûst,...**”. Eger du gire li ser hev bên dîsa divê pêkve bên nivîsîn. Wek: “**nedenûst, nedekird**”ê. Eger cihnavên likandî jî bikevin nav wan dîsa divê pêkve bên nivîsîn. Wek: “**neyandegirtin, nemdîtin, nemdedîtin...**”
- **Lêkerên lêkdayî:** Di alfabeya erebî da hin tîp hene ku bi hev ve tên nivîsîn. Li gor lijneya KZKyê tîpa dawî ya pêşgirên ku berî lêkeran tê nivîsîn divê bi tîpa piştî xwe ve neyê nivîsîn. Wek: هه‌ڵ بگره , هه‌ڵ فری , هه‌ڵ ناگرئ , هه‌ڵ نهده‌فرئ , هه‌ڵ نهده‌کهوت... . Lê eger “bi”ya fermanê di navbera pêşgir û lêkerê da bikeve wê demê bi hev ve tên nivîsîn. Wek: “هه‌ڵ بگره , هه‌ڵ فری , هه‌ڵ ناگرئ”ê. Di vê xalê da divê mirov bibêje ku lêkerên dariştî û lêkdayî wek hev hatine dîtin û di navbera wan da tu cîyawazî nehatîye çêkirin, lewra lêkerên ku wek mînak hatine dayîn hemû jî dariştî ne.
- **Nivîsîna navdêran:** (a) Her navdêrek cuda tê nivîsîn lê eger du navdêr bên cem hev û yek manayê bidin pêkve tên nivîsîn. Wek: “**dilşad û gulzar**”ê, (b) Eger îzafê di navbera du navdêran da hebe divê cuda bên nivîsîn. Wek: “**Nesrînî çarok zerd hat**”. Li vir “**çarok**” û “**zerd**” her yek manayeke wan a taybetî heye, ji ber vê jî ji hev cuda tên nivîsîn, (c) Navdêrên ku bi paşgir û pêşgiran tên dariştin pêkve tên nivîsîn. Wek: “**kiryar, balldar, hoşmend...**”

- **Bêjeyên yekmana:** Du bêjeyên ku bi gihaneka “û”yê pêkve tîr girêdan û manayekê didin bi hev ve tîr nivîsîn: “Gurcûgol, giftûgo, kelûpel, miştûmir, kitûmit, destûbird, rûtûqût, şetûwêt...”
- **Nivîsîna hin rengdêran:** Rengdêrên mîna “tîr, dîke, dî, wa, wek, weha, ewto...”yê cuda tîr nivîsîn.
- Eger “ى”ya îzafe piştî bêjeyên ku bi “ê”yê diqedin bê divê “ى”ya îzafe bi bêjeya berî xwe ve bê nivîsîn. “Hawrê: hawrêy xirab, tirê: tirêy spî...”. Eger “ى”ya îzafeyê bê dawîya bêjeyekê ku bi “î”ya dirêj diqede pêwîst nake bê nivîsîn. Tirozî +î: Tirozî nazik, qazî +: qazî Dihok.
- **Gireyên payeyê:** “-tîr” û “-tirîn” hertîr bi bêjeyên berî xwe ve tîr nivîsîn. “Ciwan: ciwantîr, ciwantirîn...”
- **Gihanekên “û” û “we”yê:** Di nav risteyê da divê cuda bîr nivîsîn.
- **Daçekên “da” û “ra”yê:** Ev her du daçek divê bi bêjeya berî xwe ve bîr nivîsîn (1973: 366-379).

Piştî vê destpêkê, em di *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* da li ser navê KZKyê rastî tu biryar û pêşniyazên li ser rênivîsê nayên û tenê li ser vê mijarê du gotar tîr weşandin. Ji biryarên jorîn derdikeve ku li ser xalbendîyê di nav biryarên KZKyê da tu pêşniyazek nayê kirin lê du sal paşê nivîsareke kurmancî ya Emînê Evdalî di *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* da tîr weşandin ku li ser xalbendîyê hatîye nivîsîn. Bêguman ev mijar beşeke giring a rênivîsê ye û Evdal di nivîsara xwe da bi hûrgilî behsa erk û cihên bikaranîna “niqtika paş (.), niqtvêrgul (;), vêrgul (,), duniqtik (:), nîşana pirsîrînê (?), nîşana gazîyê (!), cotvêrgul (“ ”), bend (-), pîrniqtik (...), cizxa veqetandinê (-), cizxa geyandina hev (-)” dike (1975: 304- 311). Lê ji ber ku ev nivîsareke kesî ye mirov nikare wek taybetmendîyeke rênivîsa KZKyê bihejmêre û divê wek bîr û raya kesî ya Emînê Evdalî binirxîne.

Lijneya Rêziman û Rênivîsa KZKyê di 1976ê da normên xwe yêr destnîşankirî bi navê *Rênûsî Kurdî* wek namîlkeyekê jî çap dike ku ji 18 rûpelan pêk tîr. Di heman salê da Mesûd Mihemed di bin sernavê “Rênûsî Kor”ê da li ser vê mijarê hûr dibe û dîyar dike ku di navbera rêziman û rênivîsê da peywendîyeke organîk heye. Ji ber ku amadekirina rêzimanê karekî dûvdirêj dide zanîn bi awayekî nerasterast xebatên rênivîsê jî karekî dirêjxayen dide zanîn. Ev jî nîşan dide ku heta mijara rêzimanê

negihîje encameke dawî dê biryarên dawî yên li ser rênivîsê jî dernekevin holê. Tevî vê têbînîyê Mesûd Mihemed çend pêşnîyazên xwe dixe rû (1976: 252, 277).

Di 1978ê da bi biryareke sîyasî di şûna KZKyê da Korî Zanyarî Êraq Destey Kurd (KZÊDK) tê damezirandin û di 1980ê da raportorê KZÊDKyê Ebduletîf Ebdulmecîd Gilî dîyar dike ku ji bo rênivîsê lijneyeke demkî hatîye avakirin û dê li ser kêşeyên rênivîsa kurdî civînek bê lidarxistin. Ji bo vê jî di bin sernavê “Bangewazêk le Destey Kurdî Korî Zanyarî Êraqewe Korêk bo Gîrûgiriftî Rênûsî Kurdî”yê dawetnameyek ji kesên pîspor û şareza ra tê şandin û li ser raborîya xebatên rênivîsa kurdî hin agahî tên dayîn. Li gor Gilî, herçend ronakbîrên kurdan li ser vê mijarê gelek kar kiribe û heta radeyekê rênivîseke baş û standard berhem anîbe jî hin mijarên çaresernekirî mane. Herweha li ser xebatên KZKyê dîyar dike ku herçend di dema xwe da li ser gelek mijaran biryar dabe jî vê dezgehê nekarîye gelek mijaran çareser bike. Ji bo vê Desteya Kurd biryar dide ku hezîrana sala bê li havîngeheke bajarê Hewlêrê li ser mijarên jêrîn civînekê li dar bixe û van mijarên rênivîsê çareser bike:

- Kêşeyên nivîsîna dengan: (a) yên ku nîşanedar in, (b) yên ku ji wan ra tîp nehatine danîn, (c) pileya dengên dengdêr “û, î”, (d) dîftong “ng”.
- Kêşeyên bêjeyên xwerû û dariştî: (a) navên erebî, (b) pêşgir û paşgirên pênasîn û komê.
- Bêjeyên nexwerû: (a) dîyardeya dataşîn û daqurtîna hinek dengan, (b) kêşeya nivîsîna hejmaran ji 11ê heta 19ê.
- Kêşeya nivîsîna lêkeran di gel cihnavan ji alîyê pêkvenivîsîn û pevnûsîyanê ve.
- Kêşeya nivîsîna daçekên lêkder ji alîyê pêkvenivîsîn û nenivîsînê ve.
- Kêşeya danîna nîşaneyan.
- Kêşeya çawanîya nivîsîna bêjeyên lêkdayî ji alîyê pêkvenivîsîn û nenivîsînê ve (Gilî, 1980: 296-298).

Civîna ku tê plankirin di dema destnîşankirî da pêk nayê lê di hejmara sala 1981ê da li ser dîroka nivîs û rênivîsa kurdî gotareke giring a Ewrehmanê Hacî Marîfî tê weşandin. Di vê gotarê da Marîf dide ser şopa bikaranîna tîpên cîyawaz ên kurdî û ji bilî dengên “ç, g, j, p, v”yê ku di çavkanîyên farisî û kurdî da ji mêj ve hatine bikaranîn, behsa bikaranîna pêşî ya tîpên dengdêr ên mîna “e, î, u”yê dike. Navborî,

van tîpan cara pêşî di destnivîsa 448a Kitêbxaneya Korî Zanyarî Kurdê da dibîne ku di sala 1784/1785ê da ji alîyê Seîd Ebdula Mukrî ve hatiye nivîsîn û paşê jî heman tîpan di di hejmara yekem a rojnameya *Kurdistanê* da (1898) dibîne (1981: 70-71). Li alîyê din “l”ya stûr jî yek ji tîpên nû yên alfabeya revîzekirî ya kurdî-erebî dide zanîn û bikaranîna pêşî ya vê tîpê jî di çapên Încîl Yuhana, Încîl Mata, Rêzimanî Kurdî ya L. O. Fossumî da destnîşan dike ku di sala 1919ê da hatine çapkirin. Bi raya wî tîpa “r”ya stûr herçend piştî 1950yan bê bikaranîn jî cara pêşî Tewfîq Wehbî ji bo nîşandana cîyawazîya vî dengî xalek datîne bin “r”yê û “r”ya stûr wêne dike (1981: 74). Ji bo bikaranîna pêşî ya hemzeyê jî amaje bi pirtûka *Hînkera Zimanê Kurdî* dike ku di sala 1921ê li Stenbolê hatiye çapkirin (1981: 78). Bi vî awayî li ser dîroka tîpên cîyawaz ên zimanê kurdî radiweste û derengketina bikaranîna van tîpan di çapemeniyê da bi bêderfetîyên çapxaneyên wê demê ve girê dide.

Marif di mijara rênivîsê da behsa rola giring a kovarên *Hîwa* (1957-1963) û *Rojî Nwê* (1960-61) dike (1981: 92) û bal dikêşe ser *Raberê bo Îmlay Kurdî* ya Nûrî Elî Emîn ku di 1966ê da nivîsiye û vê berhemê wek xebateke giring li qelem dide. Herweha çend gotarên Mihemedê Mela Kerîmî yên rojnameya *Birayîyê* (1967) û *Rênûsî Çonyetî Nûsînî Kurdîya* Tahîr Sadiqî jî ji xebatên giring dide zanîn. Herî dawî rênivîsa KZKyê dinirxîne, tevî pesendkirina hin alîyên wê yên erênî, bal dikêşe ser temamnekirina vê xebatê (1981: 95-99) û rexne li çend biryarên vê dezgehê digire. Bi raya wî yek ji karên netemam ên xebata KZKyê ew e ku “y” û “î”yê û “w” û “u”yê ji hev cuda nekirine. Ji bilî vê, biryara KZKyê ya du “î”yan, wek sepandina qaîdeyê erebî dibîne bi ser zimanê kurdî da û vê çewt dizane. Herweha daneanîna tîpa “î”yê û berevajî nerîta pêşîyan biryara danîna çûkleyê li ser “j”yê jî kêşeyek dizane (1981: 104-105). Di encamê da dîyar dike ku hîn jî di alfabe û şeweyê nivîsînê da çendîn awayên ji hev cuda tên dîtin û pêwîst e çareyek ji van ra bê dîtin. Ji ber vê ew jî herwek Desteya Kurdê lidarxistina civîneke zanistî li ser mijara rênivîsê pêwîst dizane û pêşnîyaz dike ku piştî pêşkêşkirina bîr û rayên zanistî yên li ser vê mijarê lijneyek bê sazîkirin û ev lijne pêşnîyazên vê civînê binirxîne û bigihîje encamekê (1981: 110-111).

Di berga 9em a 1982yê ya *Govarî Korî Zanyarî Êraq Destey Kurdê* da sedema lidarxistina kongreya rênivîsa kurdî bi rewşa siyasetî û şerî ve tê girêdan ku di wê demê da di navbera Îran û Îraqê da rûdide. Li ser navê desteya nivîskarên vê kovarê tê dîyarkirin ku mijarên destnîşankirî ji alîyê hin kesan ve hatine vekolîn û dê deqên

gotarên wan di vê hejmarê da belav bikin. Bi vî awayî seranserê berga 9em ji bo vê mijarê tê terxankirin û bang li xwendevanan tê kirin ku pêşnîyazên xwe yên li ser vê mijarê ji bo wan bişînin (Destey Binûsan, 1982: 3-4). Di vê hejmarê da li ser alîyên cîyawaz ên vê mijarê 15 gotarên kurdî û gotareke erebî tê weşandin. Li vir em dê tenê cih bidin hin pêşnîyazên giring û yên din jî tenê bi nav bikin.

Ewrehmanî Hacî Marif wek temamkera gotara xwe ya pêşî li ser hin kêşeyên rênivîsa kurdî radiweste ku peywendî bi alfabeya erebî heye. Herwek gotara pêşî nebûna tîpa “î”yê û bikaranîna tîpên “ى” û “ي”yê ji bo tîpên dengdêr û dengnedêr kêmasîya vê alfabeyê dizane. Ji bilî vê biryara “î”ya dirêj û kurt a KZKyê, ji bo nîşandana “û”ya dirêj bikaranîna tîrikê (keşîde) ya li ser “و”ê û bikaranîna çûkleyê li ser “r”yê wek biryarên çewt ên KZKyê dide zanîn (1982: 22, 24, 28, 33). Ji ber van sedeman hîlbijartina tîpên latînî ji bo zimanê kurdî guncawtir û baştir dibîne û vê mijara ku bi guvaşa hikumetên Îraqê hatibûn tepisandin careke din tîne rojevê (1982:38).

Marif piştî vê pêşnîyaza xwe di şeş xalan da kêşeyên nivîsîna bêjeyan û nûsandina wan gengeşe dike ku ji van xalan pêk tên: (1) Nenivîsîna hinek tîpan û neparastina reha bêjeyan, (2) Bikaranîna bêjeyên xwerû di gel morfemên nerênî, (3) Nivîsîna bêjeyên lêkdayî, (4) Nerastîya likandina hinek bêjeyan bi pêşî yan paşîya bêjeyên din ve, (5) Pevnivîsîna tîpan û (6) Nivîsîna bêjeyên bîyanî (1982: 38). Pêşnîyazên wî yên giring ên li ser van xalan jî mirov dikare weha kurt bike:

1. Xistina dengên di nivîsînê da rast nîne, nabe ku asîmîlasyona dengên di nivîsînê da bê nîşandan û divê reha bêjeyan bê parastin.

2. Pêşgir û paşgir ji ber ku ji bêjeyê cudatir manayekê nadin, nabe ku cuda bînin nivîsîn. Ji vî alîyê ve li dijî biryara KZKyê derdikeve.

3. Lêker jî tê da hemû bêjeyên lêkdayî divê bi hev ve bînin nivîsîn.

4. “tîr”a rengdêr û “tîr”a berawirdîyê du tiştên cuda ne. Ya rengdêr divê cuda û ya berawirdîyê jî divê pêve bînin nivîsîn.

5. Hemû beşên axaftinê yên kurdî divê cuda bînin nivîsîn.

6. Hinek daçek di mînakên “**behêz**, **bêhoş**, **lebar**, **çawbekil**, **serbexo**, **gulbedem**”ê da wek pêşgir û navbergir tên bikaranîn. Di vê rewşê da divê bi hev ve

bên nivîsîn. Herweha di hinek bêjeyên mîna “lewê, lem, bem, beman, bewan”ê da ji ber ku ketina dengan heye dîsa divê daçek pêve bên nivîsîn lê ji bilî wan hemû daçek divê cuda bên nivîsîn.

7. Bêjeyên bîyanî yên ku ketine zimanê kurdî divê li gor rênivîsa kurdî bên nivîsîn (1982: 49-71).

Sadiq Behaedîn Amêdî wek pisporê kurmancî û endamekî giring ê vê dezgehê, dîyar dike ku heta Şoreşa Tîrmehê ya 1958ê li Kurdistanê Îraqê bi kurdîya soranî dihat nivîsîn lê piştî vê rûdanê êdî bi kurmancî jî tê nivîsîn, bi taybetî piştî Peymana 11ê Adarê hejmara nivîskar û weşanên kurmancî zêde dibin. Amêdî di mînakê cihnavên likandî da bal dikêşe ser hin cîyawazîyên rênivîsa kurmancî û digihîje wê encamê ku ji bo zimanê kurdî bi giştî û kurmancî jî bi taybetî alfabeya latînî alfabeya herî guncaw e û bi vê alfabeyê nebe kêşeyên rênivîsê bi tevahî nayên çareserkirin (1982: 137-148).

Îbrahîm Emîn Balldar di çarçoveya pîşeyê xwe yê mamostatîyê da dîyar dike ku ji salên 1940an ve li ser hêskirina alfabe û rênivîsa kurdî kar dike, loma jî di 1951ê da li ser vê mijarê pirtûkeke wênedar çap dike, bi gotina wî li ser hin “şîretên binirx” ên Tewfîq Wehbî cara duyem vê xebatê di 1953yê da bi navê *Elfûbêy Nwê bo Mindalanê* çap dike. Ev xebat di 1955ê da ji aliyê Wezareta Perwerdeyê ve jî tê pesendkirin û di heman salê da bi navê *Elfûbê bo Gewreyê* dîsa tê çapkirin. Herî dawî *Elfûbêy Nwê bo Mindalanê* bi hin guherînên nû di 1956ê da çap dike (1982: 86-88). Li ser vê azmûna xwe ji bo rênivîsa kurdî çend xalên jêrîn pêşnîyaz dike:

- Ji bo alfabeya kurdî-erebî 34 tîpan destnîşan dike ku ji van tîpan pêk tên: و, ۆ, ن, م, ل, گ, ک, ق, ف, غ, ع, ش, س, ژ, ز, ر, د, خ, ج, چ, ح, ت, پ, ب, ە, ا, ئ, ی, ه.

- Gihaneka “û”yê eger wek “u”yê bê bilêvkirin divê bi bêjeya berî xwe ve bê nivîsîn. Wek: “minû to”yê lê eger wek “we”yê bê bilêvkirin divê cuda bê nivîsîn. Wek: “emane **we** ewane”yê.

- Divê “r”ya stûr ne wek KZKYê, mîna weşanên din çûkleya wê li bin bê nivîsîn, lewra dema çûkle li ser bê nivîsîn di gel “z” û “j”yê tevlihev dibe.

- Tîpa “û”yê divê ne wek KZKYê bi “ق”e keşîdedar, mîna weşanên din bi du “و”an bê nivîsîn.

- Divê tîpa “l”ya stûr herwek niha bi çûkleyê bê nîşandan.

- Ji bo “î”ya dirêj pêwîst nake keşîde bê bikaranîn, vê qayîdeya KZKyê baş nabîne û di wê bawerîyê da ye ku vê qayîdeyê hişê kurdan tevlihev kirîye.
- Li dijî biryara KZKyê di wê bawerîyê da ye ku “ç” (çi) tîpek e û nabe ku cuda bê nivîsîn. Ji bo vê pêşnîyaz dike di rewşên weha da ev wek “çe”yê bê nivîsîn³¹.
- Ji alîyê hêsanîya xwendinê ve divê tîpên hin pêşgiran bi tîpên pêşî yên bêjeyan ve bînin nivîsîn. Wek “لیدوان، تێپیرین، پیکەنین”ê û yên hinan jî li ber hev lê bi hev ve neyên nivîsîn. Wek: “...پیک هینان، لی پرسین، لی کۆلینموه”yê. Ji bo vê pêşnîyaz dike KZÊDK lijneyek pêk bîne û van pêşgiran destnîşan bike.
- Eger piştî dengdêrên “î” û “ê”yê kîteya “ye”yê bê divê bi hev ve bînin nivîsîn.
- Eger piştî dengdêrên “î” û “ê”yê “ى”ya îzafê yan rengdêr bê divê ev “ى” pêve bê nivîsîn. Wek “tîrêy spî, kanîy ew dêye”.
- Hin bêjeyan rêz dike ku bi du awayan tên nivîsîn û di bin stûnên “çewt” û “rast”ê da formên wan ên çewt û rast dîyar dike.
- Biryarên KZKyê yên wek nivîsîna bêje û navên bîyanî, nivîsîna bêjeyên dariştî, nivîsîna bêjeya “em”ê, nivîsîna bêjeyên guherandî, nivîsîna lêkeran di gel amrazên berî xwe, nivîsîna navan, nivîsîna bêjeyên yekmana, nivîsîna morfema pileya bala û nivîsîna daçekên “da” û “ra”yê rast dide zanîn û pesend dike (1982: 103-109).

Şakir Fetah Ehmed ji bo “ى”ya dirêj pêşnîyaz dike ku du xal li bin vê tîpê bînin danîn û ji bo “r”ya stûr jî pêşnîyaz dike ku çûkle li bin wê bê danîn û herî dawî ji bo alfabeya kurdî-erebî 29 tîpan pêşnîyaz dike ku ji berê cudatir tîpên “ق، ح، غ، ع”yê tê da nînin (1982: 116, 132-133).

Mihemed Salih Seîd li ser raborîya yekxistina rênivîsa kurdî hin agahîyên dîrokî dide û dîyar dike ku ev mijar ne li Kongreya Kurdnasîyê ya li Sovyetê ne li Kongreya Mamostayan li Şeqlaweyê ne jî li Kongreya “Lêkolînewe le barey Kitêbî Qutabxanekanewe be Zimanî Kurdî”yê tê çareserkirin ku ji alîyê Lijneya Rênivîsê ve di 25-27ê Tîrmeha 1973yê da tê girêdan. Piştî wê bal dikêşe ser xistina hin dangan di zimanê axaftinê da û di nivîsînê da nîşannedana van dangan çewt dibîne. Bo nimûne

³¹ Dîyar e, Balldar di vir da dikeve nav çewtîyê, lewra ev ne tîpek e, cihnav e û piştî wê dengdêra “î”yê heye ku di alfabeya kurdî-erebî da nayê nîşandan.

xistina tîpên “d” û “t”yê ji vana dizane ku di zimanê axaftinê da “Xuda” dibe “Xwa”, “le mal da” dibe “le mala” “dest” dibe “des”, “deçêt” dibe “deçê”. Bi vî awayî behsa çendîn cureyên xistina dengên dike ku divê di nivîsînê da bîn parastin (1982: 214-222).

Mesûd Mihemed di gotara xwe da herçend qebûl bike ku şeweyê Silêmanîyê bûye bingeha zimanê nivîskî yê kurdî jî di wê bawerîyê da ye ku hin tiştên ku ji alîyê piranîya kurdan ve tên bikaranîn lê di şeweyê Silêmanîyê da ji ber guherîna dengên yan tiştekî din guherîne divê di van xalan da ne şeweyê Silêmanîyê, piranîya gelê kurd li ber çavan bê girtin (1982: 333). Bi vî awayî pêgirîya hişk a şeweyê Silêmanîyê rast nabîne û ji bo cihgirtina destûrên zimanê nivîskî piranîya kurdan li ber çavan digire. Kurtiya pêşniyazên wî weha ne:

- Li ser alfabeyê: (a) Nabe ji bo dengê du tîp bîn danîn, (b) Divê nîşaneyek li ser “j”a dirêj û tîpên dirêj ên din bê danîn, (c) Divê diftongên “wê, ng, nd” wek taybetmendiyên herêmî bîn pejirandin û nebin taybetmendiyên zimanê standard, (ç) Tîpa “d”yê divê bê nîşandan û neyê xistin, (d) Divê ji bo diftonga “j”a dirêj a Behdînan tîpek bê danîn yan nîşaneyek bê danîn da ku “j”a dirêj ji diftongê bê cudakirin, (e) Ew dengên ku di kurdî da nînin divê li gor zimanê kurdî bîn nivîsîn û di nav kevanekê da wek zimanên xwe bîn nivîsîn, (f) Di şûna şedeya erebî da divê du tîpên dengên guvaştî bîn nivîsîn, (g) Çi li ser, çi jî li bin divê nîşane ji bo “r”ya stûr bê danîn, (h) Pêwîst nake ji bo kesreya muxtelise nîşane bê danîn, (i) Kesre, fethê û demme wek xwe bîn nivîsîn.

- Li ser rênivîsê: (a) Hemû bêjeyên lêkdayî û dariştî divê bi hev ve bîn nivîsîn, (b) Destebêjeyên rengdêrî û hokerî yên ku nebûne bêjeyên ferhengî divê kertên wan cuda lê nêzîkî hev bîn nivîsîn. Bi vî awayî nêzîknivîsînê di navbera pevnivîsîn û cudanivîsînê da wek rêyeke navîn pêşniyaz dike.

- Divê bêjeyên mîna “gulbedem, Qeretajdîn, Kakemem, kêleşîn”ê bi hev ve bîn nivîsîn.

- Navên erebî û biyanî eger wek xwe bîn veguhestin divê di nav kevanekê da bi rênivîsa zimanê kurdî bîn nivîsîn lê eger tîpên wan zimanan di çapemenî yan jî di rênivîsa zimanê kurdî da nebe divê bilêvkirina kurdan bibe binge.

- Pêşgir bi bêjeyên piştî xwe ve tên nivîsîn lê eger du pêşgir li dû hev bên ya nêzîkî bêjeyê pêve, ya din cuda lê nêzîk tê nivîsîn. Pêşgirên lêkder hertim cuda tên nivîsîn.
- Hemû paşgir pêve tên nivîsîn.
- Dataşîn di hikumê bêjeyên dariştî da ye.
- Eger di zarekî da dengê ketibe û di zarekî din da ew deng neketibe divê şeweyê ya ku neketîye ji bo zimanê edebî bê hilbijartin.
- Hejmar bi vî awayî tên nivîsîn: çwar, heft, yazde, diwazde, sêzde, çwarde, panzde yan pazde, şazde, hevde, hejde, nozde, hefta, hefsed, duwem, sêyem, noyem, deyem, yazdem, diwazdem (yazdemîn, diwazdemîn), sêzdem,.. htd. Heftayem, heştayem, newedem, sedem,.. htd. Hezareme, dehezareme, milyonem, milyonemîn...
- Cihnavên likandî hertim bi bêjeya berî xwe ve tên nivîsîn û ji ya dû xwe tên dabirîn.
- Gihanek cuda tên nivîsîn lê dema ku “û” dikeve nav du bêjeyan bi hev tên nivîsîn. Wek: “kelûpel, şitûmek...”ê. Bêjeya “her”ê dema piştî bêjeyên “kwê, kê, kam”ê bê nivîsîn divê cuda lê nêzîk bê nivîsîn (1982: 355-359).

Nûrî Elî Emîn diyar dike ku ji ber ku KZKyê ji bo “û”ya dirêj li ser “ۆ”ê keşîdeyek danîye ev nîşane bi fethiya erebî ra tê tevlihevkirin û ji alîyê ronakbîrên kurd ve nayê pejirandin û cihê xwe nagire. Ji ber vê pêşnîyaz dike ku “û”ya dirêj yan wek xwe bimîne yan bi du “ۆ”an bê nivîsîn yan nîşaneyê “ا”yê li ser bê danîn yan jî yeka guncawtir li ser bê danîn. Bi heman awayî biryara “î”ya dirêj a KZKyê jî ji alîyê ronakbîran ve nayê qebûlkirin û ji bo vê jî bikaranîna çûkleyê di bin “ى”yê da pêşnîyaz dike (1982: 365-370).

Herî dawî em dikarin behsa gotara Kamil Besîrî bikin ku di bin sernavê “Xalbendî bo Rênûsî Kurdî”yê da cihê bikaranîna nîşaneyên xalbendîyê yên mîna “xal (.), komaw (.), komawî xaldar (;), du xal (:), nîşaney pîrsyar (?), nîşaney helçûn (!), teqel (-), du kewane (), kewaney dutayî (“ “), nîşaney firêdanê (...) destnîşan dike (1982: 5-15). Lê ji ber ku biryareke KZKyê li ser vê nîne hemû xal di çarçoveya pêşnîyazan da tên destnîşankirin.

Ji bilî van gotarên ku me kurteya pêşnîyazên wan berçav kirin, 7 gotarên din jî di vê hejmarê da tîne weşandin ku em di wan da rastî pêşnîyazeke cîyawaztir nehatin. Herweha salek paşê Ewrehmanî Hacî Marif wek temamkera gotara xwe ya “Kurteyekî Mêjûy Nûsînî Kurdî be Elfubêy Erebi”yê li ser taybetmendîyên rênivîsa rojnameya *Têgeyîştinî Rastîyê* radiweste (1982: 76-132) lê li ser kêşeyên niha yê rênivîsa kurdî tu pêşnîyazeke nû nake.

Piştî van pêşnîyazan û rexneyên li ser rênivîsa KZKyê revîzekirina biryarên pêşî êdî dibe hewcedariyekê. Ji ber vê di 18ê Sibata 1986ê da Musa Ebdulsemmed endamê kara yê KZÊDKyê vê mijarê tîne meclisa KZÊyê. Ji ber ku jî destpêka avakirina Îraqê ve hikumetên Îraqê li dijî daxwaza alfabeya latînî ne, pêşnîyaza alfabeya latînî ya Ewrehmanî Hacî Marif û Sadiq Behaedinî dîsa tê redkirin û li ser zimanê Musa Ebdulsemmedî tê diyarkirin ku divê êdî gengeşeyên li ser alfabeya latînî bi tevahî bên bêtengkirin. Ev nîşaneyê aşkera ya karîgerîya siyaseta Îraqê ye li ser Desteya Kurd a KZÊyê. Mirov dikare van gotinên Ebdulsemmedî jî wek nîşaneya vê karîgerîyê bibîne ku di dawîya axaftina xwe da sipasîya wezîrê Xwendina Bilind û Vekolînên Zanistî dike û li ser navê KZÊyê birûskeyê sipasî û qedirzanîyê ji bo “serok Sedam Husênî” dişîne (Ebdulmecîd, 1986: 281-287). Di encamê da li ser bîngeha alfabeya kurdî-erebi di 4. 3. 1986ê da hin biryarên nû li ser rênivîsa kurdî tîne dayîn ku kurteya wan weha ye:

- **Kêşeya wêneyên dengan:** (a) Ji bo nîşandana “ر”ya stûr divê nîşaneya “v”yê li bin vê tîpê bê nivîsîn. Bi vî awayî biryara KZKyê ya berê tê hilweşandin, (b) Tîpa “û”yê divê bi du “و”an bê nivîsîn. Bi vê biryarê jî bikaranîna keşîdeyê ya KZKyê tê hilweşandin, (c) Pêwîst nake niv-dengdêra “î”yê bê nîşandan. Herwek di mînakên “پیاو, سیان, پیاز”ê da tîne dîtin. Bi vê biryarê biryara “î”ya dirêj û kurt a KZKyê tê hilweşandin, (ç) Pêwîstî bi danîna niv-dengdêra “و”ê nake. Herwek di bêtîyên “شوان, کاور وشه, پروا, گوان”ê da tîne dîtin, (d) Divê diftonga “وئ”yê bi “و” û “ئ”yê ve kirî bê nivîsîn. Wek “توئیر, گوئیر, نوئیر”ê, (e) Divê “و”a dengdêr û dengnedêr ji hev neyên cîyakirin, (f) Divê diftonga “وی”yê herwek xwe bi “و”ek û “ی”yê bê nivîsîn. Wek: “هویر, قویل, سویر, تویرمه”ê, (g) Divê “د”ya kilor mîna tîpa “د”yê bê nivîsîn, (h) Divê “ی”ya dengdêr û dengnedêr ji hev neyên cîyakirin, (i) Divê “ت”ya kilor mîna “ت”yê bê nivîsîn, (î) Divê tîpa dubare (şedde) her bi dubarekirina tîpê bê nivîsîn. Wek: “مهکه, شهمه”yê.

- **Kêşeya bêjeyên xwerû:** (a) Divê cîyawazî di navbera şeweya nivîsîna “”ya dengdêr û “ه”ya dengnedêr da bê kirin. Wek: “گوناھ، ههیه”yê, (b) Divê bêjeya “çî”yê cuda bê nivîsîn, (c) Daçekên “di, li, ji, bi”yê divê cuda bên nivîsîn. Wek: “Li ser çîya, di hawara min dihat, ev kitêbe bi destê min hatîye nivîsîn, ji mala min derket”, (ç) Di mînaka bêjeyên mîna “emro, emşew, emsal, ember, evsal”ê da “em” û “ew” bi bêjeyên piştî xwe ve tên nivîsîn, (d) Hejmarên dubarekirî yên ku li dû hev tên, li pal hev tên nivîsîn lê tîpên wan bi hev ve nayên nûsandin. Wek: “دووسی، یهکهیهکه، دوودوو، ع”شش ههوت، چوارچوار.
- **Kêşeya bêjeyên nexwerû:** Bêjeyên nexwerû eger navên taybetî û zarave bin bi hev ve, eger nav yan zarave nebin cuda tên nivîsîn.
- **Kêşeya bêjeyên erebî di zimanê kurdî da:** (a) Her bêjeyeke ku ji erebî hatîye wergirtin divê wek kurdî bê nivîsîn, (b) Bêjeyên erebî eger navên taybetî bin hem wek rênivîsa kurdî hem jî wek ya erebî dikarin bên nivîsîn.
- **Kêşeya pevnivîsîna cihnavên likandî di gel lêkeran:** (a) Cihnavên likandî eger piştî morfemên “de” û “bi”yê yan morfemên nerênî bên bikaranîn û ev lêkerên têper bin, bi van morfeman ve tên nivîsîn, ne bi lêkeran ve. Wek: “بم نووسی”yê, (b) Cihnavên likandî dema bikevin navbera pêşgir û reha lêkerê çî erênî çî jî nerênî her bi pêşgirê ve tên nivîsîn. Wek: “ههلی سهنگینه، ههلیان بری، دام بهزاند”.
- **Kêşeya amraz, paşgir û paşkoyan:** (a) Amraza “î”yê çî nîşaneyê îzafeyê be çî jî ji bo pevgirêdana navdêr û rengdêran be bi bêjeya pêşî ve tê nivîsîn, (b) Gihaneka “û”yê bi bêjeya pêşî ve tê nivîsîn lê bi hev ve nayên nivîsîn. Wek: “من و تو”yê lê eger “û” bikeve nav du bêjeyan û ev bêje bûbin yek bêje bi hev ve tên nivîsîn. Wek: “کتومت، کشتوکال، گفتوگو”ê, (c) Gihaneka “ş”yê eger piştî raweya fermanê bê bi nîşaneyê raweyê ve tê nûsandin. Wek: “بشچن، بشمانخواستایه، بشم گرتایه”ê lê eger piştî morfema nerênî bê bi morfema nerênî ra tê bikaranîn. Wek: “نهمش هات، نهشم دی”yê, (ç) Her bêjeya ku bi dengên “î” û “ê”yê biqede û piştî wê tiştekî din bê bikaranîn “y”ê dikeve navberê. Wek: “nwê ye”yê, (d) Divê paşdaçekên “da” û “ra”yê bi bêjeya berî xwe ve neyên nûsandin, (e) Lêkera “dan”ê bêjeyeke serbixwe ye û divê cuda bê nivîsîn. Wek: “Dînarêkim da be Hejar”ê, (f) Paşgira “we/ewe”yê divê li gor qayîdeya benda 4em bê bikaranîn. Wek: “le kanîyewe, nûsîyewe, kirîyewe”yê, (g) Her bêjeyek çawa tê gotin divê weha bê nivîsîn, (h) Mijara xalbendîyê divê li ser binemaya gotara

Kamîl Besîrî ya “Xalbendî bo Rênûsî Kurdî”yê ya berga 9em ji alîyê lijneyekê ve ji nû ve bê nîrxandin û encamên wê di namîlkeyekê da bîn weşandin (Ebdulmecîd, 1986: 288-295).

Bi vî awayî Desteya Kurd di çarçoveya pêşnîyazên berga nehem a *Govarî Korî Zanyarî Êraq Destey Kurdê* da gelek biryarên cihnegirtî yên KZKyê diguherîne û di rênivîsa kurdî da revîzyona xwe ya dawî dike. Piştî vê revîzyona berfireh li ser rênivîsê tenê di hejmara dawî ya *Govarî Korî Zanyarî Êraq Destey Kurdê* da em rastî gotareke Sebah Musa Elî tîn û em ji gotara wî têdîgihîjin ku gengeşeyên li ser rênivîsa kurdî ya yekgirtî berdewam dibin û herî dawî Korî Zanyarî Êraq Destey Kurd bi vê mebestê di 1995ê da civînekê çê dike û dîsa hin biryaran digire (2006: 286-288) lê ev biryar di kovara vê dezgehê da nayên weşandin û cihbicihkirin.

3.3. JI NÛ VE NIVÎSÎNA RÊZIMANA KURDÎ

Çawa ku di beşên pêşî da jî hat behskirin normên rêzimana kurdî bi zarê soranî, berî KZKyê tê danîn ku bi giştî xwe dispêre şêwezarê Silêmanîyê. *Muxteserî Serf û Nehwî Kurdîya* (1928) Seîd Sidqî, *Destûrî Zimanî Kurdîya* (1929) Tewfîq Wehbî û *Rêzimanî Kurdîya* (1960) Nûrî Elî Emînî ji van xebatên giring in ku bi mebestên perwerdeyî û destnîşankirina normên rêzimana kurdî tîn çapkirin. Lijneya Ziman û Zanistên Wî ya KZKyê li ser vê zemînê ji bo nivîsîna rêzimanê yekgirtî û çareserkirina nakokî û cîyawazîyên xebatên berî xwe dest bi xebatê dike û di bin sernavê “Rêzimanî Axawtinî Kurdî”yê da ji 1975ê û bi şûn da dest bi nivîsîna rêzimana kurdî ya yekgirtî dike. Lijne vê xebatê beş bi beş di *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* da diweşîne û di 1977ê da jî bi heman navî wek pirtûkekê di nav weşanên KZKyê da çap dike ku ji 477 rûpelan pêk tê.

Endamên Lijneya Ziman û Zanistên Wî ku *Rêzimanî Axawtinî Kurdî* dinivîsin di xula yekem a KZKyê da ji Mesûd Mihemed, Ebdurehman Hejar, Nesrîn Fexrî, Nûrî Elî Emîn û Sadiq Behadînî pêk tîn. Di xula duyem da Ebdurehman Hejar ji lijneyê derdikeve û heman kesên din li ser karên xwe berdewam dibin. Di her du xulan da jî Mesûd Mihemed kesê yekem û raportorê lijneyê ye û biryarên lijneyê ji alîyê wî ve di *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* da tîn weşandin. Li ser vê mijarê Mihemed dîyar dike ku lijneya wan berî nivîsîna rêzimanê bernameyekê datîne û li gor vê tê dîyarkirin ku dê

pêşî li ser beşên axaftinê rawestin û paşê jî berê xwe bidin mijara ristesazîyê (Mihemed, 1975: 394).

Rêbaza nivîsîna rêzimanê ya lijneyê ew e ku di serê her mijarê da pêşî bîr û rayên rêzimannasên berî wan tên veguhestin, rêzimanên zimanên hevmalbat tên raçavkirin, bîr û rayên endamên lijneyê tên dîyarkirin û herî dawî biryarên lijneyê tên destnîşankirin. Dema bîr û rayên endamên lijneyê cîyawaz bin du rê tên peyrewkirin: carinan biryar li gor piranîyê bi dengdanê tên dayîn carinan jî li ser vê rêbazê jî lihevatin çê nabe û mijar jî bo serokatîya encumena KZKyê tê hewalekirin. Em di mînakê cihnavan da dibînin ku encumena KZKyê naxwaze destkarî di karûbarên lijneyê da bike û carekê din vê mijarê li lijneyê vedigerîne ku ew bi xwe biryar li ser bidin. Ev jî alîyekî ve rêbaza KZKyê ya demokratîk nîşan bide jî jî alîyê din ve dibe sedem ku li ser hin mijaran biryar neyên dayîn û hin mijar neyên çareserkin.

Em jî beşên rêzimanê yên nivîsandî têdigihîjin ku endamên Lijneya Ziman û Zanistên Wî di destnîşankirina normên rêzimanê da jî çendîn çavkanîyan sîd werdigirin. Xebatên rêzimanî yên Seîd Sidqî, Tewfîq Wehbî, Nûrî Elî Emîn, Qanatê Kudo, Reşîdê Kurd, Cegerxwîn, Celadet Bedirxan, Kamiran Bedirxan, K. R. Eyûbî û Î. A. Simîrnova û Ewrehmanî Hacî Marîfî; ferhengên Merdox, Gîw Mukrîyanî, Şêx Mihemedê Xal, Qanatê Kurdoyî, Ferhenga Estêregeşe; pirtûkên perwerdeyê yên *Destûrî Zimanî Farisî bo Polî Yekemî Qutabxane Nawendîyekan*, *Kitêbî Ziman û Edebî Kurdî bo Polî Yekemî Nawendî*, *Kitêbî Ziman û Edebî Kurdî bo Polî Sêyemî Nawendî*, *Destûrî Parsîya D. Zulfurî*; ferhengên zimanên bîyanî yên mîna ferhenga *Burhanê Qatî a farisî*, *Qewaidu'l-luxel Farisîyeyê* Ebdulxenîm Mihemed Husênî; rêzimanên mîna *An English Grammar Booka* Evan C. Penglisî, *Kurdish Dialect Studiesa* Mackenzie, *Destûrî Zimanî Rûsî Bergî Yekem* (bi wergêrana Nesrîn Fexrîyê) wek çavkanî û referans tên nîşandan.

Mesûd Mihemed wek raportorê lijneyê, di mijara çavkanîyên rêzimana kurdî da bal dikêşe ser hin dijwarîyan ku jî ber nebûna jûr, pirtûkxane û arşîveke taybetî ya lijneyê gelek caran di peydakirina çavkanîyan da rûbirûyê hin zehmetîyan dibin. Ji ber vê di civînan da her endamekî lijneyê çî pirtûkeke rêzimanê li cem hebe bi xwe ra tîne, ev pirtûk carinan wînda dibin û car jî heye dema endamek beşdar nabe çavkanîyên li cem wî di civînê da nayên gotûbêjkin û ev jî dibe sedema astengîyan (1975: 393).

Em ji van gotinên wî têdigihîjin ku di dema xebatê da hemû çavkanîyên pêwîst li ber destê lijneyê ne amade ne û mercên xebata wan ew çend jî libar nîne. Ji ber vê, pirtûkên ku li jor navê wan derbaz bûn di hemû mijaran da nabin çavkanî. Bo nimûne tevî ku Celadet Bedirxan li ser hemû beşên axatinê nivîsîye jî navê wî tenê di mijara lêkeran da derdikeve pêşberî me.

Lijneya Ziman û Zanistên Wî li ser bingeha van xebatên borî û bi palpiştîya pisporî û paşxaneyê endamên xwe di 1975ê da herwek bernameya xwe ya destnîşankirî bi nivîsîna beşên axaftinê dest bi kar dîke û cara pêşî di berga sêyem a *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* da cih dide mijarên navdêr (naw), cihnav (ranaw) û rengdêrê (awelnav). Lijne navdêran jî alîyê pêkhatin û manayê ve dîke du beş. Ji alîyê pêkhatinê ve behsa navdêrên “sade” û “nasade” dîke û navdêrên nesade jî di nav xwe da wek navdêrên lêkdayî (lêkdiraw) û dariştî (darêjaw) destnîşan dîke (1975: 399). Di vê dabeşkarîyê da Nesrîn Fexrî û Nûrî Elî Emîn dixwazin navdêr jî alîyê pêkhatinê ve bibin sê beşên sereke (1. Sade, 2. Lêkdiraw, 3. Darêjaw) lê Mesûd Mihemed, Hejar, Sadiq Behadîn alîgirîya dabeşkarîya jorîn dikin û li gor piranîyê biryar tê dayîn (1975: 404). Tevî vê jî salên paşê zêdetir boçûna Nesrîn Fexrî û Nûrî Elî Emînî tê peyrewkirin û ev dabeşkarî cihê xwe nagire.

Navdêr jî alîyê manayê ve bi sê kategorîyan tên destnîşankirin:

1. Navdêr jî alîyê têgeha xwe ve (naw le rûy “mefhum, mezmûn”) bi ser sê koman da tê dabeşkirin ku ew jî hevenav (nawî giştî “am”), serenav (nawî taybetî “xas”) û komenav (nawî komel “ismulcem”) in.

2. Navdêr jî alîyê zayenda xwe ve (naw le rûy zayendewe “cînsewe”) bi ser çar koman da tên dabeşkirin ku ew jî navdêrên nêr (nawî nêrîne), navdêrên mê (nawî mêyîne), navdêrên dualî (nawî dulayen) û navdêrên bêalî (nawî bêlayan) ne.

3. Navdêr jî alîyê serbixwetîyê ve (naw le rûy serbexoyî hebûnewe) bi ser du koman da tên dabeşkirin ku ew jî navdêrên şênber (nawî madî) û navdêrên razber (nawî manewî) in. Navdêrên razber jî dikin du beş ku ew jî yên binecih (bincî) û yên çêkirî (dirustkiraw) ne (1975: 409-415).

Lijne di du civînan da mijara cihnavan (ranaw-zemîr) gengeşe dîke lê nagihîjin encameke hevbeş. Ji ber vê mijara cihnavan hewaleyî encumena KZKyê dikin lê encumen naxwaze xwe têkelî karê lijneyê bike û dîsa li wan vedigerîne. Piştî vê du

civînen din bên kirin jî dîsa endamên lijneyê li hev nakin û tenê li ser cihnavên kesî di navbera wan da lihevhatinek çê dibe (1975: 423-424). Dabeşkarîya cihnavên kesî ji aliyê lijneyê ve weha tê kirin:

Cihnavên kesî (ranawî kesî-zemîrul şexsî-personal pronoun): Bi ser du cureyên giştî da tên dabeşkirin:

1. Cihnavên kesî yên cuda (ranawî kesî cuda). Ew jî di nav xwe da dibin du beş: Yên yekhejmar (tak) ev in: 1. min, emin, ez, m, 2. to, eto, tû, etû, etû, te, 3. ew, ewê, ewî, wê, wî. Yên pirhejmar (ko) ev in: 1. ême, eme, me, em, 2. êwe, ewe, engo, hwîn, we, hewe, hingo, hing, 3. ewan, wan, wa, ew, ane. Dîyar e di vê dabeşkarîyê da ne tenê soranî, kurmancî jî li ber çavan tê girtin û cihên bikaranîna cihnavên kurmancî jî bi taybetî tên destnîşankirin (1975: 425-430).

2. Cihnavên kesî yên likandî (ranawî kesî likaw-zemîrî muttesil). Ev cihnav li gor sîstema jorîn tên dabeşkirin û cihên bikaranîna wan tê destnîşankirin. Lê di mijara cihnavên kesî yên likandî yên kesê sêyem da di nav wan da lihevhatinek çê nabe. Ji ber vê bê ku biryarek bê dayîn raya her endamêkî cuda cuda tê veguhestin (1975: 431-433).

Hêjayê gotinê ye di mijara cihnavan da pêwîst e em li ser boçûnên Sadiq Behadînî rawestin ku tekane pisporê kurmancî yê lijneyê ye. Behadîn, di şûna “ranaw”ê da “cihnav” û “bernav”ê pêşnîyaz dike û di destnîşankirina cihnavên kurmancî da jî normên *Hawarê* peyrew dike û yên behdînî di nav kenavekê da dinivîse. Bi vî awayî hevterîbî soranî hemû awayên cihnavên kesî yên kurmancî destnîşan dike. Ev jî bi raya me mîna keke cotstandardîyê ye ku nav lê nehatîye kirin (1975: 443).

Ji bilî cihnavên kesî li ser cureyên din ên cihnavan lihevhatin çê nebe jî her mijar yek bi yek tê ravekirin û navên kesên alîgir û dijber û boçûnên wan tên veguhestin. Kurteya vê em dikarin weha berbiçav bikin:

Cihnava peywendîyê (ranawî lêkder): Di vê mijarê da lihevhatin çê nabe. Mesûd Mihemed “ke/ku”yê cihnav qebûl nake loma jî raya her kesî cuda cuda tê dayîn û tu biryarek nayê dayîn.

Cihnava xweyî (ranawî xoyî-reflexive pronoun): Li ser vê mijarê du sê boçûnên cîyawaz derdikevin û tenê ev boçûn tên veguhestin.

Cihnavên xwedîtîyê (ranawî heyî): Di vê mijarê da hem “î/hî”ya soranî hem “yê/ya”ya kurmançî tê ravekirin. Mesûd Mihemed “hî”yê bêjeyeke serbixwe dide zanîn ku paşê bûye îzafe. Ji ber vê li dijî wê ye ku ev, wek cihnav bê qebûlîkirin (1975: 466).

Cihnavên pirsyarî (ranawî pirsyarî): Li ser vê mijarê piştî boçûnên Seîd Sidqî û Tewfîq Wehbî boçûnên endamên lijneyê tên veguheztin. Mesûd Mihemed ji bilî cihnavên kesî tu cihnaveke din wek cihnav qebûl nake û Hejar jî cihnavên pirsyarî wek cihnav qebûl nake. Li hember vê Sadiq Behadîn û Nesrîn Fexrî hemû cihnavên pirsyarî yên kurmançî û soranî (kwa, ka, kwanê, kanî, kanê, kê, kî, kam, kame, kêe, kîşk, kîjan, key, kengî, kengîn, çend, çen, çî, çî, çe, çon, çilon, çiton, kilon, çito, çawa, kû, a, ea, aya, axo, daxo, daxwa, erê, herê, kwê, kîrê, çu) dihejmêrin û hemûyan cihnav didin zanîn. Bi dîtina me boçûna herî balkêş û rast, ya Nûrî Elî Emînî ye ku van bêjeyan wek bêjeyên pirsyarî dide zanîn û dîyar dike ku ev bêje dema navdêrekê dipirsin dibin cihnav, dema di gel navdêrê tên bikaranîn dibin rengdêrên pirsyarî û dema di risteyê da cihê hokerê jî digirin dibin hokerên pirsyarî. Ji bilî vê, dîyar dike ku herwek mînaka “çî direng hatît”ê da ev cure bêje carinan ji bo ecêbmayîne jî tên bikaranîn (1975: 469-471).

Cihnavên nedîyar (ranawî nadîyar-mubhem): Di vê kategorîyê da jî piştî veguheştina çend çavkanîyên pêşî boçûnên endamên lijneyê tên rêzîkirin. Hejar û Mesûd Mihemed van bêjeyan cihnav qebûl nakin û Nûrî Elî Emîn, Nesrîn Fexrî û Sadiq Behadîn jî qebûl dikin. Li vir jî Nûrî Elî Emîn têbînîyeke jîrane datîne û dîyar dike ku hin ji vana li gor bikaranîna carinan dibin rengdêr û carinan jî dibin cihnav (1975: 473-474).

Di dawîya vê mijarê da ji ber dijayetîya Mesûd Mihemed û Hejarî dîyarkirina cureyên cihnavan wek biryar dernakeve lê Sadiq Behadîn, Nesrîn Fexrî, û Nûrî Elî Emîn li ser heft cureyên cihnavan li hev dikin û wan weha rêz dikin: (1) Ranawî kesî: (a) ranawî kesî cuda, (b) ranawî kesî likaw, (2) Ranawî pirsyarî, (3) Ranawî lêkder, (4) Ranawî îşarî, (5) Ranawî xoyî, (6) Ranawî heyî, (7) Ranawî nadîyar.

Mijara sêyem a vê hejmarê rengdêr e. Lijne li ser rêça Tewfîq Wehbî ji bo rengdêrê zaraveya “awelnaw”ê pesend dike. Li ser pênasekirina wê jî boçûnên çavkanîyên pêşî û endamê lijneyê tên veguhestin û di dawîyê da li ser vê pênaseyê li

hev dîkin: “Hevalnav bêjeyek e ku tê da wesifkirin heye û bi demê ve nayê girêdan” (1975: 483). Piştî vê ji alîyê pêkhatinê ve rengdêr jî mîna navdêran tên dabeşkirin û li ser cureyên rengdêran boçûnên her endamekî cuda cuda tên destnîşankirin.

Lijne di heman salê da di beşa 2yem a berga 3yem da li ser nivîsîna rêzimana xwe berdewam dibe³² û mijara lêkeran (kar-fi’îl) vedikole. Endamên lijneyê li ser hîlbijartina zaraveyeke guncaw piştî hilsengandina çavkanîyên pêşî³³ li ser zaraveya “kar”ê li hev dîkin û vê pênaseyê dipejirînin: “Kar bêjeyek e rûdan û dem tê da ye”. Piştî gengeşe û vekolînên dîrûkûr lijne ji bo têperî û teneperîya lêkeran zaraveya “hêz”ê qebûl dike û lêkeran ji alîyê “hêzê” ve bi ser lêkerên têper û teneper da dabeş dike (1975: 283-285). Herweha ji bo lêkerên teneper vê pênaseyê pesend dîkin: “Karên teneper ew kar in ku pêwîstîya wan bi bireserê nîne”. Bi heman awayî lêkerên têper jî weha pênase dîkin: “Karên têper ew kar in ku pêwîstîya wan bi bireserê heye”. Dîyar e lijne dema mijarên rêzimanê dinivîse zaraveyên wê jî destnîşan dike. Loma jî di her mijareke rêzimanê da komê zaraveyên rêzimanê tên destnîşankirin. Ji ber vê jî bilî zaraveyên jorîn ji bo “fail”ê “kara” û ji bo “meful”ê jî “berkar”ê pesend dîkin (1975: 296-299). Mîna mijarên pêşî taybetmendîyên hin lêkerên kurmancî jî ji alîyê Sadiq Behadînî ve tên behskirin (309-310).

Li dû vê wek kategoriya duyem mijara lêkerên bikerdîyar û bikernedîyar (karî karadîyar û karî karabizir - active and passive) vedikolin. Lijne pêşî di kurdîya soranî da awayê çêbûna vê qayîdeyê dîyar dike ku di dema borî da bi gireya “ra”yê û di dema niha da jî bi “rê”yê çê dibin û paşê jî behsa forma pasîf a kurmancî dike ku bi arîkarîya lêkera “hatin”ê tê çêkirin.

³² Di vê hejmarê da berî veguhestina mijarên rêzimanê Mesûd Mihemed wek raportorê lijneyê rexne li gotara “Bûjandnewey Ziman”a Pakîze Hilmîya endama kara ya KZKyê digire. Em jî gotinên wî têdigihîjin ku mijara lêkeran a ku di vê hejmarê da hatiye behskirin berî du salan bi awayekî nivîskî jî bo hin endamên KZKyê hatiye şandin ku Pakîze Hilmî jî yek ji wan e. Bi raya Mihemedî, Pakîze Hilmîyê bê ku çavkanîya zanyarîyên xwe destnîşan bike hin tiştên vê raporê herwek boçûnên xwe di gotarê da bi kar anîye. Ji bilî vê Mesûd Mihemed, nivîskara navborî bi quretî û pûçkirina rêzimannasên berî xwe tawanbar dike (1975: 246) û bi mebesta şikandina vê quretîya wê jî hin çewtîyên gotara wê destnîşan dike (1975: 258). Piştî vê pêşnîyaz li Encumena KZKyê dike ku bê hilsengandin nehêlin tu gotarek di kovarê da bê çapkirin û ji Pakîze Hilmîyê jî dixwaze ku rêziman ne pisporîya wê ye û eger li ser zimanî berheman wergêre yan jî li ser dîroka zimanê kurdî raweste dê sûda wê zêdetir çê bibe (1975: 280).

³³ Cara pêşî di vê mijarê da behsa Celadet Alî Bedirxanî tê kirin. Dîyar e piştî ku Hawar dikeve destê wan lijne jî boçûnên Celadetî agahdar dibe û wek çavkanî destnîşan dike.

Ji ber ku di vê hejmarê da mijara lêkeran temam nabe di berga 4em a 1976ê da li ser vê didomînin û pêşî li ser babeta deman di lêkeran da radiwestin. Piştî ku Sadiq Behadîn behsa demên kurmancî dike Hejar û Nûrî Elî Emîn herwek erebî lêkeran ji aliyê demê ve bi ser raborî (raburdû) û raneborîyê (raneburdû) da dabeş dikin. Mesûd Mihemed sê demên sereke yê zimanê kurdî herwek raborî (raburdû), kêlîya niha (lehzey êstake) û piştî nihayê (dway êstake) destnîşan dike. Nesrîn Fexrî bi hûrgilîtir berê xwe dide vê mijarê, ew jî bi zaraveyên cuda (raburdû, êsta, ayînde) herwek Mesûd Mihemedî behsa sê demên sereke dike lê ji wî cudatir lêkerên raborî jî bi ser pênc deman da dabeş dike (nêzîk (nizîk), berdewam (îstîmrarî), temam (tam), dûr û dûrtir). Herçend Nesrîn Fexrî dîyar bike ku “raburdîy dûrtir” (nûsîbûbûm) îro gelek kêmbûye jî di salên paşê da ev wek dem cihê xwe nagire û nayê pejirandin (1976: 293-294).

Lijne di kategorîya çarem da li ser raweya lêkeran (dariştin-sîxe) radiweste. Piştî veguheştina hizirên Tewfîq Wehbî, Nûrî Elî Emîn, Nesrîn Fexrîyê û raweyên zimanê farisî li jine li ser vê kategorîya jêrîn li hev dike: (1) Raborîya ragihandinî (raburdûy îxbarî) û (2) Raborîya dananî (raburdûy însaî). Di nav raborîya ragihandinî da çar raweyan destnîşan dike: (1) Raborîya temam (rebeq-mutleq), (2) Raborîya berdewam (îstîmrarî), (3) Raborîya nêzîk û (4) Raborîya dûr. Bi heman awayî raborîya dananî jî dike çar binbeş lê nav li wan danaîne û tenê wan bi rêya mînakên destnîşan dike. Wek: “(1) royîştiba, (2) biroyîştaye, (3) royîştibê (royîştibêt), (4) royîştibwaye (royîştîbubaye)”. Di dawîyê da li jine dîyar dike ku divê ji bo van binbeşan jî nav bên danîn û vê mijarê hewaleyî paşerojê dike. Tevî vê bi xîşteyekê di nav her çar raweyên ragihandinî û dananî da hevterîbîyê çê dike û nerasterast be jî dîyar dike ku navên raweya ragihandinî ji bo vê jî dikarin bên bikaranîn. Mînaka hevterîbîya raweyên ragihandinî û dananî yê li jineyê weha ye:

Ragihandinî	Dananî
Royîşt	royîştiba
Deroyîşt	biroyîştibaye (biroyîştaye)
Royîştuwe	royîştibê
Royîştîbû	royîştibwaye (royîştîbubaye) (1976: 300-301)

Li ser vê bingehe hemû raweyên jorîn di mînaka lêkerên têper û teneper da bi kurmancî û soranî tên ravekirin û ji alîyê bikaranîna cihnavên likandî û gireyan ve jî cîyawazîyên bikaranîna wan tên berçavkirin (1976: 302-364).

Di kategoriya pêncem da ji alîyê pêkhatinê ve behsa lêkeran tê kirin û herwek beşên din ên axaftinê lêker jî bi ser lêkerên sade û nesade da tên dabeşkirin lê ji beşên axaftinê yên din cudatir lêkerên nesade bi ser sê binbeşan da tên dabeşkirin: lêkerên dariştî (darijaw), lêkerên lêkdayî (lêkdiraw) û yên têkel (awête) ku hem du bêje tên bal hev hem jî pêşgir yan paşgirekê digirin (1976: 365-366).

Di kategoriya şeşem da navdêrên ku ji lêkeran hatine dariştin, tên destnîşankirin. Lijne navdêrên bi vî awayî di bin şeş bincureyan da destnîşan dike: (1) Navdêrên bikerî (nawî kara – îsmu’l faîl), (2) Navdêrên bireserî (nawî berkar – îsmu’l meful), (3) Navdêrên raderî (nawî çawg – îsmu’l mesder), (4) Navdêrên cihî (nawî cêga – îsmu’l mekan), (5) Navdêrên amûrî (nawî amêr – îsmu’l alet) û (6). Navdêrên nesade (nawî nasade – îsmu’l murekeb) (1976: 376-377). Bi vî awayî lijne bi hûrgilî li ser wan radiweste, mînakên wan dide û cîyawazîyên soranî û kurmancî jî berbiçav dike. Bi taybetî navdêrên bikerî di şeş koman da bi başî tên destnîşankirin (1976: 378-382). Herweha di kategoriya navdêrên raderî da ji bilî “-(i)n”ê sê paşgirên raderî yên din jî tên dîyarkirin: (1) Bi “-ar”ê: kuştin-kuşt- kuştar, gutin-gut-gutar, kirdin-kird-kirdar, birîn-birî-biryar, dizîn-dizî-dizyar, pirsîn-pirsî-pirsyar, zanîn-zanî-zanyar, (2) Bi “-ş” yan “-şit”ê: birîn- bir-birişt, koştîn-koş-koşişt, royîn-rewişt, (3) Bi “-e”yê: kokîn-kok-koke, dizîn-diz-dize, pirsîn-pirs-pirse, gutin-gut-gute. Sadiq Behaedîn jî dîyar dike ji bilî paşgira “-şit”ê yên din di kurmancî da jî hene (1976: 391-394).

Lijne di berga 5em a 1977ê da bê ku beşên din ên axaftinê temam bike berê xwe dide mijareke din ku ew jî mijara pêşgiran e. Piştî veguheştina bîr û rayên pisporên qadê yên mîna Qanatê Kurdo, K. R. Eyûbî û Î. A. Simîrnovayê lijne mîna beşên axaftinê pêşgiran jî bi ser pêşgirên sade û nesade da dabeş dike. Pêşgirên ku lijneyê destnîşan kirîye ev in: “tê-, têk-, têkda-, têkra-, têkewe-, têwe-, têda-, pê-, pêwe-, pêda-, , pêra-, pêkda-, pêkewe-, pêkra-, lê-, lêkra-, lêkewe-, hel-, ro-, wer-, da-, ra-, rê-, ber-, ve-, vê-, vêk-, jê-, pev-, wê-, wêra-, jev-, lev-, tev-, haw-, hev-” (1977: 353). Piştî destnîşankirina van pêşgiran bêjeyên ku bi van pêşgiran dest pê dikin wek lîste tên weşandin (1977: 356-410). Hêjayê gotinê ye, hinek pêşgirên mîna “ve-, vê-, vêk-, jê-,

pev-, jev-, lev-, tev-, hev-”ê tenê di kurmançî da tên bikaranîn lê dîsa jî di nav listeyê da tên bicihkirin. Herweha lijne dîyar dike ku di mînaka “têwerkirdin, pêwerkirdin, têwerhatin, pêwerhatin”ê da du pêşgir li dû hev jî tên bikaranîn (1977: 419).

Di berga 6em a 1978ê da mijara nîvcomayî ya pêşgiran tê temamkirin û pêşgîrên “ber-, we – ve-, haw – hev-, be-, bê-, le-, bo-, na-, ne-, me-, bi-”yê tên vekolan (1978: 355-408). Herçend pêşgîra “we-”yê ku beramberî “ve-”ya kurmançî ye, îro di kurdîya soranî da zêde neyê bikaranîn jî lijne ji her du ferhengên *Xal* û *Mehabadê* gelek bêjeyên mîna “wetozebûnewe, westandin, weşardin, wegirtin, wexwardin, wekirdin, wegirtin, wegeran, wekujandin, wegwêzan”ê kom dikin ku bi “we-”yê dest pê dikin (1978: 363). Herweha lijne behsa hin bêjeyên mîna “her, der, ser, la, jêr, xwar, kin, dwa, pêş, paş, pişt, naw”ê dike ku di eslê xwe da bêje ne lê hêdî hêdî ber bi pêşgîrbûnê ve veguherîne (1978: 428). Ji bilî vana di mînaka “me”yê da destnîşan dikin ku hin morfem hene ku pêşgîrbûn yan bêjebûna wan ne zelal e. Bi raya lijneyê eslê wan bêje be jî bi demê ra manaya xwe ya bêjebûnê ji dest didin û şêlû dibin. Lê îro herwek di bêjeyên mîna “mebest, metirsî, megîranî”yê da jî tê dîtin “me” wek pêşgîrê xuya dike. Ji bo vê mînaka bêjeya “megez”ê didin û dîyar dikin ku eger heye ev bêje ji “me+gestin”ê pêk hatibe (1978: 408). Bi van ravekirinan nerasterast be jî lijne “me-”yê wek pêşgir qebûl dike.

Endamên lijneyê giringîyeke mezin didin bêjeyên ku wek pêşgiran tên bikaranîn û morfemên weha bi hûrî vedikolin. Bo nimûne di mînaka “ser”ê da 261 bêjeyên ku bi “ser”ê dest pê dikin kom dikin û hewl didin pêşgir û bêjeyê ji hev veqetînin. Li gor lijneyê pîvana sereke ya pêşgîrbûnê bêmanabûna wê ye (1978: 428). Bi vî awayî morfemên cot-erkî yên mîna “ser”ê rave dikin û wan ji hev vediqetînin. Herweha bi hûrgilî li ser “pê, tê, lê, jê, têk, pêk, pêkewe, lêk, jêk, rê, rêk, vêk, wêk”ê radiwestin û li ser daçekbûn û pêşgîrbûna wan bîr û boçûnên pêşîyan û endamên lijneyê dîyar dikin. Lijne herî dawî li ser pêşgîra “ma”yê radiweste ku manaya mêyîtiyê dide. Ev “ma” di kurdî da bi serê xwe mana nade û bi raya lijneyê dibe ku ji “mader”a farisî hatibe û bêjeyên “maker, makew, malûs, maman, mayîn, mamir, manga”yê jî ji vê çê bûbin (1978: 484-485).

Lijneya Ziman û Zanistên Wî ya KZKyê, di navbera 1975-1978ê da nikaribe hemû xalên rêzimanê ji nû ve binivîse jî gelek xalên giring ên rêzimanê vedikole. Ev

nerît bi heman germûgurîyê nebe jî ji alîyê Desteya Kurd a KZÊyê ve jî tê domandin ku di 1978ê da bi biryareke Hikumeta Îraqê di şûna KZKyê da tê damezirandin. Di vê serdemê da hem navê lijneyê hem jî endamên wê diguherin. Li gor vê navê lijneyê dibe “Lijneya Zimanê Kurdî” û ji bo endamtîyê jî di gel serokek pênc endam tên destnîşankirin ku ji van kesan pêk tên: Ezîz Reşîd Akreyî-serok, Dr. Kamîl Hesên Besîr, Sadiq Behaeddîn, Mela Cemîl Bendî Rojbeyanî, Şekûr Mistefa Ebdula, Nûrî Elî Emîn. Ji van navan dîyar dibe ku ji lijneya pêşî tenê Sadiq Behaeddîn û Nûrî Elî Emîn di vê lijneyê da cih digirin û çar endamên din nû beşdar dibin.

Ji ber ku di navbera 1978 û 1980yê da em rastî tu çalakîyeke vê dezgehê nayên di warê rêzimanê da tu tiştek nayê kirin lê dema wek dewama *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* berga 7em a *Govarî Korî Zanyarî Êraq Destey Kurdê* tê weşandin serokê lijneyê Ezîz Reşîd Akreyî bê beşdariya endamên din û gengeşekirina mijareke nû di bin sernavê “Rêzimanê Axivtina Kurdî Beşê Karî yan Kîrîyarê” da mijareke ku berê ji alîyê Lijneya Ziman û Zanistên Wî ya KZKyê ve hatibû behskirin vê carê bi kurmancîya behdînî dinivîse û li ser taybetmendîyên lêkerên dema borî, niha û dahatî yên kurmancîya behdînî radiweste (Akreyî, 1980: 45-59). Ji ber vê em dikarin bibêjin ku xebata pêşî ya lijneya nû di berga 10em a *Govarî Korî Zanyarî Êraq Destey Kurdê* ya 1983yê da tê weşandin. Ev jî nîşan dide ku di navbera her du dezgehan da ji alîyê berdewamîya xebatên rêzimana kurdî ve pênc sal dikevin navberê û di vê maweyê da tu karekî hevbeş nayê weşandin.

Lijneya Zimanê Kurdî piştî vê navberê di berga 10em da xebateke hevbeş diweşîne ku ji alîyê dengnasî û rêzimanê ve li ser hîlbijartina hin zaraveyên rêzimanê û berawirdkirina zarên kurdî ye. Ji ber ku em dê mijara zaravesazîyê di binbeşa piştî vê da behs bikin em dê li ser vê ranewestin. Lijneya Zimanê Kurdî mijara guherîna denga di navbera zar û şêwezarên kurdî da bi van xalan berbiçav dike: (a) ketina dengê “h”, “e” û “d”yê, (b) guherîna “b”yê bi “v” û “w”yê, (c) guherîna “a”yê bi “e” û “ê”yê, (ç) guherîna “t”yê bi “d”yê, (d) guherîna “d”yê bi “t”yê, (e) guherîna “h”yê bi “eyn”ê, (f) guherîna “r”yê bi “l”yê, (g) guherîna “z”yê bi “s” û “j”yê, (h) guherîna “j”yê bi “ş”yê, (i) guherîna “s”yê bi “ş”yê, (î) guherîna “k”yê bi “q”yê, (j) guherîna “g”yê bi “k” û “w”yê. Ji bo guherîna van denga jî ji bo her kategorîyê yek bi yek mînakên didin (1983: 295-308).

Bi heman awayî lijne ji alîyê mijara navdêr û cihnavan ve jî zarên kurdî berawird dike. Di mijara navdêran da ji alîyê gireyên pirhejmarîyê (-an, -gel, -êl), îzafeyên pirhejmarîyê (-êd, -êt, -ên, -ê), gireyên bangkirinê (-îne -îno), gireya nasyarîyê (-eke, -ege), gireya nenasyarîyê (-ek, -êk, -yêk, -ê), gireyên zayendê (-ê, -a, -o, -u)yê yên zarên kurmançî, soranî, hewramî, goranî, lûrî didin ber hev (1983: 312-316). Di mijara cihnavan da jî ji alîyê taybetmendîyên cihnavên likandî ve soranî, kurmançî û hewramîyê berawird dikin (1983: 321-328).

Xula duyem a lijneya zimanî ya KZÊDKyê di 1984ê da tê destnîşankirin û careke din hem di navê lijneyê da hem jî di endamên wê da guherîn çê dibin. Bi vê guherînê navê lijneyê dibe “Lijneya Rêzimanê” û ji bo endamên wê jî ev heft kes tên destnîşankirin: Dr. Kamil Husên Besîr, Mihemed Cemîl Rojbeyanî, Dr. Wirya Umer Emîn, Dr. Kurdistan Ebdulrehman, Dr. Ebdulrehman Marif, Ebu Zeyd Mistefa û Nûrî Elî Emîn. Ji van her heft kesan Dr. Kamil Hesên Besîr, Cemîl Rojbeyanî û Nûrî Elî Emîn endamên lijneya berê ne û çarên din jî endamên nû ne.

Lijneya nû civîna xwe ya yekem a salane di 13. 10. 1984ê da çê dike û piştî gotûbêjeke berfireh biryar dide ku li ser mijara ristesazîyê rawestin, lewra bi raya endaman, mîna mijarên din ên rêzimana kurdî giringî bi vê mijarê nehatiye dayîn (1986: 160). Bi vî awayî tê plankirin ku lijne li ser mijarên “pênaseya risteyên sade, pêdaçûna zaraveyan, beşên risteyên sade, destnîşankirina cihên beşên risteyê, pêş û paşxistina beşên risteyê û cureyên risteyên sade ji alîyê teşe û naverokê ve” kar bikin û encamên vê xebata xwe jî mîna berê di kovara xwe da biweşînin.

Ev mijara plankirî di berga 14em a 1986ê da tê weşandin. Herwek nerîta lijneyên pêşî di serî da behsa bîr û boçûnên rêzimannasên pêşî tê kirin û paşê li ser mijarê raya endamên lijneyê tê veguhestin. Lijne ji bo pênaseya risteya sade li çend çavkanîyên rûsî jî temaşe dike û di dawîya van nirxandin û liberçavgirtinan da digihîje vê encamê ku “risteya sade herî kêr jî du bêjeyan pêk tê, ev bêje li gor qanûnên zimanî tên rêzkirin, di nav van bêjeyan da divê biker û pêveber hebin û mebesteke temam destnîşan bikin” (1986: 167).

Li ser destnîşankirina zaraveyên vê mijarê lijne pêşî cih dide zaraveyên dariştî yên pêşî û paşê jî biryara xwe dide. Bo nimûne tê diyarkirin ku heta niha ji bo “musned îleyh”a erebî zaraveyên “baslêkiraw, dirawepal, destpêkiraw, sere, nîhad, paldiraw,

bine, barber, xudanfêl” û ji bo “musned”ê jî “bas, diranepal, salox, hewalhêner/hewaldêr, guzare, palpişt, binebar, kar, fêlgotî” hatine gotin lê li jine ji van hemûyan cudatir biryar dide ku ji bo “musned îleyh”ê “desteybine”yê û ji bo “musned”ê jî desteybinebar”ê hilbijêre. Herweha tê diyarkirin ku heta niha ji bo “bine”yê “biker” û “kara” hatine bikaranîn lê li jine van her duyan ji hev cuda dike. Bi raya wan “biker” faîlêkî îradî ye (xokird) lê “kara”, faîlêkî neîradî (xonekird) ye. Di encama nirxandina van zaraveyan da li jine sê beşên sereke yê rêsteyê bi van zaraveyên nû destnîşan dike: (1) Bine (biker), (2) Binebar (pêveber) û (3) Ranawî rêkewtin (gireyên kesî). Ji bo “têrker-object”ê jî tê diyarkirin ku zaraveyên “tewawker, serbar, diyarxer, xopêgir û zîyade” hatine bikaranîn lê li jine ji bo vê jî zaraveya “diyarkar”ê pesend dike (1986: 180-186).

Li ser vê bingehe li jine taybetmendiyên têrkerê (diyarkar) destnîşan dike û li gor peywendiyên wê di gel biker (bine) û pêveberê (binebar) bincureyên wê destnîşan dike. Li gor peywendiya têrker û bikerê behsa diyarkirina wesif û taybetkirinê û li gor peywendiya wê û pêveberê jî behsa dem, cih, çawanî, hejmar û sedemê dike (1986: 187). Li dû vê cihên bikaranîna beşên sereke yê rêsteyê û qayîdeyên rêzkirina van beşan destnîşan dike û dawî li vê mijarê tîne (1986: 188-198).

Piştî vê mijarê li ser navê li jineyê tu xebatek nayê weşandin û dawî li diyarkirina normên rêzimanê tê. Ev jî nîşan dide ku hem KZK hem jî KZÊDK wek du dezgehên temamkerên hev di çarçoveya bernameya xwe ya pêşî da ji nû ve hewldana nivîsîna rêzimana kurdî didin, KZK di maweya 1975-1978ê da li ser mijarên navdêr, cihnav, rengdêr, lêker û pêşgiran û KZÊDK jî li ser diyarkirina hin zaraveyên rêzimanê, ji aliyê dengsazî û hin qayîdeyên rêzimanê ve berawirdkirina zar û şêwezarên kurdî û ristesaziyê radiweste û ji vî aliyê ve bi temamî nebe jî heta radeyeke baş bernameya xwe cihbicih dike. Ji gengeşeyên endamên li jineyên rêzimanê derdikeve ku tu hewldanek ji bo rêzimanê yekgirtî ya hemû zaran çê nabe, bi giştî taybetmendiyên rêzimana kurdîya soranî dibe binemaya van gengeşeyan û carinan hin taybetmendiyên rêzimana kurmançî jî tê raçavkirin lê li ser cîyawaziyên rêzimanê yê zarên kurdî tu biryarek nayê dayîn.

3.4. ZARAVESAZÎ

3.4.1. Lijne, Çavkanî û Lîsteyên Zaraveyên KZKyê

Zaravesazî herwek rênivîsê her ji destpêkê ve dibe yek ji armancên giring ên KZKyê û ji hejmara yekem û pê da di *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* da cihekî berfireh ji bo vê mijarê tê veqetandin. Di destpêka lîsteya yekem a “Zarawî Kargêrî”yê ya KZKyê da tê ragihandin ku demeke dirêj e encumena vê dezgehê beşeke zêde ya civînên xwe ji bo zaravesazîyê vediqetîne (1973: 419). Tevî vê divê mirov bibêje ku di nav lijneyên berdewam ên KZKyê da lijneyeke zaravesazîyê nayê pêkanîn û ev kar di bin serperîştîya encumena KZKyê da tê birêvebirin û carinan ji bo vê lijneyên demkî tên avakirin.

Encumena KZKyê cara pêşî di havîna 1971 û 1972ê da ji bo berhevkirina zaraveyên kurdî lijneyeke gerok dadimezirîne da ku li navçeyên Duhok, Hewlêr û Silêmanîyê bigerin û zaraveyên wan berhev bikin. Li ser xebatên vê lijneyê raportorê KZKyê diyar dike ku ev lijne “gelek encam û destkeftên binirx” bi dest dixe û pêşkêşî wan dike (Mezher, 1973: 328-330). Di 1974ê da sê lijneyên nû yên demkî tên avakirin ku yek ji bo zaraveyên pizîşkî, yek ji bo zaraveyên aborî û yek jî ji bo zaraveyên hiqûqê ye (Mezher, 1974: 833). Herweha encumena KZKyê di destpêka sala 1975ê da bi navê “Lijneya Danîn û Vekolîna Zaraveyên Zanistî”yê careke din lijneyeke demkî ava dike ku ji Mesûd Mihemed (demrast), Şukur Mistefa (sekreter), Hêmin Mukrîyanî (endam), Dr. Ewrehmanî Hacî Marîfî (endam) pêk tên. Ev lijne di encama çar civînan da li ser zaraveyên felsefe, mentiq û derûnnasîyê ferhengokekê amade dike (1976: 433-434) û ev ferhengok pêşî di *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* da, paşê jî wek namîlkeyeke serbixwe di nav weşanên KZKyê da tê weşandin.

Bêguman KZK di zaravesazîyê da her tiştî ji xwe nade destpêkirin û ji kar û xebatên berî xwe jî sûd werdigire. Ji ber vê di destpêkên lîsteyên zaraveyên xwe û çavkanîyên van lîsteyan da ji alîyekî ve agahdarîya xwe ya li ser dîroka vî karî nîşan dide ji alîyekî ve jî çavkanîyên xwe yên zaravesazîyê destnîşan dike. KZK, *Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî, *Ehmedîya Şêx Marîfê Nodê*, *Elhedîyetul Hemîdîyeya Yusuf Zîyaedîn Paşayî* wek çavkanîyên kevin destnîşan bike jî (1975: 498) ji bo xebatên zaravesazîya kurdî bal dikêşe ser xebatên sedsala 20ê û amaje bi ferhengoka rûsî-kurdî ya V. Nikîtinî (1919), ferhenga ermenî-kurdî ya sala 1935ê, ferhengoka Celadet Alî

Bedirxanî ya Hawarê, lîsteya zaraveyên Elaedîn Secadî ya kovara *Nizarê* û zaraveyên nû yê *Gelawêj*, *Jîn*, *Dengî Gêti Taze* û *Hetawê* dike. Ji bilî vê tê dîyarkirin ku ferhengên Merdox, Şêx Mihemedê Xal, Tewfîq Wehbî û Edmonds û Qanatê Kurdoyî jî di destnîşankirina van zaraveyan da dibin çavkanîyên giring (1974: 166; 1975: 499).

KZK ji alîyê zaravesazîyê ve kudetaya 14 Tîrmeha 1958ê wek werçerxanekê dibîne ku piştî vê rûdanê li ser zaravesazîya kurdî gelek xebat tên kirin. Ji nav van xebatan, behsa zaraveyên kovara *Rojî Nwê*, ferhengoka *Zarawî Zanistî* ya mamostayên Silêmanîyê, *Hendêk Zarawey Zanistî* û *Ferhengokî Zanistî* yê Cemal Nebezî, *Ferhengokî Zarawey Parêzgay Silêmanîyê*, zaraveyên hejmara 4em a kovara *Perwerde û Zanistê* dike (1974: 167-168). Dîyar e, hemû ev xebat ji bo KZKyê dibin çavkanîyên xebatê û endamên wê di xebatên xwe da ji wan sûd werdigirin. Bêguman ev amajepêdan û haydarî ji bo berdewamîya karên zanistî gelek giring in û ji alîyê plandanîna zimanî ve xalên bihêz in.

KZK tevî vê mîratê bal dikêşe ser pêşketinên hemû qadên jîyanê ku danîna zaraveyên nû li ser kurdan ferz dike. Bi taybetî dema ku pirtûkên xwendîngehan tên kurdîkirin ronakbîr û mamostayên kurd pêwîstî bi wergêrana van zaraveyan dibînin. Bi vê mebestê gelek zarave tên destnîşankirin lê ev piştî demekê ji sînorê xwendîngehan derbaz dibe û ber bi qadên din ve fireh dibe. KZK wek dezgeha piştî Peymana 11 Adarê; danîn, dariştin û hîlbijartina her cure zaraveyên kurdî yek ji erkên xwe yê giring dide zanîn (1975: 500-502) û bi awayekî cidî xwe dide ber vî karê giran.

KZK her ji serî ve li ser zaravesazîyê hişyarî dide bikarhênerên zimanî, bal dikêşe ser hin dijwarîyên vî karî û dîyar dike ku di serî da dibe ku hin zarave ji bo mirovan xerîb bînin lê bi bawerîya wan dubarekirin û bikaranîna berdewam a van zaraveyan dê bibe sedem ku ev zarave di demeke nêzîk da cihên xwe bigirin û belav bibin (1973: 421). Bi vê têgihîştinê encumena KZKyê di hin hejmarên kovara xwe da liste bi liste hin zaraveyên hîlbijartî diweşîne û pêşkêşî raya giştî dike.

Bi weşandina van lîsteyan KZK dawî li vê hîlbijartinê naîne û rêya gotûbêj û nirxandina van zaraveyan vekirî dihêle. Ji ber vê bang li mamostayên kurd dike, bi taybetî yê ku li gundan kar dikin, da ku bi hûrî bala xwe bidin van zaraveyan, li wan bikolin û di maweya şeş mehan da boçûnên xwe ji wan ra ragihînin da ku encumena

KZKyê biryara xwe ya dawî li ser zaraveyên hîlbijartî bide (1973: 422-423). Bi vî awayî xwe ji sepandineke yekalî diparêze û dixwaze hemû ronakbîr û xwendevanên kurd bibin beşek ji vî karî da ku qebûla civakî bihêztir û baştir be. Di vê çarçoveyê da carinan hin tercîhên xwe revîze dike û di şûna wan da zaraveyên guncawtir ên pêşnîyazkirî pesend dike.

Lîsteya yekem a zaraveyên KZKyê di berga yekem a *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* da tê weşandin ku teqrîben ji 1500 zaraveyên kargêrîyê pêk tê. Ev zareve di sê stûnan da bi awayê alfabetîk tên rêzkirin ku di stûna pêşî da erebîya wan, di stûna duyem da kurdîya wan û di stûna sêyem da jî di bin sernavê “têbînî”yê da ravekirina hin zaraveyan û çavkanîyên wan û carinan jî îngilîzîya wan cih digire. Piştî weşandina listeya yekem KZK di çarçoveya bangewaza jorîn da ji xwendevan, mamosta û ronakbîran dixwaze ku raya xwe li ser van zaraveyan ji wan ra bişînin. Li ser vê bangewazê gelek kesên xwendewar di kovar û rojnameyên cîyawaz da li ser vê mijarê gotaran diweşînin û hinek pêşnîyazên xwe bi rêya nameyan ji KZKyê ra dişînin.

KZK ji bo nirxandina van rexne û pêşnîyazan lijneyek saz dike û ji lijneyê dixwaze ku li ser vê mijarê raporekê amade bike û pêşkêşî encumenê bike. Bêguman di encama van nirxandinan da KZK di hin zaraveyan da tercîhên xwe rast dibîne û di hinekan da jî pêşnîyazan di cih da dibîne û raya xwe diguherîne. Bo nimûne di kovarê da tê diyarkirin ku yekî bi tundî rexne li wan girtîye ku çima ji aliyê wan ve bêjeyên “wezîr” û “wezaret”ê hatine hîlbijartin û “şalyar”a kurdî nehatîye hîlbijartin. Li ser navê KZKyê tê ragihandin ku eslên van bêjeyan jî îranî ne û bi rêya farisî ketine nav zimanê erebî. Ji ber ku ev zarave di nav kurdan da gelek belav bûne KZK pêwîst nabîne ku di şûna bêjeyên berbelav û cihgirtî da bêjeyên jibîrbûyî bînin bicihkirin. Herweha di mînaka bêjeyên “perawêz, rêkar, xwazer, molge”yê da jî berevanî li tercîhên xwe dike. Ji bilî vana di hinek zaraveyan da pêşnîyazan dipejirîne û di encama rapora navborî da di 81 zaraveyan da guherîn çê dike û wan wek lîste dubare diweşîne. Di listeya revîzyonê da dîsa di stûna pêşî da erebîya zaraveyan, di stûna duyem da kurdîya wan û di stûna sêyem da jî sedema vê guhertinê rave dîkin (1974: 881-885). Bo nimûne ji ber ku manaya “rêveçûn”ê di “rewîşt”ê da heye ji bo “exlaq”ê “akar”ê hildibijêrin, di çarçoveya liberçavgirtina kurmancî da jî di şûna “sûtemenî”yê da “ardû”, di şûna “ajyar”ê da “hajo” di şûna “xêra”yê da “bilez” û di şûna “wirdbîn”ê da jî “hurdbîn”ê pesend dîkin. Herweha ji ber berbelavîya zaraveyên berê û neguncawîya yên nû ji

“kişwer”ê vedigerin “dewlet”ê û ji “honer”ê jî berê xwe didin “şair”ê û dîyar dîkin ku “honer” jî bo “nazim”ê guncaw e ne ji bo “şair”ê (1974: 886-893).³⁴

Revîzyonên bi vî awayî di lîsteyên din da jî tên dîtin. Di vê çarçoveyê da dema lîsteya duyem tê weşandin hin zaraveyên lîsteya pêşî di vê lîsteyê da jî cih digirin. Li hember hin zaraveyên weha di beşa stûna “têbînî”yê da ronkirineke zêdetir tê dayîn û di hinekan da jî çewtîyên zaraveyên bikarhatî tên rastkirin (1974: 898). Bo nimûne di lîsteya pêşî da ji bo “ruxset”a erebî “derfet” hatibû danîn lê di vê lîsteyê da “îzin” jî bo “ruxset”ê û “derfet” jî ji bo “mecal”a erebî tê danîn (1974: 914). Herweha tê dîyarkirin ku di hejmara pêşî da ji bo “qetebe”ya erebî bi çewtî “tewer” hatîye danîn lê ev, bi “tewere”yê tê rastkirin. Bi heman awayî di lîsteya yekem da manaya “iaşe”yê bi “bijêw”ê hatîye dayîn lê di lîsteya duyem da manaya “qût”a erebî pê tê dayîn (1974: 925-926). Bi vî awayî di lîsteya duyem da 500 zarave tên rêzkirin ku temamkera lîsteya zaraveyên kargêrîyê ya hejmara yekem e.

Lîsteya sêyem di sala 1974ê da di beşa duyem a berga duyem da tê weşandin. Ev lîste ji sê beşan pêk tê. Beşa yekem têkel e û 206 zaraveyên qadên curbicur li xwe digire, beşa duyem ji 53 zaraveyên zimanî pêk tê ku ji alîyê Lijneya Ziman û Zanistên Wî ve hatîye amadekirin³⁵ û herî dawî beşa sêyem jî ji 547 zaraveyên pîzişkî pêk tê ku encama xebatên du pîzişkên şareza û çend kurdîzanekî ye (1974: 170). Balkêş e ji bilî çend awarteyan hema bibêje hemû zaraveyên pîzişkî yên vê beşê ji çavkanîyên kurdî tên peyda kirin û xwemalî ne.

Lîsteya çarem di 1975ê da di beşa yekem a berga sêyem da tê weşandin. Di destpêka vê lîsteyê da jî herwek lîsteyên din ji zana û ronakbîrên kurd tê xwestin ku boçûnên xwe li ser van zaraveyan jî wan ra bişînin yan jî di kovar û rojnameyên kurdî da biweşînin, lewra lijneya wan hemû rexne û pêşnîyazan kom dike û yên guncaw ji encumena KZKyê ra dişîne û ew jî li ser wan biryara xwe ya dawî didin. Ji bo vê mînaka “qedere”ya erebî didin ku pêşî ji bo vê zaraveya “hêz”ê destnîşan dîkin lê paşê raya xwe diguherînin û ji bo vê “tiwanist”ê destnîşan dîkin û “hêz”ê ji bo “quwwe”yê hildibijêrin. Bi vî awayî nîşan didin ku KZK di nav çalakîyeke berdewam da ye û derîyê wan jî rexne û pêşnîyazan ra vekirî ye. Piştî vê bibîrxistinê herwek hejmara berê

³⁴ Di lîsteya çarem da careke din li ser “kişwer” û “dewlet”ê raya xwe diguherînin û dîsa vedigerin ser “kişwer”ê (1975: 526).

³⁵ Di vê beşê da di bin stûna têbînîyê da îngilîziya van zaraveyan tê dayîn.

lîsteya vê hejmarê jî bi ser sê beşan da tê parvekirin. Beşa yekem ji 242 zaraveyên zimanî, beşa duyem ji 183 zaraveyên kargêrî û beşa sêyem jî ji 110 zaraveyên pirtûkên xwendîngehan pêk tê. Hêjayê gotinê ye di van zaraveyan da hin caran zaraveyên lîsteyên pêşî bê destkarî tên dubarekirin û lîsteyên yekem û duyem wek çavkanî tên nîşandan lê herwek mînaka “emraz” û “amraz”ê di hinekan da jî guherîn tê çêkirin. Ji ber vê “emraz”a ku di hejmara berê da ji bo “edat”a erebî hatibû bikaranîn di vê hejmarê da wek “amraz”ê tê rastkirin (1975: 502-507).

Lîsteya pêncem di heman salê da di beşa duyem a berga sêyem da tê weşandin. Ev lîsteyeke têkel a zaraveyên qadên curbicur e ku ji 239 zaraveyan pêk tê. Di serê vê lîsteyê da tê dîyarkirin ku KZKyê di vê maweyê da gencîneyeke qîmetdar li zimanê kurdî zêde kirîye û gelek zarave hîlbijartine û dariştine. Ji ber vê jî xwendevanan dixwazin ku bi şandina bîr û rayên xwe ew jî piştgirî bidin vî karê wan da ku xebateke tekûztir derkeve holê (1975: 530). Herwek lîsteyên berê di vê lîsteyê da jî hin guherîn li ber çavan dikevin. Bo nimûne di lîsteya sêyem da manaya zaraveya “hest”ê bi erebî wek “şîur” hatibû destnîşankirin (1974: 176) lê di vê lîsteyê da manaya “his”a erebî pê tê dayîn (1975: 535). Herweha ji bo “redul fî’l”a erebî di lîsteya sêyem da “bertik” hatibû danîn (1974: 201) lê di vê lîsteyê da ji bo wê “kardanewe” (reaction) tê destnîşankirin (1975: 540). Ev jî nîşan dide ku zaravesazîya KZKyê pêvajoyeke dînamîk e û bi pêşnîyazên nû di her lîsteyekê da hin destkarî û guhertin tên kirin.

Lîsteya şeşem di berga 4em a 1976ê da tê weşandin ku ji 81 zaraveyan pêk tê û lîsteya herî lawaz a KZKyê ye. Lewra gelek zaraveyên vê lîsteyê di lîsteyên pêşî da jî cih digirin. Zaraveya herî balkêş a vê lîsteyê ew e ku “dîyarde”ya ku di lîsteyên pêşî da di manaya “meruf” û “muerref”ê da hatibû bikaranîn di vê lîsteyê da di manaya “elzahire”ya erebî da tê bikaranîn (1976: 476) ku di roja îro da jî bi heman manayê tê bikaranîn.

Ji bilî vê lîsteyê di vê hejmarê da du lîsteyên din ên zaraveyan jî tên weşandin ku ji alîyê Lijneya Danîn û Vekolîna Zaraveyên Zanistî ve tên amadekirin. Lijneya navborî di destpêka 1975ê da ji alîyê encumena KZKyê ve wek lijneyeke demkî tê avakirin ku ji Mesûd Mihemed (demrast), Şukur Mistefa (sekreter), Hêmin Mukrîyanî (endam) û Dr. Ewrehmanî Hacî Marifî (endam) pêk tê. Ev lijne di encama çar civînan da bi qasî ferhengokekê zaraveyên zanistî destnîşan dike (1976: 433-434) û ev zarave

di berga 4em a 1976ê da di bin sernavê “Lîstey Zarawekanî Felsefe û Jîrbêjî” û “Lîstey Zarawekanî Zanistî Nefsî”yê da tên weşandin. Di lîsteya yekem da 507 û di lîsteya duyem da jî 475 zarave cih digirin. Di van her du lîsteyan da jî ji lîsteyên encumena KZKyê cudatir di stûna sêyem da îngilîzîya hemû zaraveyan tê nivîsîn û ferhengokeke sê zimanî tê pêkanîn.

Lijneya Danîn û Vekolîna Zaraveyên Zanistî li ser rêbaza destnîşankirina zaraveyan diyar dike ku ji bo paşgira “-ism”a îngilîzî paşgira “-ayetî”ya kurdî guncaw e û wergêrana deqbideq a hemû zaraveyan jî ne rast e. Ji bo vê mînaka “sosyalism”ê dide ku ne lefza wê, mîna ereban manaya wê dike bingeh (di şûna “elîctîmaîye”yê da dibêjin “elîştîrakîye”) û li ser pîvana erebî ji bo vê zaraveyê “hawbeşayetî”yê hildibijêre (1976: 434-438). Di vê çarçoveyê da pêgirîya tund a ferhengî rast nabîne û ji bo vê mînaka zimanê îngilîzî dide ku zaraveyên li ser “av”ê ne bi “water”ê, bi bêjeyên “aqua” yan jî “hydro”yê dadirijînin. Lijne vê yekê ji bo zimanê kurdî jî rast dibîne, lewra pîvana sereke divê pêgirîya destûrên zimanî be, ne wergêrana deqbideq. Li alîyê din wergirtina zêde ya zaraveyên bîyanî wek xeniqandîna zimanî dide zanîn (1976: 440) û bêhtir giringî dide dariştin û afirandinê. Ji ber vê Lijneya Danîn û Vekolîna Zaraveyên Zanistî bi van her du lîsteyan di nav zaraveyên KZKyê da lîsteya herî petî berhem tîne. Ji bo dîtina vê divê mirov berê xwe bide van mînanan:

Erebî	Kurdî	Îngilîzî
elismanîye	navekîyetî	nominalism
elesale	resenî	originality (1976: 443)
elzatîye	xoyekîyetî	subjectivity
elrimuzîye	pêwaretî	symbolism
elsilukîye	rewîştayetî	behaviorism
elşîur	aga	consciousness (1976: 448-449)
elmusteqbelîye	dwarojayetî	futurism
elmentîq	jîrbêjî	logic
elmewzuî	babetekî	objective
elmewcud	bûnewer	being (1976: 457-458).

Li ser van zaraveyan di 1978ê da Cemal Nebez, bi navê “Serincêk le Çend Zaraweyekî Tazebekarhatû û Korî Zanyarî Kurd”ê di hejmara 22yem a *Govarî Kolêcî Edebîyatê* da gotareke rexneyî diweşîne û li ser 66 zaraveyên KZKyê yên listeyên navborî rexne û pêşnîyazên xwe derdibire (1978: 96-107). Em dikarin van rexneyên wî di çarçoveya xalên jêrîn da berbiçav bikin:

- **Çewtîyên manayî:** Nebez, di nav van 66 zaraveyan da bi piranî bal dikêşe ser çewtîyên manayî. Em ji nav vana dixwazin bal bikêşin ser çend mînakên balkêş: Ji bo “îcaze”ya erebî “wuçan” hatîye danîn lê bi raya wî “wuçan” “muhlet” e û îcaze jî “rêpêdan” e. Ji bo “muzî”ê “nameber” hatîye danîn lê ew “dabeşker”ê rast dibîne. Ji bo “şîur”ê “hest” û “la şîur”ê jî “nest” hatîye danîn. Nebez, bingeha van bêjeyan ji alîyekî ve bi “hest û nîst”a farisî ve girê dide ji aliyê din ve reha bêjeya “hest”ê vedigerîne “hase” û “haset”a erebî û ji bo “şîur” û “la şîur”ê wan guncaw nabîne. Ji bo “nezerîyetul me’rîfe”yê “dîmane zanyar” hatîye danîn. Li gor wî kurd “dîmane”yê di manaya “dîmen” û “menzere”yê da bi kar tînin û “zanyar” jî manaya “arif”ê dide ne “me’rîfe”yê. Ji bo “elhikum”ê “sepandin” û “selmandin” hatîye danîn lê yekî ji wan jî rast nabîne, lewra “sepandin” ferzkirin e û “selmandin” jî sabitkirin e. Ji bo “elinadîye”yê “neyar” hatîye danîn lê “neyar” di kurmancî da manaya “elxesim”a erebî dide. Ji bo vê jî “rikeberayetî” û “kîne be kîne”yê pêşnîyaz dike.

Li aliyê din di hin bêjeyan da herçend KZK li gor xebatên wî yên berê jî biryar dabe Cemal Nebez li dijî wan jî derdikeve. Ev jî nîşan dide ku li ser wan bêjeyan raya xwe guhertîye lê vê guherîna raya xwe di vê gotarê da destnîşan nake û vê wek xetaya KZKyê nîşan dide. Bo nimûne di namîlkeya xwe ya *Hendêk Zarawey Zanistîyê* da li hember “resen”ê “cins”a erebî datîne (Nebez, 1960: 14) lê di vê xebatê da dîyar dike ku “resen” manaya “esîl”ê dide û ji bo “cins”ê “regez” guncaw e (Nebez, 1978: 105).

- **Çewtîyên dariştinî:** Bi raya wî di hin zaraveyan da KZK dikeve nav çewtîyên dariştinî û taybetmendîyên hin paşgirên kurdî yan jî sîstema dariştina hin bêjeyên erebî li ber çavan nagire. Ji bo çewtîyên weha dîyar dike ku ji bo “istî’lamat”ê “pîrsge” hatîye danîn lê bi dîtina wî paşgira “-ge”yê navên cihî çê dike û di vê rewşê da “pîrsge” manaya cihê pîrsînê dide, loma jî şûna “istî’lamat”a erebî nagire. Ji bo “îta’e”yê “gwêdarî” hatîye danîn, bi dîtina wî divê ev “gwêdêrî” be, lewra manayên paşgirên “-dar” û “dêr”ê cuda ne û li vir “-dêr” vê mebestê bi cih tîne. Ji bo

“tewcîye”yê “arastin” hatîye danîn lê li gor wî divê “arastekirdin” bê bikaranîn. Bê ku sîstema dariştina “qasim”a erebî li ber çavan bê girtin ji bo vê “dabeşîn” hatîye danîn lê bi raya wî “dabeşîn” şûna “teqsîm”ê digire û ji bo “qasim”ê divê “dabeşker” bê bikaranîn. Ji bo “el-e’sabu’l-herêkîyye”yê “bizwênereg” hatîye danîn, bi dîtina wî divê ev wek “regebizwên” bê bikaranîn, lewra ji bo “el-e’sabu’l-dimaxîyye”yê KZKyê “regemêşk” bi kar anîye û divê ji bo tiştên mîna hev heman sîstema dariştinê bi kar bîne da ku di nav zaraveyan da hevgirtin hebe. Ji bo “el-îdraku’l-me’rifî”yê “zanandin” hatîye danîn lê Nebez dîyar dike ku bi tu awayî di kurdî da “zanandin” nayê bikaranîn û ji alîye manayê ve vê zaraveyê rast nabîne.

- **Çewtîyên tîpan:** Di mînaka her du zaraveyên “dirêxî” û “binaxe”yê da dîyar dike ku di nav zaraveyan da divê di şûna tîpa “ğ”ê da “x” bê bikaranîn. Lê divê mirov bi bîr bîne ku Cemal Nebez jî di xebata xwe ya *Hendêk Zaraway Zanistîyê* da “binaxe”yê bi tîpa “ğ”ê dinivîse lê di ravekirina wê da dîyar dike ku ev bêje ji “bin” û “ax”ê pêk hatîye (Nebez, 1960: 5). Di vir da di nav gotinên wî bi xwe da jî nakokî derdikeve. Eger em şiroveya wî ya li ser pêkhatina vê bêjeyê rast qebûl bikin, ev zarave bi tîpa “x”yê bê nivîsîn rasttir e ku raya me jî weha ye.

- **Çewtîyên hevnegirtinê:** Di vê kategorîyê da tenê cih dide mînakekê ku me li jor behsa wê kiribû. KZK di listeya xwe ya yekem da ji bo “lefw”ê “waje”yê û ji bo “lefwî”yê “wajeyî”yê bi kar tîne lê di listeya duyem da ji bo heman zaraveyan “bêje” û “bêjeyî”yê bi kar tîne û dikeve nav çewtîyeke hevnegirtinê.

- **Pêşnîyazkirina zaraveyên guncawtir:** Zaraveyên vê kategorîyê çewt nabîne lê ji ber sedemên cûrbicûr di şûna wan da zaraveyên guncawtir pêşnîyaz dike. Ji ber ku “carizkirdin”ê giran dibîne “weriskirdin” û “pozokirdin”ê pêşnîyaz dike. Ji bo hevgirtinê dîyar dike ku madem li hember “mubaşir”ê “rastewxo” hatîye danîn ji bo “xeyr mubaşir”ê jî ne “tîyan” divê “narastewxo” yan “nayekser”ê bê bikaranîn. Ji bo “tensuxul erwah”ê di şûna “kilîşe gorî”yê da “donadon”a kevin a kurdên yarsan pêşnîyaz dike, lewra ev bêje jixwe ji berê ve di vê manayê da tê bikaranîn û pêwîst nake zaraveyeke nû bê dariştin. Bi heman awayî dîyar dike ku ji bo “xariqu’l ‘ade”yê ji mêj ve “serasa” tê bikaranîn û pêwîst nake ji bo vê zaraveya “siruşt beder”ê bê bikaranîn. Li ser vê rêçê ji bo “es-seyr fi’n-newm”ê dîyar dike ku kurdên bakurî “xewger”ê bi kar tînin û pêwîst nake ji bo vê “xewroyî” bê bikaranîn. Ji bo

“mubadere”yê jî “pêşdestî” hatîye danîn lê ji bo ku ji berê ve ji bo vê, di kurdî da “destpêşkerî” tê bikaranîn pêwîst nake zaraveyeke nû bê dariştin.

- **Di şûna zaraveyên erebî da danîna zaraveyên farisî:** Nebez di mînaka çend zaraveyan da dîyar dike ku KZK di şûna zaraveyên erebî da berê xwe dide yên farisî lê bi raya wî her du jî bîyanî ne û divê yên kurdî bîn destnîşankirin. Ji ber vê di şûna zaraveya “derya”yê da “zerya”yê, di şûna “bazar”ê da “bajêr”ê di şûna “zindegî”yê da “jîyan”ê, di şûna “resîw”ê da “pêgeyîştû”yê, di şûna “resîn”ê da “pêgeyîştin”ê û di şûna “bêsewadi”yê da jî “nexwêndewarî”yê pêşnîyaz dike. Rast e, eger kurdîya wan hebe divê bîn hîlbijartin lê bi raya me, eger kurdîya wan nebe di şûna bêjeyên erebî da hîlbijartina bêjeyên hevmalbat guncawtir e.

- **Rexnegirtina navneanîna wî:** Cemal Nebez di mînaka sê zaraveyan da rexne li KZKyê digire ku cara pêşî wî ev zarave pêşnîyaz kirine lê KZK di xebatên xwe da navên wî naîne û çavkanîya van zaraveyan dîyar nake. KZK ji bo “cerah”ê “birînsaz”, “birînger” û “nijdar”ê datîne lê cara pêşî ew “nijdar”ê ji bo “cerah”ê pêşnîyaz dike ku reha wê vedigerîne “neşterdar”ê. Herweha dîyar dike ku cara pêşî ew ji bo “elaîm”ê “seraw”ê û ji bo “utle”yê “nwêl”ê datîne lê KZK di lîsteyên xwe da tevî ku zaraveyên wî bi kar tîne jî navê wî nade.

Ev rexneyên Cemal Nebezî nîşan dide ku zaravesazîya KZKyê heta radeyeke baş di nav xwendewar û zimannasên kurd da tê gengeşekirin û ji bo pêşvebirina vê qadê nêrîn û hizirên cîyawaz derdikevin pêş. Jixwe pêşveçûna zanistî û geşedana plandanîna zimanî bi vî awayî pêş dikeve û nabe ku mirov vê dîyardeyê tenê bi biryarên dezgehên zimanî ve girê bide.

Hêjayê gotinê ye ji bilî van karên hevbeş di serdema KZKyê da di *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* da em rastî du gotarên kesî jî tînin lê divê em bi bîr bînin ku divê gotarên kesî li ser navê KZKyê neyên hesibandin. Jixwe di destpêka gotara Kamîl Besîrî da tê gotin ku her nivîskar jî gotara xwe berpirsyar e û dibe ku hin bîr û rayên xwedîyê vê gotarê di gel bîr û rayên encumena KZKyê negunce (1974: 751). Besîr³⁶ di vê gotarê da li ser rêbaza zaravesazîyê radiweste û di zaravesazîyê da çar rêyan pêşnîyaz dike

³⁶ Hêjayê gotinê ye ji bilî vê gotarê Kamîl Husên Besîr bi navê *Zaraway Kurdî* xebateke din jî diweşîne û ev xebat di 1979ê da di nav weşanên Zanîngeha Silêmanîyê da tê weşandin ku ji 172 rûpelan pêk tê (Nerîman, 1988: 54).

ku ew jî mecaz, dariştin, dataşîn û lêkdan e (1974: 754). Du sal piştî wî, Cemal Reşîd 78 zaraveyên anatomîya mirovî bi her sê zimanên erebî, kurdî û îngilîzî tomar dike û ji bo bercestekirinê hejmarên van zaraveyan li ser wêneyên hestîyên serî, mil, dest, movika piştê nîşan dide (1976: 83-96) ku ev tekane mînak e di *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* da ku zarave bi rêya wêneyan hatibin destnîşankirin.

Piştî KZKyê xebata zaravesazîyê ji alîyê Desteya Kurd a KZÊyê ve bi heman germûgurîyê nadome û ji bilî listeyeke Lijneya Zimanê Kurdî li ser zaravesazîyê tu karekî hevbeş ê berbiçav nayê kirin. Lijneya Zimanê Kurdî vê listeyê wek beşeke xebata “Zimanewanî Berawirdkarî le nêwan Zarekurdîyekan da”yê di berga dehem a 1983ê ya *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*ê da diweşîne. Di vê beşê da 117 zaraveyên dengnasîyê di bin navê “Hêndê Zarawey Fonetîkî Zimanî Kurdî” da tên weşandin. Ji rêbaza KZKyê cudatir di vê xebatê da listeya zaraveyan bi erebî û îngilîzî tê dayîn û ji bo kurdîya wan jî piştî nirxandina çendîn bêjeyan zaraveya pesendkirî tê destnîşankirin. Bo nimûne ji bo “ismul alem”a erebî û “proper”a îngilîzî “dîyarnaw, nawî dîyar, nawî taybetî, serenav” tên rêzkirin lê ji nav wan “dîyarnaw” tê pesendkirin (1983: 292).

Piştî navbereke dirêj di sala 2002yê da em di berga 29-30 ya *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*ê da rastî çalakîyeke li ser zaravesazîyê tên. Di roja 11. 11. 2001ê da bi destpêşxerîya Desteya Kurdî ya KZÊyê li hola wan civînek tê lidarxistin û li ser çawanîya çakkirina kêşeya kêmiya hemû cure zaraveyên kurdî gotûbêj dikin. Di serî da Dr. Ciwamêr Mecîd Selîm wek serokê Desteya Kurdî ya KZÊyê diaxive paşê jî axiverê sereke yê civînê Mihemedê Mela Kerîm bi navnîşanê “Çend Wişeyek û Hendê Pêşînîyar le barey Dariştin û Dirustkirdinî Zarawe le Zimanî Kurdî da”yê axaftinekê pêşkêş dike. Navborî li ser pêwîstîya dariştina zaraveyên nû û rewşa kurdên Îraqê agahîyan dide û di hemû waran da dariştina zaraveyan ji bo zimanê kurdî wek pêwîstîyeke giring a vê serdemê dide zanîn. Ji bo dagirtina vê valahîya zimanê kurdî; wergirtina zaraveyên latînî, îngilîzî û zaraveyên nûdariştî yên erebî xirab dide zanîn û di şûna vê da alîgirîya wê yekê dike ku ev valahî ji çavkanîyên kurdî bên dagirtin. Ji bo vê jî amadekirina ferhengokên hemû zarên kurdî û bi rêya lijneyekê komkirina van bêjeyan giring dibîne. Eger ji nav derfetên zimanê kurdî zaraveyeke guncaw neyê dîtin wê demê sûdwergirtina ji zimanên pêşketî yên cîhanê rewa dibîne, ew jî bi forma wan a kurdîkirî û sivik. Li alîyê din li dijî wê yekê ye ku her kes di ber

xwe da zaraveyan çê bike û ji bo ku rê li ber vê bê girtin pêwîstî bi “encumeneke bilind a zaravedanînê” dibîne ku ji zanayên herî baş ên seranserî Kurdistanê û zanayên hemû şaxên zanistî hatibin pêkanîn (2002: 303-309).

Em ji axaftina wî hîn dibin ku wê demê di nav KZÊDKyê da du lijneyên zaravedanînê hene û yek ji wan li ser zaraveyên zanistên mirovî dixebite û ya din jî li ser zanistên razber. Dîyar e, ji ber rewşa siyasî ya wê demê kadroyên şareza yên kurd li Bexdadê gelek kêr in û her du lijne ji alîyê endamên jêhatî ve lawaz in. Ji bo çareserkirina vê kêşeyê Mela Kerîm pêşnîyaz dike ku çawa hinek mamostayên zanîngehên Bexda û Tikrîtê diçin Silêmanî, Hewlêr û Duhokê ders didin, rê bi mamostayên li van deran jî bê dayîn ku bên di nav van lijneyan da cih bigirin (2002: 310). Lê ji ber rêgiriyên siyasî û dabeşbûna kirdeyî ya Îraqê ev pêşnîyaz cihê xwe nagirin û KZÊDKya ku di bin rêveberîya hikumeta navendî ya Îraqê da ye, nikare bi awayekî pêwîst bixebite û bernemaya xwe cihbicih bike.

Di heman hejmara kovarê da tê dîyarkirin ku endamên Lijneya Rêzimana Kurdî di çend civînên xwe da li ser hilbijartina zaraveya kurdî ya “zemîr” a erebî radiwestin. Ji ber kêşeyên ku Mihemedê Mela Kerîm di axaftina xwe da dîyar dike, di pêvajoya zaravesazîya kurdî da ji alîyê kesên cîyawaz ve ji bo vê zaraveyê, çend zaraveyên cîyawaz ên mîna “ranaw, cênaw, bonaw, bernaw” ê tîr pêşnîyazkirin. Di nav lijneyê da tu kes piştevanîya “bonaw û bernaw” ê nake lê alîgirên “cênaw” û “ranaw” ê kêr zêde çê dibin. Ji ber vê lijne ji alîgirên “cênaw” û “ranaw” ê dixwaze ku belgeyên rastîya tercîha xwe bixin rû. Alîgirên “ranaw” ê delîlên xwe weha destnîşan dikin: “(1) Korî Zanyarî Kurdê “ranaw” bi kar anîye û “cênaw” paşê hatiye bikaranîn, (2) Pîranîya rêzimannûsên kurd “ranaw” ê bi kar tînin, wek Mesûd Mihemed, Nûrî Elî Emîn, D. Nesrîn Fexrî, D. Wurya Umer û çendên din, (3) Di hemû pirtûkên rêzimanên kurdî yên xwendîngehên seretayî, navendî û lîseyê da “ranaw” tê bikaranîn”. Alîgirên “cênaw” ê jî delîlên xwe weha rêz dikin: “(1) Ranaw ji alîyê naverokê ve manaya vê zaraveyê nade û bi başî manaya “ra”yê nayê zanîn, lewra çend manayên wê yên cîyawaz ên mîna “tedbîr” û “rê”yê hene, wek pêşgîrêkê tê bikaranîn û kes nizane kîjanê ji wan mebest e. Li hember vê “cê” manayekê dide û nêzî şêwaza dariştina hin zimanên rojavayî ye ku di yûnanî da “antonymia”yê da “anto” yanî “cê” ye “nymia” jî “naw” e, di latînî da “pronomen” e, “pro” “cê” ye û “nomen” jî “naw” e, di “pronoun” a îngilîzî da “pro” “cê” ye û “noun” “naw” e. Ji ber vê di wê bawerîyê da ne ku manaya

“cênaw”ê gelek zelal û vekirî ye. Li alîyê din di zarê kurmancîya bakûrî da jî “cînav” tê bikaranîn lê “ranaw” jî bo wan bîyanî ye. Piştî ku belgeyên alîgirên her du boçûnan tên nîşandan bang li ronakbîran tê kirin ku raya xwe li ser van zaraveyan di kovar û rojnameyan da diyar bikin û wêneyeke wê ji adresa Korî Zanyarîyê ra jî bişînin (2002: 314-318).

Ji bilî van xebatan em di nav rûpelên *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*ê da li ser zaravesazîyê rastî tu nivîsarekê nabin. Lijneyên navborî eger kar kiribin jî em li ser rûpelê kovarê rastî xebatên wan nayên. Jixwe rewşa sîyasî ya wê demê jî zêde ne libar e ku karên zanistî û cemawerî bên kirin û weha diyar e ku civînên lijneyên navborî ji rûtînekê derbaz nakin û tu encameke şênber bi dest naxin.

Di dawîyê da em dixwazin bibêjin ku ev zarave wek pirtûk jî di nav weşanên KZKyê da derdikevin. Ji ber vê *Zarawey Kargêrî* bi amadekirin Kemal Mezher cara pêşî di 1973ê da, cara duyem di 1977ê da, *Zarawey Heme Çeşnî Kor* di 1974ê da, *Lîstey Çwaremî Zarawekanî Kor* di 1975ê da, *Zarawe Zanistîyekan* di 1976ê da û *Berew Zarawey Yekgirtûy Kurdî* jî di 1984ê da ji alîyê Lijneya Zaraveya Korê ve tê weşandin (Nerîman, 1988: 55) ku ev jî ji bo belavbûna van zaraveyan karekî giring e.

3.4.2. Rêbaza Dariştina Zaraveyên KZKyê

Li ser rêbaza destnîşankirina zaraveyan û şeweyê xebata li ser vê mijarê di destpêkên lîsteyeyên zaraveyên KZKyê da agahîyên giring tên dayîn. Li gor vê, KZK di destnîşankirina zaraveyan da xwe dispêre van prensîbên jêrîn:

1. Encumena KZKyê danîna zaraveyan ji bo hemû ziman û neteweyan karekî zehmet dide zanîn û di diyarîkirina wan da petîgerîyeke hişk rast nabîne. Ji ber vê di destnîşankirina zaraveyan da pêwîst nabîne ku hemû zarave xwemalî bin û wergirtina zaraveyên zimanên bîyanî tiştêkî asayî dibîne, lewra ji ber dîrok û cografyaya Kurdistanê kurd bi hezaran sal in bi gelek millet û zimanên din ra di nav danûstendîne da ne û ji wan gelek bêje wergirtine. Bi taybetî di demên dawî da ji ber têkilîyên dînî, sîyasî û cîrantîyê kurdan gelek bêje ji zimanên erebî, farisî û heta radeyekê ji tirkî wergirtine. Ji bo vê kuştina hemû zaraveyên ku ji van zimanan ketine nav zimanê kurdî rast nayê dîtin.

2. Tevî vê têgihîştinê û nermkirina tevgera petîgerîya zimanê kurdî encumena KZKyê rewta pakkirina zimanê kurdî ji bêje û zaraveyên neguncaw rast dibîne û ji bo

danîna zaraveyeke zanistî eger berginda wê ya kurdî bê dîtîna vê dike rêza pêşî. Ji bo dîtîna zaraveyên kurdî herwek li jor jî amaje pê hat kirin hem bi rêya lijneyên gerok bêje û zaraveyan ji nav gelî berhev dike hem jî sûd ji berhemên helbestvanên kevin û folklorî kurdî werdigire (1973: 419-420).

3. Encumena KZKyê di warê zaravesazîyê da vejandina bêjeyên kevin ên kurdî giring dibîne. Ji bo vê xalê mînakî bêjeya “şagird”ê dide û di şûna “qutabî”ya erebî da vê pêşnîyaz dike. Ji bilî vê, sûdwergirtina ji hemû zaraveyên petî yên navçeyên kurdî wek rêçikeke zaravesazîyê dipejirîne. KZK bi vê rêyê dixwaze hem soranî bi zarên din ên kurdî, bi taybetî bi kurmançî, bitehimîne (muturbekirin) hem jî di zaravesazîyê da çavkanîyên xwe dewlemendtir bike (1973: 420-422). Ji alîyê din ve rêbaza tehimandinê wek rêya dewlemendkirina zimanê kurdî jî tê bikaranîn. Bo nimûne di mînakî “berd”a soranî û “kevir”a kurmançî da “berd” ji bo “hicr”ê û “kevir” ji bo “sixir”a erebî (1974: 898), “şeqam” ji bo cadeyên sereke (şari’reîsî) û “kolan” ji bo yên biçûktir (şari’ firu’î) (1973: 478), “niho” ji bo “elhazir” (present) û “êsta” ji bo “elhal”a erebî tînin bicihkirin (1975: 510). Di vê rewşê da her du bêje jî tînin parastin û ziman tê dewlemendkirin.

4. Dariştin û qîyas (pêwane) rêyeke din e ji bo destnîşankirina zaravesazîya KZKyê. Bi taybetî dema ku zaraveyeke guncaw ji çavkanîyên kurdî yan biyanî neyê peyda kirin ji bo zaravesazîyê dariştina bêjeyeke nû yan jî bi rêya analojîyê afirandina zaraveyekê, tiştê pêwîst tê dîtîna. Bi vê rêbazê tevgera kurdîya petî tê xurtkirin û valahîyên zimanî tê dagirtin (1973: 421).

5. Endamên KZKyê di zaravesazîyê da dixwazin cîyawazîya kurdî û zimanên hevmalbat ên mîna farisî biparêzin. Ji ber vê dema bêje yan zaraveyên hevmana dinirxînin eger bêje û zaraveyek tenê di kurdî da hebe û yek jî hem di kurdî da hem jî di farisî da hebe, ya ku tenê di kurdî da heye tercîh dîkin (1974: 897). Bi vî awayî dixwazin nasnameya zimanê kurdî derxin pêş û cîyawazîya kurdî û zimanên hevmalbat zêdetir bikin.

6. Ji bo bêje û zaraveyên hevmana encumena KZKyê di wê bawerîyê da ye ku hîlbijartina ji wan yekî nayê manaya kuştina yên din. Bi taybetî di pirtûkên perwerdeyê da neçar in ku bêje yan zaraveyên herî sivik hîlbijêrin lê ev nayê wê manayê ku dê bêjeyên hevmana neyên bikaranîn. Bo nimûne di şûna “bêgane”ya ku di kurdî û farisî

da hevbeş e, “bîyanî”yê pêşnîyaz dîkin û dixwazin ev bêje berbelav bibe, tevî vê dîyar dîkin ku ji bo dewlemendiya zimanî dê “bêgane” ji bê bikaranîn û tu kêşeyek di vê da nabînin (1973: 422). Herweha mîna “lêr, cengel, daristan, bêşe”yê ji bo heman manayê carinan di kurdî da çendîn bêjeyên hevmana tên bikaranîn û KZK di vir da jî bêjeya herî sivik û berbelav tercîh dike lê yên din qedexe nake (1974: 896).

7. Endamên KZKyê carinan ji bo zaraveyekê bi saetan gengeşe dîkin û di lêgerîna zaraveyan da berê xwe didin çendîn çavkanîyên xwemalî. Di vê lêgerînê da şêwezarên cîyawaz ên kurdî dîkin rêza yekem, folklor (beyt û bendên berbelav, gotinên pêşîyan) ji bo wan dibe çavkanîya duyem, dîwanên helbestvanan dibin çavkanîya sêyem û ferhengên kurdî jî dibin çavkanîya çarem. Bi vî awayî herwek li jor hat nîşandan di zaravesazîyê da ji gelek çavkanîyan sûd werdigirin û vê wek rêbazekê destnîşan dîkin (1974: 884-885).

Li ser van binemayên sereke KZK di hîlbijartin û destnîşankirina zaraveyan da xwe dispêre çendîn rê û rêbazên cîyawaz ku ev kêr zêde nêzîkî modelên zaravesazîya neteweyên din in. Di encama nirxandina van listeyan da bi raya me ev zarave li ser van model û rêbazên jêrîn tên destnîşankirin:

- **Sûdwerigirtina ji çavkanîyên xwemalî:** Rêya herî hêsan û baş a destnîşankirina zaraveyan e. Bi taybetî di warên zanistên mirovî da sûdwerigirtina ji çavkanîyên neteweyî yên mîna folklor, zar û şêwezarên cîyawaz, ferhengên pêşîyan, çavkanîyên nivîskî gelek giring in, lewra her netewe di dîroka xwe ya dûrûdirêj da ji bo rewşên mirovî yên cîyawaz gelek bêje diafirîne û hemû plandanerên zimanî di pileya yekem da pêşî hewl didin ji çavkanîyên xwe yên xwemalî sûd wergerin. KZK jî herwek li jor hat nîşandan ji bo vê yekê, lijneyên taybetî çê dike û ji mamostayên gundan arîkarî dixwaze ku bêje û zaraveyên herêmî ji wan ra bişînin. Ji ber vê gelek zarave bi vê rêyê tên peydakirin.

Mînak: ecnebî: bîyanî, îxtisas: pisporî, îxlas: dilsozî, îhraqîye: ardû, eqelîye: kemîne, ekserîye: zorbe, elekserîye: zorîne, îmtîhan: ezmûn (ji navçeya Balekê hatiye werigirtin), iaşê: bijêw, texmîn: xeml/xemlandin, teftîş: pişkinîn, tefsîr: rave, tenasul: zawzê, zid: dij, tilmîz: şagird (bo fêrgey seretayî), ratib: mûçe, murşid: raber, irhab: toqandin, esas: binaxe, esasî: bineretî/binçîneyî, îrşad: raberî, teşkîl: pêk hênan, xebîr:

şareza, hefid: newe, resmî: mîrî, rişwe: bertîl, îzdîham: apore, inhisar: pawan, zext: tewijm, urf: dab, kure: go...

- **Berfirehkirina manayî:** Zaraveyên ku bi rêbaza berfirehkirina manayî tînan danîn jixwe di zimanî da hene lê manayên nû li wan tînan barkirin û bi vê rêyê zaraveyên nû tînan çêkin. Bo nimûne “pol” a kurdî ya ku ji bo koma teyran tînan bikaranîn ji bo “sînf” a xwendîngehan, “danan” a ku di manaya “danîn”ê da tînan bikaranîn ji bo “telîf”ê, “wergêran” a ku ji bo “qelibandina tiştêkî” tînan bikaranîn ji bo “tercûme”yê, “rêz” a ku ji bo “dîyarkirina cihê tiştêkî” tînan bikaranîn ji bo “hurmet”ê tînan berfirehkin.

- **Wergêran:** Di vê rêbazê da zaraveyên zimanên bihêz û serdest rasterast tînan wergêran. Di rewşa kurdên Îraqê da ev zimanên serçavî di pileya yekem da zimanê erebî ye û di pileya duyem da jî îngilîzî ye, lewra erebî hem zimanê şaristanîya îslamê ye hem jî di serdema nû da dibe zimanê fermî yê dewleta Îraqê. Ji ber vê kurd demeke dirêj rûbirûyê wî zimanî dibin, bi wî zimanî tînan perwerdekin û ji neçarî wî zimanî wek model dipejirînin. Bi heman awayî ji bilî ku îngilîzî zimanekî emperyal ê cîhanî ye, maweyekê li Îraqê dibe zimanê mandeterên vê dewletê jî. Ji ber vê karîgerîyê, ronakbîrên kurd ên Îraqê çavnasê îngilîzî ne û car bi car jî wî zimanî jî sûd werdigirin. Di vê çarçoveyê da “îctîma” dibe “kobûnewe”, “fewqelade” dibe “serasa”, “meqal” dibe “witar”, “muhafeze” dibe “parêzge”, “mihamî” dibe “parêzer”, “emîd” dibe “ragir”, “xaricî” dibe “derekî”, “mesder” dibe “çawg”, “linguist” dibe “zimannas”, “phonology” dibe “dengnasî”, “voiced” dibe “awaze”...

- **Pîvane (qîyas, analojî):** Di pîvaneyê da sîstema dariştinê li ber çavan tînan girtin û bi heman sîstem û mantelîteya dariştina wî zimanî zaraveyên nû tînan dariştin. Di modela pîvaneyê da zaraveyên model dibe ku bîyanî bin jî bêjeyên wî zimanê bin jî. Her du rêçik jî di zaravesazîya kurdî da li ber çavan dikevin. Bo nimûne li ser şibandina “kendelan” û “berdelan” a kurdî “newtelan” (cihê petrolê), li ser şibandina “sotemenî”yê jî terma “şilemenî (hemû cure xwerekên avî), li ser şibandina “reşeba” û “kizeba”yê “kijeba” (bayê werzê) û li ser şibandina “ruwek”ê “gewek” tînan danîn. Bi heman awayî bi rêya şibandina “berqîye”ya erebî di kurdî da “birûske”, bi rêya şibandina “muteqaid”ê “xanenişîn” û bi rêya şibandina “malikul erd”ê jî zewîdar tînan destnîşankirin.

- **Afirandin:** Zaraveyên afirandî berê di zimanî da nayên dîtin û bikaranîn. Neteweyên paşdamayî yê mîna kurdan ji ber ku ji gelek warên jîyana nû

bêhay in zimanê wan di gelek waran da pêwîstî bi zaraveyên nû ne. Di vê rewşê da ji bo binavkirina tiştên nû yên zanistî pêwîstîya wan bi afirandina zaraveyên nû heye. Ji ber vê plandanerên zimanî li gor taybetmendî û fonksîyonên van zaraveyan zaraveyên nû çê dikin.

Mînak: îdare: kargêrî, edeb: wêje, edîb: wêjewan, exlaq: akar, îstîfare: xwastin, îşraf: serperîştî, îstilah: zaraw/zarawe, uslub: şêwaz, cumle: riste, tenzîm: rêkxistin, xase: taybetî, xususî: taybetî, sanîye: çirke, unsur: regez, mehelî: xocêyî...

- **Rêbaza dariştinê (derivation):** Dariştin rêbaza herî berbelav a çêkirina zaraveyên nû ye di zimanê kurdî da. Em dikarin bibêjin ku endamên KZKyê heta radeyeke baş ji vê sîstema dariştina zimanê kurdî sûd werdigirin û li ser reha bêjeyên heyî zaraveyên nû çê dikin.

Mînak: musteşîr: rawêj**xwaz**, mubelix: **rageyên**, mesîr: çarenûs geology: zewînasî, kahîn: pêş**bîn**, sina'î: des**kird**, mehkeme: dad**ge**, mezre'e: kêl**ge**, daîre: fermange, kulîye: zanist**ge**, qaide: bin**ke**, qîrar: bir**yar**, bayî': firoş**yar**, waiz: pend**yar**, mufetiş: pişkîner, naib: nwêner, şarih: raver, sair: şoriş**gêr**, mudîr: kargêr, sicil: bendîxane, mucrim: tawan**bar**, tesdîq: rast**andin**, musteşar: rawêj**kar**, talib: xwênd**kar**, ehya: zîndewer, amil: krê**kar**, muqawil: belênder, mulaheze: têbînî, selefîye: pêş**îne**, muqedeme: pêş**ekî**, dîfa': bergirî, sehafe: rojnamegerî, muraqebe: çawdêrî, musterde: hawirde, xulase: puxte, muxteser: kurte, îmtîdad: dirêje, minteqe: nawçe, naib: cêgîr, xelef: şwêngîr, wekale: birîkarî, wekîl: birîkar, teehud: desteberî, îstîqbal: pêşwazî, mewqîf: helwest, huwîye: pênas, mewarid: dahat, sabit: negor iltizam: derbestî, îstîqbal: dahatû, sabiq: rabirdû, elîrade: wîste, laîrade: newîste...

- **Rêbaza lêkdanê/hevedudanînê:** Di danîna zaraveyên zanistî yên nû da herwek dariştinê rêbaza lêkdanê jî ji alîyê KZKyê ve bi berfirehî tê bikaranîn ku ji du yan zêdetir bêjeyan zaraveyên nû tên çêkirin.

Mînak: seqafe: roşinbîrî, leqeb: naznaw (navek e ku ji bo nazdarîyê tê danîn), mehsus: berhest, muhekîm: serpişk, unwan: nawnîşan, camie: zanko, bayî'u'l cumle: kofiroş, bayî'u'l mufred: takfiroş, îhmal: kemterxemî, tekîd: dupat, daxîlîye: nawxo, mesder: serçawe, mutewazin: hawseng, muradif: hawwata (synonym), şerîk: hawpişk, rayehel eksîye: dijeba, mewc: şepol (ji şah+pêlê bûye şepol), mubaşir: rastexwo, qare: parzemîn, înk'ikasu's-sewt: dengdanewe...

- **Wergirtina zaraveyên îranî:** Ji *Hawarê* û bi şûn da di destnîşankirina zarave û bêjeyên jîyana modern da zimanên îranî bi taybetî farisî dibe çavkanîyeke giring a zaravesazîya kurdî, lewra kurdî di gel van zimanan xwedî mîrateke hevbeş e û gelek bêje û zaraveyên van zimanan xwe dispêrin heman mîrata hevbeş. Ji ber vê, sûdwergirtina ji zimanên îranî gelek rast û di cih da ye. Lewra bi vê rêbazê bê zehmetîyeke mezin gelek zaraveyên guncaw tên dîtin. Hin ji van zaraveyan ji mêj ve ye ji alîyê kurdan ve tên bikaranîn û hevbeşîya wan û farisî nayê wê manayê ku ev milkê farisî bi tenê bin.

Mînak: iane: komek, sewre: şoriş, cehd: koşîş, îtîyadî: asayî, serwet: saman, temhîd: hemwar (li gelek navçeyên Kurdistanê tê bikaranîn), cins: nejad, taqe: wize (energy), sefîne: keştî, tebîb: pîzîşk, fen: huner, fennan: hunermend, qaid: fermande, qaid ceyş: fermandey supa, qaid firqe: fermandey leşkir, qaid quwatil muselehe: supasalar, mumtaz: nayab (excellent), nesr: pexşan, zîkrî: yad, faîde: sûd, şukir: supas, muhasib: defterdar, xerîte: nexşe, musawe: yeksanî, muhendis: endazyar, emir: ferman, amirfewc: serheng, amirlîwa: sertîp, haris: pasewan, emn: asayîş, hendese: endaze, hulf: peyman, tedrîb: meşq, terbîye: perwerde, cindî: serbaz, derece: pile, meclis: encumen, malîye: darayî, zerîbe: bac, usture: efsane, behr: derya, mezheb: ayîn, tebîe: siruşt, elhasil: deramet...

- **Wergirtina zaraveyên dariştî yên pêşîyan:** Herwek li jor jî hat behskirin KZK ji dîroka zaravesazîya kurdî agahdar e û ji xebatên pêşîyên xwe gelek sûd werdigire. Mirov dikare bibêje ku gelek zaraveyên KZKyê berê ji alîyê plandanerên pêşî yên zimanê kurdî ve hatine destnîşankirin. KZK van zaraveyan ji nû ve dinirxîne, pîranîya wan pesend dike û di nav lîsteyên xwe da dubare belav dike.

Mînak: muhim: giring, ehemîye: giringî, ufq: aso, îqtisad: aborî, umme: netewe, ummî: nexwêndewar, teqalîd: nerît, tekrar: dubarekirdnewe, cewab: welam, tarîx: mêjû, weten: nîştîman, kelîme: wişe, mesul: berpirs, cenûb: başûr, şimal: bakûr, şerq: rojhelat, sulte: deselat, mefahîm: çemk...

- **Formên têkel (hybrid forms) yan jî dariştina zaraveyên dureh:** Di vê rêbazê da morfemek xwemalî ye û ya din jî ji zimanekî bîyanî tê wergirtin. Bi vî awayî zaraveyên dureh tên çêkirin. Tevî vê mirov dikare bibêje ku muhira zimanê wergir bi xurtî xuya dike. Mînakên weha di nav zaraveyên KZKyê da hindik in.

Mînak: textît: plandanan (plan+danan), typewriter: tîpnûs (tîp+nûs), mustexdem: xizmetguzar (xizmet+guzar), tabut: daremeyt (dar+e+meyt), cuxrafi: cugrafnas (cugraf+nas)...

- **Li hember zaraveyeke erebî danîna zaraveyeke zimanê din:** Netewetî îdeolojîya sereke ya plandanîna zimanî ye û xwecîyakirina ji neteweyên dewrûber û bi taybetî jî ji bo neteweyên bindest xwecîyakirina ji neteweya serdest armanca sereke ya netewetî û plandanîna zimanî ye. Ji ber vê plandanerên zimanî carinan ji bo destnîşankirina zaraveyekê eger ji çavkanîyên navborî nikaribin sûd wergirin di şûna zaraveya zimanê serdest da berê xwe didin zimanekî din û bi vî awayî dixwazin cîyawazîyê di navbera xwe û neteweya serdest da çê bikin. KZK jî gelek caran ji zaraveyên erebî direve û di şûna wan da ji zimanên din sûd werdigire. Li alîyê din ji ber ku çavkanîya zanistên modern neteweyên rojavayî ne KZK di qadên jîyana modern da di cihê zaraveyên çêkirî yên erebî da bi awayekî rast berê xwe dide jêdera wan a eslî ku ew jî bi piranî zimanên îngilîzî û fransî ne.

Mînak: bitaqe: kart (card), fen: teknîk (technic), fenî: teknîkar (technical), hidûd: sinûr (sinir), qanûn: yasa, farîze: wêrgul, elfarize: koma (comma) (di lîsteya çarem da di şûna wêrgula fransî da “koma”ya îngilîzî tê hilbijartin), meşru’: proje, cewazel sefer: pasaport, muamele: îş, tewqî’: îmza, sefir: balyoz, remz: hêma, nezerîye: tîorî, îştîrakîye: soşyalîzm, kemalîyat: fentazî, cirum: mîkrob, mîzanîye: buce, elhukum zatî: otonomî, sarux: rokêt...

- **Wergirtina rasterast a zaraveyên bîyanî:** KZK carinan herwek zimanên din hin zaraveyên bîyanî bê destkarî herwek zimanê serçavî werdigire. Di vê kategorîyê da jî zimanên çavkanî di pileya yekem da erebî ye û di pileya duyem da jî îngilîzî ye. Ji bo vê yekê mirov dikare mînakên “ders, eyb, kefalet, kefil, saet, hazir, prostat, û daş”ê bide.

- **Wergirtina zaraveyên bîyanî bi hin guherînên dengî:** Di vê wergirtinê da taybetmendîyên dengî yên zimanê wergir yanî kurdî li ber çavan tê girtin û di hin dengan da guherîn tê çêkirin. Di mînaka zimanê kurdî da hin guherînên weha her ji mêj ve hatîye kirin, ji ber vê KZK jî bilêvkirina gelî li ber çavan digire û forma cihgirtî pesend dike.

Mînak: xidmet: xizmet, xezîne: xezêne, şahid: şayed, şair: şaîr, licne: lijne, karîse: karesat, kaxed: kaxez, kitab: kitêb, officer: efser, phoneme: fonêm, morpheme: morfêm, clause: kiloz, etymology: êtîmolojî...

Bêguman mîna ku berê jî hat behskirin di mînakên hemû plandanînan zimanî da hin pêşnîyaz cihên xwe nagirin û ji alîyê civak û bikarhênerên zimanî ve nayên qebûlîkirin. Ji nav zaraveyên KZKyê jî hinek jê cihê xwe nagirin û paşê tên jibîrkirin. Ji nav van zaraveyan ya herî balkêş “zanyarî” ye ku di navê vê dezgehê da jî cih digire. Ev zarave di wê demê da ji bo “zanist”a îro bê danîn jî paşê ev bikaranîn tê terikandin û “zanyarî” di manaya “agahdarî”yê da tê bikaranîn. Ji bilî vê zaraveyê em dikarin van mînakên bidin:

Meruf: dîyarde, muerref: dîyarde, deqîqe: wirdek, hezare: jîyar (di têbînîya vê zaraveyê da tê gotin ku ev li hinek navçeyên Behdînanê berbelav e û ne dûr e ji jînê hatibe), qeza: herêm, qaîmqam: herêmdar, adil: dadger, hakim: dadkar, muddeî am: dadyar, kelam: bêje, lefz: waje, lefzî: wajeyî, metin: saye, muwatin: hawzêd, medenî: jîyarî, tedbîqat: rahatin (rahatin di roja îro da tenê ji bo hînbûnê (get used to) tê bikaranîn), îstisna: derhawîştin, sîre: jîname, mutenasib: hawgir, şirket: beşge, sınıf: babet, tesnîf: babet kirdin, hekîm: hozan...

3.5. HEWLDANÊN FERHENG A KZKYÊ

KZK wek akademîyeke zimanî danîna ferhengeke kurdî ya yekgirtî (Ferhengî Kurdîy Yekgirtû) yek ji erkên xwe yên sereke dibîne, ji bo vê jî şarazeyên hundir û derve arîkarî dixwaze (1973: 529-530) û di her du xulên xwe yên pêşî da “Lijneya Ferhengê” ava dike ku di xula yekem da Mesûd Mihemed, Ebdurehman Hejar û Cemal Baban endamên vê lijneyê ne (Mezher, 1973: 328) û di xula duyem da jî Hêmin û Ebdurehman Merûf li van kesan zêde dibin (Mezher, 1974: 831).

Herwek di serî da jî hat behskirin danîna ferhengeke kurdî yek ji armancên sereke yên KZKyê ye û piştî ku Doktor Ebdurehman Merûf xwendina xwe temam dike û vedigere welatî li KZKyê wek pisporê ferhengdanîne tê damezirandin û ji bo cihbicihkirina vî karî hemû erk pê tên spartin. Bi vê mebestê li KZKyê hemû ferhengên kurdî tên komkirin, sûd ji gelek kesên navçeyên cîyawaz tê wergirtin û bi rêya nameyan peywendî bi pisporên derveyê welatî ra tê danîn (1974: 872-873).

Di serdema KZÊDKyê da bi navê “Lijneya Ferhengê” lijneyeke serbixwe nayê avakirin lê erka amadekirina “Ferhengî Yekgirtûy Zimanî Kurdî” bi Lijneya Zimanê Kurdî tê spartin ku di bin serokatîya Ezîz Reşîd Akreyî da endamên wê ji Dr. Kamîl Hesên Besîr, Sadiq Behaeddîn, Mela Cemîl Bendî Rojbeyanî, Şekûr Mistefa Ebdula û Nûrî Elî Emîn pêk tên. Ji bo amadekarîya vê ferhengê pêşî plan tê danîn ku hinek pispor li ser ferhenga zarê lûrî kar bikin û bêjeyên wê bi kurmancî û erebî rave bikin, hinek jî li ser ferhenga zarê goranî bixebitin û gencîneya wê ya bêjeyan derxin meydanê da ku bingeha ferhenga yekgirtî bê bihêzkirin (Gilî 1980: 292-293).

Di vê çarçoveyê da Desteya Kurd a KZÊyê di bin sernavê “Bangewazêk bo Roşinbîranî Kurd”ê da bang li hemû ronakbîrên kurd dike ku ji bo komkirina bêjeyên hemû şêwezarên zimanê kurdî arîkarîya wan bikin da ku Ferhenga Kurdî ya Yekgirtî li ser bingeha hemû zarên kurdî bê avakirin. Desteya Kurd bi bîr tîne ku heta niha bi zimanê kurdî kesên mîna Ehmedê Xanî, Şêx Marifê Nodî, Muhemmed Merdoxê Kurdistanî, Gîw Mukrîyanî, Şêx Muhemmedê Xal, Cigerxwîn, Ebdurehmanê Zebîhî, Qenatê Kurdo û Tofîq Wehbî ferhengên giştî; Şêx Marif Qeredaxî Seaetçî (ferhenga kîştûkalê) û Kemal Celal Xerîb (ferhenga zanistî) ferhengên babetî û di van salên dawî da jî hinek nivîskar di dawîya pirtûkên xwe da ferhengokên biçûk amade dikin. Desteya Kurd dixwaze li ser vê mîratê û bi arîkarîya ronakbîrên kurd ferhengeke kurdî-kurdî ya hemû şêwezarên kurdî amade bike da ku xizmeta pêkanîna zimanê edebî yê standard bike. Ji bo bicihanîna vê armancê jî amadehîya xwe nîşan dide ku navên kesên ku arîkarî bidin li ser ferhengê binivîse û eger hinek kes pere bixwazin dê bi pereyan jî bîr xelatkirin (Gilî 1980: 293-294).

Mixabin tevî van pêngavên giring ev ferhenga ku di serê sedsala 20ê da ji aliyê Xelîl Xeyalîyî ve wek armanc hatibû destnîşankirin naçe serî û KZK û KZÊDK jî nikarin vê armancê cihbicih bikin.

3.6. YEKXISTINA ZIMANÎ

KZK di çarçoveya rênivîs, rêziman û zaravesazîyê da li ser bingeha kurdîya soranî xebatên hevbeş ên plandanîna zimanî bike jî nakeve nav gengeşeyên yekxistina zimanî û bi bédengî kurdîya soranî wek zarê hîlbijartî dipejirîne. Ev jî nivîsarên *Govarî Korî Zanyarî Kurd/Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*ê û xebatên hevbeş ên navborî jî derdikeve, lewra jî bilî 11 xebatên bi kurmancî hemû gotarên kovarê bi

kurdîya soranî tèn weşandin³⁷ û di xebatên rênivîs, rêziman û zaravesazîyê da herçend sûd ji zarên kurdî yên din bê wergirtin jî di navenda xebatê da kurdîya soranî heye. Ev hîlbijartin û pejirandina bêdeng ji yekem nivîsara *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* jî tê famkirin ku ji alîyê endamê şerefê Tewfîq Wehbî ve tê nivîsîn.

Tewfîq Wehbî wek plandanerê herî giring ê Kurdistana Îraqê, ji salên 1920an ve li ser şêwezarê Silêmanîyê kar dike da ku ev şêwezar wek zimanekî standard ê edebî cihgîr bibe. Ji bo vê mebestê ji rêzimanê heta zaravesazîyê gelek xebatên giring dike. Di vê gotara xwe da jî bingeha vî zimanê edebî vedigerîne serdema Mîrektîya Baban û damezirandina bajarê Silêmanîyê ku ji alîyê Îbrahîm Paşayê mîrê Baban ve tê avakirin. Li gor zanyarîyên wî, berî vê rûdanê li vê deverê kurdîya goranî wek zimanê edebî di rewacê da bûye û kurdên kurmanc jî bi vî zarî nivîsîye. Lê di vê maweyê da ji alîyê fonolojîk, morfolojîk û bêjewergirtinê ve di encama têkelbûna şeweyê Qeleçolanê û şeweyê goranî yê Erdelanê da kurdîya Silêmanîyê wek zimanê edebî peyda dibe û ev zar ji sedsala 19ê û bi şûn da bi nûnertîya Nalî û Kurdî wek zimanê edebî şûna kurdîya goranî digire û her ku diçe bihêz dibe. Wehbî ji bilî desthilata Babanan sedema berbelavbûna kurdîya Silêmanîyê bi pêşketina bajarê Silêmanîyê ve

³⁷ Ev gotar ev in:

1. Qenatê Kurdo. (1973). Li Babet Nivîskar, Ziman û Elifabayê Pertûkê Dînê Êzîdîyan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 1, Beşî 1, 132-179.
2. Hacî Cindî. (1974). Kîlamêd Cimeta Kurdaye Lîrikê. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 664-750.
3. Sadiq Behadîn Amêdî. (1974). Ehmedê Xanî yê Nemir. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 769-826.
4. Emînê Evdal. (1975). Nîqtek Danîn. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 1, 303-318.
5. Sadiq Behadîn Amêdî. (1978). Hozana Kurdî û Havilîya Wê bi Hozana Erebi û Farisî ve. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 6, 270-313.
6. Qenatî Kurdo. (1978). Derheqa Şovêd Mem û Zîna Zargotînî û Şova Mem û Zîna Ehmedî Xanî (Ji Nivîsara Peywendîya Folklor û Lêtêratûra Kurdî). *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 6, 78-110.
7. Akreyî, E. R. (1980). Rêzimanê Axivtina Kurdî Beşê Karî yan Kiryarê (elfî'îl verb). *Govarî Korî Zanyarî Êraq "Destey Kurd"*. Bergî 7, 36-59.
8. Bedirxan Sindî. (1983). Ez û Min di Ezmanê Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 10, 133-153.
9. Urdixanî Celîl. (1984). Zargotîna Cimieta Kurda. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Amadekirdinê: Ebduletîf Ebdulmecîd Gîlî, Bergî 11, 112-159.
10. Ehmedê Mirazî. (1985). Bîranînêd Min. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Şukur Tîpguhêzî: Mistefa. Bergî 12, 205-327.
11. Ehmedê Mirazî. (1986). Bîranînêd Min. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Tîpguhêzî: Şukur Mistefa. Bergî 14, 51-98.

jî girê dide ku dibe navend û bazara hemû Şarezûr û derûdora wê û ji ber vê jî gelek mirov ji derûdorê berê xwe didin vî bajarî û zimanê vir dipejirînin (1973: 9-14).

Bi vê riwangeha dîrokî Wehbî dîyar dike ku şêwezarê Silêmanîyê di encama peresendineke xweristî, civakî û siyasî da dibe zimanê edebî û ji ber vê jî divê hemû kurd şêwezarê Silêmanîyê wek zimanê edebî bipejirînin û mîna neteweyên din bi rêya perwerdeyê li hemû deveran berbelav bikin. Ji ber vê bang li kurdan dike ku ji bo vê mebestê dest bidin hev, piştgirî bidine zimanê xwe yê edebî yê standard û vî zimanî bi kurmancîya bakurî, kurmancîya naverast (mukrî, soranî, sineyî, silêmanî) û kurmancîya başûrî (kirmanşanî, kelhûrî, lekî, feylî) xurt bikin û ji zanayan jî dixwaze ku li ser vê mijarê pêşnîyazên xwe bixin rû (1973: 29-31). Di vê çarçoveyê da ji bo qebûlbarîya vî zimanê edebî xurt bike sê pêşnîyazan dixê rû ku di kurdîya Silêmanîyê da nedihatî bikaranîn:

1. Divê di şûna “e”yê da ji bo nîşandana dema borî ya berdewam û dema niha herwek kurmancîya bakurî û mukrî “de” bê bikaranîn, lewra di eslê vê morfemê da “d” heye û bi demê ra ketîye. Bi vê pêşnîyazê, Wehbî qayîdeyêke rêzimana xwe ya 1929ê revîze dike û diçe ser raya Seîd Sidqî.

2. Divê cihnav “ez”ê ya kurmancîya bakurî di zimanê edebî da jî bê bikaranîn û herwek kurmancî ji bilî lêkerên têper ên dema borî di hemû rewşan da di şûna “min”ê da bê bicihkirin. Ji bo selmandina rastîya van her du pêşnîyazan dîwanên Nalî, Salim, Kurdî û rêzimana Seîd Sidqî wek çavkanî destnîşan dike û dîyar dike ku ev taybetmendî berê di kurdîya Silêmanîyê da jî hebûne.

3. Ji bo nîşandana dema bê herwek kurmancî pêşnîyaz dike ku piştî bikerê morfema “dê”yê bê bikaranîn (1973: 31-33).

Du sal paşê Pakîze Refîq Hîlmî li ser vê mijarê gotarekê dinivîse û ji bo piştgirîdana raya Tewfîq Wehbî di serî da bi pesin behsa şîyan, şarezatî û jêhatîbûna wî dike ku li ser bingeha zanîna xwe ya zimanên kevin û zindî bi dilsozî xizmeteke mezin ji bo zimanê kurdî kirîye û heta niha jî di nav xebat û lêgerînê da ye (1975: 156). Piştî vê di çarçoveya mijara zimanê edebî û şêwezaran da dîyar dike ku di hemû zimanan da şêwezar hene û her yek ji wan li navçeyên dîyarkirî tîn axaftin. Lê di serdema modern da kar ji bo wê yekê tê kirin ku ev şêwezar li hev bîn nêzîkkirin da ku hêdî hêdî zarekî giştî bê peydakirin û ev zarê giştî bibe zimanê standard ê hemû

endamên wê neteweyê. Dema weha bê kirin ev ziman dibe zimanê nivîsînê û şeweyên din jî tenê di qada axaftinê da dimînin. Ji ber vê bi mixabinî dîyar dike ku gelek kurd heta niha jî bi zarê navçeya xwe dinivîsin û weha dizanin ku ev zimanê hemû kurdan e. Bi raya wê, nabe ku sêrdasî, sineyî, ranyeyî û yê din, her yek bi şewezarê xwe binivîse û eger weha be dê şîrazeya zimanê kurdî têk biçe. Ji ber vê bang li kurdan dike ku di nivîsînê da pêgirê zimanê edebî bin ku ew jî şewezarê Silêmanîyê ye (1975: 159-160).

Di serdema Desteya Kurd a KZÊyê da ji bo ji kurdan ra bibe mînak Şukur Mistefa gotareke azerî ya Barat Osmanowayî ya li ser dîroka plandanîna zimanê tirkî werdigêre ser zimanê kurdî û di berga 7em a *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*ê da diweşîne. Di vê gotarê da nivîskar ji serdema Osmanî heta Komara Tirkîyeyê qonaxên giring ên plandanîna zimanê tirkî destnîşan dike û cih dide hin biryarên giring ên dezgehên plandanîna zimanê tirkî (Osmanowa, 1980: 60-80).

Piştî navbireke dirêj di sala 1990ê da Mihemed Emîn Hewramanî bi gotara xwe ya “Kurdîy Şewezar”ê li ser vê mijarê gotareke balkêş dinivîse. Ev gotar nîşaneyê wê yekê ye ku tevî hemû hewldanên behskirî zimanê edebî yê standard bi awayekî pêwîst di nav hemû kurdan da belav nabe. Hewramanî, piştî ku ji aliyê dîrokî ve behsa zimanên îranî û şewezarên kurdî dike di bin sernavê “Kurdî Şewezar Berew Şeweziman”ê da bi şayiş dîyar dike ku kurd bixwazin nexwazin ji “şewezar”an ber bi “şeweziman”an pêngavên mezin diavêjin. Herçend bi rêzeke mezin behsa xebatên li ser yekxistina zimanê kurdî bike jî di çarçoveya rastîya roja îro da bi bîr tîne ku piranîya axiverên şewezarên kurdî bi şeweyên xwe diaxivin, dixwînin, dinivîsin û ji şeweyên din nikarin sûd wergirin. Dema weha be çêj û têgihîştineke hevbeş çê nabe û jevdûrketin bihêztir dibe. Vê rewşê bi nebûna kîyanê yekgirtî ya kurdî û karîgerîya zimanên dewrûber a li ser şewezarên cîyawaz ên kurdî ve girê dide ku jevdûrketinê xurttir dikin. Tevî vê metirsîyê, nivîskar dest ji armanca zimanê kurdî yê standard bernade û bang li xwendewarên kurd dike ku eger li hember şewezarên hev xweşbîntir bin dê bikarin zimanê edebî yê standard bînin holê (1990: 289-291).

Tevî ku KZK û KZÊDK di kovarên xwe da her nivîskarî berpirsîyarê gotara wî bidin zanîn û boçûnên nivîskaran û dezgehê ji hev cuda bikin jî ji ber ku li ser navê KZK û KZÊDKyê li ser vê mijarê tu biryareke fermî nayê ragihandin û bi awayekî

kirdeyî şêwezarê Silêmanîyê wek zimanê standard ê nivîsînê dikin navendê em dikarin bibêjin ku ev her du dezgehên ku temamkerên hev in, kêr zêde li ser vê rayê ne ku şêwezarê Silêmanîyê bingeha zimanê edebî yê standard pêk tîne lê ji xebatên rênivîs, rêziman û zaravesazîyê jî tê famkirin ku endamên van her du dezgahan hewl didin vî şêwezari bi şêwezarên din ên kurdî xurt û berfireh bikin û bi vê yekê hem zimanekî edebî yê bihêz pêk bînin hem jî di navbera şêwezarên kurdî da lihevneşîkbûnekê çê bikin da ku axiverên şêwezarên din jî xwe di vî zimanê standard da bibînin.

3.7. LÎSTEYA XEBATÊN KESÎ DI GOVARÎ KORÎ ZANYARÎ KURD/GOVARÎ KORÎ ZANYARÎ ÊRAQ “DESTÊY KURD”Ê DA

KZK û KZÊDK wek akademîyên zimanî ne tenê ji bo xebatên hevbeş, ji bo xebatên kesî jî zemîne çê dikin û di kovarên wan da gelek xebatên kesî tên weşandin. Di maweya KZKyê da di navbera xebatên hevbeş³⁸ û kesî da hevsengîyek hebe jî di serdema KZÊDKyê da ev hevsengî têk diçe û rêjeya xebatên kesî her ku diçe zêdetir dibe. Lewra di serdema KZÊDKyê da êdî rapor û nûçeyên li ser vê dezgehê nayên weşandin û xebatên rêziman, rênivîs û zaravesazîyê jî gelek kêr dibin. Ji ber vê di salên dawî da kovara vê dezgehê herwek kovareke akademîk a zimanî xuya dike û ji raya dezgehî zêdetir mirov rastî raya kesî ya endamên vê dezgehê tê. Tevî vê yekê, xebatên zanistî yên kesî ji bo plandanîna zimanî giring in û carinan rê li ber xebat û biryarên gelek giring jî vedikin. Ji ber vê em dê van xebatan li gor mijarên wan û rêza çapê destnîşan bikin.

1. GOTARÊN LI SER ZIMANÎ

1. 1. Yekxistina Zimanî

Tofîq Wehbî (1973). Eslî Pîte Qalîy Şêwey Silêmanî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 1, Beşî 1, 9-38.

Hejar (1974). Kurd û Serbexoyî Ziman. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 280-323.

Pakîze Refîq Hîlmî (1975). Bûjandnewey Ziman. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 1, 143-197.

³⁸ Xebatên hevbeş ên KZKyê ji van pêk tên: Rênivîsa KZKyê, rêzimana KZKyê, lîsteyên zaraveyên KZKyê, raporên çalakîyên KZKyê û nûçeyên li ser KZKyê.

Barat Osmanowa (1980). Le barey Çakkirdinî Zimanî Turkîyewe. Ji azerî: Şukur Mistefa. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 7, 60-80.

1. 2. Zimannasîya Giştî

Elaedîn Secadî (1977). Zanînî Kirokî Ziman. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 5, 36-62.

Ewrehmanî Hacî Marif (Wer.). (1986). Çend Kêşeyekî Zimannasî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 15, 25-67.

Wirya Umer Emîn (1989). Fonetîk û Fonolojî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 20, 239-259.

Ebdurehmanî Hacî Marif (1992). Binema Serekîyekanî Ziman. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 23 û 24, 78-91.

1. 3. Rêziman

Mesud Mihemed (1973). Bekarhênanî 'î' le Rêzimanî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 1, Beşî 1, 39-114.

Ebdula Neqîşbendî (1973). Paşkoy 'dira'. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 1, Beşî 1, 115-131.

Nesrîn Fexrî (1973). Paşgir û Pêşgirî (ve- yan –we) le Zimanî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 1, Beşî 1, 234-273.

Mesûd Mihemed (1974). Sûrêkî Xame be Dewrî "Ranaw" da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 9-147.

Şêx Mihemedî Xal (1974). Pêşgir û Paşgir. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 256-279.

Cemal Baban (1974). Hendêk Lew Zarawaney Watayek Zîyatir Ebexşin. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 569-623.

Nesrîn Fexrî (1975). Paşgirî "-andin" le Zimanî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 1, 198-242.

Emîd Ehmed Hesên (1975). Pêşgir û Paşgir. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 1, 319-357.

Cemal Baban (1975). Hendêk lew Zarawaney Watayek Zîyatir Ebexşin. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 1, 358-388.

Mesûd Mihemed (1975). Fonetîk Çîman bo Bika?. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 1, 568-622.

Farûq Umer Sidîq (1975). Wişesazî le Zimanî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 2, 417-525.

Hesen Qizilcî (1977). La barey Hêndê le Nihênîyekani Rêzimanî Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 5, 113-134.

Mesûd Mihemed (1977). Hêdanewey Çend Rûperekî Zimanî Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 5, 264-311.

Hesen Qizilcî (1978). Goranî Pîtekan be Yektir, Cêgorkêy Pîtekan û Swan û Têkşikanî Wişekan be Hoy Ew Alogoraney be Serpîtekan da Dê. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 6, 118-184.

Ewrehmanî Hacî Marif (1978). Koy Naw le Zimanî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 6, 185-225.

Mihemed Me'rûf Fetah (1980). Xoyetî, le Zarî Silêmanî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 7, 162-195.

Bedirxan Sindî (1983). Ez û Min di Ezmanê Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 10, 133-153.

Ewrehmanî Hacî Marif (1985). Cênawî Kesîy Cuda le Zimanî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 11, 45-95.

Elaedîn Secadî (1985). Dengî Kurdî û Nîşaney. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 12, 97-152.

Şukur Mistefa (1985). Nasikwêjî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 13, 214-229.

Nesrîn Fexrî (1985). Lêkolîneweyêk Derbarey Cêgorkê û Helgêranewe û Gorînî Şwênî Deng le Zimanî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 13, 261-293.

Mihemed Meruf Fetah (1986). Dîsan Îdyem Pêdaçûneweyek le ber Roşnayî Zimanewanî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 15, 68-138.

Nûrî Elî Emîn (1986). Şêwazî Erê û Nerê le Axawtinî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 15, 139-181.

Wirya Umer Emîn (1986). Paşbendekan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 15, 182-193.

Ewrehmanî Hacî Marif (1988). Pilekanî Awelnaw le Zimanî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 18 û 19, 356-396.

Nesrîn Fexrî (1989). Xo le Terazûy Ziman da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 20, 208-238.

Ebdulrehman Hacî Marif (1990). Taybetêti Jimare le Zimanî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 21 û 22, 158-204.

Wirya Umer Emîn (1990). Rêzimanî Ranaw le Kirmancîy Jûrû da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 21 û 22, 252-262.

Nesrîn Fexrî (1992). Westanêk le Astî Her du Firmanî "bûn" û "hebûn" û "he" û "hî" da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 23 û 24, 159-183.

Ewrehmanî Hacî Marif (1994). Kirdarî Karadîyar û Kirdarî Karabizir le Zimanî Kudî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 25 û 26, 66-97.

Refîq Mihemed Mihêdîn Şwanî (1998). Çawg û Firman Kamyar Serçawe û Bineret in. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 27 û 28, 44-70.

Nesrîn Mihemed Fexrî (1998). Roşnayî Naneser Hendêk Layenî Bekar û Lebîrkiraw le Zimanî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 27 û 28, 209.

Nûrî Elî Emîn (2002). Wişey Nasade le Zimanî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 29 û 30, 221-290.

Wirya Umer Emîn (2002). Lêkolîneweyek Morfofonêmî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 29 û 30, 291-302.

Fetah Mame Elî (2006). Teşenekirdinî Wata le Zimanî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 31, 185-221.

Wirya Umer Emîn (2006). Çend Têbînîyek le barey “Nerê”we. *Govarî Korî Zanyarî Kurd “Destey Kurd”*. Bergî 31, 261-284.

1. 4. Ferhenga Kurdî

Ewrehmanî Hacî Marif (1974). Lêksîkolojî Zimanî Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 2, 81-116.

Ewrehmanî Hacî Marif (1975). Lêksîkolojî Zimanî Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 2, 207-240.

Mihsin Ehmed Umer (1986). Ferhengok- Zazayî-Demil-Kirmancîy Serû-Kirmancîy Xwarû. *Govarî Korî Zanyarî Kurd “Destey Kurd”*. Bergî 15, 235-280.

Ebdulrezaq Bîmar (1988). Serincêk le Ferhengokî Honrawey Ehmedî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd “Destey Kurd”*. Bergî 18 û 19, 55-114.

Nesrîn Fexrî (2006). Peresendinî Mêjûyî Watay Wişe û Dewrî le Dewlemendkirdinî Ziman da “Lêksîkoolgîya-Lexicologie”. *Govarî Korî Zanyarî Kurd “Destey Kurd”*. Bergî 31, 222-260.

1. 5. Rênivîsa Kurdî

Emînê Evdal (1975). Nîqtek Danîn. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 1, 303-318.

Kamil Besîr (1982). Xalbendî bo Rênûsî Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 9, 5-15.

Ewrehmanî Hacî Marif (1982). Gîrûgiriftî Rênûsî Kurdî be Elfûbêy Erebî. *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 9, 16-77.

Îbrahîm Emîn Balldar (1982). Rengî Karwanî Rênûsî Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 9, 78-111.

Şakir Fetah Ehmed (1982). Gîrûgiriftekanî Rênûsî Kurdî û Şêwey Çarkirdinyan. *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 9, 112-134.

Sadiq Behaedîn Amêdî (1982). Rênivîsa Kurdî bi Tîpê Erebî. *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 9, 135-148.

Tahir Sadiq Ehmed (1982). Rênûsî Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 9, 149-173.

Umer Ebdurehîm (1982). Rênûsî Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 9, 174-185.

Kurdistan Mukrîyanî (1982). Çonyetî Nûsînî Çawgey Nesade. *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 9, 186-211.

Mihemed Salih Seîd (1982). Firêdan û Helbiwardin le Bekarhênan û Nûsînî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 9, 212-228.

Mihemed Me’ruf Fetah (1982). Rênûsî Kurdî le Riwaney Fonetîkewe. *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 9, 229-267.

Mesûd Mihemed (1982). Çareserkirdinî Gîrûgiriftkanî Rênûs û Elfûbêy Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 9, 268-359.

Nûrî Elî Emîn (1982). Gîrûgiriftî Nûsînî Kurdî le Tay Terazûy Pîte Bizwên û Nebizwên da. *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 9, 360-419.

Nesrîn Fexrî (1982). Pêşekî Çon Binûsîn? Le Dengewe bo Wişê, ta Riste. *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 9, 420-433.

Wirya Umer Emîn (1982). Îmlay Kurdî û Çend Têbînîyek. *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 9, 434-449.

Îbrahîm Ezîz Îbrahîm (1982). Gîrûgiriftî Nûsînî Firman legel Ranaw le rûy Pêkewenûsan û Pêkewe Nenûsanewe. *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 9, 450-488.

Ewrehmanî Hacî Marif (1983). Rênûsî Kurdî le Rojnamey Têgeyîştinî Rastî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd “Destey Kurd”*. Bergî 10, 76-132.

Îbrahîm Emîn Balldar (1989). Xalbendî le Nûsîna. *Govarî Korî Zanyarî Kurd “Destey Kurd”*. Bergî 20, 320-363.

Muhemmed Ce’ferî Mehbûb (1994). Le barey Şêwenûsînî Xetî Farisîyewe. *Govarî Korî Zanyarî Kurd “Destey Kurd”*. Wergêran: Muhemmedî Mela Kerîm. Bergî 25 û 26, 137-150.

Sebah Musa Elî (2006). Le Dewrûberî Ew Bilawkirawane da le barey Rênûsî Kurdîyewe Nûsrawin. *Govarî Korî Zanyarî Kurd “Destey Kurd”*. Bergî 31, 285-298.

1. 6. Zaravesazîya Kurdî

Kamîl Besîr (1974). Zimanî Erebi û Kêşî Zarawey Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 751-768.

Cemal Reşîd (1976). Êskbendî Mirov. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 4, 83-96.

Ewrehmanî Hacî Marif (2002). Lêkdanewey Hendê Zarawe le barey Fonetîk û Fonolojîyewe. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 29 û 30, 3-22.

1. 7. Peywendîya Zimanê Kurdî û Zimanên Din

Ezîz Akreyî (1978). Karlêkirina Zimanê Bîyanîya li Zimanê Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 6, 111-117.

Kamil Besîr (1985). Berawirdkarîyek le Nêwanî Zimanî Kurdî û Zimanî Erebi da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 13, 3-66.

Kamil Besîr (1986). Amrazî Pênas – Lêkolînewe û Helsengandin. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 14, 3-12.

Nesrîn Fexrî (2002). Layenî Hawbeşî û Cîyawazî Nêwanî Her du Zimanî Kurdî û Erebi le Dirustbûnî Wişey Nwê da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 29 û 30, 199-220.

1. 8. Zarên Kurdî

Mihemed Emîn Hewramî (1974). Temaşakirdinêkî Serpê Zarî Soranî û Zarî Hewramî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 2, 117-165.

K.K. Kurdoş (1977). Haletekanî Cins û Binyatî Berkar le Zaza da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Ji rûsî: Îbrahîm Ezîz Îbrahîm. Bergî 5, 236-263.

Kurdistan Mukrîyanî (1980). Corekanî Cênaw û Dewryan le Ristey Kurdî da le Dîyalêktî Kirmancî Xwarû û Kirmancîy Jûrû da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 7, 229-254.

Wirya Umer Emîn (1983). Layenêkî Cîyawazî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 10, 254-276.

Mihemed Emîn Hewramanî (1990). Kurdîy Şêwezar. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 21 û 22, 263-329.

1. 9. Dîroka Zimanê Kurdî

Qenatê Kurdo (1973). Li Babet Nivîskar, Ziman û Elifabayê Pertûkêt Dînê Êzîdîyan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 1, Beşî 1, 132-179.

Pakîze Refîq Hîlmî (1973). Le Kwêwe Dest Bikeyn be Destûrsazî Rêzimanî Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 1, Beşî 1, 180-211.

Pakîze Refîq Hîlmî (1974). Le Kwêwe Dest Pê Bikeyn be Destûrsazî Rêzimanî Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 324-362.

Ewrehmanî Hacî Marif (1981). Kurtetekî Mêjûy Nûsînî Kurdî be Elfûbêy Erebi. *Govarî Korî Zanyarî Kurd “Destey Kurd”*. Bergî 8, 66-120.

Ebdulmuhsin Binîwîs (1990). Sîya le Zimanî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd “Destey Kurd”*. Bergî 21 û 22, 205-224.

1. 10. Etîmîlojîya Kurdî

Elaedîn Secadî (1974). Wişey Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 148-178.

Mukerem Talebanî (1976). Le barey Binc û Binewanî Wişey Miskênewe le Zimanî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 4, 71-82.

1. 11. Destnivîs

Şêx Mihemedî Xal (1986). Destnûsî Kon û Taze û Hêzî le Namexanekan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd “Destey Kurd”*. Bergî 15, 3-15.

2. EDEBÎYAT

2.1. Edebîyatnasî û Vekolînên li ser Edebîyata Kurdî

Elaedîn Secadî (1973). Honrawe û Pexşan (Şî'r û Nesr). *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 1, Beşî 1, 212-233.

Sadiq Behadîn Amêdî (1974). Ehmedê Xanî yê Nemir. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 769-826.

Mesûd Mihemed (1974). Çepkêk le Gulzarî Nalî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 2, 11-80.

Mesûd Mihemed (1975). Çepkêk le Gulzarî Nalî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 1, 10-88.

Elaedîn Secadî (1975). Edebî Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 1, 89-112.

Sadiq Behadîn Amêdî (1975). Serhustayê Kêş û Vehandinê Melayê Cizîrî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 1, 243-302.

Mesûd Mihemed (1975). Çepkêk le Gulzarî Nalî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 2, 8-74.

Sadiq Behadîn Amêdî (1975). Serhustayê Kêş û Vehandinê Melayê Cizîrî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 2, 359-416.

Sadiq Behadîn Amêdî (1976). Serhustayê Kêş û Vehandinê Melayê Cizîrî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 4, 97-154.

Şêx Mihemedî Xal (1977). Baba Tahîrî Hemedanî Meşhur be Uryan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 5, 3-35.

Şêx Mihemedî Xal (1978). Mela Mihemedî Xakî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 6, 9-36.

Elaedîn Secadî (1978). Sofîyetî le Honrawey Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 6, 37-77.

Mihemed Elî Qeredaxî (1978). Şaroyek le Baxçey Edebî Mewlewî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 6, 226-269

Şêx Mihemedî Xal (1980). Mela Mihemedî Xakî Beşî Dûhem Basî Mî'rac. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 7, 7-35.

K. K. Kurdoyêv (1980). Lêkolînewey Edebî Kurdî le Êraq da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Şukur Mistefa ji azerî kirîye kurdî. Bergî 7, 81-112.

Kamil Husên Ezîz Besîr (1980). Binerîtekanî Rexnesazî û Honrawey Dêrînî Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 7, 196-228.

Kamil Hesên Besîr (1981). Lasayîkirdnewe û Resenî le Rexnesazîy Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 8, 3-40.

Mihemedî Mela Kerîm (1981). Eqîdey Kurdîy Mewlana Xalîdî Neqîşbendî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 8, 199-222.

Kamil Besîr (1983). Rexnesazîk û Bîrdozî Honrawe. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 10, 3-41.

Şêx Mihemedî Xal (1984). Şaîranî Bênewûnîşan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 11, 3-11.

Kamil Besîr (1984). Wêje û Tojînewey. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 11, 12-29.

Cemal Baban (1984). Mela Hemdûn le Bêçawêkî Hejarewe bo Bilîmetêkî Behredar. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 11, 30-60.

Şukrîye Resul (1984). Geştêk be Cîhanî Şêx Rezay Talebanî û Ruxsar û Nawerokî Şî'rekanî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 11, 74-111.

Ezadîn Mistefa Resul (1984). "Me'sûm" ya "Asî" le Naw Şaîre Klasîkîyeke da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 11, 160-202.

Kerîm Şareza (1984). Saxkirdnewey Hendê Gîrûgîrîftî Şî'rekanî Hacî Qadîrî Koyî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 11, 203-263.

Kamil Besîr (1985). Mamosta Faiq Bêkes le Korî Rexnesazî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 12, 3-43.

Emîn Elî Mutabçî (1985). Zimanî Nalî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 13, 67-106.

Ebdulsitar Kazim Ismaîl (1985). Zarî Zimanî Kurdî le Tirazûy Berawurd da û Çend Rexneyek. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 12, 152-203.

Mihemedî Mela Kerîm (1986). Be Rêgay Rastkirdnewey Şîrekanî Hacî Qadîrî Koyî da Emeyş Hengawêkî tir. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 15, 194-234.

Şêx Mihemedî Xal (1987). Berawirdêkî Pîremêrd legel Şêx Reza le Wêje da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 16 û 17, 3-8.

Kamil Besîr (1987). Boçûneke da le Kêlgey Roşînbîrî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 16 û 17, 9-32.

Mihemed Nûrî Arif (1987). Wişe û Zarawekanî Babatahîr û Berawirdkirdinyan legel Şêwekanî Zimanî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 16 û 17, 327-374.

Şêx Mihemedî Xal (1989). Dîwanî Şêx Reza Talebanî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 20, 3-50.

Emîn Elî Mutabçî (1990). Swênd û Swêndxwardin le Şî'rî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 21 û 22, 3-13.

Emîn Mutacî (1992). Nalî Şaîrî Xezelî Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 23 û 24, 21-40.

Şukur Mistefa (1992). Mewlidê Nebî Ehmedê Xasê Lêkdanewe w Ferheng bo Sazkirdinî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Wergêran û Tîpguhêzî: Şukur Mistefa. Bergî 23 û 24, 41-77.

Emîn Elî Mutabçî (1994). Melay Cizîrî Ustadî Xezelî Kurdî le Şêwey Kirmancî Şîmalî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 25 û 26, 3-29.

Mihemed Elî Qeredaxî (1994). Pêdaçûnewey Mêjûy Edeb û Zanyarî Kurd Karêkî Pêwîst e. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 25 û 26, 127-136.

Mihemed Elî Qeredaxî (2002). Debê Em Du "Xerîbî"ye Yek Kes Bin?. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 29 û 30, 171-198.

Refîq Şwanî (2006). Kurdbûnî Şaîrêtî Baba Tayerî Hemedanî be pêy Zimanî Şî'rekanî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 31, 30-101.

Adil Mecîd Germîyanî (2006). Rehendî Derûnî le Çîrokî Dirêjî Min û Qale û Segekey Pavlov da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 31, 102-184.

2.2. Deqên Edebî

Muxlis (1973). Wilat Hey Wilat. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 1, Beşî 1, 356-36.

Hejar (1974). Baregay Kor. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 827.

Ehmedê Mirazî (1985). Bîranînêd Min. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Şukur Tîpguhêzî: Mistefa. Bergî 12, 205-327.

Ehmedê Mirazî (1986). Bîranînêd Min. *Govarî Korî Zanyarî Kurd* “Destey Kurd”. Tîpguhêzî: Şukur Mistefa. Bergî 14, 51-98.

2.3. Edebîyata Berawirdî

Sadiq Behaedîn Amêdî (1978). Hozana Kurdî û Haviliya Wê bi Hozana Erebi û Farisî ve. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 6, 270-313.

Emîn Elî Mutabçî (1987). Kurte Berawirdê. *Govarî Korî Zanyarî Kurd* “Destey Kurd”. Bergî 16 û 17, 33-55.

Emîn Elî Mutabçî (1989). Hafîz le Şî`rî Kurdî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd* “Destey Kurd”. Bergî 20, 51-105.

Adil Mecîd Mihemed Germîyanî (2002). Geştîkirdin, Wek Serçaweyekî Wêney Honraweyî, le Honrawekanî Goran û Seyyab da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd* “Destey Kurd”. Bergî 29 û 30, 77-110.

3. FOLKLOR

Hacî Cindî (1974). Kilamêd Cimeta Kurdaye Lîrikê. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 664-750.

Şukrîye Resûl (1976). Mêjûy Kokirdnewe û Lêkolînewey Pendî Pêşînyan û Qisey Nesteqî Kurdî û Helsengandinî Ew karaney ta Êsta lem Meydane da Kirawin. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 4, 155-231.

Qenatî Kurdo (1978). Derheqa Şovêd Mem û Zîna Zargotinî û Şova Mem û Zîna Ehmedî Xanî (Ji Nivîsara Peywendîya Folklor û Lêtêratûra Kurdî). *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 6, 78-110.

Mihemed Elî Qeredaxî (1980). Cengnamey Xalîd. *Govarî Korî Zanyarî Kurd* “Destey Kurd”. Bergî 7, 113-161.

Urdîxanî Celîl (1984). Zargotina Cimieta Kurda. *Govarî Korî Zanyarî Kurd* “Destey Kurd”. Amadekirdinî: Ebduletîf Ebdulmecîd Gilî, Bergî 11, 112-159.

Ebduletîf Ebdulmecîd Gilî (Amd.). (1987). Gulweçînî le Gulzarî Folklorî Kurdî. Ji rûsî: D. Kawis Qeftan. Bergî 16 û 17, 425-473.

Seîd Nakam (1977). Têbînîyekanim le ser Lêkdanewekey Dîwanî Nalî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 5, 177-235.

Ebduletîf Ebdulmecî (Amd.). (1988) Beytî Las û Xezal. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 18 û 19, 207-269.

Ebduletîf Ebdulmecîd Gilî (Amd.). (1989). Beytî Las û Xezal. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 20, 260-319.

Ebduletîf Ebdulmecîd Gilî (Amd.). (1990). Nasir û Malmal. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 21 û 22, 376-416.

Ebduletîf Ebdulmecîd Gilî (1994). Le Gulzarî Folklorî Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 25 û 26, 162-181.

4. DÎROK

Kemal Mezher (1973). Kurdistan le Salekanî Şerî Yekemî Cîhan da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 1, Beşî 1, 274-315.

Kemal Mezher (1974). Kurdistan le Salekanî Şerî Yekemî Cîhan da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 179-255.

Kemal Mezher (1975). Kurdistan le Salekanî Şerî Yekemî Cîhan da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 2, 75-157.

Kurd û Kurdistan le Nîgay Çend Gerîdeyekî Rojawayîyewe (1981). Şukur Mistefa (Wer.) *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 8, 121-158.

Muhammed Cemîl Rojbeyanî (1981). Fermanrewayî Şwankarey Kurd le Herêmî Fars û Îsfahan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 8, 159-198.

Emîn Neqîşbendî (1983). Şarezûr û Şarezûrîyekan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 10, 42-75.

Kurd û Kurdistan le Nîgay Çend Gerîdeyekî Rojawayîyewe (1983). Şukur Mistefa (Wer.). *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 10, 154-192.

Kemal Mezher (1983). Kurd lay Gerdlêvskî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 10, 218-253.

Cemal Baban (1985). Bo boney Têperbûnî Du sed Sal be ser Binyatnanî Şarî Silêmanî da Silêmanî û Hendêk le Beserhatekanî le Honrawey Şaîrekanmana. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 13, 158-192.

Celîlî Celîl (1986). Berpabûnî Pişewî le Herêmî Hekarî (Feslêk le kitêbekey Raperînî Kurdekan le Salî 1880 da Lapare 51-72). Ji rûsî: Dr. Kawis Qeftan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 14, 122-159.

Cemal Baban (1987). Nexşey Şarî Silêmanî le Serdemî Babanekan da legel Nawî Hakim û Muteserifekan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 16 û 17, 91-130.

Şemsî Muhemed Îskender (1987). Mêjûy Kurd le Sedey 16hem da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Ji azerî: Şukur Mistefa. Bergî 16 û 17, 166-245.

M. S. Lazarîf (1987). Çend Kêşeyekî Dîmografî û Mêjûyî û Sîyasî û Peywendî Komelayetî û Abûrî Kurd. Ji rûsî: D. Kawis Qeftan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 16 û 17, 375-424.

Mahşeref Xanim (Mestûre)y Erdelanî (1988). Mêjûy Erdelan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Ji farisî: D. Husên Caf û Şukur Mistefa. Bergî 18 û 19, 3-54.

Şemsî Mihemed Îskender (1988). Beşî Duwem Borudoxî Kurdistan û Gelî Kurd le Sedey 16hem da. Ji azerî: Şukur Mistefa. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 18 û 19, 115-179.

Ebdulstar Tahir Şerîf (1988). Komele û Rêkxiraw û Hîzbe Kurdîyekan le nîw Sede da – 1908-1958. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 18 û 19, 270-324.

Mihemed Cemîl Rojbeyanî (1988). Xaneqîn le Mêjû da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 18 û 19, 331-355.

Şemsî Mihemed Îskender (1989). Raperînî Xêlekîy Kurd le Sedey 16hem da Beşî Sêyem. Ji azerî: Şukur Mistefa. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 20, 44-207.

Hesen Caf (1990). Nexoşî Hozî Caf le Say Çend Serokêkîyewe le Mêjûy Kurd da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 21 û 22, 14-72.

Şemsî Mihemed Îskender (1990). Mêjûy Kurd le Sedey 16hem da Raperînî Serdarêti û Xêlekîy Kurd le Sedey 16hem da. Ji azerî: Şukur Mistefa. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 21 û 22, 119-157.

Mihemed Cemîlî Rojbeyanî (1990). Xaneqîn le Mêjû da (beşî duwem). *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 21 û 22, 349-375.

Ebdulsitar Tahir Şerîf (1992). Komele w Rêxiraw û Hîzbe Kurdîyekan le Nêwanî Sede da-1908-1985. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 23 û 24, 92-123.

Muhsin Mihemed Husên (1992). Lêkolîneweyekî Berawirdkarî le Nêwan Du Qelat da Xogirî Qelatî Hewlêr le Mêjû da û Paşmawekanî Qaîmkarîy Qelatî Heleb. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 23 û 24, 134-158.

5. ETNOLOJÎ Û SOSYOLOJÎ

Nacî Ebas Ehmed (1974). Koçerî û Transhîwmanî “Transhumance” Le Parêzgey Suleymanî û Hewlêr. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 363-412.

Elaedîn Secadî (1976). Roşinbîrî Kon û Nwê le Kurdistan da û Piley Em Roşinbîrîye le Derewe. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 4, 50-70.

Wolfgang Rudolf û Hesên Selah Soran (1977). Hozî Feyzula Begî Banî Bokan (Mêjûyekî Kurtî Binemaleyekî Begzadey Kurd). Wergêran: Nacî Ebas. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 5, 63-112.

Margirêt Rodînkî (1978). Şînî Kurde Yezîdîyekî Pişt Qefqaz. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Wergêran û destkarî: D. Şukrîye Resûl. Bergî 6, 314-343.

Umer Yasîn Cebârî (2002). Xêzan le Komelgay Mirovayetî da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd “Destey Kurd”*. Bergî 29 û 30, 153-170.

6. KURDNASÎ

Cemal Nebez (1974). Kurte Mêjûyekî Kurdnasî le Elmanya da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 413-498.

Ewrehmanî Hacî Marîf (1974). Le barey Kurdnasîyewe le Rûsya û Yekêtî Sovêt. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 499-568.

Qenatê Kurdo (1974). Nûsrawekanî Lêrx le barey Kurdewe. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 2, Beşî 1, 624-663.

Qenatê Kurdo (1975). Y. A. Orbîlî û Kurdnasî. Wergêran: Ewrehmanî Hacî Marîf. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 1, 113-142.

7. PERWERDE

Musa Ebdulsemed (1981). Pêşkewtinî Perwerde û Fêrkirdin le Nawçey Otonomî le Salanî 1974-1980 da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd “Destey Kurd”*. Bergî 8, 41-65.

Ebdulsitar Tahir Şerîf (1983). Perwerde û Mindal Bayexdan be Perwerdekirdinî Mindal. *Govarî Korî Zanyarî Kurd “Destey Kurd”*. Bergî 10, 193-217.

Ebdulstar Tahir Şerîf (1986). Wişe û Riste Lay Mindal le Temenî 1-6 Salan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 14, 99-121.

Ebdulstar Tahir Şerîf (1987). Amancî Bernamekanî Bineretekanî Pêxwêndinî Zimanî Kurdî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 16 û 17, 273-326.

Îbrahîm Emîn Balldar (1992). Bekarhênanî Kitêbxane le Lêkolînewe da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 23 û 24, 3-20.

Umer Îbrahîm Ezîz (2002). Helsengandinî Waney Edebî Kurdî bo Polî Sêyemî Nawendî le Têrwanînî Mamostayan û Pêşniyazekanyan bo Pêşxistinî Waneke. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 29 û 30, 111-152.

8. BÎYOĞRAFI

Şêx Mihemedî Xal (1975). Seyîd Cemaledîn Efxanî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 3, Beşî 2, 158-206.

Şêx Mihemedî Xal (1976). Seyîd Cemaleddînî Efxanî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 4, 8-49.

Sadiq Behaedîn Amêdî (1980). Celadet Bedirxan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 7, 255-286.

Kamil Besîr (1986). Ebuzerulxefarî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 15, 16-24.

Kemal Mezher (1990). Şukrîlfezî û Çend Têbînîyekî Mêjûyî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 21 û 22, 225-251.

Mihmedî Mela Kerîm (1990). Mamosta Şêx Muhemmedî Xal. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 21 û 22, 330-348.

Şîhab Şêx Teyîb Tahir (2006). Berhemekanî Roley Pîremegrûnî Kurd Mamosta Tofîq Wehbî, be pêy Bilawbûneweyan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 31, 312-325.

9. KÎMYA

Zenûn Mihemed Pîryadî (1984). Şîrînkere Destkirdekan Artificial Sweeteners. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 11, 61-73.

Zenûn Mihemed Pîryadî (1987). Xizmetekanî Kîmya bo Pêşkewtinî Kiştûkal. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 16 û 17, 131-166.

Zenûn Mihemed Pîryadî (1988). Lêkolînewekanî Pîrî Aging Research. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 18 û 19, 180-206.

Zenûn Mihemed Pîryadî (1989). Kîmya Etr û Gulaw û Bonexoşekan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 20, 106-143.

Zenûn Mihemed Pîryadî (1990). Şêrpence û Madde Kîmyayîyekan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 21 û 22, 73-118.

Zennûn Muhemmed Pîryadî (1994). Ew maddaney legel Plastîk da Têkel Dekrên. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 25 û 26, 30-65.

Zinûn Mihemed Pîryadî (2002). Pêtrokîmyayîyekan û Pîşesazîyekan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 29 û 30, 23-76.

Zinûn Pîryadî (2006). Asokanî Xizmetguzarî Zanistî Kîmya. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 31, 5-29.

10. TENDIRUSTÎ Û PIZIŞKÎ

Zenûn Mihemed Pîryadî (1985). Kolîstrol û Tendirustî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 13, 193-213.

Ebdulsitar Tahir Şerîf (1985). Temendirêjekanî Kurd. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 13, 231-260.

Ewrehman Ebdula (1987). Mîkrobtêdan û Nexoşî. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 16 û 17, 246-272.

11. ABORÎ

Zenûn Pîryadî (1986). Melbendekanî Wize û Cêgirekanî Newt. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 14, 13-50.

Mukerem Talebanî (1992). Awdan û Kehrebey Kurdistan. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 23 û 24, 124-133.

Mukerem Talebanî (1994). Şêwey Berhemhênanî Asyayî û Mulkayetî Zewîzar le Mîzapotamya da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 25 û 26, 151-161.

Mukerem Talebanî (1998). Projekanî Awdan û Heydroelektrîk le Herêmi Rûbarî Dicle le Kurdistanî Bakûr da. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 27 û 28, 71-208.

12. GERNAME

Jobêr (1994). Çûn bo Ermenistan û Êran. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Wergêran: Rojbeyanî. Bergî 25 û 26, 98-126.

Jobêr (1998). Çûn bo Ermenistan û Êran. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Wergêran: Rojbeyanî. Bergî 27 û 28. 3-43.

13. COGRAFYA

Nahîde Cemal Talebanî (1994). Kanîyawekanî Parêzgay Hewlêr. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 25 û 26, 182-217.

14. BÎBLÎYOGRAFYA

N. A. Alêksanyan (1976). Bîblîyografya Kitêbêd Kurdîye Sovyetê Salêd 1921-1960. Tîpguhêzî: Enwer Qadir Mihemed. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 4, 401-432.

N. A. Alêksanyan (1977). Bîblîyografya Kitêbêd Kurdîye Sovyetê Salêd 1921-1960" Tîpguhêzî: Enwer Qadir Mihemed. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. Bergî 5, 312-342.

Ewrehmanî Hacî Marif (1985). Bîblîyografyay Ew Witaraney le Salanî 1970-1979 da le barey Zimanî Kurdîyewe be Kurdî le Govarekan da Bilawkiranewe. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 13, 107-157.

Ewrehmanî Hacî Marif (1987). Be Zimanî Rûsî Çî le barey Zimanî Kurdîyewe Nûsrawe (1). *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 16 û 17, 56-90.

Ebduletîf Ebdulmecîd Gilî (1992). Bîblîyografyay Sercemî Nawerokî Govarî Korî Zanyarî Kurd û Korî Zanyarî Êraq/Destey Kurd. *Govarî Korî Zanyarî Kurd "Destey Kurd"*. Bergî 23 û 24, 184-212.

3.8. WEŞANÊN KZKYÊ

KZK her ji destpêkê ve giringîyeke mezin dide çapkirina pirtûkan û dema Akademîya Zanistî ya Îraqê çapxaneyekê dîyarîyî wan dike yekser hewl didin tîpên kurdî lê zêde bikin û dest bi çapkirina pirtûkan bikin. Lê heta amadekirina çapxaneyê ji bo çapkirina hin pirtûkên giring ên ku ji alîyê KZKyê ve hatine pesendkirin, dest bi dayîna arîkarîyên diravî dike. KZK di 16 xalan da mercên arîkarîya çapkirina pirtûkan dîyar dike ku bi dîtina me, yên herî giring ew in ku divê ev pirtûk xwedî nirxeke zanistî bin, di gel armancên KZKyê biguncin, li ser ziman, çand, dîrok û civaka kurdî bin û bi zimanekî paqij hatibin nivîsîn (1973: 538-539). Bi vî awayî di rapora yekem da navên 11 pirtûkên jêrîn tê dayîn ku bi arîkarîya KZKyê hatine çapkirin:

1. Şêx Mihemedî Xal, *Tefsîrî Xal*, Cizmî Duwem, Silêmanî, 1972.
2. D. Ebdurehman Ebdula, *Tendirustî Giştî*, Bexda, 1972.
3. Ebdureqîb Yusif, *el Dewletul Dustekîye fî Kurdistanul Wesetî*, Cuzul Ewel, Bexdad, 1972
4. Şêx Merufî Qeredaxî, *Ferhengî Kiştûkal*, Beşî Yekem, Bexdad, 1972.
5. Mela Ebdulkerîmî Muderîs, *Dîwanî Feqê Qadirî Hemewend*.
6. Mela Ebdulerîmî Muderis, *Dîwanî Nalî*.
7. Ehmed Hesên, *Rêzimanî Kurdî*.
8. Toma Lîwa, *Lemha 'en 'l-ekrad*, Terceme: Mihemed Şerîf Usman.
9. Tofîq Wirdî, *Folklorî Kurdî*.
10. Cemal Baban, *Mame Yare*.
11. Duktur Emîn Elî Mutabçî, *Dîwanî Hacî Mela Wesman* (1973: 342-344).

Di 1974ê da tê ragihandin ku li ser erka KZKyê bi wergêrana Hejarî *Şerefname* (ji farisî), *Hozî Lebîrkerawî Gawan û Gawanîye Benawbangekanê* (ji erebî) û berga yekem a *Hacî Qadirî Koyî* ya Mesûd Mihemedî tîpên çapkirin. Herweha (1) *El-Ekradu 'l Millî we Îbrahîm Paşaya Doktor Ehmed Usman Ebubekir*, (2) *Îdyemêt Kurdîya Sadiq Behadîn*, (3) *Dîwanî Mela Wesmana Doktor Emîn Mutabçî*, (4) *Çawgî Bêwata le Zimanî Kurdî da Ho û Çonyetî Bekarhênanî lem Zimane* daya Doktor Nesrîn Fexrîyê jî bi arîkarîya KZKyê tîpên çapkirin (Mezher, 1974: 834-838).

Di 1975ê da navên heşt pirtûkên nû di nav lîsteya weşanên KZKyê da tên destnîşankirin ku li jêr hatine rêzêkirin:

1. Mesûd Mihemed, *Wirdbûnewey Çend Basêkî Rêzimanî Kurdî*, 1974. (Ji du gotarên endamên kara Mesûd Mihemedî pêk tên ku her du jî berê di *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* da hatine weşandin)
2. Kemal Mezher, *Kitêbî Zarawey Kargêrî*, 1974. (Komkirina lîsteya yekem û duyem a zaraveyên KZKyê ye di gel bersivên wan rexneyên ku li wan hatine kirin)
3. Qenatê Kurdo, *Hendêk Bîr û Bawerî Hele le barey Ziman û Mêjûyî Kurdewe*. Wergêr: Ewrehmanî Hacî Marif, 1974.
4. Ewrehmanî Hacî Marif, *Çî le barey Zimanî Kurdîyewe Nûsrawe*, 1974.
5. Qenatê Kurdo-Cemal Nebez-Ewrehmanî Hacî Marif, *Berkutkî Xermanî Kurdnasî*, 1974. (Komkirina wan sê gotarên nivîskarên navborî ye ku di *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* da hatine weşandin)
6. Beşî Duyemî Bergî Duyemî Govarî Korî Zanyarî Kurd.
7. Encumena Korî Zanyarî Kurd, *Zarawî Hemeçêşn*, 1974. (Ji lîsteya sêyem a zaraveyên KZKyê pêk tê)
8. Mesûd Mihemed, *Hacî Qadirê Koyî*, Bergî Duwem .

Ji bilî van, KZK di çapkirina *Ferhengî Erebi-Kurdîya Gîw Mukrîyanî* (Berfirehkirina wê ferhenga wî ye ku di sala 1950yê da di bin navê “Raber”ê da çap kiribû) û berga sêyem a *Ferhengî Kurdî-Kurdîya Şêx Mihemedê Xalî* da jî arîkarî dike (Marif, 1975: 553-556).

Di 1975ê da tê ragihandin ku KZKyê makîneyeke nû ya çapê kirîye û piştî vê nûçeyê jî navên 5 weşanên nû dide ku ji vana pêk tên:

1. Beşî Yekemî Bergî Sêyemî *Govarî Korî Korî Zanyarî Kurd*.
2. Oskar Mann, Bergî Yekemî *Tuxfetû Muzefferîyye*, Amadekar: Hêmin Mukrîyanî.
3. Xaney Qubadî, *Şîrîn û Xusrev*, Amadekar: Mihemedî Mela Kerîm.
4. D. Kemal Mezher Ehmed, *Kurdistan le Salekanî Şerî Cîhanî Yekem da*.
5. Erebe Şemo, *Destanî Qelay Dimdim*, Wergêr: Şukur Mistefa (1975: 567).

Di sala 1976ê da navên 14 weşanên KZKyê yên sala 1975ê tê weşandin ku ji vana pêk tên:

1. Beşî Duwemî Bergî Sêyemî *Govarî Korî Zanyarî Kurd*.
2. Oskar Mann, Bergî Duwemî *Tuxfetû Muzefferîyye*, Amadekar: Hêmin Mukrîyanî.
3. Mesûd Mihemedî, *Çepkêk le Gulzarî Nalî*.
4. Mesûd Mihemed, Bergî Sêyemî *Hacî Qadirî Koyî*.
5. Îbnul Hac, *Mehdîname*, Pêşekî û saxkirin: Mihemed Elî Qeredaxî.
6. Mela Ebdulkerîmî Muderîs û Fatîh Ebdulkerîm, *Şerhî Dîwanî Nalî*, Pêdaçûn: Muhemedî Mela Kerîm.
7. Qenatê Kurdo, *Komele Têkstî Folklorî Kurdî*.
8. Bî pêşekî û saxkirina Usman Hewramî, *Dîwanî Welî Dêwane*.
9. D. Ebdurehmanî Hacî Marîfî, *Wişe le Zimanî Kurdî da*.
10. D. Ebdurehmanî Hacî Marîf, *Zimanî Kurdî le ber Tîşkî Fonetîk da*.
11. Yaşar Kemal, *Efsaney Çîyay Agirî*, Wergêran: Şukur Mistefa.
12. Musa Binay el-‘Eleylî, *Tehqîqul El-Îzah fî Şerhî’l Mufessel lî İbnî’l Hacib*.
13. Cemal Baban, *Usûlu Esmâ’l Mudunî we’l Mewaqî’il-Îraqîyye*.
14. Bergî Çwaremî *Govarî Korî Zanyarî Kurd*.

Ji bilî vana KZK di çapkirina van her sê pirtûkan da arîkarî dike:

1. Şêx Mihemedî Xal, Cizmî Sêyemî *Ferhengî Xal*.
2. Ehmed Hesên Ehmedî, *Rêzimanî Kurdî be Kurdî û be Erebî*.
3. Belegayêv, *Sênîgar*, Wergêran ji îngilîzî: Ezîz Gerdî (Gilî, 1976: 483).

Di sala 1977ê da navên 12 weşanên nû di gel weşanên berê tên rêzkirin. Em dê li vir tenê cih bidin weşanên nû:

1. Jimarey Duhemî Bergî Duhemî *Govarî Korî Zanyarî Kurd be kurdî û erebî*.
2. Jimarey Yekemî Bergî Sêyemî *Govarî Korî Zanyarî Kurd be erebî û kurdî*.
3. Jimarey duwemî bergî sêyemî *Govarî Korî Zanyarî Kurd*.
4. Kerîm Şareza, *Pendî Pêşînyan le Şî’rî Kurdî da*.

5. Mihemedî Mela Salih Şarezûrî, *Rêkewt le Sirazî Jîrî da*.
6. Hamid Ferec, *Nûsînî Kurdî le Sedeyek da*.
7. Mesûd Mihemed, *Çend Heşargeyêkî Rêzimanî Kurdî*.
8. Lîjney Zarawe Zanistîyekan, *Zarawey Zanistî*.
9. Bi amadekarina Sadiq Behaedînî, *Dîwanî Melay Cizîrî*.
10. Lîjney Ziman û Zanistekanî, *Rêzimanî Axawtinî Kurdî*.
11. Ewrehmanî Hacî Marif, *Wişeronan le Zimanî Kurdî da*.
12. Kemal Mezher Ehmed, *Kurdistan fî Senewatul Herbu'l 'Alemîye*,

Wergêran: Mihemedî Mela Kerîm.

Ji bilî van, KZK di çapkirina van pirtûkan da jî arîkarî dide nivîskaran:

1. Muhyîdîn Zengene, *Çîrokî Asos be erebî*.
2. Refîq Sabîr, *Pişkokan Egeşêewe* (helbest).
3. Salih Elî Gulî, *Komele Şî'rî Bûyka Behdîna*.
4. Mela Şêx Mihemedî Balîsanî, *Çiray Rûnakî*.
5. Mihemed Ehmed Mistefa, *Dabeşkirdinî Mîrat le Şerîetî Îslam û Qanûn da*.
6. Bi komkirina Ezîz Gerdî: *Dîwanî Mihîrî* (Mihemed, 1977: 426-430).

Di sala 1978ê da 19 weşanên nû yên KZKyê çê dibin ku di 1977ê da hatine çapkirin.

1. Nerîman-Mistefa Seyîd Ehmed, *Biblîyografyay Kitêbî Kurdî*.
2. Mela Ebdulkerîm û Mihemedî Mela Ebdulkerîm, *Lêkdanewe û Saxkirdnewey Dîwanî Mehîwî*.
3. Bi amadekarîya Enwer Qadir û Salih Elî Gulî, *Memî Alan*.
4. Bi edîtorîya Mihemed Elî Qeredaxî, *Eqîdey Mewlewî*.
5. Mesûd Mihemed, *Mirov û Dewrûber*.
6. Ordîxanê Celîl, *Stranê Tarîxa Kurd*, Tîpguhêzî: Şukur Mistefa û Enwer Qadir.
7. Reûf Bêgerd, *Çîrokî Bwar*.
8. Maksîm Gorkî, *Dayk*, Wergêr: Kerîmî Hisamî.
9. Şêrko Bêkes, *Ask*.
10. Enwer Qadir, *Ziryan* (şî'r).

11. Şêx Umerî Îbnul Qeredaxî, *Elfethu 'l Wamiz Elel Minhu 'l Faiz*.
12. Mesûd Mihemed, *Berew Rasteşeqamî Axawtinî Kurdî*.
13. Bi edîtorîya Mihemed Elî Qeredaxî, *Dîwanî Wefayî*.
14. D. Kemal Mezher Ehmed, *Têgeyîştinî Rastî*.
15. Ezîz Gerdî, *Edebî Berawirdkarî*.
16. Bi amadekarîya Xefûrî Mîrza Kerîm, *Yadgarî Lawan*.
17. D. Ebdurehmanî Hacî Marîf, *Çi le barey Zimanî Kurdîyewe Nûsrawe*,

Ji kurdî bo erebî: Mihemed Emîn Hewramanî.

18. Elaeddîn Sicadî, *Deqekanî Edebî Kurdî*.
19. Letîf Helmet, *Gerdelûlî Spî* (şî'r) (Mihemed, 1978: 487-489-).

Ji bilî vê tê diyarkirin ku encumena KZKYê biryar daye ku arîkarîya çapkirina pirtûkan ji 20 dînarî bike 30 dînar (Mihemed, 1978: 490).

Lîsteya herî dawî di 1980yê da tê weşandin ku ji 8 pirtûkan pêk tên:

1. Kemal Celal Xerîb, *El-Qamûsu 'l-Îlmî* (erebî- ingilîzî-kurdî), Cuzul Sanî.
2. Teha Baqir, *Mîn Tutasîna 'l-Luxawîyyî 'l Qedîm*.
3. Xidirê Silêman û Xelîlê Cindî, *Êzdîyatî le ber Roşnaya Hindek Têkstêd Ayînê Êzdîyan*.
4. Ebdurehman Zebîhî, *Qamûsî Zimanî Kurdî*, Bergî Duwem.
5. Ewliya Çelebî, *Seyahetname*, Wergêr: Seîd Nakam.
6. Mela Ebdulkerîm Muderis, *Yadî Merdan*, Bergî Yekem.
7. *Newbehara Ehmedî Xanî*, amadekirdinî Sadiq Behaeddîn.
8. Elî Esxer Şemîmî, *Coxrafyay Kurdistan*, Wergêr: Ebdurehmanî Zebîhî.

Di 1980yê da li ser çapkirina van pirtûkan jî biryar tê dayîn:

1. *Kiçanî Kurd*, Wergêr: Nacî Ebas.
2. Bi amadekarîya Mela Ebdulkerîmî Muderis û Fatîh Ebdulkerîm, *Dîwanî Feqê Qedrî Hemend*.
3. Dilşad Elî, *Dîlan Şaîr û Azadîxwaz*.
4. Sadiq Behaeddîn, *Hozanvanêt Kurd*.
5. Reûf Usman, *Rexne û Bebalabirîn*.

Di heman salê da biryara arîkarîkirina çapkirina van pirtûkan tê dayîn:

1. Bi amadekarîya Muhemmed Elî Qeredaxî, *Keşkkolî Kelepûrî Kurdî*.
2. Heme Kerîm Remezan Hewramî, *Oxey Ewe Min im*.
3. Bi amadekarîya Muhemmed Emîn Kardoxî, *Leylê û Mecnûn*. (Gilî, 1980: 299-300).

Ji bilî van zanyarîyên ku di nav rûpelên KZK û KZÊDKyê da hatine belavkirin Mistefa Nerîman di xebata xwe ya bîbliyografîk da destnîşan dike ku vê dezgehê ji 1972yê heta 1984ê bi tevahî 97 pirtûk li ser navê xwe çap kirine (1988: 388). Ev jî nîşan dide ku KZK û KZÊDKyê giringîyeke baş daye çapkirina pirtûkên kurdî ku ji bo cihbicihkirina plandanîna zimanî û belavkirina normên wê xwedî giringîyeke taybetî ye.

BEŞA ÇAREM

XEBATÊN ENSTÎTUYA KURDÎ YA PARÎSÊ LI SER PLANDANÎNA ZIMANÊ KURDÎ

Herçend negihîştibe damezirandina Enstîtuya Kurdî ya Parîsê (EKP) jî mirov dikare bibêje ku bizira pêşî ya xebatên zimanê kurdî li Parîsê ji aliyê Kamiran Bedirxanî ve tê danîn ku piştî Celadet Bedirxanî plandanerê duyem ê xwendîngeha edebî û zimanî ya Hawarê bû. Kamiran Bedirxan di 1947ê da li Parîsê bi cih dibe û ji 1948ê heta 1970yê di Ecole Nationale des Langues Orientales Vivantesê da (Xwendîngeha Neteweyî ya Zimanên Zindî yê Rojhilatê) dersên zimanê kurdî dide (Yücel, 2018: 88) û dibe sedem ku gelek xemxwarên zimanê kurdî berê xwe bidin wir û Parîsê bikin navendeke giring a kurdnasîyê. Li gor ragihandina Joyce Blauyê, Kamiran Bedirxan ji bilî vî karê xwe, di heman demê da dibe şîretkir û şêwirmendekî giring ê kurdên Ewropayê jî û Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pêşniyaz û şopa xebatên wî tê avakirin (Yücel, 2018: 104-105).

Ji bilî vê rola Kamiran Bedirxanî, em dikarin bibêjin ku EKP berhema civaka kurdî ya li dîyasporayê ye. Herçend Alakom di mînakên kurdên Anadolê da koma pêşî ya vê civakê vegehe 1960an jî (2007: 106) bingeha herî bihêz a vê civakê di dawîya 1970an û destpêka 1980an da tê danîn ku gelek ciwanên xwenda û çalakgerên siyasî yê kurd ji ber guvaşên siyasî û rewşa nearam a li welatên Tirkîye, Îran, Îraq û Sûrîyeyê kom bi kom berê xwe didin welatên cûrbicûr ên Ewropayê û li vir bingeha civakeke kurdî datînin û li ser vê sosyolojîyê jî gelek dezgehên çandî, civakî û siyasî tên avakirin.

EKP di zemîneke weha da sala 1983yê li Parîsê bi beşdarîya ronakbîrên hemû aliyên civaka kurdewarî tê damezirandin ku di nav wan da plandanerên zimanî yê giring ên mîna Tewfîq Wehbî, Qanatê Kurdo, Hejar Mukrîyanî; zana û akademîsyenên mîna Ordîxanê Celîl, Hecîyê Cindî, Îsmet Şerîf Wanlî; helbestvan û nivîskarên mîna Cegerxwîn û Nûredîn Zazayî û hunermendên navdar ên mîna Yılmaz Guney (derhêner) û Remzî Raşayî (şêwekar) jî hene (Em kî ne?, 2022). Lê ji damezirandina xwe heta niha Kendal Nezan serokatîya vê dezgehê dike û roleke wî ya berbiçav heye di berdewamiya vê dezgehê da.

Herçend dezgeheke kurdan be jî EKP di çarçoveya destûr û qanûnên dewleta Fransayê da tê rêxistin. Ji 1983yê heta 1993yê di çarçoveya komeleyekê da dixebite û di 1993yê da bi biryareke fermî ya serokwezîrê Fransayê payeya weqfekê werdigire. Loma jî ji rêveberîya wê ya 12 kesî çar jê nûnertîya dewleta Fransayê dikin ku ji nûnerên Wezareta Çandê, Wezareta Perwerdeya Neteweyî, Wezareta Karên Civakî û Wezareta Navxweyî pêk tên. Ev rêveberî ji sê salan carekê nû dibe û di nav xwe da ji bo sê salan serokekî, du cihgir, berpirsekî darayî û sekreterekî hildibijêre (Em kî ne?, 2022). Bi vê heykela xwe ya kargêrî mirov dikare bibêje ku EKP wek dezgeheke nîvfermî xuya dike.

Herwek rêveberîya xwe, EKP ji alîyê darayî ve jî xwe dispêre du bingeheên giring ku ew jî civaka kurdî ya Ewropayê û dezgehên dewleta Fransayê û welatên din ên rojavayî ne. Loma jî di salên destpêkê da bi rêya kampanyayekê ji civaka kurdî û dostên wan pere tê komkirin û di 1987ê da avahîyeke hertimî ji bo EKPyê tê kirin ku heta niha jî heye. Herçend beşek ji dahata EKPyê ji berhemên wê û arîkarîya dost û dilxwazên wê bê dabînkirin jî ev têra birêvebirina çalakîyên wê nake û ji sala damezirandina wê heta niha bi rêya projeyên curbicur piştgirî ji dewleta Fransayê û hin dezgehên mîna CCFD, Weqfa France-Libertés, Doktorên Cîhanê, Yekîtiya Ewropayê, Ajansa Swêdî ya Geşepêdana Navneteweyî, Wezareta Derve ya Norwecê, Navenda Navneteweyî ya Olof Palmeyê, Tevgera Karkerên Norwecê, Hikumeta Katalonyayê û hin şaredariyên Îtalyayê werdigire. Herweha ji sala 2008ê heta 2013ê ji Hikumeta Herêma Kurdistanê jî arîkarîya diravî werdigire (Em kî ne?, 2022).

EKP wek dezgeheke neteweyeke bêdewlet li dîyasporayê, ji alîyê erkên xwe ve bernamayeke piralî dide ber xwe. Ji ber vê herwek dezgeheke civakî û çandî li Fransa û Ewropayê arîkarîya civaka kurdî dike, li ser navê kurdan karê lobîyê dike, ji bo balkişandina raya giştî ya kurdî û ewropayî konferansên zanistî li dar dixe, bi mebesta vejandina zimanî dersên zimanê kurdî dide û bi armanca perwerdekirina kadroyên ronakbîr jî bi finansmana Fransayê ji bo ciwanên kurd bûrseke salane dabîn dike. Li gor zanyariyên li ser malpera EKPyê, heta niha 540 xwendekaran ji vê bûrsê sûd wergirtiye ku ji sedî 45ê wan keç in (Bûrsên xwendina bilind, 2022). Bi vî awayî rê li ber gelek xortên kurd xweş dike ku bikarin li welatekî pêşketî yê mîna Fransayê bernameyên mastir û doktorayê bixwînin û bi xebatên xwe yê zanistî xizmeta ziman û çanda kurdî bikin.

EKP di karnameya xwe da ji bo xwe çendîn qadên xebatê destnîşan dike ku ji zanistên mirovî, ziman, edebîyat, ragihandin, mafên mirovî, huner, muzîk û çalakîyên çandî û civakî pêk tên. Bi van xebatên xwe yên curbicur, hem dixwaze kurdan hişyar û şareza bike hem jî çanda kurdî bi cîhanê binasîne. Ji ber vê di 1983yê da bi rêya kovara *Hêvî*ê dîyar dike ku armanca wan parastin û pêşvebirina çanda gelê kurd, berhevkirina gencîneya çanda kurdî, amadekirina ferheng û rêzimana kurdî, vekolînên li ser edebîyat, pîşe û dîroka kurdî, çapkirina kovar û pirtûkên kurdî, berhevkirina kaset, sêlik û filmên kurdî ye û evana wek armanc û şaxên sereke yên xebata xwe dide zanîn (Hêvî, 1983: 207). Tevî van erk û armancên giring, bi raya me rola herî giring a EKPyê xebatên wê yên plandanîna zimanê kurdî ye û em dê di vê beşê da bi hûrgilî li ser vê mijarê rawestin.

4.1. JI 1983Ê HETA 1992Ê XEBATÊN ENSTÎTUYA KURDÎ YA PARÎSÊ LI SER PLANDANÎNA ZIMANÊ KURDÎ

Çalakîyên plandanîna zimanî ya EKPyê cara pêşî di kovara *Hêvî/Hîwayê* da tê dîtin ku ji 1983ê heta 1992yê bi tevahî 8 hejmarên wê derdikevin û yek ji weşanên giring ên vê dezgehê ye. Mirov dikare bibêje ku ji alîyê polîtîkaya plandanîna zimanî û weşanî ve *Hêvî* li ser rêbaza *Hawarê* ye. Ji ber vê alfabeya latînî ya Celadet Bedirxanî peyrew dike, herwek *Hawarê* cih dide nivîsarên kurdîya kurmancî û soranî û tevî ku nivîsarên kurdîya soranî bi alfabeya erebî jî diweşîne di her hejmarê da mîna *Hawarê* gotareke kurdîya soranî bi latînî çap dike. Lê ji *Hawarê* cudatir di *Hêvî*ê da kurdîya dimilî/zazakî jî wek zimanê nivîsînê tê bikaranîn û bi vî awayî kovar bi sê zarên kurdî tê weşandin ku di derbarê plandanîna zimanî ya EKPyê da wêneyekî di serê me da çê dike. Bêguman kovar ne tenê li ser kêşeyên zimanî radiweste û tê da gelek deqên edebî û qadên din tên weşandin. Bi raya me ji alîyê plandanîna zimanî ve nivîsarên hejmarê yekem a *Hêvî*ê gelek giring in ku li ser bernameya plandanîna zimanî ya EKPyê zanyarîyên giring li xwe digirin.

Serokê Enstîtuyê Kendal Nezan, di nivîsara yekem a vê kovarê da bal dikêşe ser metirsîya li ser zimanê kurdî û dîyar dike ku ji alîyê ve kurd ber bi bajarên mezin ve koç dikin û ji alîyê din ve dezgehên dewletên serdest li navçeyên kurdnişîn zêde dibin. Ev jî bi dîtina wî dê di paşerojê da metirsîyeke mezin li ser zimanê kurdî çê bike û eger weha biçe dê kurd hêdî hêdî ji zimanê xwe dûr bikevin. Ji gotinên serokê EKPyê

dîyar dibe ku di encama xebatên 60 salî yê dewletên neteweyî yê serdest da zimanê kurdî di hişê gelek kurdan da wek zimenekî paşdamayî û neşaristanî hatîye wênekirin, ji ber vê serokê EKPyê rexne li wê têgihîştina kurdên xwenda û bajarî digire ku axaftina kurdî wek tiştekî neşaristanî yan jî axaftina bi zimanên serdest wek çanda enternasyonel dibînin. Bi dîtina wî, ji ber vê karîgerîya nerênî, gelek kurdên şoreşgêr zarokên xwe hînî axaftina bi kurdî nakin û zarokên wan berê xwe didin zimanên din (1983: 7).

Ev gotin nîşan didin ku hokara sereke ya plandanîna zimanî ya vê dezgehê rûbirûbûna asîmîlasyona dewletên serdest e li ser civaka kurdî. Loma jî li hember vê dixwazin bi geşkirin û modernîzekirina zimanî hem propagandaya “neşaristanîbûna kurdî” ya van dewletan pûç bikin ku wek îmaj di hişên kurdan da hatîye çandin, hem jî ji alîyê paye û korpusê ve kurdî xurt bikin da ku bikare di gel pêşketinên demê bigunce. Ji ber vê serokê EKPyê bang li hemû kurdan dike ku ji bilî nivîsarên propagandaya siyâsî bi her sê zarên sereke yê kurdî (kurmancî, soranî, dimilî) nivîsarên xwe bişînin kovara wan, lewra ew li tevahîya mîrata neteweyî ya çanda kurdî xwedî derdikevin, xwe peyrewên ramanên Ehmedê Xanî û mîrata çandî ya rojname û kovarên mîna *Kurdistan*, *Rojî Kurd*, *Hetawî Kurd*, *Gelawêj* û *Hawarê* dibînin û dixwazin li ser rêbaza wan berdewamî bidin xebatên xwe (Kendal, 1983: 8).

Her di vê çarçoveyê da EKP di navbera 23-28ê Gulana 1983yê da 13 zimannas û nivîskarên kurdên Îraq, Îran û Tirkîyeyê li Parîsê dicivîne³⁹ û ev kes di vê maweyê da li ser alfabe, rênivîs û yekîtiya zarên kurdî dixebitin. Piştî civîna roja pêşî li gor her sê zaran sê komên xebatê yê kurmancî, soranî û dimilî tî avakirin û her kom du roj û nîv li ser kêşeyên zarê xwe dixebitin û roja dawî jî encam û raporên xebatên xwe gengeşe dikin. Dîyar e, hemû kêşeyên zimanî di vê civînê da nayên çareserkirin û ji bo vekolîn û çareserkirina kêşeyên din biryar tê girtin ku EKP bi kêmanî salê carekê pisporên zimanê kurdî kom bike da ku rojekê hemû zarên kurdî bi alfabeyeke standard û zimanekî “yekbûyî” bên nivîsîn. Di vê çarçoveyê da wek armanceke sereke tê dîyarkirin ku “zimanê yekbûyî” yê kurdî yê paşerojê dê bi gotinên hemû zaran bê dewlemendkirin da ku kurdên hemû navçeyên Kurdistanê bikarin ji hev fam bikin, hev

³⁹ Li gor ku tê bîra Reşo Zîlanî di vê civînê da Reşo Zîlan û Rojen Barnas nûnertîya kurmancî, Kemal Fuad û Îbrahîm Ehmed nûnertîya soranî û Malmîsanîj û Zulfî Selcan jî nûnertîya zazakî dikin (19. 09. 2022, bi rêya whatsappê).

binasin û nêzîktirî hev bibin, lewra EKP yekîtiya zimanî yekîtiya gel û welatî dide zanîn û vê yekê wek karekî neteweyî û pêwîst berbiçav dike (1983: 9). Ji ber çî ye nayê zanîn lê civînên weha di salên paşê da nayên girêdan û ev armanca stratejîk a ku hemû plandanerên zimanê kurdî yê sed sala 20ê dîkin bernameya xwe, ji aliyê EKPyê ve jî nayê cihbicihkirin. Em dikarin biryar û encamên civîna 1983ê û xebatên EKPyê yê heta sala 1987ê di bin sernavên xwarê da destnîşan bikin ku ji aliyê plandana korpuse ve girîng in.

4.1.1. Biryarên li ser Alfabeyê

Beşdarên civînê ji her sê alfabeyên ku kurd wê demê bi kar tînin (latînî, erebî, kirilî) ya herî guncaw alfabeya latînî didin zanîn û diyar dikin ku herçend mercên îro ne guncaw bin jî divê di paşerojê da kurdên Îraq û Îranê jî derbazî vê alfabeyê bibin, lewra baş dizanin ku di mercên wê serdemê da guherîna alfabeyê ji bo wan welatan wek daxwaza veqetînxwazîyê tê dîtin û bi tu awayî rê nadin ku kurdên van welatan derbazî alfabeya latînî bibin. Jixwe di wan salan da çapxane û dezgehên teknîkî yê bi tîpên latînî li Îraq û Îranê bi dest nakevin û bi awayekî kirdeyî mecala cihbicihkirina biryara bikaranîna alfabeya latînî ji bo kurdên van welatan ne pêkan e. Ji ber vê, endamên civînê heta pêkhatina alfabeyeke hevbeş pêşniyaz dikin ku pergaleke tekûz di nav alfabeya kurdî ya erebî da bê danîn da ku ziman bi yek cureyî û bi awayekî standard bê nivîsîn û berhemên sereke yê kurdên Îraq û Îranê û yê derveyê welatî bi tîpên latînî bên çapkirin da ku kurdên ku bi alfabeya erebî nikarin bixwînin bikarin ji wan sûd wergerin.

Di mijara alfabeya latînî da herçend pisporên kurdîya soranî behsa kêmbûna du dengên “l” û “r” yê stûr bikin (1983: 11) û hinekên din amaje bi tîpên Qanatê Kurdoyî yê mîna “ç, k, p, t” yê bikin jî di bin sernavê “Biryar”ê da ev pêşniyaz tîr redkirin û tenê di çend bêjeyan da bikaranîna “r” ya stûr wek (rr) yê tê pesendkirin. Bi vî awayî tê diyarkirin ku herçend “alfabeya Hawarê” bêtêmasî nebe jî dikare bi hin destkarîyên biçûk ji bo hemû zarên kurdî bê bikaranîn (1983: 15-16).

Ji aliyê din ve alfabeya latînî ya Celadet Bedirxanî li hember alfabeya Mac Carus û Tewfîq Wehbî baştir tê dîtin. Jixwe ev alfabeyên latînî yê alternatîf ji bilî çend pirtûkan nayên pratîzekirin û cihê xwe nagirin lê alfabeya *Hawarê* ji 1932yê û vir ve gelek belav dibe, cihê xwe digire û dibe alfabeya piraniya gelê kurd. Ji ber

van sedeman biryar tê dayîn ku ji bo nêzîkkirina zarên kurdî; ji niha ve dimilî bi alfabeya Celadet Bedirxanî bê nivîsîn û dema merc guncaw bûn bikarhênerên kurdîya soranî jî derbazî vê alfabeyê bibin. Herweha rexne li hin derûdoran tê girtin ku “î” û “î”ya kurdî herwek alfabeya tirkî dinivîsin û dibin sedema tevlihevîyê. Ji vî alîyî ve bang li hemû kurdan tê kirin ku di demekê da ku kurdên Sovyetê jî hêdî hêdî berê xwe didin alfabeya *Hawarê* nabe ku dubendî di vê alfabeyê da bê çêkirin û tiştên ku bi zor û zehmetî hatine avakirin divê bên parastin (1983: 16).

4.1.2. Biryarên li ser Rêzimanê

Biryar tê girtin ku “Rêzimana Kurmancî – Soranî” ya Qanatê Kurdoyî ji rûsî û rêzimana Celadet Bedirxan û Roger Lescotî jî ji fransî ji bo zimanê kurdî û zimanên din bên wergêran. Jixwe em ji têbînîya *Hêvîyê* fam dikin ku ji havîna 1983yê ve wan ev kar daye ber xwe (1983: 18). Ji bilî van planan li ser rêzimana kurdî tu xebateke taybetî ya EKPyê çê nabe. Ji van xebatên armanckirî jî tenê rêzimana Celadet Bedirxan û Roger Lescotî (Kürtçe Grameri) ji bo tirkî tê wergêran û di 1990ê da li Parîsê tê çapkirin. Ji bilî vê tu xebateke EKPyê li ser rêzimana kurdî çê nabe.

4.1.3. Biryarên li ser Ferhengsazîyê

Amadekirina ferhengê hem ji bo nêzîkkirina zarên zimanê kurdî hem jî ji bo bipêşvebirina zimanî gelek giring tê dîtin. Ji bo vê tê pêşnîyazkirin ku lîsteya ferhengên kurdî yên ku heta îro hatine çapkirin bê derxistin da ku kesên dixwazin li ser vê mijarê kar bikin ji wan sûd wergirin. Ji bilî vê biryar tê dayîn ku karê çapkirina *Ferhenga Kurdî - Fransîzî* ya Kamiran Bedirxanî bê lezandin da ku rêya danîna ferhengên kurdî û zimanên din ên bîyanî bê xweşkirin (1983: 17). Herweha di heman hejmara *Hêvîyê* da ji xwendevanên kurd arîkarî tê xwestin ku ji bo vê ferhengê, ji wan ra bêjeyan bişînin û ew jî di dewlemendkirina zimanê xwe da beşdarî bikin (1983: 24).

Ev ferheng 14 sal paşê tê temamkirin û Kendal Nezan di pêşgotina wê da dîyar dike ku herçend Kamiran Bedirxan bi qasî 25.000 bêjeyan berhev bike jî vê xebatê nîvco dibîne, loma jî dixwaze ferhenga wî bi bêjeyên ferhengên Qanatê Kurdo û Bakaevî û bi bêjeyên zarên soranî û dimilî bê dewlemendkirin da ku bibe ferhenga hemû zarên zimanê kurdî lê temenê wî têra cihbicihkirina vê armancê nake û ev xebat bi nîvcoyî jî nayê çapkirin (2017: XXXIX).

Ji ber vê ev ferheng li ser bingeha xebatên Koma Kurmancî û Koma Vateyê ku bi piştgirtîya EKPÿê tên avakirin, bi gelek bêjeyên nû tê dewlemendkirin û herî dawî bi keda xwendekara Kamiran Bedirxanî Joséfa Bertolino û serokê Enstîtuyê Kendal Nezanî digihîje 85 hezar bêjeyan û sala 2017ê tê çapkirin. Nezanî diyar dike ku ji bilî bêjeyên komên navborî di amadekirina vê ferhengê da ji ferhengên kurdîya soranî yên Tewfîq Wehbî, Şefîq Qezaz, Gîw Mukrîyanî û Hejar Mukrîyanî; ferhengên kurmancî yên mîna Yûsif Ziyaedîn Paşa, Musa Anter, D. Îzolî û Zana Farqînî û xebatên kurdnasên rûs jî sûd werdigirin (2017: XL). Em dikarin bibêjin ku çapkirina vê ferhengê yek ji xebatên herî mezin ên EKPÿê ye ku bi awayekî biserûber tê encamdan û digihîje armanca xwe.

4.1.4. Yekdestkirina Dariştina Bêjeyan

EKP ji hemû nivîskarên kurd tika dike ku tu kes di ber xwe da bêjeyên nû çê neke, lewra dariştina bi vî awayî ya bêpergal zarên kurdî ji hev dûr dixê û gelemşeyên navzimanî zêdetir dike. Ji ber vê pêşniyaz dike ku dema bêjeyek di zarekî da nebe divê ji zarên din bê wergirtin û eger di zarên din da jî neyê peydakirin divê ew kes wê bêjeyê ji EKPÿê ra bişînin û piştî ku bi nivîskar û zimannasan ra şewir bê kirin bêjeya hîlbijartî dê di kovarê da bê weşandin û ji bo hemû kurdên xwendewar bê pêşkêşkirin (1983: 18) da ku her kes bi yek awayî bi kar bîne. Mixabin ev pêşniyaza di cih da nayê peyrewkirin û salên paşê ev metirsî her ku diçe zêdetir dibe û gelek kes û derdor bê pirs û rawêj di ber xwe da bêjeyan çê dikin û tu dezgeh jî nikare rêgirî li vî karî bike. Bi kurtî hizira yekdestkirina dariştina bêjeyan a EKPÿê gelek di cih da be jî ji bo vê pêşniyaza xwe tu destpêşxerîyekê nake yan jî wê desthilatê di xwe da nabîne ku bikare karekî weha bike.

4.1.5. Rêbaza Yekxistina Zimanî ya EKPÿê

Serokê EKPÿê her di nivîsara xwe ya yekem a *Hêvîyê* da yekxistina zimanê kurdî wek armanc destnîşan dike (Kendal, 1983: 8) û diyar dike ku bi vê armancê EKP jî sala pêşî ya damezirandina xwe ve zana û pisporên hemû zarên kurdî dicivîne û li ser rê û rêbazên vê armancê dikeve nav lêgerînê. Ji biryarên civîna yekem derdikeve ku beşdarên civînê vê armancê wek pêvajoyekê dibînin û yekxistinê bi biryareke yekcarî pêkan nabînin. Ji ber vê di şûna “yekbûn” û “yekîti”yê da behsa “nêzîkkirin”ê dikin û biryar didin ku bi mebesta nêzîkkirina zarên kurdî pêşî dewlemendîyên her

zarekî bi başî bê nasîn, di dema herî zû da gotinên hemû zar û devokên kurdî bîn komkirin û li ser bingeha ferhengên devokî û zarî zemîna ferhenga giştî ya zimanê kurdî bê pêkanîn. Di vê çarçoveyê da EKP bang li zimannas û zanayên kurd dike ku ji bo pêkanîna van armancan dest bi xebatê bikin (1983: 17). Em dikarin bibêjin ku di salên paşê da Koma Kurmancî ji bo kurmancî û Koma Vateyê ji bo zazakî li ser vê bingehe ji aliyê EKPyê ve tên avakirin ku heta niha jî di heman çarçoveyê da kar dikin.

4.1.6. Bîr û rayên Kesî li ser Plandanîna Zimanê Kurdî di *Hêvîyê* da

Bêguman ji bilî van biryarên komî yên EKPyê hin nivîskar li ser plandanîna zimanî bîr û rayên xwe yên kesî jî di kovara EKPyê da diweşînin. Di hejmara pêşî ya *Hêvîyê* da Osman Sebrî û Nûredîn Zaza wek du nûnerên xwendengeha Hawarê, li ser van mijaran dinivîsin. Osman Sebrî dîyar dike ku berî ku Celadet Bedirxan alfabeya xwe biweşîne bi wî û çend kesên din ra dişêwire û Osman Sebrî wê demê jî nebûna dengên “ç, k, p, t”yên şidandî wek kêmasî dibîne lê wê demê kes piştgirî nade wî û ew jî ji bo pêşniyazên xwe bixêrî bi navê *Elifbêya Tikûz* berhemekê dinivîse. Tevî vê jî bo nebe sedema tevlihevîyê dîsa li ser şopa alfabeya Celadet Bedirxanî dinivîse. Lê bi destbikarbûna EKPyê vê pêşniyaza xwe careke din tîne rojevê (Sebrî, 1983: 19-20). Ji biryarên jorîn derdikeve ku ev pêşniyaza wî dîsa nayê pesendkirin û normên alfabeya Celadet Bedirxanî tên parastin.

Nûredîn Zazayê ku di *Hawarê* da bi îmzeya Nûredîn Êsîfî dinivîse, bê destkarî piştgirî dide alfabeya Celadet Bedirxanî û herwek bixwaze bersiva pisporên kurdên başûrî bide, dîyar dike ku wê demê jî Celadet Bedirxanî zanîye ku di zarên din da “r” û “l”yên stûr hene lê ji ber ku alfabe giran nebe bi zanîn ev deng nîşan nedane. Li aliyê din jî bo ku nerîteke zimanî çê bibe û nîfşên îro bibînin bê zimanê edebî çawa tê bikaranîn pêşniyaz dike ku EKP nivîsarên Celadet Bedirxan, Kamiran Bedirxan, Osman Sebrî, Qedrî Can û Nûredîn Êsîfî yên serdema *Hawarê* jî nû ve çap bike. Ji bilî van mijaran li ser yekkirina zarên kurdî dîyar dike ku ev ne karekî hêsan e û pêşniyaz dike ku li cihekî mîna EKPyê divê di gel kurmancî, soranî jî bê xwendin (Zaza, 1983: 21) da ku hevnasîna kurdan xurtir bibe û zemînesazîya hevgirtinê bê çêkirin.

Reşîd Simo bal dikêşe ser têkçûna normên pergala zimanî ya kurdî di hin nivîsarên weşanên kurdên Ewropayê da ku bi raya wî “mejîyên xwedîyên van nivîsaran di bin karîgerîya perwerdeya zimanên bîyanî da hatiye şûştin” û bê ku haya

wan jê hebe sîstema zimanê kurdî xirab dikin. Bikaranîna gotin û zaraveyên çêkirî yên bêbingeh û bêbinyad bi vê yekê ve girê dide û ji bo çareserkirina vê kêşeyê pêşnîyaz dike ku ev kes pêşî bi kurdî bifikirin û paşê binivîsin. Ji bilî vê, rexne li destkarîya alfabeya Celadet Bedîrxanî ya hin weşanan digire ku bi raya wî ev kes bi vê kiryara xwe bingeha alfabeyeke pêncî salî û yekîtîya neteweyî hildiweşînin (1983: 23).

Rojen Barnas li ser rênivîsa zimanê kurdî radiweste û di vê mijarê da behsa sê rêbazan dike ku ew jî bi dîtina wî rêçika Hawarê, Kurdên Sovyetê û kurdên bêalî ne ku koma dawî bixwe jî wek hev nanivîsin. Di nav rêbaza Hawarê da li ser nivîsîna gireyên erênî û nerênî yên lêkeran hûr dibe û diyar dike ku piştî mirina Celadet Bedîrxanî li dor vê mijarê du rêçik peyda dibin ku Kamiran Bedîrxan rêyek dide ber xwe û Osman Sebrî û Nûredîn Zaza jî rêyeke din (1983: 25). Di vê mijarê da alîgirîya rêçika Osman Sebrî û Nûredîn Zazayî dike, lewra bi dîtina wî eger “bi”ya erênî bi lêkeran ve bê nivîsîn divê “ne, na, ni, me”yên nerênî jî pêve bîn nivîsîn (1983: 28). Diyar e, ev pêşnîyaza wî tê pejirandin û di hemû weşanên EKPyê da êdî ev gire bi lêkeran ve tîn nivîsîn û di rêbaza rênivîsa Hawarê da çaksazîyekê tê kirin.

Ferhad Şakelî di hejmara duyem da li ser pêwîstîya zimanekî edebî yê yekgirtî bîr û boçûnên xwe derdibire û diyar dike ku zimanê kurdî heta niha bûye yek ji hokarên giring ên parastina gelê kurd lê ji vir û pê da ji bo pêşvebirina çanda kurdî pêwîstîya wan bi zimanekî edebî yê yekgirtî yanî bi zimanekî standard heye. Ji ber vê pêwîst dibîne ku li ser vê mijarê gelek vekolîn bîn kirin, ronakbîr û nivîskarên kurd li ser vê mijarê bifikirin û çareyekê jê ra bibînin (1984: 30). Şakelî, ji aliyê xwe ve çend hokarên dirokî yên peydanebûna zimanê kurdî yê yekgirtî destnîşan dike ku di roja îro da jî wek asteng derdikevin pêş. Li gor wî, parçebûna Kurdistanê di nav çend welatan da, rola nerênî ya gelên cîran û dînî, nebûna dezgehên çandî, nebûna planeke yekgirtî ya zimanî, bikaranîna sê alfabeyan (erebî, latînî, kirîlî), gîyanê navçegerîyê, xemsarîya ronakbîr û zimannasên kurd wek sedemên vê diyardeyê derdikevin pêş (1984: 32) û ji ber van sedemên dirokî û xemsarîya berdewam a kurdan, xwendewar û ronakbîrên kurd ên li Ewropayê bi awayekî pêwîst guhê xwe nadin zimanê kurdî, giringîya ku didin hînbûna zimanê bîyanî nadin hînbûna zarekî din ê kurdî yan jî ji bo xwendina deqên kurdî bi alfabeyeke din xwe naêşînin (1984: 34). Hêjayê gotinê ye nivîskar tevî ku kurdekî soranîaxêv e jî bi kurmancîyeke rêkûpêk dinivîse û bi awayekî kirdeyî dixwaze ji bo kurdên din bibe mînak.

4.1.7. Destnîşankirina Pêwîstîya Weşanên Nû

EKP di destpêkê da derxistina kovareke çandî ya giştî dixwe û dixwaze di gel nivîsarên zanistî yên li ser ziman, edebîyat, dîrok û sosyolojîyê cih bide afirandinên nivîskarên kurd jî. Ev kovar dê salê du hejmaran derkeve û her hejmar dora 120-160 rûpelî be û tê da nivîsarên her sê zarên kurdî (kurmancî, soranî û dimilî) hebin. Hêjayê gotinê ye *Hêvî/Hîwa* di vê çarçoveyê da derdikeve ku bi tevahî 8 hejmar jê derdikevin (1983: 17-18). Lê ji bilî *Hêvî/Hîwayê* ji bo belavkirina xwendin û nivîsîna kurdî di nav karkerên kurd ên li Ewropayê da, di bernameya xwe da cih didin wê yekê ku di paşerojê da eger derfet çê bibin kovareke din a bi reng û wêne derxin (1983: 18).

Salên paşê EKP çend weşanên din ên giring jî diweşîne. Di vê çarçoveyê da ji bo nasandina kurdan bi cîhana derve bi zimanên erebî, farisî, tirkî û fransî kovara *Studia Kurdicayê* derdixwe ku heta sala 2000ê 8 hejmarên wê tên weşandin. Piştî vê, *Etudes Kurdes* wek kovareke şeş mehî şûna vê kovarê digire û bi zimanê fransî li ser mijarên dîrok, ziman, edebîyat, civaknasî, çand û siyasetê weşanê dike (Lêkolîn-Weşangerî-Weşan, 2022). Bêguman weşana herî giring a EKPyê di warê plandanîna zimanî da kovara *Kurmancîyê* ye ku ji 1987ê heta niha her şeş mehan carekê derdikeve.

4.1.8. Hewldana Pêkanîna Pirtûkxane û Arşîveke Neteweyî

Bêguman ji bo plandanîna zimanî berhevkirina berhemên nivîskî û tomarkirî gelek giring in. EKP di vê çarçoveyê da dixwaze hîmê “Pirtûkxaneya Neteweyî ya Kurdistanê” daîne û ji ber vê jî di bin sernavê “Kitêbxana Enstîtuyê” da bal dikêşe ser vê mijarê û dîyar dike ku di şeş mehên xwe yên pêşî da bi 25 zimanan dora 2400 pirtûkan berhev dikin ku hin ji wan gelek kevin in û di sedsalên 18 û 19ê da hatine çapkirin û hinekên din jî destnivîs in. Herweha tê dîyarkirin ku koleksiyonên *Hawar*, *Ronahî*, *Roja Nû*, *Stêr* û *Kurdistana* ku li Îranê derketîye, hatine temamkirin û dest bi berhevkirina kovarên din jî hatîye kirin. EKP ne tenê van çavkanîyên edebî û zimanî, belgeyên arşîvên dîplomatîk, film, wêne, diapozîtîf, kaset û sêlikên kurdî jî dicivîne û di şeş mehên pêşî da 1800 diapozîtîf, 20 film û bi qasî 75 saetan jî mûzîka kurdî kom dike.

Ji zanyariyên *Hêvîyê* tê famkirin ku ev xebat wek destpêk tên dîtin û tê dîyarkirin ku dê ji vir û pê da li ser ziman, dîrok û çanda kurdî her çî hebin kom bikin

da ku kurd bikarin bi rêya van berheman dewlemendîya çanda xwe dîyar bikin, binasin û bi dinyayê binasînin. EKP vî karî wek karekî neteweyî yê her kurdekî dide zanîn û ji hemû kurdên welatparêz dixwaze ku bidin ser şopa pirtûk, kovar, film, wêne, kaset û belgeyên li ser kurdan û wan ji EKPyê ra bişînin. Herweha tê xwestin ku kurdên xîretkêş û dilsoz guhên xwe bidin dengbêj û çîrokbêjan, stran û çîrokên wan tomar bikin û ji wan ra bişînin, lewra vê ji bo parastina folklora kurdan û rizgarkirina wan ji mirinê karekî gelek pêwîst û bilez dibînin (1983: 38). Ji vî alîyî ve xebatên EKPyê gelek dişibin KZKyê û bi rêya vê dezgehê gelek çavkanîyên zimanê kurdî bi taybetî bi zarê kurmancî tên tomarkirin û arşîveke baş tê pêkanîn.

Li ser vê bingehe di salên paşê da ev pirtûkxane her ku diçe dewlemendtir dibe û beşeke wê ya giring tê dijîtalîzekirin. Li gor zanyarîyên li ser malpera EKPyê, pirtûkxaneya wan pirtûkxaneya kurdî ya herî giring a cîhana rojavayî ye ku bi 25 zimanan ji 10.000 pirtûkan, bi deh hezaran dokumanên nivîskî, berhevokên kovar û rojnameyan, wêne, vîdeo, postkart, afîş û arşîvên dengî û muzîkê yên li ser kurdan pêk tê (Bibliothèque, 2022).

4.2. JI 1987Ê HETA 2021Ê XEBATÊN KOMA KURMANCÎ YA ENSTÎTUYA KURDÎ YA PARÎSÊ LI SER PLANDANÎNA ZIMANÊ KURDÎ

Mirov dikare bibêje ku bîrokeya avakirina Koma Kurmancî di civîna yekem a 1983yê da peyda dibe lê ragihandin û destbikarbûna vê komê piştî vexwandina Hikumeta Xwecihî ya Katalonyayê û pêşniyaza wan a arîkarîya xebatên çandî ji bo kurdan û EKPyê dikeve warê cihbicihkirinê. Ji ber vê her du civînên wan ên pêşî li Barselonaya paytexta Katalonyayê tê kirin û piştî vê her şeş mehan carekê Koma Kurmancî li cihekî kom dibe û encamên civînên xwe jî di kovara *Kurmancîyê* da belav dîkin ku heta roja îro jî berdewam e.

Koma Kurmancî di çarçoveya riwangeha giştî ya EKPyê da ji ber rewşa giştî ya kurdan û bi taybetî jî kurdên Tirkîyeyê di plandanîna xwe ya zimanî da rêza pêşî dide rêgirîkirina polîtîkayên bişaftinê yên li ser kurdan û zimanê kurdî. Ev helwest di nivîsara yekem a *Kurmancîyê* da bi aşkerayî derdikeve holê. Di vê nivîsara manîfestoyî da ji bo pûçkirina dezanformasyona biçûkxistina zimanê kurdî di serî da behsa dewlemendî û dîroka zimanê kurdî tê kirin ku berî gelek zimanên zindî yên îro

“di sedsala XIV û XVê⁴⁰ da dibe zimanekî edebî û di hinek warên mîna ajeldarîyê da ji fransî û îngilîzî jî dewlemendtir e”. Ev manîfestoya ku di bin navê “Nûkirina Kurmancî” da tê weşandin, xebatên 1930-1940an ên Celadet Bedirxan û Kamiran Bedirxanî giring û hêja dibîne û li ser vê mîratê pêşvebirin û kûrkirina xebatên li ser zimanê kurdî wek kêşeya jîyanî ya roja îro dide zanîn.

Bi riwangeha “nûkirin û dewlemendkirina kurmancî” di nivîsara manîfestoyî ya hejmara yekem a *Kurmancîyê* da tê ragihandin ku EKP dê salê du caran û her carê di maweya hefteyekê da nivîskar, zimannas û rojnamevanên kurmanc ên ji hemû navçeyên Kurdistanê bicivîne û dê di her civînekê da li ser zaravesazî û şaxeke zimanê kurdî bixebitin. Di vê çarçoveyê da bang li hemû kurdan tê kirin ku li ser vê mijarê bi pîrs û pêşnîyazên xwe arîkarîya vê xebatê bikin, bi çavekî neteweyî li kêşeya zimanî temaşe bikin û bi hev ra “kurmancîya şîrîn” ji metirsî û dorpêçê rizgar bikin (Kurmancî, 1987: 3).

Li ser armanc û xebatên Koma Kurmancî serokê EKPyê Kendal Nezan bi boneya çapkirina her çil hejmarên pêşî yê *Kurmancîyê* diyar dike ku kêş û mijara sereke ya ronakbîr û zimanhezên kurdî çawanîya parastina dewlemendîya zimanê kurdî, veguheştina wê ji bo nîfşên nû, dabînkirina têgihîştina hevbeş a zimanî di nav axiverên devokan da û dewlemendkirin û guncandina kurdî ye ji bo derbirîna meremên kurdên hevçerx ên sedsala 21ê. Bi raya wî, ev yek herçend karê akademîyên zimanî yê dewletan bin jî Koma Kurmancî ji bo bersivdana van pîrsan dest bi kar kirîye û dixwaze vê valahîyê dagire (2009: V). Nexwe bi raya serokê EKPyê, Koma Kurmancî ji bo kodkirin û modernîzekirina zarê kurmancî hatiye avakirin ku pêwîstîya kurdan pê heye.

4.2.1. Beşdarên Koma Kurmancî

Ji kovar û rojnamayên Stenbolê heta *Hawarê* û ji wir jî heta Koma Kurmancî plandanerên zimanê kurdî ji wan ronakbîran pêk tên ku ji alîyekî ve di nav xebatên civakî û siyasî da ne ji alîyekî din ve jî ji bo pêşvebirina çanda kurdî kar dikin. Di vê çarçoveyê da piranîya endamên Koma Kurmancî di eslê xwe da çalakgerên siyasî ne ku di salên 1960-1970an da dest bi xebatên siyasî dikin û ji ber guvaşên siyasî welatê

⁴⁰ Li gor zanyariyên berdest ji bo edebîyata kurdî ya kurmancî ev dirok ne rast e, belkî di sedsala XVIyê da bingeha edebîyata kurdî tê danîn.

xwe bi cih dihêlin û berê xwe didin xerîbîyê. Ev ruhê têkoşer û romantîk di nivîsara pêşî ya *Kurmancîyê* da jî xwe dide der ku li ser navê endamên komê bi van gotinên jêr parastina zimanê kurdî wek cengawerîyeke zimanî û berpirsyarîyeke neteweyî tê destnîşankirin:

Welatparêzên xwedî berpirsiyar, nemaze xwenda û ronakbîr, li ber sernivîşt û qederê serî natewînin, wekî berxên sernerm li hêviya kêra qesab namînin. Parastina zimanê pêşiyên me bingehe evîna welêt e, rehê jindarî yê welatparêziyê ye. Lewra divê ku her Kurdê welatparêz li gora karî û zanîna xwe beşdarî vî şerê parastin û nûkirina kurmacî bibe (Kurmacî, 1987: 3).

Akin vê helwestê bi berdewamîya xebata sîyasî van kesan ve girê dide ku li derveyê welatî vediguhere xebata parastina zimanê kurdî. Lewra ev kes li welatê xwe nikarin ji aliyê sîyasî ve bigihîjin armanca xwe û herwek nîşên Hawarê hewl didin bi xebatên weha zimanê xwe ji mirinê rizgar bikin, li mercên jîyana modern biguncînin û birîna xwe ya derûnî bi vî awayî bipêçin û derman bikin (2013: 132-133).

Ji bilî her du hejmarên pêşî di serê her hejmarekê da nav û paşnav û bajarê/devera beşdarên civînan Koma Kurmacî tê destnîşankirin û bi saya vê em dizanin kî, kengê û çend caran beşdarî van civînan bûye û nûnerê kîjan devokê ye. Li gor vê, ji 1987ê heta 2021ê di encama 65 civînan da bi tevahî 97 kes beşdarî van xebatan bibin jî hemû ne endamên hertimî yê vê komê ne. Lewra ji nav van 97 kesan; 43 kes tenê carekê beşdar dibin, 12 kes du caran, 4 kes sê caran, 3 kes çar caran, 4 kes pênc caran, 1 kes şeş caran, 2 kes heft caran, 2 kes heşt caran, 1 kes 9 caran û yê ku ji 10 caran heta 65 caran jî beşdar dibin bi tevahî 25 kes in. Li ser vê em dikarin bibêjin ku hejmara endamên hertimî yê Koma Kurmacî di navbera deh û bist kesî da ne⁴¹. Ji bilî vê herçend nehatibe ragihandin jî Reşo Zilan wek rêxer û serokê vê komê rol digêre û tekane kes e ku ji serî heta dawîyê bê navber di van civînan da beşdarî kirîye û ev kar rêk xistîye.

⁴¹ Akin di xebateke xwe da ku di 2013ê da hatiye weşandin behsa 16 endamên berdewam ên Koma Kurmacî dike (2013: 132) û Selda Araz jî di teza xwe ya doktorayê da 11 endamên hertimî, 11 endamên kevin û 17 endamên demdemî destnîşan dike (2020: 5) lê ji ber ku endamên nû li komê zêde dibin û hinek jî piştî demekê ji ber sedemên cîyawaz nikarin beşdar bibin mirov nikare hejmareke temam destnîşan bike.

Lîsteya beşdaran, navên bajar yan jî navçeyên wan û rêza civînên ku beşdar bûne, weha ne:

1. **Reşo Zîlan** (Agirî): 1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 9, 10, 11, 12, 13, 14-15, 16, 17, 18, 19, 20, 21, 22, 23, 24, 25, 26, 27, 28, 29, 30, 31, 32, 33, 34, 35, 36, 37, 38, 39, 40, 41, 42, 43, 44, 45, 46, 47, 48, 49, 50, 51, 52, 53, 54, 55, 56, 57, 58, 59, 60, 61, 62, 63, 64, 65, 66: **65**

2. **Zinar Soran** (Mêrdîn/Dêrik): 7, 8, 9, 10, 11, 13, 14-15, 16, 17, 18, 19, 20, 21, 22, 23, 24, 25, 26, 27, 29, 30, 31, 32, 33, 34, 35, 36, 37, 38, 39, 40, 42, 43, 44, 45, 47, 49, 53, 54, 55, 57, 58, 59, 60, 61, 62, 63, 64, 65, 66: **50**

3. **Elî Şêr/Elîşêr** (Wan): 9, 10, 11, 12, 13, 14-15, 17, 18, 20, 21, 22, 23, 24, 25, 26, 27, 29, 30, 31, 32, 33, 34, 35, 36, 38, 39, 40, 41, 42, 43, 44, 45, 46, 47, 49, 50, 51, 52, 53, 54, 55, 56, 57, 58, 59, 61, 62, 63, 64: **49**

4. **Mistefa/Mustafa Aydogan** (Mêrdîn/Qiziltepe): 17, 18, 19, 20, 21, 22, 23, 24, 25, 27, 28, 29, 30, 31, 32, 33, 34, 35, 36, 37, 38, 39, 40, 41, 42, 43, 44, 45, 46, 47, 48, 49, 50, 51, 52, 53, 54, 55, 56, 57, 58, 59, 60, 61, 62, 63, 64, 65, 66: **49**

5. **Hemîd Kılıçaslan/Kiliçaslan** (Mêrdîn): 8, 9, 10, 11, 12, 13, 14-15, 16, 17, 18, 19, 20, 21, 22, 23, 24, 25, 26, 27, 31, 32, 33, 34, 35, 36, 37, 38, 40, 48, 50, 51, 52, 53, 54, 55, 56, 58, 59, 60, 61, 62, 63, 64, 65: **44**

6. **Têmûrê Xelîl** (Rewan): 14-15, 23, 24, 29, 30, 31, 32, 33, 34, 35, 36, 37, 38, 39, 40, 41, 42, 43, 44, 45, 46, 47, 48, 49, 50, 51, 52, 53, 55, 56, 57, 58, 59, 60, 61, 63, 64, 65, 66: **39**

7. **Emîn Narozi** (Batman): 25, 26, 27, 28, 29, 30, 31, 32, 33, 34, 35, 36, 37, 38, 39, 40, 41, 43, 44, 45, 46, 47, 49, 52, 54, 55, 56, 57, 58, 59, 60, 61, 62, 63, 64, 65, 66: **38**

8. **Selam Nouman/Nûman** (Cizîre/Qamîşlo): 20, 21, 22, 23, 24, 25, 26, 27, 29, 30, 31, 33, 34, 35, 37, 38, 40, 41, 42, 43, 44, 45, 46, 47, 49, 50, 51, 52, 53, 54, 59, 60, 61, 63, 65, 66: **36**

9. **K. Nezan/Kendal Nezan** (Diyarbakir): 1, 2, 3, 5, 6, 7, 8, 9, 10, 11, 12, 13, 16, 17, 18, 19, 20, 21, 22, 23, 24, 25, 26, 27, 28, 29, 30, 31, 32, 34, 37, 38, 40: **33**

10. **Lutfî Baksî/Lutfî Baksı** (Batman/Xerzan): 3, 5, 6, 7, 9, 10, 11, 12, 13, 14-15, 16, 17, 18, 19, 20, 21, 22, 23, 24, 25, 27, 29, 30, 31, 32, 33, 34, 35, 36, 37, 38, 39, 40: **33**

11. **Rojen Barnas** (Diyarbakir): 1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 9, 10, 11, 12, 13, 16, 17, 18, 19, 20, 21, 22, 23, 24, 40, 48, 49, 50, 51, 53, 55, 56, 59: **31**
12. **Mehmûd/Mahmûd Lewendî** (Siwêrek/Qerejdax): 11, 12, 13, 16, 19, 20, 21, 22, 23, 24, 25, 26, 28, 29, 35, 38, 39, 40, 41, 47, 53, 54, 55, 56, 57, 58, 59, 62, 63, 65, 66: **31**
13. **Newzad Şukrî/Newzad Hirorî** (Duhok): 23, 24, 25, 26, 29, 30, 31, 32, 33, 34, 37, 40, 41, 44, 46, 48, 49, 52, 54, 55, 56, 57, 59, 60, 61, 62, 63, 65, 66: **29**
14. **Khosrow Abdollahî** (Selmas): 1, 2, 3, 4, 5, 7, 8, 10, 11, 14-15, 16, 18, 21, 22, 24, 25, 27, 35, 37, 47, 53, 65: **22**
15. **Hazim Kiliç/Kılıç-Rojan Hazim** (Hekarî): 5, 6, 7, 8, 13, 14-15, 16, 17, 18, 19, 20, 22, 23, 25, 26, 27, 28, 29, 30, 31, 32, 33: **22**
16. **Behroz/Behrûz Sucaî/Şucaî** (Şikak/Kotol): 20, 21, 23, 24, 25, 26, 27, 28, 29, 30, 31, 33, 34, 36, 38, 39, 40, 41, 44, 66: **20**
17. **Cemal Onursal/Newzad Cemal Onursal** (Cizîr): 27, 28, 29, 30, 31, 32, 33, 34, 35, 36, 37, 38, 39, 40, 41, 44, 45, 48: **18**
18. **Veysî Zeydanlî** (Bedlîs): 7, 9, 10, 11, 12, 13, 16, 17, 18, 19, 20, 21, 22, 23, 24, 25: **16**
19. **Zeynelabdîn Zinar** (Batman/Xerzan): 7, 8, 9, 11, 12, 13, 14-15, 16, 17, 18, 19, 20, 21, 40: **14**
20. **Mehmed Uzun** (Siwêrek): 1, 2, 5, 6, 7, 8, 9, 10, 11, 12, 13: **11**
21. **Michael L. Chayet** (Washington): 22, 23, 24, 25, 26, 27, 29, 34, 59, 61, 66: **11**
22. **Lezgînê Çalî** (Barzan): 48, 50, 51, 52, 54, 55, 58, 62, 63, 65, 66: **11**
23. **Mûsa Kaval /Musa Kaval** (Hekarî): 1, 2, 3, 4, 5, 6, 8, 16, 17, 20: **10**
24. **Muzefer Begzade** (Şikakan): 4, 8, 9, 10, 11, 12, 13, 16, 17, 18: **10**
25. **Rênas Awdal** (Zaxo): 55, 56, 57, 58, 59, 60, 61, 62, 63, 65: **10**
26. **Eyûb Kiran** (Qerejdax): 48, 50, 52, 54, 58, 60, 62, 64, 65: **9**
27. **Ehmedê Dirihî** (Çewlig): 38, 40, 48, 50, 52, 54, 58, 60: **8**
28. **Omîdê Mistefayê Celalî** (Bazîd): 50, 52, 54, 58, 62, 64, 65, 66: **8**
29. **Mahmûd Baksî/Mehmûd Baksî** (Xerzan): 1, 2, 6, 7, 8, 10, 11: **7**
30. **Fadil Omer** (Duhok): 38, 40, 58, 60, 62, 65, 66: **7**
31. **Memo Yetkîn** (Semsûr): 1, 2, 3, 5, 23, 24: **6**

- 6: 5
32. **Hiner Salim/Huner Salem/Huner Salim** (Behdînan/Akrê): 1, 2, 3, 5,
33. **Derwêş Ferho/Derwêş M. Ferho** (Mêrdîn/Tor): 1, 2, 3, 4, 5: 5
34. **Salih Akin** (Xerzan): 32, 37, 42, 47, 48: 5
35. **Îsmâil Şahîn** (Sêmêl): 54, 58, 60, 62, 65: 5
36. **Abdullah Emin/Emîn Bêtasî** (Behdînan): 17, 18, 20, 21: 4
37. **Salim Çeliker** (Diyarbakir): 19, 20, 21, 22: 4
38. **Rûken Keskîn/Rûken Bagdu-Keskîn** (Stenbol): 34, 38, 40, 48: 4
39. **Xelîl Dihokî** (Duhok): 4, 5, 6: 3
40. **Huseyin Kurdo** (Amûd): 8, 9, 10: 3
41. **Samî Ergoşî** (Barzan): 32, 38, 40: 3
42. **Xalidê Hekarî** (Hekarî): 48, 50, 52: 3
43. **Ferhad Şakelî** (Kerkûk): 1, 2: 2
44. **Mustafa Düzgün** (Dersim): 4, 5: 2
45. **S. Rêwing** (Sêrt): 4, 5: 2
46. **Firat Cewerî** (Mardîn/Nisêbîn): 5, 7: 2
47. **Joyce Blau** (Fransa): 7, 26: 2
48. **Husên Binavî/Bênâvî** (Berwerîbala): 25, 26: 2
49. **Enwer Osman** (Hewlêr/Zanîngeha Selahedîn): 38, 40: 2
50. **Edîp Polat** (Diyarbakir): 38, 40: 2
51. **José Bertolino** (Paris): 40, 41: 2
52. **Rojda Azîzoglu** (Diyarbakir): 47, 49: 2
53. **Mehdî Jaferzadeh** (Xorasan): 62, 66: 2
54. **Ebdilwehab Mûsa** (Berwarî): 62, 65: 2
55. **Moayed Ahmed** (Behdînan): 3: 1
56. **Kazim Baba** (Dêrsim): 3: 1
57. **Egîd Dijwar** (Bişêrî): 3: 1
58. **Evdo** (Nûçegihanê Kurdistan Pressê): 3: 1
59. **D. Îzolî** (Dêrsim): 2, 3: 2
60. **Şahîn B. Soreklî** (Koban): 3: 1
61. **Yücel Yeşilgöz** (Dêrsim): 3: 1
62. **Huseyin Sado** (Hesîçe): 4: 1

63. **Asî Rebatî** (Sulêmanî): 5: 1
64. **Cemal Batu** (Mêrdîn): 6: 1
65. **Nûra Cewarî** (Rewan): 7: 1
66. **Cemal Batun** (Mêrdîn): 7: 1
67. **Remzî Kerîm** (Sêrt): 7: 1
68. **Mihemed Siddîq Îmamî** (Behdînan): 11: 1
69. **Mehmed Tanrîkulu** (Diyarbakir): 11: 1
70. **Zinarê Xamo** (Wêranşar): 11: 1
71. **Ferhad Pîrbal** (Hewlêr): 13: 1
72. **Ordixanê Celîl** (St. Petersbûrg): 14-15: 1
73. **Seyîd Ebdulsetar Hemîd Çemseydî** (Berwarîbala): 32: 1
74. **Dr. Emîn Ebdo** (Şengal): 32: 1
75. **Doktorant Cewher Fetah Seîd** (Hewlêr): 32: 1
76. **Dr. Enwer Osman** (Silêmanî): 32: 1
77. **Dr. Selîm Îsmâîl Şehbaz** (Duhok): 32: 1
78. **Mueyîd Teyîb** (Duhok): 32: 1
79. **Evîn Yalçîn** (Diyarbakir): 34: 1
80. **Ebdulsettar Fettah** (Duhok): 38: 1
81. **Cewher F. Seîd** (Hewlêr): 38: 1
82. **Veli Kasimoğlu** (Pîran): 38: 1
83. **Enwer Mihemed Tahir** (Hewlêr): 38: 1
84. **Îbrahîm Seydo Aydogan** (Mêrdîn): 40: 1
85. **Ebdulsetar Hemîd Berwarî** (Duhok): 40: 1
86. **Letîf Nêrwey** (Nêrwey): 40: 1
87. **Cewher Fetah Seîd** (Zanîngeha Selahedînê): 40: 1
88. **Veysî Barak** (Diyarbakir): 47: 1
89. **Yakup Karademir** (Mêrdîn): 47: 1
90. **Kadri Yildirim** (Mêrdîn): 52: 1
91. **Abdunnasir Yildiz** (Mêrdîn): 52: 1
92. **Reşadê Batûyî** (Cizîr): 54: 1
93. **Sidîq Degirmen** (Licê): 54: 1
94. **M. Selîm Gökçen** (Xurs): 54: 1

95. Dr. Farûq Îsmâîl (Qamişlo): 54: 1

96. Sidqî Hirorî (Duhok): 55: 1

97. Engîn Opengîn (Şemdînan): 63: 1

Dema mirov li vê listeyê dinêre beşdar xwedî kar û pişeyên curbicur in ku di nav wan da zimannas, akademîsyen, mamosta, doktor, nivîskar, romannûs, helbestvan, wergêr, derhêner û kesên xanenişîn hene û piranîya wan şarezayê çend zimanên zindî ne. Herçend di serî da di nav endamên komê da pisporên zimannasîyê nebin jî paşê çend kes ji derfetên jîyana Ewropayê sûd werdigirin û di bin karîgerîya xebatên komê da beşên zimannasîyê dixwînin û ji bilî vê bi demê ra hin kesayetîyên zimannas û şareza jî car bi car tevli komê dibin. Tevî vê paşxaneyê wan jî em dikarin bibêjin ku piranîya endamên Koma Kurmancî ne xwedî pisporîyeke hûr a zanistî ne û xebatên zimanî di çarçoveya xîreteke neteweyî da dikin. Ev yek, ji anketa Selda Arazê jî derdikeve ku dema ji 11 endamên hertimî yên Koma Kurmancî pirsyara “warê pisporîya” tê kirin, piranîya wan yan xwe nûnerê devoka xwe didin zanîn yan jî her tiştê kurmancî wek warê xebata xwe destnîşan dikin (2020: 340-399).

Bêguman piştî dîyarkirina navên beşdaran, destnîşankirina navên bajar û deverên wan jî ji bo hêza nûnertîya komê giring e û bi vê hatîye xwestin ku nîşan bidin nûnerên her devereke kurmancîaxêv tevî vê xebatê bûye. Dema em berê xwe bidin bajar û navçeyên beşdaran em dibînin ku ji bajar û deverên kurdî yên li Tirkîyeyê nûnerên Dîyarbekir (Farqîn, Licê, Pîran, Qerejdax), Mêrdîn (Qiziltepe, Dêrik, Xurs), Batman, Hekarî, Şemzînan, Agirî, Bazîd, Wan, Bedlîs, Cizîr, Siwêrek, Semsûr, Sêrt, Wêranşar, Dêrsim û Çewligê; ji Herêma Kurdistanê Îraqê nûnerên Behdînan (Duhok, Zaxo, Barzan, Sêmêl, Akrê, Berwarî), Şengal, Kerkûk, Hewlêr û Silêmanîyê⁴²; ji bajar û deverên kurdî yên Îranê nûnerên Şikak, Selmas, Kotol û Xorasanê; ji bajarên kurdî yên Suriyeyê nûnerên Qamişlo, Amûd, Hesîçe û Kobanê û ji kurdên Sovyetê jî nûnerên Rewanê beşdarî vê xebatê dibin. Ev nîşan dide ku Koma Kurmancî heta radeyeke baş xwe gihandîye hemû deverên kurmancîaxêv û nûnerên wan tevli xebatên xwe kirine. Lê ji bilî vana hêjayê gotinê ye ku sê kurdologên bîyanî jî di çend civînan da beşdarî

⁴² Nûnerên zarê soranî tenê di çend civînan da beşdarî dikin û mirov nikare bibêje endamên hertimî ne. Jixwe ji navê komê jî diyar e ku tenê nûnertîya zarê kurmancî dike.

Koma Kurmancî dibin ku Michael L. Chayet ji Amerîkayê û Joyce Blau û Joséfa Bertolino jî ji Fransayê beşdar dibin.

Herçend di serî da mercên beşdarîkirina endamên komê ne dîyar bin jî bi pêşveçûna xebatê ra li ser pêşnîyaza yek yan jî du endaman û bi pesendkirina tevahîya komê rêbaza wergirtina endamên nû tê destnîşankirin. Li gor vê, kesên pêşnîyazkirî yan divê di qadeke zimanê kurdî da pîspor bin yan jî şarezayê devokeke dîyarkirî ya kurmancî bin. Li ser derxistina endamên komê jî di encama hevdîtînan me yên di gel du endamên vê komê derket ku ji ber hin kêşeyên wî yên kesî heta niha tenê ji kesekî hatiye xwestin ku êdî beşdarî xebatên komê nebe û kesên din ên ku nehatine jî li ser daxwaza xwe nehatine (Aydogan-Lewendî, 13. 07. 2002).

Piranîya endamên komê ji kurdên xerîbîyê pêk bîn jî ji civîna 32ê û bi şûn da ji ber ku Koma Kurmancî civînên xwe li bajarên cîyawaz ên kurdî li dar dixê gelek kurdên welatî beşdarî xebatên wê dibin. Lê tevî vê jî stûnên sereke yên vê komê ji kurdên xerîbîyê pêk tên ku piranîya wan li Swêdê û çend kes jî li Fransayê dijîn. Ji ber vê jî van 65 civînan 36 li Swêdê, 8 li Fransayê, 2 li Barselonayê, 2 li Berlînê 1 li Brukselê, 1 li Lollanda Danîmarkayê, 1 li Almataya Qazaxistanê tê kirin û tenê 3 civîn li Duhokê, 3 li Zaxoyê, 1 li Hewlêrê, 2 li Bazîdê, 1 li Cizîrê, 1 li Wanê û 1 jî di serdema covidê da bi awayekî online tê çekirin. Ev jî nîşan dide ku piranîya civînên komê li Swêd û Fransayê tên kirin û ev jî nîşaneyêke din e ku Koma Kurmancî ya EKPÿê komeke zimanî ya kurdên xerîbîyê ye.

Li ser rêbaz û awayê karkirina Koma Kurmancî em dikarin bibêjin ku bernamêya her civînekê di serî da tê dîyarkirin û bi pesendkirina endamên komê mijarên civîna dahatî tên destnîşankirin. Herçend piranîya xebatan li ser navê kesek yan çend kesan bê weşandin jî deqa weşandî piştî gengeşe û boçûnên endamên din ên komê tê weşandin û ew xebat ya wan kesan be jî ji alîyê komê ve tê pesendkirin. Ji ber vê berî navên van kesan hertim “amadekar” tê nivîsîn.

Herî dawî mirov dikare li ser rewşa niha ya endamên hertimî yên Koma Kurmancî bibêje ku ji bilî du sê kesan hemû endam jî alîyê temenê xwe ve ji wan kesan pêk tên ku di navbera 65-80 salî da ne û ji karê xwe xanenişîn bûne (Araz, 2020: 340-398). Ev jî alîyê berdewamiya karî û veguheştina vê dezgehê û tecrubeyên wê ji bo nîfşên paşerojê metirsîyeke berbiçav e. Eger Enstîtuya Kurdî ya Parîsê endamên ciwan

tevî vê xebatê neke dibe ku çend sal paşê ev kom bi awayekî siruştî nemine û dawî li xebatên wê bên.

4.2.2. Naveroka Xebatên Koma Kurmancî

Dema em berê xwe didin 66 hejmarên *Kurmancîyê* em dibînin ku piranîya wan ji berhevkirin û kodkirina bêje û zaraveyan pêk tê û hejmara gotaran gelek kêr e. Gotarên ku hatine weşandin jî bi piranî di hejmarên pêşî da li ser rêziman, rênivîs, dîyalektolojî û etîmîlojîyê ne. Lîsteyên bêje û zaraveyan jî pêşî bi kurmancî paşê bi tirkî û li dû wê jî bi fransî û îngilîzî tên dayîn lê di hin mijarên mîna flora û faûnayê da latînî jî li van zimanan zêde dibe da ku mebest baştir bê famkirin. Herweha di mijarên weha da carinan wêne jî tên bikaranîn da ku ew gîya yan jî ajal baştir bên nasîn. Bêje û zaraveyên Koma Kurmancî bi giştî ji nav gelî û ji çavkanîyên nivîskî û devkî tên berhevkirin, tenê di mijarên jîyana modern da carinan bi rêya dariştin, analojî, wergirtin û berfirehkirina manayî hin bêje û zarave tên çekirin lê rêjeya zaraveyên weha gelek kêr e. Bi vî awayî em dikarin xebatên Koma Kurmancî di bin sê kategorîyên giştî da dabeş bikin:

1. Mijarên teorîk ên li ser rêziman, rênivîs, etîmîlojî û peywendîya zimanê kurdî di gel zimanên îranî û zimanên cîran,
2. Ferhengsazî û çekirina ferhengokan,
3. Zaravesazî di qadên jîyana modern da.

Mijarên kategorîya yekem bêhtir bi rêya gotaran tên ravekirin ku ji alîyê Reşo Zîlan, Rojen Barnas, Michael L. Chayet û Behrûz Şucaî ve tên nivîsîn. Tenê di mijara “peywendîya zimanê kurdî di gel zimanên îranî û zimanên cîran” da bêjeyên kurdî-îranî di zimanên cîran da û bêjeyên wan di kurdî da tên destnîşankirin û mijarên din hemû bi awayekî teorîk tên gengeşekirin.

Di kategorîya duyem da di çarçoveya devok, bêjeyên kêmnas/nenas, çavkanîyên nivîskî, îdyom, tomarkirina navên zindîwerên siruştî û bêjeyên têkildarî jîyana kurdan a pêşmodern da ferhengok tên çekirin. Taybetmendîya vê kategorîyê ew e ku hemû bêje ji çavkanîyên kurdî yê cîyawaz tên berhevkirin û yek ji wan jî ne çekirî ye. Keda Koma Kurmancî di vê kategorîyê da di berhevkirin, manakirin û danîna

bergindên wan ên zimanên bîyanî da xwe nîşan dide ku em dikarin vê bi “kodkirin”ê bi nav bikin.

Koma Kurmancî di kategoriya sêyem da jî cih dide zaraveyên jîyana modern ku çendîn qadên mîna îdare, sîyaset, anatomî-pîzîşkî, hîqûq, rêziman-zimannasî, edebîyat, cografya, matematîk, aborî, leşkerî, rojnamevanî, kompîtur, trafik, futbol û çend mijarên din li xwe digire. Koma Kurmancî di vê kategoriye da jî bilî ku ji gencîneya bêjeyên kurdî sûd werdigire hin caran rêya wergêrana zaraveyan, dariştin yan jî berfîrehkirina manayî jî dide ber xwe da ku bikare zaraveyên qadên jîyana modern di kurdî da daîne.

4.2.2.1. Mijarên Teorîk

4.2.2.1.1. Rêziman

Mijarên rêzimanê di *Kurmancîyê* da zêde cih nagirin lê tevî vê jî di çend hejmarên wê da em rastî hin gotaran tên ku pîranîya wan ji alîyê Reşo Zîlanî ve hatine nivîsîn. Li ser vê mijarê cara pêşî di hejmara 4em da du gotar tên weşandin. Gotara yekem beşek ji rêzimana Celadet Bedirxan û Roger Lescotî tê wergêran ku li ser ketina dengên e (Bedirxan – Lescot, 1989: 28-29), ya duyem jî ji alîyê Mûsa Kavalî ve tê nivîsîn û li ser wan bêjeyan e ku cihan nîşan didin. Nivîskar van bêjeyan bi ser pênc biran da dabeş dike ku em dikarin wan weha kurt bikin: (1) Navên ku cihekî bi awayekî giştî nîşan didin, (2) Navên ku bi arîkarîya paşgirên “istan, xane, geh, dank, ok”ê hatine çêkirin, (3) Bêjeyên “hir, vir, hê re, vira, hê ve, vê rê, vê dê, vê derê, wir, wê de, wira, wê dê, wê rê, wê derê, wê ve, (4) Bêjeyên ku alîyekî nîşan didin: alî, nikar, ba, rex, la, kelek, kenar, mil, cem, dev, tenîşt, nik, teng û (5) Bêjeyên ku hemû alîyan nîşan didin (1989: 30).

Li ser rêzimanê di hejmara 5em da du gotar tên weşandin. Rojen Barnas li ser “lêkerên hevedudanî” radiweste û van lêkeran bi ser du komên giştî da dabeş dike. Yên ku bi pêşgiran tên dariştin wek koma yekem û yên ku bi arîkarîya navdêr, rengdêr û daçekan jî tên dariştin wek koma duyem destnîşan dike (1989: 31-33). Dîyar e, Barnas wek meyla giştî ya Koma Kurmancî ji rêbaza Celadet Bedirxanî zêdetir rêbaza Kamiran Bedirxanî peyrew dike (Bedir-Xan, 1971: 47-50) û herwek wî lêkerên dariştî û lêkdayî (hevdudanî) yek cure dibîne û bêjeya “hevedudanî”yê jî bo her du cureyan jî bi kar tîne ku îro ne cihê pesendkirinê ye.

Reşo Zîlan di gotara duyem a vê hejmarê da bi gotina wî li ser “raweya neyînî” radiweste û dîyar dike ku forma sereke ya nerênîkirina risteyê bi “ne”yê çê dibe lê li hinek herêman wek awarte “nîne” jî tê bikaranîn. Bi raya wî, eger di şûna forma “ne”yê da “nîne” bê hilbijartin, wê demê dê tevlihevîyeke manayî çê bibe û ji risteyeke weha du mana derkevin. Li gor vê, eger risteya “Konê min e”yê bi “nîne”yê bê nerênîkirin dibe “Konê min nîne” û ev riste hem wek “Ne konê min e” û hem jî wek “Konê min tune”yê dê bê famkirin (1989: 36-39). Loma jî pêşnîyaz dike ku forma yekem bê bikaranîn û ya duyem bê paşguhkirin. Ji alîyê zelalkirina normên rêzimana kurdî ve bi raya me ev pêşnîyaza Zîlanî giring û di cihê xwe da ye.

Piştî navbereke dirêj Michael L. Chayet di hejmara 24em da gotarekê li ser rêzimanê dinivîse û bal dikêşe ser hin bînpêkirinên rêzimanî ku di bin karîgerîya zimanên bîyanî da çê bûne. Pasîfikirina lêkerên teneper yek ji wan çewtîyên zeq e ku kurdên Tirkîyeyê di bin karîgerîya zimanê tirkî da normeke rêzimana kurdî têk didin û Chayet li ser mînakên “tê sekinîn” û “tê têgihîştin”ê bal dikêşe ser vê çewtîyê. Xaleke din jî çewtîyên tewang û ergatîfîyê ye. Herçend di demên borî da gireya pirhejmarîyê (-in) ya ku tê ser lêkera pêveberê, pirhejmarîya bireserê nîşan bide jî gelek kurd gireya pirhejmarîya lêkerê ji bo pirhejmarîya bikerê bi kar tînin û ev jî dibe sedema alozîyên rêzimanî û manayî. Bo nimûne di risteya “Jinên van malbatên xizan û belangaz li bajarê (...) gelekî perîşanî kişandine”yê da lêker wek “kişandine”yê tê nivîsîn û ev jî dibe sedema tevlihevîyeke rêzimanî û têkdana normeke rêzimana kurdî. Bi rastî jî ev tespîta Chayetî gelek giring e û forma çewt ew çend belav bûye ku êdî piranîya nivîskarên kurmancî hest bi vê çewtîyê nakin. Herî dawî Chayet bal dikêşe ser bikaranîna rengdêrên pileya bala (superlative) ku bi paşgira “-tirîn”ê berî navdêran tên bikaranîn. Bi raya wî ev di bin karîgerîya zimanên bîyanî, bi taybetî jî di bin karîgerîya tirkî da hatiye çêkirin û divê ev awayên mîna “mezitînîrîn pîrsgirêk”ê bên terikandin (1998: 228). Bi raya me ev awa bikaranîn ne ji ber karîgerîya tirkî bi rêya kurdîya soranî jî farisî hatiye wergirtin û rast e ku di deqên kevin da mirov rastî bikaranînên weha nayê.

Piştî vê gotara giring a Chayetî, em rastî çend zincîre gotarên Reşo Zîlanî dibin ku beş bi beş di *Kurmancîyê* da tên weşandin. Zincîreyê pêşî li ser “peyvên dunavî” (binomial phrase) ye ku di şeş xelean da dinivîse. Di xelesa pêşî da bi kurtî pênaseya peyvên dunavî dike û paşê bêjeyên kurdî yên weha li gor rêza alfabetîk rêz dike. Bi vî

awayî di xeleka pêşî da 87 (2001: 341-343), di ya duyem da 102 (2002: 356-358), di ya sêyem da 55 (2003: 369-370), di ya çarem da 52 (2004: 377-378), di ya pêncem da 72 (2004: 389-391) û di ya şeşem da jî 110 navdêran destnîşan dike (2005: 399-401). Ev zincîre herçend peywendî bi rêzimanê hebe jî bêhtir wek komkirina bêjeyên dunavî xuya dike û tê da analîz nînin.

Zincîreya duyem a Reşo Zîlanî ji paşgir û pêşgirên kurdî pêk tê. Di xeleka yekem da cih dide mînakên van paşgiran: “-a, -ahî/-ayî/-hî/-yî (ji nav van -ahîyê tercîh dike), ajo, -ak, -al, -alês, -an/-yan, -ane, -anê/-anî, -anok, -ar, -are, -asa, -asî, -atî/-yatî, -avêj, -avî, -wî/-yî, -awer, -xwend, -ayetî, -bar, -bare, -baz, -bêj, -bend, -ber, -best, -bir, -birr, -bihêrk/-buhêrk/-bêrk, -bîn, -ç, -çe, -çik, -çing, -çîn, -çolkî, -da, -dan, -dank, -dar/ (e)dar, -de, -dek, -der, -derz, -dêr, -dêrî/-dorî, -dirû, -dîn, -doş, -doz/-diz, -e, -ek, -el”ê (2005: 409-412). Di xeleka duyem da cih dide paşgirên “-end/ -yend, -ende/-inde, -emenî, -er/-yer, -eve, -ê, -êr, -ezar, -ewar, -ewarî/-warî, -ewer, -firoş, -gar, -geh, -gelan, -ger, -gêr, -gez, -gihan, -gir, -gîr, -go, -gon/-gûn/-gwîn, -guhêz, -hêl, -hilgir, -hingêv, -hî/-yî, -ik, -ikî, -il, -inc, -incî, -ing/-ng/-wing, -king, -ino/-no/-nino, -istan/-stan, -îşk/-îşk/-oşk, -î/-yî, -îfk, -îk, -în, -îne, -înî, -înok, -îş/-iş, -îtî/-yîtî, -îtik, -îyan, -jen, -jimêr, -k, -ka, -kanî/-(i)kantî, -kî, -kî, -kar, -keft, -ker, -kil, -kir, -kirr, -kêş, -koj, -kuj, -kut, -ko, -kok, -kokî, -kolî, -lok, -mal, -man/-iman, -mend, -mêj/-mij, -nak, -nas, -nasî, -nêr, -nişîn, nivîs”ê (2005: 421-424). Di xeleka sêyem da cih dide paşgirên “-o, -ok/-yok, -oke, -okî, -olek, -ole, -olek/-olîk, -olekî, -onek, -or, -orik, -ose, -otankî, -over, -ox/-yox, -oyî, -pare, -perwer, -pêç, -parêz, -perest, -pêj, -pîv, -poş, -rax, -rês, -revîn, -rêj, -saz, -soj/-soz, -stîn, -şikên, -şo, -şok, -tir, -tiraş, -tirîn, -tî, -van/-evan, -wan, -wer, -weş, -wî, -xane, -xwar/-xwer/-xur, -xwaz, -xenêq, -xwên/xwîn, -yar/-iyar, -za/-zî/-ze, -zade, -zan, -zen/-ezen, -zar, -zed, -zede, -firaz/-fnaz/-finyaz, -eng”ê (2006: 445-447) û herî dawî di xelaka çarem da jî cih dide pêşgirên sade yên mîna “ba-, baz-/banz-, ber-, bê-, bi-, çe- = çeng, çê- = çak-, da-, der-, he- = hi-, hil-, î-/ev-, ne-, na-, nû-, ra-, ray-, ro-, rû-, şe-, tey-, ve-, vê-, we-, wer-”ê û pêşgirên lêkdayî yên mîna “jê-, lê-, pê-, tê-”yê (2006: 453-454).

Bi raya me çend morfemên ku li vir hatine destnîşankirin ne pêşgir in û bêje ne. Gelek aşkera ye ku “çê, çak, nû, ray, şe⁴³” ne pêşgir in û bi serê xwe bêjeyên

⁴³ Şe: Kurtkirina bêjeya “şeh”ê ye.

manadar in. Herweha “î” jî di eslê xwe da kurtkirina bêjeya “îm/em”ê ye, loma jî ji bilî çend bêjeyên lêkdayî qet nayê bikaranîn û ji wan bêjeyên nû nayên dariştin. Bi dîtina me ji ber vê ravekirina çewt a Zîlanî û pesendkirina Koma Kurmancî “çê” dema di gel lêkerên “kirin” û “bûn”ê tê bikaranîn herwekî pêşgir be, bi lêkerê tê nivîsîn û wek “xeleteke meşhûr” belav dibe. Gotara wî ya dawî li ser rêzimanê jî di bin sernavê “Guherîna hin dengên” tê weşandin ku ji agahiyên teorîk zêdetir behsa çend dengguherînên zimanê kurdî dike (2008: 7-8).

4.2.2.1.2. Rênivîs

Mijarên li ser rênivîsê di *Kurmancîyê* da sînordar in. Çend nivîsarên destpêkê bi hevbeşî û nivîsarên paşê jî ji aliyê Reşo Zîlanî ve tên nivîsîn. Di hejmara yekem da rênivîsa hejmaran (yek, du/dido, sê/sise,... yazdeh, dozdeh, şazdeh, hevdeh, hejdeh,... sî,..., nod,.. du sed), hejmarên rêzê (yeka⁴⁴/yekem/yekemîn, didoyan/duyem/duyemîn...) (1987: 3), nivîsîna navên parzemîn, welat, paytext û bajarên kurdan (1987: 4-6), navên werzên salê, meh û rojên hefteyê di gel almanî, fransî, îngilîzî û tirkîya wan tên destnîşankirin (1987: 6).

Di nivîsareke kurt a hejmara 2yem da bi navê “Al an Ala?”yê rastîya vê bêjeyê wek “ala”yê tê destnîşankirin û ji bo selmandina vê jî malîkek ji *Mewlûda* Bayetî tê veguhestin (1988: 10). Di hejmara 3yem da awayê rênivîsa lêkera bûnê tê dayîn (1988: 18) û herî dawî li ser navê komê di hejmara 13em da nîşaneyên xalbandîyê tên destnîşankirin ku ji “nuqte/xal, bihnok, pirsênîşan/nuqtepirs, nuqtecot, nuqtebihnok, kevane, koşebend, dunik, xêzik, bendik, bangnîşan, sênuqte, dubendik”ê pêk tên (1993: 133).

Ji hejmara 7em heta hejmara 20em Reşo Zîlan di pênc xelekan da normên hin xalên aloz ên rênivîsê destnîşan dike ku di nivîsarên zimanê kurdî da tên dîtin. Xalên sereke yên pêşnîyazên wî ev in:

1. Daçekên “ji, li, di, bi, bê”yê hem bi serê xwe hem jî di gel daçekên navî⁴⁵ divê cuda bînin nivîsîn. Herwek “li gor, li bin...”ê.

⁴⁴ Bi dîtina me tewandina yekê şaş hatîye nivîsîn û divê “yekê” bûya.

⁴⁵ Zîlan ji daçekên navî ra dibêje “kompleksên daçekî”. Bi raya me ev binavkirîneke neguncaw e.

2. Eger pêşdaçek ketibe paşdaçek divê bi hokerê ve bê nivîsîn. Herwek “paşve, paşde, pêşve, şûnve, şûnde, serve, serde, piştve, piştve, dûre, binre”yê lê eger pêşdaçek hebin divê cuda bîn nivîsîn. Mîna “bi paş ve, bi pêş ve....”

3. Daçek û hoker eger ji bo dariştineke nû bîn bikaranîn bi hev ve tîn nivîsîn: curbicur, derbider, rûbirû, serejêr...

4. Pareng yan jî bi gotina nivîskarî “raweya çêbiwar” (partîsîpa dema borî) ji çend morfeman pêk hatibin jî bi hev ve tîn nivîsîn: serjêkirî, jibîrkirî... lê eger morfema navdêrî bitewe cuda tîn nivîsîn: ji nivê de qelişî, ji darê ketî... (1990: 50-51).

5. Li ser rênivîsa “bi, bê, ne”yê dîyar dike ku eger ev morfem wek daçek û hokeran bîn nivîsîn cuda, lê dema wek rengdêran bîn nivîsîn pêve tîn nivîsîn (1991: 69-70).

6. Gireyên tewangê bîn ser navên taybetî jî divê bi apostrofê neyên veqetandin.

7. Zayenda hejmarnavan ji bilî “yek”ê hemû nêr in û dema ku bîn tewandin divê di navbera wan da apostrof neyê bikaranîn (1995: 165).

8. Bêje di zimanê axaftinê da tîn sivikkirin û hin deng ji wan tîn xistin lê nabe ku mirov weha binivîse û divê reha bêjeyan bê parastin. Bo nimûne di zimanê axaftinê da tê gotin “zavê me” lê di nivîsinê da divê wek “zavayê me” bê nivîsîn.

9. Divê navên kovar û rojnameyan bîn tewandin lê eger ev nav ji navên eşîr yan herêmekê hatibin wergirtin yan jî bêjeyên netewangbar bin wê demê divê neyên tewandin. Bo nimûne eger navê kovarekê “Botan” be divê mirov bibêje “Kovara Botan” yan jî eger navê kovarekê “Roja Nû” be ji ber ku “nû” rengdêr e divê neyê tewandin û wek “Di kovara Roja Nû de” bê nivîsîn.

10. Behsa sê cure “ku”yan dike û li gor wî “ku”yên ku berî lêkeran tîn bikaranîn divê berî wan bêhnok bîn bikaranîn. “Ez dibînim, ku tu li ser...”. Herweha di hin risteyan da bêhnok berî “ku”ya cihnav jî tê bikaranîn. Herwek: “Desteyek hevalên me, ku li gundê Kanîmasiyê bûn,...” (1996: 211-212).

11. Deng û alfabeyên neteweyan ji hev cuda ne û ev jî di mijara tîpguhêzîya navên taybetî da dibe sedema aloziyan. Ji bo vê, pêşniyaz dike ku navên bi alfabe ya kirilî, erebî û farisî li gor bilêvkirina kurdî bîn nivîsîn (1996: 215-217).

Bi vî awayî herçend Koma Kurmancî ya EKPyê hin taybetmendîyên rênivîsa Hawarê biguherîne jî li dijî norma roja îro li ser rêça Hawarê dema ku lêkerên lêkdayî di forma pasîf yan jî dançêker da bi kar tîne wan bi hev ve dinivîse. Herwek “Biryarên vê civînê di rûpelên vê rojnameyê da **tên belav kirin**” (1987: 3).

4.2.2.1.3. Etîmîlojî (Rehnasî)

Li ser etîmîlojîyê di *Kurmancîyê* da tenê pênc nivîsarên kurt ên hevbeş hene ku reha hin bêjeyan destnîşan dikin. Di nivîsara “Key û Kevanî”yê da tê gotin ku reha van bêjeyan jî “key”ê yanî jî qiralî û “keybanû”yê yanî jî jina qiralî tê (1988: 11). Di nivîsara “Bijî an Aferîn”ê da reha her du bêjeyan jî kurdî tê qebûlkirin ku “aferîn” jî “afirandin”ê û “bijî” jî “jîn”ê tê (1988: 11). Her sê nivîsarên dawî jî di bin sernavê “Peyivnasî”yê da tên nivîsîn. Li gor van nivîsaran reha bêjeya “alay/alayî” jî latînî, “çay” jî çînî, “fincan” jî “pingan”a îranîya kevin tê ku jî ber karîgerîya erebî bûye “fincan”. Herweha “qanûn” jî yûnanî (1992: 106-107), “îstekan/îskan” jî “stakan”a rûsî, “semawer” jî “samovar”a rûsî, “piyan” jî kurdî, “piyade” jî îranî, “tawe” jî kurdî-îranî (1993: 120), “bêdirok” jî “vedro”ya rûsî, “sênî” û “rende” jî îranî û “şekir” jî hîndo-ewropayî tên (1993: 131) ku niha di zimanê kurdî da tên bikaranîn.

4.2.2.1.4. Peywendîya Kurdî di gel Zimanên din ên Îranî û Zimanên Cîran

Ji bo berçavkirina peywendîya kurdî û zimanên din ên îranî hin endamên Koma Kurmancî xwe bispêrin şikariyên zimannasîyê jî bi piranî herwek nerîta *Kurmancîyê* ev kategori di çarçoveya berawirdkirina bêjeyan û danîna ferhengokan da tê pêkanîn. Cara pêşî Rojen Barnas bingeha vî karî datîne û di destpêka ferhengoka xwe ya pehlewî-kurdî-fransî-îngilîzî da dîyar dike ku bêjeyên vê ferhengokê jî *Ferhenga Pehlewî-Îngilîzî* ya D.N. Mackenzieyî hatine wergirtin. Di vê çarçoveyê da di hejmara 14-15em da 230 (1994: 136-143), di hejmara 16em da 291 (1995: 157-164) di hejmara 17em da 234 (1995: 178-183) û di hejmara 18em da jî 211 bêjeyan tomar dike (1995: 194-200) ku bi tevahî dikin 966 bêje. Yek ji bêjeyên herî balkêş ên vê koleksiyonê ew e ku “mana/mane”ya ku îro di kurdî da tê bikaranîn di pehlewîyê da jî di forma “manag”ê da hebûye (1995: 178).

Piştî Barnasî, Reşo Zîlan û Behrûz Şucaî bi sernavê “Peyvên kurdî-îranî di zimanên cîran de” dest bi xebateke din dikin. Her du vekoler pêşî behsa zimanên îranî

dikin û navên van zimanan rêz dikin paşê jî bêjeyên zimanê kurdî wek “bêjeyên îranî, xwerû kurdî û îranî-kurdî” dikin sê beş. Bi vê xebatê dixwazin nîşan bidin ku peywendîya zimanan û wergirtina bêjeyan bi taybetî di navbera zimanên cîran da tişteki asayî ye. Li gor zanyariyên destpêkê yê vê xebatê di çekirina vê koleksiyonê da her du vekoler sûd ji pirtûkên zanistî û etîmolojîk werdigirin û bi tu awayî guh nadin etîmolojîya gelêrî ku bi raya wan ne zanistî ye. Bi vê xebata zincîreyî dixwazin pêşî bêjeyên kurdî-îranî di zimanên cîran da destnîşan bikin û paşê jî bêjeyên zimanên cîran di kurdî da destnîşan bikin lê vê bernameya xwe nabin serî û tenê di heft xelean da komêk bêjeyên kurdî-îranî di zimanê tirkî da destnîşan dikin ku listeyên bêjeyan bi awayê alfabetîk bi tirkî, kurdî, fransî û inglîzî tên rêzkirin. Li ser vê bingehe di hejmara 26em da 105 (1999: 287-289), di hejmara 27em da 147 (2000: 306-308), di hejmara 28em da 43 (2000: 311), di hejmara 29em da 103 (2001: 326-327), di hejmara 30yem da 90 (2001: 336-337), di hejmara 31em da 103 (2002: 350-351) û di hejmara 33yem da jî 218 bêjeyên kurdî-îranî di zimanê tirkî da tên destnîşankirin ku tevahiya wan dike 616 bêje (2003: 372-376).

Li ser şopa wan û wek temamkirina bernameya Zîlan û Şucaî, Têmurê Xelîl cih dide 36 bêjeyên kurdî-îranî di zimanê ermenî da (2006: 339-340) û di hejmara 41em da jî li ser dîroka zimanê ermenî agahî dide û paşê cih dide 27 bêjeyên zimanê ermenî di kurdî da. Bêguman hin ji van bêjeyan bi guhertina manayî û hinek jî wek xwe tên wergirtin. Di nav wan da bêjeyên herî balkêş “bîbik, çortan, kêran, koşkar, pûrt, boç, savar û xapandin” in (2007: 5) ku kurd niha jî bi awayekî çalak wan bi kar tînin. Xelîl di hejmara 43yem da li ser peywendîya zimanên rûsî û kurdî radiweste û vê peywendiyê bi du sedeman ve girê dide. Yek ji van sedeman ew e ku zimanên rûsî û kurdî endamên malbata hînd-ewropayî ne û gelek bêjeyên wan ên hevbeş ên mîna “mîş-mîşk, birat-bira, jêna-jîn, brov-brû...”yê hene. Sedama duyem jî ew e ku ji aliyê dîrokî ve hin herêmên kurdî dikevin bin destê Rûsyayê û karîgerîya zimanê rûsî li ser zimanê kurdî çê dibe. Bi taybetî di serdema Sovyetê da gelek berhemên rûsî ji bo kurdî tên wergêran û bi vê rêyê hin bêjeyên vî zimanî dikevin nav zimanê kurdî. Ji van bêjeyan cih dide 30 bêjeyên zimanê rûsî ku ketine nav kurdî û ya herî balkêş jî “zagon” e (2008: 1-2) ku di 1990an da kurdên Tirkîyeyê li ser navê petîgerîyê ji kurdên Sovyetê werdigirin û di şûna “qanûn”ê da bi kar tînin.

Ji ber ku Fransa di nîvê yekem ê sedsala bîstem da Sûrîyeyê dagir dike beşeke herêma kurdan dikeve bin destê wan û ji vê têkilîyê hin bêjeyên fransî dikevin nav zimanê kurdên vê herêmê. Selam Nûman wek nûnerê kurdên wê herêmê di hejmara 46em da 92 (2009: 1-2) û di hejmara 47em da jî 76 (2009: 4) bêjeyên fransî di kurdî da destnîşan dike. Ji bilî vê, Nûman di hejmara 51em da cih dide 30 bêjeyên îranî-kurdî ku di Quranê da hene (2012: 2). Rojda Azîzoglu jî di hejmara 47em da 155 bêjeyên yûnanî di kurdî da (2009: 5-6) û di hejmara 49em da jî 106 bêjeyên kurdî di yûnanî da destnîşan dike (2011: 3-4).

Ji ber şarezabûna wî ya di zimanên îranî da di vê kategorîyê da kesê herî çalak Behrûz Şucaî ye. Ji ber vê di çend hejmaran da li ser peywendîya kurdî û partî û avestayî zûr dibe. Herwek zimnanasên vê qadê zimanên îranî bi ser du koman da dabeş dike û farisîya kevin, navîn û nû di nav koma başûr-rojavayî da û medî û partî jî di nav koma bakur-rojavayî da bi cih dike ku kurdî, beloçî, tatî, gîlekî, talişî, azerî ji vê koma duyem çê dibin. Piştî vê, behsa hin cîyawazîyên fonetîkî yên van her du koman dike û dîyar dike ku partî jî mîna kurmancî zimanekî ergatîf e (2000: 309). Şucaî, bi mebesta nîşandana nêzîkbûna partî û kurdî ferhengokekê amade dike ku di hejmara 28em da 51 (2000: 309-310) û di hejmara 30yem da jî 110 bêje tê da hene (2001). Piştî vê li ser peywendîya kurdî û avestayî radiweste û pêşî di derheqê avestayî û peywendîya wê ya di gel kurdî agahî dide paşê jî ferhengokeke avestayî- kurdî-tirkî-fransî û îngilîzî amade dike ku di hejmara 34em da 115 (2004: 383-385), di hejmara 36em da 153 (2005: 406-408) û di hejmara 39em da jî 143 bêje tên weşandin (2006: 450-452). Di vir da jî bêjeya “mana/mane”ya kurdî di avestayî da wek “manah”ê (2005: 406) û “man-, meinye, maneh”ê jî di manaya “raman û zihin”a kurdî da hatîye (2006: 450).

Herî dawî li ser peywendîya kurdî û zimanên cîran Michael L. Chayet ji mînakên jor cudatir di çarçoveya çar xalên rêzimanî da behsa karîgerîya zimanê suryanî/aramî dike li ser hin deverên kurmancî. Chayet di vê gotara xwe ya cîyawaz û giring da dîyar dike ku bikaranîna gireya demî ya (di-)yê berî lêkerên bi pêşgiran dariştî, (divekim) ji ber karîgerîya axiverên suryanî bûye ku li herêmên Tor û Behdînanê dijîn û ev bikaranîna wan piştî demekê dibe norma vê deverê jî. Nivîskar dîyar dike ku ev “di”ya ku di farisî da beramberî “mî”yê ye her wek soranî û deverên din ên kurmancî dikeve nav pêşgir û reha lêkeran lê di devokên tacîkî û derî da herwek Tor û Behdînanê tê serî. Ev jî ji ber karîgerîya peştûyî û ozbekî bûye ku berê xwe daye

forma hêsan. Chayet karîgerîya suryanî – aramî ya li ser devoka behdînî ji hin alîyên din ve jî berbiçav dike ku yek jê di dema dahatî da bikarneanîna “bi-”ya dananî (subjunctive) ye (dê pirsim) ku di suryanîya nûjen da jî weha tê bikaranîn. Li alîyê din herçend li piranîya deverên kurmancîaxêv zayenda rengdêran nayê nîşandan jî axiverên herêma Behdînanê ji ber cîranên xwe yên suryanî û ereb herwek zimanên samî zayenda rengdêran nîşan didin û mînakên wek: “ya baş (mê), yê baş (nêr), yê baş (pirhejmar)ê” bi kar tînin. Herî dawî nivîskar bikaranîna lêkera “hiştin”ê di forma “hêlan”ê da li herêma Behdînanê bi karîgerîya axaftina bîyanîyan a bi kurdî ve girê dide û forma wê ya resen “hiştin” dizane (2016: 1).

4.2.2.2. Ferhengsazî yan jî Çêkirina Ferhengokan

4. 2.2.2.1. Vekolîna Devokên Kurmancî û Çêkirina Ferhengokên Wan

Nasandina devokên kurmancî û derxistina ferhengokên wan piştî hejmara 14-15ê bi Rojan Hazimî dest pê dike û xebatên weha heta hejmara dawî jî didomin. Hazim di nivîsara xwe ya yekem da bi giştî taybetmendî û cîyawazîyên devoka Hekarîyê destnîşan dike (1994: 144-147) û di nivîsara xwe ya duyem da jî li ser çend gotinên derbareyê demên salê û guherîna hewayî li Hekarîyê radiweste (1996: 204-205) û bîngeha qadeke nû ya xebatên *Kurmancîyê* datîne.

Piştî wî Mehmûd Lewendî bê ku taybetmendî û cîyawazîyên wê dîyar bike dest bi weşandina zincîreya bêjeyên “Devoka Qerejdaxê” dike û bêjeyên vê herêmê di gel zimanên tirkî, fransî û îngilîzî diweşîne. Di vê xebata 11 xelekî da her carê birek bêjeyên weşandin ku di hejmara 16em da 72 (1995: 169-171), di hejmara 17em da 165 (1995: 183-187), di hejmara 19em da 64 (1996: 208-209), di hejmara 20em da 54 (1996: 223-225), di hejmara 21em da 71 (1997: 232-233), di hejmara 22em da 74 (1997: 240-241), di hejmara 23yem da 23 (1997: 249), di hejmara 24em da 106 (1998: 264-266), di hejmara 25em da 72 (1999: 272-274), di hejmara 26em da 64 (1999: 294-295) û di hejmara 28em da 147 (2000: 312-315) bêje hene ku bi tevahî dikin 912 bêje. Ji van bêjeyan bêjeyên mîna “nişmî” (titiz, itinalî-tidy, careful, very clean and neat groomed), “pelepûçî” (saçma sapan-nonsense, absurdity) û “gotinên pelepûçî” (abuksabuk sözler-nonsense) (1997: 240-241) hêja ne ku bîna belavkirin û bibin bêjeyên çalak ên jîyana rojane.

Cemal Onursal di sê xelean da bêjeyên devoka Botanê berhev dike ku di hejmara 28em da 66 (2000: 321-322), di hejmara 29em da 88 (2001: 329-331) û di hejmara 30em da jî 45 bêje hene (Onursal, 2001: 343-344). Herweha Têmûrê Xelîl jî 95 bêjeyên devoka kurdên Qafqasyayê destnîşan dike (2001: 323-325).

Hemîd Kiliçaslan di 14 xelean da bêjeyên devoka berîya Mêrdînê tomar dike ku di hejmara 33em da 59 (2003: 365-366), di hejmara 34em da 76 (2004: 378-380), di hejmara 35em da 54 (2004: 393-394), di hejmara 36em da 95 (2005: 396-398), di hejmara 37em da 49 (2005: 418-419), di hejmara 51em da 22 (2012: 3), di hejmara 53yem da 68 (2013: 4), di hejmara 55em da 41 (2014: 3), di hejmara 56em da 34 (2015: 1), di hejmara 59em da 25 (2016: 4), di hejmara 61em da 37 (2017: 3), di hejmara 62yem da 27 (2018: 3), di hejmara 63yem da 34 (2018: 3), di hejmara 64em da 42 (2019: 3) û herî dawî di hejmara 65em da 34 bêje hene (2019: 4) ku dikin 697 bêje. Ji van bêjeyan “neban” (uyumsuz, geçimsiz) û “banandin” (uyum sağlamak, alıştırmak, adapte etmek-to adapt, to get used to something) (2004: 378-379) ji bo bikarxistinê gelek guncaw in.

Elişêr di çar xelean da hin bêjeyên “hêla Bidlîs û Wanê” berhev dike. Di hejmara 45em da 37 (2009: 2-3), di hejmara 47em da 70 (2010: 2-3), di hejmara 49em da 34 (2011: 2-3) û di hejmara 56em da jî 45 (2015: 4) bêje hene. Seyfî Dogan 68 bêjeyên herêma Qûlûyê berhev dike ku di nav wan da bêjeya herî balkêş “katkirin” e ku manaya “vegêran û çîrokgotinê” dide. Herweha lêkera “sûrîlêkirin”ê jî balkêş e ku manaya “pelçiqandin, hincirandin, zulmkirin”ê dide (2012: 3).

Omîdê Mistefayê Celalî herwek Rojan Hazimî bi awayekî teorîk di hejmara 52yem da li ser “taybetmendiyên devoka celalîyan” (2013: 7-8) û di hejmara 54em da jî li ser eşîra goyî û taybetmendiyên devoka wan radiweste. Celalî pêşî li ser eşîreta goyî zanyariyên giştî dide, navên lîstik û xwarinên wan rêz dike, paşê jî bi awayekî biserve ji aliyê dengnasî, peyv sazî û fonolojîyê ve vê devokê dinirxîne û herî dawî cih dide çend riste û paragrafên devoka goyî û dixwaze cîyawaziyên wê yên di gel kurmancîya nivîskî berbiçav bike. Ji bilî vê, Celalî di sê hejmaran da hin bêjeyên li ser erd, av û hewayê ya devoka celalîyên Bazîdê kom dike ku di hejmara 62em da 39 (2018: 5-6), di hejmara 64em da 52 (2019: 4) û di hejmara 65em da jî 13 bêje ne (2019: 2).

Khosrow Abdollahî di du hejmaran da hin bêjeyên Selmasê kom dike ku di hejmara 53em da 49 (2013: 1) û di hejmara 54em da jî 36 (2014: 5) bêje hene. Sidîq Degirmen di hejmara 54em da 51 bêjeyên devoka Licê berhev dike (2014: 1-2). Mele Şeban Turgut û Elîşêr di sê hejmaran da hin bêjeyên başûrê Wanê diweşînin ku di hejmara 59em da 37 (2016: 3), di hejmara 60em da 49 (2017: 3-4) û di hejmara 61em da jî 34 bêje hene (2017: 1). Bi raya me bêjeya herî balkêş a vê listeyê “helemar” e ku di şûna koma maran da (yılan sürüsü) hatîye bikaranîn.

Rênas Awdal di çend hejmaran da li ser devoka Zaxoyê û bêjeyên wê radiweste û di hejmara 61em da 29 (2017: 2), di hejmara 62yem da 23 (2018: 3), di hejmara 63yem da 16 bêjeyan tomar dike (2018: 1). Ergîn Opengîn di hejmara 63yem da 54 bêjeyên devera Şemdînanê (Opengîn, 2018: 3-4) û Mehdî Jafarzadeh jî di hejmara 66em da 58 bêjeyên kurdîya Xorasanê diweşîne (Jafarzadeh, 2021: 6). Lê ji berê cudatir Jafarzadeh ji bilî danîna bergindên wan ên zimanên tirkî, fransî û îngilîzî, wan bi kurdî jî rave dike.

Ji bilî van berhevkarîyên meydani di çend hejmarên *Kurmancîyê* da bêjeyên hin devokan ji çavkanîyên nivîskî jî tên berhevkirin. Elîşêr di sê hejmaran da hin bêjeyên devoka Hekarî û rewendên Mûş û Bazîdê ji ferhenga kurdî-fransî ya A. Jabayî hildiçîne. Ji vê xebatê di hejmara 57ê da 34 (2015: 2), di hejmara 59em da 15 (2016: 3) û di hejmara 63yem da jî 121 bêjeyan destnîşan dike (2018: 4-6). Bêjeya herî balkêş a vê listeyê “derêrê” ye ku di manaya “kesê ji rê derketî” da (yoldan sapmiş) hatîye bikaranîn. Herî dawî Rênas Awdal jî di hejmara 57em da ji ferhengoka Paul Bêdarî 28 bêjeyên devoka Zaxoyê berhev dike (2015: 4).

Bêguman hizira berhevkirina bêjeyên herêmî û çêkirina ferhengokên devokan gelek giring e lê gelek caran bêjeyên ku di van koleksîyonan da tên weşandin li herêmên din jî tên dîtin û ne taybet in bi wê devokê. Ji vî alîyê ve berhevkarên zêde guh nedaye vî alîyê û kesê ku pê nizanibe dê bibeje qey ev bêje tenê taybet in bi wan herêman. Li alîyê din jî bilî kesên mîna Rojan Hazim û Omîdê Mistefayê Celalî, yên din li ser destnîşankirina taybetmendî û cîyawazîyên devokan tiştekî teorîk nanivîsin û tenê bi berhevkirina bêjeyan qîma xwe tînin. Lê em baş dizanin ku her devok ji alîyê fonolojîk, morfolojîk û sentaktîk ve xwedî hin taybetmendîyên xweser in û di xebateke devokan da divê muheqeq ev taybetmendî bînin destnîşankirin û mînakên wan bînin.

dayîn. Ji vî alîyî ve em dikarin bibêjin ku xebatên li ser devokên kurmançî kêmanê mane û vekolerên wan nekarîye wêneyekî zanistî li ser van devokan di hişê xwendevanan da çê bikin.

4.2.2.2.2. Çêkirina Ferhengokên Bêjeyên Kêmnas û Nenas

Cara pêşî Michael L. Chayetê ferhengdanerê ferhenga kurdî-îngilîzî, bingeha vê kategorîyê datîne û di hejmara 23yem da 38 bêjeyên kêmnas tomar dike ku di nav wan da ya herî balkêş “guşme” ye ku manaya “deste û kûme”ya tirkî dide (1997: 250-251). Rojan Hazim di hejmara piştî wê da 15 bêjeyên kêmnas ên devera Hekarîyê dinasîne ku “xuyanî: xizmên nêzîk, lêzim: xizmên dûr, pîxameta: ji ber û behbîr: xemsar (bi tirkî umursamaz) mînakên herî balkêş in (1998: 267). Kendal Nezan di du hejmaran da cih dide hin bêjeyên kêmnas ku di hejmara 37em da 146 (2005: 413-416) û di hejmara 39em da jî 176 bêje hene (2006: 440-444). Di nav van bêjeyên Nezanî da yê herî balkêş ev in: kurad: pîrasa, kurîfî: noqbûna avê, kurîfî avê bûn: ji bo vexwarina avê noqkirina serî di nav avê da (2005: 416). Joséfa Bertolinoya ferhendanera kurdî-fransî jî di hejmara 41em da cih dide 117 bêjeyan (2007: 7-8) ku piraniya wan bêjeyên nas in û nedibû ku ev hemû bêje wek bêjeyên nenas bên tomarkirin.

Di vê kategorîyê da kesê herî çalak Reşo Zîlan e ku ji hejmara 55em heta 66em di 12 xelekên bînavber da cih dide çendîn bêjeyên kêmnas û nenas. Di vê çarçoveyê da di hejmara 55em da 54 (2014: 4), di hejmara 56em da 56 (2015: 2), di hejmara 57em da 62 (2015: 3-4), di hejmara 58em da 49 (2016: 6-7), di hejmara 59em a 23 (2016: 2), di hejmara 60em da 50 (2017: 3), di hejmara 61em da 46 (2017: 4), di hejmara 62yem da 21 (2018: 2-3), di hejmara 63yem da 41 (2018: 6), di hejmara 64em da 56 (2019: 5-6), di hejmara 65em da 14 (2019: 2) û di hejmara 66em da jî 37 bêjeyan tomar dike (2021: 2) ku bi tevahî dikin 509 bêje. Herçend di nav wan da gelek bêjeyên kêmnas ên mîna “şayiş (fîkar)”ê (2017: 3) hebin jî di hejmara 65em da bêjeyên “eşkene, patîle û pilût kirin”ê herwek hejmara 64em tînin dubarekirin û herçî bêjeya “eşkene”yê ye qet kêmnas û nenas nîne (2019: 2) û nedibû di nav vê listeyê da bihata nivîsîn. Herî dawî Lezgînê Çalî di her du hejmarên 65 û 66em da cih dide hin bêjeyên kêmnas ên devera Behdînanê ku di hejmara 65em da 46 (2019: 1-2) û di hejmara 66em da jî 41 bêje hene (2021: 1).

4.2.2.2.3. Derxistina Ferhengokên Çavkanîyên Edebîyata Kurdî

4.2.2.2.3.1. Ferhengokên Çavkanîyên Edebîyata Klasîk

Ev cure xebat yek ji xebatên herî berfireh ên *Kurmancîyê* ye ku cara pêşî Reşo Zîlan bi derxistina hin bêjeyên *Mewlûda Kurmancî* dest pê dike. Zîlan pêşî li ser Bateyî û *Mewlûda* wî agahîyan dide û paşê jî di bin navên Beş I, Beş II û Beş IIIyê da cih dide 47 bêjeyên vê berhemê û manayên wan rave dike. Lê divê mirov bibêje ku hinek ji van bêjeyan reha xwe ji kurdî nagirin hinek jî di nav kurdî û farisî da hevbeş in. “Namwer, der, karsaz, bende, mihriban, aferîd, zeman, aferîn, an, darû, dîde, bînahî, destegîr, penah, pûşt, asîman, rewan, xakî pa, karûbar, çerx, daxîdar, dergeh, koh, bexşîn, dîger, pur” ji van bêjeyan çendek in (1988: 10).

Rojen Barnas ferhengoka *Dîwana Melayê Cizîrî* derdixe û di destpêka xebata xwe da bi awayekî gelek rast dîyar dike ku berî ku mirov dest biavêje çêkirina bêjeyan divê pêşî ji çavkanîyên klasîk û folklorîk û bêjeyên nav gelî sûd wergire da ku anarşiyek di nav zimanî da çê nebe. Di vê çarçoveyê da behsa vê xebata xwe dike ku ji çend çavkanîyan sûd wergirtiye. Li ser vê bingehe bêjeyên dîwana Melayê Cizîrî dike sê kom: (a) Gotinên ku îro ji alîyê piraniyê ve nayên nasîn, (b) Gotinên ku ji alîyê rênivîs yan bilêvkirinê ve têvel in, (c) Gotinên ku ji dema Melayê Cizîrî heta niha neguherîne û wek xwe mane. Piştî vê bi awayê alfabetîk 253 bêjeyan rêz dike û ji bo her bêjeyekê malikeke Melayê Cizîrî mînak dide. Hêjayê gotinê ye Barnas gelek bêjeyên resen destnîşan bike jî hin bêjeyên mîna “bestin”ê bi çewtî wek “bestîn”ê, “hinartin”ê wek “henarîn”ê û “Baxoy”ê (Xwedê) jî wek “ba Xoy”ê nivîsiye û manaya “bi Xwedê”yê dayê ku bi raya me çewt e û di nav tevahîya malikên Cizîrî da jî ev mana jê dernakeve. Jixwe Elîşêr jî di hejmara 52em a *Kurmancîyê* da dema ji *Folklorê Kurdî* ya Sadiq Bahaeddînî hin bêjeyan berhev dike vê bêjeyê wek “baxwê/baxo”yê destnîşan dike û manaya “xwedîyê bendeyan”ê dide pê ku hevmanaya Xwedê ye (2013: 3). Ji bilî vê, Barnas bêjeya “westan”ê ku manaya “sekinîn”ê dide jî wek “muhlet dan”ê mana dike û dikeve nav şaşîyê (1989: 21-27).

Zeynelabidîn Zinar ji *Nûbara Ehmedê Xanî* 96 bêjeyan destnîşan dike ku di nav wan da bêjeyên herî balkêş “gerew: rehin, mehder: şafaet, mehdervan: şefaetkar, hilû: şayîk, bêgav: mecbûr, bêgavî: mecbûrîyet û şên: qudret” in (1991: 72-74). Ji bilî vê, ji *Dîwana Melayê Cizîrî* cih dide 9 bêjeyên kêmnas ku di nav wan da ya herî balkêş

bêjeya “rexne”yê ku di roja îro da jî bi awayekî çalak tê bikaranîn. Herçend ev bêje kêmnas nebe jî ji alîyê dîroka bikaranînê ve bêjeyê ve giring e (1993: 120). Herweha ji *Sirr ul-Mahşera* Feqî Reşîdê Hekarî 28 (1992: 96), ji *Mîrsad-ul Etfala* Şêx Mihemdê Kerbelayî 17 (1992: 99), ji *Mewlûda* Bateyî 23 (1994: 148) û ji *Nehc-ul Enama* Mela Xelîlê Sêrtî jî 8 (1994: 148) bêjeyan tomar dike.

Khosrow Abdollahî di du hejmaran da ferhengoka *Mem û Zînê* derdixê û di hejmara 16em da 82 (1995: 174-175), di hejmara 18em da jî 44 (1995: 200-201) bêjeyan tomar dike. Narozi û Çalî ji *Dîwana* Exlatî 16 (2011: 1), Kadri Yildirim ji *Tiba Melayê Erwasî* 74 (2013: 2), Emîn Narozi ji *dîwana* Şêx Memdûhê Birîfkanî di hemara 55em da 19 (2014: 2), di hejmara 56em da 35 (2015: 3), di hejmara 57em da 23 (2015: 1), di hejmara 59em da 23 (2016: 2) û di hejmara 60em da jî 19 bêjeyan berhev dike (2017: 6). Herweha Omîdê Mistefayê Celalî jî di hejmara 58em da ji Xelîfe Êsivî 21 bêjeyan destnîşan dike ku ya herî balkêş “tuneyî”yê ku ji bo “yokluk, adem”a tirkî û erebî bi kar tîne (2016: 7).

Hemîd Kiliçaslan di hejmara 10em da ji *Adet û Rusûmata* Mela Mehmûdî 101 bêjeyan tomar dike û di nav van bêjeyan da “hêwişandin”a ku manaya “esirgemek”a tirkî dide di kurdî da cihê wê vala ye û bi raya me divê bê çalakkirin (1992: 88-89). Piştî wî Elîşêr berê xwe dide berhemên Mela Mehmûdî û çendîn bêje ji berhemên wî hildiçîne. Di sê hejmaran da hin bêjeyên wergêrana *Şerefnameyê* ya Mela Mehmûdê Bazîdî kom dike ku di hejmara 42yem da 71 (2008: 1-2), di hejmara 43yem da 49 (2008: 2) û di hejmara 44em da jî 112 bêje hene (2009: 2-3). Herweha ji *40 Hikayetên* Mela Mehmûdî jî di hejmara 45em da 34 (2009: 3) û di hejmara 46em da jî 39 bêjeyan diweşîne (2010: 2). Elîşêr ji bilî berhemên Mela Mehmûdî ji Yûsif û Zuleyxayê jî 11 bêjeyan tomar dike (1994: 154).

Eger em bi giştî berê xwe bidin bêjeyên vê kategorîyê mirov dikare bibêje ku piranîya bêjeyên vê beşê gelek caran tên dubarekirin û di nav wan da bêjeyên hevbeş ên îranî jî gelek in. Ji bilî vê xala nerênî, hêjayê gotinê ye ku di nav wan da hin bêjeyên balkêş jî hene ku yan di roja îro da ji alîyê bikarhênerên kurmancî ve hatine jibîrkirin yan jî bi tevahî cihê wan vala ye ku çendek ji wan li jor hatin destnîşankirin. Tevî van têbînîyan vekolîna deqên edebîyata klasîk, ji bo derxistina şopa dîrokî ya zimanê kurdî û vejandina wê, çavkanîyeke gelek giring e û beşeke pêwîstiyên jîyana roja îro ji wan

dikare bê dabînkirin. Ji vî alîyê ve ji bo plandanîna zimanê û bihêzkirina korpûsa zimanê kurdî vekolîna li ser berhemên kevin giring û di cih da ye.

4.2.2.2.3.2. Ferhengokên Çavkanîyên Edebîyata Nû

Ev cure xebat ji dîwanên helbestvanan heta roman û kovarên birayên Bedirxanî berfireh dibe. Khosrow Abdollahî di sê hejmaran da hin bêjeyên dîwana yekem a Cegerxwînî tomar dike ku di hejmara 5em da 316 (1989: 33-36), di hejmara 9em da 51 (1991: 78-80) û di hejmara 10em da jî 20 bêje hene (1992: 91). Bêguman ferhengeke dewlemend a Cegerxwînî heye ku ji bêjeyên edebîyata klasîk heta folklor, devok û zarên cîyawaz ên kurdî sûd wergirtiye. Di vê ferhengokê da gelek bêjeyên nas hebin jî yê herî balkêş ev in: “daberizîn (êrîş kirin), difr – difre (xurûr), kelxot (bêdidan), stêle (beredayî), şeyl (hal û hereket), rîp (fêl, hîle), şek (derb)”.

Piştî vê Zinar Soran ji *Dîwana Tîrêjî* 133 bêjeyan destnîşan dike (1991: 74-77) û Newzad Hîrorî ji dîwana yekem a Ehmedê Nalbendî di şeş xelekan da gelek bêjeyan tomar dike ku di hejmara 57em da 23 (2015: 2), di hejmara 60em da 31 (2017: 6), di hejmara 61em da 24 (2017: 3), di hejmara 62yem da 37 (2018: 6), di hejmara 63yem da 29 (2018: 2), di hejmara 65em da 39 bêje hene (2019: 6). Mistefa Aydogan di çar xelekan da hin bêjeyên *Nameyek Şernexê* ya Evdirehman Gundikî çend bêjeyan tomar dike ku di hejmara 59em da 40 (2016: 5-6), di hejmara 61em da 29 (2017: 2), di hejmara 63yem da 15 (2018: 1) û di hejmara 64em da jî 44 bêje hene (2019: 6). Em dikarin ji van bêjeyan “dirb (patika yol), kavişkî (ergenlik öncesî doğum), kuştan (yayla), mel (kuş), palûn kirin (koyun otlatmak), palûnvan (koyun otlatan), paşdiz (hırsızlıkta kandırmakla yükümlü olan), patexwer (işbirlikçi), pelgazg (maşa)”yê wek bêjeyên giring destnîşan bikin.

Di vê kategorîyê da ferhengoka du romanên kurdî jî tê derxistin. Mistefa Aydogan di çar hejmaran da bêjeyên romana *Şivanê Kurmanca* ya Erebe Şemoyî derdixe ku di hejmara 45em da 64 (2009: 1-2), di hejmara 46em da 48 (2009: 3), di hejmara 47em da 27 (2010: 3) û di hejmara 49em da jî 34 bêje hene (2011: 2). Herweha Têmûrê Xelîl jî di du hejmaran da çend bêjeyên romana *Gundê Mêrsan* a Elîyê Evdilrehmanî derdixe ku di hejmara 55em da 30 (2014: 1) û di hejmara 56em da jî 23 bêje hene (2015: 3-4).

Bêguman kovar û xebatên birayên Bedirxanî ji bo *Kurmancîyê* referansên sereke yên plandanîna zimanî ne. Ji ber vê çendîn kes ferhengokên weşanên wan derdixin. Cara yekem Reşo Zîlan dest bi derxistina ferhengoka *Roja Nû* ya Kamran Bedirxanî dike û di hejmara 9em da 77 bêjeyan destnîşan dike ku “sotemenî: şewate, nûçegihan: muxabir, zirehpoş, zirîpoş: bizirx, torin: esîl, lihevhatî” yên herî balkêş in (1991: 71-72). Reşo Zîlan ji *Stêrê* jî 77 bêjeyan kom dike ku hinek ji wan ji bo rênivîsê hatine nîşandan (1991: 80-81). Piştî wî Hemîd Kiliçaslan di sê hejmaran da bêjeyên *Roja Nû* berhev dike. Bi vî awayî di hejmara 16em da 123 (1995: 166-168), di hejmara 17em da 93 (1995: 189-191) û di hejmara 20em da jî 55 bêjeyan tomar dike (1996: 219-220).

Mehmed Uzun û Zinar Soran ferhengoka *Hawarê* derdixin. Uzun di hejmara 11em da 76 (1992: 105-106) û di hejmara 13em da 19 bêjeyan tomar dike (1993: 127). Piştî wî Zinar Soran di şeş xelakan da bêjeyên *Hawarê* berhev dike û di hejmara 19em da 66 (1996: 206-207), di hejmara 20em da 60 (1996: 225-227), di hejmara 21em da 38 (1997: 234), di hejmara 22yem da 38 (1997: 247), di hejmara 23yem da 42 (1997: 255-256) û di hejmara 24em da jî 32 bêjeyan bi cih dike (1998: 266-267). Bêjeyên wî yên herî balkêş ev in: “gizing (şefeq), hûrbijarî (özenle), piştawî (qîyamet), warkoz (kışlak), mafir (nasılsa, madem ki), velo kirin (aramak, yoklamak)”.

Hemîd Kiliçaslan û Mizafer Begzade ferhengoka *Ronahîyê* derdixin. Kiliçaslan di hejmara 10em da 95 (1992: 94-95) û di hejmara 11em da jî 41 bêjeyan destnîşan dike (1992: 104). Di nav wan da bêjeyên “têkber (eşya), lezbot (motora bisuret a li ser avê), peresto (îlah, kesê gelek hezkirî), sergewaz (mezinê dewletê, pêşeng), berevan (bergirîkar, parêzvan)” ji bo jîyana modern a îro giring in. Herî dawî Begzade jî di çar hejmaran da bêjeyên *Ronahîyê* berhev dike û di hejmara 12em da 40 (1993: 116-117), di hejmara 13em da 91 (1993: 125-127), di hejmara 16em da 75 (1995: 172-173) û di hejmara 17em da 32 bêjeyan tomar dike (1995: 188).

4.2.2.2.3. 3. Ferhengokên Çavkanîyên Folklorê Kurdî

Di vê kategorîyê da berhemên folklorîk ên nivîskî, qewlên êzîdîyan, stran, nifir, dua/nîyaz, listikên gelêrî û rojên giring ên gelêrî wek çavkanî tî wergirtin. Cara pêşî Mehmed Uzun ferhengoka *Memê Alanê* derdixe ku ji 98 bêjeyan pêk tê û ji nav van jî bêjeyên herî giring “lezgîn (çevik), gengaz (kolay), kok (süsleme), xwe kok kirin

(süslenmek), li kesekî kuşim kirin (biriyle alay etmek), segman (nişancı)” in (1991: 81-83). Mehmûd Lewendî ji *Zargotina Kurdên Sûrîyeyê* ya Celîlê Celîlî di hejmara 13em da 82 (1993: 122-124) û di hejmara 14-15em da jî 46 bêjeyan werdigire (1994: 149-150). Balkêş e ku herçend li gor Michael L. Chayetî reha “misoger”ê vegere “sigorta”yê û di nivê yekem ê sedsala 20ê da bi rêya erebî ji îngilîzî hatibe wergirtin jî (Chyet, 2003: 392) ev bêje di vê koleksîyonê da cih digire û dibe ku xwedî dîrokeke kevintir be jî.

Reşo Zîlan di heft xelekan da ji *Hikyatêd Cimaeta Kurda* ya Hecîyê Cindî di hejmara 45em da 22 (2009: 4), di hejmara 46em da 32 (2010: 3-4), di hejmara 47em da 19 (2010: 4), di hejmara 49em da 25 (2011: 2), di hejmara 51em da 43 (2012: 4), di hejmara 53em da 44 (2013: 3) û di hejmara 55em da jî 16 bêjeyan berhev dike (2014: 3). Elîşêr di pênc xelekan da ji *Folklorê Kurdîya* Sadiq Bahaeddîn Amêdî çendîn bêjeyan tomar dike ku di hejmara 51em da 35 (2012: 2), di hejmara 52yem da 54 (2013: 3), di hejmara 53yem da 32 (2013: 3), di hejmara 54em da 14 (2014: 2) û di hejmara 55em da jî 26 bêje hene (2014: 2). Ji nav van “pûte pê dan (ehemmiyet vermek), delîve (firsat), malxulyan (melankoli), malxulyayî (melankolik), aşop (kabus), kerkirusk (horoz), baxwê/baxo (köle sahipleri), benîzava (içgüvey)” bêjeyên balkêş in. Herî dawî Zinar Soran di sê hejmaran da çend bêjeyên zargotina kurdan ji pirtûka Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîlî werdigire ku di hejmara 64em da 22 (2019: 3), di hejmara 65em da 22 (2019: 4) û di hejmara 66em da jî 17 bêje hene (2021: 5).

Ji bilî van çavkanîyên ku bi nivîskî hatine tomarkirin ji gelek çavkanîyên devkî jî bêje tên tomarkirin. Emîn Narozi di bin sernavê “peyvên stranên folklorî” da di 15 xelekan da gelek bêjeyan dide hev ku gelek ji wan bêjeyên giştî ne û hem di zimanê rojane da hem jî di ferhengên giştî da tên bikaranîn. Bi bawerîya me nedibû ku ev hemû bêje herwek bêjeyên nebihîstî bên tomarkirin. Narozi di hejmara 30em da 58 (2001: 339-340), di hejmara 31em da 91 (2002: 354-355), di hejmara 33yem da 49 (2003: 367-368), di hejmara 34em da 55 (2004: 380-381), di hejmara 35em da 60 (2004: 391-392), di hejmara 36em da 64 (2005: 401-402), di hejmara 37em da 45 (2005: 419-420), di hejmara 39em da 106 (2006: 448-450), di hejmara 41em da 58 (2007: 4-5), di hejmara 42yem da 73 (2008: 3) di hejmara 43yem da 56 (2008: 3), di hejmara 44em da 28 (2009: 3), di hejmara 45em da 48 (2009: 5), di hejmara 46em da 57 (2010: 4) û di hejmara 47em da 38 (2010: 1) bêjeyan kom dike.

Qewlên êzîdîyan çavkanîyeke giring a bêjeyên resen ên kurdî ne ku bi rêya devkî gihîştine heta roja îro. Reşo Zîlan di hejmara 41em da 104 (2007: 1-2), di hejmara 42yem da 34 (2008: 3-4), di hejmara 43yem da 36 (2008: 3-4) û di hejmara 44em da jî 43 bêjeyan tomar dike (2009: 1). Piştî wî Xanna Omerxalî jî di hejmara 51em da 42 bêje ji qewlên êzîdîyan destnîşan dike ku “babzer (zanayê dînî di êzîdîtîyê da), badî/badîn (qedeh), coqe (kom, müfreze), lora (mîna, wek)” bêjeyên herî balkêş in (2012: 1).

Elîşêr di bin sernavê “Dem û rojên bi nav û nîşan”ê da navên hin demên dîyarkirî û taybetmendîyên wan rêz dike ku ji “newroz, hivde, hêkesor/zadîk, avêtik/gamêşqiran, serê gulânê, çil esir, cejna zozanan, rojveger, qurix, berxbirîn/berxbir, gûzweşînk, nan û tirî, rezçînîn, korkud, xaç, xidirnebî, roja agir/agirê filan, zîp, sersal, gîskfetisîn/gîskoguro” pêk tên û taybetmendîyên wan bi kurdî rave dike (1996-203-204). Piştî vê di hejmara 21em da 460 nifiran (1997: 236-238) û di hejmara 25em da jî 183 dua û nîyazan tomar dike (1999: 274-279). Herwek wî Selam Nûman jî di sê hejmaran da navên hin listikên gelêrî dide hev û wan dinasîne. Di hejmara 27em da navên 21 (2000: 305-306) û di hejmara 29em da jî navên 22 listikan dide ku 12 ji wan listikên derve û 10 listikên hundir in (2001: 328-329). Herî dawî di hejmara 59em da 30 bêjeyên bi “şetrenc”ê ra peywendîdar destnîşan dike (2016: 4-5). Ji bilî wan, Emîn Narozi 29 mamik û tiştanokên herêma Xerzanê di gel bersivên wan (2021: 2) û Michael L. Chayeet jî bi arîkarîya Arjen Brûsk û Reşo Zîlanî navên 68 govendan tomar dike û di hinekan da navên deverên wan jî dîyar dike. Herweha 13 bêjeyên govendgêrîyê û navên 9 amûrên mûzîkê yên govendê jî destnîşan dike (2021: 5).

4.2.2.2.4. Ferhengoka Îdyoman

Îdyom ji lêkdana çendîn bêjeyan pêk tên, ji manayên sereke wêdetir xwedî manayên nû yên mecazî ne û ji bo derbirîn û wênekirina rewşekê tên bikaranîn. Piranîya îdyoman herêmî ne û heta nekevin nav zimanê nivîskî belav nabin. Ji ber vê çêkirina ferhengokên îdyoman hem îdyomên herêmî derdixe asta zimanê edebî hem jî hêza derbirîna zimanê nivîskî zêde dike. Hemîd Kiliçaslan û Mustafa Aydoğan ji hejmara 19em heta 36em di 15 xelekan da gelek îdyomên kurdî tomar dikin ku di hejmara 19em da 42 (1996: 213-214), di hejmara 20em da 74 (1996: 217-219), di

hejmara 21em da 30 (1997: 234-235), di hejmara 22em da 55 (1997: 245-247), di hejmara 23yem da 81 (1997: 253-255), di hejmara 24em da 50 (1998: 262-263), di hejmara 25em da 84 (1999: 270-272), di hejmara 26em da 43 (di gel 3 bêjeyên kêmnas) (1999: 295-297), di hejmara 27em da 49 (2000: 303-305), di hejmara 28em da 39 (2000: 315), di hejmara 30yem da 48 (2001: 338-339), di hejmara 31em da 50 (2002: 352-353), di hejmara 34em da 48 (2004: 382-383), di hejmara 35em da 71 (2004: 387-389), di hejmara 36em da jî 119 îdyom hene (2005: 402-405). Eger ji nav van mirov çend mînakên bide “birê bûkê, serê biskê” ji bo kesên biîmtîyaz û bitorpîl (1997: 246) û “ji yekî pelikandin” ji bo şerm û tîrsa ji yekî (bi tirkî birinden çekinmek) (2000: 303) yên herî balkêş in.

Reşo Zîlan jî di pênc xelekan da hin îdyoman kom dike ku bêjeyên wan ji endamên laşên mirovan pêk tên. Bi vî awayî di hejmara 23yem da 102 (1997: 251-253), di hejmara 25em da; 58 îdyomên li ser destî, 53 îdyomên li ser devî, 15 îdyomên li ser diranan, 17 îdyomên li ser enîyê, 14 îdyomên li ser gerdenê, 28 îdyomên li ser guhî, 14 îdyomên li ser gulîyan, 8 îdyomên li ser kezîyan, 2 îdyomên li ser gurçikan û 23 îdyomên li ser lêvan (1999: 280-285), di hejmara 26em da; 7 îdyom li ser ceger, cerg û kezêbê, 1 li ser milî, 2 li ser neynûkan, 2 li ser lêvan, 15 li ser piştê (1999: 298), di hejmara 27em da; 13 li ser pêyî, 26 li ser por, pirç û mûyan û 4 jî li ser poz, difîn û bêvilê (2000: 302) û di hejmara 28em da jî; 11 li ser qûnê, 30 li ser rih, rû, ridên û rîşî, 40 li ser serî, 9 li ser stû/sî/huştu/stoyî, 4 li ser tilîyan, 4 li ser tûncikê, 14 li ser zikî, 13 li ser zimanî, 2 li ser ziravî, 3 li ser gunî û sê îdyomên serbixwe tomar dike. Hêjayê gotinê ye ku Zîlan di vê xelekê da gelek caran îdyom û bêjeyan tevlihev dike û bêjeyên asayî jî wek îdyom destnîşan dike. Bo nimûne bi tu awayî mirov nikare bêjeyên mîna “pişt, piştî, lêvsor”ê û gelekên mîna wan wek îdyom bipejirîne lê Zîlan hemûyan wek îdyom dide zanîn.

4.2.2.2.5. Tomarkirina Navên Zindîwerên Siruştî

Binavkirina zindîwerên siruştî yek ji cîyawazî û taybetmendîyên giring ên zimanan e ku di derxistina korpûsa zimanekî da nabe ku li ber çavan neyên girtin, lewra hin zindîwer hene ku li herêmeke dîyarkirî ya cîhanê dijîn û tenê niştecihên wan deran navên wan û tiştên bi wan ra peywendîdar dizanin û di zimanên xwe da kod dikin. Ji ber vê çendê jî destdan û windabûna bêjeyên weha tê manaya lawazketina hêza

zanîna mirovî û jidestdana zanyarîyên li ser van zindîweran. Ji ber vê çendê Koma Kurmancî giringîyeke taybetî dide vê mijarê û di çendîn hejmaran da bêjeyên li ser vê babetê kom dike.

4.2.2.5.1. Komkirina Navên Gul, Gîya û Daran

Bingeha vê kategorîyê di hejmara 3yem a *Kurmancîyê* da tê danîn û Koma Kurmancî ji bo danîna bingeha vê kategorîyê arîkarî ji xwendevanan dixwaze. Di vê hejmarê da navên çend gîyayên hekîmtîya kurmancî destnîşan dikin û ji xwendevanan dixwazin ku kî manayên gîyayên “meyremxurt, tirşok, qahfûr, pelewêsk, gûlik, karî, gûriz, nûsek, doçbizin, hîro”yê bi zimanên din dizane ji wan ra binivîsin (1988: 19). Li ser vê xwendevanekî ji Mîdyadê navên 11 gîyayan dinivîse û taybetmendîyên wan rave dike (1989: 29-30). Di hejmara 6em da careke din li ser navê komê arîkarî ji xwendevanan tê xwestin ku navên gîyayên “tûsî, baxoxe, bendik, kûzrek, pêmirîşk, sping, xenclîsk”ê di zimanên din da ji wan ra binivîsin (1990: 43). Ev pirsyar di hejmara 7em da jî didome û vê carê navên hin dar û kulîlkên mîna “kinêr, masîjark, germox, zersik û xemla bûkê” di zimanên din da ji xwendevanan tê pirsîn (1990: 55).

Dîyar e, endamên Koma Kurmancî ji welatê xwe dûr di nasandina navên gul, gîya û daran da dikevin tengasîyê ji ber vê navbereke dirêj didin vê mijarê û du sê civîn ne tê da, vê mijarê di civînên xwe yê bajarên welatî da dixin bernamêyê û bi arîkarîya pisporên welatî vê mijarê gotûbêj dikin. Loma jî di civîna Duhokê ya hejmara 32yem da careke din vedigerin ser vê mijarê. Bi vî awayî Reşo Zîlan navê 46 gul û gîyayan (2002: 361) û 74 daran di gel manayên wan ên latînî, tirkî, fransî û îngilîzî tomar dike û di hejmara 38em da jî Veli Kasımoğlu û Edîb Polat bi heman awayî navên 179 gîyayan destnîşan dikin û 50 gîyayan jî di gel wêneyên wan nîşan didin (2006: 425-431).

Di vê mijarê da beşdarîya herî giring rehetîyê Ehmedê Dirihî dike ku bi salan li ser navên gîyayan kar dike û di dawîyê da vê xebata xwe wek pirtûk jî çap dike (Dirihî, 2013). Dirihî cara pêşî di hejmara 38em da li ser vê mijarê dinivîse, di derheqê taybetmendîyên navên gîyayan, awayê dariştin û binavkirina wan a bi kurdî û latînî da agahîyan dide û cih dide hin gotinên pêşîyan û îdyoman ku ji navên gîyayan çê bûne⁴⁶ (2006: 433-438). Salek paşê di hejmara 40em da navên 77 gîyayan bi pênc zimanan û

⁴⁶ Cara yekem em di vê gotarê da rastî beşa “Çavkanî”yê tên ku di *Kurmancîyê* da hatiye nîşandan.

147an jî di gel wêneyên wan bi kurdî û latînî dide (2007: 456-463). Ji bilî vê di hejmara 48em da bi arîkariya Eyûb Kiran û Xalidê Hekarî vê carê navên 23 gîyayan bi pênc zimanan û 22yan jî di gel wêneyên wan bi kurdî û latînî dide (2011: 6). Di hejmara 50yem da navên 36 daran bi pênc zimanan û di gel wêneyan dide (2012: 2-3). Ji bilî vê di du hejmaran da di bin sernavê “Gulûgîyayên Kurdistanê” da navên hin gul û gîyayên Kurdistanê bi kurdî û latînî dide. Di hejmara 58em da diyar dike ku hin gul û gîyayên ku li Kurdistanê hatine dîtin bi latînî navên kurdan li wan hatiye danîn. Bi vî awayî navên 20 gul û gîyayan di gel wêneyên wan destnîşan dike (2016: 10). Herî dawî di hejmara 59em da navên 42 gul û gîyayan bi kurdî û latînî û di gel wêneyên wan tomar dike (2016: 6-8).

Li ser vê rêçê Abdunnasir Yıldız behsa “kuvarik”an dike û 18 cureyên wan bi pênc zimanan û di gel wêneyan dide (2013: 1), Behrûz Şucaî navên 12 gul û gîyayên Gelîyê Kotolê di gel pênc zimanan û wêneyan nîşan dide (2021: 3-4) û navên 18 “nexweşîyên nebatên çandinê” bi pênc zimanan û di gel wêneyan dide ku bi vê mijarê ra têkildar in (2016: 5).

4.2.2.2.5.2. Navên Ajelan û Bêjeyên Têkildarî Wan

Cara pêşî Hazim Kiliç bingeha vê kategorîyê datîne û navên 105 pez û dewaran destnîşan dike (1991: 61-64). Piştî wî Mizaffer Begzade 59 navên têkildarî hespan (1991: 69-70) û Hemîd Kiliçaslan jî li ser heman mijarê di hejmara 30em da 22 bêjeyan di gel wêneyên wan destnîşan dike (2001: 346). Navborî di bin sernavê “Heywanên nav malê” da jî bêjeyên li ser kevok, mirîşk, elok, qaz-werdek, se, tajî, pisîk, kergo û keroşkê berhev dike. Tenê di beşa mirîşkê da bi zimanên din manaya bêjeyan dide lê ji bo ajelên din tenê agahîyên mîna cih, zayend û rengên wan destnîşan dike (1992: 85-86). Di heman hejmarê da bê ku navê amadekar bê nîşandan di nav xişteyekê da di bin stûnên “nav, bankirin, qewirandin û werkî din”ê da taybetmendîyên mirîşk, dîk, keroşk, kew, kûçik, ker, dahşik, çêlek û hespan û di bin sernavê “Dengê Lawirên Kedî”yê da jî navên dengê mirîşk, kew, kurk, kûçik, ker, hesp û keroşkan tê tomarkirin. (1992: 86-87). Herî dawî Elîşêr li ser “navlêkirina heywanên kedî” dinivîse û tenê bi kurdî navên taybetî yên hin ajelan destnîşan dike ku ji 103 navên taybetî yên mihan, 36 navên taybetî yên bizinan, 29 navên taybetî yên gayan, 14 navên taybetî yên çêlekan, 72 navên taybetî yên seyan, 21 navên taybetî yên pisîkan, 13 navên taybetî

yên gamêş û madekan, 16 navên taybetî yên hesp û mehînan û jî 6 navên taybetî yên hêstiran pêk tên.

Li ser balindeyan Reşo Zîlan 15 bêjeyan di gel wêneyên wan (2002: 363-364) û Fikret Ertek û Rûken Bagdu Keskîn jî 35 bêjeyan di gel wêneyan (2011: 4-5) tomar dikin. Herweha Îsmail Taha Şahîn di bin sernavê “Balindeyên li Kurdistanê” da di hejmara 54em da pêşî li ser balindeyên li Kurdistanê agahîyan dide paşê navên 65 balindeyan destnîşan dike (2014: 3-5) û di hejmara 58em da jî navên 43 balindeyan bi pênc zimanan û di gel wêneyan tomar dike (2016: 4-5). Navborî di hejmara 58em da 33 endamên laşên çûkan (2016: 6) û di hejmara 59em da jî 59 “peyvên girêdayî bi balindeyan ve” berhev dike ku di nav wan da ya herî balkêş “kewê davdoz” e û manaya “kewê ku davan dibîne” dide (2016: 1-2). Bi rêya vê bêjeyê derdikeve ku herçend îro lêkera “dozîn”ê di kurmancî da hatibe jibîrîkirin jî berê herwek “dozînewe”ya soranî hebûye û bi rêya wê hin bêje jî hatine çêkirin ku “davdoz” û “wardoz” mînakên vê ne.

Eyûb Kiran di vê kategorîyê da kesê herî çalak e. Di sê hejmaran da bêjeyên li ser heşereyan bi pênc zimanan û hinekan jî di gel wêneyên wan tomar dike. Bi vî awayî di hejmara 50yem da 14 (2012: 3), di hejmara 52yem da 22 (2013: 5) û di hejmara 58em da jî 34 bêjeyan dide hev (2016: 8-9). Herweha di heman hejmarê da li ser entomolojîyê 13 bêjeyan destnîşan dike ku “gel”a paşgira pirhejmarîyê ya goranîyê di bêjeyên “perwangel: kelebekler-lepidoptera, mêşgel: çiftkanatlılar- diptera, fly” (2016: 9) bêjeyên herî balkêş in. Ji bilî vê, di hejmara 50yem da piştî ku bi giştî behsa masîvanîya bakurê Kurdistanê dike li ser sê cure masîyên Mala Badê radiweste ku ew jî “şelq, şimşûl û kerkerok” in. Li dû vê behsa nêçîra beravanîyê ya çemê Batmanê dike û çend cureyên masîgirîyê destnîşan dike. Di encamê da bi pênc zimanan û di gel wêneyan cih dide 19 celebên masîyan ku li Kurdistanê Bakur tên dîtin (2012: 4-5). Di hejmara 58em da li ser “fauna, semender, beq, req û kûsîyan” 15 bêje bi pênc zimanan û 14 jî di gel wêneyan (2016: 2), di hejmara 62yem da li ser gumgumokan 28 (2018: 1-2), di hejmara 64em da li ser “Marên Kurdistanê” 33 bêje di gel hin wêneyan (2019: 1-2) û di hejmara 65em da jî navên 23 ajelan tomar dike ku di latînî û zimanên din ên cîhanê da bi navên kurd û Kurdistanê hatine binavkirin (2019: 3).

Di vê kategorîyê da herî dawî em dikarin behsa bêjeyên têkildarî ajelan bikin ku Rojan Hazim li ser nexweşîyên wan 45 (1997: 239-240), Lezgînê Çalî û Rûken

Bagdu Keskîn 76 (2011: 1-2), Têmûrê Xelîl li ser zayîn û mirina ajelan 14 (2003: 370-371), Eyûb Kiran li ser pezxwedîkirinê di hejmara 50yem da ji herêma Milan 19 (2012: 6), di hejmara 52yem da 69 (2013: 2-3) û di hejmara 54em da jî 24 bêjeyan (2014: 2) tomar dikin.

4.2.2.2.6. Tomarkirina Bêjeyên Têkildarî Çanda Kurdî ya Pêşmodern

Yek ji armancên giring ên Koma Kurmancî tomarkirina bêjeyên qadên cîyawaz ên jîyana kurdewarî ye da ku di bin çerxa asîmîlasyonê da winda nebin û bigihîjin nîfşên paşerojê. Ji ber vê ji hejmarên pêşî heta dawîyê berdewam ji qadên cîyawaz ên jîyana kurdewarî ya pêşmodern gelek bêje û zarave tên tomarkirin ku ji xwarin-vexwarin, cilûberg, xanî û amanên navmalê, bêjeyên karûbarên gelêrî û hunerên destî û bêjeyên çend mijarên têkel li xwe digire.

4.2.2.2.6.1. Navên Xwarin û Vexwarinan

Cara yekem Khosrow Abdollahî di hejmara 8em da 30 bêjeyên berhemên şîrî berhev dike (1991: 66) û Zinar Soran li ser nan û nanopêjîyê 42 bêjeyan tomar dike (1993: 128-129). Elîşêr di du hejmaran da navên hinek xwarinên Serhedê kom dike û yek bi yek terîfa wan dide. Bi vî awayî di hejmara 26em da 58 (1999: 291-293) û di hejmara 27em da navên 20 xwarinan tomar dike (2000: 301). Herweha di hejmara 29em da li ser çêkirina penîrê kurdewarî, nav û cureyên penîrî radiweste û 17 navên li ser vê mijarê bi çar zimanan pêşkêş dike (2001: 331-332). Salih Akin di hejmara 48em da li ser hingivî û mêşvanîyê radiweste û navên 15 cureyên hingivî, navên 9 kewar û alavên wê, 7 celebên mêşan, 3 navên xwarina mêşan, 9 îdyomên li ser wan û 10 bêjeyan jî di gel wêneyan destnîşan dike (2011: 3). Herî dawî Hemîd Kiliçaslan hin berhemên tirîyê vedikole û diyar dike ku ji bo vê mebestê bi mêvanî diçe mala Hecî Mihemed Bakayî (Ji Misûrê) û ji wî û xanima wî ku her du jî dora 72 salî ne, zanyariyên çêkirina berhemên şîreya tirîyê hîn dibe û di vê çarçoveyê da 18 bêjeyên li ser vê mijarê tomar dike ku 6 ji wan di gel wêneyan hatine destnîşankirin (2016: 3).

4.2.2.2.6.2. Bêjeyên li ser Xanî û Amanên Navmalê

Hemîd Kiliçaslan di sê hejmaran da li ser zaraveyên avakirina xanîyan û bêjeyên peywendîdar radiweste. Di hejmara 12em da 26 zarave li ser xanî û 47 li ser avakirinê (1993: 111-113), di hejmara 13em da 30 zarave li ser avahîyê û 20 navên alavên avahîyê di gel wêneyên wan (1993: 130-131) û di hejmara 54em da bi arîkarîya

M. Selîm Gokçenî li ser kevirên Mêrdînê, avahîyên wê û navên wan agahî dide. Li dû vê 22 bêjeyên li ser vê mijarê tomar dike ku 13 ji wan bi wêne hatine nişandan û di dawîya xebata xwe da jî cih dide çend dîmenên avahîyên Mêrdînê (2014: 6-7). Khosrow Abdollahî navên 73 amanên nav malê (1992: 102-103), Elişêr 15 navên amanên axîn (2001: 335) û Reşo Zîlan jî li ser “hewan”ê 16 navan di gel wêneyên wan tomar dike (2002: 360). Herî dawî Selam Nûman di bin sernavê “Xanî Mal û Navmalê”ê da di hejmara 37em da 24 (2005: 417), di hejmara 41em da 137 (2007: 2-4) û di hejmara 44em da jî 22 bêjeyan tomar dike (2009: 4).

4.2.2.2.6.3. Navên Cilûbergan

Li ser navên cilûbergên kurdî tenê sê kes dinivîsin. Muzaffer Begzade di hejmara 11em da 59 navên cilûbergên gelêrî yên kurdî tomar dike (1992: 97-99). Husên Binavî li ser bergûzên (şal û şapik) Behdînanî 16 navan bi çar zimanan û 15yan jî di gel wêneyan tenê bi kurdî rave dike (1999: 285-286). Herî dawî Rojan Hazim li ser 6 modelên bergûzan radiweste ku ji bergûzên “şemdînanî, ertoşîyanî-zaxoyanî, şirnexyanî-botî, koçerî, rênçberî û sineyî-bokanî” pêk tên û yek bi yek beşên van modelan dinasîne û terîfa wan dike (1999: 290-291).

4.2.2.2.6.4. Bêjeyên Karûbarên Gelêrî û Hunerên Destî

Mizaffer Begzade 76 zaraveyên dezgehên cotkarîyê li herêma Şikakan (1991: 64-65) û 25 bêjeyên li ser konan (1992: 90), Elişêr navên 40 alavên çandinîyê (1995: 155-156), 13 bêjeyên li ser tevnê (1993: 121) û 27 bêjeyên li ser aşî (1995: 177), Rojan Kılıç/Hazim di hejmara 6em da 202 (1990: 43-46), di hejmara 7em da 49 zaraveyên çandinîyê (1990: 51-52) û 9 zaraveyên li ser kurinc û kurincîyê (1995: 193-194), Zinar Soran jî li ser zaraveyên çandinîyê yên herêma Mêrdînê 111 (1991: 57, 59-61), li ser ristînê û tiştên peywendîdar 46 (1994: 135-136) û li ser aşê avê jî 35 zaraveyan bi çar zimanan û 18 zaraveyan jî bi pênc zimanan destnîşan dike ku beşek ji wan biwêne ne. Navborî dîyar dike ku ev zanyarî ji hostayekî aşê avê wergirtine ku navê wî Hecî Ezîzê Şêx Elo ye li herêma Mêrdînê li gundê Darê dijî û temenê wî ji 80 salan derbaz kirîye (2008: 4-5). Hemîd Kiliçaslan bi arîkarîya Birahîm Cîhanê hostayê têlkarîyê li ser hunera têlkarîyê 32 bêjeyan bi çar zimanan û 25an jî di gel wêneyan tenê bi kurdî rave dike (2013: 4-5). Îsmail Taha Şahîn jî 35 nexşên beran di gel wêneyên wan tenê bi kurdî dinasîne (2019: 5-6).

4.2.2.2.6.5. Bêjeyên Çend Mijarên Têkel

Ji bilî van kategorîyên jorîn çend mijarên din jî hene ku bêjeyên wan di *Kurmancîyê* da tên komkirin. Di hejmara duyem da li ser navê Koma Kurmancî navên 24 rengan (1988: 7), 40 meyweyan (1988: 7-8) û 51 navên heşînahîyan tên komkirin ku em dikarin çend mînakên mîna “kelem (lahana), gulkelem (karnabahar), sêvaxîn (yerelması), xes (marul), baqil (bakla), tevrik-tivir (turp), şêlim (şalgam), silk (pancar), siyele (ıspanak), karî – kuvark – kumik – figerojk – karkulîlk – karok (mantar), catirî (kekik)”ê bidin (1988: 8) ku îro li gelek herêman hatine jibîrkin û di şûna kurdînan wan da tirkîyên wan tên bikaranîn. Li ser navê komê di hejmara 20em da jî 5 awayên simbêlan di gel wêneyên wan tên tomarkirin (1996: 215). Hemîd Kiliçaslan di hejmara 12em da 80 bêjeyên li ser malbat û mirovatîyê (1993: 118-119), di hejmara 17em da jî bi arîkarîya Dîlawerê Zengî 58 zaraveyên li ser çekan tomar dike (1995: 191-192). Lutfî Baksî 93 bêjeyên li ser zewacê (1994: 150-154) û Reşo Zîlan jî di hejmara 3yem da navên 33 biharatan tomar dike ku hinekên mîna “rizyane – cehcehik (rezen - common fennel), zîre (kimyon – cumin), anix – anîs (anason – anise), hêl (kakule – cardamom), pîjînda – şiwît (dere otu – aneth)” (1988: 16-17) di nav gelek kurdan da nayên zanîn û di şûna wan da bêjeyên bîyanî tên bikaranîn. Herweha di hejmara 20em da navên 83 kevirên bihadar (1996: 227-230), di hejmara 22yem da 127 bêjeyên zimanê zarokan (1997: 242-245) û 16 bêjeyên li ser “berd-devî/teras”ê jî kom dike (2002: 359).

4.2.2.3. Zaravesazî di Qadên Jîyana Modern da

Ji bo kodkirin, pêşvebirin û plandanîna paşeroja zimanekî tomarkirina bêjeyên heyî yê raborî têr nake. Bi taybetî di serdema modern da bi guherîn, pêşketin û geşedanên qadên curbicur pêwîstî bi dariştin yan peydakirina hin zaraveyên nû çê dibe. Bêguman neteweyên ku biker, dahêner û berhemhênerên zanist û teknolojîya nû ne, bi awayekî siruştî karê navlêdanînan û zaravesazîyê çareser dikin lê ji bo neteweyên kartêkirî û wergirên zanist û teknolojîya nû nasîn û binavkirina wan dibe kêşeyeke girîng. Di vê rewşê da ev zarave yan jî zimanên serçavî tên wergirtin, yan tên wergêran yan jî di zimanên wergir da jî nû ve tên dariştin. Dema mirov bala xwe dide azmûna neteweyên cîyawaz ev her sê rêbaz jî tên peyrewkirin. Lê divê mirov bibêje ku di hin qadan da nûnerên zimanên wergir sûd ji gencîneya bêjeyên xwe jî werdigirin, carinan

bi rêya analojîyê zaraveyên nû çê dikin carinan jî bi rêya berfirehkirinê, manayên nû yên zaraveyî li bêjeyên berê bar dikin.

Koma Kurmancî jî kêr zêde bi vî awayî berê xwe dide zaravesazîya jîyana modern. Di destpêkê da hin zarave li ser navê komê bîn destnîşankirin jî herwek arasteya giştî ya *Kurmancîyê* di hejmarên paşê da her beşdar li gor pisporîya xwe hin zaraveyan amade dike û di encama gengeşekirina wan da ew zarave di hejmarên *Kurmancîyê* da tên weşandin. Mirov dikare zaraveyên *Kurmancîyê* bi ser van qadan da dabeş bike: (1) zaraveyên kargêrî û sîyasî, (2) zaraveyên anatomî û pîzîşkîyê, (3) zaraveyên hîqûqî, (4) zaraveyên rêziman û zimannasîyê, (5) zaraveyên edebî, (6) zaraveyên cografî, (7) zaraveyên matematîkê, (8) zaraveyên aborî, (9) zaraveyên leşkerî, (10) zaraveyên rojnamevanîyê, (11) zaraveyên kompîturê, (12) zaraveyên trafikê, (13) zaraveyên futbolê, (14) zaraveyên rêzgirtinê û (15) zaraveyên çend mijarên têkel.

4.2.2.3.1. Zaraveyên Kargêrî û Sîyasî

Ev kategorî li ser navê Koma Kurmancî ji hejmara 2yem dest pê dike, di vê hejmarê da 70 (1988: 11-12) û di hejmara 3yem da jî 69 zarave tên destnîşankirin (1988: 17-18). Di danîna van zaraveyan da bi piranî ji gencîneya zimanê kurdî û zimanên bîyanî sûd bê wergirtin jî carinan rêbaza dariştin, berfirehkirin û sûdwegirtina ji kurdîya soranî jî tê peyrewkirin. Bo nimûne “bajar, navçe, hawîr, dever, tax, hevotin” mînakên bêjeyên xwemalî; “serbajar (başkent) û nijadkuji (soykırım/genocide)” mînakên wergêrana ji zimanên din, “berbajar, bajarok, bajaravahî, hinare, hawirparêzî” mînakên dariştinê, “çandin (tarîm) û hevotin (eğitim)” mînakên berfirehkirina manayî; “dewlet, hukûmet, wezareta budcê, wezareta malîyê, wezareta enerjîyê, statu, referendum” mînakên wergirtina ji zimanên hevmalbat, cîran û bîyanî û “komar, serokkomar, bergirî, dengdan, hîlbijartin, hîlbijêr” mînakên sûdwegirtina ji kurdîya soranî ne.

Hêjeyî gotinê ye, di vê kategorîyê da carinan hin bêjeyên çewt jî tên dariştin. Bo nimûne di hejmara duyem da ji bo “adalet bakanlığı/ministry of justice”yê “wezareta dadîyê” (1988: 11) û di hejmara 3em da jî “wezareta dadmendiye” (1988: 17) tê gotin ku bi raya me her du jî çewt in. Lewra “edalet” “dad” e, ne ku “dadî” û “dadmendî” ye û pêwîst nake di mînaka pêşî da paşgira rengdêrçêker a “-î”yê û paşgira

bikerçêker (îsmê faîl) a “-mend”ê lê bê zêdekirin. Bi raya me “wezareta dadê” ya herî rast e û di roja îro da di kurdîya soranî da jî herwek “wezaretî dad” tê bikaranîn. Jixwe salek paşê di danîna zaraveyên hiqûqî da ji bo bêjeya “adelet / justice”ê bêjeya “dad”ê tê danîn (Kaval, 1989: 39) û ev çewtî tê rastkirin. Herwek vê, herçend ji bo “tarîm/agriculture”ê “çandin” bê danîn jî di binavkirina wezareta wê da paşgira rengdêrçêker “-î”yê lê tê zêdekirin û wek “wezareta çandiniyê” tê bikaranîn ku ev jî şaş e û divê wek “wezareta çandinê” bihata binavkirin.

Li ser navê komê di vê kategorîyê da tenê ev zarave tên destnîşankirin lê di hejmara 38em da Samî Ergoşî li ser dezgehên dewletê 49 zaraveyan tomar dike ku di nav van da “sexbêrî (bakîm/maintenance), avero (lağîm, kanalizasyon/sewers)” (2006: 432-433) hêjayê balkişandinê ne. Bi taybetî cihê “sexbêrî”yê di nav kurdên Tirkîyeyê da vala ye û piranîya wan di jîyana xwe ya rojane da “baxim”a tirkî bi kar tînin.

4.2.2.3.2. Zaraveyên Anatomî û Pizîşkîyê

Zaraveyên anatomîya mirovî di çend hejmarên pêşî yê *Kurmancîyê* da li ser navê komê tên destnîşankirin. Di hejmara 3yem da kiloxeke serî, ji alîyê pêş û paş ve anatomîya jinekê û şikilê dev, diran, guh û çavên mirovî tên xêzkirin û li ser van xêzan her organek bi hejmarekê tê nîşandan û di bin da jî navên van organan bi kurdî, tirkî, fransîzî û îngilîzî tên nivîsîn. Bi vî awayî 28 zarave li ser serî, 15 li ser rûyî, 3 li ser stûyî, 10 li ser guhî, 13 li ser dev û gewrîyê, 11 li ser diranan û 14 jî li ser çavî tên destnîşankirin (1988: 13-15). Herweha bi vê rêbazê li ser organên cîyawaz ên mirovî di hejmara 5em da 42 (1989: 31-32), di hejmara 6em da 83 (1990: 41-42), di hejmara 7em da 44 (1990: 49-50) û di hejmara 8em da jî 43 zarave tên tomarkirin (1991: 67). Ev zarave bi tevahî ji çavkanîyên kurdî tên berhev kirin û bêjeyên xwemalî ne. Tevî vê herçend “pêçî” û “tilî” di devokên cîyawaz da di şûna hev da bînan bikaranîn jî di vê xebatê da ji bo parastin û kodkirina her du bêjeyan “pêçî” ji bo pê û “tilî” ji bo destan tên bikaranîn (1990: 42).

Lezgînê Çalî wek pisporê vê qadê di hejmara 48em da careke din vedigere ser vî mijarê û di du hejmaran da li ser sedemên paşvemana zaravesazîyê di zimanê kurdî da û rêbaza danîna zaraveyên zanistî radiweste. Ew jî herwek Celadet Bedirxanî sedema sereke ya pêşneketina zaravesazîya kurdî bi nebûna hikûmet û dewleteke kurdan ve girê dide. Bi dîtina wî di rewşeke weha da danîna zaraveyên zanistî nabe

pêwîstîyeke jîyanî û tenê dibe derdê hin dezgeh û derûdorên xemxwar (2011: 1). Li aliyê din zimanên ku nabin zimanên zanistan, paşeroja wan tarî dibîne û ji vî aliyê ve zaravesazîya zanistî ji bo her zimanekî karekî jîyanî û çarenûssaz dizane. Li ser rêbaza dariştina zaraveyên zanistî jî dîyar dike ku zaravesazîya her zanistekê beşek e ji wê zanistê û divê di serî da ew zanist bi başî bê zanîn, cîyawazî û newekhevîya bûyeran, bûneweran, hestan û konseptan bi başî bê destnîşankirin û paşê ji bo wan navên guncaw bên peydakirin. Ji bo peyrewnekirina vê rêbazê û liberçavnegirtina cîyawazîya “heat” û “thermo”yê di kurdîya soranî da ji bo “thermometre”yê “germapêw” tê danîn ku bi raya nivîskarî divê ev “thênpîv” bûya (2012: 5).

Li aliyê din Çalî di danîna zaraveyên zanistî da liberçavgirtin û sûdwegirtina ji rêzimana kurdî pêwîst dibîne. Di vê çarçoveyê da pêşnîyaz dike ku eger hinek çemkên zanistî ji zimanên din bên deynkirin jî divê li gor rêzimana kurdî serederî bi wan ra bê kirin û bi rêya paşgir û pêşgirên kurdî ji wan, bêjeyên nû bên dariştin. Ji bo vê mînaka “ion”ê dide ku bilêvkirina wê ya kurdî dibe “ayon” û divê wek bilêvkirina wê bê nivîsîn û “ionization” û “ionized” jî bi paşgira “-andin” û “î”yê wek “ayonandin”ê û “ayonandî”yê bê kurdîkirin (2012: 5). Bi vî awayî ji bo kurdîkirina zaraveyên zanistî giringîyeke taybetî dide sîstema dariştina kurdî û berî ku hin zaraveyên pizîşkî destnîşan bike bal dikêşe ser hin paşgir û pêşgiran ku di dariştina zaraveyên zanistî da gelek tîrî bikaranîn û li hember wan hin paşgir û pêşgirên kurdî pêşnîyaz dike da ku bi rêya wan bi hêsanî zaraveyên pizîşkî û zanistî bên dariştin. Di mînaka paşgiran da ji bo paşgira “-itis”ê paşgira “-kulî”yê, ji bo “-scopy” û “-scope”yê “-bîn” û “-bînî”yê, ji bo “-tomy”yê “-kelêşî”yê, ji bo “-ectomy”ê “-jêkirin”ê, ji bo “-ostomy”ê “-derkelêşî”yê, ji bo “-centesis”ê “-kêşî”yê, ji bo “-rhaphy”ê “-dirûn”ê, ji bo “-gram” û “-graph”ê “-nîgar” û “-nîgarî”yê, ji bo “-meter” û “-metry”ê “-pîv” û “-pîvî”yê, ji bo “-ize” û “-fy”ê “-andin” û “-în”ê pêşnîyaz dike. Di mînaka pêşgiran da jî ji bo “macro-” û “micro-”yê “gir-” û “hûr-”ê, ji bo “hypo-” û “hyper-”ê “kêm-” û “pir-”ê, ji bo “pseu-”yê “zir-”ê, ji bo “inter-” û “intra-”yê “nav-” û “hindur-”ê, ji bo “infra-” û “sub-”ê “jêr-” û “bin-”ê, ji bo “ultra-” û “supra-”yê “jor-” û “ser-”ê û ji bo “meta-”yê jî “dî-”yê pêşnîyaz dike (2012: 6).

Li ser vê bingehe di hejmara 52yem da 30 (2013: 6), di hejmara 54em da 70 (2014: 8), di hejmara 57em da 19 (2015: 4), di hejmara 58em da 56 (2016: 1-2), di hejmara 60em da 32 (2017: 4), di hejmara 62yem da 39 (2018: 5) û di hejmara 63em

da jî 39 zaraveyan tomar dike (2018: 2). Di mînaka van zaraveyan da Çalî navên nexweşîyên ku di kurdî da hene bê destkarî ji gencîneya kurdî werdigire ku “avis, azar” (2013: 6), “ta, teşenekirin, tevizîn” (2017: 4) mînakên vê ne. Bêjeyên ku bergindên wan di kurdî da nînin bi rêya paşgirên navborî dadirijîne ku “baguhkulî: orta kulak iltihabî - barotraumatic otitis” (2013: 6), “dilkulî (kalp iltihabî - carditis)” (2014: 8), “kezepkulî (hepatit - hepatitis)” (2015: 4), “hinavbînî (endoskopi - endoscopy), pestpîv (sphygmomanometer, barometer)” (2016: 1), “aşîkbînî (gastroscopy), hûrbînî (microscopy), hûrbînk (microscope)” (2018: 5), “tîrêjnas (radiologist), tîrêjnasi (radiology), tîrêjnigar (radiogram), tîrêjnigarî (radiography)” (2018: 2) jî mînakên vê kategorîyê ne.

4.2.2.3.3. Zaraveyên Hiqûqî

Zaraveyên hiqûqî di *Kurmancîyê* da ji alîyê du kesan ve tên tomarkirin. Mûsa Kaval di hejmara 5em da 33 (1989: 39) û di hejmara 6em da jî 42 zaraveyên giştî yên hiqûqê tomar dike (1990: 47). Piştî wî Veysî Zeydanli di hejmara 10em da 29 (1992: 91), di hejmara 11em da 35 (1992: 107-108), di hejmara 12em da 21 (1993: 115-116), di hejmara 13em da 23 (1993: 121-122), di hejmara 16em da 16 (1995: 171) û di hejmara 23em da jî 21 zaraveyan tomar dike (1997: 250).

Herçend di nav van zaraveyan da hin bêjeyên guncaw ên mîna “berevanî (savunma - defence), peyitandin (ispat etmek - to prove), jêpîrsîn (sorgulama, sorgu - questioning), venêrîn (denetleme, doğrulama - checking, verification), lêgerîn (araştırma - research), vekolîn (soruşturma, tahkikat - inquiry, investigation)” (1992: 107), “deyndar (borçlu - debtor, indebted), deyndêr (alacaklı - creditor)” (1993: 121) hebin jî hin zarave rasterast li ser wergêrana zaraveyên tirkî tên danîn ku “binçav, jêrçav (göz altı - in custody)” (1992: 108), “guwahê çavkî (görgü tanığı - ocular witness)” (1993: 121) mînakên vê ne.

Ji bilî van hin caran ji bo heman manayê du zaraveyên cîyawaz jî tên danîn ku ji bo “tesdîq”ê hem “rastandin” hem “pejir” û ji bo “teswîb”ê jî hem “rastandin” hem jî “pesend” tên destnîşankirin (1995: 171) û manayên van zaraveyan bi tevahî tên tevlihevîkirin. Dîsa “pawan (gardiyan - guard)” (1992: 108), “serdest (başat - dominant), karîn (iktidar - power), desthilat (yetki), desthilatdar (yetkili)” (1997: 250) ji alîyê manakirinê ve nerast in û ne berê ne jî di roja îro da bi vê manayê nehatine û

nayên bikaranîn. Herweha di mînaka “qanûndanêr”ê da jî (1997: 250) paşgira “-er”ê bi çewtî wek “-êr”ê tê bikaranîn ku di kurdî da paşgireke weha nîne.

4.2.2.3.4. Zaraveyên Rêziman û Zimannasîyê

Zaraveyên rêzimanê cara pêşî di hejmara 9em da bi hevbeşî tên weşandin ku ji 75 zaraveyan pêk tên (1991: 77-78). Piranîya van zaraveyan jî wan zaraveyan pêk tên ku Celadet û Kamiran Bedîrxanî bi kar anîne lê karîgerîya Kamiran Bedîrxanî zêdetir xuya dike û zaraveyên mîna “pêşdanî (önek – prefix), paşdanî (ardek – suffix), tof (grup – group), erînî (olumluluk – affirmative), neyînî (olumsuzluk – negative)” nîşaneyên vê karîgerîyê ne. Lê tevî vê girêdanê Koma Kurmancî hin zaraveyên wan diguherîne. Herçend Celadet û Kamiran Bedîrxan “dengdar”ê di manaya “consonant”ê da bi kar bînin jî Koma Kurmancî manaya “vowel”ê lê bar dike û ji bo “consonant”ê zaraveya “bêdeng”ê datîne. Herweha di şûna “yekejmar” û “gelejmar”a wan da “tekane” û “pirane”yê datîne û di mînaka zaraveya “hevmana”yê da jî “mana”ya wan bi “mane”yê diguherîne. Ji bilî vê, hin zaraveyên mîna “kîtandin (hecelelemek)” û “tîpandin (harfî harfîne yazdırmak)”ê jî dadirijînin (1991: 77-78).

Ji hejmara 10em û bi şûn da zaraveyên rêzimanê ji alîyê Rojen Barnasî ve tên tomarkirin. Barnas dîyar dike ku xebatên destpêkî yên li ser zaraveyên rêzimanê ji alîyê Celadet û Kamiran Bedîrxanî ve hatibin kirin jî hin caran zaraveyên wan hev nagirin û carinan xebatên pêşî û paşî yên Kamiran Bedîrxanî jî hev nagirin. Di vê çarçoveyê da jî bo destnîşankirina zaraveyên rêzimanê çar rêzikan datîne: (1) Eger zaraveyên wekhev ên Celadet û Kamran tevlihev nebin divê wek xwe bîn qebûlkin, (2) Zaraveyên wan ên ku hev nagirin kîjan jî alîyê manayê ve rasttir û ji alîyê bilêvkinê ve siviktir be divê ew bê hîlbijartin, (3) Divê ji xebatên din sûd bê wergirtin, (4) Eger ji bo zaraveyek jî van her sê rêyan encamek bi dest nekeve wê demê divê navekî nû yê kurmancî bê danîn (1992: 92). Piştî vê dest bi danîna zaraveyên rêzimanê dike û di hejmara 10em da 39 (1992: 92-93), di hejmara 11em da 43 (1992: 108-109), di hejmara 12em da 57 (1993: 113-115), di hejmara 13em da 44 zaraveyan tomar dike (1993: 132-133).

Barnas di mînaka van zaraveyan da herçend bi piranî zaraveyên her du birayên Bedîrxanî hîlbijêre jî di mînaka “têper” û “têneper”ê da carinan jî kurdîya soranî jî sûd werdigire (1993: 114). Herweha di mînaka “awayê navkî (nominative)”ê da kêmbê jî

carinan li ser modela îngilîzî û fransî hin zaraveyan dadirijîne û di mînaka “tişte (object)”ê da jî li ser analojîya van zimanan carinan zaraveyên nû datîne. Di nav zaraveyên Barnasî da yên herî balkêş zaraveyên deman in ku roja îro piranîya wan nayên bikaranîn. Ji bo dema borî ya nêzik “raborîya sade”, ji bo dema borî ya temam “raborîya çîrokî” û ji bo dema borî ya berdewam/domdar “raboriya berdest”ê bi kar tîne. Li alîyê din navên hin deman û mînakên wan dide ku di kurdî da nînin û hinek ji wan jî ne dem in, rawe ne. Bo nimûne; li hember “raboriya dûr a liserbûyînê” dibêje “ez dimabûm” ku di deqên kurdî da mirov rastî demeke weha nayê û li hember “dahatiya pêş” jî dibêje “ezê mabim” (1993: 115) ku bi bawerîya me ev jî ne dem e, rawe ye.

Herî dawî Mistefa Aydogan û Newzad Hirorî di du hejmaran da li ser zaraveyên zimannasîyê radiwestin û di hejmara 50yem da 42 (2012: 1-2) û di hejmara 52yem da jî 40 zaraveyên giştî yên zimannasîyê destnîşan dikin (2013: 6) ku peywendîya wan bi taybetmendiyên zimanan heye.

4.2.2.3.5. Zaraveyên Edebî

Rojen Barnas di du hejmarên *Kurmancîyê* da li ser zaraveyên edebî radiweste. Pêşî zaraveyên edebîyata klasîk destnîşan dike û paşê berê xwe dide yên nûjen û bi rêbaza ansîklopedîk her zaraveyeke edebî yek bi yek rave dike. Bi vî awayî di hejmara 7em da 88 (1990: 52-55) û di hejmara 8em da jî 55 zaraveyên edebîyata klasîk û nûjen tomar dike (1991: 57-58). Barnas di destnîşankirina zaraveyên edebîyata klasîk da hem rêbaza nerîtî hem jî ya petîger peyrew dike. Loma jî ji alîyekî ve zaraveyên erebî yên mîna “edebîyat, nezm, nesr, menzûm, redîf, xezel, qesîde, mesnewî”yê bi kar tîne li alîyê din zaraveyên çekirî yên mîna “kêş (wezn), beşavend (qafîye), rawest, malik, çarîn (rubai), çarane (muraba), pêncane (muxemmes)”yê bi kar tîne. Bi taybetî di hunerên edebî da bêhtir ber bi rêbaza petîger ve dişikîne û zaraveyên mîna “pircare (tekrrir), jêwergirtin/jêveguhastin (îqtîbas), pêç û belav (lef û neşr), nezanîya bi zanîn (tecahulê arif), xweşbehane (husnê ta’lîl), kesandin (teşxîs), peyivandin (întaq), lihevî (tenasub), niç (tarîz), dirûvpêxistin (teşbîh)”ê dadirijîne. Li alîyê din bi çewtî ji bo “pîşe”yê “pêşe” ji bo “vegêran”ê “vegêrîn” (1990: 52), ji bo “şano”yê “şanû” û ji bo “ceribandin”ê “cêribandin”ê bi kar tîne (1991: 58). Herweha bi dîtina me, zaraveyên “çendahîn (kemiyyet)” û “çawahîn (keyfiyyet)”ê jî (1990: 53) çewt dadirijîne. Lewra di

kurdî da paşgira “-ahîn”ê nîne û divê di şûna vê da paşgirên “-ahî” yan jî “-anî”yê bi kar bianiya.

4.2.2.3.6. Zaraveyên Cografi

Elîşêr di hejmara 10em da 25 (1992: 87) û di hejmara 33yem da jî 27 zaraveyan tomar dike (2003: 368). Di nav wan da zaraveyên çêkirî nînin û hemû jî ji gencîneya zimanê kurdî hatine berhevkirin. Ji alîyê me ve zaraveya herî balkêş “kuran (havza – basin)” e (2003: 368) ku ji alîyê gelek kesan ve nayê nasîn.

4.2.2.3.7. Zaraveyên Matematîkê

Hemîd Kiliçaslan û Behrûz Şucaî di du hejmaran da li ser vê mijarê radiwestin. Di hejmara 24em da 26 (1998: 259) û di hejmara 25em da jî 36 zaraveyan tomar dikin (1999: 269-270). Ji ber ku matematîk ji bo kurdan qadeke nû ye bêjeyên ku di vê kategorîyê da tên tomarkirin jî yan dariştî ne yan jî bi berfirehkirina manayî tên çêkirin. Di vê çarçoveyê da bêjeyên mîna “kirarî (işlem – operation), kêmek (eksi – minus), zêdek (artı – plus), carandin (çarpma – multiplication), carek (çarpma işareti - multiplication sign), çarçik (kare – square)”ê mînakên zaraveyên dariştî û “jimar (sayı – number), wekhev (eşit – equal), hevber (eşdeğer – equivalent), parvekirin (bölme – division)”ê jî mînakên berfirehkirina manayî ne (1998: 259; 1999: 269-270). Bi dîtina me ji nav van zaraveyan ya herî kêşedar “kirarî” ye û ji bo vê manayê ne guncaw e, lewra Celadet Bedirxan “kirar”ê di manaya “faîl”ê da dadirijîne û ev jî dibe sedema aloziya zaraveyî.

4.2.2.3.8. Zaraveyên Aborî

Salim Çelîker di sê hejmaran da li ser vê mijarê radiweste û di hejmara 19em da 23 (1996: 205-206), di hejmara 20em da 35 (1996: 222) û di hejmara 21em da jî 72 zaraveyan tomar dike (1997: 231-232). Herçend aborî ji mêj ve beşeke jîyana civakî ya mirovan be û gelek bêjeyên li ser aborîyê di zimanê kurdî da hebin jî zanistekê nû ye û ji bo kurdan qadeke xam e. Ji ber vê mirov nikare tenê ji gencîneya bêjeyên kurdî vê valahîyê dagire û pêwîstî bi dariştina zaraveyên nû heye. Çelîker jî hin zaraveyên mîna “binavahî (altyapı - infrastructure), jêkêm (açık - in deficit), jêkêmiya butçeyê (bütçe açığı - budget deficit), jêzêde (fazla, artık-excess), vexwazî (alacak - credit, claim)” (1996: 205) û “navînî (ortalama - average)”yê (1997: 231) dadirijîne ku cihê xwe nagirin. Herweha carinan jî zimanên cîran ên mîna erebî sûd werdigire û

zaraveyên mîna “safî (net), nesafî (gayri safî), nisbet: (oran - rate)”ê (1996: 206) destnîşan dike û manaya zaraveyî dide gelek bêjeyên kurdî ku “mişehî (bolluk - abundance), (1996: 206), “mezinbûn (büyüme - growth), lez (hız, sürat - speed), belavkirin (dağıtım - distribution), teraz (denge - balance), butçeya biteraz (denk bütçe - balanced budget), terazname (bilanço - balance sheet), kardêr (iş veren - employer), rawestîn (durgunluk - stagnation) (1996: 222), aboriya têkel (karma ekonomi - mixed economy), mezaxtin (tüketmek - consumption), mezêxer (tüketici - consumer), miz-mizd (ücret - salary, wage), ber (ürün - product)” (1997: 231-232) mînakên vê ne.

4.2.2.3.9. Zaraveyên Leşkerî

Rojen Barnas û Mizaffer Begzade di du hejmarên *Kurmancîyê* da çend zaraveyên leşkerî tomar dikin û di destpêkê da diyar dikin ku di destnîşankirina van zaraveyan da wan xwe spartîye çend serdem û çavkanîyên dîrokî ku bûne çavkanîya bikaranîn û dariştina zaraveyên leşkerî. Ji bo vê berê xwe didin sê serdem û çavkanîyan: (1) Zaraveyên leşkerî di serdema Komara Mehabadê û Tevergera Barzanî da, (2) Zaraveyên leşkerî di *Hawar* û *Ronahîyê* da û (3) Zaraveyên leşkerî di klasîkên kurdî da. Piştî vê diyar dikin ku eger zaraveyek di van çavkanîyan da neyê dîtin wê demê dê li gor manaya wê, zaraveyeke nû çê bikin (1992: 100). Bi vî awayî di hejmara 11em da 50 (1992-100-101) û di hejmara 12em da 27 zaraveyan tomar dikin (1993: 117). Herçend bibêjin “dûmahîk heye” jî dûmahîka vê xebatê nayê û vê bernameya xwe nabin serî.

4.2.2.3.10. Zaraveyên Rojnamevanîyê

Zaraveyên rojnamevanîyê pêşî di her du hejmarên 3yem û 4em da li ser navê Koma Kurmancî tên weşandin ku di yekê da 61 (1988: 19) û di ya din da jî 56 zarave hene (1989: 21, 28). Di nav van zaraveyan da hin zaraveyên guncaw ên mîna “nivîsar (yazı, metin - text), bend (makale - article), nivîsyar (katip - secretary), belavok (bildiri - tract), rêze (dizi - series), rêze-film (dizi film - serial)” (1988: 19), “tevkar (katkıda bulunan - contributor)” (1989: 21) hebin jî hin zaraveyên kêşedar jî hene. Bo nimûne tevî ku di nav kurdan da ji bo “okuryazar - literate”ê ji mêj ve bêjeya “xwenda” yan jî “xwendewar”ê tê bikaranîn jî di vê lîsteyê da ji bo vê “nivîser” tê pêşnîyazkirin ku ev bêje hem di hin deqên *Hawarê* da hem jî di nav kurdên behdînî da ji bo “nivîskar”ê tê bikaranîn. Li alîyê din herçend Celadet Bedirxan “heyber”ê di manaya “hemû tiştên

rihber û nerihber”ê da bi kar bîne jî (Ferhengvan, 1941: 12) ev bêje di vê lîsteyê da wek hevmanaya “mijar”ê tê bikaranîn ku ev jî ne di cih da ye. Herî dawî em dikarin behsa bêjeya “werger (tercume - translation)”ê bikin ku bi çewtî wek navdêra “wergêran/wergerandin”ê tê çêkirin ku ji aliyê dariştinê ve bi tu awayî nabe ku di vê manayê da bê bikaranîn (Ergün, 2021: 25-27).

Piştî vê, di du hejmaran da Newzad Hirorî çend zaraveyên rojnamevanîyê tomar dike ku di hejmara 38em da 21 (2006: 432) û di hejmara 40em da jî 28 zarave hene (2007: 455-456). Zaraveyên lîsteya Hirorî bi piranî zaraveyên berbalav in û berî wî jî gelek kesan bi kar anîne lê di nav wan da du zaraveyên nû jî hene ku “dawîdem”ê ji bo “zaman sînirî - deadline” û “xweser”ê jî ji bo “yalnız, sırf - exclusive”ê bi kar tîne (2007: 455-456). Ev her du zarave jî cihê xwe nagirin û herçî “xweser” e niha di manaya “otonom”ê da tê bikaranîn.

4.2.2.3.11. Zaraveyên Kompîturê

Kompîtur yek ji dahênanên giring ên teknolojiya modern e ku bûye sedema berhemana gelek zaraveyan. Ev zarave, di zimanên çavkanî da mîna gelek qadên din, yan bi rêya analojî û berfirehkirina manayî yan jî bi rêya dariştinê tîne destnîşankirin. Hewla kurdîkirina zaraveyên kompîturê ji aliyê du zimannasên Koma Kurmancî ve tîne encamdan. Cara pêşî Behrûz Şûcaî dest bi vî karî dike û di hejmara 24em da 6 (1998: 267), di hejmara 25em da 6 (1999: 279) û di hejmara 26em da jî 10 zaraveyan tomar dike (1999: 297) ku bi tevahî dikin 24 zarave. Ev zarave bi çend awayên cîyawaz tîne destnîşankirin. Zaraveyên ku di zimanên çavkanî da bi rêya berfirehkirinê hatine dariştin di kurdî da jî bi heman awayî tîne destnîşankirin. Herwek “bîr (memory)” û “mişk (mouse)”ê. Hinek zarave rasterast tîne wergêran ku “karta deng (sound card), reqdîsk (hard disc), nermalav (software)”ê mînakên vê ne û hinekên din jî rasterast ji zimanên çavkanî tîne wergirtin û li kurdî tîne guncandin ku “disket (diskete), monîtor (monitor), klaviye (clavier - keyboard), prosesor (processor)” mînakên vê ne.

Piştî wî Newzad Hirorî di hejmara 33em da 22 (2003: 368-369), di hejmara 34em da 11 (2004: 386) û di hejmara 37em da jî 14 zaraveyan tomar dike (2005: 417). Hirorî jî mîna Şucaî hin zaraveyên mîna “data, skaner, mikrofona, modem”ê rasterast ji zimanên çavkanî werdigire, hinekên mîna “lîstikajo (joystick), binmişk (mouse pad),

bişkok (button), tik (click), cottik (double click)”ê li ser mantelîteya îngilîzî werdigêre ser kurdî û hinekên wek “disketgêr (disk drive), firehband (broadband)”ê jî nîv îngilîzî nîv kurdî bi awayekî têkel (hybrid form) dadirijîne.

4.2.2.3.12. Zaraveyên Trafîkê

Trafîk bi mezinbûna bajaran û zêdebûna erebeyan dibe yek ji pêwîstîyên jîyana bajarên modern û ji bo rêxistina wê gelek zarave û rêzik tên dahênan. Ji ber vê pêwîstîyê Koma Kurmancî di vê qadê da hin zaraveyan destnîşan dike. Ji bo dagirtina vê valahîyê Rojan Hazim di sê hejmaran da çend zaraveyên giştî yên trafîkê di gel wêneyên wan destnîşan dike. Bi vî awayî di hejmara 27em da 37 (2000: 299-300), di hejmara 28em da 32 (2000: 320-321) û di hejmara 29em da jî 20 zaraveyan tomar dike (2001: 333). Ji nav van zaraveyan hinekên mîna “zîkzak (zikzak - zigzag), viyaduk (viaduc), bariyer (barrier)”ê ji zimanên çavkanî rasterast tên wergirtin lê piranîya zaraveyên vê listeyê bi bergindên guncaw tên kurdîkirin ku “korerê (çikmaz sokak - dead end - no outlet), peyarêk: (kaldırım - pavement - sidewalk), çivanek (viraj - virage - curve), durêyan (iki yol kavşağı - fork in the road), çarrêyan (dört yol - four - way intersection)” mînakên vê ne. Carinan jî hin zarave bi forma hîbrît tên kurdîkirin ku “trafîka bejahiyê (kara trafiğı - trafic terrestre - land travel), otorê (otoyol - autoroute), rêya şose (şose yol - chaussée - couseway), rêya asfalt (asfalt yol - route asphaltée - asphalt road)”ê mînakên vê ne. Herî dawî hin zaraveyên mîna lampeyên trafîkê (traffic lights)” ji zimanên biyanî tên wergirtin lê li ristesazîya kurdî tên guncandin.

4.2.2.3.13. Zaraveyên Futbolê/Topanê

Futbol yan jî bi kurdîya wê topanê listika herî populer a serdema modern e ku bala milyonan mirovan radikêşe. Ji ber vê gelek zaraveyên taybet bi vê listikê hatine dariştin. Ji nav Koma Kurmancî Mistefa Aydoğan di pênc hejmaran da hin zaraveyên futbolê destnîşan dike ku di hejmara 37em da 42 (2005: 420), di hejmara 39em da 28 (2006: 445), di hejmara 41em da 74 (2007: 6), di hejmara 42yem da 58 (2008: 6-7) û di hejmara 43yem da jî 40 zarave hene (2008: 4) ku hin caran ji bo berçavkirina van zaraveyan wêne jî tên bikaranîn.

Herwek zaraveyên din di vir da jî bi çar awayan zarave tên destnîşankirin. Hin zarave bi rêya zimanê tirkî ji zimanên rojavayî tên wergirtin. Wek “gol (goal), maç

(match), lîg (league), pas (pass), ofsayd (off-side), puan (puan - point), faul (foul)”ê. Hinek dîsa bi rêya tirkî ji zimanên rojavayî tî wergirtin lê li rîstesazîya kurdî tî guncandin. Mîna “maça lîgê (league match), fînala kûpayê (cup final), lîga şampiyonan (championship league), averaja golan (goal average)”ê. Hinek nîv bîyanî nîv kurdî bi awayê tîkel tî dariştin. Herwek “golavêj, golker (golcû - kicker), deqa penaltiyê (penaltî noktası - penalty mark), fûtbollîz (futbol oyuncusu - football player), gola nelê (geçersiz gol - invalid goal), maça betalkirî (ibtal edilen maç - a cancelled match)”ê. Herî dawî li hember hinekan jî kurdîyên wan tî pey dakirin. Mîna zaraveyên “stûn: (yan direk- upright post), kêran (üst dire - crossbar), goşe (korner - corner), dadwer (hakem - referee), bergirî (savunma - defence), çiv dan (çalım atmak - to dribble), çivdêr (çalımcı - dribble)”ê.

4.2.2.3.14. Zaraveyên Rêzgirtinê

Bêje û zaraveyên rêzgirtinê yek ji nîşaneyên giring ên şaristanbûnê ne û hebûna bêje û zaraveyên bi vî awayî nîşaneyên giring ên pêşketina her gelekî ne. Ev jargon xwedî dîrokeke gelek kevin be jî di serdema modern da xurttir û bihêztir dibe. Rojan Hazim hewl dide zaraveyên li ser vê babetê kom bike û di hejmara 23yem da 38 (1997: 256-257) û di hejmara 24em da jî 81 bêje, destbêje û zaraveyan tomar dike (1998: 260-262). Hêjayê gotinê ye, ev bêje û destbêje ji nav gelî tî berhevkerin û yek ji wan jî ne çêkirî ye.

4.2.2.3.15. Zaraveyên Çend Mijarên Tîkel

Koma Kurmancî di hejmara 2yem da navê 17 wesayîtên veguhestinê tomar dike ku 14 jê rasterast ji zimanên bîyanî tî wergirtin. Ji bilî van “balafir” ji Hawarê, “sêçerxe (tricycle)” li ser analojîya farisî ji zimanên serçavî û “parxêl (at arabası - oxcart)” jî ji nav gelî tî wergirtin (1988: 12).

Hejmara piştî vê Mûsa Kaval 49 zaraveyên amrazên deryayayê destnîşan dike. Ji nav vana hinekên mîna “deryavan (denizci - seaman), deryavanî (denizcilik - navigation)”yê bi rêya dariştinê, hinekên mîna “bêrik (kürek - oar)”ê bi rêya berfirehkirina manayî, hinekên mîna “vapor”ê rasterast ji zimanên bîyanî û hinekên mîna “keştiya bi motor (motorlu gemi - motorboat)”ê jî li ser wergêrana zaraveyên bîyanî destnîşan dike (1988: 16).

Rojan Hazim di hejmara 31em da 97 zaraveyên kozmetîkê tomar dike. Hinekên mîna “bêhn (koku - perfume), gulav (gül suyu - rose water), xweçêkirin (makyaj - make-up), kil (sürme - kohl)”ê ji çavkanîyên resen ên kurdî, hinekên mîna “misk, enber, esans, lewante, melhem”ê ji zimanên rojhilatî yê ku ji mêj ve di kurdî da bi cih bûne û hinekên mîna “kolonya, krem, rûj, pûdre, losyon”ê jî ji zimanên rojavayî tên wergirtin. (2002: 347-348).

Herî dawî Mistefa Aydogan di hejmara 36em da li ser kaxezên listikan 64 (2005: 395-396) û Îsmail Şahîn jî li ser stêrnasîyê 18 zaraveyan tomar dike ku 12yê wan di gel wêneyan tên nîşandan (2018: 4).

Li ser bingeha van zanyariyan em dikarin bibêjin ku Koma Kurmancî di maweya 24 salan da di warên curbircur da gelek bêje û zaraveyên kurdî tomar dike. Eger em her sê kategorîyên xebatên komê binirxînin derdikeve ku temayên teorîk di *Kurmancîyê* da gelek lawaz in û em tenê rastî çend xebatên biçûk tên. Bêguman qada herî berfireh a *Kurmancîyê* destnîşankirina hin bêjeyên taybetmend ên heyî ne ku di çarçoveya temayên cîyawaz da hatine komkirin. Bi vê xebatê Koma Kurmancî xwestîye ku hem van bêjeyan ji windabûnê biparêze hem jî bi rêya giştîkirinê bike malê hemû bikarhênerên kurmancî. Bi vî awayî hem valahîyeke zimanî dadigirin hem jî di navbera bikarhêner û devokên kurdî da nêzîkbûnekê çê dikin. Lê hêjayê gotinê ye ku gelek bêjeyên vê kategorîyê di ferhengên giştî da ji xwe hene û tu taybetmendîyeke wan a xweser nîne. Bi raya me xala herî lawaz a vê kategorîyê dubarekirina bêjeyên weha ye ku nedibû di *Kurmancîyê* da bînin bicihkirin.

Herî dawî Koma Kurmancî di kategorîya sêyem da zaraveyên jîyana modern destnîşan dike û dixwaze vê qada vala dagire. Lê di vir da jî herçend bingeha zaraveyên hin qadan bînin danîn jî nayên temamkirin û bi nîvcoyî dimînin. Ev jî vê nîşan dide ku xebatên komê gelek caran bi destpêşxerîyên kesî sînordar dimînin û bernameyeke wan a hevgirtî û planake wan a ron a paşerojê nîne. Eger weha nebûya dê ji bo temamkirina zaraveyên van qadan karên berdewam bihata kirin lê ev yek di *Kurmancîyê* da nayê dîtin. Ji vî aliyî ve em nikarin bibêjin ku Koma Kurmancî di qada jîyana modern da beşeke giring a zaraveyên zanistek yan dîsîplînekê destnîşan kirîye. Ji aliyê çalakîyên giştî û kesî ve jî em dikarin bibêjin ku di hejmarên destpêkê da dora sih xebat bi hevbeşî

li ser navê komê tîn encam dan û yên din hemû jî li ser navê kesek yan çend kesan tîn kirin. Ji nav endamên hertimî yên komê jî alîyê hejmara xebatan ve Reşo Zîlan bi 68 xebatên kesî û hevbeş di rêza yekem da ye û Hemîd Kiliçaslan jî bi 43 xebatên kesî û hevbeş di rêza duyem da ye. Herweha Kendal Nezan bi du xebatan û Lutfî Baksî jî bi xebatek di rêzên dawî da cih digirin.

Bêguman Enstîtuya Kurdî ya Parîsê di nav dezgehên kurdên diyasporayê da dezgeha herî giring e ku ji 1983yê heta niha di gelek waran da bernameyê berfireh daye pêşîya xwe. Di vê beşê da em li ser xebatên wê yên zimanî zûr bûn. Enstîtuya navborî herçend di serî da bi rêya *Hêvîyê* li ser rêça pêşîyan bide dû armanca bîdestxistina zimanekî standard û hevbeş ê hemû kurdan jî zû zehmetîya vê armanca mezin dibîne û bi çêkirina Koma Kurmancî armanceke hêsantir dide ber xwe ku ew jî nûjenkirin û standardkirina zarê kurmancî ye. Herçend Koma Kurmancî ji 1987ê heta îro berdewam li ser ferhengsazî û zaravesazîyê kar bike û karê kodkirin û normdanînê encam bide jî mîna ku Matras û Reeşemius jî amaje pê dikin (2017: 80) pêşnîyazên wan nagihîjin hemû kurdan û weku pêwîst belav nabin.

Bêguman dûrbûna ji welatî, sînordarbûna derfetan û rewşa sîyasî ya kurdan hokarên sereke yên vê yekê bin jî Aydoğan ji alîyê kurdan ve vê diyardeyê bi sîyasîkirina xebatên zimanî ve girê dide û bi raya wî ev helwest nahêle ku hemû vekolerên kurd li dor armanceke hevbeş kom bibin (2013: 43). Bi raya me jî hem ji alîyê derekî hem jî ji alîyê navxweyî ve sîyaset astengeke mezin e li hember plandanîna zimanî û hevgirtina civakî ya kurdan. Di vê manayê da tu dezgehek bi hêsanî nikare xwe ji etîketeke sîyasî rizgar bike. Loma jî rexneya Akinî ya li ser Koma Kurmancî ku dibêje “endamên wan nehatine hilbijartin û Enstîtuya Kurdî ya Parîsê di çarçoveya neteweyî da deng nedaye” (2013: 132) kêmkê ji bo hemû dezgehên kurdan rast in. Jixwe ji ber nebûna dezgehên niştimanî û neteweyî yên giştî û rêgirîyên sîyaseta derekî tevî daxwaz û xebata wan jî heta niha kurdan nekarîye li ser zimanekî standard li hev bikin û kêşeyên xwe yên zimanî bi yekdestî çareser bikin.

ENCAM

Hizira plandanîna zimanî mîna piranîya dîyardeyên modern piştî Ronesansê gav bi gav peyda dibe û bi xurtbûna netewetîyê û avakirina dewletên neteweyî ra digihîje lûtkeyê. Akademîyên zimanî di vir da roleke sereke digirin ser xwe û dibin dezgehên herî giring ên plandanîna zimanî. Ev modela rojavayî ji nîvê duyem ê sedsala 19ê heta nîvê yekem ê sedsala 20ê li Rojhilatê jî reng vedide û her netewe-dewlet bi avakirina akademîya xwe ya zimanî bizava plandanîna xwe ya zimanî xurttir dike.

Şopên pêşî yên vê têgihîştinê di manaya modern da cara pêşî di weşanên kurdî yên piştî 1908yê da xuya dibe. Li ser vê bingehe ronakbîrên kurd li Stenbolê li dor komele û weşanan li ser plandanîna zimanê kurdî pêngavên giring diavêjin. Lê ji ber parçebûna Împaratorîya Osmanî û dabeşbûna kurdan di nav çendîn dewletên neteweyî da ronakbîrên kurd ên li Stenbolê ji hev belav dibin û plan û bernameyên wan ên li ser zimanî naçin serî.

Kurd di serdema avakirina dewletên neteweyî da ji derfetên plandanîna yekdest bêpar dimînin û bi vî awayî li her welatê kurdnişîn serborîyeke cîyawaz a plandanîna zimanê kurdî derdikeve holê. Di nav van dewletan da, ji ber hebûna mandayên Îngiltere û Fransayê li Îraq û Sûrîyeyê û ji ber îdeolojîya sosyalîst û çînî li Sovyetê bi awayê rêjeyî be jî hin xebatên herî baş li van welatan tê kirin û herçî Îran e, tenê di maweya kurt a Komara Mehabadê da hin karên zimanî tên encamdan.

Ji ber vê çendê dezgeha pêşî ya plandanîna zimanê kurdî di 1970yê da li Îraqê tê avakirin û bi vê yekê kurd di warê plandanîna zimanî da derbazî qonaxeke nû dibin. Ev dezgeh ji ber zêdebûna hejmara kurdên soran û xurtbûna bizava ronakbîrî ya bajarê Silêmanîyê di plandanîna xwe da zarê soranî dike navenda xebatên xwe û zarên din dixe bin xizmeta bihêzkirina vî zarî.

Ji ber mercên sîyasî yên neguncaw dezgeha pêşî ya plandanîna zimanê kurdî ku li ser bingeha zarê kurdîya kurmancî tê avakirin, ne li welatî, li Fransayê di nav civakeke biçûk a kurdên Ewropayê da tê avakirin. Herçend di 1983yê da bi beşdarîya gelek kurdên navdar ên her pênc welatên kurdnişîn Enstîtuya Kurdî ya Parîsê bê damezirandin jî ji ber zêdebûna endamên kurmanc ev dezgeh di xebatên plandanîne da kurmancî dike navenda xebatên xwe.

Ji ber siruştā hevmanend a plandanîna zimanî herçend ji alîyê karkirinê ve her du dezgehên zimanî bikevin nav hewldanên çêkirina arşîveke zimanî û neteweyî, pêşvebirina xebatên korpûsa zimanî, piştgirîdana pêgihandina kadroyên akademîk û derxistina weşanên perîyodîk jî di navbera wan da hin cîyawazîyên berbiçav jî hene. Wek encameke vê xebatê mirov dikare van cîyawazîyan weha rêz bike:

Damezirandina KZKyê li Îraqê ne tenê rêpadana dezgeheke zimanî ye, di heman demê da nîşaneyê bidestxistina kîyanêke sîyasî û çandî ya kurdên vî welatî ye. Li hember vê EKP ji alîyê komê kurdên dîyasporayê ve di çarçoveya mafên mirovan da li welatekî bîyanî yê mîna Fransayê tê avakirin. Ji ber vê ji alîyê sîyasî, civakî û darayî ve pêgeha KZKyê ji EKPyê xurttir e.

KZK bi tevahî dezgeheke fermî ye û awayê karkirina wê bi qanûneke 25 xalî hatîye destnîşankirin lê EKP wek dezgeheke nîvfermî xuya dike û peyreweyeke wê ya navxweyî nîne ku awayê karkirina wê tê da hatibe dîyarkirin. Ji ber vê di çarçoveya lijneyên taybetmend da dabeşkarîya karî ya KZKyê di nav xebatên EKPyê da nayê dîtin. Bêguman ev ji bo dîsîplîna karî kêmasîya EKPyê nîşan dide û ji bo gihîştina armancên dîyarkirî qelsîyekê çê dike.

KZK dezgeheke zimanî ya welatî ye û tenê di çarçoveya zanistî û pîşeyî da dimîne lê EKP dezgeheke dîyasporîk e û di ber karên xwe yê zimanî da xebatên lobîyê jî dike. Tevî vê, pêşhatên sîyasî karîgerîyeke zêdetir li ser KZKyê çê dikin û bi guherîna rewşa sîyasî çarçoveya xebatên wê bertengtir û biçûktir dibe. Lê ev dîyarde ji bo EKPyê derbaz nabe û ji serî ve di nav seqamgîrîyekê da berdewamî dide karên xwe û di vî warî da karîgerîya sîyaseta nerênî ya Fransayê li ser xuya nake.

Endamên KZKyê wek rengvedana rewşa çandî ya pêşketî ya kurdên Îraqê ji alîyê amadehîya xebatên zimanî ve pêşketîtir in û piranîya wan akademîsyen û pisporên zimanî ne. Li hember vê piranîya endamên EKPyê û koma wê ya Kurmancî çalakgerên sîyasî û çandî ne ku wek penaberên sîyasî li welatên Ewropayê dijîn û bi ruhekî têkoşer û romantîk berê xwe didin vê xebatê. Loma jî li hember profesyonelîya endamên KZKyê endamên EKPyê vî karî bi amatorî û dilxwazî dikin û ji bo vî karî tu ucretekê ji EKPyê nagirin.

KZK her ji despêkê ve di plandanîna korpûsê da karê pêşîneyî dide rênivîsê û ji bo çareserkirina kêşeyên rênivîsa kurdî bi palpiştîya nîrxandî û sûdwegirtina

xebatên pêşîyan çend pêşnîyazên nû pêşkêş dike ku hinek jê cihê xwe digirin û hinekên din jî paşê tîr revîzekirin. Ji vî alîyê jî bilî biryarên xwe yê li ser rênivîsê, berga 9em a *Govarî Korî Zanyarî Êraq Destey Kurdê* bi tevahî ji bo gengeşekirina vê mijarê terxan dike. Lê EKP di warê rênivîsê da bêhtir pala xwe dide xebatên Hawarê û di vî warî da tenê çend çaksazî û pêşnîyazên biçûk dike ku morfemên “ne-, me-, -bû”yê bi lêkeran ve dinivîsin û di rewşên tewang û ravekê da jî reha bêjeyan diparêzin.

KZK bi rêya Lijneya Ziman û Zanistên Wî di bin sernavê “Rêzimanî Axawtinî Kurdî”yê da dest bi venivîsîna rêzimana kurdî dike. Lijneya navborî vê rêzimanê pêşî beş bi beş di *Govarî Korî Zanyarî Kurdê* da diweşîne û paşê jî wek pirtûk dide çapkirin. Lijne di bernamêya xwe da venivîsîna beşên axaftinê û mijara ristesazîyê dike armanc û heta radeyeke baş vê armanca xwe bi cih tîne. Lê tevî hewldana yekgirtina rêzimanê jî hem ji alîyê termînolojîyê ve hem jî ji alîyê dabeşkirina mijarên navborî ve hemû endamên lijneyê navborî nagihîjin encameke hevbeş û carinan biryar li gor piranîyê tîr dayîn carinan jî bîr û boçûnên endaman jî hev cîya tîr nivîsin. Li hember vê EKP ji bo berbelavkirina normên rêzimanê wergêrana hin xebatên rêzimana kurmancî wek armanc destnîşan bike jî tu xebateke hevbeş li ser rêzimanê nake. Di vî warî da jî bilî çend gotarên biçûk ên kesî tu xebateke hevbeş li ser vê qadê nayê kirin Ji ber vê herwek rênivîsê di warê rêzimanê da jî xebatên EKPyê li hember KZKyê lawaz dimînin û venivîsîna rêzimanê nabe yek ji armancên wan.

KZK di warê zaravesazîyê di bin serperîştîya encumena xwe da bi avakirina çend lijneyên demkî di çend qadên cîyawaz da hin zaraveyan destnîşan dike, wan lîste bi lîste di kovara xwe da diweşîne û paşê jî wek pirtûk dide çapkirin. Di vê çarçoveyê da dora 2183 zaraveyên kargêrîyê, 547 zaraveyên pizîşkî, 507 zaraveyên felsefê û mentiqê, 475 zaraveyên derûnnasîyê 295 zaraveyên zimanî, 117 zaraveyên dengnasîyê, 110 zaraveyên pirtûkên xwendîngihan û 526 zaraveyên giştî tomar dike. Bi vî awayî tevî hin zaraveyên dubare KZK 4760 zaraveyan destnîşan dike. Dema vê jî dike ji tevgera petîgerîya hişk a salên şêstan cîyawaztir rêbazeke nermtir dide ber xwe, wergirtina zaraveyên bîyanî asayî dibîne û pakkirina zaraveyên cihgirtî yêr deynkirî rast nabîne. Mirov dikare bibêje ku KZK di destnîşankirina zaraveyan da jî rê û rêbazên sîdwegirtina ji çavkanîyên xwemalî, berfirehkirina manayî ya bêjeyên heyî, wergêrana zaraveyan, analojî, afirandin, dariştin, lêkdan, wergirtina zaraveyên pêşîyan

û wergirtina zaraveyên ji zimanên bîyanî dike binemaya karê xwe û zaraveyên xwe li ser vê bingehe destnîşan dike.

Koma Kurmancî ya EKPyê jî çî bi rêya xebatên hevbeş çî jî bi amadekarîya beşdaran û pesendkirina komê, di çend qadên jîyana modern da xebatên zaravesazîyê dike û bi giştî di destnîşankirina van zaraveyan da ji rêbazên wergirtin, dariştin, berfirehkirin, kodkirina bêjeyên xwemalî, sûdwergirtina ji kurdîya soranî, dariştina formên têkel sûd werdigire. Di vê çarçoveyê da 188 zaraveyên kargêrî û sîyasî, 591 zaraveyên anatomî û pizîşkîyê, 220 zaraveyên hiqûqî, 340 zaraveyên rêziman û zimannasîyê, 143 zaraveyên edebî, 52 zaraveyên cografî, 62 zaraveyên matematîkê, 130 zaraveyên aborî, 77 zaraveyên leşkerî, 166 zaraveyên rojnamevanîyê, 69 zaraveyên kompîturê, 89 zaraveyên trafikê, 242 zaraveyên futbolê, 119 zaraveyên rêzgirtinê û 245 zaraveyên çend mijarên têkel diweşînin ku tevahîya wan dike 2733 zarave.

Li gor vê tabloyê EKP bi nîsbet KZKyê zaraveyên kêmtir destnîşan dike lê qadên zaravesazîya wê zêdetir in. Tevî vê EKP di hemû qadan da di asta destpêkê da dimîne û nikare xebatên xwe bi pêş ve bibe, lewra di vî warî da ji bernameya dezgehî zêdetir tercîhên takekesî dîyarker in û bi qasî ku xuya dike Koma Kurmancî ya EKPyê nikare endam û beşdarên xwe ber bi armanceke dîyarkirî ve araste bike. Lewra endamên Koma Kurmancî herwek endamên KZKyê ji alîyê madî ve nayên piştgîrîkirin û ji ber siruştî dilxwazane ya Koma Kurmancî rêveberên EKPyê jî nikarin bernameyeke dîyarkirî bi ser wan da bisepînin. Li alîyê din piranîya endamên vê komê ne akademîsyen in ku bi awayekî siruştî li ser şaxeke zanistî bixebitin û mijûlîya xwe ya zanistî veguhêzin plandanîna zimanî. Ev jî ji alîyê dema xebatê û peyrewkirina bernameyeke dîyarkirî ve ji bo wan dibe rêgirîyeke mezin. Ji ber vê jî nikarin hin armancên nêzîk, navîn û dûr destnîşan bikin û bi neçarî xebatên komê li gor destpêşxerîya kesî ya endamên wê teşe digire û ji riwangeheke dezgehî dûr dikeve. Ji vî alîyê ve em dikarin bibêjin ku KZK ji EKPyê serkeftîtir e û asta karîgerîya wê jî zêdetir e.

KZK di nav planên xwe da cihekî giring dide danîna “Ferhengî Kurdîy Yekgirtû”yê û ji bo gihîştina vê armancê Lijneya Ferhengê datîne. Herçend ji bo vê armancê hemû ferhengên çapbûyî yên kurdî bîn komkirin, bi rêya nameyan peywendî

bi pisporên derveyê Îraqê ra bê danîn û di serdema KZÊDKyê da banga arîkarîyê li ronakbîrên kurd bê kirin jî ev xebat naçe serî û ferhenga kurdî-kurdî ya yekgirtî bi encam nabe.

Li hember vê EKP li ser bingeha Ferhenga Kurdî - Fransizî ya Kamiran Bedirxanî ya nîvcomayî û xebatên ferhengokên Koma Kurmancî ferhengeke duzimanî ya kurdî-fransizî çap dike. Ji bilî vê, Koma Kurmancî ya EKPyê di kategorî û mijarên cîyawaz da çendîn ferhengokên pir-zimanî (kurdî-tirkî-fransî-îngilîzî-latînî) di *Kurmancîyê* da diweşînin û di vê çarçoveyê da 2895 bêjeyên devokên Hekarî, Botan, Şemdînan, Zaxo, Selamas, Qafqas, Xorasan, Qerejdax, Licê, deşta Mêrdînê Bidlîs, Wan, Celalî, 1088 bêjeyên kêmnas û nenas, 1254 bêjeyên edebîyata kevin, 2156 bêjeyên ku ji çavkanîyên edebîyata nû, 1957 bêjeyên ku ji çavkanîyên folklorîk, 1417 îdyom, 714 navên gul, gîya û daran, 1208 navên ajelan û bêjeyên têkildarî wan, 238 navên xwarin û vexwarinan 432 bêjeyên li ser xanî û amanên navmalê, 96 navên cilûbergan, 743 bêjeyên karûbarên gelêrî û hunerên destî û 610 bêjeyên çend mijarên têkel kom dikin ku ji bilî sê awarteyan hemû jî ji alîyê hin kesên diyarkirî ve tîr amadekirin û di civînên Koma Kurmancî da tîr gengeşekirin û pesendkirin. Tevî ku beşeke zêde ya bêjeyên van ferhengokan di ferhengên giştî da hene û tu balkêşîya wan nîne jî kodkirina bêjeyên kurdî yê çavkanîyên cîyawaz ji bo parastin û belavkirina wan giring in û em dikarin bibêjin ku çî bi çapkirina Ferhenga Kurdî-Fransizîyê çî jî bi weşandina van ferhengokan, EKP ji KZKYê çalaktir xuya dike.

KZK li Kurdistana Îraqê wek akademîya pêşî ya zimanê kurdî hem bi kovara xwe hem jî bi çapkirin û arîkarîya çapkirina pirtûkan piştgirîyeke baş dide qada berfirehkirina zimanê kurdî. Di *Govarî Korî Zanyarî Kurd û Govarî Korî Zanyarî Êraq Destey Kurdê* da ji bilî xebatên hevbeş ên li ser rêziman, rênivîs û zaravesazîyê çendîn xebatên kesî li ser yekxistina zimanî, zimannasîya giştî, rêziman, ferheng, rênivîs, zaravesazî, zarên kurdî, dîroka zimanê kurdî, etîmîlojîya kurdî, destnivîs, edebîyata kurdî, edebîyatnasî û rexneya edebî, deqên edebî, edebîyata berawirdî, folklor, dîrok, etnolojî û sosyolojîya kurdî, kurdnasî, perwerde, bîyografî, kîmya, tendirustî û pîzîşkî, aborî, gername, cografya û bîblîyografyayê tîr weşandin. Herweha pirtûkên ku çap dike yan jî di çapkirinê da arîkarîya diravî dide wan jî li ser rêziman, ferheng, zarevesazî, zimannasî, dîwanên kurdî, edebîyat, edebîyatnasî, folklor, kurdnasî, kovarên edebî, dîn, tendirustî, dîrok, hiqûq, bîblîyografya û wergêranê ne.

EKP jî wek dezgeheke zimanî bi derxistina kovarên *Hêvî* (8 hejmar) û *Kurmancîyê* (66 hejmar...) dikeve nav hewldanên berfirehkirina qadên bikaranîna kurdî lê ji KZKyê cudatir EKP bi rêya *Kurmancîyê* bêhtir giringî dide berhevkarîya bêje û zaraveyên kurdî. Ji ber vê ji bilî hin mijarên teorîk ên mîna rêziman, rênivîs, etîmîlojî û peywendîya zimanê kurdî di gel zimanên din ên îranî û zimanên cîran, giranî dide ser berhevkirina ferhengokên devokên kurmancî, bêjeyên kêmnas û nenas, çavkanîyên edebîyata kurdî ya klasîk, nû û folklorê, îdyom, navên zindîwerên siruştî, bêjeyên çanda kurdî ya pêşmodern û destnîşankirina hin zaraveyên kargêrî û sîyasî, anatomî û pîzîşkî, hiqûqî, rêziman û zimannasî, edebî, cografî, matematîk, aborî, leşkerî, rojnamevanî, kompîtur, trafik, futbol, rêzgirtin û çend mijarên din. Herçî pirtûk in EKP nakeve nav karekî weha û em dikarin bibêjin ku ji vî alîyî ve li gor KZKyê çarçoveya xebatên wê bertengtir dimîne. Jixwe ji alîyê berfirehkirina qadên zimanê kurdî ve bi giştî kurdîya soranî li hember kurmancî li pêştir e, lewra herwek li jor jî hat nîşandana di vê maweyê da pirtûkên ku li Kurdistana Îraqê tên weşandin li hember beşên din ên civaka kurdî ji sedî 80 ye û pirtûkên çapbûyî yên Kurdistana Îraqê jî ji sedî 96.6 bi kurdîya soranî ne. Ev tablo rewşa bihêz a kurdîya soranî û asta standardî û berbelavîya wê bi awayekî berbiçav nîşan dide.

Yekxistina zimanê kurdî ji destpêka sedsala 20ê û vir ve berdewam bê gengeşekirin jî ji ber nelibarîya rewşa sîyasî jê ra çareyekê nayê dîtin. Ji ber vê soranî û kurmancî bi awayekî ji hev cuda wek du standardên zimanê kurdî tên pêşxistin û her alî zarê xwe dike navenda plandanînê. Loma jî KZK xwe hemû xebatên xwe yên rênivîs, rêziman û zaravesazîyê li ser şêwezarê Silêmanîyê yê kurdîya soranî ava dike û zar û şêwezarên din wek hêzeke arîkar dide pal vî şêwezarî. Li hember vê EKP jî xwe dispêre mîrata plandanîna zimanî ya Hawarê û kurmancî dike navenda xebatên xwe.

PÊŞNÎYAZ

Ji serborîya plandanîna zimanê kurdî derdikeve ku hîlbijartina normê li pêşîya geşedan û hevgirtina zimanê kurdî astenga herî mezin e ku heta niha jî jê ra çareserîyeke şênber nehatîye dîtin. Ji nêrînên plandanerên pêşî jî xuya dibe ku ji bo gihîştina vê armancê (1) hinek kes kurmancî, (2) hinek kes soranî, (3) hinek kes tehmândin soranî bi kurmancî û zarên din (muturbekirin), (4) hinek kes bi bêdengî berdewamîdana rewşa heyî (firehzarî) û hewalekirina vê mijarê ji bo paşerojê û (5) hinek kes jî rêbaza lihevnêzîkkirinê pêşnîyaz dikin.

Li hember van pênc nêrîn û pêşnîyazan, em di wê bawerîyê da ne ku vebijêrkên yekem, duyem û sêyem jî ber rewşa sîyasî ya kurdan qabîlê cihbicihkirinê nînin û vebijêrka çarem jî xemsarîyekê di xwe da dihevine û dibe ku ev xemsarî bi arîkarîya hin hokarên derekî di paşerojê da li ser nasnameya kurdan û zimanê kurdî metirsîyeke mezin çê bike. Di vê rewşê da herwekî ku Celadet Bedirxan pêşnîyaz dike û paşê kesayetîyên mîna Îsmet Şerîf û Hejar jî pesend dikin, mirov dikare bi hin xebat û bername û planên zimanî zemînesazîya lihevnêzîkkirina paşerojê çê bike. Dema weha bê kirin cîyawazîyên îro dê di paşerojê da kêmtir bibin û paşeroj di şûna tirsê da bibe çavkanîya hêvîya hevgirtinê.

Ji bo vê armancê pêngava pêşî ew e ku em li dor nerîteke hevbeş kom bibin, xebatên borî yên li dor her du zarên sereke baş binasin û li ser vê mîratê di modernîzekirina zimanî da li ser rêbazeke hevbeş li hev bikin. Lewra ziman dîyardeyeke zindî ye û bi vîna mirov û civakê teşeyên nû werdigire. Eger ev vîna civakî û zanistî derkeve holê bi raya me dê tevî hemû astengan, rêyên çareserîyê li ber me vebin. Rast e ku ev sed sal in kurmancî, soranî û di van salên dawî da zazakî bi awayên ji hev cuda di nav xwe da tînin standardkirin lê di ber van plandanînan mîkro da pêwîstîya kurdan bi plandanîneke makro jî heye ku mixabin îro planeke weha yan jî dezgeheke ku karekî bi vî awayî bike li meydana nîne.

Bi raya me pêwîstîyeke yekcar bilez bi dezgeheke neteweyî ya giştî heye ku xebatên van zaran di bin sîwaneke hevgirtî da bişopîne û wan ber bi armanceke hevgirtî ve araste bike. Eger kurd xwedî riwangeh û armanceke hevgirtî ya neteweyî û çandî bin pêwîst e demildest dezgeheke nû ava bikin da ku di çarçoveya plandanîneke hevbeş

da xebatên van zaran bişopîne û ji bo hevgirtineke paşerojê ya yekcarî xebatên pêwîst bike.

Ji bo vê em pêşnîyaz dikin ku bi lihevkirina hemû alîyên kurdî û bi beşdarî û nûnertîya pîsporên hemû zarên kurdî di bin sîwana Akademîya Kurdî da çend komîsyonên berdewam ên mîna komîsyonên rêziman, ferheng, zaravesazî, rênivîs û edebîyatê bên avakirin, li ser xebatên lihevnêzîkkirinê karên berdewam bê kirin, ev komîsyon her pênc salan carekê xebatên xwe berfireh bikin, bi rêya weşanan biryarên xwe bi raya giştî ra parve bikin û hemû dezgehên ragihandin û weşangerîyê jî pêgirîya van biryaran bikin. Dema weha be kurd dê heta radeyeke baş ji vê rewşa tevlihev rizgar bibin, ji bo tiştên nû biryarên hevbeş bidin, rê li ber kûrbûna cîyawazîyan bigirin, cîyawazîyên heyî kêr bikin û zemîna jevtêgihîştin û sîdwergirtinê xweş bikin.

ÇAVKANÎ

A) Pirtûk û Gotar

- A.T. (1955). Le jûr Yekkirdina Zimanê Kurdî. *Hetaw*. 37, 5-6.
- Abdollahî, K. (1989). Ferhengoka Dîwana Cegerxwîn. *Kurmancî*. 5, 33-36.
- Abdollahî, K. (1991). Ferhengoka Dîwana Cegerxwîn. *Kurmancî*. 9, 78-80.
- Abdollahî, K. (1991). Berhemên şîr. *Kurmancî*. 8, 66.
- Abdollahî K. (1992). Ferhengoka Dîwana Cegerxwîn –III. *Kurmancî*. 10, 91.
- Abdollahî, K. (1992). Amanên nav malê. *Kurmancî*. 11, 102-103.
- Abdollahî, K. (1995). Ferhengoka Mem û Zînê. *Kurmancî*. 16, 174-175.
- Abdollahî, K. (1995). Ferhengoka Mem û Zînê –II-. *Kurmancî*. 18, 200-201.
- Abdollahî, K. (2013). Hinek peyv ji Selmasê – I –. *Kurmancî*. 53, 1.
- Abdollahî, K. (2014). Hinek peyv ji Selmasê – II –. *Kurmancî*. 54, 5.
- Akin, S. (2011). Hingiv û mêşvanî. *Kurmancî*. 48, 3.
- Akin, S. (2013). *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî*. İstanbul: Avesta.
- Akreyî, E. R. (1980). Le Dayikbûnî Destey Kurdî Korî Zanyarî Êraq. *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 7, 3-6.
- Akreyî, E. R. (1980). Rêzimanê Axivtina Kurdî Beşê Karî yan Kiryarê (elfî’îl verb). *Govarî Korî Zanyarî Êraq “Destey Kurd”*. Bergî 7, 36-59.
- Alakom, R. (2007). *Orta Anadolu Kürtleri*. İstanbul: Evrensel Basım Yayın.
- Alan, R. (2019). *Keşkûl*. Stenbol: Peywend.
- Alfabêya Qurdî. (1932). *Hawar*. 1, 3-4.
- Alêksanyan, N. A. (1976). Bîblîyografya Kitêbêd Kurdîye Sovyetê Salêd 1921-1960. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. (Tîpguhêzî) Enwer Qadir Mihemed. Bergî Çwarem, r. 401-432.

Alêksanyan, N. A. (1977). Bîblîyografya Kitêbêd Kurdîye Sovyetê Salêd 1921-1960. *Govarî Korî Zanyarî Kurd*. (Tîpguhêzî) Enwer Qadir Mihemed. Bergî Pêncem, r. 312-342.

Amêdî, S. B. (1982). Rênivîsa Kurdî bi Tîpê Erebi. *Govarî Korî Zanyarî Êraq "Destey Kurd"*. Bergî 9, 135-148.

Awdal, R. (2015). Devoka Zaxoyê di ferhengoka Paul Bêdarî de – I –. *Kurmancî*. 57, 4.

Awdal, R. (2017). Devoka Zaxoyê. *Kurmancî*. 61, 2.

Awdal, R. (2018). "Peyvên Zaxoyî – I –. *Kurmancî*. 62, 3.

Awdal, A. (2018). Peyvên Zaxoyî – II –. *Kurmancî*. 63, 1.

Aydogan, M. (2000). Îdyomên kurdî – X-. *Kurmancî*. 28, 315.

Aydogan, M. (2005). Peyvên kaxezên listikan. *Kurmancî*. 36, 395-396.

Aydogan, M. (2005). Termên fûtbolê. *Kurmancî*. 37, 420.

Aydogan, M. (2006). Termên fûtbolê – II –. *Kurmancî*. 39, 445.

Aydogan, M. (2007). Termên fûtbolê – III –. *Kurmancî*. 41, 6.

Aydogan, M. (2008). Termên fûtbolê – IV –. *Kurmancî*. 42, 6-7.

Aydogan, M. (2008). Termên fûtbolê – V –. *Kurmancî*. 43, 4.

Aydogan, M. (2009). Şivanê Kurmanca ya Erebe Şemo – I –. *Kurmancî*. 45, 1-2.

Aydogan, M. (2010). Şivanê Kurmanca – II –. *Kurmancî*. 46, 3.

Aydogan, M. (2010). Şivanê kurmanca ya Erebe Şemo – III –. *Kurmancî*. 47, 3.

Aydogan, M. (2011). Şivanê Kurmanca ya Erebe Şemo – IV –. *Kurmancî*. 49, 2.

Aydogan, M. (2016). Hin peyv ji "Nameyek Şernexê" ya pirtûka Evdirehman Gundikî – I –. *Kurmancî*. 59, 5-6.

Aydogan, M. (2017). Hin peyv ji “Nameyek Şernexê” ya pirtûka Evdirehman Gundikî – II –. *Kurmancî*. 61, 2.

Aydogan, M. (2018). Hin peyv ji “Nameyek Şernexê” ya pirtûka Evdirehman Gundikî – III –. *Kurmancî*. 63, 1.

Aydogan, M. (2019). Hin peyv ji “Nameyek ji Şernexê ya pirtûka Evdirehman Gundikî”. *Kurmancî*. 64, 6.

Aydogan, M. - Kiliçaslan, H. (2002:). Îdyomên kurdî –XII-. *Kurmancî*. 31, 352-353.

Aydogan, M. - Kiliçaslan, H. (2005). Îdyomên kurdî – XV –. *Kurmancî*. 36, 402-405.

Aydogan, M. - Hirorî, N. (2012). Termên zimannasîyê. *Kurmancî*. 50, 1-2.

Aydogan, M. - Hirorî, N. (2013). Termên zimannasîyê” – II –. *Kurmancî*. 52, 2013.

Azîzan, M. H. (1932). *Rêzana Elfabêya Qurdî*. Şam: Çapxana Terekî.

Azîzoglu, R. (2009). Peyvên kurdî-îranî di yûnanî de. *Kurmancî*. 47, 5-6.

Azîzoglu, R. (2011). Peyvên yûnanî di kurdî de. *Kurmancî*. 49, 3-4.

B. (1957). Çon Zimanekeman Binûsîn. *Hîwa*. 1, 4, 10-17.

B. (1958). Be Kam Şêwe Zimanekeman Binûsîn. *Hîwa*. 2, 5, 72-75.

Baksi, L. (1994). Zewac. *Kurmancî*, 14-15, 150-154.

